Manvêl A. HASRATYAN

# KURDÊN TIRKIYÊ DI DEMA HERÎ NUH DA



Institut kurde de Paris

Wergerandina rû[illegible]
Tîmûrê Xelîl MURA[illegible]

ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Institut kurde de Paris

LIV. K.L. 2886
27/06/2016
1130 GAS KUR.

Manvêl A. HASRATYAN

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# KURDÊN TIRKIYÊ DI DEMA HERÎ NUH DA

Institut kurde de Paris

Wergerandina rûsî-kurdî :
Tîmûrê Xelîl MURADOV

ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Institut kurde de Paris

Îlon 1994

D/1994/5799/S

© Enstituya Kurdî Ya Brukselê
4, rue Bonneels — 1040 Bruxelles
Tel. 02/230.89.30
Fax. 02/230.34.02

Çapxane : Acco - Leuven

# PÊŞGOTIN

Kurdzanê ermenî yê navdar, Manvêl Hasratyan, vê pirtûka giranbuha "Kurdên Tirkiyê di dema herî nuh da" di sala 1990 da bi zimanê rûsî nivîsî. Weşanxana Hayastan jî ew li Erivanê, paytextê Ermenistanê, weşand. Du sal şûn de, di 1992 de, rojnamevan û nivîskarê kurd ê hêja, Tîmûrê Xelîl, ew li Erivanê wergerand kurdî û ji Enstituya me xwest ku wê biweşîne.

Em bi dilxweşiyeke mezin vê pirtûkê diweşînin û hem ji nivîskar û hem ji wergêr re ji bo vê xebata hêja gelek spas dikin, ji bo ku ewê ev berhem, weka yên din ên hêja, arşîva dîroka kurdî dewlemendtir bike û ji gelê kurd re, îro û sibê jî, gelek bi kêr bê.

Di vê pirtûkê de, M. Hasratyan li dîroka Kurdistana Tirkiyê ya sedsala XXmîn, nemaze li serhildanên 1925, 1930 û 1937, hûr dinêre û piştre tevger û partiyên siyasî yên vê beşa Kurdistanê ji salên 1960 heta îro li ber çavên me radixe.

Ev pirtûk ne bitenê rêzkirina kronolojîk a bûyeran e, lê dîtineke kûr li ser rewşa Kurdistana Tirkiyê û ya dewletên Rojhilata Nêzîk, taybetiyên partiyên kurdî, aliyên xurt û qels ên tevgera kurdî ... ye.

Rexneke me tenê li vê berhemê heye. Ew jî tehlîla nivîskar a hemî bûyeran li gora marksîzm-lênînîzmê û bawerîya wî ya xurt ku siyaseta Yekîtiya Sovyêtî ya bilindtirîn û paqijtirîn li cihanê ye !

Em hêvî dikin ku xwendevanên me vê pirtûka hêja bi hûrî bixwînin û jê gelek kelk (istifade) bigirin.

Pervîn Cemîl

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# BEŞ I

## PIRSA KURDAN DI DEMA TEVGERA KEMALIYAN DA
## (1918-1924)

### 1. Oktobra mezin û pirsa Kurdan di destpêka tevgera Kemaliyan da

Şoreşa Oktobrê ya sosyalîst a mezin di nava dîroka pêşdaçûyîna mirovayiyê da dewraneke nuh vekir, dewrana şoreşên prolêtaryê û azadiya neteweyan, dewrana azakirina gelên welatên kolonîkirî û bindest ji nîrê empêryalîzmê. Wê derbeke zor gihande bingehên empêryalîzmê li koloniyan, gelên Rohilatê yên şûndaketî rakirin şerkariya dijî sermayedaran, bona azadiya xwe.

"Pey hişyarbûna Rohilatê - gotiye V. Î. Lênîn - di nava şoreşa nuh da demeke usa dest pê dibe ku hemû gelên Rohilatê tevî safîkirina bext û nivîsa hemî cihanê dibin, bona nîşan bidin ku ewana ne tenê bona wê yekê ne ku kîsê wana dewlemend be. Gelên Rohilatê bi wê baweriyê hişyar dibin ku usa kar bikin, wekî her milletek keda xwe bike nava safîkirina pirsa di derheqa bext-nivîsa hemî mirovayiyê da" (5. s. 328).

Dewleta Sovyêtî ku bi saya Oktobra Mezin bûye ji rojên jiyana xwe yên pêşîn da polîtîka teribandina planên dewletên empêryalîst di zevtkirina di hindava gelên Rohilatê da daye derbas kirin. Prensîpên dewleta Sovyêtistanê û hîm di hindava gelên Rohilatê da ji aliyê Lênîn hatine hazir kirin û ji aliyê hukûmeta Sovyêtî di nava jiyanê da têne pêk anîn. Ji bo nimûnê, Biryarnama di derheqa aşîtiyê da, ku li kongrêya Sovyêtê di 2 adar-8 november 1917 da hatiye qebûl kirin, û Gaziya "Ber bi hemû xebatkarên Rûsyayê û Rohilata musulman" ya 3.12.1917 hene.

Prensîpên polîtîka dewleta Sovyêtê di derheqa alîkariya biratiyê bona gelên Rohilatê yên bindest ku ji bo azadiya civakî û neteweyî şer dikir bi resmî hatine îlan kirin.

Hemcivîna Hemrûsya Sovyêtê ya 7mîn biryara xusûsî di derheqa gelên bindest da qebûl kir û tê da sempatiya xwe ya mezin ji bo hejên azadiyê yên gelên Rohilatê û haziriya xwe ji bo alîkariya hem moral û hem maddî bide wan îlan kir (27, s.18). Şoreşa Oktobrê ferzendeke baş da sazkirina şerkariya gelên Rohilatê yên bindest ji bo azadiyê dijî empêryalîzmê. Wê ne tenê sîstema empêryalîzma kolonyal pîre-pîre kir, lê usa jî bi saya dewleta Sovyêtî stûna şoreşên gelerî yên azadiyê da saz kirin.

"Helbet tiştekî têgihiştinê ye - V. Î. Lênîn daye xuya kirin - ku ew heja gelên Rohilatê dikare şoreşgeriyê nuha bi awakî vekirî pêş da bibe, her tenê bi pevgirêdanên kîp tevî şerkariya Komara me ya Sovyêtî di şoreşgeriya dijî empêryalîzma navneteweyî da" (5, s.318).

Rûsya Sovyêtî bona gelên bindest bû alîgir-pêşîkêş, ku riya azabûnê ji şûndamayîna civakî û neteweyî ronî dike.

Bingehvanekî Partiya Komunîst a Tirkiyê û sedrê wê, Mistefa Sibhî, dema ku kemala şoreşa Oktobrê bona gelên Rohilatê qîmet dike, dinivîse : "Şayînetiya serketina li Rûsyayê di nava karker û gelên hemî cihana bindest da bi dil tê qebûl kirin, pencên baweriyê di nava wan da pêş da tîne ... Îro Rûsya Sovyêtî destê alîkariyê dirêjî gelên cihanê gişkî yên bindest dike û gazî gelan dike ku wek bira bin û bi hev ra muttefiq bin" (117, s.45).

Bîr û baweriyên Oktobra Mezin, nenihêrî hemî ferzenndên ku dîwana Tirkiyê işaret daye, dakutane Tirkiyê û di nava gelên welêt da hatine belav kirin. "Her bajarekî Anatolî yê biçûk, her gundekî wî - di derheqa wê demê da Nazim Hikmet bîr tîne - bi deng û basên di derheqa Oktobra Rûsyayê da tije bûn" (179, s.VIII, 1951).

Bîr û baweriyên Oktobra Mezin, bê gilî, ketine wilayetên Rohilatê, ku tê da piranî Kurd bûn, jî.

Casûsên Ingilterê di derheqa hukmê dîtinên şoreşa Oktobrê li navçeyên Kurdan da dida zanîn ku hukûmeta Ingilterê ew şandine wira bona tevgera azadiyê ya Kurdan, ji bo ku armancên xwe yên empêryalîst bi kar bînin.

Ji bo nimûnê, Çawîş Noël, ku serhing Wîlson ew şandibû bona ku serekvaniyê li navçeya Suleymaniyê bike, di sala 1919 de, di nama hesabdayînê da, dabû zanîn : "Divê ku em hesab hildin ku nemaze rewşa polîtîka derve hukm li ser rewşa hundurî ya navçeyên Kurdan dikir. Tunebûna aşîtiyê li Tirkiyê û têkoşîna wê tevî Yûnanan di bin guhdariya mirovên Kurdistanê da nav û deng dabû. Li vira bi planên Bolşêvîkan dihesin, hurmeta bolşêvîsmê ku li vira çiqas diçû bêtir dibû, derbaskirina polîtîka Ingilterê li nav vê navçê şerpeze dikir. Ajîtasyona Tirkiyê ku dijî Ingilterê bû rêke nuh vedikir. Kurd Kemal Paşa rind nas dikin û li ser wê bîr û baweriyê ne ku ewê dewleta Islamî saz bike û otonomiyê bide Kurdan, bê kongreya aşîtiyê. Pirsdanîna me ya sereke ew e ku nehêlin bîr û baweriyên bolşêvîsmê belav bibin û hesabê propaganda Tirkiya islamî bêne der, û ûsa jî nehêlin ku li welatên Rohilata Nêzîk û Navîn dîtinên şoreşvaniyê bêne testîq kirin" **(175, r.145)**.

Serketina Oktobra Mezin, derketina Rûsyayê ji nava şer û qetandina wê ji polîtîka dewletên empêryalîst, usa jî ji aliyê Ingilterê zevtkirina Mêzopotamya û wilayeta Mûsilê (para Kurdistana başûr) û parvekirina Imperatoriya Osmanî rewşeke nuh saz kir. Pirsa Kurdan hemî cihan dest anî. Bi van faktorên bingehî dihat xuya kirin ku :

1- Li Kurdistanê dewlemendiyên binerd pir hebûn. Ji yên sereke, nefta Mûsilê û ya çend navçeyên mayîn. Bilî wê, krom, hesin, sifir, komir û dewlemendiyên madenî yên din hebûn.

2- Para Kurdistana başûr (Mûsil) xwediya kemala bazirganiya mezin, wek axa di navbera Tirkiye û Iraqê, Tirkiye û Sûriyê, Îran û Iraqê da, bû.



Institut Kurde de Paris

3- Kemala Kurdistanê stratêjîk bû. Navçeyên wê yên çiyayî hukm li ser Tirkiya başûr û rohilatê, Îranê, best-beyarên Iraqê, riyên ber bi Devtenga (xelîc) Farisî û herweha Pişt-Qefqasa Sovyêtî dikir.

4- Perçebûna Kurdistanê di nava sê dewletan de (Tirkiye, Îran, lê paşê jî Iraq) ferzenend dida empêryalîstan ku hergav hukm li ser polîtîka wan welatan bikin û bona wê wan daxwaziyên gelê Kurd ên azadiyê bi kar dianîn.

Van hemû dereceyan alîkariya pêşdahatina "pirsa Kurdan" , ku pey şerê hemcihanê yê pêşîn pêş da hat û ku dewletên Roavayê dicedand bona meremên xwe yên empêryalîst bi kar bînin, dikir.

## 2. Rêxistinên Kurdan pey şerrê pêşîn û bikarkirina wan

Şerkariya kurdî ji bo azadiyê li Tirkiyê di nava pêşdaçûyîna wê da çend merhele derbas kirin û di destpêka sedsala 20mîn da rewşa tevgera neteweyî wergirt, ji bo ku şovînîzma polîtîka Tirkiyê hîn gurr dibû. Binketina Imperatoriya Osmanî di cenga hemcihanê ya pêşîn da, jihevçûn û ketina panislamîzm û panosmanîzmê, tevî bilindbûna pantirkîzmê, ku dixwest binceciyên bi jimara xwe va biçûk bi destê zorê bike tirk û bihelîne, bûn faktoreke baş ji bo hişyarbûn û pêşdeçûna hissê neteweyî li ba Kurdan û geşbûna tevgera wan a azadiyê. Kurd, usa jî gelên mayîn, di dema pîre-pîrbûna Imperatoriya Osmanî da rabûne têkoşînê ji bo mafên xwe yên gelî. Rêxistinên kurdî serokatiya wan tevgeran dikir, wek Komela Damezrandina Kurdistanê (Kürt teşkilatı niştimaye cemiyeti, Kürt millî fırkası), ku nemaze li Stembolê kar dikir, Komela Daxuliqandina Kurdan (Kürt teali cemiyeti) ku li Diyarbekirê kar dikir **(145, r.54)**.

Komela Daxuliqandina Kurdistanê di sala 1918 da li Stembolê hatiye saz kirin. Gelek endamên şêwra serokatîkirinê ya wê ji malbatên bi nav û deng bûn, ku li Kurdistanê navdar bûn. Bingehvanên komelê Bedîuzzeman Melle Seîd Beg, Xalid Begê

Moksî, Xelîl Xeyalî Begê Motkî bûn. Bajariyên bi eslê xwe va kurd, ku dixwest alîkariya amadekirin û pêkanîna pirsa Kurdan bikin, diketin nava wê komela rewşenbîrên Kurdan.

Komelê şêwra serokatiyê bijart. Kesên ku ketine nava wê Seyid Ebdulkadir (sedrê şêwrê), lawê Ubeydullah Efendiyê ji Şemdînan; Emîn, Elî Beg Bedirxan (cîgirê serokê şêwrê); Ferîk Fuad Paşa ji Botan, lawê wezîrê berê yê karên derve (cîgirê serokê şêwrê yê duyem); Ferîk Hemdî Paşa ji Suleymaniyê, generalekî berê, ku ji text hatiye avêtin (sekreterê sereke); Seyid Abdullah, lawê Seyid Ebdulqadir (hesabdar). Herweha, wek endam-serhing, Xelîl Begê ji Dersîmê; serhingê berê M. Alî Beg Bedir Xan; dîndar Xoce Alî Efendî; profesor Şefîk Efendiyê ji Arvasê; berpirsiyarê rojnama sereke ya "Tercuman" Babanzade Şukrî Beg; Babanzade Fuad Beg; bazirganbaşî Fethullah Efendî; profesor, doktor Şükrü Memet Beg Sekban **(145, r.52)**.

Serokatiya Komelê li ser pirsa dayîna mafên neteweyî ji bo Kurdan xwe nerm girtibû û pevgirêdanên xwe yên tevî komên osmanî ne dabûn birîn. Bi bîr û baweriya nivîskarê Tirkan, Metin Tokaç, wê tevî partiya "Azadî û bawerîhevanîn" (Hürriyet ve itilaf) di derheqa dayîna otonomiyê ji bo Kurdan di nava axa Imperatoriya Osmanî da peyman girêdabû **(147, r.115)**.

Anegorî gotara 4mîn a qanûnnama hundurî, Komelê armanca xwe ew yek hesab dikir ku bi matêryalî û rûhanî ji bo pêşdaçûyîna Kurdistanê û daxuliqandina wê kar bike **(148, r.439)**.

Bi gotina serokê heja dijî empêryalîzmê li Tirkiyê, Mistafa Kemal, komikên Komela daxuliqandina Kurdistanê li Diyarbekir, Bitlîs û Elaziğê hebûn **(113, dîwan 3, r.904)**. Lê serkaniyên Kurdan ew înkar dikir. Wek tê xuya bûn, Mistafa Kemal ew komele bi Komela daxuliqandina Kurdan ku li Diyarbekirê kar dikir va şaş dikir. Komela Daxuliqandina Kurdistanê, pey zevtkirina Stembolê ji aliyê Ittifaqdaran, karkirina xwe di nava Kurdên bajêr da xurt kir. Anegorî salixên weşana Tirkan, her endamekî

Institut kurde de Paris

Komelê diviya ku her roj quruşek bida. Ev pere û pereyê mayîn ku her meh dikir 1.000 lîra ji serokê Komelê Seyid Ebdulqadir re dihat dayîn (230, 18.IV, 1925). Ji wan peran, ku piraniya wan karkerên kurd dida, Seyid Ebdulqadir wek alîkarî dida komela xwendekarên kurd "Hêvî" (145, r.98).

Komele gihîşte wê yekê ku Kurd ji navçeyên Anatolyayê yên cihê-cihê vegeriyane cî-warên xwe, li ser qulixên bilind li Kurdistana Tirkiyê xuya bûne, pevgirêdan tevî nûnerên Antantayê li Stembolê dane saz kirin.

Komelê ew kovar û rojnameyên ku li Stembolê bi zimanê kurdî dihatine weşandin dişandin Diyarbekirê, ji Komela Daxuliqandina Kurdan ra. Ji wan weşanan, yên herî giring li çapxana Komela Daxuliqandina Kurdan dihatin bergirtin, li hev zêde kirin û di nava bineciyan da belav kirin.

Komelê dijî îdêolojiya panturkîst a Süleyman Nazif Bey, Agayêv (Ahmed Aga Oğlu), Ziya Gökalp şervanî dikir. Wê yekîtiya bi Komela parastina mafên milletên wilayetên rohilatê, ku rast e, çend şêxên Kurdan ên navdar û serekeşîr kiribûn nava koma xwe, lê ku dijî dayîna mafên neteweyî ji bo Kurdan pêş da hat, înkar dikir (148, r.430).

Endamên şêwra serokatîkirinê ya Komela Daxuliqandina Kurdistanê diçûn bal komîsarên amerîkî, ingilîz û fransiz li Stembolê, de'w dikir ku ew mafên Kurdan ên neteweyî bidin. Dema rasthatineke usa tevî komîsêrê amerîkî ye ku tevî wê Seyd Ebdulqadir Efendî, Emîn Elî Beg Bedir Xanî, Bedîuzzeman Melle Seîd, doktor Şukrî Memet Beg, weke berpirsiyarên Kurdan bû,. Wan mêmorandumeke mezin ku tê da xarîta tixûbên Kurdistanê dabûn xuya kirin raberî komîsar kir, pêwistbûna derketina van sînoran ber bi derya da zanîn û hêvî kir ku di wê yekê da alîkarî bidin wan. Vî Komîsêrê amerîkî bersiva wê yekê da : "Aide-toi Dieu t'aidera", ango : "Tu alîkariya xwe bike, wê demê Xwedê jî ewê alîkariya te bike", û ji serayê derket. Ji gişkan zehftir, Kurd rastî komîsêrê ingilîz dihatin. Wî gilî dabû ku mafên Kurdan ên neteweyî nas bike. Tevî

wî yekê, wî digot ku bona vê yekê Kurd divên berbihêr û mulayim bin. Wek ku berpirsiyarê Kurdan ê bi nav û deng, Zinar Silopî, bi heqî dide xuya kirin, eger bi rastiyê bikeve, wî Kurd dixapandin (145, r.54).

Wek hat nîşan dan, komîsêrê Ingilterê tewre bilindî li Stembolê, gava ku di derheqa wan hevpeyvînan da gilî hate ortê, di têlêgrama xwe ya li ser navê nûnerê Ingilterê yê dîplomasî li Bexdadê, ya 18 nîsan 1919 da, dinivîsî ku Ebdulqadir, yê ku sedrê senata dewletê bû, "li ber min bi navê komîteya Kurdan li vira pêşniyar kiriye, de'wa serbestiya Kurdan kiriye û de'wa azadkirina ji nîrê Tirkiya kirêt kiriye". Di têlêgrameke mayîn di 3 gulan 1919 da, li ser navê wezîrê Ingiltera Mezin ê karên derva, komîsêrê bilind daye zanîn : "Ew dixwazin ku dewleta wan a azad hebe ... Ew dixwazin heta-hetayî ji Tirkan xelas bin, yên ku, wek Ebdulqadir dibêje, tucar tutişt ji bona wan ne kiriye, ew di derheqa Tirkan da bi dilekî xemgîn û kovan dipeyive" (162, r.21).

Di nava pirsa destanîna mafên neteweyî bona Kurdan, di nava endamên Komela Daxuliqandina Kurdistanê da yekîtiya bîr û baweriyan tu nebû.

Ji bo nimûnê, di civîneke xwe ya destpêka sala 1919 da, endamên Komelê yên genc (Cankurd) li Stembolê de'wkarî kir ku biryara di derheqa nasandina serbestiya Kurdistanê û ji hemû navçeyên Kurdan derxistina hêzên hemû biyaniyan (herweha Tirkan jî) da qebûl bikin. Sedrê Komelê, Seyid Ebdulqadir, dijî wê pêşniyara cankurdan (Kurdên genc) derket. Wî dijderketina xwe bi wê yekê va efû dikir ku Tirkan qayil bûne ku otonomiyê bidin Kurdistanê, ku diviya di bin hukmê Sultan da bûya (gotina wî di derheqa wê peymanê da ye ku Komelê tevî partiya "Azadî û bawerîhevanîn" qol kiriye). Dûvra Seyid Ebdulqadir temî dida endamên Komelê ku herin navçeyên Kurdan û li wira di nava goveka bernama Komelê da propaganda bikin û usa jî bi her awayî dijî sazkirina dewleta ermenî ya neteweyî û serbest ku bi prensîpên serok Day Wîlson hatibû biryar kirin derkevin (1).

Divê ku bê zanîn ku Seyid Ebdulqadir gelek berk dijî yekbûna Ermeniyan û Kurdan û hêviyên wan ên tevayî ku pirsên Ermeniyan û Kurdan bidin safî kirin derket. Ew derkete dijî sazkirina dewleta Kurdan û got ku tu tişekî wê dewletê bi sultanetî û xelîfetiyê tu neye (126, r.120-121).

Paşê wî bîr û baweriyên xwe di hindava pirsa di derheqa dewleta Kurdan da hinekî guherandin. Ji bo nimûnê, dema ku ew li dadgeha tevgelên serhildana sala 1925 a Diyarbekirê rabû peyivî, piştgiriya sazkirina komara kurdî ya islamî, ku ewê bi polîtîk ji Imperatoriya Osmanî bihata qetandin lê pevgirêdanên olî-dîndarî bi xelîfetiyê biparasta, kir. Bi bîr û baweriya wî, dîwana diviya ku dîwana serokatiyê ji bav derbasî kur ne bibûya, lê wî ne da zanîn ku di her guhastineke parlementê da ewê serokê dewletê jî bihata guhartin. Serokê dîwanê, gava kar jê neyê, nexweş e an jî mirî ye, ewê wê çaxê dest ji qulixê bikişanda. Ango, Seyid Ebdulqadir monarşiya konstîtusyonî (padîşahiya qanûnî) diparast. Bi tomerî hildayî karê Komelê, ku ji ruyê sazbûna hukûmeta Ankarayê ji Kurdistanê qetiyayî bû, tenê li Stenbolê hinek karê polîtîk dikir.

Pareke endamên Komela Damezrandina Kurdistanê ku tabiya Seyid Ebdulqadir bû bi nermiyê ne razî bû, ji Komelê derket û rêxistineke nuh, bi navê "Komela Kurdan a Civakî", saz kir. Ketine nava wê Komelê : Emîn Alî Beg Bedir Xanî, Ferîd Beg Bedir Xanî, Şukrî Beg Baban, Fuad Beg Baban, Hikmet Beg Baban, doktor Abdullah Cewdet Beg, doktor Şukrî Memet Beg, Kemal Fewzî Begê ji Bitlîsê, Ekrem Beg Cemîl Paşa, Necmeddîn Huseyn Begê ji Kerkûkê, Molanzade Rifat Beg û Memdûh Selîm Beg. Wan di derheqa sazkirina Komela Kurdan a nuh da komîsêrên dewletên Antantayê li Stembolê agahdar kirin. Kovara "Jîn" ku rêxistina "Hêvî" diweşand, wek rojname, her roj derdiket û tê de bîr û baweriyên "Komela Kurdan a Civakî" diyar dikirin.

Di sala 1921 de, wê Komelê dêlêgasyoneke bi van kesan : Xelîl Rehman Beg Bedir Xan, Mistefa Paşa

Emlikî Beg, Kemal Fewzî Beg, Rifat Beg Molanzade da saz kirin û şande Iraqê, ji bo ku ew ji Kurdistana Bakur herine Kurdistana Başûr. Lê dîwanên Ingilterê yên zevtkar ne hişt ku endamên wê Komelê ji Iraqê derbas bin. Wan tenê îzn da Mustafa Paşa ku here Suleymaniyê (ew bi eslê xwe va ji wira bû) û li wira bû wezîrê ronayîdariyê yê hukûmeta "padişahiyê" ku wî çaxî Şêx Mehmûd damezrandibû. Di sala 1922 da, li Stembolê, xaniyê Osmanî yê cezakirina bajarvaniyan civîna dawîn a endamên Komela Kurdan a Civakî da derbas kirin û biryar kir ku endamên wê Komelê yên serokatîkir ji Stembolê derkevin, ji ber ku êdî ferzenda bona karkirinê li wî bajarî ne mabû **(145, r.106)**.

Di derheqa karê Komela Kurdan a Civakî da, ew ala sêrengî ku saz kiriye bîr tîne. Zola pêşîn a vê alê sor e, zola navîn sipî ye û li ser wê roj (tav) hatiye kişandin, zola jêrîn kesk e. Komelê îlan kir ku ew ala neteweyî ya Kurdan e.

Di nava karên Komela Kurdan a Civakî ku roleke giring lîst da, Partiya Kurdistanê ya gelî, ku Necmettîn Huseyn Beg, Mehmûd Beg, Kemal Fewzî Beg, Ezîz Beg Babanzade saz kiribû, ye. Armanca wê pêkanîna daxwaziya neteweyî ye **(145, r.60)**.

Komela Damezrandina Kurdan, ku di nava gel da bi "Komika Kurdan" dihat bi nav kirin, bi pêşniyara endamên Komeleyê yên genc yên "Hêvî", ku li Diyarbekirê bûn, hate saz kirin. Bona serokatiya Komelê, pêşiyê Ekrem Cemîl Paşa serwêrtî hate bijartin, û ji endamên wê Cercis Zade Kerîm Beg, Çerxîzade Fikrî Beg, Ganîzade Reşad Beg, Cemîl Paşa Ömer Beg, usa jî ji berpirsiyarên Kurdan ên bi nav û deng, wek Ganîzade Cevdet Beg û doktor Fuat Beg, bûn. Komelê, bilî lêhûrbûna di nava pirsên polîtîk da, kemaleke mezin dida hînkirin-fêrkirina zimanê kurdî, pêşdaçûyîna çanda wê. Di nava demeke kurt da, Komela Daxuliiqandina (damezrandina) Kurdan li gelek bajarên Kurdan perçên xwe da vekirin. Tenê li Diyarbekirê jimara endamên wê ji hezar mirovî derbastir bû. Bona ku xunedarkarkerên kurd ên bi nav û deng bikevine nava

Institut kurde de Paris

serokatiya Komelê, serwêrtiya wê di nava demeke kurt da ji hev belav bû. Komcivîn hate derbas kirin û tê de Cemîl Paşazade Qasim Beg (bavê Erkem Cemîl Paşa) wek serokê serwêrtiyê hat bijartin, cîgirê wî doktor Ganîzade Cevdet Beg hat bijartin, lê sêkrêter Cerciszade Kerîm Beg û temîdayî-şêwirdar Hemdî Efendî bûn. Wek endamên serwêrtiyê ev kes hatin bijartin : Cemîl Paşa Ömer Beg, Çerxîzade Fikrî Beg û Cemîl Paşa Ekrem Beg. Di nava Komelê da komîsyona bona propagandakirinê hebû. Endamên wê avukat Mehmed Efendî (Bavê Tûjo), Fewzî Efendîzade, Mehmed Efendî, Cemîl Beg, Elî Efendiyê ji Licê bûn.

Di wê demê da, hemû bineciyên Diyarbekirê piştgiriya Komela Damezrandina Kurdan dikir, bilî Lutfî Hecî Îbrahîm Efendî û mirov-pismamên wî, ku ji malbeta Pirîncîzade bûn, ku bi muxalefeta xwe di derheqa sazkirina Kurdistanê da eyan bûn **(145, r.47)**.

Di nava wê demê da, li wilayetên Tirkiyê yên Rohilatê Komîta Serbestiya Kurdistanê jî dest bi karkirina xwe kir. Pêwist e em bidin zanîn ku ne tenê pir Kurdên gundî ketine nava heja dijî Tirkiyê, lê herweha jî ew kesên ku bûbûne endamên Suwariyên Kurd "Hemîdîyye", ku heta van demên paşîn jî bi rêjîma Sultan ra bûn û baweriya xwe pê tanî.

Wek hûn dizanin, eskerên "Hemîdiyye" heta dawiya sedsala 19mîn ji aliyê Sultan Abdul Hamîd hatibûn saz kirin. Ew cerdên derebegên Kurdan ên eşîrtiyê bûn. Hukûmeta Tirkiyê ku "Hamîdiyye" da saz kirin û ew kire bin bandûra xwe, dixwest ew bi kar bîne bona ku dijî têkoşîna gelê Ermenî ya neteweyî di nava şerrê dijî Rûsyayê da derkeve, û herweha nehêle ku ew alîkariya têkoşîna Kurdan ku çiqas diçû pêş da diçû bike. Hukûmet gihîşt armanca xwe ya pêşîn. Cerdên derebegên Kurdan di dema qir-gelkujiya ermenî ya sala 1915 da, ku Jön-Tirkan dabû teşkîl kirin, ber bi çav ketin. Tiştê ku ji du armancên mayîn dimîne ew e ku di dema şerrê hemcîhanê yê pêşîn da çend deste û tabûrên "Hemîdiyye", ku perçebûn û pîre-pîrebûna Imperatoriya Osmanî texmîn dikirin, derbasî hêla eskerên rûs

Institut Kurde de Paris

bûn û gelek caran berê çek û gulle dida aliyê hukûmeta Osmanî, û bi wî awayî dibûn faktoreke aktîf bona tevgera Kurdan.

Rast e, gişkan zanîbû ku "Hamîdiyye" komikeke derebegî-rêaksyonêr bû, lê Kemaliyan ew ne dane hildan û dixwest ku Kurdan bona daxwaziyên xwe yên zevtkariyê bi kar bînin. Piraniya eskerên "Hamîdiyye" li "pêşeniya rohilatê" bûn û qumandarê wan, Qerebekir Paşa, dixwest ku wan di nava şerê dijî Ermenistana Daşnakî, dijî gelên Piştqefqasê, lê usa jî bona "nermkirina Kurdan" bide xebatê. Lê wî di qewlên nuh da nikaribû bigihîje armanca xwe. Alayên "Hamîdiyye" ku ji aliyê dîwana Tirkan hatibûn xapandin, ferman ne diqedand û gelek caran radibûn serhildanê. Wê alaya ku qumandariya wê Xalit Beg Cibranlî dikir roleke gelek giring lîst.

Cibranlî Xalit Beg ku ji malbateke Kurdan a mezin a derebeg derketibû, pey temamkirina dibistana Eşîretiyê li Stembolê, di nava teşkîlata "Hemîdiyye" ya qumandariyê da yê herî xwendî û di dereca eskeriyê da jêhatî bû. Ew dema ku hîn genc bû bû serhing û qumandarê alayê û paşê jî yê dîvîzyona eskerên "Hamîdiyye". Jihevçûyîna Imperatoriya Osmanî, hişyarbûna tevgera Kurdan û "parastina" têkoşîna Kurdan ji aliyê dewletên Roavayê hêvî dikir dilê Xalit Beg û ew hêdî-hêdî dikete nava wê têkoşînê.

Di sala 1920 da, Xalit Beg Cibranlî û zabitên alaya wî yên gumreh dest bi propaganda bîr û baweriya Kurdistana serbest dikir. Li navçeyên Warto, Qerliova, Melezgir, Bulanik, Xunusê, wan tevî şêx û serokên eşîretên Kurdan hevpeyivîn didane derbas kirin, bona şerkariya dijî biryarên kongrên Erzurum û Sivasê, û usa jî dijî wê miqala "Sondxwarina millî" ku tê da dihat dîtin ku Kurdistana Tirkiyê bikeve nava teşkîla Tirkiyê **(128, r.117-118)**. Ew li ser wê dîtinê bûn ku dem hatiye bona ji zordestiya Tirkiyê ku bi sedsalan gelê kurd di nava tarî û belengaziyê da hiştiye, mafên wan ên herî piçûk pêpes kirine xilas bin. Bi wê yekê ra, ew tevayî li

Institut kurde de Paris

ser wê bîr û baweriyê bûn ku bi van qewlên sazbûyî ew dikarin bigihîjin wan mafan, her tenê bi riya bilindkirina dereca hişyarbûna neteweyî, propagadadakirina fikrên şerkariya azadiyê, herweha bi serhildana Kurdan a çekdarî. Loma jî, serokên Kurdan dest pê kir eşîretên ku piştgiriya wan dikir bidin çekdar kirin, temî dida Kurdan ku bi rihalkincên xwe yên neteweyî bigerin, bi kurdî bixwînin û binivîsin, û usa jî afirandinên nivîskarên Kurdan ên polîtîk, ên Xalit Cibranlî, Melle Ahmed Cizîrî, Ahmedê Xanî û h.w.d. belav dikirin.

Di Oktobra sala 1920 da, li Erzurûmê rêxistina dizî "Cemiyeti Istiklali Kurdistan" (Komîta serbestiya Kurdistan" hate saz kirin. Ew rêxistin, çawa ku ji navê wê tê xuya bûn, pirsdanîna xwe ya sereke destanîna serbestiya Kurdistanê hesab dikir. Pêşiyê, kesên ku ketin nava Komîta Serbestiya Kurdistanê serhing Cibranlî Xalit Beg, Alî Riza Beg, Kemal Fewzî Beg û çend karkerên têkoşîna Kurdan ên navdar bûn. Serokê Komîtê Cibranlî Xalit Beg hate bijartin **(108, r. 242)**.

Rêxistinên dizî yên wê Komîtê pir zû li hemû navçeyên Kurdên Tirkiyê hatin belav kirin. Serokên wan gelek hereket rêtin bona ku pevgirêdanên bi tevî serok û şêxên welatparêz kîp saz bikin. Lê Komîta Serbestiya Kurdistanê pevgirêdan, ne tenê tevî nûnerên serokatiya Kurdan a derebeg, lê herweha tevî xwendekarên kurd ku li idarên Tirkan ên xwendinê hîn dibûn, tevî zabitan, karmendên kurd ên dewletê saz kirin. Wê dest pê kir bi zimanê kurdî tişt bide weşandin; ji bo nimûnê, pirtûkên biçûk û stranên gelî çap dikirin **(108, r. 244)**.

Wê çaxê, bi saya propaganda Komîtê, nêzîkî 80% ji Kurdan bûn hêla wê **(12, 10, VI.1925)**.

Anegorî berpirsiyarê kurd ê bi nav û deng, Heqqî Beg, bi saya qulixkirina pevgirêdanên rind teşkîlkirî, Komîteya Serbestiya Kurdistanê hay ji hemû planên Kemaliyan di hindava Kurdan da hebû. Di wî alî da, emekê niştimanperwer-xwendekarên kurd, zabit

û karmendên idarên dewleta Tirkiyê yên kurd pirr bû (108, r. 244). Temamiya karkirina Komîtê ji bo xurtkirina hişyarbûna Kurdan, şirovekirina polîtîka Kemaliyan a şovînîst di dereca pirsa neteweyî da, sazkirina qewlan bona ku Kurd bibin xwdiyên mafê xwe bû. Havîna sala 1920, Xalit Beg Cibranlî pevgirêdan tevî endamên Komela Daxuliqandina Kurdistanê li Stembolê, Ebdulqadir û Ebdulrehman Hekarlî testîq kir. Bi destê wan, ew tevî parlementerên Tirkiyê, Yusuf Ziya û alîgirên wî, di derheqa gihajtina Kurdistanê serbestiyê, bi riya Lîga (Koma) Milletan, pev diket. Wê çaxê, Xalit Beg dest pê kir ji mirovên kurd ên bi nav û deng, şêx û muxtarên gundan, ên navçeyên Varto, Bulanik, Melezgir, Xinis, Karluova, Solxan, Çapakçur gaziyên bi nivîsar berhev bike bona ku ji Lîga Milletan ra bişîne, ku ew serbestiyê bide Kurdistanê. Bi destê wê Komela Damezrandina Kurdistanê ew gazî, li ser navê Mistefa Nemrûdî û Şerîf Paşa, ji Lîga Milletan ra hat şandin.

Karkirina Xalit Beg Cibranlî berçav diket. Di 17 tebax 1920 da, Xalit Beg li Erzurûmê hat gazî kirin, bona ku ew ji tevgera Kurdan bê qetandin û wan ew wek sedrê komîsyona şêwra bilind (mahkeme) ya korpûsa eskerî nîşan da. Lê ew qulixa resmî li Erzurûmê firsendeke baş bû bona karkirina dizî. Ewê bi hev ra karbikirina tevî Komela damezrandina Kurdistanê û tevî Yusif Ziya, yê ku ji bo karê xwe yê muxalefetê paş demekê ji teşkîla Civîna Tirkiyê ya Millî (Meclis) hate derxistin û tevî Xalit Beg dîsa dest bi propagandakirina karê ji bo serbestiyê kir, kar bikirana.

Lênihêrandina qinyatên cihê-cihê didine xuya kirin ku, piştî şerrê hemcihanî yê mezin, bi tomerî hildayî di nava tevgera Kurdan da 5 serokên ku daxwaziyên polîtîk ên komikên Kurdan ên cihê-cihê didan pêş xuya bûne :

1- Koma yekemîn ji bo destanîna serbestî û xwexwedîtiya Kurdistana tam bû : ew nemaze serokên Komîta ji bo Serbestiya Kurdistanê bûn.

2- Koma duyemîn ji bo otonomiya Kurdistanê ya

hundurî di goveka dewleta Tirkiyê da (perçeke Komela damezrandina Kurdistanê) bû.

3- Koma siyemîn ji bo "serbestiya" Kurdistanê di bin bandûra Îranê da bû. Çend Kurdên bi nav û deng ku di cihana diplomatîk da roleke mezin dilîzt ketin nava wê komikê. Serokê wê Şerîf Paşa bû (11).

4- Koma çaremîn ji bo sazbûna Kurdistana "serbest", di bin bandûra Ingilterê da, bi al û zimanê kurdî yê dewletê (tevgera li Kurdistana Iraqê), bû.

5- Koma pêncemîn, ku xwezma di dema şoreşa Kemaliyan da rabû meydanê, dixwest ku Kurd tam di bin bandûra Tirkiyê de bin. Ew Kurdên ku li ser wê bîr û baweriyê bûn di qulixkirina diplomasî, eskerî û dewletê da bûn, herweha jî parlementer, karkerên siyasî ku bûbûne Tirk, yên ku roleke mezin di jiyana Imperatoriya Osmanî û Tirkiya nuh da bûn lîzt. Ew ji gelê xwe hatibûn birîn û helbet nikarîbû bi daxwaziya Kurdan ya neteweyî qayil bin û piştgiriya wan bikin.

Em bi hûrgilî li ser hal û dema tevgera Kurdan a wê çaxê cihê-cihê nasekirin, slogan û de'wkirinên wan naynin meydanê, lê emê her tenê bidin nasîn ku bîr û baweriya xelasbûna ji nîrê Tirkiyê rihên kûr avêtibûn, li temamiya Kurdistanê belav bûbûn, ketibûne nava giyana hemû Kurdan. Ev hemû tişt şehadetiyê didin ku rewş û pirsa Kurdan li Kurdistanê tûj bûye. Gava ku hemû milkên Imperatoriya Osmanî yên li Ewropa û Asyayê ji dest çûn, pirsa qedera navçeyên Kurdî hate meydanê. Divê ku em li ser zêde bikin ku pirsa Ermenistana Roava (ya Tirkiyê) jî pirsa rojane bû. Di van şertan da, pirs hat pêş serokatiya Tirkiya nuh ku çawa van navçeyên ku ji Imperatoriya Osmanî mane biparêze. Gilî ne tenê di derheqa raqetandina têkilbûna welatên derve li axa Tirkiyê bû, lê usa jî ku Ermenistana Roavayî û Kurdistana Bakur di nava goveka Tirkiyê de xwedî bikin, ku ji destê wan neçe. Loma jî, gava Mustefa

Institut kurde de Paris

Kemal Paşa nuh hatibû Anatolyayê, dest pê kir hêza xwe mezin bike, ji bo mehkemekirina tabiyên Tirkan ên wê navçê.

### 3. Serhildanên dijî Kemaliyan li Meletyê di 1919 da

Mustafa Kemal û koma dora wî, ku ji navê bûrjuwaziya Anatolyayê pêş da dihatin û ku bi bîr û baweriya nasyonalîzma Tirkiyê va dihatine serekvanî kirin, ji roja hatina xwe bo Anatolyayê şerkariyeke bê hempa dijî her karkirineke ku ne bi dilê tevgera Tirkiya milletçî û nasyonalîst bû kir. Loma jî têkoşîna Kurdan ji bo mafên xwe yên gelî hema ji destpêkê da ji aliyê Kemaliyan bi dijminatî hate qebûl kirin.

Ha va ye ji bo nimûnê : di 1 hezîran 1919 da, ango 10 roj piştî hatina Mustefa Kemal bo Anatolya Rohilatê, wî têlêgramên hejmarkirî (44 N°) ji waliyên Diyarbekir, Erzurûm, Wan, Bitlîs, Xarpût (IV), Sivas û qezayên otonom ên Erzincan û Qeyserî ra şandin. Wî tê da pirs dikir ku li kîjan ji van bajaran komele û rêxistin hene û serokên wan kî ne.

Di nava bersiva waliyê Xarpûtê da dihate gotin ku tevî çend rêxistinên mayîn li vê wilayetê Komela Damezrandina Kurdistanê jî kar dikir. Wî nivîsîbû : "... Komela Kurdan ku li Diyarbekirê ji aliyê çend xortan hatibû saz kirin (di dokumentê da çend gotin hatine berdan), nuha propaganda dike bona sazkirina otonomiya Kurdistanê ... û ew komele ji hev belav bû. Ji aliyê walî mehkeme dijî gunehkarên wan ceribandinên ku ne anegorî zagûnên Tirkiyê ne hate derbas kirin...".

Karên ku dîwana Diyarbekirê di wê derecê da kirine ji aliyê Mustefa Kemal bi dilalavî hatin qebûl kirin, û wî di 15 Tîrmeh 1919 da ji Amasyayê têlêgrameke hejmarkirî ji cîgirê waliyê Diyarbekirê ra şand, ku tê da ewha hatibû nivîsandin : "Her komeleke ku dicedîne welêt pîre-pîre bike, divê ku bi destê xwe bê belav kirin. Pêwîst e, herweha, ku dû wan hemû casûsan bigerin, yên ku van rojên dîrokî ... dixwazin jiyana qûltiyê sexîrî derbaskin,

loma jî dikevin bin bandûra dewletên welatên derve. Wacibê her niştimanperwerekî berk dijî neyaran derkeve. Loma jî min bi temamî mecalên we yên qebûlkirî di hindava Komika Kurdan da ecibandin" **(113, dîwan III, r. 903-904)**.

Mustefa Kemal, ku dixwest gelek hogir û hevkaran bixe nava tevgera millî ya Tirkiyê, di nava têlêgrama xwe ya 18 hezîran 1919 da jî qumandarê Imîn li Edirnê nivîsî ku giva temamiya bineciyên Anatolyayê "bûne yek ji bo piştgiriya serbestiya gelî ... Bawerbike hemû walî û muteserrif bi wê biryarê qayil in ... Propaganda bona karê otonomiya Kurdistanê di bin bandûra Ingilterê da nema tê kirin. Alîgirên wê bîr û baweriyê ji kar hatine avêtin. Kurd hatine-gihîştine Tirkan" **(113, dîwan III, r. 910)**.

Divê ku bê zanîn ku hinek bingeha Mustefa Kemal hebû dema ku da zanîn ku "Kurd hatine-gihîştine Tirkan". Rast e, ne hemû Kurd bûn ku tevgera Tirkiyê ya azadariyê diparast. Pareke serokên Kurdan li ser wê bîr û baweriyê bûn ku ewê bi alîkariya nasyonalîstên Tirkan bigihîjin otonomiyê. Ji bo vê yekê, hinek serokên Kurdan tevî kongreya Erzurûmê ku di 10-23 hezîran 1919 da hate derbas kirin bûn.

Tevî komelên "parastina maf" ên mayîn, Komela parastina mafên gelî ya wilayetên Rohilatê jî, ku tê de Kurd jî hebûn, tevî kongreya Erzurûmê bû.

Nûnerên wê komelê pirs pêş dan ku kongre li van xalan binêre :

1- Armancên propagandayê li wilayetên rohilatê.

2- Pirsa turkîzm û kurdîzmê.

3- Cudabûna dînî û olperestiyê û cihêtiyên mayîn **(118, r. 73)**.

Ev xal tînin bîr û baweriyê ku kongreya Erzurûmê gotiye ku ewê li pirsa Kurdan bê nêrîn. Lê biryar û manîfesa wê nîşan didin ku nasyonalîstên Tirkan li hev hatin ji bo qebûlkirina pêşdanîna konkrêt ên dîtinên xwe li ber mafên Kurdan. Hela bi ser da, ew li hev hatin ku biryareke usa qebûl bikin ku kongre hemû musulmanan, herweha Kurdan jî,

Institut kurde de Paris

mecbûr bike ku şerkariyê dijî qetandina Ermenistana Roavayî û Kurdistana Bakur ji dewleta Tirkiyê bikin.

Ji bo nimûnê, di wê manîfesta ku li kongrê hatibû qebûl kirin da, dihate gotin ku Erzurûm, Sivas, Diyarbekir, Xarpût, Bitlîs ji hev nayên cihê kirin û nikarin ji Imperatoriya Osmanî bên veqetandin.

Musulmanên ku li ser wê axê dijîn, ji çi milletî dibin bira bibin, xusûxiyetên daxwaziyên wan ewê bên hesab hildan. Lê, ew hemû musulman gotî divê bizanibin ku hemû jî birayên hev in û ji dayikekê hatine dinyayê (98, r. 381).

Di wê demê da panislamîzm û panturkîzm bi hev ra hatibûn nixamtin-nitirandin û ji nasyonalîstên tirk ra pêwîst bûn ku li ser bingeha dîn hemî gelên biçûk (Kurd, Çerkez, Laz û h.d.) bicivînin dora xwe û wan derxînin dijî êrîşa welatên derve, usa jî dijî bineciyên welêt ên xaçparêz, dijîtiya dîn di nava gelên biçûk da bidin xurt kirin, ji bo ku yeko-yek ji hesabê wan gelên biçûk ku carna dijî Tirkan derdiketin derên. Ewê di jimarê da usa jî heqê Kurdan bihata der.

Di komîta navdar (9 mirov) da, ku li kongreya Erzurûmê hatibû qebûl kirin, sê Kurd hebûn : Şêx Efendî, Sedulle Efendî, Hecî Mûsa Beg.

Lê komîteya navdar tucar berhev ne bû, ji ber ku M. Kemal baweriya xwe bi wan ne dianî, nemaze bi Kurdên ku di derheqa M. Kemal da di pirsa Kurdan da zanîbû, gûmana xwe bi kar û barê wî yê baş di nava xebata kongreya Erzurûmê da, wek endamê Komela Parastina Mafên Gelî li Wilayetên Rohilatê kiribû îlan kiribû, usa jî dijî bijartina wî wek serokê komîteya navdar bûn.

Lîderê Kurdan Ömer Fewzî Beg û terefdarên wî di xebata Komîteya navdar da dijî tevgera M. Kemal bûn. Weha, du-sê roj berî girtina Kongreya Erzurûmê, wan da zanîn ku karkirina M. Kemal wek endamê Komîteya navdar hîç dest nade. Wan digot : "Divê bê zanîn ku jîndarbûna millet ku di derheqa wê da li kongrê tê peyivîn bi rastî jî muxulqeta milletekî

yekîtî ye ... Komîteya navdar divê ji delegeyên usa bê saz kirin ku li ciyan ji wilayet û senceqên otonom hatibe bijartin. Tenê bi wî awayî ew dikare daxwaza millî ya yekîtiyê diyar bike" **(113, dîwan I, r. 68-69).**

M. Kemal di hundirê xwe da baweriya xwe bi endamên komîteya navdar ne anî û cedand ku temamiya dîwanê di nava destên xwe da xwedî bike. Tiştê ku wî di derheqa wê yekê da got ev e : " ... gelo dibe ku xebatê bispêrin wa gotî organeke navdar, ku hemî berpirsiyarî bi wakî vekirî li ser wê ye û ku ji mirovên text-bext, wek Şêx Neqşbendiyê ji Erzincanê, an jî serekeşîrê qebîla Motkan, ku hîç tecruba wan a siyasî û eskerî tu neye, bi tewekelî hatibin saz kirin ? Gelo ew şaşiyeke bê hempa nîn e ku rola serokatîkirinê bidin destê wan ? ..." **(113, dîwan I, r. 70-71).**

Tevî vê yekê, M. Kemal pey kongreya Erzurûmê dijî zevtkarên empêryalîst derket û di hindava sultan û xelîfetê da baş dipeyivî, lê dîsa jî gûmana xwe dianî ser serokên Kurdan, axan û şêxan. Wî wê demê îdêolojiya olperestiyê û panislamîzmê bi firehî bi kar dianî, dixwest eşîrên Kurdan bîne hêla xwe. Û ew hinek li wira li hev hat.

Ne tenê M. Kemal îdêolojiya panislamîzmê bi kar anî, lê usa jî serokên tevgera kemalîzmê yên mayîn, herweha qumandarê korpûsa 15mîn, û derengtir qumandarê "pêşeniya rohilatê" Kazim Qerebekir Paşa.

Bi gotina nivîskarên tirk, M. Kemal wê demê gelek zeman li ser hînbûna Islamê derbas dikir. Ji bo ku leşkerên dewletên Antantayê Stembol zevt kiribû, wî bang ji "cihana islamî" ra şand, gazî kir ku di Sibata sala 1921 da kongreya panislamî derbas bikin **(200, 1969, Nº 13, r. 31).**

M. Kemal ku di 1 gulan 1920 da li Civîna Tirkiyê ya millî ya herî bilind peyivî, ji parlementeran hêvî kir ku gotina "turkîzm" bi kar neynin. Paşê wî da zanîn : "Ez tika ji we dikim ne ku bêjin Tirk, lê Musulman û hela Osman ... Em gişk bi xelîfetê va girêdayî ne" **(144, r. 163).**

Bona ku eşêrîn Kurdistanê bînin hêla şoreşa Kemalîstan, yan jî eger li hev neyên, qet nebe wan bi dûrxin, îdêolojiya panislamîzmê bi firehî hat xebitandin.

Hela di Tebaxa sala 1919 da, M. Kemal biryara kongreya Erzurûmê, usa jî ji çend şêx û serokên Kurdan ên bi nav û deng ra şand û tê da da zanîn ku ew dijî "destdirêjên" ermenî û "dijminên" mayîn yên ku giva dixwazin li ser axa Tirkiyê dewleta Ermeniyan bidin damezrandin bibin, û gazî kir ku ew ji bo navê islamê û parastina welatê dê bibin yek.

Ev e, ji bo nimûne, di nava gazîke li ser navê serekeşîrê Kurdan Ebdulrehman Axa yê Şirnaxê da, wî nivîsî : "Baweriya we di hindava xelîfetê û sultanetiyê da ji temamiya cihanê ra xuya ye. Usa jî li ber çavan e ku hûnê tucar bi wê yekê qayil nebin ku xweliya we ya ziyaretê ewê bi destê Ermeniyan bê pêpes kirin. Ez ji we ra çend nusxe manîfest û wan biryarên ku ji aliyê kongreya Erzurûmê hatine qebûl kirin dişînim".

"Ez hêvî dikim ku hûn bi lez dest bi teşkîlkirina hêzên gelî bikin û bi êgintî dawiya karên dijminên me bînin. Ez ku ji niştimanwerperî û baweriya we bawer dikim, li benda mefayên wî karê ku hûnê di wî alî da bikin im" **(113, dîwan III, r. 940)**.

Di 10 tebax 1919 da, M. Kemal gazî şande ser navê serekeşîrê Motkiyan, Hecî Mûsa Beg, ra. Tê da dihate gotin : "Ez benî, ez tim di derheqa wan têlên dostiya me ya qenc da bîr tînim, ku dema min serokatiya ordiya duduyan dikir, di navbera min û te da hatibû saz kirin, ew jî di wan demên oxirmên giran da. Hemû niştimanperwer ji baweriya we, herweha ji karê we yê mezin ku we ji bo welêt, millet û hukûmetê kiriye, qîmeteke bilind didin".

"Em bi kubarî û razîbûn tim di derheqa wê alîkariya giranbuha ku we gelek caran daye ordiyê da, ji bo ku em careke din Bitlîsê hildin, bîr tînin, usa jî em mêraniya we di karê parastina navça Motkî ji dijminan ji bîr nakin ... Dijminên me dixwazin nuha

me perçe-perçe bikin û milletê me ku di nava sedsalekê da ewqas xwîn bona islamê rijandiye bindest bikin, dixwazin gelê me ji mafên bilind û serbestiyê mehrûm bikin. Ew dicedînin ku li ser axa wetenê me zurreta pêşiyên me Ermenistanê bidin damezrandin ...".

"Berî demekê, li Erzurûmê kongreyek hat derbas kirin, bona yekkirina karmendên millet û nêzîkkirina çend komelên ku di derheqa wan da min li jor bîr anî, lê usa jî bona amadekirina çend mecalan ji bo şerkariya tevî neyarên ku dixwazin êrîşî me bikin. Ji ber ku birayê me Celal Beg ewê we bi çend peyvandinên li kongrê bike nas û hûnê hay ji wan biryarên ku li kongrê hatine qebûl kirin jî hebin, ez li ser wê bîr û baweriyê me ku zêde ye em li ser wê bisekinin. Tenê wê yekê didim zanîn ku kongreya komîta navdar deng da, bona ku nîşanî me û cihanê bike ku di nava me da yekîtiyeke çawa di karê şerkariya bona serbestî û destpêneketina welatê me da heye. Hûn usa jî bi yekdengî hatine bijartin, wek endamên komîtê ku di nava wan da jî ez û birayê me Raûf Beg, wezîrê berê û mêrxasê gemiya "Hemîdiyye" hene. Hûn helbet derc dikin ku ez bona wê yekê pir şah im ku em dikarin destê xwe bidin destê hevdu, bona bextewarî û xelaskirina welatê me kar bikin. Birayê me Celal Beg ewê mefayên kongrê ji we ra bîne. Ez hêvî ji we dikim ku anegorî wê kar bikin û karê rêxistinên me bidin fireh kirin û nehêlin ku tuyek di wê navçê da dijî me derkeve yan tevî karê me bibe. Ez li ser wê bîr û baweriyê me ku dîwanên bajarvaniyê û leşkeriyê ewê pey mesela we herin nava karê me yê xelaskirina milletê me yê ziyaretî. Lê eger ew dijminatiyê bigirin, wan bi her awayî bînin ser riya rast".

"Zûtirekê ewê li Sîvasê kongreyek wek ya Erzurûmê bê derbas kirin. Ewê dêlêgeyên ji temamiya welêt bikevin nava wê kongreya hemtomerî. Çend rojên din şûn da, ezê bi xusûsî herim Sîvasê bona tevî xebata kongrê bibim. Pey kongreyê re, ezê vegerim Erzurûmê, ku ez bawerim ezê tê da rastî we bêm. Ez dizanim ku karê we ewqas gelek e ku hûn

nikarin demeke dirêj li vira bimînin, lê ez berk bawer im ku hûnê bona alîkirina gel dem bibînin. Emê hela li wê pirsê binihêrin û bona wê emê biryarê qebûl bikin. Ez bi dil dixwazim ku welat û millet rizgar bibe, loma jî silavên xwe yên ji dil dişînim" (98, r. 231-238).

Wî têlêgramên usa ji van kesan ra jî şandin : Şêx Ebdulbaqî Efendî Kufrêvîzade (ji Bitlîsê), Ömer Axa (ji Dêrşevê), Resûl Axa (ji Mûşasê), Sedullah Efendî (parlementerê berê), Şêx Mehmûd Efendî, Şêx Ziyaettîn Efendî (ji Nûrşînê), Cemîl Çeto Beg (serekeşîrê Garzanê).

Çend serokên Kurdan hatin gaziya M. Kemal. Ji navçeyên Kurdistanê yên cihê-cihê , ku tê da li ser baweriya di hindava xelîfetê û sultan da û di derheqa dostiya gelên tirk û kurd da dihat gotin, dest pê kir bên stendin. Ji bo nimûnê, parlementer Bekir Sitkî Beg da zanîn ku bineciyên Diyarbekirê ku piraniya wan Tirk û Kurd in hîç naxwazin ji mexlûqetiya islamê cihê bibin (129, r. 81).

Têlêgramên bi vê naverokê ji çend cî û warên Kurdistanê yên mayîn hatin stendin. Bi awakî vekirî, serokên çend eşîrên Kurdan hêla M. Kemalê ku di çavên wan da ew mirov bû, ku xwe gelekî ji bo azadkirina sultan, xelîfe û islamê êşandibû, girt. Lê piraniya serekeşîrên Kurdan ên ku me li jor nîşan dan, wê polîtîka ku mafên Kurdan yên neteweyî inkar dikir ne eciband. Dema pêşdahatin û pêşdaçûyîna têkoşîna azadiyê ya gelên Imperatoriya Osmanî ku ji hev çûbû, doktrîna panislamîzmê êdî xwe efû ne dikir, wê êdî nikaribû rola yekkirinê di nava gelên musulman da vekirî bilîsta. Gelên ne tirk, herweha gelê kurd jî, rabûn şerkariyê ji bo azabûna xwe ya millî. Di derheqa wê yekê da qewimandinên li wilayetên Kurdan şehadet didin, gava ku li Sîvasê kongre - û pey wê jî - hat derbas kirin.

Kongreya Sîvasê ji aliyê Komela Parastina Mafên Anatolya û Rûmeliyê di 4-12 îlonê da hat derbas kirin.

Manîfêsta Kemaliyan ku li kongreya Sîvasê di 2 îlon 1919 da hat qebûl kirin, bingeha wê nemaze dijî emperyalîstiyê bû. Lê tê da giyana nasyonalîzm-milletçîtiyê jî ku mafên gelên biçûk - di wê jimarê da yên Kurdan jî - inkar dikir hebû. Di wê dokumentê da dihate gotin : "Axa Imperatoriya Osmanî ku piraniya bineciyên wê musulman bûn û ku ji 30 cotmeh, ango ji roja imzakirina Peymana Aşîtiyê di navbera Imperatoriya Osmanî û dewletên Antantayê da (1), di nav sînorên me da ne, ew ax nikare bê cihê kirin, ne bi tu sebebî ji dewleta osmanî bê qetandin" (118, r. 127).

Biryarên kongreyên Erzurûm û Sîvasê li ser bingeha Hevhatina millî, ku di meha çile ya sala 1920 da ji aliyê parlementa Stembolê hate qebûl kirin û ku piraniya parlementerên wê piştgiriya Kemaliyan kir, bûn.

Di nava miqala yekemîn a Hevhatina millî da dihate gotin ku pareskerên Imperatoriya Osmanî ku bi aşîtiya Mudrusê hatiye testîq kirin û ku piraniya bineciyên wê Tirk û musulman in û ku bi têlên olperestî û çandî va bi hevdu ra girêdayî ne û ber bi armanceke dicedînin, yekşivêt in, û divê bi tu şertan ji hev neyên cihê kirin (134, r. 52).

Prensîpên ku di nava Hevhatina millî da hene, ji bo karkirina nasyonalîstên tirk bûne bingeh. Wan di nava kêlmeke xwe ya programê da di 1 adar 1922 de ew da zanîn.

"Hem di nava polîtîka me ya hundurî, hem jî ya derve da - wî got - riya tebiya me ya hîmlî divê biryarên Hevhatina millî be" (114, r. 229).

Biryarên kongreyên Erzurûm û Sîvasê nîşan dida ku Kemaliyan soz nadin Kurdan ku di goveka Tirkiya nuh da otonomiyê bidin wan, mafên wan ên millî bendî tiştekî hesab nakin, dicedînin ku têkoşîna wan a azadiyê ji bo kara tevgera Tirkan bi kar bînin û ji bo wê sloganên "yekîtiya" dîn-olperestiyê, çand û armancan dianîn holê û meydanê. Polîtîka Kemaliyan bi vî awayî ne tenê alîkariya safîkirina pirsa Kurdan ne kir, lê hela bi ser da bû sebeba

bingehî a serîhildanên Kurdan ku di dema nuh da dîsa dest pê kiribû.

Çend endamên Komela Damezrandina Kurdistanê tevî tedarukdîtina serhildanê bûn. Çawîşê ingilîz Noël (2) jî, ku ji hêla konfêransa aşîtiyê li Parîsê bi resmî hatibû şandin Tirkiyê bona rastkirina jimara bineciyên kurd û ermenî li Anatolya Rohilatê, alîkariya wan kir (126, r. 124).

Bi vê yekê ra girêdayî, ew malûmat gelekî hewaskar in ku kîjan casûsê ingilîz di sala 1919 da wezareta karên derve ya Ingilterê şandiye.

"... Ez bi Ebdulqadir û yên wek wî ra peyivîm – di nava malûmatekê da dihate gotin –, min pêşniyar kir ku ew herin Kurdistanê û nav û dengê xwe li wir bi kar bînin. Ji bo ku ez tesîra xwe li ser wan bihêlim, ez mecbûr bûm pênc caran biwekilînim ku em jî dicedînin Tirkan bixapînin. Bi vê yekê ra tevayî, divê ku gelek baweriya xwe bi Kurdan neynî. Armanca hukûmeta Ingilîz ew e ku çiqas bikaribin Tirkan bidin sistkirin, Kurdan dijî Tirkan rakin. Ew planeke ne xerab e".

Di nava malûmateke din da dihate gotin : "... Kurd hela hê dijî Mustafa Kemal ne rabûne, lê Noël li ser wê baweriyê ye ku ewê bi wî ra li hev bê, wê yekê pêk bîne ..." (1919) (149, r. 202).

Ev dokument û rasthatinên çawîş Noël tevî serokên Kurdan li Meletyê di erheqa wê yekê da şehadet dikin ku kolonyalîstên Ingilterê dixwest ku şerkariya Kurdan a azadiyê bona meremên xwe yên empêryalîst bi kar bînin.

Havîna sala 1919, çawîş Noël nûnerên malbatên kurdî : Bedir Xanî Kamuran Elî (3), Celadet Beg (4), usa jî Cemîl Paşasade Erkem Beg (ji Diyarbekirê), ku 15 suwariyên kurd rêberiya wan dikir, hatin Meletyê. Noêl li Meletyê ji aliyê muteserrif Xelîl Rehmî Beg Bedir Xan (5) hate qebûl kirin.

Hema wê demê muteserrif Xelîl Rehmî Beg nûnerên çend eşîrên Kurdan li Meletyê gazî kirin. Li wira digot ku serhildana dijî Tirkan tê amade kirin.



Institut Kurde de Paris

Xuyaye ku hema wan deman kongreya serokên Kurdan li wargeha Şîro (weke 20 kîlometre dûrî Meletyê) hate derbas kirin, û ku tê da Xelîl Rehmî Beg ji navê Komîteya parastina mafên Kurdan prensîpên Kurdistana serbest ku ji çend lîderên Kurdan ra hatibûn şandin, hîmlî îlan kirin. "Kurd" - di nava wê bangê da dihate gotin - "ku ji ruyê zordestiyên karmendên Tirkan li Kurdistanê dizêrin, nuha bi şahbûneke bi heytehol azadiya xwe ya millî ku nêzîk dibe silav dikin. Ji îro pê va binecîyên Kurdistanê ji qeydçîdarên qûltiyê û xizaniyê tên azad kirin".

Qanûnên Tirkan ku hetanî nuha gelek gunehkarî û zorlêkirin tê da hebûn, ji îro pê va nema dimînin. Qanûnên nuh divê xweşbextiyê ji gelê kurd re, bi riya pêşdaçûyîna wî ya aborî, civakî û dîndarî bînin û zûtirekê wê civîna Destûrê anegorî dewra nuh, di wê dewrana ku di nava dîroka Kurdistanê da vedibe da, bê derbas kirin. Lê vê gavê divê ku bi vê biryarê bêne serokatî kirin :

a) dadgeh dikarin demeke ne dirêj jî bi awayê berê kar bikin.

b) polîs, esker û cendirme di bin qumandariya min da dimînin.

c) temamiya çekan, cebirxana leşkeriyê ku dixwestin pê şerkariya Kurdan bidin fetisandin di bin destê min da ne.

d) bexşandina hemtomerî ewê bê îlan kirin.

e) zû wêneyên Talat, Enver û Cemal ji jor bînin xwarê, herweha "tugra" (monogramên Sultan) jî, ku li xaniyên dewletê û dibistanên li Kurdistanê hatine dar da kirin, raqetînin.

f) ew dibistanên ku tê da mamostayên kurd dersan nadin ewê bên girtin (202, 3.III.1925).

M. Kemal hela di tîrmeh 1919 da zanibû ku hazirî şer dibin. Wî spart qumandarê korpusa 13mîn li Diyarbekirê, usa jî muteserrifê Canîkê (Samsûn), ku di dû serokên Kurdan ku ji Stembolê çûbûn Meletyê da bikevin, wan bigirin, lê usa ku tu deng ranebe.

Lê lîderên Kurdan ne di rê da, ne jî li Meletyê, hatin girtin. Qumandarên ciyên eskerên hertlmî turuş ne kir ku wê yekê bikin.

M. Kemal ku di derheqa karkirina dijî Tirkiyê li Meletyê da hesiya û herweha dixwest ku nehêle ku Kurdên Dersîmê bigihîjin pêşmergên Meletyê, ferman da qaymeqamê Sîvasê, Reşîd Paşa, ku lîderên Kurdan ku bona sazbûna dewleta Kurdan propaganda dikir bîne bal wî. Tenê Elîşan Beg (nûnerê eşîra kurdî ya Koçgirî, serokê qezayê Umraniyê) rastî M. Kemal hat. Ew rasthatin li Sîvasê di îlona 1919 da hat derbas kirin. M. Kemal wê çaxê ji Elîşan Beg ra da zanîn ku, rast e, ew di derheqa karkirina endamên Komela Damezrandina Kurdistanê da dizane, lê dixwaze ku careke din ji zarê (devê) wî bibihîse.

Wê demê, nûnerê Kurdan texmîn kir ku anegorî prensîpên serokê DAY, Wîlson, wilayetên Rohilatê didin Ermenistanê û bi wê yekê va mafên Kurdan davêjin piştî guhê xwe. Loma jî armanceke Kurdan hebû ku li wilayetên ku tê da Kurd piranî bûn otonomiyê di bin bandûra sultaniyeta osmanî da saz bikin.

M. Kemal bersîva wê yekê da û got ku hîç hêza prensîpên Wîlson nîn e û li ber lîderên Kurdan pêşniyar kir ku tevî wî, wek nûnerên Dersîmê, kar bikin. Paşê, wî bi ser da zêde kir ku, li gora ku ew di derheqa wê yekê da dizane, ew anegorî xalên endamê senata sultanetiyê, Seyid Ebdulqadir, bona damezrandina rêxistinên Kurdan kar dikin. Tevî wê yekê, wî zêde kir ku ji Kazim Qerebekir Paşa têlêgram stendiye û tê da daye zanîn ku casûsê ingilîz, Çawîş Noël, tevî nûnerên malbatên kurdî, Bedir Xan û Cemîl Paşazade, hatiye Meletyê û bi qaymeqamê Elazîz ra tedbîr dibînin ku eşîrên Kurdan êrîşî Sîvasê, ku tê da kongreya nasyonalîst-milletçiyan tê derbas kirin, bikin.

Li dawiyê, M. Kemal baweriya xwe anî ku ewê serokên Kurdên Dersîmê piştgiriya wan planên hukûmeta sultaniyetê ya Ferît Paşa nekin, ji ber ku xwedê giravî li kongreya Erzurûmê hemû nûnerên

Institut kurde de Paris

Kurdan ew daye bawer kirin ku piştgiriya wî dikin û loma jî ew bixwe bi navê wilayetên Rohilatê pêş da tê (126, r. 122-129).

Bi vê yekê va peyv qediya.

M. Kemal, ku tevî lîderên Kurdan cihê-cihê dikete hevpeyvînan, dixwest nehêle ku ew bi Kurdên Meletiyê ra bibin yek.

Tevî vê yekê, Kemaliyan dest pê kir çek bi kar bînin. Pareskerên Tirkan şandin ji bo fetisandin-temirandina tevgera Kurdan. Bi fermana M. Kemal a 9 îlon 1919, qumandarê alaya 15mîn (tabûra Elazîzê), Ilyas Beg, bi 52 esker û bi du gullereşan va çû Meletyê. Hema wê rojê, du êskadronên (êrdek) suwariyê ji Elazigê, êrdekek ji Sîweregê, usa jî çend zabit bi makînê ji Sîvasê berê xwe da Meletyê. Serokên Kurdan ku bi nêzîkbûna eskerên Tirkan hesiyan, reviyan Kextayê, ku tê da tedbîrên xwe dîtin, ji bo ku bi wan ra bikevin nava gotûbêjê.

Divê ku bê texmîn kirin ku haya M. Kemal di derheqa wê yekê da hebû, û loma jî wî di tîrmeha 1919 da de'w kir, lê di 10 îlon da ferman da ku lîderên Kurdan ku ne dixwest bê qalmeqalm bên rayê bigirin. Tevî wê yekê, wî îlan kir ku "divê mecalan biafirînin bona ku tevgera veqetandinxwestinê ji her awayê alîkariyê mehrûm bikin, serekê cendirman Tewfîq Beg wek muteserrifê Meletyê bidin nasîn, lê niştimanperwerê tirk li ser qulixa waliyê Elazîğê bidin zanîn. Ji bo pêşîgirtina her hêviyeke dijî welêt û millet, evên gotî divên hemû eskerên hukûmetê yên Meletye û Elazigê bi temamî hildin bin qumandariya xwe, li her der belav bikin ku kî bi serhildanvanan ra bibe yek û bigihîje wan, ewê gelek bê ceza kirin ... Bi hesabhildana wê yekê, ku wek xuya ye, emê dijî eskerên welatên derve şer bikin, ku ji bo heyetiya me ya doza millî, gotî di derheqa hazirbûn û tedbîrkirina xwe ya di wê derecê da min agahadar bikin" (113, dîwan I, r. 122, 125-126).

Qumandarên pareskeran ne diwêriyan bi awakî aktîf kar bikin, lê dîsa jî bi guhdarî li kar û barê

lîderên Kurdan mêze dikir. Ji bo nimûnê, Ilyas Beg di 12 îlonê da bi navê xwe û navê qumandarên perçeyên eskerî yên mayîn têlêgramek şand Meletyê û tê da got ku li Reqayê (ji Meletyê 5 saet dûr) Kurd berhev bibin, ku muteserrif Xelîl Rehmî Beg û herweha alîgirên wî jî li wira ne, lê ku eşîrên Kurdan ên cîran (hetanî Sîwerekê) û hela eşîrên Dersîmê jî dixwazin bo navê karê Kurdan herin wira **(113, dîwan I, r. 133-134)**.

Kurdên Meletyê ku ji aliyê eşîrên cîran piştgiriya pêwîst ne stend, ji hev çûn, belav bûn. Çawîşê ingilîz Noêl bi riya Elbistanê ji Anatolyayê çû. Tevgelên serhildana Kurdan ên mayîn xwe li navçeyên cihê-cihê veşart.

Wek êdî me li jor nîşan da, tevgeliya Noêl ji nava qewimandinên Meletyê nîşan da ku kolonyalîstên ingilîz dicedand ku nerazîbûna Kurdan bona armancên xwe bi kar bînin. Lê divê em usa nefikirin ku ew serhildanên Kurdan bi destê Ingilîzan hatibûn amade kirin. Bi wê yekê ra girêdayî, ew bîr û bawerî hewaskar e anegorî serkaniyên Kurdan bi kîjan ji nivîskarên welatên derve di nava nivîsarên xwe da tînin. Ewana dinivîsin ku gava Kurd ber bi Kextayê bûn ji bo ku dijî Kemaliyan tevger bidin teşkîl kirin, serokê polîsê dizî li Helebê, serhing Bell, ku bi navê hukûmeta xwe pêş da dihat, dixwest ku Kurdan bide bawer kirin ku dest ji tevgerê bikişînin û ku bi navê Hevalbenên Ewropî soz bide wan ku ewê daxwaziyên Kurdan ên millî bên hesab hildan. Li vira wî behsa Peymana Sêvrê dikir **(100, r. 292)**.

Dijwar e meriv bizanibe ku ew isbat çiqas rast e. Lê tiştek safî ye, ku di rewşa dîrokî ya nuh da, gava di bin hukmê bîr û baweriyên Oktobra Mezin da gelên bindest rabûne şerkariyê bona azabûna xwe ya millî, dewletên kolonyalîst bi pelixandina tevayî fen û fêl dikirin bona ku wê şerkariyê ji bo armancên xwe yên empêryalîst bi kar bînin.

Nevekirîbûna serhildana Kurdan a pêşîn dijî Kemaliyan hela ne dida xuya kirin ku Kemalî ji hesabê Kurdan hatin der. Li bin ronahiya isbatên ku me li jor

anîn, xuya ye ku Kemaliyan daxwaziya Kurdan inkar dikir, û dijwar nîn e ku meriv tê bigihîje ku tevgera Kurdan diviya bêtir bi hêz bûya, ji ber ku polîtîka Kemaliyan çiqas diçû, ewqas dijî Kurdan bû. Çi jî hebe, tevger-serhildana Kurdan di wê dema dîrokî da ewqas girgîn (ferz) bû ku bi navneteweyî hate nas kirin. Ango, ew bi Peymana Sêvrê bo naskirina mafên Kurdan ên millî ya di 10 tebax 1920 da hat girêdan. Ew peyman ji aliyê Hevalbendan hat girêdan û dijî sultanê hukûmetê li Stembolê bû. Rast e, ew peyman tucar ne hat bi kar anîn, lê xalên wê gelek ferz in, ne tenê di dereca naskirinpêhesandina polîtîka dewletên Roavayê li Rohilata Nêzîk, lê usa jî di dereca aşkerekirina qedera cî û kemala tevgera Kurdan a azadiyê ku êdî nikaribû bihata inkar kirin.

Em li wan xalên peymanê, ku di derheqa Kurdistanê da ne, binihêrin : - Di xala 62 da, tê dîtin ku wan navçeyên Tirkiyê ku tê da piranî Kurd in ewê otonomiyê bistînin, û wek hat gotin, ewê ew plana ku nûnerên Ingiltere, Fransa û Italyayê hazir bikirina bihata kirin.

- Xala 63 Tirkiye mecbûr dikir ku di nava sê mehan da ew otonomî bi wê plana ku kommîsyona pêşda kişandibû di jiyanê da bê pêk anîn.
- Di xala 64 da dihat dîtin ku Kurd ber bi Şêwra Lîga Milletan bibin, bi de'wkariya ku serbestiyê bide wan. Şêwr dikaribû bi wê de'wkariyê, ku tê da dihat gotin ku ewê paşê ji aliyê Tirkiyê bihata nas kirin, qayil bibûya. Em nîşan bidin ku ew yek diviya bi hevqayilbûna Tirkiyê tevî dewletên hevalbend ên derve bihata kirin. Hevoka wê xala dawîn di derheqa Mûsilê da bû. Tê da dihat gotin ku gava Tirkiyê dest ji mentiqên Kurdan bikişanda, dewletên hevalbend ên sereke ewê dijî wê yekê nebin û ku ew Kurdên ku di wê perça Kurdistanê, ku hetanî nuha dikete nava wilayeta Mûsilê, da dijîn jî ewê bi rizadilî bikevin nava wê dewleta Kurdî ya serbest. **(26, r. 24-25)**.

Wek xuya ye, peymana Sêvrê digot ku, di pêşiyê da, ewê otonomiya Kurdistanê di nava goveka

Institut kurde de Paris

Tirkiyê da bide saz kirin û izn bide ku piştî salekê Kurdistan bibe serbixwe û navça kurdî ya Mûsilê jî bikeve nava wê.

V. Nîkîtîn, gava di derheqa kemala peymana Sêvrê da bona Kurdan dipeyive, dinivîse : "Rast e, peymana Sêvrê her tenê li ser kaxez ma, lê ew dagerandineke giring bû di nava pêşketina problêma Kurdan da. Cara pêşîn di nava dîrokê da, di dokumenta dîplomasiyê da, pirsa otonomiya "ci"yê ku li temamiya navçê da piraniya binceciyan Kurd in hate lê nihêrandin. Ji wê demê da, kemala pirsa Kurdan a navneteweyî êdî şikberî pêş da ne danî" **(100, dîwan I, r. 292)**.

Biryara peymana Sêvrê di derheqa wê yekê da ku navça Mûsilê bigihînin Kurdistanê hewaskarîke mezin pêş da anî. Wê nîşan da ku dewletên Roavayê ku dixwest tevgera Kurdî li Tirkiyê ji bo armancên xwe bi kar bînin qayil dibûn ku wilayeta Mûsilê ku wê demê ne dikete nava axa Tirkiyê bikeve nava dewleta Kurdistanê.

Hela bi ser da, ew li ser wê baweriyê bûn ku ew tevbûn bi awayê rizadilî dibû, ango daxwaziya bineciyên Mûsilê û navça wê dibû. Ango, bi prensîpa rêfêrendumê, dengdaryîna gel a tomerî. Lê paşê Ingilterê ji bîr-baweriya rêfêrendumê paş da vekişiya, ji ber ku ewê pêkhatina wê ziyan bida armanca wê.

Di nava koma imperyalîstan da, fikra tam-tomerî di nava dereca pirsa Kurdan da tu nebû. Gilî di wê yekê da ye ku pirsa Kurdan bona Ingilîz, Fransiz û Amerîkan kîp bi nefta Musilê girêdayi ye û wan ber bi wê dicedand.

Wek ku xuya ye, bi peymana Sayks-Picot ku di dema şerê hemcihanî da (1916) hatibû girêdan, Mûsil diviya bidana Fransayê **(23, r. 40-42)**. Lê paşê, Ingilîzan xwe bi xwe Mûsil zevt kir û qayil bûn ku tenê 25% ji nefta Mûsilê bidin Fransayê. Kolonyalîstên Fransayê ji vê yekê engirîn (xeyidîn), û loma jî dixwest wê pirsê bi destê Kurdan ji bo kara xwe safî bikin. Loma jî wan dixwest "polîtîka Kurdan" bi awayê xwe dibin derbas kirin. Amerîkî jî ji nefta Mûsilê xwe ne dabûn alîkî û guh dida

Institut kurde de Paris

pirsa kurdî ku pê ra girêdayî bû. Gava ku Kemalî dijî êrîşkerên yûnan bi ser ketin, hemî danûstendinên di hindava pirsa kurdî da di wê demê da hatin sekinandin.

Ev hemû tişt karakterê empêryalîzmê, hem di dereca peymana Sêvrê, hem jî di dereca polîtîka dewletên empêryalîst da, di hindava Kurdan da nade guherandin. Gilî ne di wê yekê da bû ku wan dixwest serbestiyê bidin Kurdan, lê di wê yekê da bû ku têkoşîna Kurdan a azadiyê ji bo armancên xwe yên zevtkirinê bi kar bînin. Ji bo nimûne, ew ji wê yekê jî xuya ye ku Ingilîzan, piştî zevtkirina Kurdistana Başûr (Iraq), li wira heja Kurdan da temirandin-fetisandin û mafên Kurdan ji bo serbestiyê nas ne dikir. Lê, tevî wê yekê, wan "piştgiriya" tevgera Kurdan li Tirkiyê dikir û dixwest bi wê riyê hukm li ser Kemaliyan bikin ku ew dîsa berdaxwerinan bikin. Tiştekî şaşmayînê-metelmayînê nîn e ku Kemaliyan çiqas xwe bi riya rastê digirt û bi wê yekê va planên empêryalîstan tev li hev dikirin, ewqas ew hîn zûtir di derheqa daxwaziyên milletê kurd û peymana Sêvrê da ji bîr dikir. Loma jî, gava li Kongreya Lozanê Tirk qayil bûn ku wilayeta Mûsilê bidin Ingilterê û gava bi wê yekê va daxwaziyên monopolên Ingilterê û yên mayîn di hindava neftê da hatin razî kirin, peymana Sêvrê hate ji bîr kirin, ne nihêrî ku casûsên empêryalîzmê pey wê yekê jî provokasyonên xwe yên di hindava pirsa Kurdan û tevgera wan a millî da ne didan sekinandin.

Li vira divê em du aliyên pirsa Kurdan bidin nîşan dan : yê objektîf û yê subjêktîf. Tê da yê objêktîf ev tevgera Kurdan a millî ye, lê yê subjêktîf daxwazîcedandina casûsiya empêryalîzmê ku wê tevgerê ji bo kara xwe bidin bi kar anîn e (81, r. 18). Rast e, ew herdu alî ketibûn nav hev, lê pirsa sereke, pirsa kurdî li Tirkiyê, hesab dibû şerkariya gelê bindest ji bo rizgarî-azadiyê.

Ew şerkarî ku hela di dema Jön Tirkan (Tirkên genc) da dest pê bûbû, di dema Tirkiya Kemalî da

jî berdewam bû. Ew nemaze ji ruyê polîtîka komên Tirkan ên milletçî ku mafên Kurdan ên millî inkar dikirin pêş da diçûn û berdewam bûn.

## 4. Serhildana Kurdan li navçeya Koçgirî-Dersîm (1920-1921)

Wê demê, gava Komîteya Serbestiya Kurdistanê planên serhildana şerr amade dikirin, endamên Komela Damezrandina Kurdistanê yên berê, herweha lîderên Kurdan ên mayîn, hazirî şerrê dijî Tirkan li navça Konçgirî-Dersîm (6) dibûn. Divê bê zanîn ku tişteki text-bext nîn bû ku ew navçe ji bo şer bijartibûn. Gilî di wê yekê da ye ku, wek M. V. Frûnzê dida zanîn, Kurdên Dersîmê li ser dînê Elî Ilahî bûn û bi navê "qizilbaş" dihatin nasîn, û Kurdên musulman bi şikberî ber bi wan dibûn û ola wan qebûl ne dikir û heta dema dawîn jî baweriya xwe bi wan ne dianî. "... Paşê wî da zanîn : "Çi ku dimîne di derheqa eşîrên Kurdên qizilbaş da, wan di eskeriyê da qulix ne dikir û unsurên Anatolyayê yên ne emîn hesab dibûn. Ew nuha bi wî awayî ne. Ew ne tenê di eskeriyê da qulix nakin, lê herweha ziyaneke mezin didin hukûmetê, tevî şerrê partîzaniyê dibin ..." (105, r. 300).

Di destpêka sala 1920 da, li wargê Huseyn Aptala ku tevî wî serekeşîrên Cangêgan, Qurmêşan û yên mayîn bûn, li navça Yêllicê (qeza Qengalê) civîna giring a nûnerên Kurdan hat derbas kirin. Tevgelên civînê bi yekdengî sond xwar ku dest bi şerkariya çekdarî bikin ji bo navê Kurdan.

Anegorî biryara civînê, Kurdan dest pê kir ji navçeyên nêzîk çek berhev bikin. Di navbenda civînê da, malûmatên usa dihatin stendin ku ji Dersîma Roavayê 45.000 mirovên rind şekkirî hazir in piştgiriya serhildana Kurdên Dersîma Rohilatê bigirin, ku li Elaziğê para Komela Damezrandina Kurdistanê hatiye saz kirin û ku li hemû wargên Kurdistanê tevgera neteweyî vekirî pêş da diçe (126, r. 126).

Di Tîrmeha sala 1920 da, desteyên Kurdan bi seroka-

tiya Misto êrîş li ser cebirxanên eskerî, li qeza Zarayê (wilayeta Sîvasê), kir û esker û zabitên Tirkan dîl girtin. Di dawiya Tîrmehê da, wê salê zabitê cendirman ê wextekê û serekeşîrê Madana-Paşo bi hêzên xwe yên pirjimar Refaqiye (navbenda wilayeta Erzincanê) zevt kir û ew bi resmî xwe qumandarê desteyên Kurdan ên cî îlan kir **(126, r. 127)**.

Civîna Tirkiyê ya Millî ya Mezin (CTMM) ku dît ku dijî dîwana Ankarê hergav hej-tevger heye, dest pê kir aktên zagondariyê ku li gora wan hemû kesên ku dijî Kemaliyan şer dikir ceza bikin qebûl bike.

Ewha, di 29 nîsan 1920 da, CTMM "zagona di derheqa gunehkarî û dijminayiya di hindava welêt" da (Zagon N° 2) qebûl kir. Tê da dihat gotin :

"Ew kesên ku serhildanê dikin û bi gotin û kirinên xwe yên dijminatiyê di weşanê da helanan didin ku dijî dîwana qanûnî ya Civîna Millî ya Mezin ku bona azakirina xelîfatê hatiye saz kirin derkevin, dijminên welêt hesab dibin (miq. 1); ew mirovên ku dijî welêt gunehkarî kirine, bi destê dardakirinê gunehê mirinê bi wan ra derxin (miq. 2)" **(35, dîwan I, r. 4-5)**.

Ew zagon pirr caran di hindava serhilên kurd da hatiye bi kar anîn. Lê hukumdarên Ankarê ew yek ne bes hesab kir, loma jî di 11 îlon 1920 da, CTMM zagon N° 21 ya di derheqa wan kesên ku xwe ji qulixkirinê ra didin da qebûl kir. Anegorî wê qanûnê, dadgehên aza ku endamên wê CTMM bûn hatin vekirin û li gora wan ewê zagonên bajarvaniyê û eskeriyê mehkeme bikirana û, gava ku pêwîst bûya, ewê bi lez her awayê cezakirinê di hindava qulixçiyên eskeriyê da, wan mirovên ku ji ber eskeriyê revîne û kesên ku di wê hêlê da alîkariya wan kirine, bikirana. (miq. 1); biryarên dadgeha aza yên dawîn bûn û hemû dîwanên bajarî û eskerî borc hildida ser xwe ku ew wan biqedînin **(35, r. 61)**. Di paşdemê da, karkirina dadgehên aza da fireh kirin. Ji ferzendên cezakirinê ra tevayiya Kemaliyan mêtodên "aşîtiyê" yên cihê-cihê bi kar dianîn bona sistkirina tevgera Kurdan. Bi vî awayî,

Institut kurde de Paris

dîwana Ankarê serokê eşîra Koçgir (V), Elîşan, dewsgirê (cîgirê) qaymeqamê Refaqiyê, lê birayê wî Heyder wek qaymeqamê Umraniyê (wilayeta Sîvasê), kifş kir. Lê Elîşan tevî çend serokên Kurdan çû Xozatê (Dersîm). Li wira, di meha november 1920 da bi tevgiliya lîderên Kurdan ên Xozat û Çemîşkizikê civîna tomerî ku wan tê da biryar qebûl kir ku tevgera xwe bikin yek, bona peydakirina mafên xwe yên millî, hat derbas kirin. Anegorî wê biryarê, di 15 novembr da, ev banga jêrîn ji aliyê hukûmeta Ankarê hat şandin :

"Bi lez ji Dersîmiyan ra bidin zanîn ku bîr û baweriyên hukûmeta Ankarê di derheqa otonomiya Kurdistanê da çi ne; hemû Kurdên di destê we da, yên ku di girtîxanên Elaziğ, Meletye, Sîvas û Erzincanê da ne, ji hebsê derxin; hemû karmendên Tirkan ji wan navçeyên ku piraniya bineciyên wan Kurd in derxin; bi lez eskerên Tirkan ji navçeya Koçgirê derxin" (126, r. 127–129). Wek bersîva wê bangê, hukûmeta Ankarê ji Elaziğê dêlêgasyoneke ku heq da daxwaziya Kurdan û temî da wan ku vê gavê serhildanê nekin şande Dersîmê. Lê serokên Kurdan berî wan temîvanan da û bi destê waliyê Elaziğê di 25 november 1920 da, bi îmza serekeşîrên Dersîma Roava têlêgrameke ku tê da ew dawet dikirin ku Kurdistaneke serbest ku li gora peymana Sêvrê be bê saz kirin, ku "eger daxwaziya me pêk neyê, emê mecbûr bin bi destê çekan bigihîjin armanca xwe" li ser navê CTMM şand (126, r. 127–129).

Dersîmiyan bersîva wê têlêgramê bi nivîsar ne stend. Lê hukûmeta Ankarayê bona wê yekê ku Kurdan bixapîne û zeman kar bike, bi destê waliyê Elaziğê, bi zar (dev), ji serokên Kurdan ra da zanîn ku ew razî ye ku daxwaziyên Kurdan pêk bîne û hema wê demê jî li navça Sîvasê dijî tevgera Kurdan dest bi şer kir.

Tevî wê yekê, wan dest bi pelepistûkiyên usa kir ku serokên Kurdan ên bi nav û deng bînin hêla xwe. Ji bo nimûnê, waliyê Elaziğê bi navê Mustafa Kemal erze-elametiyeke ku tê da dihat gotin ku serokên Kurdan, Miço Axa û Diyap Axa, wek

parlementerên CTMM ên Dersîmê hatine xuya kirin, ku ji hemû navçeyên Kurdistanê nûnerên Kurdan tên Ankarayê, ku bi tomerî hildayî ewê daxwaziyên Kurdan bên razî kirin, xwend (126, r. 130).

Bilî wê, Kemaliyan çend parlementerên mayîn ên Dersîmê jî, herweha Mustefa Zekî Beg, Remîz Beg, Ebdulhak Tofîq Beg (148, r. 538-539), Hesen Heyrî Beg, li CTMM hilbijartin (7).

Ev parlementerên Dersîmê ku baweriya xwe bi sozdayînên Kemaliyan anîn çûn Ankarê û bûn çekên destê M. Kemal ji bo hincirandina serhildana Kurdan li Dersîmê.

Rast e, polîtîka hinek lîderên Kurdan bi hevdu ra hatibû qayil kirin ku bi hukûmeta Tirkiyê ra razî bin, lê serhildana Dersîmê berdewam dibû û Dersîmê dîwana Tirkiyê bendî tiştekî hesab ne dikir. Dîwan di destê şuxulkarê Kurdan ê bi nav û deng, Seyid Riza ku ne dij bû ku tevî Tirkan danûstendinan bikin û dixwest ku mafê Kurdan ê millî di goveka dewleta fêdêral a yekîtiyê da bê razî kirin bû. Ew daxwazî helbet ne bi dilê Kemaliyan bû û behara sala 1921 wan çarşefa "dostaniya bi Kurdan ra" ji ser ruyê xwe avêt û got ku pareskerên Kurdan ên millî divên dest ji şer bikişînin û bên ser rê, û gef dixwarin ku eger usa nekin ewê fermanê bidin ku hemû cî û wargên Kurdan kaf-kûn bikin, wêran bikin. Bona ku Kurdan bitirsînin, di 4 adar 1921 da, qumandarê alaya li wê navçeyê, serhing Xalis Beg, çend mirovên kurd ên bi nav û deng ji Umraniyê da girtin û di bin derba gulle ew şandin riya ber bi Zarayê. Lê, desteke Kurdan ji wargê Yazîhecî ku di derheqa vê yekê da pê hesiya, pêşî li eskerên Tirkan da birîn, ew talan kirin û girtî aza berdan (136, r. 156). Ev êpîzoda ne mezin bû sebebê destpêka şerr di navbera Kemaliyan û hêzên Kurdan ên millî da.

Kurdan, ku eskerên Tirkan hincirandin, ji serhing Xalis bi lez xwest ku bê peyv alayê teslîm bike (126, r. 165), yan na, çi paşmayîn jî ku hebin ewê bi cebdarî bikevin ser wî. Zabitê Tirkan ew daxwazî

qebûl ne kir, lê da zanîn ku ew hêvî-dîlekan dike ku bihêlin alay vegere Sîvasê. Wan ew hêvîkirin bendî tişteki hesab ne kir û desteyên Kurdan ên Mehmûd Beg, Azemet Beg û Eşqî Beg di 6 adar 1921 da Umraniye kir nava hesarê (dor lê girt). Temamiya bineciyên wê navçeyê alîkariya pêşmergan kir. Pey şerrê ku weke 24 saet kişand, alaya Tirkan mecbûr bû teslîm be. Mehkema kurdî ya eskerî ku bi xusûsî hatibû saz kirin, gulle ji serhing Xalis ra derxist û ew di merkeza Umraniyê ku tê da ala Kurdistanê hatibû dar da kirin û dimilmilî da hate gulle kirin.

Kurdan, ku bela alaya Tirkan dan, gelek çek bi dest xistin; pir cebirxane, herweha ji hezarî zêdetir hesp û ga zevt kirin. Kommisyona bi xusûsî sazkirî zabit û eskerên Tirkan ên dîlgirtî berdan û dokumentên anegor dan wan. Tevî wê yekê, izn dane wan Kurdan û Çerkezan ku alaya Tirkan qulix dikir derbasî nava desteyên hêzên kurdî yên çekdar bibin. Ev qewimandin di hemû goşeyên Kurdistanê da deng da. Pey Umraniyê ra, Kurdên Koçgirî ku bi desteyên Kurdên Dersîmê ji eşîra Ovacikan, ku hatibûn hawara wan, rabûn serhildanê û di 8 adar 1921 da navça xwe rizgar kir. Gerîlla kurdî ya rind sîlihkirî berxwedayîna Tirkan li Kemaxê hincirand û qaymeqam û qumandarê eskerên cendirman dîl girtin. Pey wê yekê ra, wan pira Çêrtove li ser çemê Feratê çê kir, berê xwe da qezayê Quruçayê, nûnerên dîwana Tirkiyê girtin û ew anîn Umraniyê bona bidin mehkemê. Di wî şerrî da, qezayên Kengal, Koçxîsar, Dîvrîgî, Zara, Refaqiye, Quruçay û Kemaxê hildan.

Anegorî zanînên nivîskarê tirk, Ali Kemalî, serhildan li ser mezîla weke 15.000 metrên çargoşe diçû. 15 desteyên Kurdan dijî Tirkan dikirine şerr. Di her yekê da ji 100 hetanî 1500 esker hebûn. Li ser hev, di nava tabûr û alayên Kurdên çekdar da ji 6000 esker zêdetir hebûn (136, r. 163).

Lîderên pêşmergên Kurdan, ku xwediyên hêzeke mezin bûn û gihîştibûn destanînên usa, di 11 adar 1921 da têlêgramek li ser navê sedrê CTMM şand û

tê da dixwest ku wilayeteke nuh ji qezayên Konçgirî, Divrigî, Refaqiye, Kuruçay û Kemaxê, ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn, saz bikin û ku waliyê wê wargehê Kurd be û ji cî be. Rast e, daxwaziya Kurdan tiştekî pir mizin jî nîn bû, hukûmeta Ankarê dij derket û got ku ewê li pirsê binihêre û razî bike.

Dewsa wê yekê, ew ket nava rewşeke giran û tewlebazî da xwe ku polîtîkake usa bide derbas kirin ku ji heqê Kurdan bê der. Bona dubendiyê-dutîretiyê bixe nava serhildana Kurdan, hukûmetê dêlêgasyonek şand wilayetên Rohilatê, bi serokatiya sedrê dadgehê, Kurdê Bitlîsê, Şefîq, ê ku bi rêberiya çend begên Kurdan ji navça Sîvasê di 15 adar 1921 da hat gundê kurdî Boxazwiranê. Wî da zanîn ku ew bixwe Kurd e, piştvanê tevgera Kurdan e, nûnerê hukûmetê ye û bi navê wê hatiye bona tevî serokên Kurdan hevpeyvînan derbaske. Ew "Kurd, piştvanê Kurdan", tenê hêvî dikir ku hetanî dawiya hevpeyvînan Kurd tevgera xwe ya dijî Tirkan bidin sekinandin. Û divê ku bê zanîn ku di nava serokatiya serhildanê da dîsa "piştvanên tevgera Kurdan", wek Heyder Begê ku bi Şefîq re bû û bi wê yekê va derbeke xedar gîhande şerkariya Kurdan li wê navçê, peyda bûn.

Em bidin xuya kirin ku hetanî ku hevpeyvîn derbas dibûn, qumandarê koma eskerî ya merkezî, Nûreddîn Paşa, tedbîreke şerrê dijî Kurdan didît. Bi vî awayî, di 12 adar 1921 da, alaya suwariya 53mîn ji Yozgatê dest pê kir û berê xwe da Sîvasê. Di 14 adar da, tabûrên opêratîv ên dîvîzyona 5mîn li Amasyayê, usa jî du tabûrên polka 10mîn ya dîvîzyona 5mîn, ku li Mêrfîzonê bûn, xût hatin wira. Hema wê rojê, qumandariya koma eskerî ya merkezî biryar qebûl kir ku dest bi teşwîqkirina bajariyan li navçeyên nêzîk bike. Eskerên cendirme, û herweha yên li Sîvas, Yozgat, Amasya, Mêrzîfon, Tokat, Erzincan, Baybûrt, Girêcor, Şabîn-Karaxîsar, Çemîşkizik, Arabkîr û navçeyên mayîn jî, ketine bin qolê qumandariya koma eskerên merkezî. Qumandariya Tirkan, ku ew hêz berevî ser hev kirin, li wilayetên Sîvas, Elazîğ û Erzincanê halê qaydeder îlan kir.

Tevî wê yekê, hukûmetê, ku dixwest daxwaziyên Kurdan azirûke (zelal bike), li ser navê lîderên Kurdan têlêgramek şand û tê da xwest bizanibe ka ewê şerrê xwe berdewam bikin. Di bersîva wê têlêgramê da, Kurdên Dersîmê bi navê serokên xwe îlan kir ku "ji ber ku ew dizanin ku hukûmeta Tirkiyê dixwaze qira Kurdan bîne, wek wan qira Ermeniyan anî, ewê şerrê xwe berdewam bikin hetanî bigihîjin mafên xwe yên millî û parastina wan a zagonî" (126, r. 146).

Divê bê gotin ku liberxweketina hukûmeta Tirkiyê ji bo rewşa Dersîmê ewqas pirr bû ku ew mecbûr bû pareke eskerên Tirkan ji pêşeniya Yûnanistanê derxe û ew dijî Kurdan bişîne. Bi vî awayî, zûtirekê dîvîzyona suwarî ya 14mîn û brîgada suwarî ya 13mîn şandin Sîvasê. Bilî wê, bona pêşiya serhildana Kurdan ku ber bi rohilatê û başûr belav dibû bigire, hukûmetê gelek esker şandin Elaziğ û Erzincanê. Eskerên Tirkan riyên Sîvas-Kengal-Meletye-Elazig-Sîvas-Zara hildan bin kontrola xwe û pirên li ser çemên Ferat û Diclê, ku Dersîm bi Elaziğê ra dida girêdan, û herweha bi Arabkîr, Meletye, Êgîn û Kemaxê û bi riyên mayîn ên giring dida girêdan, xistin bin destên xwe.

Rast e, behareke sar bû, lê ferman dane eskeran ku êrîş bikin. Xwezma li navça di navbera Dersîm û Erzîncanê da şerrekî giran çû. Mecalên Nûreddîn Paşa yên cezakirinê lîderên Kurdan dan bawer kirin ku Kemaliyan naxwazin sozdayînên xwe bînin cî, ne jî daxwaziyên wan ên biçûktirîn bînin cî; hela Heyder Beg jî baweriya xwe êdî bi sozdayînên Tirkan ne dianî û tevî şerê dijî wan bû. Şerr li ser riya Sîvas-Koçxîsar-Zara û Sîvas-Kengal gumreh bû. Hemû Kurdên biçûk û mezin, ew hemû kes, ku wek dibêjin destê wan digirt, mêr, jin, kalmêr û pîrejin, zaro, çiqas ku ji destê wan dihat tevî şerrê dijî Tirkan dibûn, bi mêranî li ber xwe dida.

Lê hêz weke hev nîn bûn. Pêşmerge li ber zordayîna Kemaliyan ku çend caran li ser Kurdan ra bûn, mecbûr bûn paş da vekişin. Gelek serokên Kurdan

bi mêranî şehîd bûn. Di wî halî da, serokên Kurdan biryar kir ku jîn û zaran bişînin Dersîmê. Di 24 nîsan 1921 da, Heyder Beg bi 2000 meriv ber bi riya Erzîncan û Pûlûmyûrê liviya (ango ber bi hêla başûr-rohilatê), bona bigihîje Dersîmê. Ewê ku eskerên Tirkan pey wî digeriyan hat, gihîşte eşîrên Kurêşî û Beleban; ji vira niyeta Heyder Beg hebû ku bi riya çiya û kendalan bikeve Dersîmê. Lê dewsa stendina alîkariyê, serekeşîrê Kurêşiyan, Kor Paşo, bona ber çavê Tirkan xwe xweş bike, bi desê xwe bi çend hezar mirovan derkete pêşiya Heyder Beg û îlan kir ku ewê dijî pêşmergan dest bi şerr bike, eger ew lingê xwe bavêjin ser axa "wî". Heyder Beg, ku ev derba xedar ji piştê stend, tevî şervanên xwe berê xwe da çiyayên Koçgirî ku tê da di navbera pêşmergan û eskerên Tirkan da, ku hev berbat dikirin, şerrekî giran diçû.

Xwezma cerda Osman Topal Axa gelek ecêb-nenere anîn serê Kurdan. Di wan gundên ku ew xistibûn bin destê xwe da, bawerbike temamiya bineciyan qir kir. Gava V. Frûnzê di derheqa hovîtiyên wî derebegê cellad, ê ku ji aliyê eskerên hukûmetê pêş da dihat, da dipeyive, dinivîse : "Gelek dem ne buhuriye, gava serokekî Lazan ê navdar, ku desteke Lazên rizadil di bin hukmê wî da bû, bi şûr û agir ji riya navçeyên Kurdan ku dijî Tirkan rabûbûn li Anatolya Rohilatê ra derbas bû" **(105, r. 278)**.

Nûreddîn Paşa ku dixwest derbeke xedar bigihîne pêşmergan, biryar kir ew bêserî bike. Wî li ber begên Sîvasê, ku xwe dabûne hêla Tirkan, pêşniyar kir ku li ser riya pêşeniyê tevî Heyder Beg bikevin nava kontaktê û wî bidin bawer kirin ku ew bê Sîvasê ji bo hevpeyvînan derbaskin. Heyder Beg, ku yekî jêhatî nîn bû, vê carê jî xapiya. Ew bi destê xwe bi 1000 mirovî hate barêgeha qumandariya ordiya Tirkan li Sîvasê û tevî 400 rêber hate girtin, lê 600 eskerên mayîn şandin wilayetên roavayê ku ew tê da rind hatin lêxistin û hesabê wan hat der.

Ev derdayîn-ketina Heyder Beg a nuh bû delîleke baş ji bo serhildana Kurdan. Bilî wê ku wî serhilên kurd dan sist kirin, wî ziyaneke moral jî gihande

Institut Kurde de Paris

wan. Çi ku dimîne di derheqa dîwana Tirkiyê da, hovîtiya wê ya di hindava Kurdan da bêtewşe xwediyên armancên dûr bûn. Yek ji wan ew bû ku yên şikber ji tevgerê dûr bixin, û bi rastî jî, gelek ji serhildanê dûr ketin. Pêşmergeyên mayîn ku serokatiya wan Elîşêr, Nûrî, Sebrî, Memet Elî, Cingiz, Memo Terbezalî, Kamil Ezîz, Dîlo, Paşa Abbas û yên mayîn dikir, bêçare bûn û vekişiyan navçeyên Dersîmê yên çiyayî ku tê da gotî haziriya şerrê nuh bibûna.

Di pratîkê da xuya bû ku serhildana Dersîmê bin ket. Qumandariya eskerên Tirkan li Sîvasê îlaneke ku tê da dihat gotin ku di nava şerr da 113 Kurd hatine kuştin û 159 jî dîl girtin weşand. Usa jî navdarekî Kurdên Koçgiriyê, Azemet Behrî Beg, herweha Sabit Beg, Filik Elî, Xemo, Ezîz, Takî, Pehlewî, Huseyn Aşûr û yên mayîn, dîl ketin. Wê demê 2000 tiving û cebirxana mayîn hatin zevt kirin **(126, r. 159)**.

Mehkema eskerî ya qaydeder li Sîvasê, piştî hincirandina seerhildanê, 400 gunehkar dan mehkemê û Heyder Elî Beg, Seîd Ezîzî û 15 hevalên wan jî gulle kirin, lê bona Elîşêr, M. Nûrî, Mehmûd Mustefa Paşaoğlu, Memo Terbezali, Dîlo, Sebrî û 95 serhilên mayîn bi cûre dûreke biryara gullekirinê ji wan ra derxist. Gunehkarên mayîn anegorî sûcê xwe hatin girtin, li ser 5 salan hetanî xelasiya jiyana wan. Ji 400 kes tenê 110 kes hatin efû kirin, lê ew jî ber bi navçeyên welêt ên cihê-cihê hatin raqetandin.

Hincirandina wê serhildanê ji Dersîmê ra aşîtî ne anî, rewş dîsa rehet nîn bû. Awakî berxwedayînê ew bû ku Kurdan ji dîwana Tirkiyê dixwest ku girtiyên hebsan berde. Kurdan têlêgram dişandin Ankarê û gazinên xwe dikirin ku li ser riyên Erzîncan-Kemax-Êngînê, hetanî navçeyên Zara û Dîvrîgiyê jî, şerr berdewam e û ku sûc yê Tirkan e. Di nava rewşa Kemaliyan a dijwar da, gava pêwîst bû hemû hêzên xwe bikin yek bona pêşeniya Roava, dijî eskerên yûnan şerr bikin. CTMM, bi pêşniyara M.

Institut kurde de Paris

Kemal, biryara mehkema qaydeder li Sîvasê di hindava girtiyên Kurdan (bilî Elîşêr û M. Nûrî) da hildan (efû kir, ew bexişandin). Bawer bike, ew hemû Kurdan ku biryara gullekirin ji wan ra derxistibû hatin berdan. Lê bexişandin li ser wan Kurdên ku teslîmî eskerên Tirkan ne bûn û xwe li çiya veşart belav ne dibû. Kurdan, ku di rewşa "cerdbaşiyan da" man, wek ku Tirkiyê ew usa bi nav dikirin, karê xwe yê li Dersîmê, ku tê da hukmê dîwana Tirkiyê tu nebû, dîsa berdewam dikir, dev jê ber ne dida. Ji bo nimûnê, li Agdê, ku bi temamî di bin destê Seyid Riza da bû, ala Kurdistanê dimilmilî û dîwana Tirkiyê nikaribû tutiştî jî bike.

Lê ew giliyeke din e ku hukûmeta Tirkiyê serildan dabû hincirandin û hukmê wê êdî li vira tu nebû, û giliyeke din e ku Kurd jî ne gihîştin armanca xwe - ango destxistina mafên millî, qet nebe yên piçûk -. Sebebên derdayîna (binketin) tevgerên Kurdan çend faktorên ku em li jêr raberî guhdariya we dikin bûn :

1- Berî her tiştî, divê ku em karaktêrê mexlûqiyeta Kurdan ya derebegî-eşîretiyê û dereca hevgirtina wan a millî ku bû sebeb û ne dihişt ku ew di nava şerkariya xwe da bi yek bin nîşan bidin. Dijîhevbûnên civakî di nava mexlûqetiya Kurdan da, tunebûna hewaskariyên Kurdên kesîb ku pir bûn, ferqiya di navbera kesîbên kurd û dewlemendên kurd gelek serekeşîr mecbûr dikir ku bikevin nava koma nasyonalîstên tirk, yên ku wek dijminên tevgera kurdî ya millî-azadariyê hesab dibûn.

2- Cihêbûna dîndarî-olperestiyê di nava hinek komên Kurdan da nebawerî pêş da danî. Tevî wê yekê, rewşenbîriya Kurdan a burjuwa, ku nuh hatibû damezrandin, ku dikaribû vekirî şerkarî bona yekîtiya hemû hêzên millî bikira, hela gelekî sist bû. Serhildana Koçgirî, bawerbike, bi temamî ji aliyê endamên Komela Damezrandina Kurdistanê hatibû amade kirin, lê di wê demê da, ew komel ji hev belav bû. Loma jî rêxistina Kurdan a polîtîk tu

nebû ku bikaribûya serokatiya serhildanê bike, û loma jî serhildana Dersîmê çiqas bi hêz bû jî, lê ne ya millî bû, ango ya bi fikra cî bû, hejeke millî nîn bû.

3- Divê ku em bi xusûsî wê yekê bidin nîşan dan ku serokên tevgera Kurdan, ku ji gelê xwe hatibûn birîn, carna xem û xeyalên wî tê ne digihîştin. Wan, ku ji aliyê gel piştgirî ne distand, ne tenê carna tevger bi riya ne rast dibir, lê usa jî baweriya xwe li gel ne danî; ne ku hêviya xwe bi gel ra danî, lê hêviya xwe danîbû ser "piştgiriya" empêryalîstan, carna jî ser ... Kemaliyan. Loma jî bextê Kurdan ne ku di şerkariya bona serbestiyê dihat biryar kirin, lê di salonên dîplomasiyê da, û bi wê yekê va rê ber bi her awayê provokasyonan di nav pirsa Kurdî da vedibû. Hema xût bi wê yekê va, tê şirove kirin ku bextê tevgera Kurdan a wê demê bê gelê kurd dihate qerar kirin. Loma jî li konfêransa Lozanê dewletên empêryalîst tevî Kemaliyan pirsa Kurdan, wek dibêjin, bindoşek kir.

Ev hemû behane û sebebên mayîn bûn qesasê serê binketina serhildana Koçgirî-Dersîmê, nenihêrî Kurdan mêranî û pêşengîke bêhempa nîşan dan.

## 5. Konfêransa Lozanê û pirsa Kurdan

Çawa ku êdî hate nîşan dan, anegorî peymana Sêvrê kommisyona ji nûnerên dewletên hevalbend diviya bona navçeya ku dikete rohilata Feratê, di navbera Ermenistan, Iraq û Sûriyê da, rêjîma otonom a admînîstratîf amade bike. Eger di nava salekê da, pey girêdana peymanê, bineciyên wê navçeya kurdî vekirî ji Koma Milletan ra bêjin ku piraniya Kurdan dixwazin ji Tirkiyê veqetin, û eger Koma Milletan wê daxwaziya Kurdan pêk bîne, divê ku Tirkiye dest ji wan navçeyan bikişîne. Lê di adara 1921 da, weke nîv sal pey qolkirina peymana Sêvrê, dewletên hevalbend îlan kir ku xwe hazir dikin bo guhastinan bikin nava wê peymanê - di pirsa Kurdistanê da -, bi wî qewlî ku Tirkiye ji aliyê xwe va îlan bike ku xwe hazir dike ku bi dilxweşî

Institut Kurde de Paris

ber bi otonomiya Kurdan biçe û daxwazên Kurdan bi cih bîne. Dû salekê ra, ango di adara 1922 da, dewletên hevalbend di nava pêşniyarên xwe da êdî zor ne dikir ku pirsa Kurdan bê lê nihêrandin. Loma jî Kemaliyan izn ne da ku ew pirs bikeve qayderoja konfêransa Lozanê **(113, dîwan II, r. 755)**. Wan di derheqa wê yekê da şehadet dida ku empêryalîstên Roavayê, ku bi "kurdofîliya" qelp va xwe veşartibû û projeyên sazkirina "dewleta Kurdan" pêş da dikişand, dixwest ku tevgera Kurdan bona kara xwe bidin bi kar anîn û Kurd bikin çek ji bo polîtîka xwe ya kolonyalîst li Rohilata Nêzîk.

Kemaliyan bi dizî ji sala 1921 dest pê kir li gelek navçeyên Kurdistana başûr (Iraq) propaganda fireh bidin derbas kirin, û bi hêvî bûn ku hissên Kurdan ên dîndariyê û milletiyê bi kar bînin ji bo ku wilayeta Mûsilê bikin nava teşkîla Tirkiyê. Hukûmetê casûsekî xwe - Remzî Beg - di adara 1922 da wek qaymeqamê Rewandûzê nîşan da. Gava Remzî Beg hate Rewandûzê, dest bi propaganda fîreh di nava Kurdan da kir. Wî dida bawer kirin ku "zûtirekê, ewê Tirk bêne hawara Kurdan û ewê Suleymaniye, Kerkûk û Erbîlê ji Ingilîzan bidin azad kirin" **(75, r. 33)**. Di tîrmeha wê salê da, generalê Tirkan ê bi nav û deng, Özdemir Paşa, hate Kurdistana Başûr **(161, r. 246)** û got ku ewê planên Ankarayê li wê navçeyê bide mîaser kirin.

Tevî wê yekê, wek ku Kemaliyan li Anatolyayê tevgera Kurdan bi hovîtî dane fetisandin, wan li Kurdistana Başûr jî dicedand ku ol-dîn ji bo armancên xwe bi kar bînin û hergav belavok di derheqa "şerrê ziyaretî" da belav dikirin. Di nava belgokeke usa da dihat gotin : "Hemû lawên ol-dînekî divê ber bi yekîtiyê, ku dewleta Osmanî îlan kiriye, bicedînin, ... Bila Xwedê li aliyê yê ku ji bo dînê xwe şerr dike û xwîn dirijîne be, lê bila ne'let li wan agirperestên (zerdeştî) ku dînê xwe firotiye Ingilîzan be ... Amîn" **(161, r. 246)**.

Lê Tirkan ne tenê propaganda dikir. Wan dest pê kir esker û çekên xwe bişînin çend navçeyan. Esker û zabitên Tirkan carna tevî serhilên kurd dijî



Institut kurde de Paris

Ingilîzan şerr dikir. Bi vî awayî, di tebaxa 1922 da, hêzên Tirkan tevî eşîrên navça Pîşdar êrîşî Raniyê, ku di destpêka îlonê da Ingilîz jê hatin raqetandin, kir (161, r. 246).

Komîserê Iraqê yê tewrebilind, Pêrsî Koks, di bin heja Kurdan da mecbûr bû ferman di derheqa derketina eskerên zevtkar ji Suleymaniyê da bide. Lê tevî wê yekê, bona ber dilê Kurdan bên, Ingilîzan xwest ku Şêx Mehmûd (8) bîne hêla xwe û soz bide Kurdan ku di bin serokatiya wî da ewê Kurd serbestiyê bistînin.

Di îlona sala 1922 da, komîserê Iraqê yê herî bilind Şêx Mehmûd ji hebsê aza kir û ew şande Suleymaniyê, ku li wir wî di meha novembrê da xwe Padîşahê Kurdistanê îlan kir. Empêryalîzma Ingilterê ku "Padîşahiya Kurdan" da saz kirin, dixwest ku Kurdan bîne hêla xwe û bi wê yekê va pirsa Mûsilê bi hêsanî ji bo kara xwe safî bike. Şêx Mehmûd ji "piştgirên" xwe ra xayintî kir û bi Tirkan ra kete nava danûstdentinan bona amadekirina tevgera Kurdî dijî Ingilîzan.

Şêx Mehmûd name ji Civîna (Meclis) Tirkiyê ya Millî, hukûmeta Farisistanê û yên mayîn ra şandin û tê da meremên şerkariya Kurdan a azadariyê anî ber çavan û alîkarî xwest. Ew bawer bû ku bona pêkanîna planên xwe ewê piştgirî û alîkariyê bistîne. Di van qewlan da, wî biryar kir ku hêviya xwe bide ser Kemaliyan, ku wê demê tawrê dijî empêryalîstiyê girtibû.

Komên Tirkiyê yên serokatîkir piştgiriya Kurdan bi awakî şeklî dikir, lê wan bi dizî, giva xwe, hêla Şêx Mehmûd digirt, her tişt dikir bona ku heja azadariyê bidin sist kirin, kêm bikin, çend serokên wan li ber çavê xelk bikin casûsên empêryalîzmê. Tevî vê yekê, ew talîmata dizî hewaskariyeke mezin ku di nîvê meha hezîran 1922 da pêş da tîne û dike ku serekê serwêrtiya barêgeha bilind, Besrî Beg, li ser navê Ozdemir Paşa bişîne Rewandûzê. Ev talîmat di derheqa serokê Kurdên Îranê yê bi nav û deng Sîmko, yê ku di bin zordariya eskerên îranî da mecbûr bû paş da vekişe Kurdistana Bakur, bû. Di

talîmatê da dihate gotin ku Sîmko "di derheqa serbestiyê da difikire û heta ku li Îranê bingeheke xurt bigire û armancên wî neyên pêkanîn, ew naxwaze bi me ra dijminatiyê bike".

"Biserketina Sîmko û firehbûna hukumdariya wî bi vî awayî li ser eşîrên Kurdan ne anegorî daxwaziyên welatê me yên millî ne, lê dijminatiya di hindava wî da jî nuha ji me ra dest nade. Loma jî hûnê qencîke mezin ji welêt ra bikin eger bikaribin eşîretan bixapînin û wan dijî Sîmko derxînin, di nava wan da deng û behs belav bikin ku giva Sîmko ew serhildan bi alîkarî û perê Ingilîzan dest pê kiriye, ku bona kara xwe xwîna Kurdan dirijîne û ku ew xulamê Ingilîzan e" (93, r. 112).

Tevî wê yekê, dîwana Ankarê ji nêzîkhevbûna Şêx Mehmûd tevî Sîmko ku wê demê wek mêvanê dewleta Kurdan li bal wî bû ditirsiya. Nenihêrî beyantî-hovîtiya eskerên tirk ku berî wan qewimandinan ji nişkê va êrîşî desteya wî kir, Sîmko bi serekeşîran ra bi elametiya xusûsî qol kir ku izn dida Şêx Mehmûd ku tevî Kemaliyan hevpeyvînan di derheqa platform û qewlên hevrakartirina Tirkan-Kurdan derbas bike (93, r. 113).

Kemalîstan, bona ku Kurdên Iraqê bînin hêla xwe, tevî Şêx Mehmûd peyman girêda. Li gora wê, "hukûmeta Tirkiyê soza serbestiyê da Kurdistana Başûr û kefîltî da ku nekeve nava karên wan ên hundir". Şêx Mehmûd wek serokê Kurdistanê, li Suleymaniyê ku tê da meclis hatibû saz kirin, hat nîşan dan, ji bo ku di dema şerr da hêzên çekdarî yên Kurdistana Başûr dikaribûn bona kara hukûmeta Tirkiyê bên bi kar anîn (95, r. 115).

Helbet, li bal me hîm tu nene ku kemala bîr û baweriyên Şêx Mehmûd "turkofîliyê" bidin zêdekirin. Lê, isbat dimîne ku di şerkariya dijî Ingilîzan da wî cedand ku piştgiriya Kemaliyan bi kar bîne.

Bi vî awayî, di wî halê sext ku tê da konfêransa Lozanê hate derbas kirin da, Kemaliyan mecbûr bûn bona sazbûna "Kurdistana serbest" razî bin, lê bi kîsê Iraqê.

Tevî wê yekê, wan dîsa tevgera Kurdan li Kurdistana Başûr dan fetisandin. Gava ku di sibat 1922 da Kurdên navça Diyarbekirê dest bi tevrabûnê bûn, wan Cevdet Paşa ku di bin destê wî da li wira wekîldarên mezin hebûn şand wê derê.

Kemaliyan, tevî wê yekê, aktên zagondariyê ji bona hincirandina her serhilidaneke dijî Tirkan qebûl kirin. Bi vî awayê, di 31 hezîran 1922 da, CTMM zagon (qanûn) N° 249, ya di derheqa cereke din teşkîlkirina temamiya sîstema dadgeh-mehkemên serbest da, qebûl kir. Bi wê zagonê, meclisê li navçeyên anegor mehkemên serbest dan damezrandin. Mehkeme diviya ji sedrekî, ji du endaman û dadxwazê sereke bûya û bi dengdayîna dizî endamên xwe bibijarta **(35, dîwan 3, r. 108)**.

Anegorî zagona nuh û bona merema şerkariya dijî tevgera kurdî ya azadariyê, di 21 kanûna paşîn 1923 da, mehkeme ji bo wilayetên rohilatê yên bi navbenda Diyarbekirê va hate testîq kirin.

Di 18 oktobr 1923 da, CTMM zagon di derheqa hincirandina eşqiyatiyê (cerd) da qebûk kir. Ew zagon N° 356 bû ku wezîrê karên hundirî Fethî Beg amade kiribû. Dema enenekirina proja zagonê, gelek parlementer Fethî Beg bona kêmaniyên mezin di karê serkariya dijî "eşqiyatiyê" da gunehkar kir. Zagona qebûlkirî hem cezakirina ji bo "bandîtîzmê", hem jî ji bo piştgirî û parastina cerd da xurt kirin **(35, dîwan 5-6, r. 384-385)**. Zagonên li jor xuyakirî ji aliyê dîwana Tirkiyê bi firehî di hindava tevgelên serhildanên kurdî yên azadariyê da û pêşmergên kurd ku weşana Tirkiyê ya resmî ew "eşqiya" bi nav dikirin da, dihatin xebitandin.

Di van qewlan da, Şêx Mehmûd riya xwe di hindava Kemaliyan da guhast. Şêx, ku hay ji fêl û fenê empêryalîstên ku dixwest tevgera Kurdan ji bo kara xwe bidin xebitandin hebû, dest pê kir armancên hukumdarên Tirkiyê, ku dicedand pirsa Kurdan ji xwe ra bikin darinde (tramplen) bona zevtkirina wilayeta Mûsilê, jî derc bike. Di wê demê da, M. Kemal bi balyozê sovyêtî, S. I. Aralov, ra di derheqa pirsa Kurdan da peyivê : "Kurdên ku li dora gola

Urmiyê diman xwestina xwe nîşan da ku bi Tirkiyê ra kar bikin. Li ban wan çek û pere hene û ew hazir in ku wan dijî empêryalîzma Ingilterê derxînin".

"Pirsa Kurdan - Kemal digot - gelekî tev li hev û dijwar e ... Ingiltere wê ferzendê bi kar tîne ku Kurd di bin destê dewletan da - Tirkiye û Farisistan - in, û loma jî bi wê dilîze. Ingiltere dixwaze dewleta Kurdan di bin bandûra xwe da çêke û bi wê yekê va hukm li ser me, Farisistan û Piştqefqasê bike. Nuha serekên Kurdan ji hev cihê bûne : hinek xwe ber bi Îranê dikişînin, hinek ber bi Ingilterê, hinek jî ber bi me ... Ingilîzan li Suleymaniyê Şêx Mehmûd mecbûr kir ku dijî Tirkiyê derkeve ...".

"Em Tirk - Kemal bi ken got - di bin deynan da namînin. Me ji Fethiyê kurd ra alîkarî kir ku ew li başûrê Kurdistanê rabe dijî Ingilîzan û yên din" (83, r. 107–108).

Serokên Tirkiya nuh, usa jî yên empêryalîstên Antantayê, li konfêransa Lozanê careke mayîn isbat kir ku her du alî jî bi rastî ne dixwest ku pirsa Kurdan li Tirkiyê bê safî kirin.

Bi vî awayî, di pirsa di derheqa milletên biçûk da, kommisyona xusûsî li ser vê yekê sekinîbû ku dema gilî bê ser "milletên biçûk", ew yek divê bi xalên ol-dînî, irk û ziman va bê diyar kirin - biryar kirin. Ne pêwist e em vê biryara ne ilmî bidin isbat kirin. Lê, hela ku usa be jî, ne tenê Xaçperest ketin nava milletên biçûk, lê usa jî Ereb û Kurdên musulman ku li Tirkiyê diman. Lê Kemalî qayil bûn ku tenê mirovên ne musulman wek mirov-bineciyên ji milletên biçûk hesab bikin.

Gava li konfêransa Lozanê gilî hate ser peymana Sêvrê, pirs di pêş da hat ku gelo Kurd wek berê dixwazin ku Kurdistan ji Tirkiyê bê qetandin. Bi têlêgrafeke ku ji CTMM hat şandin hat pirsiyar kirin. Civîna Meclisê ya dizî hate derbas kirin û tê da M. Kemal pêşniyar kir ku ber bi parlementerên "kurd" herin bona ku ew bîr û bawerîyên xwe li ser wê pirsê bêjin. Parlementerê ji Erzurûmê, Huseyn Ewnî Beg, li CTMM da xuya kirin : "Ev

welat ê Kurdan û Tirkan e. Ji vê dikê tenê destûra du gelan heye ku bipeyivin - destûra milletê kurd û tirk -" (156, r. 9). Paşê Hesen Heyrî peyivî û got ku Kurd tucar ji Tirkan naqetin. M. Kemal ji wê peyva parlementerê "kurd" gelekî memnûn ma û loma jî li çepikan xist. Hela bi ser da, wî pêşniyar li ber Hesen Heyrî û parlementerên mayîn kir ku ew dikarin bi cillê kurdî bêne Meclisê, civînê. Wan usa jî kir. Bona isbatkirina tabiya xwe, wan têlêgram ji konfêransa Lozanê ra şandin û tê da da zanîn ku Kurd tucar ji Tirkiyê naqetin (126, r. 189).

Serekê dêlêgasyona Tirkiyê, Ismet Paşa ku tevî du konfêransên li Lozanê bûye, cara pêşîn parlementerê Diyarbekirê, Pîrîncizade Fewzî Beg, wek nûnerê Kurdan tevî xwe hilda, lê cara duduyan parlementer Zulfîzade Beg hilda û jê ra da zanîn : "Em û Tirk bira ne, di navbera me da hîç ferqî tune û naxwazin ji wan biqetin" (145, r. 61). Bi wê yekê va, wek ku niştimanperwerê Kurdan ê bi nav û deng Zinar Silopî (Qedrî Cemîl Paşa) dide zanîn, wan bi gelê xwe ra xayintî kir û loma jî gelê kurd li wan heta-hetayê nifiran dike (145, r. 61).

Wek ku xuya ye, pey wê yekê ra, dema munaqeşa di derheqa pirsa Mûsilê da, Ismet Paşa îlan kir ku Tirkiye ya du gelan e - ya Tirkan û Kurdan -, yên ku li ber hukûmetê wek hev in û mafên wan ên gelî bi awakî ne (121, r. 288).

Wek me li jor nîşan da, M. Kemal piştgiriya gelek Kurdan stend. Kurdan alîkarîke mezin di şerkariya dijî zevtkarên welatên Antanta û Yûnanistanê da da. Di derheqa wê alîkariyê da, I. Inönü jî li konfêransa Lozanê got (121, r. 289). Dema azakirina Izmirê, suwariyên kurd ên pêşîn bûn ku ketine bajêr. Gava zevtkarên yûnanî nêzîkî Seqarayê bûn û dest pê kir êrîşî Ankarê bikin, parlementerên "kurd" ên CTMM M. Kemal ji parlementerên rêaksyonê parast û pêşniyar kir ku Meclis bê belav kirin û xebata wê ji Ankarê bo Qeyserî yan Sîvasê bê guhaztin.

Eger em bi çavê gelê tirk li wê kirina parlementerên

"kurd" binihêrin, ewê kemala wê kirinê baş bê qîmet kirin, ji ber ku ew hejeke dijî empêryalîzmê bû û eger ew ferzend ji ortê bihata hildan, dibe ku dewletên Roavayê biketana nava karê Tirkiyê yê hundirî. Çi ku dimîne di derheqa kara kurdî ya millî da, ew "dilgermiya" wan di hindava Tirkan da dikare wek nezaniya polîtîk bê qîmet kirin. Em bidin zanîn ku "parlementerên" kurd ku "piştgiriya" Kemaliyan dikir, nikaribû bizanibûna ku zûtirekê ewê wan ji text bavêjin.

Tevgelên konfêransa Lozanê ku li ber wê isbatiya ku "parlementerên" kurd naxwazin navçeyên Kurdan ji Tirkiyê bên qetandin, lê hukûmeta wê dixwaze mafên Kurdan ên millî pêk bîne, sekinîn, "bi hevra qayil bûn" ku fikrê Kurdistana serbest ji bîr bikin.

Ji ruyê bi fehmberî, berdaxwerina diplomasiya Ingilterê, ku dicedand ji Kemaliyan berdaxwerinên mayîn bi dest xîne, di pirsên mayîn da jî (wek di pirsa Mûsilê da) bîranîna Kurdan ji peymana Lozanê derxist. Wê serketina polîtîka komên Tirkiyê yên rêaksyonêr di pirsa millî da dida nîşan dan.

Peymana Lozanê di hezîrana 1923 da hat qol kirin. Anegorî Peymanê, Kemaliyan mecbûr bûn tenê van borcdariyên jêrîn hildin ser xwe :

- "Miqala 38 - a) Hukûmeta Tirkiyê borc hildide ser xwe ku azadî û jiyana bê qeziya ji bo hemû bineciyan bide bêtirs kirin, bey hesabhildana ku ew ji çi milletî ne, zimanê wan kîjan e, çi dînî dihebînin ...".

- "Miqala 39 - b) ... Her bajarvanekî tirk dikare bi kîjan zimanî bixwaze, li her der - bi hevra peyivîn, dema kirîn-firotinê, di nava afirandinên di weşanê da, di civînan da ... - bipeyive" **(26, r. 152)**.

Rast e, peymana Lozanê cedandinên gelê Tirkiyê yê kurd ber bi serbestiyê inkar dikirin. Ew ji ruyê fen û fêlên empêryalîstên Antantayê tevî Kemaliyan bû. Eger dîwana Tirkiyê borcdariyên ku me li jor nîşan dan biqedanda, ewê ew pelixandina gelê kurd bihata rakirin.

Institut kurde de Paris

V. Nîkîtîn, ku peymanên Sêvr û Lozanê di hindava pirsa Kurdan da qîmet dike, dinivîse : "Rast e, peymana Sêvrê bi polîtîk xerab hatibû hazir kirin, lê ew jî bû sebebê ku ne hate bi kar anîn. Em naxwazin dîroka dîplomasiya pey şerrê li Asyayê pêş bînin ber çavan, an jî lê hûr bibin. Lê, di nava prensîpên mayîn da, xwemukurhatina otonomiya Kurdistanê, ew peyman bi wê yekê va bi navneteweyî hate nas kirin, lê ... peymana Lozanê ew yek ne kir û di dereca naskirina navneteweyî da helbet gaveke bi paş va kir ..." **(100, r. 407-408)**.

Rast e, peymana Lozanê pirsa Mûsilê da bilind kirin û Lîga Milletan mecbûr kir ku li wê navçeyê lênihêrandin bide derbas kirin **(binihêre miqal 3 ya peymanê) (26, r. 145)**, lê ew ne ji bo çavê Kurdan ên belek bû, lê ji bo ku empêryalîst navça bi nefta dewlemend bixin bin hukumdariya xwe.

Ew qîmeta ku V. Nîkîtîn daye peymana Lozanê hîn bêtir rastiya xwe isbat dike, ji ber ku dewletên empêryalîst ku dîtina serbestiya gelê kurd ji bîr kiribû, tevgera wî ya millî bendî tiştekî hesab ne dikir û "destûra" huqûqîtiyê dida rêaksyona Tirkiyê ku kara Kurdên Tirkiyê ya millî inkar dikir. Mixenetiya polîtîka dewletên empêryalîst di wê yekê da bû ku wan, tevî wê yekê, provokasyonên di hindava Kurdan da ne didan sekinandin, dicedand ku pirsa Kurdan di filan yan bêvan merhelê da bona armancên xwe yê kolonyalîst bi kar bînin.

Kemaliyan, ku pey konfêransa Lozanê tebiya xwe ya navneteweyî xurt kir, slogana "Tirkiye bona Tirkan" derxist meydanê û dest pê kir Kurdan, herweha gelên ne tirk jî pê ra, ji jiyana civakî-aborî bi dûr xînin; usa jî mecala qebûlkirina hilanîna pirsa Kurdan vekin.

Kamuran Bedir Xan, ku polîtîka komên Tirkiyê yên ku wê demê serokatî kir qîmet dikir, nivîsiye : "Hela nuh peymana Lozanê hatibû qol kirin, gava ku Mustefa Kemal dest xwe ji polîtîka hevrakarkirinê ra da, derbasî terbandina sozdayînên xwe kir û hela ne bû xwediyê soza xwe ya ku li Peymanê

xuya bû û ku li gora wê hukûmeta Tirkiyê diviya mafên millî yên gelên biçûk nas bike ... Gava Kurdan di derheqa sozdayînên wî da kir bîra wî, wî ferman da ku dibistan bên girtin û niştimanperwer û mirovên bi nav û deng bên girtin. Dîsa dest bi bêqanûniyan bû. Wek ku di çîrok û hikayatan da dibe (gilî di derheqa CTMM da gazîkirina duduyan bû - M.H.), ji axa Kurdan parlementerên tirk hatine bijartin. Çend parlementerên berê hatin girtin û dayîn mehkema eskerî. Li temamiya Kurdistanê dest bi pelixandin û cezakirinê bû" (156, r. 10).

Di van qewlan da, mîlîtanên Kurdan ên pêşverû di nava polîtîka empêryalîstan û serokên Tirkiya nuh a durû da hatin bawer kirin. Di nava wan da mêlgirtina ber bi Rûsyayê, ku hukûmeta wê pey şoreşa Oktobr a sosyalîzmê ya Mezin bi ruhê wekhevîtiyê û alîhevkirina biratiyê li welatê xwe dest bi safîkirina pirsa millî kir û bi piştgiriya gelên Rohilatê di şerkariya xwe bona serbestî û azayiya xwe dijî qûltiya kevnepersetên dewletên Roavayê da kir, hate xurt kirin.

Berdana mîlîtanên kurd ruyê xwe ber bi Rûsya Sovyêtî, di şerkariya azadariyê ya pêşverû da, bi firehî deng da. Mîlîtanên kurd ên polîtîk, pey serketina dewleta Sovyêtê, di hindava rêaksyona hundir û derve da dest pê kir ber bi rêxistinên Sovyêtê yên konsulî li Rohilata Nêzîk bin û ji wan ra di derheqa dilsarî û xemgîniya xwe di hindava polîtîka empêryalîzma Ingilterê ku heja Kurdan a azadariyê asê kir da dinivîsî. Tevî wê yekê, lîderên Kurdan di derheqa mêlgirtina xwe ya di hindava Rûsya Sovyêtî ku polîtîka wê di pirsa millî da kefîltiya bi heqî safîkirina pirsa Kurdan dida da dida zanîn.

Di 1922 da, Komîta Kurdistanê ya Serbestiyê (Erzurûm) biryar qebûl kir ku bi alîkarî û di bin bandûra Rûsyayê da mafên millî bi dest bixîne. Sedrê Komîtê, serhing Cibranli Xalit Beg, hela berî kongreya Lozanê ber bi nûnerên Sovyêtî, bi name dida zanîn ku ew "hêviya xwe danayne ser alîkariya Ingilterê

ya bi dil di nava sazkirina Kurdistana serbest da, biryar kir bi alîkariya Rûsya Sovyêtî bigihîje armanca xwe û de'wkarî bike bona sazkirina Kurdistana serbest, li bin bandûra Rûsan". Wê demê, tevgera Kurdan a azadariyê hîn gumreh û bi teşkîldarî, rêk û pêk bû. Komîta Kurdistanê ya Serbestiyê li Erzurûmê gelek alî wî yekê kir. Wê Komîta ku bingeh çê kiribû bona sazkirina partiya polîtîk dicedand ku li temamiya Kurdistanê rêxistinên xwe sazke. Rêxistinên usa li Bitlîs, Derehîn, Elazîz, Diyarbekir, Urfa, Sîirt û cî-wargehên mayîn hatibûn saz kirin (126, r. 173).

Berbirêbûna di derheqa binbandûriya Rûsya Sovyêtî da ji aliyê serok û mirovên kurd ên bi nav û deng da jî hat qebûl kirin û piştgiriya wan hat stendin. Bi vî awayî, bo nimûne, nûnerên kurd ji Erzurûm û Bitlîsê nivîsîbû :

"Rûsya Sovyêtî wek parastvana kara hemû millet û civakên bindest ji sedî sed dixwaze pirsên gelan bên safî kirin".

"Berê em li ser wê hêviyê bûn ku di nava teşkîla Tirkiyê da emê tomerîtiya xwe biparêzin, emê li ber zordayîna empêryalîstan li ber xwe bidin û bi wê yekê va emê pirsa Kurdan bidin hel kirin. Lê hêviyên me bi ser ne ketin, ji ber ku Tirkiye qayil bû ku Mûsilê bide Ingilterê ... Tirkiya ku bi bîr û baweriyên xwe yên şovînîst va dihat serkarî kirin qayil dibû ku Kurdistana otonom nas bike. Lê tevî wê yekê jî, Mûsil da Inglîzan. Ev sebebeke bingehî bû ku gelê kurd biryar kir ku têkoşînê bike û xwe bi xwe qederê xwe qerar bike".

Mîlîtanên Kurdan bi heqî hay ji xwe hebûn ku pey ku Mûsil dane Ingilterê, temamiya Kurdistanê dikare bibe koloniya wê. "Em gişk gelek rind dizanin - wan paşê nivîsîbû - ew yek çi nîşan dide. Bi baweriya me, welatekî usa nuh, wek Kurdistan ku tê da daxwaziyên dewletên zor hev xaçerê dibin, bêy alîkariya milletekî zor nikare tehemmul bike. Piştgiriya Ingilterê bi kolonyalîzmê dest pê dibe. Loma jî me biryar kir bona alîkarî ber bi

Rûsya Sovyêtî, ku di derheqa piştgiriya xwe ya ji bo gelên rohilatê yên bindest da îlan kiribû, bin".

Rûsya Sovyêtî, wê demê, ji ruyê çend problêmên hundir û derve nikaribû alîkariya mezin bida heja Kurdan a azadariyê.

Rast e, nûnerên Rûsya Sovyêtî di nava peyvên xwe yên tevî nûnerên hukûmeta Tirkiyê da dicedand usa bikin ku jiyana Kurdan bê pak kirin, qet nebe bona ku wê merhela otonomiya millî ya çandî bidin wan. Lê ew daxwazî pêk ne hatin.

Şêx Mehmûd ku dixwest ji bin qolê Ingilîzan derkeve, lê ev yek ne bi dilê mîlîtanên Kurdan bû, dest pê kir rê-ferzend bibîne ji bo ku Rûsya Sovyêtî piştgiriya wî bike. Pêşniyara Komita Serbestiya Kurdistanê ku jê ra şandibû ew bû ku dev ji Ingilîzan berdin û hêviya xwe bidin ser Rûsya Sovyêtî. Di 20 kanûna paşîn 1923 da, Şêx Mehmûd bi destê nûnerê xwe yê wekîldar û resmî name ji konsulê sovyêtî li Tebrîzê ra şand û tê da hêvî-tika dikir ku Rûsya alîkarî û piştgiriya wî bike. Em li jêr naveroka wê namê bi çend kurtkirinan va tînin :

"Gava di sala 1917 da temamiya cihanê dengê azayî û xelasbûna gelan ji qeydçîdarên gunehkar û zordestê çavsor eyan bihîst, hemû millet û gelên cihanê yên bindest bi dilgermî ew deng qebûl kir û rabûn şerkariyê ji bo azadiyê. Xeyala wan ew bû ku armancên wan pêk bên û di wî karî da hêviya xwe dabûn ser dilrehmî û dilpaqijiya gelê rûs".

"Çi ku di derheqa mafên me da dimîne, ji gelek rojnaman xuya ye ku Ingilîzan çawa gelê kurd di nava belengazî û sexîriyê da hiştiye, bi bomban û çekan êrîşî jin û zarên kurd kiriye ... Lê gava gelê kurd ê zêrandî dixwest ku li Suleymaniyê maf û de'wkariyên xwe yên qanûnî di nava jiyanê da bide pêkanîn, wê demê, mixabin, rewşa hundurî ya dewleta Sovyêtê ya navdar usa bû ku izn ne dida ku ew li ser gelên welatên derve yên zêrandî û bindest bifikire".

"Temamiya gelê Kurdistana Başûr gelek dixwaze ku dostiyê bi dewleta Sovyêtê ra bike, ew hazir e her

tiştî bike boy navê wê dostiyê, amade ye wê dostiyê bi moralî û maddî biparêze. Tevî wê yekê, em di hindava xwe da gotina xwe ya sereke datînin ser wê yekê ku mafên me yên qanûnî bi resmî bên nas kirin. Û bona wê yekê ku zorayî û hurmeta me bê bilind kirin, zorayiya dijmin bê qels kirin, welatê me hewcê gullereşan, topan, balafiran, çekan û cebirxanan e ... Temamiya gelê kurd Rûsyê wek azadara Rohilatê dihesibîne û loma jî hazir e bextê xwe bi bextê wê ra bide girêdan. Nuha, tiştê tek-tenê ku em difikirin ew problêma alîkirina me ye ...".

Lê rewşa navneteweyî ya sazbûyî, herweha tunebûna sînorên tomerî di navbera Rûsya Sovyêtî û Kurdistana Başûr da izn ne dida ku alîkariya eskerî bidin Şêx Mehmûd di şerkariya wî dijî kevneperestên Ingilterê. Di nava wan gotinan da, her ceribandineke bi radîkalî tevbûna di nava safîkirina pirsa Kurdan da dikaribû bigihanda sextbûnên polîtîkî û eskerî yên mezin li Rohilata Nêzîk ku casûsiya empêryalîzma Ingilterê ber bi wê nikaribû tevî safîkirina pirsa Kurdan bibûya.

## 6. <u>Qanûna bingehî ya pêşîn a komara Tirkiyê û inkarkirina mafên Kurdan</u>

Polîtîka komên Tirkiyê pey konfêransa Lozanê rêaksyona helandina pirsa millî bi temamî teşkîl kir. Ew ji bo wê yekê hatibû damezrandin ku hemû daxwaziyên milletên biçûk ên azadariyê bidin fetisandin û wan bi destê zorê bihelînin. Rêaksyonêrên Tirkiyê dest bi xurtkirina propaganda panturkîzmê kir.

Wê demê, gava weşana navbendî turuş ne dikir ku di derheqa Kurdan da eşkere binivîse, rojnama "Varlık" ku li Erzurûmê ji aliyê barêgeha Tirkiyê dihat çap kirin, di îlon 1923 da miqaleke giranbeha bi sernivîsa "Turkîzm û kurdîzm" da weşandin. Tê da berk dihate gotin ku milletê "kurd" (ku li çiyayê rohilata welêt da diman) ê ku di ruyê nezaniyê da navê şerm û etbê, navê "Kurd" li xwe kiriye,

Institut kurde de Paris

hîç tune, ku tenê gelê tirk heye. Wê rojnama panturkîzmê nivîsiye : "Her miroveki ku li Tirkiyê dijî, bêy hesibandina ol û bîr û baweriyên wî, wek Tirk tê hesab kirin ... Mirovên usa hene ku malûmatên dîrokî fe'ş dikin û navê "Kurd" li birayên me yên tirk dikin".

"Bi dîrokî hatiye isbat kirin ku Tirk, ku li çiyayên wilayetên me yên rohilatê dijîn û ji aliyê hindekan wek Kurd tên bi nav kirin, ew birayên me yên tirk tên hesab kirin. Çi ku di derheqa ferqî-cudatiya wan biran da dimîne, ew bi wê yekê va tê şirovandin ku gelek sedsalan pêş da ji ruyê mihacirbûna milletan ew Tirk mecbûr bûn li wargên çiyayî bihêwirin û loma jî ji me hatine birîn û zaravê wan jî hat guhartin ... Tenê bîr û baweriyên tomerî, ku li ser bîr û baweriyên eşîran, zimên û ol-dîndariyê ne, dibin bingeha millî. Cudabûn-cihêbûna di nava zimên da nikare tomerîtiya me ya millî ya dîrokî bide sist kirin. Nuha, bi saya serkarîkirina cumhûriyetiyê, ewê gel bi hiş û sewdê xwe pêş da here û ew ferqiya "biçûk" ewê bê hildan û pevgirêdanên millî ku hene ewê hîn bêtir bên xurt kirin ...".

"Eger em ber bi nivîskarên cihê-cihê ku dîroka hemtomerî nivîsîne bibin, wê demê em dibînin ku di nava wan afirandinên dîrokî da hîç cî di derheqa wî milletî da, ku xwe "Kurd" hesab dike, nayê bîr anîn".

"Birayên me yên gotî kurd, wek Tirk hesab dibin" (236, 5.10.1923).

Meqalên bi vî awayî ji bo wê yekê bûn ku Kurd bi ruhê tirkkirinê terbiye bikin, daxwaziyên wan bidin inkar kirin, bineciyên Kurdan ji şerkariya azadariyê - ji bo tomerîtiya nasyonalîzmê - bidin dûr xistin.

Siyaseta inkarkirina mafên Kurdan ên millî, siyaseta nasyonalîzma Tirkan, bi temamî di nava qanûna bingehî ya pêşîn a Komara Tirkiyê, ku di sala 1924 da hat qebûl kirin, da ciyê xwe dîtine.

Di derheqa wê yekê da ev gotar şehadetî didin :

- "Her Tirkek aza tê dinyayê û aza dijî ..." (Miqal 68).



Institut kurde de Paris

- "HemÛ Tirk li ber zagonê (qanûn) wek hev in ..." (miqal 69).
- "Destpêneketina nefs, maf, wijdan, azadî, fikr, peyv, weşan, malbarkirin, kirîn-firotin, xebat, mulk, civîn, komel û şeriketan mafên Tirkan hesab dibin (miqal 70), (22, r. 276).

Gelo wê rewşa gelên ne tirk, milletên biçûk, Kurdan çawa be ? Wek ku xuya dibe, divê miqala Qanûna Bingehî N° 88 bersîva vê pirsê bide.

Di varyanta miqala Qanûna Bingehî N° 88 ya dawîn, ku di nava pirsiyarnama "Tirkiya wê demê" da hatiye nivîsîn, tê gotin : "Hemû bineciyên Tirkiyê, bêy hesabhildana dîn û rengê çermê wan, di hêla bajarvaniyê da Tirk tên hesab kirin ...".

Li vira, di nava wergerê da şaşî hatiye berdan. Diviya ew para miqala 88 bi vî awayî bihata wergerandin : "Hemû bajarvanên Tirkiyê, bêy hesabhildana dîn û rengê çermê xwe, Tirk hesab dibin ...".

Pey ra, di wê miqalê da dihate gotin : "... Ew merivên ku li Tirkiyê yan jî ji derveyî sînorê wê ji bavê xwe yê tirk hatine dinyayê Tirk hesab dibin; herweha jî ew mirovên ku ji wan mirovên biyanî ji diya xwe bûne, yên ku hatine Tirkiyê û li Tirkiyê jî rûdinên, ew mirovên ku li Tirkiyê mane heta ku umrê wan gihîştiye kamilbûnê, û ew mirovên ku dixwazin bi resmî bajarvaniya Tirkiyê qebûl bikin, ew mirovên ku anegorî zagona di derheqa bajarvaniyê da bajarvaniya Tirkiyê stendine ..." (22, r. 278).

Lê ev hemû jî tiştek ne da guhastin, ji ber ku gelên cihê-cihê ku li Tirkiyê diman ne dixwest û nikaribûn jî bibûna Tirk. Kurdan jî, yên ku şerkariya xwe ji bo xwexwetiya millî berdewam dikir, ne dixwest bibin Tirk, dixwest serbest bijîn, dijî qûltiya millî ku civaka Tirkiyê ya hukumdar pêk dianî derdiketin.

Miqalên Qanûna Bingehî yên mayîn jî di derheqa zorlêkirin û kêmkirina mafên milletên biçûk da şehadet dida. Bi vî awayî, di miqal 2 ya Qanûna Bingehî di sala 1924 da tê gotin : "... Zimanê dewletê zimanê tirkî hesab dibe" (35, diwan 26, r.

170). Wê miqalê dida nîşan dan ku di welêt da hemû nivîsarên resmî diviyan bi tirkî bihatana kirin, ku ew ziman bi destê zorê li stuyê milletên biçûk dihat kirin û mafên wan ên biçûktirîn dihatin pêpes kirin. Di vê yekê da usa jî ceribandina komên ku serokatî dikir, ku dijminayiya di navbera millet da li welêt bidin hişk kirin-tûj kirin, xuya dibû.

V. Î. Lênîn ku lîbêralên Rûsan rusa' (sosret, robet) dikir, ji bo ku ew bi gotinên ji bo "kulturiyê", "yekîtiyê" û "perçenebûna" Rûsyayê xwe li bin perdê dikir û digot ku divê zimanê rûsî bibe zimanê dewletê, dinivîsî : "... hûn çiqasî jî gotinên bedew di derheqa "kulturiyê" da bêjin, em nikarin bi zorê zimanekî resmî li situyê xelk bikin ... û zorlêkirin ewê tenê bigihîne vî tiştî : ewê karê zimanê mezin û zor dereca qedirgirtina zimanên millî yê mayîn bide dijwar kirin, lê ya sereke ew e ku ewê dijminayiya di navbera wan da bide zêde kirin, ewê milyon problêmên nuh bide saz kirin, ewê hevheznekirin, hevdufehmnekirin û tiştên mayîn bide hişk kirin" (9, r. 295).

Komên serokatîkjir, ku zimanê tirkî wek zimanê borclî îlan kir, dicedand ku pêşiya pêşdaçûyîna rûhanî ya xebatkarên milletên biçûk bigire, nemaze ya Kurdan, wan di nav tarî û tengezariyê da bihêle.

Gelek miqalên mayîn ên Qanûna Bingehî ya Komara Tirkiyê jî bi giyanê milletçîtiyê, ku mafên millî ne didan gelên ne tirk, va hatibûn perwerde kirin. Li dawiyê, Qanûna Bingehî ya pêşîn a Komara Tirkiyê polîtîka komên Tirkiyê yên serkarîkir ên di pirsa millî da rêaksyonêr bi qanûnî dan mehkeme kirin.

Lêhûrbûna rewşa şerkariya Kurdan û siyaseta komên Tirkiyê yên serdest ya wê demê di pirsa kurdî da destûr dide me ku em bên ser van bîr û baweriyên jêrîn :

1- Rast e, ji ruyê binketina Tirkiyê ji Imperatoriya Osmanî di şerrê hemcihanî yê pêşîn da, gelek welatên ne tirk ji hev çûn, Tirkiye dîsa wek "dewleta pirmillet" dihat hesab kirin. Rast e, pey şerr, Tirkiya ku ji aliyê hovên empêryalîst hîn

kaf-kûn bûbû, dîsa jî dewleteke kolonyal wek Imperatoriya Osmanî nîn bû. Tevî wê yekê, ew li hev hat hukmê xwe ku li ser Ermenistana Roava û Kurdistana Bakur xwedî bike-biparêze. Bi xusûsî, divê ew isbat bike ku dewsa hundakirina ax-erdê kolonyal ê gelek fireh, wê dicedand ku qet nebe wek dewsderxistina koloniyên mayîn heta-hetayê bike bin qolê xwe. Hema xût bona wê armancê, wê siyaseta "paqijkirina" Ermenistanê ji bineciyên wê ku Jön Tirkan dest pê kiribû xelas kir, lê pey wê yekê ra dest bi teslîmîxwekirina wê perça Kurdistanê ku para wê ketibû kir.

Di dema ku em tê da di vê pirtûkê da lêdinihêrin, em dibînin ku di wê merhela siyaseta burjuwaziya Tirkan a pêşîn di pirsa Kurdan da dixwest ku navçeyên Kurdan ji dest xwe bernede, ji bo ku di paşdemê da wan bike bin qolê xwe.

2- Di wê siyaseta xwe da, burjuwaziya Tirkan rastî dijderketina şerkariya kurdî ya millî ku di dema hilweşandina Imperatoriya Osmanî da komeleyên wê ya mexlûqetiyê, yên çandî û siyasî, û yên ku karkirina ji bo xurtkirina xwefehmdariya Kurdan û hevgirtina wan ji bo serbestiyê pêk dianî hebûn hat. Nemaze nûnerên burjuwaziya Kurdan, ku nuh xuliqî bûn, rewşenbîr (parlementer, karmend, zabit, avuqat, nivîskar) û bazirgan, û herweha şêx û serekeşîrên niştimanperwer diketin nav wan.

Sistiya şerkariya wê demê : tunebûna programa fireh, a yekîtiya di navbera komele û komiteyên kurdî yên cihê-cihê da, usa jî di navbera eşîr û beradan da, pevgirêdana sist di navbera wan rêxistinan û kitleyên xebatkaran da, dilpakiya wan di hindava armancên dewletên empêryalîst da, xwezma armancên Ingilterê ku ferzend dida wan dewletan ku tevî karê Kurdan bibin û wan di nava meremên xwe yên empêryalîst da bi kar bînin. Hema xût bona wê yekê, dewletên empêryalîst xalên di derheqa Kurdistana serbest da kirine nava peymana Sêvrê û tevî wê yekê her tişt dikir ku ew dîtin neyê serî, pêk neyê.

Institut kurde de Paris

3- Şerkariya gelê Tirkiyê dijî empêryalîzmê, wê gotî şoreşa Kemaliyan, li bal hinek mîlîtanên Kurdan bawerî pêş da dianî ku bi alîkariya nasyonalîstên Tirkan ewê mafê pêşdaçûyîna xwexwetî û otonomiyê dest bînin. Loma jî ew tevî gelek mecalên Kemaliyan bûn, bi aktîvî di şerkariya wan dijî zevtkarên empêryalîst da ew diparastin. Burjuwaziya Tirkan, ku dixwest Kurdan di wê şerkariyê da bi kar bîne, hêviya xwe danî bû ser xapandina derebegên kurd û hela şerkariya kurdî li ... Iraqê diparasrt. Çi ku di derheqa Kurdên "xwe" da dimîne, gavên nasyonalîstên Tirkan ên pêşîn, biryar û manîfêstên kongreyên Erzurûm û Sîvasê nîşan da ku temamiya siyaseta wan ji bo bindestkirina navçeyên Kurdan û qûlkirina Kurdan e.

4- Kongreya Lozanê derbeke xedar gihand şerkariya Kurdan a azadariyê, loma jî eger em li destûra navneteweyî-extiyariyê binihêrin, şerkariya Kurdan a millî li hemberî peymana Sêvrê gaveke ber bi şûndaketinê bû. Kongreya Lozanê nîşan da ku dewletên empêryalîzma Roavayê pirsa Kurdan wek destmala destan dijî Tirkiyê hesab dikir û bi kar dianî, ku Mûsilê bi dest xînin. Wan, ku gihîştine armanca xwe, dest ji bîr û baweriya Kurdistana serbest kişand û bi wê yekê va "destûr" dan rêaksyona Tirkiyê ku ew daxwaziyên Kurdan ên gelî inkar bike û şerkariya wan a millî bihincirîne.

5- Siyaseta komên Tirkiyê yên şovînîst a rêaksyonêr di pirsa Kurdan da di nava qanûna bingehî ya pêşîn a Komara Tirkiyê bi qanûna ku di 1924 da hat qebûl kirin hat mehkeme kirin. Wê ferzend dida dîwana Tirkiyê ku li ser bingeha "zagonê" daxwaziyên gelên ne tirk inkar bike, şerkariya Kurdan a millî-azadariyê li welêt bi hovîtî bixeniqîne.

# SERHILDANA KURDAN A SALA 1925
## (Serhildana Şêx Seîd)

Kemaliyan, ku hukmê xwe li welêt dan xurt kirin, dixwest ku Tirkiyê bikin dewleteke di dereca gel û millet da yekşivêt, hemî bineciyên wê bikin Tirk. Siyaseta komên welêt ên serokatîkir helandina gelên biçûk di salên 20 da bû. Ew bi mesela bineciyên Kurdan fireh-zelal dihat dîtin. Berî ku em derbasî şirovekirina vê pirsê bibin, pêwist e em bi kurtî li rewşa gundiyên kurd ên pirmilyonî ku bilî qûlîtiya millî, qûlîtiya derebegên xwe jî dîtine binihêrin.

Hukmê şêx û begên Kurdan bû : wan pir caran bi xwe mehkema millet dikir, hesabên wan û tiştên mayîn dihatin der. Weşana Tirkiyê ya girêdayî serhildana Şêx Seîd wê demê gelek di derheqa wilayetên rohilatê ya civakî-aborî da, di derheqa hukumdariya şêx û begên Kurdan da dinivîsî, giva dîwana Tirkiyê dijî wan, ji bo xweşbextiya Kurdan, şerkarî dikir. Rast e, ew meqale gelekî biteref bûn û bi siyasî jî binperdekirî bûn. Lê, dîsa jî ew gelek tişt di derheqa danûstendinên civakî di navbera Kurdan da dibêjin. Bi vî awayî, rojnama "Akşam" a 19 îlon 1925 nivîsiye : "Gundiyên koçer ji mafan hatine mehrûm kirin. Çi ku dimîne di derheqa borcdariyên wan da, ew bi hevokekê va tê gotin : "Kar bikin heta mirinê". Û rewşa wan, sexîriya wan digihêje dereca qûlîtiya rast ... Xurekê wan hergav nanê ceh û toraq bû. Gundî tim ji bo xwediyê xwe kar dikir û zexîra wî tije dikir. Û milkdar ewqas nan dida wî ku ji birçîna nemire ...".

Gundî ji bo xweliya xwe diviya piraniya eknê gihandî bida milkedar, an jî demeke dirêj li ser erdê wî kar bikira. Gelek bac jî ji wan distendin.

Institut kurde de Paris

Tevî wê yekê, gundiyên kurd diviyan eseyê heq-kiriya xweliyê jî bidana. Ew gundî jî gotî, ku bona xebatê diçûne Stembol, Zonguldak, Îzmîr û bajarên din, diviyan bidana. Ew heq, nûnerên eşîran salê carekê, an jî du salan carekê dida. Çap-qedera wê girêdayî meaşê gundî û dereca hukmê axayê ku, eger lazim bûya, dikaribû bi destê zorê ew heq hilda bû **(136, r. 197)**. Eger yek turuş bikira heq neda, wey li wî, mala wî dizêrand **(213, 1932, r. 18)**.

Rojnama "Akşam" di sala 1925 da nivîsiye ku çiqasî dûrî merkezan bûna, ewqas hukmê milkedaran pirtir dibû. Di çend navçeyan da, hukmê wan ewqas pirr bû ku ew dibûn wek serokên dîwana cî ku bi organên hukûmeta navendî ra kar dikir. "Li wilayetên rohilatê beglerên (cîgirên derebeg-milkdaran M.H.) usa hebûn, û gava ji gundekî diçî gundekî din, te digot qey ji sînorê dewletekê derbas dibî. Gava li ser tixûb ji gundiyên çekdar dipirsî : "Hûn kî ne ?", wanên han bersîv dida : "Em mirovên filan axayî ne".

Rakirina sultanetê (1922) û xelîfetê (1924) ji holê derbeke dijwar gihande şêx û begên Kurdan. Hilanîna mehkemeyên şerîetê ne tenê şêx ji hebûna pirr mehrûm kir, lê usa jî hukmê wan li ser piraniya Kurdan kêm kir. Hukûmeta Anakarayê mecalên bona mehkemekirina hukmê dîwana merkezî li ser rohilata welêt xurt kirin. Karmendên Tirkiyê li ser qulixên bilind, li Kurdistana Tirkiyê, hîn rêaksyonêrtir hatin xuya kirin. Bertîlxwarin di nava administrasyona dewletê da li Kurdistanê bû tiştekî sade.

Ew siyaseta Tirkiyê ya nuh di nava bineciyên Kurd da nerazîbûneke mezin pêş da anî. Di nava wan qewlan da niştimanperwerên kurd dest pê kir haziriya serhildaneke nuh bibînin.

## 1. Tedarukdîtina serhildanê û destpêka wê

Tedarukdîtina serhildanê, ku di paşdemê da navê "Serhildana Şêx Seîd" lê hat kirin, ji destpêka salên bîst da dest pê bû. Bi saya tevgera niştimanperwerên Kurdan, di 1923 da li hev hatin ku karkirina

Institut kurde de Paris

Komîta Serbestiya Kurdistanê (navê wê "Azadî" bû) aktîf bikin. Ew rêxistin dizî bû û ji komikên xewle hatibû saz kirin (di her komik da 5 mirov hebûn). Her endamekî wê xwediyê rutbekê bû û navekî zêde li xwe kiribû. Ew diviyan tenê hevalên komika xwe nas bikirana û di nava pevgirêdanan da tevî hevalekî ji komika din bibûna (147, r. 35).

Navê Komîtê jî diviya di dizî bihata xuya kirin, lê eger yek şaşîtî bikira û di hindava rêxistinê da xayintî bikira, ew bi decalî dihat gunehkar kirin. Serokê Komîtê yê serhing Cibranli Xalit Beg bû. Di nava demeke kurt da, ew bi serekeşîrê qebîla Mutkan, Hacî Mûsa, li hev hat ku bikeve nava hevkarkirinê. Usa jî, danûstendinên wî tevî serekeşîrê qebîla Hesenanliyan, Hesenanli Xalit Beg (9), û gelek serekeşîrên mayîn baş bûn. Komîtê rêxistinên xwe usa jî di nava ordiyê da, ku tê da li hev hat ku çend zabitan bîne hêla xwe, dane saz kirin. Di nava wan zabitan da usa jî bineciyên Iraqê hebûn, û ew yek alîkariya tesdîqkirina pevgirêdanan bi Bexda û Helebê ra kir. Endamên wê rêxistinê bi nav û deng bûn : zabit Ihsan Nûrî ji Bitlîsê, çawîş Ismaîl Hakkî Şawês ji Suleymaniyê, Xûrşîd ji Siirtê. Navenda rêxistinê li Erzurûmê bû. Bi spartina navbenê Ismaîl Hakkî Şawês borcdarî hilda ser xwe ku navçeyên Kurdistanê yên cihê-cihê parên (şaxên) wê rêxistinê bide saz kirin. Bona wê armancê ew hate Diyarbekirê. Li vira bi tevgeliya Qedrî Beg Cemîl Paşazade, Qasim Beg Cemîl Paşazade, doktor Fuad, avukat Mehmet Efendî (Bavê Tûjo, an jî Hacî Axte), Ekrem Beg Cemîl Paşa û çend mîlîtanên Kurdan ên mayîn para wê rêxistinê hat saz kirin (145, r. 82). Pevgirêdana di navbera navbendê û paran li Diyarbekirê bi destê nûnerê pareyê li Darahînê, Teyib Elî, dihate mîaser kirin.

Serokatiya Komîteya Serbestiya Kurdistanê di nava karkirina xwe da dicedand ku ji aliyê dîwana cî bê hez kirin. Usa jî dixwest ku şêxên rohilata welêt ên bi nav û deng piştgiriya wê bikin. Ew faktoreke giring û pêwîst bû, bona ku şerkariya çekdarî bi awakî vekirî bibe sebeba pêkanîna armancên Komîtê

Institut kurde de Paris

(85, r. 45). Şêx Seîd, ku nav û dengê wî ji Xunis, Genc û Palû heta Diyarbekirê belav bûbû, hukmekî mezin li ser komîtê hişt (10).

Şêx Seîd gelek dewlemend bû. Hebûna wî di wê derecê da roleke giring lîst ku ew bi biryara Komîteya Serbestiya Kurdistanê bû endamekî wê yê bi nav û deng. Di dawiya havîna sala 1923 da, Yûsif Ziya, ku serokekî Komîtê û parlementerekî Bitlîsê bû, çû Xunisê li bal Şêx Seîd.

Dema rasthatinê, ew di derheqa pêwîstiya sazkirina rêxistinên Kurdan da peyivî û got ku şerkariyê bikin bona serbestiya Kurdistanê. Tevî wê yekê, wî soz da ku di paşdemê da ewê hukûmeta Kurdistanê qulixeke bilind bide Şêx. Loma jî Şêx Seîd kete nava teşkîla Komîtê. Wan tevî wî peyman danî bona ku agahdarî di derheqa teşkîlkirina serhildana Kurdan da bidin hevdu. Pey wê yekê, Yûsif Ziya navê dizî yê Komîtê ji Şêx Seîd ra got.

Di zivistana salên 1923-1924 da, li Paluyê şêwrdariya serokên Kurdan, ku di nav wan da derebegên qeza Xanî (wilayeta Diyarbekirê) jî hebûn, hate derbas kirin. Şêwrdariyê biryar qebûl kir ku hej-şerkariya Kurdan a dizî bidin aktîf kirin.

Jimara alîgirên heja Kurdan her ku diçû zêde dibû: bawer bike hemû eşîr bi alîkariya Komîta Serbestiya Kurdistanê çek û cebirxane ji xwe ra peyda kirin.

Serokên serhildana Kurdan bi çekdarkirina eşîran û tedarukdîtina serhildanê dicedand ku bigihîjin wê yekê ku Koma Milletan Kurdistana Serbest nas bike. Serokên serhildana bona guhdariya dîwanê, bona ku guhdariya dîwanê daneynin ser xwe, filan yan bêvan biryar bi dizî qebûl dikir û civînên bi vî awayî, bi tevgeliya mirovên kêmjimar va, dihatin derbas kirin. Bi vî awayî, di behara 1924 da, Yûsif Ziya hat "mêvaniya" Cibranli Xalit Beg, li Erzurûmê. Di dema rasthatinê da, biryar hat stendin ku bi alîkariya Şêx Mehmûd û Ismail Axayê Sîmko, ku li derveyî Tirkiyê diman, eşîran bi çek û rihal bikin, usa jî bi riya Sûriyê de'wekarî ji Koma Milletan ra, di derheqa naskirina Kurdistanê da, bişînin. Yûsif

Ziya bi wê biryarê û nama Cibranli Xalit Beg çû bal Şêx Seîd, li gundê Kolxîserê (qeza Xinisê). Paşê ew çû navçeyên cihê-cihê (Göksu, Hecî Omran, Tekman, Gökoğlan, Qerliova, Varto) û li wan deran ew biryar ji serokên Kurdan ra da nasîn (128, r. 126).

Wê demê, alaya Tirkan li navça Xizan bû û şerkariya Aşûriyan dida fetisandin. Serokê barêgeha wê alayê Ihsan Nûriyê kurd bû (di paşdemê da ew bû serokekî serhildana Kurdan li rex Araratê). Bilî wê, zabitên Kurdan ên navdar jî, wek Resîm Wanlî, Xurşît, Tewfîq Cemîl, Riza û yên mayîn, qulix dikir. Wan zabitan anegorî spartinên Komîtê dest pê kir li ciyan, li nava eşîrên Kurdan, komikên partîzanan bidin saz kirin.

Endamên Komîtê dicedand ku pevgirêdan tevî wan komên ku bi Mustafa Kemal ra di nava muxalefetê da bûn bidin saz kirin. Bona wê armancê, di payîza sala 1924 da, Yûsif Ziya li Stembolê rastî endamên Partiya Pêşverû ya Cumhûriyetê (PPR) û mîlîtanên mayîn ku di nava muxalefetê da û dijî hukûmetê bûn hatin. Pey wê yekê, ew çû Erzurûmê û ji wira têlêgrameke dizî ji birayê xwe Çawîş Riza, ku ew paresker qulix dikir ku li navça Xizanê bi fetisandina serhildana aşûrî va gîro bûn, ra şand. Ew têlêgram bi şaşî hat fehm kirin û Kurdan tirê diviyan rabin serhildanê, û zabitên kurd ên wê alayê, serokatiya paraskerên xwe, bi qumandariya Ihsan Nûrî, çek hildan û berê xwe dan çiya (126, r. 173-174). Lê ew rabûna cur'et prîskek bû û ji aliyê eşîrên Kurdan piştgiriya pêwîst ne stend. Loma jî Ihsan Nûrî û zabitên Kurdan ên mayîn eskerên xwe ji hev belav kirin û bixwe jî çûn Sûriyê, ji wira jî Kurdistana Başûr (Kurdistana Iraqê) (145, r. 83).

Tişteki têgihîştinê û sade ye ku ev karkirina Kurdan û serokên wan diviya ji guhdariya dîwana Tirkiyê der nemîne. Cara pêşîn serokên eşîra Xormekan bi nama dizî di derheqa tedbîrdîtina serhildanê da Ankara agahdar kir. Mustafa Kemal bona erdheja (zelzele) payîza 1924, ku li wilayetên rohilatê bûbû, çû Erzurûmê. Li vira ferzend kete wî ku di nava

rastiya wê agahdariyê da bê bawer kirin ku di namê da dihat gotin. Dema ew vegeriya Ankarê, ferman da bona ku Yûsif Ziya, Cibranli Xalit Beg û mîlîtanên Kurdan ên mayîn ên bi nav û deng bên girtin. Di oktobra 1924 da, dîwana Tirkan li hev hat ku Yûsif Ziya bigire, û ew bi rêberiya eskeran hat şandin Bitlîsê bona ku mehkema eskerî wî mehkeme bike. Bilî wê jî, endamê hurmetlî yê berê, Hecî Mûsa, û 20 niştimanperwerên Kurdan ên bi nav û deng hatin girtin. Cibranli Xalit Beg, ku hela di nava azayê da bû, nikaribû serederî ji rewşa sazbûyî bikira. Ew li ser wê bîr û baweriyê bû ku hukûmetê turuş (cur'et) neke wî bigire. Ew usa jî difikî ku qet nebe bineciyên cî û pareskerên korpusên ordiyê, usa jî eşîrên ku pê ra girêdayîne, ewê serê xwe rakin û wî azad bikin. Lê usa ne bû. Şeva 20.12.1924, desteya ku ji hukûmetê ra emîn bû Cibranli Xalit Beg li mala wî girt û hema wê şevê jî berê wê da Bitlîsê (128, r. 127). Di sala 1924 da, mîlîtanên Kurdan ên mayîn jî hatin girtin û ji welêt hatin raqetandin (170, r. 26).

Pey girtina Xalit Beg, Şêx Seîd wek sedrê Komîta Kurdistana Serbest hat bijartin. Komîtê biryar qebûl kir ku dest bi serhildana hemtomerî bike û serokên Kurdan ên girtî bide azad kirin (108, r. 246).

Şêx Seîd spartin stend ku serhildanê bide lez kirin, serokatî li wê bike û bi riya Sûriyê pevgirêdanan tevî Kurdên Sûriyê bide testîq kirin. Şêx Seîd ku ew spartin stend, name ji Hesenanli Xalit Beg ra şand û tê da got ku pêwîst e, eger ferzend hebe, êrîşî Bitlîsê bikin û Cibranli Xalit Beg aza bikin, lê ew bixwe di 27.12.1924 da hat gundê Qirikxanê (qezayê Palû). Li vira, di 4 çileya paşîn 1925 da, serekeşîrên Kurdên navçeyên nêzîk berhev bûn bona ku pirsa serhildanê enene bikin. Ji Stembolê, kurê Şêx Seîd, Elî Riza, jî hat wira (128, r. 123).

Hela berî van qewimandinan, Elî Riza di cotmeha 1924 da, bi riya Diyarbekirê çû Helebê, bona teşkîl-kirina serhildanê tevî lîderên Kurdan ên mayîn ên ku ewê bide qayil kirin. Gelek mîlîtanên Kurdan ji

Tirkiye, Sûriye û Iraqê hatin wira. Di wê civînê da, rewşa Kurdistana Tirkiyê bi hûrgilî hat enene kirin. Bawer bike, hemû tevgelên wê hatin ser wê bîr û baweriyê ku tenê bi destê serhildanê ew dikarin mafên gelê kurd biparêzin. Civînê biryar qebûl kir ku di 21 adar 1925 da li Kurdistan Tirkiyê dest bi serhildana hemtomerî bikin (ew roja cejna millî "Newroz" bû), herweha organa serhildanê ya serkarîkirinê hat bijartin **(126, r. 174)**. Elî Riza mecalên dereca tedarukdîtina serhildanê enene kirin û di 15 cotmeh da ji Helebê derket û heftekê şûn da hat Stembolê, ku tê da rastî Seyid Ebdulqadir hat. Dema wê rasthatinê, Elî Riza di derheqa rewşa wilayetên rohilatê da şirove kir, bîr û baweriyên Komîta Serbestiya Kurdistanê yên girêdayî serhildanê raber kirin, usa jî fikra xwe di derheqa planên wan serokên Kurdan da, ku li Heleb û Iraqê bûn, got. Seyid Ebdulqadir di 2 çiriya pêşîn da Elî Riza bal xwe gazî kir bona ku azatir pê ra bipeyive. Dema wê gotûbêjê, lawê Seyid Ebdulqadir , Seyid Mehmet, jî hazir bû. Di 4 çiriya pêşîn 1924 da, Elî Riza dîsa hat bal Seyid Ebdulqadir ku ew agahdar kir ku hela ji îlon 1924 da, nûnerê wî Kör Sadî, tevî xebatkarê balyozxana Ingilterê, hevpeyvînan di derheqa pêwîstbûna piştgiriya Ingilîzan ji serhildana Kurdan ra da derbas dike. Paşê, wî da zanîn ku dû dawîhatina vekirî ya wan hevpeyvînan, ewê bixwe here wilayetên rohilatê bona bêtirskirina yekîtiyê di nava heja Kurdan da **(212, 17, 18, 21, VIII. 1925)**.

Elî Riza di derheqa van hemû tiştan da bi tevgelên civînê ra şirove kir. Bilî wê, Elî Riza civîn agahdar kir ku ew li Ankara û Stembolê rastî şuxulkarên usa hatiye ku dijî hukûmetê ne û di nava muxalefetê da ne. Wan gotiye ku gava serhildan dest pê bike, ewê di derheqa wê yekê da Koma Milletan agahdar bikin. Civînê ew agahdariya Elî Riza hilda ser hesêb. Tevî wê yekê, tevgelên civînê kir bîra Şêx Seîd ku eger Kurdên qizilbaş (elewî), ku li navçeyên Varto (wilayeta Mûşê) û Xinisê (wilayeta Erzurûmê) dijîn, tevî wan nebin û bi wan ra nebin yek, wê demê ewê di dereca pêkanîna serhildanê da dijwariyên anegor pêş da bên.

Institut Kurde de Paris

Xuya bû ku eşîra Xormek (qizilbaş) ku li navça Varto û Kîgî (wilayeta Bingolê) koçer bûn, dijî planên Cibranli Xalit Beg derketine. Loma jî hema wê rojê, 3 nûnerên wê civînê yên çekdar bi nama Şêx Seîd berê xwe dane serekeşîrên Xormekê. Tevî wê yekê, serekeşîrên qizilbaşan civîn derbas kir û tê da biryar qebûl bû ku bi hemî hêzan ra dijî serhildanê derkevin û di derheqa wê yekê da nûnerê Şêx agahdar kir. Hela bi ser da, wan nama Şêx şand ji Sirrî Beg, ku karmend-qaymeqamê Tirkan bû, ra. Wî jî ji aliyê xwe wilayeta Mûşê agahdar kir. Hema wê demê, Şêx Seîd dicedand ku Kurdên Dersîm û Mûşê jî bike nava serhildanê. Lê ew ceribandin pêk ne hatin (117, r. 225).

Şêx Seîd, Elî Riza û çend serekeşîr û şêxên eşîra ji gundê Qirikxan derketin û di 6 çiriya paşîn 1925 da hatin gundê Kanîreşê (qezayê Varto) li bal Cibranli Kamil Beg. Li vira civîna duduyan, ku tê da Şêx Seîd spart serokan ku dema serhildanê divê ku li pêşiyê heq-hesaba eşîra Xormek bînin der, hat derbas kirin. Di 8 çiriya pêşîn da, ew hat gundê Melîkanê (qezayê Solxanê, wilayeta Bingolê) ku tê da serokên Kurdan ev biryar qebûl kir : dest bi serhildanê bikin û êrîşî Diyarbekir, Bitlîs û Erzincanê bikin û berê xwe bidin tixûbên Iraqê, bi her awayî xwe bigihînin Şêx Mehmûd (128, r. 131).

Wê demê, gava gelek navçeyên Kurdan li rohilata welêt gumreh tedarukdîtina serhildanê didît, serekeşîrên Dersîmê (qizilbaş) dîsa bi hev ra diketin huceta derheqa peydakirina riyên şerkariya dijî nîrê Tirkiyê. Em bidin zanîn ku gelek ji wan siyaseta aşîtiyê derbas dikir, berî her tiştî di derheqa nefsê canê xwe da difikirî, û hela ew di wê bîr û baweriyê da bûn ku siyaseta Kemaliyan di pirsa Kurdan da ewê riyeke ronahiyê ji wan ra veke. Yek ji wan parlementerê Dersîmê yê herî bilind Hesen Xeyrî bû. Seyid Riza, Baytar Nûrî Dersîmî û çend lîderên Kurdan ên mayîn xwe bi tabiya radîkal girtibû, baweriya xwe bi sozdayînên dîwana Tirkiyê ne dianî û li ser wê bîr û baweriyê bûn ku Kurd tenê bi riya şerkariya çekdarî dikarin bigihîjin mafên xwe yên millî.

Di dawiya 1924 da, dema şevbihêrîkê, li bajarê Xozatê (wilayeta Tunceliyê), li mala serekeşîr Ferhad Cemşîd civîna serokên eşîrên Kurdên Dersîmê, ku tevî wan Hesen Xeyrî û Nûrî Dersîmî dibûn, hat derbas kirin. Di wê civînê da, Hesen Xeyrî dijî şerkariya Dersîmiyan li hemberî Tirkiyê derket û pêş da hat bona karkirina tevî Kemaliyan (ew yek di dema konfêransa Lozanê da dihat texmîn kirin, dema ku parlementerên meclisê yên kurd bi pêşniyara M. Kemal ji kongrê ra çend têlêgram şandin û tê da dida testîq kirin ku Kurd naxwazin ji Tirkan cihê bin). Paşê Hesen Xeyrî ber bi Nûrî Dersîmî bû û got : "Hevalê min, doktor Nûrî, eva salên dirêj in ku şerkarî bona serbestiya Kurdistanê dibe. Ew şerkarî wê bigihîne kafkûnbûn-wêranbûna Dersîmê. Ez gelek hez ji doktor Nûrî dikim, lê ne li ser bîr û bawerîyên wî me. Eger em tevî Tirkan kar bikin, emê milletê xwe pêşxin û ewê dema azadiyê bixwe bê ...".

Nûrî Drsîmî bersîva wî da : "Xeyrî Begê qedirbilind, tu nuha parlementerê kurd ku ji Tirkan tê cuda kirin î. Tu dema bûyî endamê PRP, tu bûyî dijminê Mustafa Kemal. Tu li ser wê hêviyê yî ku bi saya PRP careke din bibî parlementer, lê tu şaş dibî. Ewê demek bê ku tuê nikaribî bi zarê (devê) xwe gotina "Kurd" bêjî ...". Paşê Nûrî Dersîmî gotina xwe dûmayî kir : "Em divên ji vê ferzendê karê kevn û pevgirêdanên xwe tevî Tirkan bidin birîn. Gava we ji Konfêransa Lozanê ra têlêgram şand, wê rojê we gora xwe kola" **(126, r. 189)**. Qewimandinên paşdemê nîşan da ku ew gotin çiqas aqilmend bûn.

Wê demê, ku Kurd ji rohilata Dersîmê hazir dibûn şoreşê bikin, çend lîderên Dersîmê ku dijî gelê xwe bûn şerrê hev dikir bona ku li meclisê cî bigirin. Ev hemû, helbet, ji hukûmetê ra dest dida ku ew yek bi kar bîne û siyaseta dijî Kurdan bide derbas kirin.

Di 9 çiriya paşîn 1925 da, Şêx Seîd çû bajarên Derexîn (Genc), Lice û Xaniyê û tê da rastî serokên Kurdan ên cî hat **(128, r. 131-132)**. Di 5 sibat da,

ew tevî 100 suwariyên çekdar û gelek serokan hat gundê Pîranê (11) û bû mêvanê birayê xwe Ebdulrehman. Xût li vira qewimandineke usa bû ku destpêka serhildanê da lez kirin.

Êvara wê rojê, desteyek ji 15 cendirme bi qumandarîya du zabitan hat gundê Pîranê û de'w ji Şêx Seîd kir ku 10 Kurdên ku di nava kuştinê da dihatin gunehkar kirin bide wê.

Di wan qewlan (şertan) da, gava ji her du aliyan desteyên çekdar dijî hev sekinîbûn, hevpeyivîn nikaribû vekirî bihatana derbas kirin, û di 8 sibat da, dema pevçûyînê çend cendirme hatin kuştin, lê yên mayîn bi serokatiya zabitê xwe dîl hatin girtin. Ew pevçûyîn ji wê da zûtir planên serhildanê tevî hev kirin.

Rast e, Şêx Seîd pey wê pevçûyînê hat ser wê bîr û baweriyê ku Kurd hela ne amade ne bona serhildana hemtomerî, ji wira çû ber bi Gencê bona ku qewimandinên li Pîranê bide lokal kirin. Lê birayê Şêx, Tahir, ku bi qewimandinên li Pîranê hesiyabû, di 10 sibat da posta li Licê dizî û bire gundê Serdiyê û di 11 sibat da tevî desteke ji 200 mirov hate Gencê, li bal Şêx Seîd, û dokument û perê dizî da wî. Ev her du qewimandin bûn bingeha destpêka serhildanê. Di nava van qewlan da, Şêx Seîd tenê dikaribû vê gotinê bêje : "Xuya ye ev bextê me ye" **(126, r. 176)**.

Şêx Seîd ku bû serokê serhildanê, tevî hevalbendên xwe û weke 10.000 esker di 14 sibat da Genc hilda **(128, r. 132)**.

Piştî ku Kurdan walî û karmendên Tirkiyê yên mayîn dîl girtin, serekeşîrê Modan, Feqî Hesen, waliyê Gencê hat xuya kirin. Bi imza Şêx Seîd zagona dizî hat weşandin, û li gora wê Genc paytextê Kurdistanê yê muweqqet dihat hesab kirin. Her Kurdek bû şervanê doza welêt û temamiya dîwanê ket bin destê Şêx Seîd.

Pêşmergan usa jî bang di derheqa hîçkirin-pûçkirina baca giran "aşar" da weşand. Dewsa wê yekê, wan

Institut kurde de Paris

bangî bineciyan dikir ku pêşmergan bi xurek va têr bikin. Ev mecala giring gelek bi dilê hemî gundiyên ku piraniya wan çek hilda û dijî nîrê dîwana Tirkiyê derketin bû (80, r. 54).

Plana teşkîlkirina serhildanê bi vî awayî bû : Şêx Seîd bû qumandarê hemû hêzên pêşmergan ên sereke, dewsgirtiyê (cîgir) Feqî Hesen ku li Gencê bû bû. Şêx Seîd diviya hemû desteyên xwe berevî Telalê bikira û wan amade bikira bona êrîşî Diyarbekirê bikin. Du sebebên hîmlî hebûn ku bi zevtkirina Diyarbekirê va girêdayî bûn : berê hertiştî, Diyarbekir wek paytextê paşerojê yê dewleta Kurdan a serbest dihat hesab kirin. Loma jî serokên serhildanê bi zevtkirina Diyarbekirê diviyan di derheqa sazkirina Kurdistana serbest da agahdarî bidana. Ya duduyan, ew vekirî dikaribû alîkariya testîqkirina danûstendinan tevî welatên derve ku serokên Kurdan ji wan hêvî dikir ku alîkariya eskerî û maddî bistînin bikira. Serkarîkirina xebata propagandayê û civandina kaniyên maddî û mirovî danîbûn ser Şêx Ibrahîmê ji Çanê (147, r. 40-41).

Ev hemû di derheqa wê yekê da dibêje ku serhildan di demeke dirêj da dihat amade kirin û ew ji pevçûyînên di navbera cendirman û Kurdan da dest pê ne bû. Ew isbat gelek hewaskar e ku Şêx Seîd ku karê propagandayê dikir, di nava bineciyan da bangên ku di weşanxana dewletê da hatibûn çap kirin belav dikirin.

Di nava demeke kurt da, serhildan li ser 14 wilayetên welêt ên rohilat û başûrê rohilatê hat belav kirin (116, r. 308).

Çend faktor alîkariya vekirina destpêka serhildanê kir :

a) Bi awakî vekirî bijartina navça serhildanê. Şerr ji navçekê derbasî navçeke mayîn dibû û ew yek serdestî dida pêşmergan û karê eskerên hukûmetê dida dijwar kirin.

b) Teşkîla navça serhildanê ya etnîkî ya destdayî : li wan wilayetên ku şerr diçû, ji 600.000 bêtir Kurd diman.

Institut kurde de Paris

Di bin destê me da malûmatên resmî di derheqa teşkîla navçeyên Anatolya rohilatî ya etnîkî di dema destpêka serhildanê da, ango di sala 1925 da, tu nene. Loma jî emê ber bi hesabkirina bineciyên sala 1927 bibin.

Hesabkirina bineciyên sala 1927 jimara Tirkan û Kurdan li wan wilayetên ku şerr pêş da diçû anî meydanê **(41, r. 70-71)**. Ew yek ji navnîşa jêrîn xuya dibe :

| Wilayet | Jimara binec. | Tirk | Kurd | % bin. kurd |
|---|---|---|---|---|
| Bazîd | 104.586 | 43.570 | 60.928 | 58 |
| Bitlîs (Mûş) | 90.631 | 20.689 | 67.678 | 75 |
| Diyarbekir | 194.316 | 56.151 | 132.209 | 69 |
| Elazîz | 213.777 | 97.657 | 112.493 | 53 |
| Hekkarî | 24.980 | 1.044 | 17.005 | 69 |
| Mêrdîn | 183.471 | 11.864 | 109.841 | 61 |
| Sîîrt | 102.433 | 5.479 | 75.962 | 75 |
| Wan | 75.329 | 17.399 | 57.723 | 77 |
| ------ | ------------ | ------ | ------- | -------- |
| Serhevdu | 989.523 | 253.853 | 633.837 | 67 |

Divê ku em bidin zanîn ku di dema destpêka serhildanê da, wilayetên ku me li jor nîşan dan piranî bûn. Çawa ku bi hovîtî serhildan hat hincirandin û bi destê zorê ciyên Kurdan hatin şihitandin, usa jî li wê navçê cîwarkirina mihacirên tirk nisbeta (%) Kurdan kêmtir û ya Tirkan bêtir kir. Lê dîsa jî, li wan wilayetan, Kurd weke 640.000 mirov bûn, lê Tirk 250.000, ango 2,5 car kêmtir, bûn. Bilî wê, li navça serhildanê weke 100.000 Çerkez, Ereb, Aşûrî û milletên mayîn ên biçûk dijiyan.

Ev hemû helbet alîkariya pêşketina serhildanê dikir.

"Temamiya Kurdistanê bi agirê serhildanê va gîro bû û bona navçên rohilatê doz pêş da dianî, Tirkiya cahil dihejiya-dilerizî ...", Armstrong nivîsiye **(154, r. 264)**.

2. Pêşdaçûyîna serhildanê

Di 16 sibat da, Şêx Seîd ji Derexanê hate Gencê, kete nava qumandariya desteyên Hecî Hesen û Omer Faro, rastî eşîrên Mistan û Botan hat, li desteyên Salih Beg (ji Xaniyê) qesidî, bi riya gellyê Xanî berê xwe da Diyarbekirê. Di 28 sibat da, dora Diyarbekirê desteke Şêx Şemseddîn a mezin gihîşte wî. Birayê Seîd, tevî Şêx Eyyûb ku di desteya wî da 500 esker hebûn, ber bi Erganiyê liviyan. Di 28 sibat da, Şêx Seîd gihîşte wargê Talayê (başûrê Diyarbekirê) û barêgeha xwe li wira cîwar kir. Di ordiya wî da, wê demê, weke 20.000 mirov hebûn **(128, r. 133)**. Li vira ew ji hêzên Kurdan, ên ku li navçeyên Mêrdîn, Erganî, Sîwerek û Madenê şerr dikir, li benda malûmatan bûn.

Divê ku bê zanîn ku Kurdan di dema pêşîn da zora êrîşkirinên eskerên hukûmetê dibir. Di bin destê Şêx Seîd da tenê desteyên eşîrên Kurdan ku serokatiya wan şêx, serekeşîr û zabitên ku ji qulixê ordiya Tirkiyê derketibûn dikir. Kurd çiqas pêş da diçûn, bineciyên cî jî digihîştin wan. Pey hildana her wargeheke jiyînê, li wira admînîstrasyoneke nuh ku herdem nîn bû û ku baş serokatî dikir dihate damezrandin. Lê divê bê zanîn ku ji destpêka serhildanê heta dema ku kabîneta Ismet Paşa hat ser hukm (3 adar 1925), serdestiya eskerî li aliyê Kurdan bû. Ew bêtir bi wê yekê va dihate şirove kirin ku piraniya bineciyên wargên ku şerr lê diqewimî Kurd bûn û li bin hukmê Şêx Seîd û alîgirên wî bûn. Tevî wê yekê, Şêx Seîd slogana parastina olperestiyê ji hukumdarên Ankarê yên "ne emîn" radikir ser planên pêşîn, û bi wê yekê va armanca serhildanê yên rast - sazkirina Kurdistana serbest bi paytextê Diyarbekirê va - ji gel vedişart. Aliyê vê siyasetê yê ne baş jî hebû : gelek serokên Kurdan guhdariya lazim ne dida ser kampanya Şêx Seîd a olperestiyê, ne dixwest şerr her tenê bo navê "qedirgirtina olperestiyê-dîndariyê" bikin. Em dibêjin ku eşîrên Kurdan ên Dersîm û Mûşê tevî wê serhildanê ne bûn, lê hazir bûn ku şerkariyê bona sazkirina dewleta Kurdan bikin **(147, r. 83)**.

Serokên Kurdan dixwest ku pey zevtkirina Diyarbekirê dewleta serbest îlan bikin. Lê Diyarbekirê riya şervaniyê usa da guhastin ku bona kara dîwana Tirkiyê bû.

Şêx Seîd derc dikir ku hêzên wî têr ne dikir bona ku di destê xwe da Diyarbekirê hilde. Loma jî wî, tevî nûnerên dîwana Tirkiyê, dest bi hevpeyvînan kir, bona ku zeman derbas bibe û ferzend bide niştimanperwerên Kurd ku xût li Diyarbekirê isyan bikin. Tevî vê yekê, mufettişê ordiyê, Kazim Paşa (Orbay), walî Elî Cemal (Bardakçi) û qumandarê korpusê Mursel Paşa, ku hemû wergehên stratêjîk ên bajêr kirin bin destê xwe, li benda wê yekê bûn ku dîsa ewê eskerên hukûmetê bên. Dîwan berk sekinîbû û çek dida bineciyan. Bajar tenê bi eskerên hukûmetê va li ber xwe dida. Ji ber ku qumandarîya Tirkan berk dijî wê yekê bû ku bajêr bide der. Şêx Seîd di destpêka meha adarê da biryar qebûl kir ku dest bi êrîşkirina ser Diyarbekirê bike. Desteyên Kurdan ên sist çekkirî ji her alî dicedand ku bi şerr dakute bajêr. Êrîşkirin di 2 adar da dest pê kir. Bi şev, desteya eskerên Kurdan ên bijare bi riya dergê Mêrdînê kete bajêr û gihîşte terefdarên Şêx Seîd yên ku di bin sloganên "Bira bijî serxwebûn !", "Bira bijî Kurdistan !", dijî hêzên Tirkan ên pirjimar şerr dikir (108, r. 247). Ji ruyê şerrê giran û newekhev, 150 eskerên Kurdan hatin qir kirin, yên mayîn jî bi şev ji bajêr derketin, an jî çûn malên xwe.

Pey ceribandina ne vekirî, ku wan dixwest ku pê Diyarbekir hildin, Şêx Seîd ferman da ku xwe paş da vekişin. Şêx Seîd, ku dema mehkemê di derheqa paşeroja serhildanê da (li Diyarbekirê) peyivî, got : "Dû wê yekê, gava êrîşkirina me pêk ne hat, me biryar kir ku paş da vekişin. Min eskerên xwe di şeş rojan da şande malê, lê bixwe hatim navça Qerzerê. Ez li wira 5-6 roj mam. Eskerên ku min şandibûn malê, pey 8 rojan vegeriyan. Wê demê ez li gundê Tilxamê bûm. Em bi şev ber bi Sîwerekê liviyan. Tenê riya ber bi Mêrdînê vekirî mabû. Ji wira eskerên hukûmetê ber bi Diyarbekirê diliviyan.

û me bona pêşîgirtina wan gundên Dêgêcûk, Cebar, Hecî-Leylik, Gavzedan û Qerekilîse zevt kirin. Em li vira pê hesiyan ku ji Sîwerekê hêzên polîs tên (ew desteyên Kurdên Zaza bûn), usa jî dîvîzyona Tirkan a suwarî dihat. Min 300 esker şandin pêşiya wan. Wan eskerên hukûmetê hincirandin, bera wan dan û 80 mirovên ji eşîra "Zaza" dîl girtin" **(147, r. 87)**.

Rast e, pêşmerge carna digihîştin serî, lê rewşa wan çiqas diçû hîn pîstir dibû. Ji bakur 40.000 eskerên hukûmetê, ji başûr jî 30.000 esker zora pêşmergan dibir **(109, r. 313)**. Di wê rewşê da, Şêx Seîd ji ciyê badîhewa hereket dirêt bona civandina tevgerên serokên Kurdan û kaniyên maddî û mirovî, bona pakkirina halê şerkariya pêşmergan.

Şêx Seîd ji birayê xwe Ebdulrehman û Şêx Ismaîl ra ewha nivîsî : "Roja îniyê, saet 4, min nama we ya 15 adar 1925 stend. Min li wira usa jî nama Şêx Mehmet Reşîd dît. Hûn dibêjin ku Pozan Axa û Şêx Eyyûb hatine Qerebaxçê, û hûn dixwazin ku ez jî bêm wê derê. Min jî dixwest serîkî li we bixim, lê min hema Reşîd Axayê hêja, tevî 100 suwariyan, şande pêşeniya rohilatê û, eger Xwedê hez kir, îro eşîra Tergiyan jî divê bê; ezê wan jî bişînim pêşeniyê. Min usa jî Şêx Tahir û Şêx Serac şandin navçan bona ku hinek eskerên hukûmetê bînin hêla xwe. Ew hîn venegeriyane. Hema ku ew vegerin, ezê li vira her mecal pêk bînim bona ku bêm navçeyên we û tevî Pozan Axa û Şêx Eyyûb bipeyivim. Ez temiyê didim eskerên me ku ber bi hêr bin û wesiyeta min ew e ku xwe anegorî şerîetê xwedî bikin. Ew mirovên ku hebûn û heywanên musulmanan bidizin ewê guneheki mezin bikin. Lê, wek min di nama berê da jî nivîsîbû, dema pêwîst be, ew dikarin xurek li embaran berhev bikin û dewsa wê dokumenta di derheqa stendina wê da bistînin. Paşê emê an dewsa wê xurek bidin, an jî emê pere bidin ... Xulamê eskerên Mehmed Seîd El-Neqşbendî" **(185, 27.IV.1925)**.

Lê êdî hîç tişt nikaribû pêşiya êrîşkirinên hêzên Tirkan bigirta, hereketên qumandariya pêşmergan

Institut kurde de Paris

bergê tiştekî ne digirt. Hema wê demê eskerên hukûmetê yên ku dest pê kir berê desteyên Şêx Seîd bidin ber bi geliyê Xanî nêzîkî Diyarbekirê bûn. Li vira desteyên Ebdulrehman jî, ku bera wan dabû, gihîştin wan. Dû berxwedana kurt, pêşmerge mecbûr bûn dagerin Daraxînê, lê ji wira jî belayî ser çend komikên mezin bûn û li daristanên navçeyên Genc, Palû û Çapakçûrê (Bingolê) xwe veşart. Şêx Seîd , tevî şêxên eşîrên cihê-cihê, Daraxîn terk kir û di 27 adar da hat Çapakçûrê, ku tê da li hêviya Abdullah, Şafî û şêxên mayîn ku diviyan ji Elazîz, Kîgî û Wartoyê bihatana bû (128, r. 134).

Hela di 26 adar da, eskerên Tirkan ên hukûmetê êrîşeke mezin bir ser Diyarbekir, Warto û Elazîzê. Di wî şerrî da, korpusa 9mîn a Warto zevt kir. Qumandariya Tirkan dixwest ku dora pêşmergan bigire û nehêle ku ew herin Iraq, Sûriye û Îranê (117, r. 226).

Qumandarê navça duduyan ku Elazîz û erdê dora wê diket nav wê Şêx Şerîf (ji Gökderê) bû. Eşîrên navçeyên Şakî-Warto û Çapakçûrê, eşîrên zaza ji Gökder û Paluyê, usa jî berên Musiyan, Okçiyan û Azan di bin qolê wî da bûn. Di 21 sibat da, Şêx Şerîf qezayê Paluyê hilda û di 5 adar da nêzîkî Elazîzê bû. Pareke bajarvanên Elazîzê yên bi nav û deng li hêla pêşmergan bûn û hîşt ku ew bikevin bajêr. Kurdan nûnerên hukûmetê dîl girtin, girtî aza kirin, kîlerên çekan û cebirxanan zevt kirin (128, r. 135).

Şêx Şerîf li wargê jiyînê yê Huseynîkê rastî parlementerê meclisê yê berê Hesen Xeyrî hat û pê ra peyivî. Di 6 adar da, wî Muftî Mehmet Efendî wek waliyê Elazîzê kifş kir û bi qolê xwe û yê Hesen Xeyrî têlêgrameke ewha da serekeşîrên Dersîmê : "Tevî hev bin, mulayim bin, emê zûtir bi dêlêgasyonekê bên Dersîmê. Em ji we ra serketinê dixwazin" (126, r. 180).

Tebiya Hesen Xeyrî ya bi dilê Tirkan û têlêgramên wî yên dilhêsakirinê ziyaneke mezin da şerkariya Kurdan a partîzaniyê. Di 16 Adar da, pareke derebegên Dersîma Roava hate Diyarbekirê û piştgiriya xwe di

hindava hukûmetê da îlan kir, lê hinek eşîrên Dersima Rohilatê jimara wan desteyên xwe ku di nava eskerên Tirkan da bûn zêde kir û piştgiriya wan dikir (147, r. 87).

Parlementerê meclisa gazîkirina pêşîn, Diyap Axa, gava ku tevî rojnamevanê rojnama "Vakıt" di derheqa tebiya serekeşîrên Dersîmê da dipeyive, nîşan dide ku ew hema di destpêka serhildanê da dijî Şêx Seîd derketin û çûn aliyê hukûmetê (235, 27.V.1925). Ev yek serketina Kemaliyan a bêhempa bû.

Wê demê, gava bawer bike temamiya Kurdistanê dijî dîwana Tirkan rabû, Dersîmiyan xwe bêteref girtibû.

Rewşa ewha bi dilê planên hukûmeta Tirkiyê ku dixwest dutîretiyê-dubendiyê bixe nava Kurdan, par-par şerkariya azadiyê li Kurdistanê bihincirîne, bû. Gava di paşdemê da ew plan li temamiya Kurdistanê (bilî Dersîmê) hat pêk anîn, bi fermana Mustafa Kemal, Hesen Xeyrî û biraziyê wî Celal Mehmet hatin girtin û li Elazîzê dar da kirin, li daraxacê xistin (126, r. 187).

Lê divê bê ronahî kirin ku ne hemû lîderên Kurdan li Dersîmê bi hukûmetê ra bûne yek. Hela bi ser da, hinek ji wan dixwest bigihîjin pêşmergan. Ji bo nimûnê, Seyid Riza li ser wê baweriyê bû ku Şêx Şerîf ewê pey hildana Elazîzê ber bi Meletyê bilive, lê ewê ji wek serokên eşîrên Erzincan û Koçgirî berê xwe bide Sîvasê. Lê wê demê pareskerên dîvîzyona 5mîn, ku Kazım Paşa serokatiya wê dikir, dest bi êrîşkirina li ser Elazîzê kir. Xiringêle, bi dizî derevekirina malan, neqayilbûna di navbera serokên Kurdan da, ku li Elazîzê dest pê kiribû, usa jî ew yek ku pareke serekeşîrên Elazîzê derbasî hêla Tirkan bûn, alîkariya êrîşkirina eskerên hukûmetê kir.

Serekê eşîra Şabanan, Necîb Axa (ji Oxê), beglerên Kurdan ên Elazîzê, eşîrên Dersîma Rohilatê yên wek Xwêran, Lolan, Îzolan, Sûran bi serokatiya mellê xwe Doğan Dedeoğlu, ji sozdayînên qumandariya Tirkan bawer kir û ji pişt da li hêzên pêşmergên



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

Şêx Şerîf xist. Ji ruyê wê yekê, di 1 nîsan 1925 da, pêşmerge mecbûr man paş da vegerin Paluyê ku eskerên Kazim Paşa yê hukûmetê nêzîkî wê dibûn (126, r. 187). Piraniya Kurdan (weke 5.000 mirov) daket geliyê Mendo û li wira hesar çêkir û dîvîzyona Kazim Paşa ya 5mîn ket nava dorgirtinê. Di 3 nîsan da, li geliyê dest bi şerrê giran ku tam rojek kişand bû. Rast e, Kurdan bi mêrxasî şerr dikir, lê li dawiyê mecbûr bûn ji geliyê derkevin û xwe li daristanên nêzîk veşêrin, lê Şêx Şerîf, tevî çend alîgir û piştmêrên xwe, berê xwe da Çapakçûrê, bona xwe bigihîne Şêx Seîd. Di 6 nîsan da, eskerên hukûmetê ketin Çapakçûrê û Şêx Seîd bi 300 suwariyên xwe mecbûr bû ku berê xwe bide Solxanê. Kazim Paşa, ku serhildan li navça Çapakçûrê da hincirandin, ew ax teslîmî qumandarê alaya 8mîn a qaymeqam Samî Beg ku ji Erzurûmê hatibû kir, lê bixwe vegeriya Paluyê (128, r. 135-136).

Serokatî li navça serhildanê ya siyemîn Şêx Mustefa û Şêx Ibrahîm (her du jî ji Çanê) dikir. Di 17 sibat da, wan qezayê Çapakçûrê zevt kir û Şêx Hesen (ji Çanê) wek qaymeqamê bajêr kifş kir. Di 20 sibat da, ew bi 2.000 eskerên xwe va ketin qezayê Kîgiyê. Qumandariya Tirkan korpusa ordiyê ya 8mîn dijî Kurdan derxist. lê pareskerên wê ji ruyê nenasbûna cî da der û hatin şkandin.

Eşîra Xormekan hat hawara Tirkan. Serokê wê eşîrê, Küçük Ağaoğlu Mehmed Hulyusi Efendi, desteke ji 300 mirovên çekdar dijî pêşmergan derxist. Birayê wî Elî Kemal bi desteya xwe ya ji 100 mirovî li pişta Kurdan xist. Loma jî pêşmerge mecbûr bûn paş da vegerin Senceqê, lê li vira jî desteyên eşîra Xormekan bêbextî li wan kir û eskerên hukûmetê jî hatin hawara wan. Qaymeqam Selîm Beg ku bi alaya xwe ji çiyayên Xirkal û Çavreş ra derbas bû, di 5 nîsan da hat besta Karliovayê û xwe gihand pareskerên ji eşîra Xormekan. Eskerên hukûmetê, tevî eşîrên Kurdan ên bi wan emîn, li besta Karliova zora Kurdan, ku piraniya wan ji eşîra Cibran bû û serokên wan Baba û Xeto bi 50 suwarî va dageriyan navça Solxanê û wergê Eşek-Meydanê, xwe gihand Şêx Seîd, bir.



Institut kurde de Paris

Serokên Tirkan bi têlêgrafê razîbûna xwe da bineciyên Kîgiyê û serekeşîrên Xormekan, bona wê alîkariya ku wan da eskerên hukûmetê. Têlêgram bi navê serokê komara Tirkiyê, Mustefa Kemal, û qumandarê dîvîzyona 11mîn a Osman Nûrî hatibûn şandin (128, r. 137-138).

Navçeya çaran a serhildanê, serokatî tê da Ebdullah (ji Melekanê), serhing Hesenanli Xalit Beg, Elî Riza û axayên eşîra Cibran dikir. Di nava demeke kurt da, pêşmergan Solxan, Gönuk, Warto, Melezgir û Mûş xistin bin destên xwe. Şêx Ebdullah dixwest Erzurûm jî hilde, paşê tevî Hesenanli Xalit Beg û Elî Riza Bitlîs hilde û Cibranli Xalit aza bike. Bîr û bawerîyên Cibranli Xalit Beg ên azadarîyê hukmekî gelek mezin li ser Kurdên wê navçeyê ku dixwest Cibranli Xalit Beg aza bikin û bigihîjin Kurdên rex sînorê Iraqê hişt.

Di 11 adar 1925 da, pêşmergan, bi serokatiya Şêx Ebdullah, bi şerrekî giran ketin Wartoyê. Rojtira din, Şêx Ebdullah nûnerên xwe şandin bal serekeşîrên Xormekan û pêşdanîn dikir ku bigihîjin wî. Eger ew qayil bûna, ewê serkarîkirina Warto û Mûşê bida wan. Lê serekeşîrên Xormekan ew pêşdanîn qebûl ne kir û hema wê rojê ber bi qumandarê desta Tirkan li Xinusê bûn û hêvî jê kir ku çek bide wan. Qumandariya Tirkan di destê xwe da daxwaziya wan pêk anî.

Pênc roj ji wê demê derbas bûn, gava ku pêşmergan qezayê Wartoyê hilda. Şêx Ebdullah, ku pareke mirov li bajêr hişt, serokatî li desteya ji 100 mirovî kir û berê xwe da ber bi geliyê Arpadêrêsiyê, lê ji aliyê eşîrên Xormek, Çerek û Lolan, usa jî cendirmên Tirkan ji Xinusê hat sekinandin.

Pey wê yekê, pêşmergan derc (fehm) kir ku ew nikarin ji geliyê Arpadêrêsiyê ra derbas bin. Loma jî di 19 adar 1925 da, 200 pêşmerge, bi serokatiya birayên Cibranli Xalît - Selîm û Ahmed - ji Wartoyê derketin û xwe gihandin Hesenanli Xalit ku li qezayê Melezgirê bû.

Ji ruyê wan ferzendan, ku qumandariya Tirkiyê pêk anîbûn, pêşmergan nikaribû navçeyên Bitlîs û Mûşê

hildin. Pey şerrê rex çemê Muradê, serokên Komîta Serbestiya Kurdistanê, Cibranli Xalit Beg, Hecî Mûsa Beg û Yûsif Ziya Beg, bi biryara mehkema eskerî cezayê gullekirinê stend **(145, r. 83)**.

Şêx Ebdullah, ku di derheqa dardakirina mîlîtanên Kurdan ên siyasî yên bi nav û deng da bihîst, tevî serekeşîrên Cibran gelek hêzên pêşmergan berhev kirin û di 20 adar 1925 da li rex gundê Söylemezê (qezayê Xinusê) hesar çê kir û bela da pareskerên alaya 34 ya dîvîzyona tirkî ya 12mîn, ew hincirandin. Lê hêz weke hev nîn bûn, û pêşmerge mecbûrî paş da vegeriyan.

Di 22 adar 1925 da, li rex Arpadêrêsê, dîsa şerrekî giran qewimî, lê Kurd dîsa mecbûr bûn paş da vegerin. Qumandarê dîvîzyona 12mîn a Osman Paşa, ku serhildanan li navçeya Wartoyê hincirandin, karê xwe dikir ku di şerrekî pêşmergeyî yê din da bi ser bikeve.

Di 27 adar 1925 da, Hesenanli Xalit, Elî Riza, birayên Cibranli Xalit û çend serokên Kurdan ên mayîn, tevî desteya xwe ya bi 1.000 suwarî va, pey êrîşkirina şkestî **128, r. 143-145)**, mecbûr bûn ber bi rohilatê paş da vegerin. Wê demê, hêzên Tirkan, ku li Qerekosê bûn, bi alîkariya serekeşîrê Heyderiyan, tevî pêşmergan ketin nava şerrekî nuh. Pey wî şerrî, Hesenanli Xalit Beg, tevî alîgirên xwe, ji tixûbê Îranê derbas bû û berê xwe da Makuyê. Hukûmeta Îranê bi agir-alav pêşmergeyên Kurdan qebûl kirin. Di nava şerr da, kurê Hesenanli Xalit Beg - Şemseddîn -, kurê Şêx Seîd - Abbaseddîn -, serokê eşîra Zergan - Kerem - û gelekên mayîn hatin kuştin **(126, r. 179)**. Pey wî şerrî ra, Hesenanli Xalit Beg û Elî Riza tevî eskerên mayîn gihîştin serokê Kurdan, Sîmko **(12)**.

Sebeba şkestina Kurdên usyanvan ew bû ku li hemû navçan ew tevgerên eskerî-admînîstratîf û siyasî yên berk ku komên Tirkiyê yên serkarîkir bona ku serhildanê bihincirînin pêk anîn.

### 3. Ferzendên zagondarî û admînîstratîf-eskerî bona hincirandina serhildanê

Wek ku li jor hatibû xuya kirin, pêşiyê serhildan ewqas zû li ser wilayetên welêt ên rohilat û başûr-rohilatê hat belav kirin ku dîwana tirkiyê pê bawer ne dikir. Rast e, hukûmeta Tirkiyê di derheqa şerkariya Kurdan li rohilata welêt da dizanîbû, lê dîsa jî zora serhildanê bona Tirkan tişteki ecêb bû. Ew yek bi wan agahdariyên optîmîst ên weşanê dihat zanîn; usa jî ew yek mefayê wê bû ku nûnerên hukûmetê yên resmî bi kubar-babaxî di derheqa hincirandina bi lez û bez a "şerkariya şêxên rêaksyonêr" da agahdarî dida.

Usa, di 18 sibat 1925 da, di civîna meclisa wezîrê karên hundirî da, wî ewha bersîva parlementerekî da : "Li Gencê qaçaxekî bi navê Şêx Seîd peyda bûye. Wî tevî terefdarên xwe yên li navçeyê dest bi talanê kiriye. Lê bi destê ferzendên hukûmeta jîr û zîrek ewê zûtir bê girtin" (124, r. 39). Tevî wê yekê, agahdariya balyozê Tirkiyê li Moskovê, Enîs Beg, jî ku daye xebatkarê ROSTÊ, gelek hewaskar e : "... ew serhildan tu qeziye bona welêt pêş da nayne. Şêx Seîd li bin sloganên dîndarî-olperestiyê xwe veşartiye û bi wî navî jî pêş da tê. Loma jî dikare biqewime ku li Tirkiyê ewê hinek rêaksyonêrên ku ewê piştgiriya şerkariya Şêx Seîd bigirin peyda bibin. Lê piraniya gel ewê dijî wî derkeve ... Ez şikber nîn im ku serhildana Aşûriyan a par ji aliyê hukûmetê hat temirandin, usa jî ewê serhildana nuha ya bi serokatiya Şêx Seîd tam bê hincirandin" (178, 1.3.1925).

Agahdariyên serokên Tirkiyê yên resmî di derheqa qewimandinên Rohilata welêt da awha bûn. Wan, ku temamiya giringbûna wê rewşê derc dikir, dîsa jî hemû ferzend bi kar dianîn bona hincirandina serhildanê.

Di 21 sibat 1925 da, bi teklîfkirina Mustefa Kemal, Ismet Paşa bi lez ji Stembolê hat Ankarê. M. Kemal, tevî serokên Tirkiyê yên mayîn, li meydana xeta hesin çû pêşiya wî (147, r. 12). Tenê serekwezîr Fethî Beg ne di nava wan da bû.

Hatina Ismet Paşa bo Ankarê li welêt bi cûrên cihê hat qebûl kirin. Rast e, Ismet Paşa di cotmeh 1924 da ji qulixa serekwezîr derket, lê ew dîsa wek cîgirê serokê Partiya Gel a Komarî yê sereke dima. Weşana resmî di derheqa hatina Ismet Paşa da dinivîsî ku ew hatiye ji bo ku li Ankarê "bigere", rastî hevalên xwe yê hukûmetê bê, bibe mêvanê meclis û Partiya Gel a Komarî, ku piştre ewê vegere Stembolê û li wê derê bê qenc kirin (147, r. 14).

Lê çûbûna serokê komarê bixwe pêşiya Ismet Paşa bala mexlûqetiya welêt, ku nizanîbû ku ev tedbîra guherandinên di nava hukûmetê da dikin, bi şikberî ne dikişand.

Rast e, weşanê dîsa agahdariyên awa-awa di derheqa qewimandinên Gencê da diweşandin, lê pêşmergan wê demê gelek erd zevt kiribûn û bi awakî aktîf dijî eskerên hukûmetê şerr dikir. Di derheqa vê yekê da, M. Kemal dest xwe da pey hatina Ismet Paşa bo Ankarê, jê ra şirove kir. Dema peyva wan hat xuya kirin ku serekwezîr Fethî Beg li ser wê bîr û baweriyê nîn e, ku dîtina wî ew e ku serhildana Kurdan qewimandineke lokal e û ku divê rewşê hişk nekin. Pey peyvên demdirêj, her du lîderên Tirkan hatin ser wê fikrê ku pêwîst e mecalên bi lez pêk bînin bona hincirandina serhildana Kurdan û her pêşdahatineke dijî hukûmetê, her karkirineke muxalefetê li welêt. Hema wê rojê, serokê komara Tirkiyê Ismet Paşa teklîfî şîvê ku tê da serokê meclisê Kazim Paşa jî hazir bû kir. Sê berpirsiyarên eskerî li mecal-ferzend dinihêrî ku, bi fikra wan, dikaribû qebûl bikirana.

Rojetira mayîn, roja yekşemê, 22 sibat 1925 (wê demê roja rehetiyê dîsa roja înîyê bû), civîna fraksyona parlementê ya Partiya Gel a Komarî hat derbas kirin. Wê civînê li pirsa monopoliya tutunê dinihêrî û bi şeklî giva di derheqa qewimandinên li rohilata welêt da nîn bû. Lê ew civîn ji aliyê M. Kemal hat bi kar anîn bona pevguhastina fikr û baweriyên wezîr û parlementeran. Hema wê rojê, M. Kemal dîsa gazî Ismet Paşa li bal xwe kir, usa jî gazî

Kazim Paşa, serekwezîr Fethî Beg, kir. Vê carê peyv di derheqa serhildana Şêx Seîd û mecalên hincirandina wê da bû. Di peyvê da, du fikir pêş da hatin. M. Kemal û Ismet Paşa (Mehmut Esat Beg, Ihsan Beg û hinekên din ên hukûmetê piştgiriya wan kir) alîgirên wê yekê bûn ku divê mecalên berk pêk bînin bona hincirandina serhildanê. Lê Fethî Beg dijî zêdekirina çapên serhildanê, xwezma zêdenivîsîna weşanê, bû. Usa jî ew li ser wê fikrê bû ku hinek mirov dixwazin hişkbûna polîtîka welêt bidin xurt kirin.

Şev dereng, 22 sibatê, bi serokatiya serok civîna wezîran hat derbas kirin. Serekê barêgeha sereke, Fewzî Paşa (Çeqmaq), jî tevî civînê bû. Di wê civînê da hukûmetê biryar qebûl kir ku navça serhildanê wek rewşa sirêder li ser mehekê îlan bike. Lê anegorî miqala Destûra Komara Tirkiyê N° 86, ew biryar divê ji aliyê meclis bihata testîq kirin. Loma jî ew biryar bi gotina Fethî Beg hema wê şevê ji meclisê ra hate şandin bona testîqkirinê. Di biryarê da dihate gotin ku "serhildana dijî hêzên hukûmetê yên çekdar ji wilayeta Erganiyê dest pê bûye û belav bûye ser wilayetên Diyarbekir, Elazîz û Gencê. Ji ber ku wek tê dîtin, ewê li wilayetên Mûş, Dersîm, Mêrdîn, Urfa, Sîwerek, Siirt, Bitlîs, Wan û Hekkarî, usa jî qezayên Kîgî û Xinisê belav be, rewşa eskerî li ser mehekê hat îlan kirin" **(206, 24.2.1925)**. Meclisê ew biryara hukûmetê eciband. Anegorî wê biryarê, li wan wilayetên ku tê da rewşa eskerî hatiye îlan kirin, mehkemên eskerî ku ewê li hemû gunehkariyên girêdayî şerkariya partîzaniyê binihêrin hatine saz kirin.

Di 24 sibat da, civîna koma parlementerên Paritiya Gel a Komarî bû. Tê da serokê hukûmetê Fethî Beg û wezîrê karên derve Cemîl Beg bi şirovekirinên di derheqa qewimandinên Gencê da pêş da hatin. Serekwezîr êdî wek berê di derheqa "qaçaxiyê" da ne dipeyivî, lê tenê "di xeyseta serhildana rêaksyonêr da" dipeyivî. Paşê, li civînê, banga Şêx Seîd ku tê da giva gazî gel dikir, bona sazkirina Kurdistana serbest, ji bo dasekinandina Xelîfetê, testîqkirina

Institut kurde de Paris

normên "şerîetê", usa jî bona şerkariya ji bo avêtina dîwana "atêîzmê", hat xwendin (147, r. 22). Hemû peyvên serhildanê wek rêaksyonêr, ku nemaze "ji fanatîzma Kurdan a dîndarî-olperestiyê" pêş da hatiye qîmet dikir. Usa jî dewletên derve helana pîs dane wê. Piraniya weşana Tirkiyê jî bang dikir ku mecalên herî bi hovîtî pêk bînin bona hincirandina Kurdan.

"Hissê niştimanperweriyê gelekî dûrî eşêrîn paşdemayî ye, "Akşam" nivîsiye, yekbûna dîn jî wan êdî bi hevdu ra nade girêdan ... Hema ku ew rastî hêzên eskerên hukûmetê, cebirxanan, topan, balafiran tên, desteyên wan (yên Kurdan) di dest xwe da ji hev belav dibin. Gava pêşîn ku divê bê kirin, hincirandina serhildanê bi destê esker e. Di wî alî da tu berdaxwerin, tu gunehpêanîn divê nebe. Ya duduyan, divê şaşiyên berê bidin hildan û organîzma admînîstratîf saz bikin ku bikaribe di her wergeke jiyanê da kar bike" (185, 26.2.1925).

Rojnama "Hukumiyeti milliye" bang dikir ku divê "şaşîtî" û "dilrehmî" ku giva dîwana Tirkiyê di hindava Kurdan da diyar dikir bên terk kirin. Wê dida bawer kirin ku "şerkariya talankirin û hilweşandinê ... ewê rastî şoreşa Tirkiyê ya mezin bê, ku tu qulçekî topa cihanê ne hiştiye ku zagonên wê ya ziyaretê bên pêpes kirin" (206, 24.2.1925).

"Tanin" hîn pêkhatî derket. "Tiştê tek-tenê ku divê em di vê rewşê da bikin ew e ku em serhildanê kokbir bikin. Sebebên pêşdahatin-destpêbûna serhildanê qet jî ne giring in : ew ji rêaksyona, helandayîna welatên derve, yan jî ji administrasyona me ya xirab dest pê bûye, hesab yek e ... Wê demê, gava agir li ban ketibû, ewê tiştekî dûrî aqilan bûya ku li sebebê agirpêketinê bigeriyana ... Gava li bedenê mirov nexweşiyek peyda dibe, berî her tiştî divê pêşiya belavbûna wê nexweşiyê bigirin ... Her derengîketinek dikare ne tenê rehetî û halxweşiya welêt bike bin qeziyê, lê usa jî heyetî û paşeroja wê. Fireh û zelal e ku emê dijî mirovên ji dîn-donê xwe, ku zarokên wan jî zarên vî welatî ne, şerr bikin; belê balafirên Tirkan ocaxên wan mirovan,

Institut kurde de Paris

ku mîna me "Tirk" in, dane ber gullan. Lê mixabin, çareke mayîn tu neye ku bikaribin welatê Tirkan ji pîsîtiyê paqij bikin" (230, 26.2.1925).

Lê ne hemû rojname bûn ku pêşniyar dikir ji heq-hesabê serhildanê bêne der. Hinek ji wan dicedand ku sebebên wê şirove bikin, usa jî mecalên admînîstratîf û civakî, ku dikaribû sebebên nerazîbûn-neqayilbûna bineciyên welêt ên kurd bidin hildan,pêş da dikişandin. Ji bo nimûnê, rojnama "Stembol" nivîsiye : Komara me ya nuh divê li her der propaganda xwe ya rêformê bide xurt kirin, û xwezma li qezayên welêt ên dûr. Ferzenda herî baş bona ku em bigihîjin wê armancê ew e ku administrasyona nuh li ser riya rast be, qayde-qanûn û bêqeziyabûnê biparêze, û helbet rewşa aborî bide pak kirin. Divê ji bîr nekin ku bendî tiştekî hesab kirin hîç ne baş e" (212, 24.2.1925).

Çend parlementerên meclisê jî di vekirina sebebên serhildanê ya resmî da, ku di civîna wê da xeysetê serhildana Kurdan a polîtîk da zanîn, ne parast. Ewha, li civîna meclisê, parlementer Eyyûb Sebrî Xoce (wilayeta Qonyayê) îlan kir ku musluman qet jî ne fanatîk in, ol û siyaset tiştên ji hevdu cihê ne. Lê Parlementer Derwîş Ilyas Samî Efendî (ji wilayeta Mûsilê) da zanîn ku serhildan bi bîr û baweriyên polîtîk pêş da hatiye, lê bi cûra xwe va dînî-olî ye. Bawer bike ku parlementer Hecî Ilyas Efendî (wilayeta Mûşê) jî li ser wê bîr û baweriyê bû. Bi niyeta wî, rast e, ew serhildan li ser bingeha dînî pêk hat û xuliqî, lê tevî wê yekê, xeyseta wê ya siyasî jî heye û loma jî kemaleke usa divê bidin wê, wek ku ew heye" (185, 24.2.1925).

Pey enenekirina rewşê li rohilata welêt, wezîrê edaletê, Mehmût Eset Beg, proja zagonê ku kabîna Fethî Beg amade kiribû xwend. Tê da dihate gotin :

1. Her kirineke ku dicedîne bi nivîsar yan bi zar (dev) hissên gel ên dîndariyê bo armancên xwe yên siyasî bi kar bîne, gunehkarî dijî welat tê hesibandin.

2. Ew hemû mirovên ku ol wek çek (bi nivîsar yan jî zar) bi kar tînin, komelên dîndariyê saz dikin,

usa jî gotaran diweşînin, an jî bi awakî mayîn dîn bona armancên xwe yên siyasî bi kar tînin, wek mirovên ku dewleta xwe firotine tên hesab kirin.

Piraniya parlementerên Partiya Gel a Komarî projeya wê zagonê eciband. Parlementer Alî Şûrûrî dijî wê derket û pêşniyar kir ku bihêlin ku parlementerên wilayetên rohilatê bipeyivin. Lê piraniya parlementeran ew pêşniyar qebûl ne kir. Li dawiyê, projeya zagonê bi dengdayîna parlementerên ji Partiya Gel a Komarî hat qebûl kirin **(212, 25.2.1925)**. Partiya Gel a Komarî bi resmî îlan kir ku ew bi tomerî hildayî ferzendên hukûmetê di dereca hincirandina şerkariya pêşmergan li Gencê da diecibîne û biryar kir ku bi her alî piştgirîya wê bike **(124, r. 47)**.

Di 25 sibatê da, meclis miqala zagonê ya Imîn di derheqa xayintiya di hindava welêt da, ku di 15 nîsan 1923 hatibû qebûl kirin, bi awakî nuh da guherandin (zagon N° 556). Li vira wê miqalê sazkirina rêxistinên siyasî yên li ser bingehên ol-dînî, herweha bikaranîna dîn bona mîaserkirina armancên xwe yên siyasî, qedexe kirin. Ew mirovên ku rêxistinên usa saz dikin yan jî dikevin nava wan, wek xayinên welêt tên hesibandin **(35, dîwan 6, r. 107)**.

Rojnamevan Necmeddîn Sadiq, ku li meclisê dema enenekirina projeya zagona N° 556 peyivî, nivîsî ku pey şirovekirin-axaftina bi Fethî Beg ra meclis hat ser bîr û baweriyê û yekîtiyê. Civîn, ku bi yek dengî dengê xwe da nivîsîna nuh ya miqala di derheqa xayintiya di hindava welêt da, isbat kir ku li ber pêşdahatina rêaksyonê hemû dubendî xwe li ber betave didin. "Îlana Kazim Qerebekir Paşa (ku muxalefet navê wî dike lîderê "pêşverûyan") - rojnamevan gotina xwe dûmayî dike - rast e, bi çepik hate qebûl kirin, lê dijwar e ku bikaribin wan çepikan bixin dilê dijminên Tirkiyê yên hundir û derve. Eger usa be, maqûlî û niştimanperweriya ku partiya nuh raber kirine, bi her awayî hêjayî pesinandinê ne" **(185, 27.2.1925)**.

Rojnamevanê din, Subhî Nûrî, ku di derheqa her du partiyan da dipeyive, di derheqa pirsa qîmetkirina

serhildana Kurdan da nivîsiye : "Peyvê Fethî Beg li meclisê di derheqa qewimandinên li Gencê û qalme-qalma Kazim Qerebekir di hindava pêşmergan da zelal nîşan da ku hîç ferq di navbera bernameyên partiya Pêşverû û ya Gel (PGP û PGR) da nîn e. Nemînanîhevbûn tenê di nava taktîkê da ne, usa jî di nava şerkariya di navbera mirovên zor da ne **(212, 2.2.1925)**.

Çawa jî hebe, divê ku em bidin zanîn ku komên Tirkiyê yên serokatiyê di pirsa hincirandina serhildana Kurdan da li ser siyaseta yekîtiyê nîn bûn. Cudabûna bîr û baweriyan, çawa ku di navbera PGR û PGP da, herweha jî di nava Partiya Gel a Komarî bixwe da xuya dibû. Di wê partiyê da, sê bawerî hebûn : yên bi hemdê xwe (mulayim, qenc), ên milletçî û yên "çep". Fethî Beg serokê yên mulayim bû. Ismet Paşa, ku M. Kemal jî piştgiriya wî dikir, serokê yên milletçî bû. Mehmût Eset jî serokê "çep"an bû. Milletçî, ku di nava serokatiya PGR da piranî bûn, li bendê bûn ku komika mulayiman ji serkarîkirina welêt dûrxin, lê usa jî wan dixwest ji heq-hesabên "pêşveruyan" bêne der.

Di wî alî da, serhildana Şêx Seîd zemanekî herî baş bû. Fethî Beg berî her tiştî di wê yekê da gunehkar bû ku wî serhildan avêtibû pişt guhê xwe. Bi wî ra di derheqa hal û demê serhildanê da rast şirove ne dikir, loma jî ew di hindava hincirandina serhildanê da berk nîn bû. Êdî di destpêka qewimandinan da ev tiştên sade xuya dibûn : pareke endamên PGR qestbende di derheqa qederê serhildanê da kêm çap dikir û hela bi ser da jî netabetiya xwe di hindava serhildanê da diyar dikir. Tebiya PRP jî, tuê bêjî ji nişka va bû ku hema di destpêkê da jî xwe lê girtibû. Eger ji berê wê her dijwariyeke hukûmetê ji bo rexnekirina wê bi kar dianî, nuha "pêşverûyan" di destê xwe da riya piştgirtina hukûmetê girt û ne tenê bona serhildanê li ber xwe ketin, lê usa jî haziriya xwe bona bi aktîvî vemirandina wê îlan kir. Lîderên PGP ew mecalên ku kabîna Fethî Beg pêş da kişandibûn ecibandin û di meclis û weşanê da bi îlanekê pêş da hatin ku

Institut kurde de Paris

dijî serhildanê derdiketin û soza piştgiriya tam didan hukûmetê.

Kazim Qerebekir, ku ji nav PRP pêş da dihat, digot ku ew tam bi hukûmetê ra qayil e gava ku ew wan mirovên ku dîn ji bo armancên xwe yên siyasî bi kar tînin xayin dihesibîne. Wî dida bawer kirin ku eger qeziyeke usa hebe ku ziyan û zerer ji derve û hundir bide welêt, hemû Tirk ewê amade bin, wek mirovek rabin ji bo parastina welêt **(230, 27.2.1925)**.

Komita PRP a navendî têlêgram ji komelên xwe yên endam ra şandin û tê da de'w dikir ku serhildanê wek rêaksyonêr qîmet bikin, ji ber ku partî dijî wan prensîpên ku serhildan dixwaze wan mîaser bike derdikeve **(124, r. 47)**.

Kazim Qerebekir bi têlêgram ber bi serkreterê sereke yê partiya xwe bû û tê da nivîsîbû : "Êdî tu şikberî tu neye : serhildana pêşmergan li Gencê ji aliyê komikeke rêaksyonêran ya ne mezin hatibû teşkîl kirin bona êrîş li ser yekîtiya millet û prensîpên komarê bikin. Em dijî hereketa wan ku dikarin tenê zererê bidin yekîtiya dewleta me ne. Me êdî talîmat dane şaxên xwe" **(230, 1.3.1925)**. Taktîka PRP ne tenê bi wê daxwaziyê dihat şirove kirin ku ji şerkariya Kurdan rizgar bibin, lê usa jî bangek bû ku haya we ji we hebe û xwe biparêzin. Serokatiya wê, helbet, di derheqa armancên alîgirên Ismet Paşa, ku niyeta wan ew bû ku qewimandinên li rohilata welêt bi kar bînin bona heta-hetayê ji heq-hesabê muxalefeta ku serê xwe bilind kiribû bên der, da zanîbû.

Ixlasbûna muxalefetê, ku wê di dema herî giran da di hindava hukûmetê da diyar kiribû, li bal wê para PRP ya mulayim ew fikr pêş da anî ku şikberiya li ser wê gelek hatiye zêde kirin û bê bingeh e. Lê piraniya PRP li ser bîr û baweriyeke mayîn bû. Wê tebiya muxalefetê tenê wek tewlebaziyeke ku li welêt aliyê wê bigirin hesab kir. Loma jî bi pêşniyara M. Kemal, Fethî Beg dû qebûlkirina zagon N° 556 bi lîderên PRP ra dest bi hevpeyvînan kir û temî dida wan ku ew partiya xwe bidin hilanîn. Em

Institut kurde de Paris

rohnî bikin ku rêxistinên wê partiyê li wan navçên serhildanê tu nebûn. Tu danûstendineke partiyê ya siyasî û teşkîldarî tevî damezranvanên serhildanê tu nebû. Lê terefdarên hilanîna PRP gotina xwe bi miqala programa wan a 6mîn ku tê da tê gotin ku partî "qedrê dîn digire" mak dikir (148, r. 617). Tevî wê yekê, anegorî miqala 2mîn a Destûra sala 1924 dînê Tirkiyê yê resmî islam bû, ango Tirkiye dewleta musulmanetiyê ye. Ango, miqala di derheqa qedirgirtina dîn da, ku di programa PRP da hebû, ne dijî Destûra sala 1924 bû. Je derveyî wê yekê, hîn du hefte ji serhildanê derbas ne bûbûn, gava ku di 25 sibat da serekwezîr Fethî Beg, serokê PRP, Kazim Qerebekir Paşa gazî bal xwe kir, usa jî bangî sekreterê sereke Elî Fuad Paşa û Raûf Beg kirin û ev tişt ji wan ra got : "Spartine min ku ji we ra bêjim ku hûn divên dest ji partiya xwe bikişînin û wê belav bikin. Eger na, paşeroja we ewê gelekî giran li ser we rûnê. Ewê xwîn bê rêtin". Paşê wî bi ser da zêde kir : "Ez gelek li ber xwe dikevim ku di derheqa wê yekê da ji we ra dibêjim, lê ez mecbûr im. Wek hûn dizanin, ez dijî her zordarî me". Gava Fethî Beg di derheqa wê yekê da digot, tebiya xwe ya ne xurt xuya dikir : "Tirsa min ew tirs e ku kêm mirov piştgiriya min bikin " (117, r. 220). Bi vî awayî, pirsa di derheqa hîçbûn-jihevbelavbûna PRP da bi pratîkî hatibû safî kirin, nenihêrî wê yekê ku programa wê ne tenê dijî Destûrê bû, lê usa jî di çend derecan da libêral bû, ne ku ya PGR bû. Lê gilî ne di wê yekê da ye ku M. Kemal û mirovên dora wî dixwest bi bîr û baweriyên milletçîtiyê diktatoriya yek partî ya burjuwaziya Tirkan damezrînin.

Hevpeyvîn ne gihîştin tu mefayî, ji ber ku "pêşveruyan" partiya xwe ji hev belav ne kir. Serok Kazim Qerebekir Paşa ji Fethî Beg ra da zanîn ku, rast e, wan ew partî saz kiriye, lê tenê kongreya partiyê dikare ew ji hev belav bike. Dûvra, Kazim Qerebekir Paşa îlan kir ku Partiya Pêşverû ya Komarî hemû hereketên hukûmetê ji aliyê hincirandina serhildanê diparêze (147, r. 45). Lê ew bawerî, wek emê li jêr

bibînin, ne gihîştin tu mefayî. Komikên Partiya Gel a Komarî di bin siya serhildana Kurdan da careke din li taktîk û tabiyên xwe nihêrî. Terefdarên Fethî Beg, ku li ser wê bîr û baweriyê bûn ku nemaze derebeg serokatiya serhildanê dikin, hatin ser wê fikrê ku wan gotiye li vira hay ji xwe hebin û hesaba xwe ji radîkalîzma civakî bikin. "Yên çep" li ser wê bîr û baweriyê bûn ku serhildan tenê ji sebeba ku hukûmetê ne dixwest ku li wilayetên rohilatê rêform bike pêş da hat. Wan nîşan dida ku eger ew rêform di dema xwe da bihata derbas kirin, ewê di destê derebegan da ewqas hêz tu nebûya, lê bineciyên kurd ewê ji hukmê serekeşîr û şêxên xwe rizgar bibûna.

Di hundirê xwe da, Fethî Beg û terefdarên wî ne tenê riya pelixandinê inkar dikir, lê wek xuya ye, hela bi ser da wan dixwest isbat bikin ku di weşanê da pirsan di derheqa parvekirina dîwanê tevî da "pêşveruyan" deynin. Ew li ser wê bîr û baweriyê bûn ku ew şerkariyê hem li Kurdistanê, hem jî li para welêt a mayîn bikin, û ku pelixandina bê hempa ewê bigihîne xurtkirina muxalefetê û tevhevbûnên mezin di nava dereca aborî, ku dikare hemû pêşdanînên hukûmetê yên bucê biteribîne, bi wê yekê va qeziyê pêş da bîne û tiştên mayîn, da. Bîr û baweriyên bi xeysetê polîtîka derve jî gelek giring xuya bûn. Aliyê partiya mulayim nîşan dida ku zordestiya zêde ewê li welatên derve fikra usa pêş da bîne ku çap û qedera serhildanê mezin e, ewê nebawerî di hindava rejîma serokatiyê da bîne û ewê zordariya dewletên dijminên Tirkiyê bidin xurt kirin. Lê piraniya partiya wan bi wan bîr û baweriyan qayil ne bûn. Wê pirs ewha datanî : rejîm di nava qeziyê da ye, siyaseta kompromiyê ewê ji sedî sed bigihîne hundakirin-hêçbûna rejîmê. Demeke usa baş e ku heta-hetayê ji heq-hesabên dijminên dizî û eşkere bên der, ewê êdî bi dest me nekeve.

Ev bîr û bawerî jî bi ser ket.

Di 2 adar da, li civîna fraksyona Partiya Gel a Komarî, Recep Beg bi rexnekirin dijî siyaseta Fethî

Beg a hundirî pêş da hat. Kêlma wî weke 3 saetan kişand û armanca wî ew bû ku lazimiya qebûlkirina mecalên berktir bide isbat kirin. Fethî Beg ku xwe ji rexna wezîrê xwe yê karên hundirî yê berê diparast, îlan kir : "Sed mixabin, ew mirovê ku pirsa Kurdan di ruyê wî da pêş da hat, xuliqî, min rexne dike. Mecalên ku me dane qebûl kirin ne hindik in û bes in jî. Ezê destên xwe bi mecalên ne cayiz ên hovîtiyan bi xwînê va qirêj nekim" (117, r. 221).

Parlementerên ji wilayetên rohilatê bi dizî (di civîna partiyê da) îlan kir ku mecalên ji aliyê kabîna Fethî Beg qebûlkirî bi dilê wan nayên. Dû wê ra, parlementer Qiliç Elî pêşniyar kir ku guh bidin peyvê Mustefa Kemal Paşa ku di nava peyvê xwe da da zanîn ku pêwîst e mecalên berktir bidin qebûl kirin. Li dawiyê, hat qebûl kirin ku mecalên berktir qebûl bikin bona hincirandina serhildanê û mehkemên serbest bidin saz kirin (147, r. 66). Li dawiya civîna PGR, Fethî Beg pirsa di derheqa emniyetê da danî. Biryara di derheqa baweriyê di hindava kabîna Fethî Beg da bi piraniya dengan va hat inkar kirin û hukûmetê dest ji dîwan kişand, ji hev belav bû.

Di 3 adar 1925 da, Ismet Paşa kabîna nuh da damezrandin (13).

155 parlementer dengê xwe bona baweriya di hindava hukûmetê da da, 23 dij bûn (muxalefet), 2 jî bê teref man.

Rast e, serhildan ji ruyê sebebên civakî-aborî û siyasî dest pê bû, lê hukûmeta Ismet Paşa dixwest pirsa Kurdan bi destê mecalên eskerî û polîsî-admînîstratîf "bide safî kirin".

Ismet Paşa ku bi kêlma xwe ya programê va li meclisê pêş da hat, got : "Berî her tiştî di nava polîtîka xwe ya hundirî da emê bicedînin ku qewimandinên van dawiyan bidin hildan, welêt ji xiringêlê biparêzin ku xelk dilhêsa bibe, û em divên bi saya wan mecalên xusûsî yên aktîf di hemû derecan da hurmeta dewletê, ku divê em hesab bikin, bidin bilind kirin" (147, r. 69). Rojnama "Hukumeti milli"

ku di derheqa bernama kabîna nuh da dipeyive, dinivîse : "Ew hevraneqayilbûn ku ji ruyê wê hukûmeta berê dest ji kar kişand, ne ku bi xeysetên bingehî bûn, lê yên taktîkê bûn. Ew ji wê yekê xuya ye ku wek Ismet Paşa îlan kirîye, ewê polîtîka hundirî û ya derve wek ya berê tenê bi çend guhartinên taktîkî va bide derbas kirin **(206, 6.3.1925)**.

Anegorî wê bernamê, hukûmeta nuh mecalên bona hincirandina serhildanê ya nuh dane amade kirin. Wê bi lez projeya zagonê ya di derheqa parastina qayde-qanûnan da da hazir kir û ew raberî meclisê kir bona ku lê binihêre. Muxalefet dijî projeya wê zagonê derket û nîşan da ku mecalên qebûlkirî dijî Destûrê ne û ku zagonên heyî têrê dikin bona ku li welêt qayde-qanûn bên parastin **(212, 5.3.1925)**. Lê dîsa jî piraniya parlementeran dengê xwe da bona qebûlkirina zagonê. Ewha, wezîrê parastina millî Recep Beg da zanîn ku sebebeke zagona nuh a sereke ew e ku bicedînin hurmeta dîwanê bidin dasekinandin, loma jî hukûmet li ser wê bîr û baweriyê ye ku pêwîst e "hemû hêlînên marên bi jehr kor-pûç bikin, hez bikî ew li kîjan quncê welêt bin jî" **(230, 5.3.1925)**.

Dû gotûbêja dirêj û sext ya di navbera milletçiyên rastê û muxalefeta liberal da, meclisê di 4 adar da N° 578 ya di derheqa parastina qayde-qanûnan da, ku ferzendên mezin dida dîwanê di şerkeriya dijî xwepêşandanên gel, dijî her karkirineke muxalefetê da, qebûl kir.

Di zagonê da dihat gotin : "Miqal I. Hukûmet gava cezayên serokê komarê bistîne, dikare bi serê xwe şerkariyê dijî her awayê rêxistinan, pêşdahatinan, kirin û çapkirinê, ku bi xeysetê xwe va rêaksyonêr in an jî helanan didin rabine isyanê, an jî ziyan û zererê didin qayde-qanûnan, rehetî û bêqeziyabûna welêt, bike".

"Destûra hukûmetê heye ku wan mirovên ku ev tişt bi kar anîne bide mehkemê" **(35, dîwan 6, r. 144)**.

Zagon ji roja çapkirina xwe du salan kar kir. Wê ferzend dida hukûmetê ku her hovîtî tevî serok

bike. Ismet Paşa, ku wê zagonê da qebûl kirin, pirsa di derheqa sazkirina mehkemên serbest da raberî lênihêrandina meclisê kir û gullederxistina mehkemê bêy cezakirina meclisê dikaribûn pêk bihatana (124, r. 59-60).

Parlementer Ferîdûn Fikrî yê ji Dersîmê dijî sazkirina mehkemên serbest derket. Wî, ku bîr û baweriyên xwe yên berê di derheqa dijbûna xwe di hindava mecalên bê pergalan da dûmayî kir, da zanîn ku ew pêşniyar dijî miqal 6 ya Destûrê ye, loma jî divê wê inkar bikin û qebûl nekin.

Nenihêrî muxalefeta parlementerên partiya pêşveruyan, meclisê biryar qebûl kir ku du mehkemên serbest bide saz kirin : yek bona temamiya Tirkiyê, ku gotî li Ankarê be (maf-bijartinên wî gotî pirr nebûna, dema mehkemê ji aliyê wan biryara gullekirinê derxista, diviya ji aliyê meclisê bihata testîq kirin), ya mayîn li wilayetên rohilatê û bi her awayî mafan va.

Di 7 adar da, li civîna meclisê bijartinên mehkemên serbest hatin derbas kirin.

Çend rojnamên Tirkiyê, ku zagonên nuh qîmet dikirin, mecbûr bûn xwe mukur bên ku wan bijartinên usa, ku di demên şerkariya bona serbestiya bin destê hukûmeta Ankarê da tu nebûn, bidin Ismet paşa. "Eger em bi par-par li zagona di derheqa parastina qayde-qanûnan da hûr bibin, "Vakıt" nivîsiye, wê demê mirov dikare bibîne ku ew bijartin pirr in û sînorên wan tu nene" (235, 6.3.1925).

Qebûlkirina wan zagonan gihande hilanîna karkirina muxalefetê, qedexekirina azayên burjuwaziyê, ku bi Destûrê hatibû îlan kirin, usa jî gihande dîktatoriya Kemaliyan a yek partiyê ya demdirêj.

Wezîrê karên hundirî Cemîl Beg di derheqa naveroka zagona di derheqa qayde-qanûnan da (dîssîplîn) hemû wilayetên welêt agahdar kirin. Wê demê wî herweha di nava peyveke xwe da ewha got : "Armanca me ew nîn e ku sansur li ser rojnaman bidin testîq kirin. Lê emê wan mirovên ku karkirina wan ne bi dilê welêt e gazî bersîvdayînê bikin" (147, r.

81). Lê wezîr ne bû xwediyê soza xwe : hukûmeta Tirkiyê biryar derxist ku hemû organên waşana muxalefetê bidin girtin. Li Stembolê, rojnama "Tevhidi efkar", kovara "Sebilurreşat", rojnamên Ittihadiyê "Istiklal" û "Son telegraf", li Trabzûnê rojnama pêşverû "Istikbal", li Adanê rojnama "Seyhan" hatin qedexe kirin.

Tevî wan, usa jî organa weşana çep "Aydınlık" û "Örek ve çekiç" jî hatin girtin (147, r. 82).

Di 7 adar da, li welêt di derheqa biryara hukûmetê da, ku berhevkirina eskeran bidin teşkîl kirin, hat îlan kirin. Rojtira mayîn Mustafa Kemal ber bi bineciyan, ordiyê û karmendan bû û li wira da zanîn ku pêşmerge di bin navê parastina dîn da dixwazin dijî şoreşa me derkevin. Di wê bangê da xuya dibû ku meclis û hukûmet mecalên anegor qebûl dikin. Binecî, ordî, organên admînîstratîf, polîs û cendirme divên alîkariya hukûmetê bikin, ferman û biryarên ku bona tunekirina serhildanê ne êwê pêk bînin (147, r. 82).

Rojnama "Vakıt" ku banga M. Kemal şirove dikir da zanîn ku armanca wî ya sereke xurtkirina hurmeta dîwanê, ku li gelek navçeyên welêt, hela berî serhildanê, dijî wê gelek pîsî dihatin kirin, e. Li Stembolê û gelek ciyan polîs û cendirme bêkare mabûn. Serhildana Kurdan hukûmet da birîn, hetka wê birî (235, 9.3.1925).

Di 12 adar 1925 da, mehkema Ankarê ya serbest gazî bo bineciyan da weşandin û tê da gef dixwar ku "ewê bi hovîtî bela wan hemû mirovên ku fikra mexlûqetiyê dijî qayda heyî jehrdadayî dikin û helanan didin serhilan û kî ku xwe ji qulixkirina eskeriyê ta dide û yên mayîn jî hîn dike ku eger ji eskeriyê birevin, bi wê yekê va alî pêşmergan dikin" (86, r. 108).

Gaziyên serok û mehkema Ankarê ya serbest li gelek navçan, bi xusûsî li wilayetên rohilatê, ji aliyê bineciyan bi dijminayî hate qebûl kirin. Hela bi ser da, gava li navça Artwînê îlan kir ku divê eskeran berhev bikin û bişînin pêşeniya Kurdan,

serokên wê derê di nava bineciyan da ajîtasyoneke mezin dijî wê kir, gazî wan dikir ku neçin eskeriyê û guh nedin fermanên "dîwana nezagonî". Pêşiyê ew ajîtasyon bi ser de ket : gelek eskerên berê rojên pêşîn ne çûn wargehên gazîkirina eskeriyê, lê hukûmetê mecalên admînîstratîf bi kar anîn û ew mecbûr kir ku herin eskeriyê. Dîwanê weke 40 serokên Kurdên cî ku bi awakî aktîf tevî ajîtasyona dijî hukûmetê bûbûn girtin (178, 13.5.1925).

Piştî çend rojan, Partiya Gel a Komarî ecibandina xwe da wê pêşniyara hukûmetê ku ew fermanên gullekirinê, ku ji aliyê mehkemên eskerî hatibûn biryar kirin û di hindava Kurdên serhil da bûn, gotî tenê ji aliyê qumandarên pareskerên wê navçê ku tê da Kurd serhildan dikir, bihatana pêk anîn (202, 31.3.1925).

Lênihêrandina wê pirsê li meclisê ji aliyê muxalefetê berk hate rexne kirin. Ewha, parlementer Abiddîn Beg (ji Sarûxanê, ango ji Manisê) metelmayîna xwe îlan kir ku hukûmet mehekê pey halê eskeriyê ra dîsa pêşniyar li ber meclisê di derheqa eskeriyê da, ku ne li gora Qanûna Bingehî ye, raber dike. Parlementer Ferîdûn Fikrî Beg (ji Dersîmê) jî bi wî rûhî peyivî : "Anegorî Destûrê, di bin destê meclisê da gelek maf, ku di nav wan da îlankirina şerr, imzakirina peymanan û testîqkirina biryarên gullederxistinê ne, hene. Ew maf bi tu awayî nikarin bidin destê dîwaneke mayîn, eger Zagona Bingehî (Destûr) neyê teribandin". Kazim Qerebekir Paşa jî piştgiriya wê bîr û baweriyê kir (251, 1.4.1925).

Lê proja zagon N° 695 ku hukûmetê raber kiribû, di 31 adar da bê guhartin ji aliyê meclisê hate qebûl kirin.

Di dawiya adarê da eskerên hukûmetê hazir bûn ku bi derbekê, ji bakur, başûr û başûrê rohilatê, êrîşî serhildanê bikin. Generalê Tirkan Kemalettîn Samî Paşa qumandarî li eskerên Tirkiyê dikir (14).

Bi agahdariya wî di pirsa Kurdan da, li ber hukûmetê sê pirsgirêkên sereke sekinîbûn :

1. Bi hovîtî û beyantî hincirandina serhildanê. Bona wê armancê, hatibû dîtin ku di destpêka meha

nîsanê, sala 1925, da êrîşeke xurt ku tevî wê korpusên ordiyê yên 7, 8 û 9, usa jî alayek ji her korpusên 3 û 5, bê dest pê bikin.

2. Bêçekkirina hemû Kurdan, hezbikî ew tevî serhildanê be yan na.

3. Kurdan li ser navçeyên temamiya welêt bela-belayî bikin ku ew li tu ciyî piranî nebin, û Tirkan bînin, li navçeyên Kurdan bidin cîwar kirin (94, r. 221-222).

Bi tomerî hildayî, hukûmeta Tirkiyê di nava siyaseta xwe ya di hindava Kurdan da xwe bi van her sê xalan digirt.

Xwezma empêryalîstên Fransayê alî dîwana Tirkiyê dikir ku ew serhildana Kurdan bihincirîne, ji ber ku wan 150.000 eskerên Tirkiyê bi riya Sûriyê berdan bona ku ew ji pişt va li Kurdan bixin (108, r. 248). Ew gava dagîrkerên Fransayê derbeke mixenet û xedar bû li pişta pêşmergên Kurdan.

Di nîvê duduyan a meha adar 1925 da, qumandariya Tirkiyê ber bi bineciyên wilayetên Erzurûm, Erzincan, Dersîm, Elazîz, Meletye, Urfa (Ruha), Wan, Siirt, Mûş û Gencê bûn û di banga wan da ewha dihat gotin : "Ordiya me ya cezakirinê tedarukdîtinên xwe xelas kirine ... Emê derba xedar bigihînin wanên ku dijî hukûmeta komarê derketine. Pêwist e ku bineciyên am û tam (bê sûc), yên ku bi karên xwe baweriya xwe bi komarê bidin isbat kirin ... ciyê belasebeb nekevin bin derban ... ku ew mirovên ku bi rastî bi dijminayî ber bi pêşmergan dibin, bira di dest xwe da erzê bêne bal dîwanên komarê yên bajarvaniyê û eskeriyê, ku ew amade ne bi rizadilî di eskeriyê da qulix bikin" (251, 24.3.1925).

Di destpêka nîsanê da, qumandariya ordiya cezakirinê agahdarî da weşandin û tê da soz da ku ewê 1000 lîrên zêr (8000 lîrên kaxiz) bide wan mirovên ku ewê wî bigirin bînin, lê yê ku wî bi mirîtî bîne ewê 700 lîreyên zêr bistîne (109, r. 319). Eger ew mirovên ku Şêx Seîd zêndî yan jî mirî bînin û ew mirov ji dor-berê wî bin (terefdarên wî bin), ew ne tenê nayên ceza kirin, lê hela bi ser da ewê pêşkêşan jî bistînin (185, 5.4.1925).

Bi vî awayî, dîwana Tirkiyê hemû mecal bi kar dianîn, destê xwe davêt her tiştî, ji pelixandina girtî hetanî bi pêşkêşan kirîna mirovan, ku serhildanê bê serî bike û bi wê yekê va pirsdanîna xwe bide hêsan kirin, şerkariya Kurdan a azadariyê bifetisîne.

Nenihêrî serdestiya eskerên hukûmetê ji aliyê jimar û teknîkê, Kurdan dîsan şer dikir. Di nava wan qewlan da, qumandariya Tirkan bi bangeke nuh va ber bi Kurdan bû, ku ew çekên xwe teslîm bikin û gunehê xwe bi wê yekê va efû bikin, ku serokê xwe bidin. Eger usa nekin, ewê bi hovîtî bên ceza kirin **(185, 13.4.1925)**.

Mehkema serbest a Diyarbekirê jî bi gefxwarin pêş da hat. Di nîveka nîsan 1925 da, wê banga ber bi bineciyan da weşandin û tê da da zanîn ku wekîldariyên wê li ser wilayetên Erganî, Elazîz, Diyarbekir, Urfa, Bitlîs, Hekkarî, Dersîm, Sîwerek, Siirt, Mardîn, Meletye, Mûş, Genc û Wanê, û qezayên Xinis û Kîgiyê li wiyaleta Erzurûmê, tên belav kirin û destûr dane wê ku zagonên komarî here bi qetil bi kar bîne. Her karkirineke dijî bêqeziyabûna komarê û seqiriya (rehetî, dilhêsayî) milletê tirk - di nava bangê da dihate gotin - ewê wek gunehkariyeke herî mezin - xayintiya weten - bê hesibandin **(212, 14.4.1925)**.

Di nîveka nîsanê da, hêzên pêşmergan ên sereke li geliyê Gencê hatin dor girtin û hincirandin. Şêx Seîd û serokên serhildanê yên mayîn ji ruyê bêbextiya Cibranli Qasim li ser pirê çemê Muradçayê hatin girtin. Di nava girtiyan da Şêx Seîd, Şêx Ebdulle, Şêx Elî, Şêx Xalid, Reşît Axa, Mehmet Axa, Tîmûr Axa û dîsa 26 pêşmergên kurd bûn **(117, r. 227)**.

Di 15 nîsan da, eskerên hukûmetê Genc zevt kir. Çend komikên pêşmergan, ku bê serokatî mabûn, çûne şkefta Şerefeddînxanê (45 km ber bi başûrroavaya Mûşê). Li vira dora wan girt û bera wan dan, ji heqê wan hatin der.

Rast e, serhildan bawer bike hatibû hincirandin, komên Tirkiyê yên serokatîker dîsa qebûl dikir ku karên zagondariyê û admînîstratîf ku gotî tevgelên

serhildanê, bineciyên am û tam, usa jî her karkirineke muxalefetê, bi hovîtî bidin ceza kirin. Ewha, di 20 nîsan 1925 da, meclisê biryar kir ku halê eskerî ku li navçeyên serhildanê û wilayetên rex wan hatibû îlan kirin dîsa li ser heft mehan bide zêde kirin. Tevî wê yekê, wê destûr dabû hukûmetê ku guhastinan di nava erdnîgariya wan navçan da bike. Meclisê dîsa karkirina mehkemên Ankara û Diyarbekirê yên serbest şeş meh da zêde kirin û izn da mehkema Ankarê ya serbest ku ew, bê cezayê meclisê, biryara gullekirinê, ku wê derxistiye, pêk bîne, mîaser bike **(35, dîwan 6, r. 566-569)**.

Di 22 nîsan 1925 da, meclisê zagon N° 635 di derheqa wan guhartinan da qebûl kir, ku divê di nava kodêksa welêt da gunehkarkirin bihata kirin. Anegorî wê zagonê, bona wan mirovên ku dicedand ku Destûra komarê biguherînin an jî ji bingehê raskirinan di nava wê da bikin, yên ku dicedand meclisê ji hev belav bikin an jî nehêlin ku ew borcê xwe biqedîne, lê usa jî bona wê yekê ku gel ber bi tevgera dijî hukûmetê bi çekdarî bidefînin an jî bineciyên Tirkiyê dijî hevdu derxînin, biryara gullekirinê hat derxistin.

Di 10 gulan 1925 da, serokên serhildanê yên mayîn jî hatin girtin û ji Wartoyê ew bo Çapakçûrê, lê ji wira jî bo Diyarbekirê, hatin şandin. Bi wê yekê va, serhildana Kurdan li her çar navçan hate hincirandin.

Di 31 gulan 1925 da, M. Kemal bi bangê ber bi bineciyan bû û tê da da zanîn ku hukûmet wan eskerên ku bona hincirandina serhildiana Kurdan şandibûn paş da tîne. Lê mehkemên serbest ewê karkirina xwe berdewam bikin. Di dawiyê da, wê îlan kir ku pelixandinên pey serhildanê divê bikin bîra wan mirovan ku ewê cezayê çiqas giran bînin serê wan kesên ku difikirin komarê bavêjin û "pêşveçûna millî şerpeze" bikin **(126, r. 73-75)**.

X X X

Institut kurde de Paris

Em dikarin binketina serhildana Şêx Seîd bi çend sebebên hundirî û derveyî bidin şirove kirin. Sebebeke sereke ew serdestiya eskerên hukûmetê ya eskerî û jimara şervanvan bû. Dema serhildanê, komên Tirkiyê yên serokatîkir 5 korpusên ordiyê anîn halê şerr (ew hazir kirin), lê hinek eskerên berê jî gazî ordiyê kir ku tê da qulix bikin. Paresker li ser temamiya Tirkiya Rohilatê û Merkezî da hatin belav kirin, bi wî qewlî ku dora navçeyên serhildanê bigirin û bi derbekê va bela wan bidin. Dîvîzyonên peya N° 2, 3, 8, 12 û 17 û yên suwarî N° 1 û 14, 3-4 tabûrên cendirmên ser sînor, pareskerên korpusa ordiyê ya 7mîn û pareskerên dîvîzyonên peyaye yên N° 7 û 41 yên ji Adana, Meletye û Nixdê tevî fetisandina serhildanê bûn. Pareskerên korpusa ordiyê ya 9mîn ji aliyê Diyarbekirê kar dikir. Bilî wê, 12 firînde-balafir jî tevî wan karan dibûn **(80, r. 55)**. Anegorî malûmatên Ismail Hak (bi salixên) tevgelê têkoşîna Kurdan, weke 200.000 eskerên tirk dijî 40.000 eskerên kurd şerr dikir. Serkaniyên Ermeniyên welatên derve li ser wê bîr û baweriyê ne ku di nava ordiya Tirkan a cezakirinê da hetanî 120.000 esker hebûn **(108, r. 249)**.

Bi mukurhatina M. Kemal a resmî, hukûmeta Tirkiyê bona hincirandina serhildanê mecbûr e 8-9 dîvîzyonên eskeran hazir bike û di nava halê şer da xwedî bike **(103, dîwan II, r. 893)**. Anegorî malûmetên weşana Tirkiyê, serhildana Şêx Seîd li ser Tirkiyê weke 50 milyon lîre, ku dikir çarîka (25%) buceya welêt a salekê, rûnişt **(206, 14.5.1925)**.

Sebebê binketina serhildanê ya mayîn jî ew bû ku di nava serekeşîrên Kurdan da yekîtî tu nebû, gelekan ji wan piştgiriya Şêx Seîd ne dikir. Dema serhildanê, serokên hinek eşîrên Mûş, Siirt, Sîwerek û navçên mayîn têlêgram li ser navê palementerên meclisê dişandin û tê da karê Şêx Seîd gunehkar û rexne dikir û dida zanîn ku ew bi hukûmetê ra ne, pê bawer in **(185, 26.2.1925)**. Eşîrên Dersîmê jî piştgiriya Şêx Seîd ne dikir. Ew tebiya Kurdên Dersîmê bi wê yekê va tê şirove kirin ku wan baweriya xwe bi serketina tevgeran ne dianî û

Institut kurde de Paris

ditirsiyan ku ewê ji rewşa xwe ya nîvserbest jî mehrûm bin, ku halê wan bey wê jî ne tiştek bû.

Waliyê Elazîzê, ku di derheqa tebiya Kurdên Dersîmê da di nava serhildana sala 1925 da dipeyivî, hevpeyvîna xwe tevî nûçegihanên rojnaman ewha digot : "Eger bineciyên Dersîmê tevî tevger-serhildanê bibûna, wê demê wargehê têkoşînê ewê gelek fireh bûya. Ewê Dersîm tevî serhildanê bibûya eger Şêx Seîd slogana wê ya sereke ne "dasekinandina xelîfetê" nekira, lê damezrandina serbestiya Kurdistanê bikira" **(230, 11.4.1925)**.

Lê walî isbat hinekî fe'ş kiribûn : Şêx Seîd ne ku slogana "dasekinandina xelîfetê" îlan kiribû, lê tenê "hurmetgirtina ber bi dîn". Ew komên Tirkiyê yên serokatîkir bûn ku ew slogan ji ber xwe derxistibû û di stuyê Şêx Seîd va kiribû. Me hîç dokumentek ne dît ku ew vêrsyona berxwederxistî isbat bike.

Bi vî awayî, hevranerazîbûn û tunebûna yekîtiyê di navbera serekeşîran da ferzend ne dane wan ku rabin li ser qederê pirsdanînên hemmiletiyê û bi ser bikevin, bindest bibin.

Sebebê sisiyan a bindestbûnê ew bû ku rêxistineke bi yekîtî û hêz tu nebû ku bikaribûya bi polîtîk kar bikira, bernama wê ya zelal hebûya. Rast e, Komita Serbestiya Kurdistanê roleke mezin di nava tedarukdîtina serhildanê da lîzt, lê dîsa jî wê nikarîbû bibûya serokê wê yê rast. Ew yek ne tenê bi qewlên Kurdistana nîvfêodal va girîdayî bû, lê usa jî bê wê yekê va ku serhing Cibranli Xalit Beg hate girtin, herweha jî karkerên bi nav û deng ên rewşenbîrên kurd û serhildana Kurdan bi wê yekê va bê serî, bê serokatiya bi siyasî qayilbûyî, ma. Eger li rastiyê bikeve, serhildana Kurdan bêy teşkîldarên siyasîvan ma. Ew gihande wê yekê ku Kurdan ji demê zûtir dest bi têkoşîna ku serokatiya wê Şêx Seîd dikir kir. Ne niştimanperweriya wî, ne qedrê wî yê mezin di nava gelê kurd da, ne mêrxasiya pêşmergan têrê kir ku serhildan bi serkeve. Sebebeke mayîn a giring jî ew bû ku ji derve hîç alîkarî û piştgirî ji serhildanê ra tu nebû. Ji ruyê van û hinek sebebên mayîn, serhildana Kurdan ji aliyê

hukûmeta Tirkiyê hate hincirandin. Hela bi ser da jî, wê ra li hev hat xelkê bide bawer kirin ku tevgera Kurdan serhildana Şêxê rêaksyonêr ku dixwest xelîfetê (sultenetê jî) bide dasekinandin û ew bixe bin hukmê (bandûra) Ingilterê, û bi wê yekê va nehêle ku mexlûqetiya cihanê û xwezma welatên cîran piştgiriya wê bikin, bû.

## 4. Mehkema serokên Kurdan

Kemaliyan ku hela berî destpêbûna serhildanê di derheqa heyeta rêxistinên Kurdan a dizî da zanîbû, mecal bi kar dianî bona bêserîkirina wan. Ewha, ji bo nimûnê, wan lîzek lîzt û hevpeyvînek di navbera Komela Daxuliqandina Kurdistanê (serok Ebdulqadir) û casûsê polîsê Tirkiyê, ku xwe dewsa xebatkarê wezareta Ingilterê yên karên derve danîbû, da da teşkîl kirin. Ew hevpeyvîn gotî di derheqa damezrandina serhildana Kurdan da bûya. Wek ku polîsê Stembolê di nava rapora xwe ya ji bo dîwana Ankarê da da zanîn, gava Xoce Eskerî ku ji ruyê serhildanê li Silifkê (wilayeta Îçelê) hatibû gunehkar kirin û jê ra gulle derxistibûn li girtîxana Ankarê bû. Wezîrê karên derva di 11 îlon 1924 da spart polîsê bi pê-rêge ku dû Kör Ebdulle Saadiyê ji Palû ku li Stembolê dimîne bigerin (Kör Ebdulle Saadî di sala 1912 da tevî damezrandina komelên Kurdan bûbû û bi aktîvî tevî xebata wan bûbû) : hat isbat kirin ku ew di nava tevgirêdanan da bi Xoce Eskerî ra bûye. Serokatiya polîs spartin da casûsekî xwe ku xwe dewsa muxalifekî deyne û bi Saadî ra bibe nas. Li dawiyê, xwedê giravî Saadî bi xwe gotiye, an jî ji devê wî çûye, ku Şêx Seîd, Seyid Ebdulqadir û serokên Kurdan ên mayîn piştgiriya wî dikin ku armanca wan ew e ku hej-tevgera fireh li navçeyên Dersîm, Palû û Bitlisê bidin teşkîl kirin. Usa jî xuya bû ku serokên Kurdan ew plan hazir dikir, hêviya xwe danîbû ser wê yekê ku li Stembolê Ingiltere piştgiriya wan bi moralî û maddî bike. Loma jî Saadî, ku tam baweriya xwe bi casûs-şerletanê polîs dianî, hêvî ji wî kir ku bibe navçîgarê di navbera balyozxana (sefaretxane)

Institut kurde de Paris

Ingilterê li Stembolê û serokên Kurdan. Di 30 îlon 1924 da, polîsê Stembolê di derheqa vê yekê da ji wezareta karên derva ra da zanîn. Wê jî spartin da ku Saadî ji ber çavê xwe bernedin û bicedînin ku wî li ciyê gunhekarkirinê bigrin (212, 26.8.1925). Wî şerletanî Saadî bi casûsekî mayîn - Nizamettîn - ra kire nas û got ku ew xebatkarê serwêrtiya Rohilatê ya wezareta Brîtanya ya karên derve ye û navê wî Têmplî ye. Saadî bi hûrgilî ji wî casûsî ra di derheqa wê yekê da şirove kir ku li rohilata welêt bona teşkîlkirina serhildana Kurdan a hemtomerî çi tê kirin, û jê ra da zanîn ku ew serhildan divê di behara sala 1926 da dest pê bibe **(147, r. 53)**.

Anegorî talîmatên wezareta karên derve qisa casûsê duduyan (Têmplî) tevî Saadî hate derbas kirin, û di wî zemanî da Saadî îlan kir ku 135 parên Komiteya Kurdan ku amade ne ku nuha jî şer bikin hene. Karmendên polîs, ku xwe hema di wê avahiya ku tê da hevpeyvîn hatin derbas kirin da xwe veşartibûn, ew qise dan nivîsarê (tescîlkirin) û di 11 çileya pêşîn 1924 da ew ji wezîrê karên derva ra şand. Wezîr di nava "bersîva" xwe ya 2 sibat 1925 da da zanîn ku hela dem ne hatiye bona bi dawî "safîkirina" pirsa Kurdan.

Gava serhildan dest pê bû, Saadî ber bi "Têmplî" bû û d'aw kir ku Ingilîz tev bibin ji bo pêşîgirtina şerpezebûn-teribandina serhildanê. Di 7 nîsan da "Têmplî" dîsa rastî Saadî hat û soz da wî ku biryara di derheqa peymana Ingilterê tevî Kurdan da ewê piştî heftekê bê hel kirin **(212, 26. 8. 1925)** û di van demên nêzîk da, gava rastî Seyid Ebdulqadir bên, ewê çêka bahê 80 milyon lîra teslîmî wî bikin. Casûs pêşniyar kir ku projeya peymana di navbera Kurdistana serbest û Brîtanya Mezin da, kîjan gotî "Têmplî" ji aliyê Brîtanya Mezin qol bike, lê ji nav Komita Serbestiya Kurdistanê jî Seyid Ebdulqadir, ewê bê amade kirin.

Projeya ji 9 miqalan, bi du zimanan (ingilîzî û tirkî), li mala xebatkarê polîsê Stembolê Nihat Beg hat hazir kirin û li ser belgoka (lîste) resmî ku casûsê Tirkiyê ji konsulxana Stembolê ya sereke ya Ingilterê dizîbû bû.

Institut kurde de Paris

Anegorî wê projeyê, tê da hatibû dîtin ku li rohilata welêt serhildan çiqas pêş da biçûya, gotî li Stembolê ewqas pêşdahatinên dijî hukûmetê gurr bûna, divê Kurdên çekdar idarên hukûmetê zevt bikirana, barêgeha korpusa eskerî, serwêrtiyên polîs bikirana bin destên xwe û alîkarî bidana komên pêşmergan ên mayîn. Pêşdahatinên dijî hukûmetê divê usa jî li Bûrsu, Izmîr û Konyayê bihatana derbas kirin. Bona wê yekê, Ingilîz razî bûbûn ku gelek cebirxaneyên eskerî û zêr bidana Seyid Ebdulqadir **(147, r. 56–58)**.

Di 13 nîsan da, roja qolkirina peymanê, Kör Saadî agahdarî da casûsên polîsê dizî (ku xwe dewsa Ingilîzan danîbû) ku Seyid Ebdulqadir dixwaze pê bihese, çika rastî jî Têmplî ew mirov e, dewsa kîjanî xwe datîne, û loma jî biryar kir bi destê cîranê xwe yê havîngeha inglîzî Tyûkkêr ji balyozxana Ingilterê pirs bike ka ew bi rastî xebatkarê wan e yan na. Û bi rastî jî, di 12 nîsan da, kurê Seyid Ebdulqadir - Seyid Mehmed - çû bal Tyûkkêr û weke nîv saet li bal wî ma. Pey wê yekê, ew vegeriya bal bavê xwe û lezo-bezo çû wî bajarê ku Saadî hêwiriye. Ji ber ku Ingilîzê rast tevî kar bûbû, loma jî karê polîs tev li hev dibû, ewê poxê wê derketa ser avê. Ji ber wê, wezîrê karên derva ferman da ku hemû serokên Kurdan di 13 nîsan da bigirin **(212, 26.8.1825)**.

Dema rasthatina tevî wî nûnerê şikber ê serwêrtiya Rohilatê ya wezareta Brîtanya Mezin a karên derve, Seyid Ebduqadir ne xwest ew çêk bi buhayê 80 milyon lîra qebûl bike, usa jî dijî wê wan gotî peymana ku casûsên polîsê Tirkiyê hazir kiribû qol bike derket. Lê ew êdî tutişt ne dida guhastin - bextê serokên Kurdan li Stembolê êdî ji aliyê Kemaliyan hatibû biryar kirin : hema wê rojê Seyid Ebduqadir, kurê wî Seyid Mehmed, Nafiz (ji Suleymaniyê), Kör Saadî, usa jî serekeşîrên Xoşenan ku li Suadiyê li bal Seyid Ebdulqadir diman, hatin girtin.

Bilî wê, serekê polîsê Stembolê Ekrem Beg dijî wan pêşdahatinên Kurdan mecal da hazirkirin ku hebûn û jimara ewên ku wê demê li Stembolê gihîştibû 10.000 mirov dikare biqewime **(212, 26.8.1925)**.

Institut kurde de Paris

Di 14 gulan da, li Diyarbekirê dest bi mehkema sênatorê berê Seyid Ebduqadir û nefsên mayîn ku bona wê yekê hatibûn girtin, ku dixwest Kurdistana serbest saz bikin, bû. Dadxwazê mehkema dizî Sureyya Beg rojnamevan agahdar kirin ku "senatorê berê Seyid Ebdulqadir û alîgirên wî hetanî nîvê meha nîsanê bi aktîvî kar kirine bo navê serketina tevgerê û Kurdistana serbest. Piştgirên wî yên aktîf bûne - kurê wî Seyid Mehmed, Nafiz (ji Suleymaniyê) ... û Ilahî Ebdulle Saadî yê kurd" **(212, 7.5.1925)**.

Di mehkemê da, dada Seyid Ebdulqadir, kurê wî Seyid Mehmed, Hecî Axta **(15)**, Kyor Ebdulle Saadî, Kemal Fewzî (ji Bitlîsê) **(16)**, Xoce Eskerî, Ilyas Efendî, Nafiz Beg û yên mayîn dikir **(147, r. 113)**.

Di mehkemê da Seyid Ebdulqadir got ku ew tevî serhildana Şêx Seîd ne bûye. Wî hela da zanîn ku eger ew hay ji wê serhildanê hebûya, ewê di dest xwe da (pêra-pêra) di derheqa tedarukdîtina wê da dîwanê agahdar bikira. Di nava wê agahdariyê da, ya rast ew bû ku Seyid Ebdulqadir rastiyê ji tevgeliya aktîf di nava serhildana Şêx Seîd da diyar ne kiriye, lê helbet di tedarukdîtin-hazirbûna wê da zanîbû, xwezma pey rasthatina xwe ya tevî Elî Riza (kurê Şêx Seîd) li Stembolê.

Tevî wê yekê, Kör Saadî, ku ji ruyê karkirina xwe ya dûrnedîtî û maceracî alî girtina serokên Kurdan ên bi nav û deng kir, li mehkemê xwe pak nîşan da. Wî ne tenê xwe ne diparast, lê bi dilekî barîstan di derheqa karkirina serokên Kurdan da gilî dikir. "Erê - wî îlan dikir - ew salên dirêj in ku li ser damezrandina Kurdistana serbest kar dikin". Çi ku dimîne di derheqa wî da, ew hela berî destpêka şerê hemcihanî yê yekemîn wî karî dikir, ji ber çi ew sirgûnî li Taîfê bû, tevî sazkirina komelên Kurdan ên cihê cihê dibû, lê di dema şerrê azadariyê da, dijî hêzên gerîlla pêş da hat. Hela bi ser da, wî dida zanîn ku Seyid Ebdulqadir serokatî li hemû karên kurdeyatiyê dikir. Wî digot : "Bêy haypêhebûna Seyid Ebdulqadir li Kurdistanê tu pelek jî ne

Institut Kurde de Paris

dihejiya" (147, r. 117). Bilî Kör Saadî, tukes xwe gunehkar hesab ne kir, ango gunehê xwe hilneda situyê xwe.

Li dawiyê, dadê mehkema serbest li Diyarbekirê ji Seyid Ebdulqadir, kurê wî Seyid Mehmet, Hecî Axta, Kör Saadî, Kemal Fewzî û Xoce Eskerî ra gulle kirin derxist (147, r. 118).

Di 27 gulan 1925 da, li Diyarbekirê, Kemal Fewzî, Hecî Axta, Seyid Ebdulqadir, kurê wî Seyid Mehmet, Kör Ebdulle Saadî û Xoce Eskerî hatin dar da kirin. Avukat Hecî Axta berî dardakirinê kire gazî : "Bira bijî bîr û baweriya Kurdan ! ", "Bira bijî Kurdistan ! " (251, 29.5.1925). Seyid Ebdulqadir di hêviya xwe da got ku dardakirina wî ewê bibe bingehek ji bo karkirina Kurdan ji bo azadariya xwe ya millî.

Hîn zûtir, di meha nîsanê da, mehkema niştimanperwerê Kurdan ê bi nav û deng Doktor Fuad (17) hate derbas kirin.

Di zemanê mehkemê da, pirsa ha da Fuad Beg : "Te çima dixwest ku Kurdistan aza bibe, ew jî wê çaxê, gava te xwendina xwe li Tirkiyê stendiye û bi tirkî jî dipeyivî ?".

"Ji ber ku ez Kurd im - Fuad Beg bersîv da - ez dixwazim welatê xwe azad bibînim. Hetanî li Kurdistanê bêbext û neyarên tirk hebin, pirsa Kurdan nayê hel kirin-safî kirin".

Bi ser vê yekê, sedrê mehkemê Elî Saib got : " A hema xût bo wê yekê ku tu boy navê Kurdistana serbest jiyana xwe dikî bin pirsê û temamiya zanebûn û idêalên xwe didî bona wî karî tuê bêyî dar da kirin" (84, r. 125)

Di meha nîsanê, sala 1925 da, mehkema serbest gunehê gullekirinê ji Doktor Ruad ra derxist, bona karkirina wî di damezrandina Kurdistana serbest da. Berî dardakirinê, Doktor Fuad Beg kire gazî : "Xeyala min tim ew bûye ku bibim qurbanê welatê xwe. Hîç şik tune ku ala serbestiyê ewê li ser wê axa ku me dar da dikin bimilmile" (108, r. 252).

Di dawiya gulana 1925 da, dest bi mehkema Şêx Seîd, tevî serokên serhildanê yên mayîn, bû.

Li ser kursiyê gunehkaran, Şêx Seîd, Şêx Ebdulle (ji Melîkanan), Şêx Ismaîl (ji Cizîrê), Şêx Ebdulletîf (ji Cizîrê), çawîşê berê Qasim (ji Warto), Hecî Xalit, Ebdulhemîd, çerkez Reşît, bînbaşiyê berê Ismaîl, imam Molle Emîn, Şêx Elî, Baba Beg, Reşît, Tîmûr, Mehmet, Sulêman, çawîşê berê Behrî, Emîn, Şewket, Meqsût, Hemît, dadxwazê Melezgirê Ebdulmecît, Şêx Şerîf, Suleyman (ji Çapakçûrê), Elî, Yûsif, Huseyn, mamostayê dibistana destpêkê Molle Cemîl, Hikmet, Ahmed, binbaşiyê cendirman Mehmet Muhrî, karmendê saxlemîparastinê Gence Niyazî, Hecî Sadiq û yên mayîn bûn **(124, r. 97)**.

Mehkema serokên serhildanê weke mehekê kişand. Di 29 hezîran da, mehkeme biryara xwe di hindava 47 tevgelên serhildanê yên muhim ku serokê wan Şêx Seîd bû derxist. Ji bo gişkan gunehê dardakirinê derxist. Rojtira mayîn ew biryar hat pêk anîn.

Berî dardakirinê Şêx Seîd got : "Jiyana li vê dinê xelas bû. Ez hîç pirtîkî jî poşman nîn im ku xwe qurbanê gelê xwe dikim. Em bi wê yekê va serbilind in ku torinên me ewê bi eniya vekirî berê xwe bidin dijmin" **(108, r. 252)**.

Bi dardakirina Şêx Seîd û hevalbendên wî yên nêzîk, dawiya gunehkarkirina tevgelên serhildanê ne hat. Di nava çend mehan da dîwanên Tirkiyê li dû mirovên ne bi dilê xwe digeriyan, ew digirtin û teslîmî mehkema serbest ku gunehkariyên berk û sext ji wan ra derdixistin dikirin.

Me êdî di derheqa wê yekê da nivîsiye ku endamê PRP, parlementerê ji Dersîmê Hesen Xeyrî, di sala 1924 da derbasî hêla Seyid Riza bû. Paşê bi temîndariya qumandarê eskerên Tirkan li Elazîzê, Nûrettîn Paşa, koç kir, çû gundê Huseynîkê (wilayeta Elazîzê). Di sala 1925 da, gava pêşmergan Elazîz hilda, wî bi wan ra kar dikir. Lê dîwana Tirkiyê, ji bo ku li Dersîmê tevrabûn nebe, ew ne girt. Lê dîsa jî, pey hincirandina serhildanê, Hesen Xeyrî bi fermana M. Kemal hate girtin. Biraziyê wî Celal Mehmet jî tevî

wî hat girtin. Di dema mehkemê da, sedrê dadgehê Elî Saîb Hesen Xeyrî di nava wê yekê da gunehkar kir ku ew bi cillê kurdî, bi şal û şapik, hatiye civîna meclisa Ankarê û bi wê yekê va wî propaganda kurdîzmê kiriye. Bona xwe biparêze, Hesen Xeyrî got ku ew bi daxwaziya Mustafa Kemal bi cillê kurdî hatiye. Lê dîsa jî mehkemê gunehê gullekirinê ji parlementerê meclisê yê berê Hesen Xeyrî û biraziyê wî Celal Mehmet ra derxist, tenê bona wê yekê ku ew wek Kurd ji diya xwe bûne.

Dibe tenê berî dardakirinê Hesen Xeyrî bi ser va çû (fehm kir, têgihîşt) ku siyaseta Kemaliyan dijî Kurdan e û hurmeta wan Kurdên ku jiyana xwe bona azakirina gelê xwe da girt. Ewha, berî dardakirinê, wî kire gazî : "Bira bijî gelê kurd ! Hey şehîdên Kurdistanê ! Nuha Hesen Xeyrî jî ewê bê bigihîje we !".

Girêdayî serhildana Şêx Seîd, usa jî neferên mala Cemîl Paşa (ji Diyarbekirê) : Qedrî, Ekrem, Mehmûd, Muhittîn, Ahmed û gelek mîlîtanên Kurdan ên mayîn hatin girtin. Mehkemê hîç behane û isbatên ku mala Cemîl Paşa rusa û bedlome bikin ne dîtin. Gilî di wê yekê da bû ku hela gelek zeman berî serhildanê, ji arşîvên polîs qinyat- matêryalên ku di derheqa karkirina endamên mala Cemîl Paşa da bûn hatibûn dizîn. Lê dîsa jî gişk Ekrem wek lîderekî hej-tevgera Kurdan nas dikir. Lê wan hezar zêrên mehmûdî (yên zêr) wek bertîl dan sedrê mehkemê Elî Saîb û endamê mehkemê Lutfî Mufît ku jiyana Ekrem Cemîl Paşa xelas bikin. Tenê biryara girtina deh salan da wî. Ew yek jî roleke giring lîst, ku Ziya Beg ji Cemîl Paşa balafirek kirî û wek diyarî da ordiya Tirkiyê. Û endamên malê yên girtî hatin azad kirin, ji ber ku mehkeme hat ser wê baweriyê ku ew ne gunehkar in **(145, r. 103)**.

Di 26 îlon 1925 da, mehkema serbest a Diyarbekirê ji bo hedadê ermenî Poxos (kurê Makar) gunehê gullekirinê derxist, ji ber ku ew bineciyê Çemîşkezekê "bi aktîvî tevî serhildana Kurdan bûye, ji bo kara pêşmergan li Xarpûtê casûsî kiriye" **(212, 28.9.1925)**.

Anegorî malûmatên weşana Tirkiyê, di dawiya îlon 1925 da, mehkema navçên rohilatê 379 şuxulên ku lê binêre û ku di nav wan da 1855 meriv dihatin gunehkar kirin hildabûn. Ji wana 1320 mirov hatibûn girtin, lê yên mayîn hela di nava azadiyê da bûn. Hetanî wê çaxê, mehkemê 138 şuxulên ku lê nihêrîbûn, ango mehkema 690 mirovan, kiribûn. Ji wana, bona 120 kesî gunehê gullekirinê derxist, şuxulê 116 kesan guhastî mehkemeyên mayîn kir, lê yên mayîn hatin efû kirin (202, 25.9.1925).

Lê bi malûmatên M. N. Dersîmî, tenê li Xarpûtê mehkema serbest ji 400 xortên Kurdan ên ji Palû û Çapakçûrê ra gulle kirin derxist (126, r. 181).

Tehlîla teşkîla mirovî û civakî nîşan dide ku ew kesên ku hatine dar da kirin zabitên kurd ku tevî tedarukdîtina serhildanê bûne û ku di ordiya Tirkan da qulix dikir, şêx, mirovên xwedî erd, endamên parlementa sultanetê yên berê û yên meclisê, bazirgan, rojnamevan, avuqat, mamosta, vêtêrînêr, bijîşk û nûnerên rewşenbîrên Kurdan ku nuh pêş da hatibûn bûn. Ew yek, ku bineciyên kurd ên cihê-cihê ku tevî serhildanê bûne, şehadeta wê yekê ye ku bindestiya Tirkiyê ya pir sedsalan ew gihandine hev bona şerkariya azadariyê. Em bidin zanîn ku tevî wê serhildanê usa jî Aşûrî, Çerkez, Ermenî û nûnerên gelên mayîn jî dibûn, ji ber ku wan jî ne dixwest ku bihelin û ew dijî siyaseta komên Tirkiyê yên rêaksyonêr û şoven bûn.

Weşana Tirkiyê jî di derheqa tevgeliya gelên bi jimara xwe ve biçûk di nava serhildana Kurdan da nivîsiye : ewha, "Hakimiyeti milliye" daye zanîn ku Aşûrî û Ermeniyên ku bi rizadilî tevî serhildanê dibûn ji bo sazkirina Ermenistana serbest ku gotî ewê bi Kurdistanê ra tevayî bi aşîtî bijiya (206, 2.3.1925).

Qumandarê korpusa ordiya Tirkiyê, ku dicedand di navbera Tirkan, Kurdan, Ermeniyan û Aşûriyan da dijminayiyê pêş da bîne, ji waliyên ciyan ra ev nivîsara ha şand : "Şêx Seîd ..., ku serokatiya serhildanê li navça Gencê dike, usa jî tevî tevgera

Institut kurde de Paris

Aşûriyan bûye û ji aliyê mehkema Bitlîsê ya eskerî wek dijminê weten hatiye guneh kirin. Di nava dîlgirtiyan da rizadilvanên aşûrî û kurd bûn. Li bal wan dokumentên ku isbat dikin ku Şêx Seîd bi Ermenî û Aşûriyan ra kar kiriye ji bo sazkirina Kurdistana serbest dîtine ... Ermenî, ku gelek hêrs ketine û dixwest heyfa xwe ji me hildin, li benda ferzendeke baş in ku hemû kesên ne ermenî bikujin, berî gişkî Kurdên ku nuha piştgiriya wan dikin. Li ser axa me û li ser çermê musulmanan ew dixwazin Ermenistana nuh bidin dasekinandin. Li her derî hincirandina wan qaçaxan ... bi serketin pêş da diçe". Pey ra qumandar hêvî dikir "ku her demê bi kar bînin bona wê rastiyê ji bineciyan ra bêjin" (202, 15.8.1925).

Bi vî awayî, Kemaliyan ku serhildana Kurdan daye fetisandin siyaseta berîhevdayîna milletan jî bi kar anî, di navbera musulman û xaçparêzên welêt da dilsarî pêş da dianî. Serokatiya serhildanê xwe bi tebîke mayîn girtibû. Ji bo nimûnê, gava ku wan elamî Şêx Seîd dikir ku hinek pêşmergên wî zorê didin Ermeniyan, wî ferman derxist û tê da got : "Eger yek pirtîkî zorê bide Ermeniyan, an jî xatirê wan bikeve, ewê berk bê ceza kirin" (109, r. 308). Anegorî lîtêratura Ermeniyên welatên derve, pey wê fermanê tu eskerekî Kurdan zor ne dida Ermeniyan. Di wan deman da, rêxistinên ermenî yên milletçî yên welatên derve dest bi danûstandinên xwe tevî Kurdan xurt kir û ew yek dijî siyaseta Tirkiyê ku dixwest milletên biçûk bike qûl bû.

Pey hincirandina serhildanê û kuştina serokên wê, wan dest pê kir bi hovîtî êrîş bibin ser bineciyên Kurdan ên am û tam. Eskerên Tirkan gund talan dikirin û dişewitandin, kalemêr û pîrejin, jin û zarok dikuştin.

Armstrong dîdemeke gelek ber bi çav di derheqa zêrandina bineciyên Kurdan da aniye : "Kurdistan - wî nivîsiye - bi destê şûr û agir hatiye vala kirin : mêr dizêrandin û dikuştin, jin û zarok diçerçirandin, gund wêran dikirin û deşt dişewitandin. Tirkan usa Kurd qir dikirin ku ji qira Ermeniyan di dema

sultanetê da bi hovîtiya xwe va ne kêmtir bû. Wan ne tenê Kurd, lê usa jî Rûm, Ermenî, Bulgar dikuştin ... Bi biryarên mehkemê Kurd gelekî lez dar da dikirin, sirgûn dikirin û dixistin hebsxanê" (154, r. 26).

Ew name jî di derheqa hovîtî û cezakirinên eskerên Tirkiyê, ku komela Aşûriyan di tebax 1925 da ji Koma Milletan ra şandibûn, da elam dikir. Di nama 6 tebax 1925 da dihate gotin : "... Ew (Aşûrî û Kurd - M.H.) êdî nikarin ji gundên xwe derkevin, hebûna wan dizîne, pez-dewarên wan talan kirine, jinên wan li ber çavên wan şuhurandine" (244, 1926, № 238, r. 86). Paşê dihat zanîn ku dîwanê qet pirtîkî jî bi biryara Koma Milletan di derheqa kefîltiya destpêneketina gelên biçûk da hesab ne dikir.

Di nava nama 10 tebax 1925 da, Komela Aşûriyan, ku dabû zanîn ku ewê êdî şikayetên xwe ji Koma Milletan û dewletên mezin ra bişîne û daye zanîn ku serokatiya Tirkiyê zordestiya gelên am û tam li Kurdistanê dike, malan wêran dike, usa jî dida zanîn : "Tirkiye her tiştî talan dike, pez-dewran dibe, gund û bajaran dişewitîne, serokan dar da dike, zordestiyê li bineciyan dike, Kurdan cîşihitî dike". Di namê da dihat dîtin ku dîwana Tirkan bineciyên Dersîmê û navçeyên mayîn bi zorê dişîne bakur û başûr, li Samsûn, Kîlîkya û Sînopê. Bi fermana ji Ankarê jin û mêr ji hev cihê dikirin û dişandin navçeyên cihê-cihê. Gelek mêr di rê da hatin gulle kirin, lê jin hatin şuhurandin û li bazarên bajar û gundên Anatolyayê hatin firotin, ew jî eger ew hela ji hovîtiyan û îşkencan ne miribana (244, 1926, № 238, r. 86).

Pey hincirandina serhildanê di nava salên 1925-1926 da, bi sedan gund hatin wêran kirin, bi hezaran mal hatin hilweşandin, bi sed hezaran bineciyên am û tam - jin, zaro, kalemêr, pîrejin - hatin kuştin û mihacir bûn (170, r. 28). Rêxistineke navneteweyî ya usa, wek Koma Milletan, guh ne da bext û nivîsa gelê kurd ê Tirkiyê ku bersîva wan erz û şikayetên dijî hovîtiya dîwana Tirkiyê ne da. Em

nameke usa ku mîlîtanên Kurdan, Ahmed Elî û Xoce Sebrî, qol kirine û di 25 tîrmeh 1925 da ji Koma Milletan ra şandine, bînin :

"Ev êdî serê du salan e ku li welatê me bi çeman xwîn dikişe. Gelê kurd di bin zordayîna hovan da ye. Gelê kurd ku êdî ji qewata wî dere ku neheqiyan û qûltiyê qebûl bike dest avêtiye çek ji bo xwe biparêze. Ew şerkariya ku me dest pê kiriye ewê ferzendê bide me ku em jîna xwe biparêzin. Emê şerkariya xwe ewqas bidomînin, hetanî ji qûltiya hukûmeta Ankarê tam bên azad kirin û rizgar kirin. Tu tiştekî me yê tomerî bi Tirkan ra tu neye, ne di hêla millet da, ne di urf û adetan da, ne jî di hêla zimên da. Ankara, ku ji aliyê dewletên Roavayê pişta wê germ e, dicedîne ku di hindava gelê me da siyaseta gelkujiyê ku bi serketin di hindava Ermeniyan da da derbas kirin derbas bike. Têkoşîna me fireh û millî ye. Gelê kurd ji Koma Milletan û gelên pêşketî de'wa alîkariya lez û kardar dike. Tevbûna dewletên Roavayê ne tenê deynê merivhiziyê ye, lê usa jî lazimiya siyasî ye. Gelê kurd ew kefîltiya aşîtiyê li Rohilata Nêzîk e" **(202, 29.6.1926)**.

Bi hovîtî hincirandina serhildana sala 1925 û dardakirina gelek serokên wê di nava welatên cîran da hêrseke mezin rakir. Di 26 hezîran 1925 da, li Bexdadê mîtînga şikayetkirinê ya mezin dijî hovîtiya dîwana Tirkiyê di hindava Kurdan da hate derbas kirin. Tevgelên mîtîngê têlêgram şandin Koma Milletan û hukûmetên dewletên mezin û hêvî kir ku alîkariyê bidin Kurdên Tirkiyê **(255; 27.8.1925)**. Usa jî Kurdên Suleymaniye, Kerkûk, Hewlêr û bajarên Kurdistana Iraqê yên mayîn jî şikayetên xwe kirin.

Lê Koma Milletan bersîva tu bangî jî ne da. Hela bi ser da, di hezîrana 1925 da, Koma Milletan biryar kir ku protêstoyên Kurdan dijî kirinên hukûmeta Tirkiyê ku di hindava pêşmergeyên Kurdan da li Tirkiyê bûn dernekevin.

Tevrabûna Şêx Seîd rêçeke kûr di nava dîroka gelê kurd û bi xurtî di nava edebiyata kurdî da ciyê

xwe girt. Gelek afirandinên millî yên hozan û helbestvanan, ku pey serhildanê wek protêstoya dijî siyaseta komên Tirkiyê yên serdest û şoven hatibûn nivîsîn, peyda bûn. Ji wan ê herî bi nav û deng helbesta helbestvanê Kurdan ên mezin Pîremerd bû. Di wê helbestê da wî digot "dewleta Tirkiyê li hemberî wê makîneya ku nikaribû li Kurdistanê kar bikira eger ew bi xwîna gelê kurd va nehata rûn kirin dikir" (93, r. 135).

5. Rê û derbên serhildanê

Serhildana Şêx Seîd bi masştab û teşkîldariya xwe va di nava temamiya dîroka gelê kurd da ya herî bi nav û deng bû. Ew di bin slogana sazkirina Kurdistana serbest da hatibû amade kirin.

Pirsa di derheqa mana û rê-derbên wê serhildanê da di nava weşana Tirkiye û Awropa Roava da bi çend cûran dihate şirove kirin û gelek fikir jî dijî hev bûn. Ew bîr û bawerîyên weşanan ne ku lênihêrînên ilmî bûn, lê tenê fikrên wan siyasetvanên dilgerm ku serhildana Kurdan di bin menfeetên xwe û welatê xwe da, ji bo kara komikên civakî qîmet dikir bûn.

Bi tomerî hildayî, weşana Tirkiyê ya wê demê li ser sebeb û rê-derbên serhildana Kurdan çend bîr û bawerî gotin. Yek ji wan dicedand ku wê wek "qaçaxiya eşîrên beyanî û hov" nîşan bide. "Serhildan divê bi dîtinan bê ruhdar kirin, fikra wê gotî hebe, divê li ser prensîpa bingehgirtî be, rojnama "Tanîn" nivîsiye. "Lê çi dîtin, çi prensîp ewê li bal wan merivên nîv beyanî hebe ... Eger dîtin bikaribûya bigihîje hiş-sewdê wan, gelo ewê xwe bi wê riyê bigirtana ... Wan hiş-aqllê sade û prîmîtîf ku nezanî û fanatîzmê ew ji her awayê mantiq derî kirine (mehrûm kirine), tenê fikrek heye : talan qaçaxî" (230, 28.2.1925).

Fikreke mayîn jî ew bû ku sebebê serhildanê yê hîmlî ew fanatîzma Kurdan a olperestiyê bû. "Çend xwefiroşên siyasî - di ansîklopêdiya Tirkiyê da tê gotin - casûsên welatên derve ... di hêlekê da

fanatîzm gurr dikir, soz dida koçeran ku ewê izn bidin wan ku bajaran talan bikin .... di hêla din da jî soz dida ku ewê serhildanê tev rakin" (37, r. 4359). Terefdarên wê bîr û baweriyê testîq dikir ku gundîtiya paşdamayî ku ji aliyê şêxan dihat serkarî kirin dijî hukûmeta komarê şerkarî dike bona dasekinandina xelîfetê û sultanetê. Bona testîqkirina wê fikrê ew behane wek bingeh dianîn ku Şêx û alîgirên wî serokatî li serhildanê dikir. Hela bi ser da, be's dihatin belav kirin ku malbata sulteneta Tirkiyê ku ji text hatiye avêtin tevî serhildanê dibe. Ew bîr û bawerî jî bê hîm bû. Berî her tiştî, wek me li jor dît, serhildan ne ku ji aliyê şêxan hatibû hazir kirin, lê ew Komita Serbestiya Kurdistanê amade kiribû û serokatiya wê militanên rewşenbîr ên Kurdan ên bi nav û deng, wek serhingê ordiya Tirkan Cibranli Xalit Beg, rojnamevan Kemal Fewzî, doktor Fuad û yên mayîn, dikir. Bilî wê, slogana şerkariyê boy navê şerîetê, wek tê xuya bûn, ji aliyê lîderên Kurdan bi armanca taktîkiyê dihate bi kar anîn, ji bo ku meremê wan ê sereke Kurdistana serbest bû. Bi rastî jî, ji bo çi Kurd divên ji bo navê şerîetê tevrabûnê bikin, ew jî bona kurê sultanê berê Ebdul Hemîd 2. Divê bê gotin ku fanatîzma olperestiyê ne bi dilê Kurdan bû. Gelek eşîrên Kurdan tenê bi awakî şeklî islam diheband. Hema xût di nava Kurdan da gelek sêktên (ber) musulmaniyê hebûn. Çend eşîrên Kurdan usa tevî serhildanê dibûn ku ji van sêktan bûn : qizilbaş, êzdî, elewî û yên mayîn. Ew sêktên ku di nava sewde û hişê wan da berhemên xaçparêzî û zerdeştiyê hebûn carna jî dijminatiya hev dikir. Eger sultenet bihata dasekinandin, ewê xuya biba ku dewleta burokratîk a navendî ku mafên gelên biçûk bendî tiştekî hesab ne dikir ewê bê nûjen kirin ... Ew yek ewê bona Kurdan bindestiya siyasî û qûltiya millî bianiya. Tevî wê yekê, lîderên Kurdan ku slogana "qedirgirtina islamê" pêş da dikişand dicedand ku hukmê şêxan bide bi kar anîn, usa jî derc kir ku li Tirkiya şûndamayî, bi xusûsî li wilayetên rohilatê û başûrê rohilatê ku tê da di nava bineciyên kurd da ferqên civakî yên berbiçav

tu nebûn, şerkariya Kurdan a millî dikaribû bi perda olperestiyê bihata qebûl kirin. Girêdayî vê yekê, gotina F. Engels ku dema xeysetê şerrên ji bo dîn di sedsalên navîn da li Awropayê qewimîne gelek hewaskar e. Ew ewha şirove dike û dinivîse : "Eger ew şerrê civakî wê demê di bin ala olî da pêş va diçû, eger kar, daxwazî û daweyên hinek civakan di bin perda olperestiyê da dihatin veşartin-nixamtin, ew qet pirtîkî jî pirsê nade guhastin û gelek bi hêsanî bi şertên demê va tên şirove kirin" (4, r. 360). Tevî wê yekê, ew fikrên ji têzên di derheqa pirsa Rohilatê da, ku di kongreya 4mîn a Komînternê da, hatine hazir kirin, hewaskar in. Ewha, tê da tê gotin : "Li welatên musulman şerkariya millî di demên destpêkê da bi idêolojiya xwe va bi wê yekê va berbiçav dikeve ku sloganên panislamîzmê yên dîndarî-siyasî ne û ew yek ferzendê dide karmendên dewletên mezin û diplomatan ku dilsaxî û nezaniya gel bi kar bînin bona şerkariya dijî wê tevrabûnê. Lê şerkariya millî-azadariyê di hundir da çiqas fireh dibe, sloganên panislamîzmê yên dîndarî-siyasî ewqas pûç û bêfeyde dibin, ji ber ku êdî dawekariya siyasî peyda dibe" (181, 1926, Nº 2a r. 174)

Ev hemû şehadeta wê yekê ye ku pêşmergan dikaribû slogana ji Kemaliyan "azabûna dîn" wek gaveke taktîkî di nava şerkariya xwe ya bona mafên millî bi kar bînin.

Bîr û baweriyên weşana Tirkiyê ya resmî, ku bi her awayî dicedand ku têkoşîna Kurdan a millî nizm bikin, bi qalmeqalm di derheqa rêaksyona serhildana Şêx Seîd da hîn bêtir dûrî aqilan bûn. Bi destê van fen û fêlan Kemaliyan bi her awayî dixwest ku serhildana Kurdan li ber çavê gelên welêt û yên der rûreş bikin, ew wek ya rêaksyonê yan jî ya olperestî-dîndariyê qîmet dikir.

Û ya dawî, fikra sisiyan ew bû ku xwedê giravî serhildan bi destê welatên derve hatiye amade kirin, xwezma bi destê Ingilîzan. Fikrên han bi temamî ne rast in. Tevî vê yekê girêdayî, hevpeyvîna parlementerê meclisê yê ji Erzurûmê, endamê PRP

Ruştî Paşa, gelek hewaskar e ku weşana Tirkiyê di 26 sibat 1925 da da weşandin. Di wê hevpeyvînê da wî ewha gotiye :

"... Çi ku dimîne di derheqa tevbûna welatên derve da, ez wê yekê wek bê bingeh hesab dikim, ji ber ku Genc û Mûş gelek dûrî tixûb in. Eger pêşmergan hêviya xwe daniyana ser piştgiriya derve, ewana gotî li navçeyên ser sînor serhildan bikirana û bigihîjtana ku eşîrên wan navçan ku tê da admînîstrasyona Tirkan tu nebû" (124, r. 52).

Ango, serhildan ne ku ji helandayîna derve, lê bi faktorên hundirî yên herdemî dest pê bû. Di derheqa faktoreke usa da ew matêryalên ku nûçegihanê rojnama "Vakıt" Naşîd Hakkî li Diyarbekirê, ku tê da civînên mehkema serbest dihatin derbas kirin, anîbûn şehadet didin : "Sebeb û serkaniyên şoreşa dawîn ku li wilayetên welatê me yên rohilatê bû bi tu tiştî va ji wan sebebên ku vê dawiyê li Bosnî û Hêrzêgovîn bûbûn nayên cihê kirin. Idêal û armancên ku bûne bingeha şoreşa Kurdan, ew xût ew idêal û armancên ku bûne sebebê jihevqetandina Sûriye û Filistînê bûn".

Di hindava xwe da, sedrê mehkema serbest, ku ber bi riya gunehkaran bû û ku ji wan ra hukmê gullekirinê derxistibû, di dawiyê da got : "Hinek ji we mena digirin ku serhildan ji ruyê wê yekê dest pê bû ku hukûmetê zor dida we, hinek di derheqa parastina xelîfetê da dipeyivîn, lê gişk jî di pirsekê da li ser bîr û baweriyekê bûn : we dixwest Kurdistana serbest saz bikin" (170, r. 27).

Bi vî awayî, nûnerên organên admînîstratîf bixwe mecbûr bûn ku nîv rastiyê di derheqa sebebên serhildana Kurdan bixwe da bêjin.

Serhildana Şêx Seîd, rast e, bêy plana karkirinê ya fireh bû, serokatiya wê ya siyasî ya gihîştî tu nebû û çend kêmasiyên mayîn ên bi we va eyan hebûn, lê ew ya gelî lazim û divê bê hesab kirin, ji ber ku piraniya Kurdên wilayetên rohilatê û başûrê rohilatê hemû ji civakên cihê cihê - koçer, heywanxwedîker, nûnerên burjuwaziya bazirganiyê, şêx û axa, rewşenbîrên eskerî û bajarvanî - tevî wê dibûn.

Aşkere ye ku ji her civakekê xelq tevî serhildanê dibû, bilî pirsdanînên hemmiletî ku ji nîrê Tirkan ê qûltiyê aza bibin, li bal wan usa jî armancên şexsî hebûn. Ew yek ne dibû asêgeh, ku Kurd di nava desteyên şervaniyê da yek bin, bi mêrxasî dijî eskerên Tirkan şer bikin û, eger lazim bûya, bi mêranî şehîd bibin boy navê serbestiya Kurdistanê. Loma jî, nenihêrî armancên hinek derebegên Kurdan ên şexsî, dîsa jî serhildana Şêx Seîd, usa jî tevrabûnên Kurdan pey wê ra bi xeysetê xwe va ya azadariyê û pêşverû bûn.

6. Hincirandina muxalefeta libêral

Serokatiya Partiya Gel a Komarî ku serhildana Şêx Seîd hincirand, li behane digeriya bona qedexekirina karkirina Partiya Pêşverû ya Komarî. Li pêşiyê, bingeh hebûn ku li ser wê bîr û baweriyê bin ku pevgirêdanên PPR bi lêderên serhildanê ra hene û serokatiya PGR tişt dikir ku pevgirêdanên Kazim Qerebekir Paşa tevî şêxan diyar bike, derxe ser avê. Lê hate zelal kirin ku "pêşveruyan ne tevî tedarukdîtin, ne jî tevî derbaskirina serhildanê bûn. Hela bi ser da, de'wa serbestiya Kurdistanê ku serokatiya Kurdan pêş da kişandibû gihande wê yekê ku PPR bi resmî got ku hîç danûstendinên wê tevî serhildana Kurdan tu neye, û hela, wek ku li jor hate nîşan dan, li hêla hukûmetê sekinî. Bi vê yekê va tê şirove kirin ku mesele ew yek e ku bi alîkariya endamên PPR Xarpût ji pêşmergan hildan.

Bona ku PPR ji êrîşkirinan biparêzin, lîderekî wê, Elî Fuad Paşa, hela di destpêka nîsana 1925 da ji rojnaman ra da zanîn : "Çawa karkirina partiya me ya hundirî, usa jî ya derve ... bi prensipên mafên destûra zelal û berk va têne ruhdar kirin. Bilî wê, partiya me nikare bikeve nava pêwendî-danûstandinan tevî serhildanên şikber. Emê herdem xwe ji wan serhildanên ku dicedînin me tevî wan bikin bidin alîkî" (202, 9.3.1925).

Dîsa jî alîgirên hukûmetê ji wê fikrê xwe ku ji heq-hesabên "pêşveruyan" ku jimara wan roj bi roj

zêde dibû bêne der, rêxistinên wan kaf-kûn bikin, hilweşînin, pûç bikin, ne dane paş (18). Di destpêka gulana 1925 da, mehkema serbest li Ankarê koma "pêşveruyên" Stembolê gunehkar kir û di nava nama xusûsî da guhdariya hukûmetê danî ser wê yekê ku wan bi isbatî dîn bona armancên siyasî bi kar anîne. Di nîveka gulanê da, li Trabzon, Urfa û bajarên mayîn çend endamên PPR girtin. Girêdayî wê yekê, mehkema serbest a Diyarbekirê biryar kir ku karkirina hemû parên PPR ên li wilayetên rohilatê qedexe bikin û di nava nama xusûsî da guhdariya hukûmetê danî ser wê yekê ku "pêşverû" dîn bi kar tînin ji bo armancên xwe yên siyasî. Hukûmetê li ser pareke bernama PPR ku tê da dihate gotin ku "partiya bi qedr û hurmet ber bi riya fikir û temiyên (weyset) dîndarî-olperestiyê dibe gelek serê xwe êşand". Wê serokatiya PPR di nava wê yekê da gunehkar kir ku ew xwedê giravî dicedîne ku fanatîzma dîn tev rake û gel dijî komarê, pêşveçûyînê û rêforman rake.

"Eger li maniyên serhildanê li rohilatê bigerin, - M. Kemal gotiye - serhildan ji zû da hatiye hazir kirin û ya rêaksyonê bû û sebebeke wê ya sereke û girîng ew bû ku Partiya Pêşverû ya Komarî sloganên dîndariyê pêş da dikişandin, lê usa jî "qasidên" xwe ku karkirina wan di hindava xwe da alî serhildanê kir dişandin wilayetên rohilatê" **(113, dîwan 2, r. 89)**.

Tevî wê yekê, terefdarên qedexekirina PPR ew name û agahdariyên hinek serekên Kurdan, ên ku wan dema mehkema Şêx Seîd gotibûn, wek bingeh dianîn. Ji bo nimûne, serokekî serhildanê, Qadirî, ku di paşdemê da ji aliyê dîwana Tirkiyê hate dar da kirin, ji Şêx Seîd ra nivîsîbû ku partiya Kazim Qerebekir Paşa li meclisê mêlgirtina xwe ya di hindava dîn da testîq kiriye. "Ez şikber nîn im, - wî nivîsiye - ewê sedî sed alîkariya me bike. Erê, kete bîra min, "qasidên" wan ku nuha li bal Şêx Eyyûb in bi xwe ra qanûnnama partiyê anîne".

Dema mehkemê, Şêx Eyyûb gotiye : "Partiya tek-tenê ku dikaribû dîn ji hundabûnê xelas bikira ew partiya

Institut kurde de Paris

Kazim Qerebekir Paşa ye. Di nava bernama wê da tê gotin ku divê bi qedirgirtin ber bi riya dîn bibin" **(113, dîwan 3, r. 892)**.

Weşana resmî ku li ser agahdariyên usa hîm dibû, kampanyake berk dijî "pêşveruyan" vekir. Xudanên usa, wek Falih Rifki Beg (Atalay), Yaqûb Qadrî Beg (Qereosmanoğlu), Mehmûd Esed Beg, her roj gotar di rojnama "Hukmiyeti milli" da çap dikirin û tê da muxalefetê bi her tiştî berk gunehkar dikir û de'w dikir ku ew bê qedexe kirin.

Ne sondxwarinên PPR, ne gotinên wan ên baweriyê di hindava Destûrê da karibû wê partiyê ji qedexekirinê biparêzin. Pêwîst e bidin zanîn ku ne ewqas paragrafa bernama wê partiyê, ku tê da dihate gotin ku di derheqa "qedirgirtina di hindava dîn da" dijminên PPR dida tirsandin, çiqas ku de'wekariya "dêsantralîzasyonê", çi ku nîşan dida ku otonomiya cî bidin milletên biçûk, herweha Kurdan jî. Tevî wê yekê, divê ku ji wê yekê ra jî hesab rûnin ku lîderên PPR bi milletê xwe va ne Tirk bûn : Kazim Qerebekir Paşa bi eslê xwe va Kurd bû, Huseyn Raûf Beg Çerkez bû, lê Elî Fuad Paşa nîv slovên bû. Di wê pirsê da çend derecên mayîn jî roleke giring lîst, wek ew ku Mustefa Kemal hevalbendên xwe yên nêzîk di dereca şerkariya millî-azadariyê ra ne eşkere bû, şika wî li ser wana hebû, baweriya xwe bi gelekan ne dianî. Wê demê hukmê wî ewqas xurt bû ku wî biryar kir ku hemû muxalefetên di nava welêt da bide hildan û wan hesab dikir wek qeziya bona dîktatoriya xwe ya şexsî. Loma jî di 3 hezîran 1925 da, Şêwra Wezîran biryar kir ku karkirina PPR qedexe bike.

Hema wê demê, dîwanê weşandina rojnama "Tanin" qedexe kir û berpirsiyarê wê yê sereke Huseyn Cahîd (Yalçin) û hevalbendên wî da girtin. Hema wê rojê hatin girtin, usa jî xwediyê kovara çepan "Aydınlık" û xebatkarên wê. Ew kovar ji berê da jî hatibû qedexe kirin. Di nava girtiyan da doktor Şefîk Husnî, Professor Sadrettîn Delal, mamosta Şewket Sureya (Aydemir) bûn. Ji wana 12 meriv gunehê ji 7 hetanî 10 salan xwar **(117, r. 229)**.

Pey qedexekirina PPR li welêt, bi salên dirêj diktatoriya yekpartî hate testîq kirin û ji ruyê wê yekê hetanî sala 1945 li welêt partiya tenê ya burjuwazî-derebegiyê Partiya Gel a Komarî bû (19).

## 7. "Safîkirina" pirsa Mûsilê

Kemaliyan bi êrîşên xwe yên bê hesab dijî Kurdan, ku ji bo wan gelek pere dihat xerc kirin, xezîna dewleta xwe vala kir. Dema safîkirina pirsa Mûsilê, li bal wan ne kaniyên eskerî, ne yên siyasî, ne jî yên pere mabûn ku alîkariya wan bikira ji bo ku şerkariya xwe tevî Ingilîzan dewam bikin û bi ser bikevin, bona wilayeta Mûsilê di bin destê xwe da xwedî bikin. Hukûmeta Tirkiyê dixwest bona wê pirsê bi Ingilterê ra rûnê, bi hevdu ra qayil bibin. Lê, bona ku navê xwe li welêt û di nava merivên welatên derve da biparêze, nûnerên Tirkiyê li kongreyên navnetyeweyî yên resmî "berk" û "bêminet" mafên xwe li ser Mûsilê "diparast". Lê ew berktî û "bêminetiya" wan nîşan dida ku ew, wek dibêjin, paş da dikolin, ji ber ku şerkariya wan a pirsalî bona Mûsilê bêtaqetî û nekarebûna Kemaliyan nîşan dan.

Serhildana Şêx Seîd di hindava xwe da safîkirina pirsa Mûsilê da lez kirin û alî wê yekê kir ku li dawiyê tixûbê navbera Tirkiye û Iraqê di bin mandatiyê da bê testîq kirin.

Lê divê bê zanîn ku ne Tirkiye, ne jî Ingiltere tu mafekî wan ê huqûqî li ser navça Mûsilê ku piraniya bineciyên wê Kurd bûn tu nebû. Bineciyên wê navçeyê ne dixwest bigihîjin Tirkiyê, ne jî Iraqa bin mandatiyê. Di derheqa wê yekê da şerkariya Kurdan a pirsalî bona mafên xwe yên gelî, bi serokatiya Şêx Mehmûd û serokên Kurdan ên mayîn ku li navça Mûsilê bûn, şehadet dide. Lê mafên Kurdan ên millî ne xema empêryalîstên ingilîz bûn, ne jî xema milletçiyên Tirkiyê bû û wan dixwest bextê Mûsilê bi destê xwe safî bikin.

Di civîna Şêwra Koma Milletan a 24 cotmeh 1924 da, tixûbê wedelî di navbera Tirkiye û Iraqê da ku,

Institut kurde de Paris

eyan e, wek "Xeta Brukselê" hat testîq kirin. Kommîsyona bona lênihêrînê (di nav wê da mîrlaw (graf) P. Têlêkî, M. Wîrsên û serhing Taûlîs), ku di 30 cotmeh 1925 da bi biryara Şêwra Koma Milletan hatibû saz kirin, di dawiya çileya pêşîn 1925 da hate Mûsilê. Wê dest pê kir agahdariyan berhev bike, bi tebiya wilayetê ra bibe nas, xwe bi bineciyan bide nasîn. Di 20 nîsan 1925 da, Kommîsyon li Jenêv berhev bû, lê di 3îlon da wê dokumenta ku tê da piştgiriya Koma Milletan kir û biryar bona 25 salan hatibû testîq kirin raberî Koma Milletan kir. Anegorî wê, diviya admînîstrasyona Kurdan, mehkema wê, organên wê yên ronahîdariyê hebûna, lê zimanê kurdî wek zimanê resmî dihate hesab kirin **(181, 1926, N° 2, r. 137)**. Li vira divê bê hesab hildan ku ew biryara ku Ingilterê wek argument bona kara xwe, ku Mûsilê bigihîne Iraqê, bi kar anî Kommîsyonê pey serhildana Şêx Seîd qebûl kir. Tevî wê yekê, serhildanê ferzend da agahdariya dêlêgasyona Tirkiyê li Lozanê, ku dida bawer kirin ku giva milletên biçûk "di nava rejîma Tirkiyê da ji bext û qederê xwe gelek razî û memnûn in", inkar bikin **(100, r. 293)**.

Di nava fikrên kommîsyonê da hatibû nîşan dan ku divê ji wan bîr û baweriyên Kurdan ra, ku wan (Kurdên wilayeta Mûsilê) gotine, jî hesab bê kirin. "Eger em tenê aliyê etnîkî hildin ser hesêb - di nava fikrên kommîsyonê da dihate gotin -, divê em bên ser wê bîr û baweriyê ku divê dewleta Kurdan a serbest bê saz kirin, ji ber ku Kurd li vira dikin 5 heştaniya (weke 60%) ji bineciyan" **(94, r. 235)**.

Di nava meha îlonê, 1925 da, di civîna Şêwra Koma Milletan da, nûnerê Ingilterê da bawer kirin ku li Iraqê gelek mafên Kurdan hene, ew jî di wê çaxa ku tê da ew li Tirkiyê tên zêrandin. Wî di nava wê yekê da Tirkiye gunehkar kir ku "wê tucar soz ne daye ku mafên Kurdan ên millî biparêze, çawa ku ew yek Ingilterê kiriye". Lê nûnerê Ingilterê yê wê demê dixwest isbatan fe'ş bike, fikra mexlûqetiyê tev hev bike. Rewşa Kurdên Iraqê ji rewşa Kurdên Tirkiyê hinek dihate cuda kirin.

Di nava bersîva xwe da nûnerê Tirkiyê tenê ew argumenta kevnbûyî diwekiland ku giva di welatê wî da mafên Kurdan û Tirkan weke hev in. Bi gotina wî, Kurd li Tirkiyê xwediyên wan mafan in, çi ku Tirk in. Û ew agahdarî pey bi hovîtî hincirandina serhildana Şêx Seîd hat kirin.

Nûçevanê "Times" ku di derheqa tabiya hukûmeta Tirkiyê di hindava pirsa tixûbê Iraq-Tirkiyê da dinivîse, nîşan dide ku maniya herî sereke ew pirsa Kurdan li Tirkiyê ye. Di nava gotûbêjên şexsî da, - rojnamevanê Ingilîz dinivîse - gelek caran bi wê fikrê qayil dibûn, lê ew yek tucar di weşanê da ne dihate nivîsîn. Rast e, nûçegihan di derheqa lazimiya wergirtina Mûsilê di nava teşkîla Tirkiyê da nivîsiye, lê gelek Tirk li ser wê bîr û baweriyê bûn ku ne ewqas giring e ku Mûsil bikeve nava axa Tirkiyê, çiqasî ku giring e ku bineciyên kurd bi temamî bikevine nava teşkîla welêt. Dema qisa tevî nûçegihan, zabitekî tirk ê bi nav û deng da zanîn ku ew dawekariya Tirkiyê ku Mûsilê careke din bidin wê ew e ku bi wê yekê va hemû Kurdan bikin bin bandûra Tirkiyê. Wî usa jî kemaleke mezin dida wê yekê ku hemû Kurd bigihîjin Tirkiyê. Dikare biqewime - wî daye zanîn - ku Kurd ewê di bin bandûra Ingilîzan da hîn rind bijîn, ne ku di bin bandûra Tirkiyê, û dibe ku Kurdên Tirkiyê hevsûdiya xwe bi Kurdên usa ra bikin, xweziya xwe bi wan bînin. Ewê Tirkiyê mecbûr bike ku hergav li wilayetên rohilatê gelek hêzên eskerî ku ewê gelek hukm li ser rewşa welêt a malî bikin xwedî bike" **(261, 12.2.1926)**.

Qewimandinên duwerojê nîşan da ku ew bîr û bawerî bi bingeh bûn. Bi rastî jî dîwana Tirkiyê hergav gelek esker li rohilata welêt xwedî dikirin.

Di nîveka îlonê da, Şêwra Koma Milletan girêdayî belgeya kommisyonê ra xwe mukur hat ku pêwîst e fikra Mehkema Navneteweyî li Den-Hagê pê bihese.

Ingiltere li ser a xwe sekinîbû ku mehkeme izna arbîtrajê bide Şêwra Koma Milletan, lê Tirkiye, ku

haya wê ji fikra Şêwrê hebû, qayil bû ku ew tenê navçîgariyê bike.

Di kanûna pêşîn 1925 da, Mehkema Navneteweyî di derheqa wê pirsê da ev biryar derxist :

1) biryara Şêwra Koma Milletan a di derheqa pirsa Mûsilê da bona her du aliyan borclî ye û ew divê heta-hetayê di navbera Tirkiye û Iraqê da tixûb bide testîq kirin.

2) Ew biryar divê bi yekdengî bê qebûl kirin. Nûnerên wan welatan dikarin tevî dengdayîna Şêwra Koma Milletan bibin. Lê dema safîkirina pirsa di derheqa wê yekê da ku biryara Şêwrê hatiye qebûl kirin yan na, dengên nûnerên wan welatan nayên hesab hildan (88, r. 42).

Di 15 çileya pêşîn 1925 da, civîna Şêwra Koma Milletan a dawîn hat derbas kirin. Şêwrê wek bingeh "Xeta Bruksêlê" qebûl kir û ew wek xeta tixûb di navbera Tirkiye û Iraqê da hesab kir û mandata 25 salan raberî Brîtanya Mezin kir. Wan spart hukûmeta Brîtanyê ku mecalan bidin amade kirin bona ku statuya bi belge hatiye dîtin bidin bineciyên kurd. Di sibat 1926 da serekwezîrê Iraqê li parlementa Bexdayê da zanîn : "Em divên mafê Kurdan bidin wan. Mirovên li ser qulixê divên ji wan bin. Zimanê kurdî divê bibe zimanê resmî, lê zarokên wan divên di dibistanan da bi zimanê kurdî fêr bibin" (100, r. 293).

Lê ew yek ji serî hetanî binî vir û derew, dêmagojiya ku wan dixwest pê Kurdan bidin xapandin bû, ku ew rehet bimînin û fikra welatên mayîn bixalifînin.

Biryara Koma Milletan di derheqa pirsa Mûsilê li Tirkiyê da bi nerazîbûneke mezin va hate qebûl kirin. Ewha, rojnama "Hukumiyeti milliye" di hejmara xwe ya 15mîn, a adar 1926 da bi berxweketin nivîsî : "Hemû pêşniyarên Ingilterê di derheqa pirsa Mûsilê da hêjayî ecibandina Koma Milletan bûn. Hêjayî guhdariyê ye ew yek ku otonomiya fireh divê bidin Kurdan li navçeyên wilayeta Mûsilê ... Wek me êdî nîşan daye, daxwaziyên Ingilterê dijî kara Tirkiyê ye ... Mûsil pareke welatê Tirkiyê ya

Institut Kurde de Paris

neveqetiyayî ye, tu tişt nikare Mûsilê ji destê me hilîne, tu tewlebaziyeke siyasî nikare hukm li ser me bike, kemala wan bona me qet ne hêjayî tişteki jî ye".

Lê dîsa jî hukûmeta Tirkiyê hazir bû ku tevî Ingilterê danûstandinên kîp bike. Eger li rastiyê bikeve, daxwaziyên van herdu welatan di pirsa Kurdan da ketibûne hev, ji ber ku ew herdu jî dixwazin tevrabûna Kurdan a azadariyê bihincirînin.

Wezîrê Brîtanyayê yê karên derve, Chamberlen, û wezîrê hebsxanan, Emery, pey qebûlkirina biryara Şêwra Koma Milletan bi agahdarî pêş da hatin û tê da qayilbûna Ingilterê testîq kir ku wan şertên ku Koma Milletan pêş da kişandine qebûl bikin. Tevî wê yekê, Chamberlen hêviya xwe ku qayilbûna Tirkiyê dest bîne nîşan da "bona wê yekê ku bê bawer kirin gelo nikarin şertekî usa bibînin ku pê va pêwendiyên her du welatan bên mehkeme kirin, lê tevî wê yekê, usa bikin ku ji biryara Şêwra Koma Milletan ra jî hesab rûnên". Hevraqailbûna usa hate peyda kirin, dû aktên dîplomatîk ên demdirêj, ew jî bi hesabê şerkariya Kurdan a azadariyê.

Ewha, di 5 hezîran 1926 da, di navbera Brîtanya Mezin, Iraq û Tirkiyê da peyman hate qol kirin û tê da xelek dihatibû nivîsîn ku di nava 25 salan da divê 10% ji nefta ku Iraq ji şirketa Ingilterê distîne bide Tirkiyê (77, r. 9). Lê Iraqê ew yek ne xwest, lê dewsa wê bi neqd 500.000 frengên sterlîng xwestin.

Şerkariya di navbera Tirkiye û Ingilterê da ji bo wilayeta Mûsilê, ku ji sala 1919 da dest pê bûbû, bi vî awayî xelas bû. Derbaskirina tixûbê nuh perçekirina Kurdistanê û gelê kurd xurt kir û pirsa Kurdan ne tenê li Tirkiyê ne hat safî kirin-hel kirin, lê usa jî li Iraq û Îranê.

Institut kurde de Paris

# BEŞ III

## SIYASETA MULAYIMKIRINA KURDAN Û SERHILDANA ARARATÊ

1. Tevrabûnên Kurdan û mecalên polîsî-admînîstratîf bona hincirandina wan (1925-1927) û bi hovîtî hincirandina serhildana Şêx Seîd hêza şerkariya Kurdan a azadariyê ne şikand. Di wan şertan da hukûmeta Tirkiyê, tevî karê şerr, mecalên admînîstratîf xurt kirin û bi wê yekê va dixwest li dawiyê şerkariya Kurdan vemirîne. Di dawiya gulan 1925 da, Kommîsarya karên hundirî miqale di derheqa sansurkirina nûçevaniyê li wilayetên rohilatê da hazir kir. Anegorî wê miqalê, qutiyên postê diviyan tenê bi huzûra casûsên sansurê bihatana vekirin. Wan ew karmendên ku di nava belavkirina nûçeyên lênenihêrî sûckar bûn didan mehkemê. Tenê bi zimanê tirkî dikaribû têlêgraman bişînin wan navçan. Rojname û weşana herdemî di bin sansurê ra derbas dibûn **(202, 24.5.1925)**.

Lê hinek kom li Tirkiyê derc dikir ku tenê bi mecalên eskerî û admînîstratîf pirsa Kurdan nayê hel kirin. Wan pêşniyar dikir ku tevî wan mecalan çend rêformên civakî-aborî li Kurdistanê bidin derbas kirin, çi ku bi bîr û baweriya wan divê şerkariya Kurdan a azadariyê bida hilanîn.

Wek ku weşana Tirkiyê dida zanîn, di destpêka hezîrana 1925 da hukûmetê 15 kommisyonên ku diviyan biçin wilayetên rohilatê, bona ku di nava wan problêmên girêdayî hazirkirina rêforman da lê hûr bin, saz kirin **(212, 5.6.1925)**. Hema wê mehê, hukûmetê biryara di derheqa hesabkirina milk û hebûna bineciyên gund û bajaran da, ku ji ruyê cezakirina hukûmetê bûne mihacir, da qebûl kir. Hebûna wan mirovên ku tevî şerrê partîzaniyê bûn diviya ji destê wan hildana û di torgan da bifrotana **(202, 21.6.1925)**.

Institut Kurde de Paris

Weşana Tirkiyê guhdariya hukûmetê danî ser lazimiya lênihêrandina pirsa xweliyê li wilayetên rohilatê. Wê ku hilanîna aşarê dieciband dida xuya kirin ku tenê hilanîna wê tu kareke berbiçav ji gundiyan ra nayne. Divê ku xweliyê bidin wan **(235, 24.5.1925)**. Lê wê demê dîwanê hêviya sereke danîbû ser hêza eskeriyê bona bigihîje armancên xwe, bineciyên welêt ên kurd bide mulayim kirin.

Di 21 cotmeh 1925 da, meclisê pêşniyara hukûmetê di derheqa dîsa ser salekê dirêjkirina halê eskerî ku di navça serhildana Şêx Seîd da hatibû îlan kirin eciband **(78, dîwan 4, r. 5)**. Çar rojên din şûn da, wê pêşniyara hukûmetê ya nuh di derheqa li ser mehekê îlankirina halê eskerî li wilayeta Erzurûmê testîq kir. Ew pêşniyar pey pêşdahatina Ismet Paşa, ku îlan kir : "Bona wê yekê ku dûgera mirovan bidin xurt kirin, di hemû navçeyên Erzurûmê da halê eskerî hatiye îlan kirin. Em dixwazin berk kar bikin, bona çend teşkîldarên serhildanê bigirin û ceza bikin", hêjayî ecibandinê bû **(185, 26.11.1925)**.

Li Erzurûmê, mehkema eskerî-deştê hat saz kirin, lê mehkema serbest a Ankarê dîsa destûr stend ku bê testîqkirina meclisê gullekirinan derxe.

Ne dardakirina serokên serhildana Şêx Seîd, ne jî ferzendên cezakirinê nikaribû şerkariya eşîrên Kurdan a azadariyê bidin hildan.

Di mehên hezîran û tîrmeh 1925 da, li qezayê Şemdînliyê (wilayeta Hekkarî), bawer bike li ser tixûbê Îran-Iraqê Seîd Ebdullah, lawê Seyid Ebdulqadirê dardakirî, serhildan kir. Pey serhildanê, ev qewimandin bûn. Seyid Ebdullah ji Nehriyê (wilayeta Hekkariyê), ku di derheqa dardakirina bavê xwe û birayê xwe Seyid Mehmed da hesiya (ew ji sala 1924 da li wira dima), çû Îranê, li bal serokên eşîra koçeran, Cangîr Axa û Midhat Xan, yên ku 500 esker dane wî. Paşê Seyid Ebdullah di derheqa planên xwe da ji kurmamê xwe, qaymeqamê Rewandûzê, Seîd Taha ra got **(93, r. 109)**. Wî jî 200 eskerên Kurdan ên çekdar dan wî. Bilî wê, Kurdên ji eşîrên mayîn jî hatin, gihîştin wî. Bi wan eskeran va, Seyid Ebdullah vegeriya Şemdînliyê û serhildan tev rakir **(240, 1966, hejmar 174, r. 13)**.

Dîwana Tirkiyê eskerên hukûmetê şandine ser pêşmergan. Di hezîran 1925 da, qumandariya ordiya 3mîn agahdarî da weşandin û tê da îlan kir ku serhildana li qezayê Şemdînliyê hatiye hincirandin, lê serokê wî Seyid Ebdullah reviyaye welatên derve, ku li wira sitara mihaciriyê bibîne **(261, 23.7.1925)**. Û bi rastî jî, pey ketina serhildanê Seyid Ebdullah li Îranê dijiya.

Di behara sala 1926 da, komên Kurdan ên pêşmergan, ku xwe pey hincirandina serhildana Şêx Seîd li navçeyên çiyayî veşartibû, rabûn şerr. Di adara 1926 da, desteyên Haco, Emîn Axa ji tixûbê Tirkiye-Sûriyê derbas bûn û hatin gihîştin hetanî Midyatê **(235, 19.3.1925)**. Qumandariya Tirkiyê parên eskerên dîvîzyona 2, 12 û 48 şandin bona hincirandina ocaxên serhildanê yên nuh. Ji ruyê wê yekê, pêşmerge ji hev belav bûn, lê serokên wan, Cemîlê Çete, Ebdulkerîm û hinekên mayîn, hatin girtin û şandin Diyarbekirê bona li mehkema serbest bên mehkeme kirin. Emîn Axa, Haco, Nûh Beg **(20)** û hinekên mayîn li hev hatin ku xwe veşêrin, an jî birevin Iraq û Sûriyê. Bi vî awayî, ev prîska serhildana Kurdan jî hate hincirandin.

Di mehên hezîran û Tîrmeh 1926 da, ji Bexdadê agahdarî hatin stendin ku li navçeyên Tirkiyê yên cihê-cihê dest bi serhildanên Kurdan ên nuh bûne. Ewha, li rex gola Wanê desta Kurdan ji 600 mirov tevî eskerên Tirkan ketin qal û cengeke ku weke 7 saetan kişand. Hema wê demê, şerrekî usa, weke 20 kîlomêtr dûrî Bitlîsê, tev rabûbû. Pêşmergan gelek gund û bajar xistin bin destên xwe. Wan li Çelemerîkê walî dîl girt, topek û gelek cebirxaneyên eskerî zevt kirin. Kurdan eskerên Tirkan ku serokatiya wan Suleyman Sebrî Beg dikir hincirandin **(247, 3.6.1926)**. Li navça Licê koma pêşmergan bi serokatiya şêxê bi nav û deng, Tahir, ku sê salan dîwana Tirkan mecbûr kiribû ku ji destê wî ji tirsê zare-zar be, ku tawa Tirkan di destê wî da tu nebû , şerr dikir **(185, 26.5.1925)**.

Payîza sala 1926, eşîrên Celaliyan, Hesenan, Cibran û Heyderan vekişiyan navçeyên Araratê û dest bi

Institut kurde de Paris

serhildana nuh ku serokatiya wê Berxoyê ji eşîra Celaliyan dikir kir **(126, r. 247)**. Di nava salên 1926-1927 da, desteyên Kurdî yên pêşmergan li qezayên Xinis, Warto, Mûş, Solxan, Çapakçûr, Kîgî, Tercan, Genc, Licê û yên mayîn şer dikir **(128, r. 149)**, ango li ser axa nuh ya wilayetên Bingol, Mûş, Bitlîs, Diyarbekir û Mêrdînê.

"Milliyet" ku di derheqa serhildanên li wilayetên welêt ên rohilatê dinivîse, di 9.10.1926 da daye zanîn ku "qaçaxî" kêm dibe, lê gelek caran "cerd" êrîş dikin. "Ew qeziye - rojname dinivîse - kêm bûye ji ruyê karkirina mehkema serbest ku ... her tiştên lazim dike bona kokbirîna qaçaxiyê" **(28, dîwan 61, r. 24)**.

Û bi rastî jî, mehkema serbest ku bi programa Ankarê dihate serkarî kirin, di hindava tevgelên tevgera Kurdan da hovîtiyeke bêhempa diyar dikir. Ewha, di salên 1926-1927 da, wan dîsa gunehê gullekirinê ji tevgelên serhildana Şêx Seîd û pêşdahatinên dijî hukûmetê yên mayîn derdixist. Di wî zemanî da, wan gullekirin ji Hemidoğlu Şeref (ji Çelemerîkê), Abdulkadiroğlu Mehmedê ji Çapakçûrê (ew berê cendirmê Tirkiyê bû, hat gihîşt eskerên Kurdan û tevî êrîşkirina Diyarbekirê bû), serokekî serhildanê Hecî Ömeroğlu Fermo - alîkarê Şêx Seîd ê nêzîk -, Ömeroğlu Ömer (ji Xanî) **(269, 6.10.1926)**, cendirme Ramanoğlu Emîn (ji Wêranşehirê) **(251, 8.11.1926)**, Mustafaoğlu Huseyn û Köroğlu Huseyn ku desteyên wan tevî koma Şêx Huseyn alaya cendirman a 7mîn li navça Kazîgê şikand **(28, r. 161, belge 540-541)**, avukat Melek Parso (ji Midyatê) ra derxist **(21)**.

Mehkemên serbest bi zordayîna hukûmetê cezayên gelek giran ku ne bi dilê endamên mehkemê-dadgehê bûn jî derdixistin. Ewha, li Xarpûtê endamên dadgehê dicedand ku tevî civînên mehkemê nebin û çend caran pirs danîne ku dewsa wan bira dadkerên mayîn bên, loma jî usa diqewimî ku endamên dadgehê carna ji qulixa xwe dûr diketin, ne dihatin mehkemê. Ji bo nimûnê, sedrê mehkema serbest yê Xarpûtê, Hecî Muhiddîn Beg (parlementerê ji

Gîrêsûnê), bi resmî çû betlanê, paşê berk sekinî û got ku êdî naxwaze vegere Xarpûtê û hêvî ji meclisê kir ku wî ji kar azad bikin, ji ber ku saxiya wî xwedê giravî ne baş e. Meclis mecbûr ma ku hêviya wî qebûl bike. Du meh lazim bûn ku dewsa wî meriveki din bibînin. Di 6 çileya paşîn 1926 da, li meclisê, parlementerê ji Kozanê, Alî Sahib **(22)**, wek sedrê mehkema serbest li Xarpûtê îlan kir. Bi hovîtî zêrandina niştimanwerên Kurdan gelek bi dilê hukûmetê bû û bi pêşniyara wê meclisê di 28 sibat û 18 gulan 1926 da biryar qebûl kir ku karkirina mehkema serbest li Xarpûtê salekê jî bide dirêj kirin. Di çileya pêşîn 1926 da, wê mehkemê li xebata 96 Kurdên Dersîmê ku di nava tevgeliya serhildana Şêx Seîd da dihatin gunehkar kirin nihêrî, û ji bo 8 mirovan cezayê gullekirinê derxist, 5 mirov hetanî dawiya jiyana xwe da girtin û 83 mirov jî mihacirî navçeyên welêt ên roavayê kirin ku li wira kar bikin **(251, 29.12.1926)**.

Serokekî Kurdên Dersîmê yê bi nav û deng, Seyid Riza, dijî komên Tirkiyê yên rêaksyonêr û siyaseta wan a şovînîst dipeyivî. Wî gelek caran têlêgram dişandin Ankarê û tê da dixwest ku pêşiya cezayên gullekirinê yên Kurdan bigirin û dev jê berdin. Lê ew hemû bê guhdarî diman û pişt guhê xwe va davêt. Em bêjin ku waliyê Diyarbekirê, Elî Cemal, bona ku rastî Seyid Riza bê, hate Dersîmê. Ew li gundê Karaçayê rastî hevdu hatin. Elî Cemal ji qisevanê xwe ra dida bawer kirin ku ew gelek qedrê Dersîmiyan digire, ji ber ku bixwe Elewî ye (Qizilbaş) û ewê bigihîje wê yekê ku wan xweliyên ku Ermeniyan li navça Erzincan-Elazîzê "hiştine-çûne" di nava bineciyên Dersîmê da bide belav kirin. Wî da zanîn ku li Dersîmê ewê dibistanên ku dersdayîna wan ewê anegorî dogmên şîiyan bê derbas kirin bên vekirin, ewê bexşandin bidin eşîra Kiçgirî **(126, r. 190)**, ku piraniya wan pey serhildana salên 1920-21 bar kir hatin Dersîmê. Pey wan sozdayînan, Elî Cemal li ber Seyid Riza fen-fêl kir bona ku hevpeyvînên li Xozatê (navbenda Dersîmê) berdewam bikin, ji ber ku mufettişê eskerî Izettîn Paşa û

Institut kurde de Paris

waliyê Elazîzê Elî Riza ji Diyarbekirê hatine wira. Wê gavê, peyvê demdirêj ê Izettin Paşa ji nûnerên Kurdan ra (Mehmet Nûrî Dersîmî jî bi Seyid Riza ra hatibû Xozatê) da bawer kirin ku mafên bineciyên Dersîmê yên millî ewê bên parastin **(126, r. 191)**.

Pey buhurandina demeke kurt, Elî Cemal wek waliyê Elazîzê û Elî Riza waliyê Diyarbekirê hatin nas kirin. Ango, wan ciyê karê xwe bi hevdu ra guherand. Xuya ye ku dîwana Tirkiyê dixwest ku hukmê Elî Cemal li ser pareke eşîrên Dersîmê bi kar bîne. Çend serekeşîrên Dersîmê, ku dîsa siyaseta bi dilê Tirkiyê derbas dikir, herweha Îbîş Zekî jî bêtir li walî diqesidî û jê ra digot ku ew dostên Tirkan in. Di dilê xwe da, Elî Cemal çend serokên Kurdan ên bi nav û deng ên Dersîma rohilatê, herweha Îbîş Zekî, wek endamên şêwra herdemî ya wilayeta Elazîzê kifş kirin. Bilî wê, weke 2000 mal li deşta Elazîzê perçeyên xweliyê stendin. Bi zagona xusûsî dêra Holvênkê teslîmî Mehmet Nûrî Dersîmî kir. Tevî wê yekê, Elî Cemal dest pê kir serokên Kurdan bikire, bîne hêla xwe. Niştimanperwerên Dersîmê yên kurd ên ku bi serokatiya Seyid Riza doza ne ku "çavgirtinokê" lê ya mafên xwe dikir, di derheqa van hemû tiştan da helbet zanîbû. Di nava wan da : 1) vekirina dibistanên bê pere li Dersîmê. 2) amadekirina mamosteyên kurd. 3) bi hesabê dewletê pareke Kurdên genc bişînin Stembolê bo xwendinê, usa jî Ankarê û Awropayê. 4) pir û riyan çêkin. 5) malhebûna gundîtiyê û sinaetê pêş da bixin **(126, r. 192-193)**.

Lê pêkanîna wan de'wkariyan ne diket nava planên dîwana Tirkiya ku dicedand li Kurdistanê mulaymbûnê testîq bike û yekser plan amade dikirin ku serokên Kurdan ên bi nav û deng, axa, şêx û niştimanperwerên Kurdan ên navdar ji cî û warên wan bişihitîne û berê wan bide navçeyên welêt ên roavayê.

Di 31 gulan 1926 da, Meclisê Zagon di derheqa mihacirkirinê da qebûl kir **(hejmar 885)**, **(45, r. 25-28)**. Ew zagon destûr dida Şêwra Wezîran ku eşîrên koçer û wan bineciyên gundan mihacirî navçeyên sêrek (ku mirov li van deran hindik in)

bikin, ji ber ku şertên wan ên saxiyê pîs e yan jî rewşa wan a aborî xerab e, herweha wan mirovên ku casûsiyê dikin jî ji navçeyên ser tixûb raqetînin. Pêkanîna van ferzendên cezakirinê danî ser Wezareta Karên Hundirî **(miqal 3)**. Lê ew zagon bi rastî berê jî hebû, tenê vê carê "per û bask" dan polîsên dîwana Tirkan. Berî wê, di adara 1926 da, mala Fewzî Paşa, wezîrê berê, parlementerê ji Diyarbekirê mihacirî Ankarê kir, lê mala Bedir Axa, parlementerê ji Meletyê, şand Mersînê **(261, 30.3.1926)**.

Di destpêka meha gulanê da, ji navça Wanê çend malên Kurdan hatin Izmirê. Niyeta dîwana Tirkiyê hebû ku serhevdu weke 400 malên Kurdan cîguhastî Izmirê bike **(185, 3.5.1926)**. Tiştekî hewaskar e ku dîwana Tirkiyê dest pê kir wan serokên eşîrên Kurdan jî, ku di ji berê jî mêla Tirkan digirt, mihacir bike. Hinek ji wan dijî wî karî derketin. Weşana Tirkan ku di derheqa wê yekê da dinivîsî, dida zanîn ku ew serokên Kurdan ku bi fedakarî ber bi dîwana Tirkiyê dibin, divê qayil bibin ku mihacir bibin, ji ber ku dewlet usa dixwaze **(248, 3.5.1926)**.

Ji sala 1926 hetanî 1930, tenê ji Dersîmê weke 10.000 meriv cîguhastî wilayetên Elazîzê hatin kirin. Bi hezaran Kurdên koçer ji navçeyên Palû, Kîgî û Bitlîsê jî cîşihitî vira kirin **(126, r. 44)**. Lê ji gişkan zehftir Kurd mihacirî roavayê kirin, li Stembol, Izmir, Ödemiş, Manîs, Andin, Isparta, Burdur, Nixd, Kastamon, Edirne û ciyên mayîn.

Di sala 1926 da, waliyê Elazîzê, Elî Cemal, ra li hev hat delegasyonekê teşkîl bike û ku tê da nemaze serekeşîrên Dersîma Rohilatê hebûn, û ew şandin Ankarê bona "hurmeta xwe ya mezin nîşanî Mustefa Kemal bikin".

Li Ankarê, li avayiya meclisê, sedrê meclisê Kazim Paşa dêlêgasyona Kurdan qebûl kir. Di hevpeyvînê da wî da zanîn ku M. Kemal bi hatina dêlêgasyonê gelekî şah e, lê gelekî li ber xwe dikeve ku Seyid Riza tevî wê nîn e, usa jî ku çend serekeşîrên Dersîmê yên mayîn ne hatine. Paşê Kazim Paşa soz

da serokên Kurdan ku zûtirekê ewê li wan navçan riyên fireh bên çêkirin, li ku Kurd dimînin ewê dibistan û ocaxên çandî bên vekirin, hemû Kurdên ji wilayetên rohilatê cîşihitîbûyî ewê vegerin cî û warên xwe, eger Elî Cemal di derheqa daxwaziya wan a vegerê da ji meclisê ra bêje; bona wê yekê meclis ewê xwedê giravî zagona di derheqa bexşandinê (efû) da qebûl bike û ewê Dersîmî li aran û zozanên wilayetên Elazîz, Erzincan û Meletyê xwelî bistînin.

Ismet Paşa jî hema bi wê naverokê ber bi Kurdan pêş da hat. Pey demeke kurt, komên Tirkiyê yên serdest dest pê kir mecalên usa, ku ji wan xuya dibû ku ew giva sozdayînên xwe pêk tînin, qebûl kirin. Ewha, di çileya paşîn 1927 da, wezareta karên hundirî projeya zagonê di derheqa bexşandinê da amade kir û ew raberî lênihêrandina meclisê kir **(259, 9.11.1927)**. Lê ew proje tenê li ser kaxez ma.

Di 28 sibat 1927 da, Ismet Paşa li civîna koma parlementoyê ya PGR bi agahdariya di derheqa biryara hukûmetê ya bona hilanîna mehkemên serbest, ku zemanê karkirina wê di 7 adar 1927 da temam dibû, da pêş da hat. Di 2 adar da, ew biryar li meclisê hate testîq kirin **(98, dîwan S, r. 275)**. Ismet Paşa ku li meclisê peyivî da zanîn ku hilanîn-hêçkirina mehkemên serbest ewê ferzendê bide bajarvanan ku "di nava rewşeke hîn rehettir da" borcê xwe biqedîne, dema bijartina meclisê ya gazîkirina siyasî **(23)**, lê eger xwefiroş û neyar bicedînin dîsa kar bikin (wek bi kurdî dibêjin : lingê xwe li guhê xwe xin ) T.X.), wê demê meclis ewê dîsa biryar bike ku mehkemên serbest vekin **(185, 3.2.1927)**.

Anegorî zagona qebûlkirî, di 7 adar 1927 da mehkemên serbest ên Ankara û Xarpûtê karkirina xwe dane sekinandin, lê hemû karên li wir teslîmî mehkemên sade kirin.

"Milliyet" ku ew biryara dîwana Tirkiyê eciband, di 28 sibat 1927 da nivîsî : "Hukûmeta me hilda ser hesêb ku li welêt rewşeke seqirî û qayde-qanûn hatine testîq kirin, û hatiye ser wê baweriyê ku

mehkemên serbest ku xebata wan hêjayî pesndayîna herî mezin e ... êdî bingeha wan tu neye ku karkirina xwe berdewam bikin" **(28, 161, belge 522)**.

Tevî bîr û baweriyên siyasî, ku di derheqa wan da Ismet Paşa digot, faktorên mayîn jî hebûn ku mecbûr kir ku mehkemên serbest bidin hildan. Tevî vê yekê, pêşnivîsara rojnama "Ikdam", hejmar 28, ku di sibat 1927 da hatiye çap kirin, gelek hewaskar e : "Biryara hukûmeta me - tê da dihate gotin - di nava jiyana welêt da dewraneke nuh vedike. Ew isbat dike ku li vira êdî bona bineciyan tu qeziye tune. Sistkirin û sivikkirina mecalên cezakirinê û halê eskeriyê ewê hem li hundirê welêt, hem jî ji welêt der aminayiya me bide bilind kirin û ewê riya firehtir ji bo pêşketina aborî veke ... Gelek caran deng û basên vir û derew zerereke mezin didin kirîn-firotan û bazirganiyê. Lê deng û basên baş meriv ruhdar dikin. Eger em bi wê fikrê hildin, hilanîna mehkema Ankarê bi xwe kemaleke mezin e" **(28, 161, belge 523)**.

Ev nivîsarên weşana Tirkiyê şahid in ku rewşa terora eskerî û admînîsratîf-polîsî ne tenê nerazîbûna Kurdan, lê usa jî ya mexlûqetiya Tirkan ku dixwazin li hundirê welêt karê malhebûna gundîtiyê, usa jî pevgirêdanên kar tevî fîrmayên welatên derve pêş da herin, tev rakir. Tevî vê yekê, hukûmetê, ku nemithîmtiya rewşa li Kurdistanê texmîn dikir, biryar kir ku ewê li navça welêt halê eskeriyê bide dirêj kirin. Hukûmet bi kêlma Mustefa Kemal a li vekirina meclisê di 1 cotmeh 1926 da dihate serkarî kirin.

"... Ew ferzendên ku bona hincirandina şerkariya rêaksyonêr hatibûn pêk anîn, - wî digot -, û divê ku li wilayetên rohilatê bihatana mîaser kirin, di nava jiyanê da hatin pêk anîn û mefayên gelek baş dan. Ew mecal ... hukmekî baş li ser jiyana civakî û aborî ya hemşeheriyên me hişt ...".

"Civîna we mecbûr bû zagona di derheqa parastina qayde-qanûn da qebûl bike, bona karê wan kesên ku di bin behaneyên cihê cihê da ewê bixwestana

Institut kurde de Paris

millet ji wan mecalan bidin dûr xistin, ku meclisê van salên dawîn tê ra dîtine, şerpeze bike. Nuha gelek isbat hene ku rastiya qebûlkirina zagonê tînin ber çavan û bi wê yekê va hurmeta hukûmetê tê bilind kirin ... Eger lazim bibe, meclis dikare pirsa di derheqa dirêjkirina wê da lê binihêre û dikare biqewime ku ew li ser demekê jî bê dirêk kirin **(185, 2.11.1926)**.

Bi vî awayî, hela çar meh berî temambûna dema zagona di derheqa parastina qayde-qanûnan da, biryar hat stendin ku karê wê dîsa dirêj bikin.

Di 2 adar 1927 da (roja qebûlkirina biryara di derheqa hilanîna mehkemên serbest da), Meclisê guhastin kire nava wê miqala zagonê ku tê da tê gotin : "Zagona di derheqa parastina qayde-qanûnan da, ku ji 4 adar 1927 kar dike, heta 4 adar 1929 wek berê dimîne" **(78, dîwan 5, r. 89)**

Bi vî awayî, bi wê yekê va, li wilayetên rohilatê û bakurê rohilatê halê eskeriyê jî du sal hat dirêj kirin.

Hukûmetê, ku texmîn dikir ku tabiyên wê li Kurdistanê sist in, tevî ferzendên cezakirinê mecalên admînîstratîf ku bi bîr û baweriya wê diviyan giyanê (ruh) gelê kurd ê azadariyê qels bikin jî pêk dianîn. Di 10 hezîran 1927 da, meclisê zagona di derheqa mihacirkirina Kurdan ji wilayetên rohilatê ber bi yên roavayê da qebûl kir. Ew zagon N° 1097 bû **(54, r. 28-30)**.

"Di hêla admînîstratîf, eskerî û mexlûqetiyê da, - di zagonê da dihate nîşan dan -, wekîldarî dane hukûmetê ku weke 1.400 meriv, tevî neferên malên wan û 80 malên nesitirî (yên ku tevrabûnê dikin), usa jî wan merivên ji wilayetên rohilatê (wilayetên ku halê eskerî tê da heye) û wilayeta Bazîdê biguhêzin navçeyên roavayê, ango wan mirovên ku li wan wilayetan gunehkariyên giran kirine jî (miqal 1). Eger em hildin ser hesêb ku malên Kurdan ji dudu an jî bêtir malbatan in, wê demê meriv dikare têbigihîje ku jimara Kurdên ku ketine ber mihacririyê gelek mezin e.



Institut kurde de Paris

Di miqala zagonê ya duduyan da tê dîtin ku di dawiya tebax 1927 da ewê mihacirbûnê xilas bikin. Malên xwedî milk û xwelî dikaribûn hetanî dawiya meha novembr 1927 li ciyê xwe bimînin. Ew yek şehadet dia ku berî gişkan koçer mihacir dibûn, ji ber ku ew gelek beter û şerbaz bûn".

Anegorî miqal 3, "yên destteng" bi transport û xurekê bona rê bê pere dihatin razî kirin. Lê Kurdan bi piranî kîsî wan dişandin wilayetên roavayê.

Anegorî miqal 5, Kurd diviyan biçin wan navçeyên roavayê ku tê da hukûmetê ew cî veqetandine. Ew Kurdên hebsî jî pey derketina ji kelê diçûne wira. Lê destûra Şêwra wezîran hebû ku nehêle ew tevî neferên mala xwe bên wira. Di paşdemê da Kurd dikaribûn aza di nava welêt da bigerin, lê izna wan tu nebû ku vegerin wilayetên rohilatê.

Ev in fikrên zagon N° 1097 yên bingehî, ku ji ruyê wê bi hezaran malên Kurdan ku piraniya hebûna xwe hunda kir, mihacirî wilayetên roavayê bûn.

Weşana Tirkiyê ew zagon bi ruhdarbûneke mezin va qebûl kir. Rojnama "Hakimiyetî milliye" di 19 hezîran 1927 da nivîsiye : "Hukûmet ku ew zagon qebûl kir borcê xwe yê merivhiziyê diqedîne û piraniya þineciyên wilayetên rohilatê ji destdirêjiyên "şêx û began" aza dike".

Ji ruyê "azabûna" usa, anegorî nivîsara V. Nikitin, dîwana Tirkiyê di nava salên 1926-27 da weke milyonek Kurd (mêr, jin û zar) mihacirî Anatolya Roavayê kir, zordestiyeke wek ku dianî serê Ermeniyan di dema cîşihitandina wan di dema şerrê hemcihanî yê pêşîn da li wan dikir **(100, r. 90)**.

Lê zêrandin û cizaretên eşîrên Kurdan bi mihacirbûnê va xelas ne bûn. Dîwana Tirkiyê ya cî, ku di navbera eşîran da dîsa dijminatî pêş da dianî, dicedand çend eşîrên Kurdan dijî Seyid Riza derxe û bera Koçan (ji Dersîma roava) ku bi awakî aktîf piştgiriya S. Riza dikir bide. Ewha, waliyê Elazîzê, Elî Cemal, rastî nûnerên eşîra Avacîkan (Arslan, Beytan, Pezgewran û Meqsûdî) hat û soz da wan ku alîkariyê bide, eger ew bikaribin qebîla Koçan wergerînin,

bînin hêla hukûmetê. Wî careke mayîn nîşan da ku eger eşîra Koçan bê hêla Tirkan, hemû pirs ewê li Dersîmê bên safî kirin : eger hukûmet ji hal û demên wê navçê razî be, ango rewşa navçê bi dilê wê be, ewê hemû dawekariyên Dersîmiyan miaser bike (126, r. 199).

Nûnerên eşîrê, yên ku agahdariya Elî Cemal bihîst, soz da ku rojtira mayîn bersiva wî bidin. Lê ji serokên Kurdan rojtira mayîn tukes ne hat. Serokên Kurdan ku derc kir ku dîwana Tirkiyê, pey hincirandina Koçanan, ewê dora eşîrên din bîne, paşdemê nameya bersîvdayînê ji Elî Cemal ra şand û tê da wan qayilbûna xwe diyar dikir ku bi van şertan pêş da bên :

1- Eskerên Tirkan ewê neyên şandinê ser xeta tebiyên şerr ku tê da bineciyên Ovacikê dijîn, û ew yek ewê pevçûyîna Kurdan tevî eskerên Tirkan bide hildan.

2- Qumandariya "pêşeniyê" li Ovacikê datînin ser Mehmet Nûrî (Dersîmî).

3- Dîwana Tirkiyê borc hilda ser xwe ku çiqas çek lazim e, ewqas bide Kurdan (126, r. 200). "Qayilbûna" serekeşîran Elî Cemal ku ew qewl qebûl kirin û çû Elazîzê kir nava gêjgerîngê.

Hemû eşîrên Kalanê, ku di bin destê xezûrê Mehmet Nûrî Elî Axa da bûn, îlan kir ku naxwazin tevî mulayimkirina eşîra Koçan bibin. Lê dîsa jî dîwana Tirkiyê ji Elazîzê alaya eskerî, ku bi qumandariya Heyder Paşa û bi alîkariya çend serokên Kurdan dor-bera eşîra Koçanan girt, şand navçeya Çemîşkezekê. Eşîrên cîran ên Rêsikan û Şemkan biryar kir ku herin pişta Koçan. Heyder Paşa ber bi wan her sê eşîran bû, ji bo ku teslîm bibin û soz da ku wan ciguhastî deşt-beyarên wilayeta Elazîzê bike. Eger na, wî got, hemû Kurd, herweha jî zar jî, ewê bên kuştin (126, r. 200).

Di nava vê rewşê da, eşîrên Ovacikan a cîran borcê xwe hesab kir ku alîkariyê bidin birayên xwe yên xwînê. Anegorî peymana girêdayî, wan ji walî Elî Cemal çek û cebirxane stendin û payê wê ya bêtir

Institut kurde de Paris

şand bona Koçanan. Koçaniyan, ku hêviya xwe danîbû ser piştgiriya eşîrên cîran, dest pê kir zor bidin eskerên Tirkan, nemaze li para başûr û roavayê. Xwezma wan bi şev rind şerr dikir.

Heyder Paşa, ku dîna xwe dida têkoşîna Kurdên ku dijî hêzên Tirkiyê yên pir şerrekî ne wekhev dikir, mecbûr bû ku îlan bike : "Eger eskerên min wek eskerên Kurdan ji wan eşîran hebûna, minê temamiya cihanê zevt bikira" **(126, r. 201)**.

Di nava şerrên giran da, eskerên Tirkan gelek eskerên xwe û tknîka şerr hunda kirin. Kurdan hela firindekê jî ji jor da anîn xwarê. Ev yek di navbera qumandarê alaya Tirkan Heyder Paşa û walî Elî Cemal da nerazîbûn û hêrsketineke mezin pêş da anî. Heyder Elî baweriya xwe bi wê yekê ne dianî ku eşîrên Kurdan yên Ovacikê ewê dijî Koçanan şer bikin. Bi fermana wî 3 tabûrên peya ji Erzincanê şandin Ovacikê, lê eşîrên Kurdan ji navçeyên şerr hatin derxistin. Ev mecal li dawiyê bixwe dijî Tirkan derket. Kurd ku vegeriyane wargehên xwe, dest pê kir êrîşî ser Tirkan bikin. Eskerên Tirkan ku ji riyên çiyayî yên bê fesal westiya bûn, ji ruyê êrîşên Kurdan ên zor ên ku bi şev dibûn bi temamî hatin rayê. Ewana ku birçî û cemidî bûn û ne dixwest ku li ciyê badihewa bimrin, tenê di derheqa xelasbûna xwe da difikirîn. Eskerên Tirkan dest pê kir çek û cebirxaneyên xwe bi Kurdan ra tevî beranan, bizinan, nan û xurekên mayîn biguherînin. Payîza sala 1927, gava êdî sur-serma diket, eskerên Tirkan şekşikestî mecbûr bûn vegerin Elazîzê.

Nerazîbûnên di navbera Elî Cemal û Heyder Paşa da hîn zortir dibûn, wan şikayetên xwe li ber wezareta karên derve û wezareta parastina millî dikirin. Demeke kurt şûn da, Heyder Paşa cîguhastî Erzincanê kir **(126, r. 202)**.

Bi vî awayî, bi saya berxwedayîna eşîra Koçanan û piştgiriya eşîrên Kurdan ên mayîn, planên Tirkiyê ku Dersîmê bînin rayê ji serî heta binî pûç bûn, ew ne gihîştin armanca xwe.

Tebiya Seyid Riza ku li dora wê hemû niştimanperwerên Dersîmê yên rast berhev bûbûn dijî Tirkiyê

jî gelek alî wê yekê kir. Lê dîsa jî hukûmeta Tirkiyê hela wê çaxê plan amade kiribû ku temamiya Kurdistana Tirkiyê qels bike, şerkariya Kurdan a azadariyê di nava xwînê da bimewicîne. Di derheqa wê plana nuh da emê li jêr ji we ra şirove bikin.

2. Teftîşa sereke û siyaseta "aştîkirina" Kurdan li Anadoluya Rohilatê

Siyaseta terorê, halê eskerî li wilayetên rohilatê, bi salan berdewambûna hukumdariya Kemaliyan gihandin gelek hişkkirina rewşa siyasî li welêt, bihêzkirina mexlûqetiya Tirkiyê. Loma jî di havîna sala 1927 da, hukûmeta Partiya Gel a Komarî biryar qebûl kir ku di dereca serkarîkirina wilayetên rohilatê da derbasî mêtoda nuh bibe.

Di 30 cotmeh 1927 da, li Ankarê civîna koma parlementerên Partiya Gel a Komarî bû. Serekwezîr Ismet Paşa, ku di wê civînê da peyivî, îlan kir ku pêwîst e dev ji zêrandina gel li wilayetên rohilatê berdin û dewrana rêformên aştiyê vekin. Serekê hukûmetê pêşniyar kir ku halê eskerî ku dema wî di cotmeh 1927 da xelas dibû nedin dirêj kirin û bona wilayetên rohilatê teftîşa sereke saz bikin. Bilî wê, wî pêşniyar kir ku projeya zagonê ya di derheqa wê yekê da, ku tê da dihat dîtin ku wan mirovan mihacirî navçeyên roavayê nekin, ku "keda" wan li ber welêt heye, ku wan merivên ku li wan navçeyên rohilatê mane muxlis bûne vegerînin cî û wargehên berê, bikin nava meclisê bona lênihêrînê. Tevî wê yekê, Ismet Paşa hêvî kir ku wê projeya zagonê ya di derheqa xurtkirina karê cendirman li Kurdistanê da testîq bikin. Koma parlementê ew pêşniyar eciband (216, 1.12.1927). Wezîrê karên hundirî ku dema enenekirina projeya zagonê li meclisê (5 çileya pêşîn 1927) aliyê hukûmetê girt û ew parast, îlan kir ku li wilayetên rohilatê rewş hinek rehet e, têkoşîn warguhêzî "qaçaxiyê" bûye. Bona dijî wan şerkariyê bikin, ne pêwîst e ku şerr bikin, tenê pêwîst e ku jimara cendirman bê ducar kirindubare kirin û jimara eskerên ser tixûb jî divê pirr bê zêde kirin. Hukûmet bawer e - wî gotina xwe

dûmayî kir - ku ji qolanê milê wê tê ku li her demî rewş bide xweş kirin, loma jî biryar kiriye ku li wilayetên rohilatê serkarîkirina sade ya normal bide testîq kirin. Bona dema normalkirinê, teftîşa bajarvaniyê gotî divê bi serokatiya mufettişê sereke bê damezrandin (216, 6.12.1927).

Di 25 hezîranê da, Meclisê zagon N° 1164, ku maf dida Şêwra wezîran ku dema pêwîst be teftîşên bajarvaniyê saz bike, qebûl kir û got ku teftîşên usa divên di her navçeyeke serkarîkirinê da, ku tê da çend wilayetên rohilatê hene, hebe (36, r. 68).

Di 27 cotmeh 1927 da, hukûmeta Tirkiyê talîmatên ku karê teftîşa bajarvaniyê nîşan dide îlan dikir qebûl kirin (36, r. 69). Anegorî wê teftîşê, wilayetên Elazîz, Urfa, Bitlîs, Hekkarî, Diyarbekir, Siirt, Mêrdîn û Wanê diketin nava navçeya idarî ya xusûsî ku di paşdemê da navê teftîşa sereke ya pêşîn lê kir (35, dîwan 9, r. 44).

Zagon N° 1164 a hema xût dijî Kurdan, ku li wan wilayetan bi piraniya bineciyên xwe va gelekî bi ser bineciyên mayîn bûn, bû. Ew ferzend-mecalên ku di nava wê zagonê da hebûn ne tenê diviya li navçeyên Kurdan rewş bidana mulayim kirin û seqirandin, lê usa jî alî helandin-asîmîlasyona Kurdan bikirana, ew jî bi destê zorê.

Rojnamevan Felih Fikrî, ku biryara meclisê ya di derheqa sazkirina navçeya idarî ya xusûsî li wilayetên Kurdan da şirove dike, di rojnama "Milliyet" a 2 çileya pêşîn 1927 da dinivîse : "Komara Tirkiyê êdî naxwaze di nava rewşa terorê ya herdemî da bijî. Ew mecalên sext bi we'delî hatine qebûl kirin û tenê bona wê yekê ne ku rewşê bidin mulayim kirin. Hema li wilayetên rohilatê rewş biseqire (xweş bibe), hukûmet ewê qayde-qanûnên normal saz bike, bona ku asîmîlasyonkirina Kurdan bi riyên aşîtiyê berdewam bike".

Ango, gilî di derheqa berdewamkirina xût di wê siyaseta dijî Kurdan da, di qewlên nuh da û bi metodên nuh va, bû. Di derheqa wê yekê da, weşana Tirkiyê eşkere dinivîsî.

Ewha, rojnama "Vakıt" di hejmara xwe ya 5 çileya pêşîn 1927 da nivîsiye : "... Ew mecal ewê guhartinên mezin nekin nava kûrsa siyaseta tomerî, ku hukûmetê pey hincirandina serhildana Şêx Seîd qebûl kiriye, da ...". "Vakıt" ku paşê îlan dike ku ne pêwîst e ku halê eskerî li wilayetên rohilatê berdewam bike, gotina xwe ewha dûmayî dike : "... Lê tevî wê yekê, ewê şaş bûya eger em bihatana ser wê bîr û baweriyê ku her ku hukûmet ew halê eskerî li wilayetê bida hildan, li wira rewş ewê bi carekê bihata pak kirin ... Zagona qebûlkirî divê bibe delîl bona normalkirina jiyana bineciyên wilayetên rohilatê".

Nuha em dîtina xwe bidin miqalên Zagonê di derheqa "teftîşa sereke" da, ku bikaranîna wê bi baweriya komên Tirkiyê yên serkarîkir divê li Kurdistanê rewşa jiyanê ya normal bikira. Di wê talîmatê da, xwezma kemala paragrafên 7-13 ku wekîldariyên mufettişê sereke nîşan dida, gelek giring bû (24). Li jêr em wan paragrafên talîmatê yên tam tînin :

7. Mufettişê sereke li navça di bin bandûra xwe da nûnerê hukûmetê yê emîn û yê çend wezaretan hesab dibe. Hemû qulixçiyên dewletê di bin qolê wî da ne, herweha walî jî di derheqa karkirina xwe da hesabdarî didin mufettişê sereke.

8. Walî û karmendên mayîn ku wek berê borcdar in ku zagonan bi kar bînin û gotî pevgirêdanên wan tevî wezaretan hebin, ... eger pêwîst be borcdar in ku di derheqa karkirina xwe da şirovekirin û malûmatiyan bidin mufettişê sereke, lê usa jî dokumentên pêwîst bidin wî. Mufettişê sereke organên bikêrhatî saz dike û walî û karmendên mayîn ên qulixbilind divê bona wan karan ber bi riya wan organan bibin ku nekevin nava karê wan. Mufettişê sereke rê nîşanî wan dide ku çawa pirsên pêşdahatî safî bikin.

9. Destûra mufettişê sereke heye ku dema pêkanîna borcê xwe ordî, cendirma û polîs bi kar bîne.

10. Eger pêwîst be, mufettişê sereke dikare ber bi wezareta karên derve bibe û de'wê bike ku ji wan

Institut kurde de Paris

wilayetan eskerên ku nakevin nava navça bin qolê wî bidin wî. Mufettişê sereke daxwaziya xwe ku hêzên eskerî bidin wî ji qumandarê ordiyê yê herî mezin ra dişîne, ku navçe di bin bandûra wî da dimîne, di wan de'wkariyan da ew bîr û baweriyên xwe di derheqa safîkirin-azirûkirina pirsdanîna pêşdakişandî da dibêje.

11. Di nava qedandina wezîfa xwe da, mufettişê sereke tenê li ber hukûmeta navbendî hesabdar û bersîvdar e. Anegorî miqala 3mîn a Zagonê, ya di derheqa teftîşa sereke da, mufettişê sereke dikare :

a) qayde-qanûn (dîssîplîn) û seqiriya (dilrehetî) mexlûqetiyê biparêze.

b) bikaranîna zagonan û pêşdanîna ber kontrol bike.

c) ber bi wezareta edaletê bibe bona ku bikaribe zagona tam bi kir bîne ... lê usa jî di derheqa her awayê derengîketina prosêsusekê da wezîrê edaletê agahdar bike.

d) bi riya lênihêrandina hemû daxwaziyên bineciyên cî, hemû ferzendan bi kar bînin bona parastina pêşveçûyîna aborî, saxî, civakî û çandî li navça di bin bandûra xwe da, hergav dîna xwe bide ku ew mecal berk û bi awakî rasyonêl di nava jiyana bineciyan da bê miaser kirin û herdem wî karî kontrol bikin.

e) mafên bineciyên wê navçeya ku di bin bandûra serkarîkirina wî da ne biparêzin.

f) mecalan bi kar bînin bona pakkirina jiyana bineciyan, jiyana eşîrên koçer bikin a reatî-rêcberiyê, gundiyan bikin milkdarê xweliyê, xwediyê wê.

g) eger walî û karmendên hukûmetê yên mayîn, ku bi bîr û baweriya wî ew di dereca testîqkirina dîssîplînê û seqirîbûnê da li navça ku di bin bandûra wî da ye bê kêr û bê kar in, divê bi fermana wî ji kar bên avêtin û raqetandin.

h) xebata hemû mufettişan û rêxistinên ronayîdariyê bidin teşkîl kirin.

Karê mufettişê sereke li wan şuxulan ne ketiye ku gotî kontakt û tevgirêdanan tevî welatên derve saz

Institut kurde de Paris

bikin. Wî karî karmend û organên anegor dikin.

12. Eger mufettişê sereke isbat bike ku rewşa sazbûyî qeziyaye an jî dikare bibe sebebê teribandina qayde-qanûnan li navçeya bin bandûra wî, ew dikare bi destûrdayîna wezareta karên hundirî li wê navçê halê eskerî îlan bike.

13. Mufettişê sereke ku hukmê wî gelek e dikare xebata organên dîwana cî kontrol bike. Loma jî walî û şêwrên belediyê tenê pey ecibandin-razîbûna mufettişê sereke biryarên xwe pêk tînin. Mufettişê sereke projeyên buceya dîwanên wilayetan paş da dişîne, eger bi bîr û baweriya wî di wan projeyan da kêmasî hene, an jî ew dijî zagonê ne.

14. Mufettişê sereke dikare, eger pêwîst bibe, idarên nîvê wilayetan bide saz kirin. Lê bona xwedîkirina wan, borc hildide ser xwe ku bi destê waliyan pere peyda bike bona wî karî.

15. Mufettişê sereke di 3 mehan de carekê rapor dide wezareta karê hundirî di derheqa mecalên parastina qayde-qanûnan û bêqeziyebûnên navçeyên di bin bandûra xwe da, usa jî bîr û baweriyên xwe di derheqa rewşa navçê da dibêje.

Mufettişê sereke perçeyên wan raporan, ku di derheqa wezaretên anegor da ne, kopî dike û wan ji wezaretan ra dişîne.

16. Wezareta karê hundirî kontrol li karkirina mufettişê sereke dike.

17. Şêwrdarê sereke yê pêşîn wek alîkarê mufettişê sereke hesab dibe û bi emrê wî kar dike **(35, dîwan 9, r. 20–23)**.

Tehlîlkirina miqalên wê talîmatê nîşan dida ku ewê mafên bêhempa (bê sînor) ji mufettişê sereke re, li navça welêt ku spartiye wî û ku di bin bandûra wî da bû, dihatin dayîn.

Wek ku mîlîtanê mexlûqetiyê yê bi nav û deng, rojnamevan Yûnis Nadî, di gotara xwe "Di mentiqên Rohilatê da" da nivîsiye (Cumhuriyet, 12 kanûna paşîn 1927), fikra temamiya siyaseta mufettişê sereke ew bû ku dîwana idarî bixin bin destê

mufettişê sereke ku di bin qolê wezareta hundirî da bû. "Ew mecal, - xudanê gotarê dide zanîn -, îzn dide temamiya dîwanê ku bikeve bin destê mufettişê ku ... dikare bi lez biryarên pêwîst bike ...". Yûnis Nadî, ku di derheqa wê yekê da dipeyive, dibêje ku serkarîkirina xerab ne tenê ji idareta xerab e, lê usa jî ji xerabzanîna xusûsiyetên aborî, çandî, moralî û yên wan navçeyên mayîn in. Ew ewha dinivîse : "Bona pêkanîna wan pirsên civakî, tedarukdîtina mezin pêwîst e. Gelo ewê baştir nîn bûya ku kommisyonên ji mutexessis-pêşekzanan, ku bikaribûna di nava demeke dirêj da li wan pirsan hûr binihêrin, hela biçûna nava gel bona bi hûrgilî li rewşê bibûna nas, malûmatên anegor berhev bikirana, ji fikra gel ra hesab rûniştandana..., saz bikirana". Yûnis Nadî lênihêrandin-lêhûrbûna problêmên wê navça welêt ên civakî-aborî, ku bineciyên wê bi "pêşketin û dereca xwe ya aborî û çandî va" ji bineciyên wilayetên mayîn gelek dihatin cuda kirin-cihê kirin, û giringiya wê rind derc dikir (fam dikir).

Dema pêşîn dihat texmîn kirin ku mufettişê sereke yê wilayetên rohilatê, Ibrahîm Talî Beg, jî (25) kemaleke mezin dide wan problêman.

Lê, wek ku qewimandinên paşdemê nîşan daye, karkirina wî ya bingehî ew bû ku problêma Kurdan bi mecalên eskerî-idarî bên safî kirin.

Rojnamevan Ahmed Cewdet, ku destpêka xebata Ibrahîm Talî Beg li Diyarbekirê silav kir, di 8 sibat 1928 da, di rojnama "Ikdam" da pêşniyar dikir ku ew guhdariya xusûsî daye ser pakkirina rewşa bineciyan. "Tirk, - wî nivîsiye -, gelek belengaz û sexîr in, loma jî slogana "dewlemend bin" divê ji bo hemû bineciyên welêt be. Lê kemala wê ya xusûsî bona wilayetên rohilatê ku tê da tengezarî, rebenî, belengazî pirr in heye. Divê her tiştî bikin bona halxweşiya gel û ez bawer im ku eger idaret (serokatî) biserxwe û jêhatî be, ewê bineciyên Tirkiyê di nava 10-12 salan da karibin rewşa xwe xweş bikin". Wê demê, pêşdanînên ehwa di nava weşana Tirkiyê da pirr bûn.

Di nîvê meha Kanûna Paşîn 1928 da, Ibrahîm Talî Beg hate Diyarbekirê. Di wê ziyafeta bona hurmeta hatina wî da, wî got ku bi daxwaziya hukûmetê ewê dest bi çêkirina riyan û xetên hesin bikin, usa jî ewê li wilayetên rohilatê dibistan bên çêkirin, lê di hêlekê da jî gef li bineciyan dixwar ku ewê cezayê giran bistînin eger xwe rehet xwedî nekin. "Xwestinên pîs û bêfeyde ewê bi hovîtî bên hûr xweş kirin", wî da zanîn (216, 21.1.1928).

Hukûmeta Tirkiyê, bona hincirandina tevgerên dijî hukûmetê, di 22 kanûna pêşîn 1928 da di derheqa sazkirina pareskerên cendirman a mobîl da biryar qebûl kir. Ew paresker diketin bin bandûra wezareta karên hundirî, lê bi pratîkî ew di bin qolê mufettişê sereke, ku gotî çawa bixwesta usa jî wan bida xebatê, da bûn (35, dîwan 9, r. 118-190).

Di destpêka adara 1928 da, Ibrahîm Talî Beg hemû waliyên wilayetên di bin bandûra xwe da teklîfî Diyarbekirê kirin, bona ku sistema wan mecalên ku anegorî wan divê li navçeya teftîşa sereke li pêşiyê sinaet, malhebûna gundîtiyê û kirîn-fîrotan (bazirganî) pêş da here, hazir bikin. Civînê weke 3 hefteyan, heta dawiya adarê, kişand. Civînê çend dokumentên îlanê di derheqa bi aborî û civakî pêşdabirina wilayetên rohilatê da qebûl kirin. Hat biryar kirin ku bîrên avê çê bikin û li her navbendeke wilayetê nexweşxanan çê bikin (251, 28.3.1928). Tevî wê yekê, Ibrahîm Talî Beg dida zanîn ku xwedê giravî ew xemxûrî di hindava bineciyên wilayetên rohilatê da dibe. Di nîvê meha nîsanê da, wî di nava bangeke xwe da bêtabetiya dîwana cî di hindava bineciyan da rexne kir. Gundiyan, - wî nivîsiye -, gazinên xwe li zêrandinên derebegan dikirin, loma jî divê guhdariya pêwîst bidin ser şikayetên wan. Ibrahîm Talî Beg da zanîn ku çawa hinek mirov ji dîwana cî dokument di derheqa wê yekê da distandin ku xweliya ku berê erdê xelkê bû daye wan mirovan. Loma jî wî de'w kir ku bi lez wan perçeyên xweliyê paş da vegerîne xwediyê wan. Ibrahîm Talî Beg pêşniyar kir ku usa jî ji bineciyan bac hildin (251, 14.4.1928). Lê ew tenê wek daxwaziyên qenc man û

hîç tukes ew daxwazî pêk ne anîn. Tevî wê yekê, komên Tirkiyê yên serdest, ku dicedand ku mirovên kurd ên bi nav û deng bînin hêla xwe, çend mecal qebûl kirin bona hinek derebegên Kurdan vegerînin Kurdistanê. Ismet Paşa, dema peyvê xwe yê tevî rojnamevanekî di adara 1928 da, da zanîn ku ji ber ku qayde-qanûn li wilayetên rohilatê hatine dasekinandin, ferzend çê bûye ku wan mirovên ku dema serhildana Şêx Seîd û pey wê ra ji wira hatibûn mihacir kirin vegerînin navçeyên wan. Hukûmet herdem ji mirovên cihê-cihê hêvîkirinan distîne ku destûrê bidin ku vegerin cî û wargehên xwe. "Ew mirovên ku bi hêvîkirinên usa va ber bi riya hukûmetê dibin, borcdar in ku bi hemû qewlên pêşdakişandî qayil bibin. Polîtîka hukûmeta Komarê dijî wan mirovên li welatên derve ku dijî vegerandina wan kesan li cî wargên xwe asêgehan çê dikin derdikeve. Karkirina teftîşa sereke ewê ji sedî sed mefayên usa bide ku bi dilê hukûmetê bin". "Eger kara welêt bixwaze mecalên usa ku bona rehetiya gel lazim in bên qebûl kirin, - wî da zanîn -, emê eseyê wan pêk bînin" **(216, 27.3.1928)**.

Di 7 gulan 1928 da, Meclisê di derheqa baxşandinê (efû) da zagon qebûl kir / zagon N° 1239 / ku anegorî wê ew kesên ku di nava tevgeliya xwe ya serhildana Şêx Seîd da dihat gunehkar kirin ji cezakirinê aza dibûn. Di zagonê da dihat gotin ku karên ku di dema şerkariya partîzaniyê da hetanî hilanîna halê eskerî li navça serhildanê (23 cotmeh 1927) hatin pêk anîn êdî wek gunehkarî nayên hesab kirin (miqal I). Ew kesên ku tevî serhildana Şêx Seîd bûne û ji aliyê dîwanê ne hatine girtin, divê pey qebûlkirina wê zagonê, di nav sê mehan da bên teslîm bibin, bona ku bikevin bin miqala wê zagonê **(35, dîwan 9, r. 804-805)**.

Wezîrê karên hundirî ku qebûlkirina wê zagonê şîrove dike dide zanîn ku li wilayetên rohilatê qayde-qanûn hatine dasekinandin, jiyan bê qeziya bûye, lê binecî di nava hêza hukûmeta komarê da hatiye bawer kirin **(28, arşîv 277, belge 247)**.

Tevî wê yekê, di weşanê da, wek nimûne, rojnama "Milliyet" di hejmara xwe ya 13 gulan 1928 da îlan kir ku qebûlkirina zagon N° 1239 di hêlekê da şehadet dide ku li navçeyên rohilatê rewş seqirî ye (rehet e), li hêleke din jî dibêje ku hukûmet di nava hêza xwe da bawer e. Lê wek ku xudanê gotareke wê rojnamê Mehmûd Beg dida isbat kirin, tu esaseke (hîm, bingeh) bineciyên wilayetên rohilatê tu neye ku xwe wek ne Tirk hesab bikin, lê ew kesê ku bêje ew ne Tirk e dixwaze dutîretiyê-dubendiyê bixe nava millet **(28, arşîv 277, belge 230)**.

Navnîşa Kurdan a pêşîn, ku hukûmetê dil hebû wê vegerîne cî-meskenên wê, hela di kanûna paşîn-sibat 1928 da, pey qebûlkirina zagon N° 1178 hatibû amade kirin. Di nav wê navnîşê da derebegên Kurdan ên ji wilayetên Meletye, Siirt û Mêrdînê, hinek jî yên Wan û Bitlîsê hebûn. Ji gişkan hindiktir vegeriyane Diyarbekir, Xarpût, Bazîd, Entab û Urfayê (Ruha) **(28, arşîva 276, belge 156)**.

Di destpêka gulana 1928 da, 203 mirov jî destûr stend ku vegerin wilayetên rohilatê **(216, 2.5.1928)**. Tevî wê yekê, dîwana Tirkiyê her tişt dikir ku nehêle serokên şerkariya Kurdan ên aktîf vegerin malên xwe. Ewha, 9 serokên Kurdan, ku tevî serhildana Şêx Seîd bûbûn û li hebsxanên Stembolê dihatin xwedî kirin, bi hêvîkirin ber bi riya hukûmetê bûn, ku ew zagona di derheqa baxşandinê da li ser wan jî bê belav kirin. Lê wezîrê edaletê ew hêvîkirin bendî tiştekî hesab ne kir **(259, 8.8.1928)**.

Çend serokên Kurdan ên girêdayî qebûlkirina zagona di derheqa baxşandinê da teslîmî dîwana Tirkiyê bûn û hêvî kir ku wan efû bikin. Di destpêka gulana 1928 da, serokê pêşmergên navça Mêrdînê, Remanli Emîn, tevî alîgirên xwe, usa jî tevî serokên desteyên pêşmergan Stepyali Husnî, birayê wî Osman, pismamên wan Kîmîno û Sulêman Ebdulqadir, usa jî 12 terefdarên wan hatin bal hukûmetê **(251, 9.5.1928)**. Divê bê zanîn ku di paşdemê da ew gişk jî hatin dar da kirin an jî hebs kirin.

Nûçegihanê "Times" ku di derheqa siyaseta dîwana Tirkiyê di hindava Kurdan da şirove dike dinivîse ku, rast e, êdî sê sal pey hincirandina serhildana Şêx Seîd li Kurdistanê, dîsa jî ji hela hukûmeta Tirkiyê ra li hev ne hatiye ku li welêt rehetiyê testîq bike. Nuha Tirk, - nûçevanê rojnamê nivîsiye -, xuya nîn e ku dixwazin siyaseta xwe di hindava Kurdan da biguhêrin, hinekî mulayim bikin. Ji bo nimûne, hinek kesên ku ji Kurdistanê hatibûn muhacir kirin, bi izndayîna hukûmetê vegeriyane wargehên xwe yên jiyînê yên berê. Hinek Kurd li Wan û Bitlîsê li ser qulixên bilind hatin kifş kirin. Paşê nûçegihan nîşan dida ku nenihêrî hukûmeta Tirkiyê nahêle dibistanên Kurdan bên vekirin, lê nacedîne jî ku li Kurdistanê cillên kurdî li xwe nekin **(261, 7.4.1928)**.

Di 12 gulan 1928 da, meclisê biryar kir ku serdazêdekirinekê li ser zagona wê salê ya 9 gulan, ku tê da tê dîtin ku êdî li dû wan mirovên ku hetanî 30 gulan 1928 "karên gunehkariyê" kirine negerin, eger ew gunehkar bixwe teslîmî dîwanê bibin, bike. Di paşdemê da, ew zemanê sê mehan bi şeş mehan va jî hate zêde kirin **(35, dîwan 9, r. 834)**, ango hetanî nîveka meha oktobr 1928.

Lê ew mecal bona dîwana Tirkiyê mefayê baş ne da. Hinek desteyên pêşmergan dîsa li navçeyên çiyayî şer dikir. Bi wê yekê ra girêdayî, Ibrahîm Talî Beg û şêwrdarên wî mecbûr bûn ku navçeyên Kurdan biqesidin û dicedand bên li ber dilê bineciyan. Wan işaret dida wan kesên ku tevî têkoşîna pêşmergan bûbûn ku hema ew pirtîkî zagonê biteribînin, ewê li ser cezayê nuh yê kevn jî zêde bibe.

Divê ku bê nîşan dan ku dîwana Tirkiyê bi mecalên mehkemekirinê yên admînîstratîf, ku bona hincirandina tevgera Kurdan a millî bûn, di nava bineciyên cî da kampanya panturkîzmê ya fireh dida derbas kirin. Bona wê armancê, di hezîrana 1928 da, wezîrê ronkayê Necatî, wezîrê edaletê Mehmût Eset û çend parlementerên meclisê çûne navçeyên Kurdan. Ew di nava bajarên wilayetên rohilatê da digeriyan, li ber bineciyan bi peyv pêş da dihatin û bîr û

Institut kurde de Paris

baweriya Panturkîzmê propaganda dikir (259, 8.7.1928).

Ew kampanya hêjayî piştgiriya weşana Tirkiyê ya burjuwaziyê aktîf bû. Ewha, rojnama "Milliyet" di hejmara xwe ya 28, adar 1928, da dinivîse ku ew li ser wê fikrê ye ku mecalên hukûmetê yên siyasî û admînîstratîf têr nakin (hindik in), û paşê dûmayî dike : "Em ji wê karkirinê li benda mefayên berbiçav ku em gotî di erafê çandî, moral û terbiyekirinê da pêk bînin in. Hema wê rojê, gava em di nava bineciyan da yekîtiya ziman û idêalên bi bîr û baweriya tam testîq bikin, wê demê emê gelek bi hêz bin".

Bi xurtî, tevî propagandakirina idêalên turkîzmê, hukûmeta Tirkiyê nîşan dida ku giva li wilayetên rohilatê warguhastinên mezin dike. Ji bo nimûne, girêdayî kutabûna zemanê zagona di derheqa parastina qayde-qanûnan ku di adara 1929 da temam dibû da, Ismet Paşa bi kêlmeke fireh va pêş da hat û tê da usa jî ev tişt got : "Hukûmet mecbûr ne bûye ku zemanê wê zagonê dirêj bike ... Ew biryar bi temiya serokê dewletê hatiye qebûl kirin. Em dikarin bêjin ku di nava du salên dawîn da hukûmet dikaribû zagona di derheqa qayde-qanûnan da bi kar neyne. Ew isbatî şehadet dide ku hemşeheriyên me dixwazin rewşa welêt bê pak kirin ... Di nava çar salên karkirina wê zagonê da em gihîştine serketinên wusa ku me nikaribû di nava 100 salan da bigihîjin wan ...". Paşê serekwezîr nîşan da : "Borcê me yê bajarvanan pê bidin hesandin ku çi qeziye dikare ji welatên derve bê serê me. Di nava zagonên komarê da ewqas hêz hene ku hurmet û siyaneta welêt û lawên wî ji her şer-şiltaxan û destdirêjiyan biparêzin" (212, 4.3.1929).

Lê kevneperestên Ankarê dixwest bi wê agahdariyê gel bixalifînin, wek ku dibêjin çavgirtinokê bilîzin, ji ber ku êdî li navça Araratê şerkariya Kurdan dijî Tirkiyê nuh dest pê bûbû. Di van qewlan da, komên serokatîkir tevî mecalên eskerî dest pê kir gavên usa bikin ku dikaribûn hişkbûna li Anatolya Rohilatê bidin sist kirin. Ewha, hela di behara 1927 da, hukûmeta Tirkiyê projeya zagonê ku xweliya derebe-

gên Kurdên ku muhacirî navçeyên roavayê kiribûn, di nava gundiyên bê xwelî û kêm xwelî da parve bikin qebûl kir. Projeya zagonê tê da didît ku para xweliya ku didin gundiyan ji 200 donuman (weke 20 hêktar) zêdetir nîşan nedin. Gundî divên heqê para xweliyê di nava 20 salan da bidana milkedar **(28, arşîv 161, belge 441-442)**. Lê ew projeya zagonê ne hate qebûl kirin. Tenê pey du salan, di 2 hezîran 1929 da, meclisê zagon N° 1505 di derheqa xweliyê da, ku gotî di nava gundiyên navçeyên rohilatê da ewê bihata belav kirin, qebûl kir. Di nava zagonê da dihat dîtin :

Miqal 1. Ew erdê ku gotî anegorî miqal 9 ya zagon N° 1097 a 19 hezîran 1927 ewê bidana dewletê û ewê jî divê di nava bineciyên gundên koçeran da belav bikirana, dîsa di bin destê wan da dimîne.

Miqal 2. Hukûmet wekîldar e ku wî erdî di nava wan kesên ku dikevin bin miqal 1 ya wê zagonê da par ve bike, û gotî çiqas ku ji wan ra xwelî dikeve ewqas bidin. Ew gundiyên wilayetên Urfa û Bazîdê bûn ku anegorî miqal 1 ya zagon 1097 diviyan ew xwelî bistînin.

Miqal 3. Qîmeta xweliya parvekirî û ya ku gotî bê parvekirin anegorî qîmeta ku li ciyan hebû dihat dîtin û ji aliyê şêwra wilayetê dihat testîq kirin. Dadxwaziyên (prokuror) sereke tevî xebata wan şêwran dibûn, eger li wira pirsa xweliyê bihata enene kirin. Ew qîmet diviya ji qîmeta wê 8 caran bilindtir neba û ji du caran jî nizimtir nebûya. Xweliya xozan û dem bi awakî din dihat qîmet kirin **(35, dîwan 10, sal 1973)**.

Anegorî wê zagonê, bi malûmetiyên resmî 70.000 donum xwelî, ango 7.000 hêktar hatin par ve kirin. Eger li rastiyê bikeve, hukûmeta Tirkiyê xwelî di nava wan eşîrên ku êdî ji jiyana koçeriyê derbasî jiyana reatiyê bûbûn da û êdî ew erd di bin destê wan da bû û hela ji wan gundiyan jî heqê xweliyê dixwest par ve kir. Lê, ya lape sereke ew e ku komên serokatîkir dicedand ku şerkariya Kurdan a azadariyê pîre-pîre bikin, bixînin, eşîrên nesitirî ji

çiya berjêrî nava deştê bikin, bacê dewletê deynin ser Kurdan.

Tevî wê yekê, di ruyê jiyanê da miaserkirina wê zagonê tenê gundiyê dewlemend û bazirgan jê kar dikir, ji ber ku gundiyên saxîr dema ew xwelî stend, nikaribû bi kar bianîna û ew gundiyên feqîr diketin "tora" nemerd û xêrnexwazan.

Loma jî "rêformên" giregirên dewletê ku tu kara wan bona mexlûqetiya Kurdan a civakî-aborî tu nebû, ne tenê nerazîbûn û hêrsa gel ne dan sist kirin, lê hela kela dilê wan bêtir rakir.

Mufettişê sereke Ibrahîm Talî Beg guhdariya mezin datanî ser Dersîmê. Di Hezîrana 1928 da, ew hate Xozatê, ku tê da rastî serokên eşîrên wê navçê hat. Dema wan rasthatinan, Ibrahîm Talî Beg temî da wan ku dest ji pêşdahatinên dijî Tirkiyê bikişînin, li Dersîmê rewşa rehet xwedî bikin û dewsa wê soz dida ku hukûmet bi qencî ber bi riya wan bibe. Lê mufettişê sereke gava vegeriya Diyarbekirê, dîsa dest bi cezakirina Kurdan, ku nerazîbûna bineciyan a berk pêş da anî, kir.

Du meh şûn da, di îlon 1928 da, Seyid Riza bi rêberiya Mehmet Nûrî (Dersîmî) bi zorlêkirina Elî Cemal hate Diyarbekirê bona safîkirina wan pirsên ku di derheqa Dersîmê da bûn. Lê ew rasthatin jî tu mefa ne da, ji ber ku tu daxwazeke Kurdan ne hate razî kirin.

Teribandin-şerpezebûna siyaseta mulayimkirina Kurdên Dersîmê gihande wê yekê ku navbera Elî Cemal û Ibrahîm Talî Beg, ku dest pê kir li ser hev şikayet binivîsin û bişînin, xerab bû. Dîwana navbendî piştgiriya Ibrahîm Talî Beg kir û Elî Cemal di nava wê yekê da gunehkar kir ku wî rastiya di derheqa rewşa Dersîmê da veşartiye, ji kar hatiye avêtin, paşê jî ew wek waliyê Çorumê hatiye kifş kirin.

Di destpêka hezîrana 1929 da, Ibrahîm Talî Beg Mehmed Nûrî gazî bal xwe, li Diyarbekirê, kir bona ku dîsa bipeyivin. Di destpêka peyvê da, wî dicedand ku temamiya gunehê bona dijîtiya eşîra

Koçan bavêje ser Elî Cemal, paşê dokumenteke ku tê da agahdarî di derheqa karên Kurdên Dersîmê dijî hukûmetê da hebûn da Mehmed Nûrî û li ser navnîşana teftîşa sereke hatibû şandin.

Ibrahîm Talî Beg ew dokument teslîm kir û got : "Rast e, ew salix hêjayî guhdariyê ne, lê hukûmet baweriya xwe ji wan nayne ... eger bawer bikira, ewê koka Dersîmiyan bianiya. Hûn nûnerê Rewşenbîrên Dersîmê yên bi nav û deng in. Ez bona wê yekê we dişînim wira ku hûn di derheqa plan û armancên bineciyan da agahdarî min bikin. Ew lazim e ji bo halxweşiya welatê we" (126, r. 207-210).

Mehmed Nûrî ew pêşniyar bi razîbûn û bi dilekî baristan qebûl kir, ji ber ku wê ferzend dida wî ku careke mayîn jî rastî Seyid Riza bê. Hema ew hate Dersîmê, rex Xozatê civîn di navbera Seyid Riza, Mehmed Nûrî, serekeşîrê qebîla Ferhedan Cemşîd Axa, serekeşîrê qebîla Kerbelan Kengeoğlu Mehmet Elî û serokên Kurdan ên mayîn da hate derbas kirin. Civînê rewşa sazbûyî enene kir û siyaseta dîwana Tirkiyê dijî Kurdan hilda ser hesêb, paşê jî biryar kir :

1) dêlêgasyona hurmetlî bişînin bal mufettişê sereke ku bikaribûya wî vir-derewê ku di nava dokumenta jorê ya kifşkirî da heye inkar bikira.

2) her tiştî bikin bona dakutana eskerên hukûmetê li Dersîmê, ku dikare bê sêrî biqewime.

3) bi demekê terka pêşdahatinên dijî Tirkan bidin, bona ferzendê nedin hukûmeta Ankarê ku eskeran bişîne Dersîmê.

4) karê ji bo yekîtiya eşîrên Dersîmê berdewam bikin.

5) kontrola van hemû tiştan deynin ser Baba Ibrahîm (kurê Seyid Riza) ku ew ji aliyê jiyanê pêkanîna van humuyan bike, di derheqa wan nerazîbûnan da Seyid Riza agahdar bikin, ku dikarin di dema miaser-kirina van planan da di nav eşîrên Dersîmê da pêş da bên, mecalan qebûl bikin bona ku Kurd ji navçeyên Erzincan û Elazîzê çekan û cebirxane bistînin.

Institut kurde de Paris

Pey qebûlkirina wê biryarê û herweha gavên mayîn ku bona xurtkirina bêqeziyabûna eşîran bû, serokên Kurdan dêlêgasyona bi serokatiya Şêx Hesen şand Diyarbekirê bona ku tevî Ibrahîm Talî Beg hevpeyvînan derbas bike (26).

Şêx Hesen ku rastî mufettişê sereke hat, ji navê dêlêgasyonê agahdarî da : "salixên me di derheqa bineciyên Dersîmê da stendine ji serî hetanî binî vir û derew in. Em kurê Ebdul Hemîd nas nakin; wek xuya ye, ew Tirk e, lê ne Kurd e, loma jî bêfeyde ye ku em tevî karê problêma sulteneta Tirkiyê bibin. Eger hukûmeta Tirkiyê li behanan digere bona êrîşî Dersîmiyan bike û me bizêrîne, wê demê tu gotin namîne" (126, r. 212).

Mufettişê sereke hevpeyvînên tevî serokên Kurdan da xebatê bona ku eynî armancên Tirkiya ku dixwaze di navbera serokên Kurdan da dijminatiyê pêş da bîne veşêre, şerletaniyên (provokasyonên) dijî bineciyên Dersîmê ku tên amade kirin bên efû kirin. Dema rasthatina dawîn, Talî Beg 1000 lîra da her endamekî dêlêgasyona Kurdan, lê 2000 lîra û qutîke bi diyariyan va da bona teslîmî Seyid Riza bikin. Di nava wê qutiyê da şîrînayî, perçeyên hevrîşm hebûn. Pey wê yekê, bona ku serokên Kurdan dijî Seyid Riza rake, dîwana Tirkiyê di derheqa wê yekê da deng û bahs belav kirin ku xwedê giravî Seyid Riza ji wan gelek zêr stendine. Wan, bona provokasyonê, serokekî eşîra Abbasan, Ibrahîm Axa ku zavayê Seyid Riza bû, kuşt. Huseyn kurê Miço Axa, ku parlementerê meclisê bû, bi 1000 lîra ew kuşt. Seyid Riza jî bona heyfhildanê êrîşî gundê wî merivkujî kir û gund wêran û kambax kir. Tevî wê yekê, Kurdan usa jî êrîşî wargehên Tirkan kir. Di nava wê rewşê da, wan Deli Fahri yê ji Hekkariyê anî Elazîzê û li ser qulixa walî kifş kir. Wî ferman stendibû ku çawa jî mabe, Dersîmê "mulayim" bike, were ber dilê bineciyên wê.

Ji 1 çileya paşîn 1930, hukûmeta Tirkiyê biryar di derheqa mihacirkirina Kurdên navça Dersîmê ber bi best-beyarên wilayeta Elazîzê da qebûl kir. Temamiya hebûna wan Kurdên ku pey mihaciriyê hiştibûn

digihîşt dewletê. Bilî wê, Kurd diviyan bona wê perça xweliyê ku li ciyê nuh dida wan heq bidin. Bineciyên Dersîmê ne razî berk sekinîn ku ji wargehên xwe dernekevin. Wê demê Şêwra wezîran biryar qebûl kir ku heqê hebûna kesên ku diviyan mihacir bibin wek heqê xweliyên gotî li ciyê nuh bidin wan hesab bike (45, r. 165) (27).

Lê ew biryar jî ne bi dilê Kurdan bû, ji ber ku wan ne dixwest ji cî-warên xwe biqetin. Lê Kurdên Dersîmê bi saya aqilmendiya xwe bi dizî hay ji fen-fêlên hukûmetê yên dijî Kurdan hebûn. Ew Kurdên niştimanperwer ku di idarên Tirkan da kar dikir, haya wan ji hertiştî hebû û wan di derheqa wê yekê da ji gel ra digot. Bi saya wan niştimanperweran haya lîderên Kurdan ji naveroka nameyên di navbera mufettişê sereke û wezareta karên hundirî da û ku di derheqa pirsa Kurdan da bû hebû, û ew yek ferzend dida wan ku eksîmecalan qebûl bikin (126, r. 213).

Wezareta edaletê projeya zagona xusûsî ku armanca wê ew bû ku prosêdura mehkemê bide lez kirin amade kir. Anegorî wê zagonê biryarên dadgehê yên di derheqa "qaçaxiyê" da, di derheqa karkirina dijî dewletê da, nikaribû bên şikayet kirin û di destê xwe da ew biryar dihatin pêk anîn. Karê wê zagonê nemaze li navçeya teftîşa sereke ya pêşîn dihat belav kirin. "Hîç şikberî tu neye - rojnama "Akşam" nivîsiye - ku li wan ciyên ku tê da psîkolojiya gelê prîmîtîf usa ye, ku heyfhildana xwînî di dilda heye, li wê derê nikarin bêqeziyabûnê testîq bikin, dadgeh jî bê çare ye, eger ew li ser nimûna dadgeha Almanyayê be jî. Armanca wê zagonê ew e ku bi lez qayde-qanûnan bidin bênetirs kirin, nehêlin ku gunehkar wê prosêdura mehkemê ku hetanî nuha heye bi kar bîne" (185, 29.3.1930).

Di 9 gulan 1930 da, li xaniyê belediya Elazîzê civîneke ku qumandarê alayê Huseyn Husnî Paşa, usa jî karmendên wilayetê yên navdar, tevî wê bûn hat derbas kirin. Civînê pirsa Kurdan enene dikir. Di nava peyva xwe da, cîgirê walî, Midhat Beg, usa

jî got ku Dersîmiyên ku di dema hukumdariya sultanetiyê da li bendî tiştekî hesab ne dikir Tirk in. Ew dikarin tevî xebata mexlûqetiyê bikin ku ew ji jiyana Komara Tirkiyê ra der nemîne û bona wê divê mecalên bi zagonê qebûlkirî bi kar bînin. Qumandarê alayê sedrê koçka wilayetê ya bazirganî, Ahmed Beg, û sedrê belediyê, Xelîl Beg, piştgiriya wê ya tesîsê kir. Lê walî Deli Fahri li ser bîr û baweriyeke mayîn bû. Wî agahdar kir ku Dersîmî ne Tirk in û tu tiştekî weha tomerî tevî Tirkan tu neye. Bineciyên Dersîmê, ku qulixî welatên derve û "Xoybûnê" dikin, divê bên hincirandin, ji rû-barê dinyayê bên hildan. Paşê, dema ew ber bi Mithad Beg bû, devê xwe tije tûk kir û got : "Zagon, zagon ! Ez tû li ser zagona we bikim ... milletê tirk ji Dersîmiyan li benda tu alîkarîkirina matêryalî û rûhanî nîn e, qewmandinên van salên dawîn Tirk di nav wê yekê da dane bawer kirin" (126, r. 214). Pey peyva Deli Fahri, civînê xebata xwe nîvcî hîşt.

Dû xêleke zeman, Deli Fahrî gazî Mehmet Nûrî li bal xwe kir û gotê ku bi lez here bal Seyid Riza û jê ra bêje ku bira di dest xwe da gurra hukûmetê bike û çekan teslîm bike. Lê Mehmet Nûrî got ku ew wê fermanê naqedîne û bi şikayet ber bi dadxwazê wilayetê bû bona ku ew zor li bineciyên Dersîmê dikin û ew zordarî bi serokatiya Deli Fahrî tê pêk anîn. Û ew gotina xwe bi destûra Komara Tirkiyê ku hemû bajarvanên xwe wek Tirk hesab dike mak dike.

Li ser wê, dadxwaz got ku anegorî destûrê ew Ermeniyên ku li Tirkiyê dimînin jî Tirk in, lê siyaseta di hindava wan da bi biryara dizî tê miaser kirin; "Bi destûrê bi formalî tu jî Tirk î - wî dûmayî kir -, lê eger li rastiyê bikeve, tu ji biyaniyan bi tutiştî va nayî cuda kirin ... Tu divê bizanibî ku eger li ser qulixeke herî nimiz jî meriv tên kifş kirin, serwêrtiya bêqeziyabûna dewletê lê dinihêre, ka filan kes Tirk e yan Kurd e" (126, r. 233).

Neçûyîna Mehmet Nûrî tiştek jî ne guhêrand. Dîwana Tirkiyê hemû Kurd mecbûr kir ku çekan teslîm bikin, lê ji ber ku çek li bal herkesî tu ne

Institut kurde de Paris

bû, ew mecbûr dibûn herin çekan peyda bikin, bikirin û teslîmî dîwanê bikin, ku neyên zêrandin.

Li dawiyê, navçeya teftîşa sereke ya pêşîn 30.000 mawizer (damançe) û 160.000 jî çekên mayîn hatin berhev kirin **(116, r. 321)**. Dema berhevkirinê, cendirmên Tirkiyê gelek hovîtî dikir. Tevî wê yekê, ev isbata jêrîn hêjayî guhdariya xusûsî ye.

Sala 1932, li Demişqê, otêla "Kontînental", karmendê kurd ê bi nav û deng Celadet Bedir Xan rastî nûçegihanê Hungaryayê yê ku dema ku ji aliyê Tirkan hildana çekan li Kurdistanê bû bû hat. Nûçegihan ewha şirove kir : li gundekî Kurdan ew rastî kalemêrekî 102 salî hatibû. Wî nikaribû mêvanê xwe çawa lazim e qebûl bike. Gava nûçegihan pirs dayê : "Çi qewimiye ?", kalemêr ewha bersîv dayê : "Du hefte pêş da, cendirme hatin gundê me bona çekan berhev bikin. Me gişkan çekên xwe teslîm kirin ... Cendirman hemû gundiyên me girêdan, bi xwe ra birin. Ez avêtim erd û gelek zêrand, çil qamçî li min xist ... Ez bi xwe va çûm, min hişê xwe hunda kir, ji wê demê ez nikarim ji nav ciyan rabim". "Lê çima li te xist ?", mêvan pirsî. Kalemêr bersîv da : "Ji ber ku ez Kurd im, lê Kemal Paşa naxwaze ku li welêt Kurd bijîn" **(120, r. 82-83)**.

Tevî wê yekê, komên serkarîkir ku gelek caran ne bûbûn xwediyên sozên xwe, tu mecaleke usa qebûl ne kir ku alî sistkirina zêrandina aborî û civakî li Kurdistanê bike, wê navçeya ku di nava rewşa kolonî da bû pêş bixe. Wilayetên rohilatê bûbûn ciyên sirgûnkirina Tirkên "sûckar". Di salên 20 da jiyana nemir-nejî gelek mecbûr kirin ku, xwezma li zivistanan, gunehkariyên biçûk bikin bona bikevin hebsê "ji bo ku bikaribin nan bixwun". Dîwanê jî, bona ku pêşiya wê yekê bigre, bi biryara xwe ya çileya pêşîn 1928 qirar kir ku "gunehkarên" usa ne ku bişîne hebsê, lê berê wan bide wilayetên rohilatê bona ew li wira xebata herî giran bikin" **(216, 30.1.1928)**.

Navçeyên Kurdan, bona admînîstrasyona Tirkiyê, ji wan navçên ku tê da bac dihat berhev kirin bû. Navçeya teftîşa sereke ya pêşîn ku wan salan 10

Institut kurde de Paris

wilayet diketin nava wê, her sal weke 6,5 milyon lîra dikir xezna dewletê (116, r. 399), lê ew navçe ji hukûmetê bawer bike tu alîkarî ne distend. Li wê navça bi 900.000 meriv serhevdu sê xebatkarên hêjayî xwedîkirinê û 17 bijîşk hebûn, usa jî 6 dermanxane dixebitîn. Ronayîdarî jî di nava rewşeke ewqas xerab da bû. Sala xwendinê ya 1927/28, li wê navçeyê 104 dibistanên destpêkê û 5 jî yên navîn, ku tê da 7690 şagirt hîn dibûn, kar dikir (36, r. 453).

Di destpêka sala 1930 da, li wilayetên Tirkan %33 hemû zaran dixwend, lê li wilayetên Kurdan %2,5 (120, r. 26). Ji 720 gundên wilayeta Diyarbekirê tenê li 30 gundan dibistan hebûn (ew jî yên tirkî bûn). Li 428 gundên wilayeta Mûşê, tu dibistan ne bû. Lê dewsa wan, li 58 qezayên navçeya teftîşa sereke ya pêşîn 336 cendirma hebûn (116, r. 339-400).

Di derheqa wê yekê da, çika komên serokatîkir çawa dixwest ku problêmên wilayetên rohilatê yên civakî-aborî safî bikin, ev isbat nîşan dide. "Wek ku mirovek ji min ra got ku haya wî ji wan pirsan heye, - S. Aydemir dinivîse -, wê demê danûstendinên me bi Mussolîniyê italî ra pak dibûn. Hukûmetê niyet hebû ku ji Italyayê weke 30 milyon lîra bi deyn bistîne. Bi gotina gotiyan, serek-wezîr Ismet Paşa soz dabû Ibrahîm Talî Beg ku wan peran bişîne bona pêşdaçûyîna wilayetên rohilatê. Lê Mussolînî deyn ne da, û wilayetên rohilatê tiştek jî ne stend", li dawiyê, Ş. S. Aydemir got (116, r. 317).

Ev isbat şehadeta wê yekê dide ku planên hukûmeta Tirkiyê çiqas bêfeyde bûn di hindava pêşdaçûyîna navçeyên welatê Kurdan da.

Karkirina teftîşa sereke ya pêşîn tu pirseke problêma Kurdan ne da safî kirin. Ew daxwaziyên tu komeke mexlûqetiyên Kurdan a civakî ne da razî kirin û çare ne kir : ne gundiyên rêncber, ne koçer, ne rewşenbîr, ne burjuwaziya bazirgan, ne derebeg û milkdar kar ne kir û loma jî nerazîbûna wan a

di hindava siyaseta dîwana Ankarê da kêm ne bû. Di dawiya salên 20 da, ew nerazîbûn gihand serhildana ku li navça Araratê dijî Tirkiya nuh dest pê bû.

### 3. Serhildana li navça Araratê (1927-1931

Hincirandina serhildana eşîran, bêçekkirina wan, mecalên mehkemê yên admînîstratîf, kirina hinek serokên Kurdan, siyaseta helandina bi destê zorê, tirkkirina hemû aliyên jiyana aborî, civakî-siyasî nikaribûn pirsa Kurdan bidin hel kirin.

Sebebên serhildana bineciyên kurd nemaze ew bêmafbûna Kurdan bû, zêrandina millet, kêmxistina gundiyên ku di bin qolê derebeg-şêxên xwe da bûn, ji aliyê axa û began dihatin zêrandin bû. Xerabbûna dereca jiyana Kurdan bi destê dêlêgasyonên cezakirinê ne hatin hildan. Xweserîtiya hukûmetê zêde dibû, bacdayîn êdî hetka gundiyan biribû. Ev hemû bi krîza aborî ku hemû nerazîbûn hişktir dikir dihat kûr kirin û rewşa pale û xebatkarên Kurdan a bê wê yekê jî xerab hîn dijwartir dikir. Ewha, di sala 1929 da, çiniya ku ji mezîlên bêcerkirî hat stendin, ji %80 çiniya sala 1913 bilindtir ne bû. Wê salê jimara dewaran gihaşt tenê %85 jimara heywanên sala berî şerrê hemcihanî yê pêşîn. Ji ruyê wê yekê û sebebên mayîn, roj li ser roj qîmetên xurek çiqas diçû bilind dibû. Ewha, eger di sala 1913 da, kîloya goşt 5 quruş ba, nanek bi quruşek ba, lê rûnê zeytûnê bi 3 quruş ba, sala 1928 ew bûn 150 quruş, 18 û 70 quruş (131, r. 41-42). Bi vî awayî, li dawiya salên 20, xurekên li jor nîşandayî bi 18-50 caran zêde bûn.

Rewş usa jî di tiştên mayîn da bû. Ev hemû dijîhevbûnên civakî ku bi zêrandina millî ya tevayî li Kurdistanê kûrtir dibûn li welêt hîn xurttir dihatin kirin.

Dîwanê, ku ne dixwest û ne jî dikaribû sebebên serhildanên Kurdan bide rakirin, gihand wê yekê ku gel dikeliya, dixwest rabûya qal û cengê, daxwaziyên Kurdan ên millî-azadariyê bi hêztir dibûn. Di nîveka salên 20 a duduyan da, li temamiya Anatolya

Rohilatê şerrê partîzaniyê tev rabûbû. Desteyên pêşmergeyên Kurdan ên biçûk êrîşî idarên cendirman dikir, hucûmî avayiyên hukûmetê dikir, karmendên tirk dikuştin.

Di sala 1927 da, li navçeyên Tirkiyê ya başûr-rohilatê dest bi serhildana nuh bû. Di dawiya behara wê salê da, eskerên hukûmetê (bi jimara 10.000 meriv) dest pê kir êrîş bibin ser pêşmergên Ararat, Îdir û Bazîdê (Doğubeyazit). Ji ruyê şerrê giran , Tirkan weke 2.000 esker û zabit şehîd dan. Kurdan 400 dîl girtin, 12 top, 36 gulleres û cebirxanên mayîn zevt kirin (108, r. 270). Payîzê Kurdan garnizona eskerî şkand û 10 zabit û 45 esker dîl girtin. Serhildan li Wan, Melezgir, Mûş, Bitlîs, Siirtê dest pê kir û belav bû. Qumandariya Tirkan mecbûr bû dîsa eskeran bişîne hewara pareskerên xwe. Li gelek navçeyên li jor nîşandayî Tirk bi dijwariyeke mezin li hev hatin ku şerkariya pêşmergan bihincirînin.

Lê di navbera salên 1928-1929 da, Kurdan, ku eskerên hukûmetê li dû wan digeriyan, dest pê kir hêzên xwe li navçeyên welêt ên rojhilatê yên çiyayî bicivînin. Sitara Kurdan nemaze çiyayê Araratê bû. Li vira şervanên bona azadariya Kurdan a millî xwe li şkeftan veşart, ji ber ku wan di şerrê tevî eskerên hukûmetê yê newekhev da dabûne der. Li dawiya salên 20, berpala di navbera Ararata Biçûk û Mezin da, ku Tirkan jê ra digot Kîrê, bû ocaxa şerkariya Kurdan a partizaniyê ya sereke (86, r. 109).

Serhildana li navça Araratê ji aliyê komiteya "Xoybûn"ê ya eskerî-siyasî (Xoybûn = serbestî) ku roleke giring di nava pêşdahatina têgihîjtina Kurdan a millî da lîst hatibû hazir kirin.

Komîta "Xoybûn" di tebaxa 1927 da li kongreya rêxistinên Kurdan hatibû saz kirin (28). Endamên rêxistinên Kurdan ên usa bi nav û deng, wek Komela Damezrandina Kurdistanê, Komela Kurdan a civakî, Partiya Kurdan a millî, Komita Serbestiya Kurdistanê diketin nava wê. Bilî mirovên wan rêxistinên navdar, çend serekeşîr û niştimanperwerên Kurdan ên mayîn dibûn tevî xebata kongrê (29).

Kongre bi dizî derbas dibû. Wê 45 roj kişand. Di nava wê demê da, wê hemû pirsên sereke yên girêdayî şerkariya Kurdan li Tirkiyê enene kirin. Bi gotina niştimanperwerê Kurdan ê bi nav û deng Zinar Silopî, armanca "Xoybûnê" ew bû ku desteyên Kurdan ên ji hev cihêbûyî yên ku dû serhildana sala 1925 li çiyayên Çapakçûr, Sasûn û Araratê dijî dîwana Tirkan şerr dikir bicivîne dora bernama yekîtiyê, ew hêzên Kurdan kardartir bike bona pêkanîna pirsdanînên millî **(145, r. 110)**.

Rast e, kêmasiyên komita "Xoybûn"ê yên bîr-baweriyê û teşkîldariyê hebûn, lê ew bi rastî partiyeke siyasî bû û bername û qanûnnama wê hebû. Her endamekî wê "Sonda biratiyê" dixwar û soz dida şerkariyê bike bo navê yekîtiya hemû Kurdan, bo navê damezrandina Kurdistana serbest **(108, r. 270)**. Bernama ku li kongrê hatibû amade kirin pirsa "dijî Tirkan şerr bike, hetanî eskerên Tirkiyê yê dawî ji axa Kurdan a ziyaretî bê derxistin" danîbû pêşiya xwe **(miqal 2-a)**. Wê guhdariya xusûsî datanî ser sazkirina komên Kurdan ên çekdar, bona ku wan fêrî bikaranîna çekên nûjen bike. Hemû komên Kurdan divên di bin qolê "qumandariya eskerî ya yektî" ku di navbera wê da li navçeke Kurdistanê ya çiyayî bû bin **(miqal 3-a)**.

Di bernama Xoybûnê da dihat dîtin ku danûstendinên dostiyê bi çend welatên derve ra divê bên testîq kirin. Ewha, partiya Xoybûn divê "danûstendinên biratiyê yên dostiyê tevî hukûmeta Îranê û gelê îranî yê bira ra testîq bikira" **(miqal 4) (85, r. 48-49)**. Wê guhdariyeke mezin datanî ser propaganda pirsa Kurdan ji derveyî tixûbên Tirkiyê. Bona wê armancê, partiyê çend şaxên xwe li welatên derve çê kirin. Ji bo nimûne : li Sûriye, Lubnan, çend welatên Ewropa û li DYA. Tevî wê yekê, di bernama Xoybûnê da hîç xeberek di derheqa testîqkirina danûstandina tevî hêzên Tirkiyê yên pêşverû ne dihat gotin. Li vira nasyonalîzma Kurdan a ku roleke xerab di dereca peydakirina alîgirên xwe da lîst dihate ber çavan. Partiya Xoybûn di hêlekê da d'ew dikir ku serbestiyê bidin qezayên Kurdan li

Institut kurde de Paris

Tirkiyê, lê di hêla din da jî ew - wek xuya ye - ji rewşa Kurdên Iraqê razî bû (30), herweha ji yên Sûriyê jî, û loma jî bona wan de'wa tu mafekî siyasî ne dikir, bilî wan mefayên ku di nava dokumentên Koma Milletan da hatibûn nivîsîn.

Bernama Xoybûnê bi giyana nasyonalîzmê bû asêgeh bona peydakirina piştgirên wê. Lê tenê partiya Ermaniyan a burjuwazî-nasyonalîst a Daşnakan a ku, eyan e, bi karkirina xwe ya dûrnedîtî va piştgirîya wê rêxistinê dikir.

Komên Tirkiyê yên resmî û weşanê, ku bîr û baweriyên xwe di derheqa serhildana Kurdan da digotin, dicedand ku karê usa bidin nîşan dan ku giva li wilayetên rohilatê aştî û xweşbextî heye, eger casûsên empêryalîzmê dijî Tirkan, ku di nava navnîşa wan da usa jî partiya Xoybûn, nîn bûna. Wê partiyê wek bersîva wê gunehkariyê ya komên Tirkiyê yên serkarîkir di meha nîsanê sala 1928 da da weşandin û tê da dihat gotin : "... Xoybûn çekê siyasî di destê dewleteke derve da nîn e ... Armanca Xoybûnê ya tek-tenê ew e ku gelê kurd ji bin destê nîrê Tirkan xelas bike, Kurdistanê bike dewleta serbixwe. Di nava pêkanîna armanca xwe ya sereke da Xoybûn hêviya xwe datîne ser hêzên xwe" (108, r. 278).

Girêdayî qewimandinên li navça Araratê, bi resmî "Pirtûka Kesk" (Xoybûn-Daşnak) ronahî di derheqa pirsa Kurdan da dît. Di nava pêşnivîsara wê pirtûkê da dihate gotin ku armanca wê ew e ku di derheqa wê pirsê da agahdariyên bi belge bidin mexlûqetiya cihanê. Di pirtûkê da fikra di derheqa wê yekê da hebû ku dû hincirandina serhildana sala 1925 ra, têkoşîna Kurdan ji ber wê dîsa tev rabû, ji bo ku du rêxistinên dizî : Xoybûn û Daşnak bi hevra kar kir.

Û bi rastî jî partiya Xoybûn bi tevgeliya Daşnakan tedaruka serhildanê didît.

Divê ku li ser hesêb hildin ku partiya Daşnakan hela di sala 1925 da gelê ermenî li welatên derve mobîlîze kir ku piştgiriya tevgera Kurdan bike. Hela bi ser da jî, hema wê salê bi pêşniyara buroya

partiya "Daşnaksûtyûn" mêmorandum ji kongreya navneteweyî ya ku di derheqa pirsa Kurdan da li Marsêlê dihat derbas kirin şand. Xoybûnê bi dizî di nava Kurdan da lazimiya dostiya Ermanî-Kurdan propaganda dikir. Ewha, di sala 1927 da, hemcivîna Xoybûnê ya pêşîn di nava dêklarasyona siyasî da di derheqa pirsdanînên xwe da ewha elam kir : "Kongre îlan dike ku Ermenistan û Kurdistan, ku bi sedsalan li ser axa wan her du gel, Ermenî û Kurd, mane, dijî wê yekê ye ku di bin qolê dewletekê da be û dicedand ku serbestiya xwe bi dest bînin. Kongre elam dike ku ew her du welat tenê yên gelên kurd û ermenî ne" **(82, N° 2, r. 38)**.

Serokekî têkoşîna Kurdan, Sureyya Bedirxanî, ku di derheqa wê dêklarasyonê da dipeyive, dinivîse : "Di meha oktobr 1927 da, Xoybûnê bi navê gelê kurd û nûnerên gelê ermenî ku bi hev ra bûbûne yek dijî dijminê xwe yê tomerî, Tirkiyê, hemû hêzên xwe civandine ser hev. Ez bi navê partiya xwe mêlgirtina (sempatiya) xwe ya kûr elamî gelê ermenî dikim û daxwaziya wî gelê mêrxas ya zagonî pîroz dikim, ji ber ku ew dicedîne ku Ermenistana yekbûyî a serbest saz bike" **(100, r. 282-283)**.

Zinar Silopî ku di derheqa sebebên testîqkirina danûstendina di navbera her du partiyan da, usa jî di derheqa pêşdaçûyîna pêwendiya di navbera wan da, dipeyive dinivîse : "Hîç rêxistin an jî welatekî usa tu nebû ku alîkariya Xoybûnê bike, dostiyê jê ra bike ... Ji ber wê jî em hatin ser wê bîr û baweriyê ku divê bi Ermeniyan ra dostaniyê bikin".

"Her du alî bi hevdu ra qayil bûn ku pirsa di derheqa tixûbên di navbera Kurdistan û Ermenistanê da, ku dikare di navbera Ermenî û Kurdan da biqewime û pêş da bê, ewê hukûmetên Kurdan û Ermeniyan di paşerojê da safî bikin. Bilî wê, ew li hevdu hatin ku pirsa di derheqa alîkariya maddî ku Ermenî ewê bidin rêxistina Kurdan, ewê dîsa ji aliyê hukemtên her du aliyan bê safî kirin. Û bi rastî jî, di destpêkê da navçîgariya Ermeniyan bi firehî hat bi kar anîn. Ermeniyan pirsaniya pevgirêdanên di navbera olkên Kurdan da li welatên cihê

Institut kurde de Paris

cihê didan pêk anîn. Wan pevgirêdan di navbera pêşmergên Araratê û navbenda Xoybûnê da jî dan testîq kirin. Weşana Ermeniyan a dilpaqij û xêrxwaz, ku li Amerîka û Awropayê dihate weşandin alîkarîke mezin da wê yekê ku bîr û baweriyên xerab di hindava Kurdan da bên hildan. Ermeniyan bi weşandinên xwe piştgiriya me kir, propaganda dijî Kurdan da bêriyê" (145, r. 114, 116).

Ji bo tedarukdîtin û destpêkirina serhildana Kurdan li navça Araratê, kemala danûstendinên di navbera serokên rêxistinên Kurdan û Ermeniyan ên burjuwazî-milliyetçî da gelek ber bi çav bû. Lê ew yek şehadet dida, ne tenê di derheqa dûrdîtina wan da, lê usa jî di derheqa kesera xwe ya di hindava siyaseta Tirkan a helandinê da.

Tevî wê yekê, serokên Xoybûnê gava di derheqa gelê Ermenî da dipeyivîn, di bîra wan da tenê Daşnak bûn, ji ber ku tenê Daşnak bi sloganên "Ermenistana mezin û yekbûyî" pêş da dihatin, lê ne gelê ermenî bi gişkî, yê ku wê demê di bin ala dîwana sovyêtî da êdî Ermenistana xwe ya sosyalîst çê kiribû.

Çi jî hebe, wê demê partiya "Daşnaksûtyûn" propaganda dora têkoşîna Kurdan dida gurr û xurt kirin. Di meha nîsanê 1929 da, Daşnakan di kongreya xwe ya IImîn da qebûl kir vê bangê bike : "Kongre serhildana Kurdan dijî Tirkan bi xurtî pîroz dike. Kongre li ser wê baweriyê ye ku ew serhildan pêwîst e bona safîkirina-herikirina pirsên Ermeniyan û Kurdan û di hindava wê şerkariya mêrxasiyê da hêjayî guhdarî û piştgiriya Ermeniyên bîrewar e" (82, N° 2, r. 37).

Tevî wê yekê, Daşnakan Kurd ji xwe ra kiribûn bingeh û delîl. Wan di nava wê şerkariyê da slogana xwe ya "Ermenistana serbest" bilind dikir. Ew yek bi van riyan derbas dibû :

1) Têkoşîna Kurdan li ser axa Ermenistana Tirkiyê pêş va diçe, loma jî her Ermeniyekî ku bextê welatê wî jê ra buha ye divê piştgiriya tevgera Kurdan bike.

2) Şerrê Kurdan dijî Tirkan nahêle ku Tirkên mihacir ên ku qeziyake gelek mezin in bona gelê ermenî li ser axa Ermenistana Tirkiyê cîwar bibin.

3) Damezrandina Kurdistana serbest nahêle ku daxwaziyên Tirkiyê yên panturkîzmê pêk bên.

4) Şerrê Kurdan Tirkiyê sist dike û bi wê yekê va bingeh bona şerkariya boy navê "Ermenistana yekbûyî ya serbixwe" çê dike (82, N° 2, r. 38). Ha ev in ew bîr û baweriyên ku Daşnak pê dihatin serkarî kirin, dema ku piştgiriya şerkariya Kurdan a azadariyê li navça Araratê dikir.

Niştimanperwerê kurd ê bi nav û deng, Ishan Nûrî Paşa, ku wek nûnerê eskerî yê bêhempa ji aliyê Xoybûnê hatibû şandin navça serhildanê, şerkarî li serhildana Araratê dikir. Ew ku teşkîldarekî eskerî yê zîrek û jêhatî bû, di nava demeke kurt da usa kir ku hêzên serekeşîrê Celaliyan, Ibrahîm Heskiyê ji Têlloyê, ku navekî dizî - Ibrahîm Paşa - lê kiribû (partiya Xoybûn navê paşayê general dabû wî), gihandin hev, bi wî ra usa jî li hev hat ku sala 1927 bingeha dewleta Kurdan deyne (126, r. 247). Admînîstrasyona qezayê Araratê (Agrî) ku Ibrahîm Paşa serokatiya wê dikir hate damezrandin. Serokên mayîn jî hatin kifş kirin. Ewha, Temir Axa wek serokê cendirmeyên qezayê , Melle Huseyn Efendî qaymeqamê qezayê Korhanê, serekê navça Botî - Ibrahîm Axa -, serekê navça Ortî - Hesen Efendî -, serekê navça Korî-Bêrkilî Axa, qaymeqamê qezayê Kohan - Omerîn Axa, hatin xuya kirin (145, r. 121).

Ihsan Nûrî komên çekdar usa li ser komikan belav kirin ku şerrê partîzaniyê bi awakî serketî pêş da here. Tevî wê yekê, wî danûstendin bi Ismaîl Xan Sîmko ku wê demê şerrekî giran dijî rêjîma Şahê Îranê dikir çê kirin. Anegorî qewlên serhildanê, wî çend mecal qebûl kirin. Ewha, ji bo nimûne :

1) miroên ku dizî, talan kirine, an jî keç û jin şuhurandine, divê bên gulle kirin.

2) Tukesekî gotî ji derveyî navça serhildanê ji dizî û qaçaxiyê neke.

3) ew kesên ku ewê karên usa li navça serhildanê bikin, ewê ji aliyê mehkema pêşmergan bên hebs kirin, û bi piraniya dengan va ewê gunehê xwe bistînin.

4) jinên eskerên şehîdbûyî bi pêşmergekî mayîn ra mêr dikir.

5) nerazîbûn-munaqeşeyên di navbera tevgelên serhildanê da divê bi biryara serokatiya serhildanê bihatana hel kirin û ew biryar divê bona gişkan yek be û t.m.

Partiya Xoybûnê dest pê kir bi navê "Agrî" banga ku xwendevanan bi qewimandinên li navça Araratê nas dikir biweşîne **(192a, N° 17, r. 14, sal 1927)**. Ala pêşmergan jî hebû.

Zanyarê pêşverû ku di derheqa serhildana Kurdan li navça Araratê da dipeyive dinivîse : "Ew serhildan bi teşkîldariya xwe ku li kongreya Agrî-Daxê bi kombûna çend komikên Kurdan ên ne mezin hate destanîn va ber bi çav dikeve. Tevî wê yekê, rasttir bû ku navê wê rêxistinê ya gel deynin" **(162, r. 21)**.

Pêşmergan hey navça serhildanê dida fireh kirin. Di van qewlan da dîwana Tirkiyê wek berê pelepistûkî (fen-fêl) dikirin û pêş da danî ku Ihsan Nûrî bi wan ra rûnê bona hevpeyvînên aşîtiyê.

Di nîvê meha gulanê sala 1928 da, meclisê kommisyona "aşîtiyê" saz kir û tê da 12 parlementer û çend kesên li ser qulixên bilind ji wilayetên rohilatê hebûn. Ew kommisyon li wargê Şeyxlî-Kopruyê (ew navça ku di navbera pêşmergan û eskerên hukûmetê da bû bêteref bû) rastî dêlêgasyona Kurdan a bi serokatiya Ihsan Nûrî hat. Endamên Kommisyonê Ihsan Nûrî dida bawer kirin ku hukûmetê bona hemû Kurdan baxşandin (efû) îlan bike, lê wê qulixa bilind di dewletê da bidin wî. Dewsa wê yekê, Kurd divên teslîmî eskerên Tirkan bibûna.

Dêlêgasyona Kurdan dijî wê pêşniyara kommisyonê ya "aşîtiyê" derket. Tevî wê yekê, wê da nîşan dan ku qewlê sekinandina şerr tenê dikare ew yek bibe

ku Tirkiye mafên Kurdistanê yên millî nas bike. Li dawiyê, hevpeyvînên li wargeha Şeyxlî-Kopruyê bê feyde xelas bûn (108, r. 281).

Tevî wê yekê, serokatiya Araratê, partiya Xoybûnê dest bi kampanya zor dijî wan gotî bexişandina Kurdan kir û bi wê yekê va armancên hukûmeta Tirkiyê şerpeze kirin ... Di sala 1928 da, serokatiya Araratê name ji eşîrên wilayetên rohilatê ra şand û tê da siyaseta Ankarê ya di hindava Kurdan da dihat şirove kirin, lê usa jî poxê baxşandina Tirkiyê derxist meydanê. Li dawiyê, wê ew endamên rêxistina Xoybûnê ku baxşandinê diparast xayin û neyar hesab dikirin (108, r. 280).

Serokatiya Araratê ku dicedand eşîrên Kurdan ên mayîn bike nava serhildanê, di salên 1928-1929 da çend hêzên çekdar ên ji 15-20 merivan dan saz kirin û ew şandin Zîlan, Wan, Bilanix, Melezgir, Mûş, Qaqizman, Xinis, Qers û ciyên mayîn. Ew desteyên pêşmergan êrîşî eskeran, idaran, avayiyên polîs dikirin. Di çiriya pêşîn 1930 da, Ihsan Nûrî Paşa di banga "Agrî" da gotar çap kir û tê da bangî hemû Kurdan dikir ku bi xurek û çekan alîkariya pêşmergan bikin (108, r. 284-285).

Tevî wê yekê, serokatiya Araratê di nava Kurdên Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê da bang belav kir bi gaziya yekîtiyê di şerkariya bona azabûna ji nîrê Tirkiyê da. Bergirtina (kopî) wê ji Koma Milletan ra hate şandin. "Kurdên birayên me - di bangê da dihate gotin -, hûn divên hêjayî wê yekê bin ku bibin milletê Mezin. Hûn, wek neteweyê dilpaqij û jêhatî, çawa dikarin wek qûlan bijîn, Tirk serokatiyê li we bikin, gava hemû gelên mayîn serbixwe ne ... Bona şerkariyê gişk bibin yek. Me dest pê kiriye birayên xwe ji nîrê Tirkiyê aza bikin, bona ku wê axa ku bi sedsalan erdê me bûye aza bikin" (153, r. 41).

Di destpêka sala 1930 da, bawer bike ku hemû wilayetên başûr-rohilatê di bin destên pêşmergan da bûn. Di van qewlan da, hukûmeta Ankarê gelek hêzên xwe yên eskerî, teknîkî û matêryalî civandin ser hev bona hincirandina serhildana Kurdan. Lê di

6 nîsan 1930 da, desteya Tirkan a cezakirinê li Kîrê bi destê şervanên Kurdan ên mêrxas hat kaf-kûn kirin, temirandin. Ew xeyala Tirkan jî ku dixwest eşîrên Kurdan ên mayîn dijî pêşmergan derxîne şerpeze bû. Hela bi ser da, serhildana Kurdan li Ararat ê çiqas diçû hîn firehtir dibû. Vê yekê serkariya Ankarê bêtabet kir, tirseke mezin kir dilê wan.

Rojnama "Milliyet" a 1 hezîran 1930, mecbûr bû ku bide zanîn ku her behseke di derheqa nerehetiya li rohilata welêt da li welatên derve bîr û baweriyên ne qenc di derheqa qayde-qanûnên li Tirkiyê û hêza hukûmeta Tirkiyê da pêş da tîne. Bi dizî, partiya muxalfetê a liberal-komarî, ku wê demê êdî hatibû saz kirin, bi serokatiya Fethî Beg dicedand ku şerkariya Kurdan bi kar bîne bona bêtaqetî û bêçaretiya siyaseta kabîneta Ismet Paşa nîşan bide. Hela bi ser da, hinek parlementerên meclisê ji Ismet Paşa ra de'w kir ku terka "wî şerrê birakuştinê" bikin. Wan nîşan dida ku ew hemû şerrên ku li Imperatoriya Osmanî dijî gelên ne tirk dihatin kirin, tenê bûne sebebê wê yekê ku ew gel ji Imperatoriyê dûr ketine **(156, r. 14)**.

Lê dîsa jî hukûmeta Tirkiyê xwe bi wê riyê girt ku hêz û mecalên xwe yên pirr bicivîne ser hev bona hincirandina pêşmergan. Wê bi qumandariya Salih Paşa ordîke ku tê da 40.000 eskerên peya, 10 taxbûrên topavêj û gullereşan, 550 çekên gullebarandinê û 50 balafirên eskerî hebûn çê kir **(145, r. 121)**. Qumandariya Tirkiyê, ku êdî hîn bi hêztir bû, dest bi şerrê nuh dijî Kurdan kir. Pey şerrê giran ku weke mehekê kişand, eskerên hukûmetê dane der, şkestin. Kurdan 2.000 dîl girtin, 60 gullereş û 24 top zevt kirin. Kurdan 12 balafir ji jor anîn xwarê **(155, r. 30)**.

Lê dîsa jî eskerên hukûmetê li hev hatin ku di hezîrana 1930 da Kurdan mecbûr bikin ku birevin şkeftên ser tixûbê Îran-Tirkiyê. Wê dema girêdana Îranê alîkariya mezin da Tirkiyê. Gulana 1930, hukûmeta Îranê destûr da eskerên Tirkan ku bi erdê Îranê ra derbas bibin û bikevin nava tabiyên pêşmergan. Pareskerên Tirkan ji wê yekê kar ketin

û ji xwe ra riya Bazirgan-Yarikaya-Aybek-Denbet-Kîrê girt û Kurd kirin nav hesarê. Lê Kurdên ji navça ser sînorê Makuyê (Îranê) bi serokatiya Sîmko hatin hawara pêşmergan û berê xwe da eskerên hukûmetê. Ew rewşa sazbûyî ya bi qeziya qumandariya Tirkan mecbûr kir ku hesarkirina Kîrê bi zeman bide hildan û li benda eskerên xwe yên nuh bin, bona hincirandina ocaxa serhildana Kurdan a nuh ku gelek bi lez belav dibû û êdî gihîştibû navçeyên Başkala, Saray, Bagrîkal, Erdîş, Patnos, Wan, Zîlan û navçeyên mayîn ku tê da weke 100.000 bineciyên ku ji wan 10.000 esker bûn diman. Şerrekî giran xwezma li beşta Zîlanê ji 20 heta 27 hezîran qewimî. Rojnama "Times" di hejmara xwe ya 24 tîrmeh 1930 da di derheqa wî şerrî da nivîsiye ku ji 60.000 eskerên Tirkan 2.000 şehîd bûn û 700 meriv jî dîl hatin girtin.

Bona hildana (pûçkirin) wê serhildanê, ku gelek wek qewimandinên sala 1925 bû, quman- dariya Tirkiyê dîsa pareskerên mezin anîn wira. Bilî wê, Salih Paşa bi serokên çend Kurdan ra danûstendin çê kir, soz da ku pêşkêş-hediyan bide wan û bi wan ra li hev hat ku gelek ji wan bîne hêla xwe û desteyên wan ên çekdarî dijî pêşmergeyên şerrê li Araratê derxe **(112, hejmar 15, r. 14)**. Opêrasyona bona hincirandina serhildanê mehekê kişand û tenê di dawiya tîrmehê da hate serî. Di çend şerran bi Tirkan ra da, ewqas li hev ne hat ku desteyên pêşmergan bihincirîne, çiqasî ku dutîretî û dubendî di navbera wan da pêş da bîne.

Wan dest pê kir bo hovîtî ji heq-hesabên Kurdan hatin der. Cezakirina wan hemû mirovan dizêrand ku şika wan heye ku tevî serhildanê bûn. Bi salixên dîwana Tirkiyê 3.000 Kurd hatin kuştin. Tenê di navbesta Zîlanê da 1.550 Kurd bûn xurê Tirkên bêbext. Di navça Ardîşê da 200 gund hatin şewitandin. Li ser erdê Patnosê tu gund ne hişt. Eskerên Tirkan heywanên Kurdan ji dest wan girtin û bi xwe ra birin **(86, r. 111)**. Wê demê, gava eskerên Tirkan li navça Wanê pey Kurdan digerîyan, Kurdên Kîrê nêzîkî Aralixê êrîşî cerdbaşiyên tirk kir. Di 14

tîrmeh da, pêşmergan rex Aralixê êrîş bir ser alaya Tirkan, rev li wan xist û mecbûr kir ku ew ji sînorê Sovyêtistanê derbasî navça Qemerluyê bibin ( Artaşasa nuha) **(86, r. 112)**.

Şerrê di navbera Kurdan û eskerên hukûmetê da hela berdewam dikir, gava ku di 12 tîrmeh da ajansa Anatolyayê bi têlêgraf îlan kir : "Karên eskerî dijî cerdan êdî xelas bûne. Tirkan berra serhilan daye. Têkoşîna partîzaniyê, ku ya rêaksyonê bû, û li navça Zîlanê dest pê bûbû û gelek cerdên çekdar tevî wê dibûn, û ku di 10 hezîran da ji Farisistanê dest pê kiribûn, êdî hate tune kirin-pûç kirin. Pêşmergan nemaze êrîşî navbendên navçên Muradiye, Bazîd, Patnos, Arşîx û yên mayîn dikir. Li çend wargên jiyînê ku tê da eskerên hukûmetê tu nebûn, pêşmerge bi destê gundiyan hatin raqetandin û gundiyan bixwe xwe diparast. Pêşmergan hil ne dabû ser hesêb ku binecî bi rejîma komarî bawer in.

Serokên cerdê, ku ji Farisistanê hatin hewara pêşmergan, nikaribû êdî tiştekî bikin. Kommisyona cezakirinê ku di 5 tîrmeh da dijî pêşmergan hatibû teşkîl kirin, di 10 tîrmeh da bi serketin kuta bû. Jimara pêşmergan ji 1.500 kes derbas dibû û piraniya wan ji Farisistanê hatibûn **(117, 1930, hejmar 8-9, r. 36)**.

Ew agahdarî ji serî heta binî derew bû, ji ber ku hela di 20 hezîran 1930 da li navça Wanê şerrekî giran diçû. Jimara pêşmergan jî qestbende hatibû kêm kirin. Tiştek li ber çavan e ku bona 1.500 pêşmerge (wek ku qumandariya Tirkiyê digot) ne pêwîst bû ku ji 50.000 zêdetir esker û zabit berhev bikin. Ew yek jî dûrî aqilan bû ku gundî bi rejîma komarî bawer in û xwedê giravî "wan xwe xwe parastiye". Ev gotin qet nakeve serê merivan, ji ber ku mufettişê wilayeta rohilatê yê sereke Ibrahîm Talî Beg di nava gaziya xwe da gef dixwar ku "bineciyên 5 gundan ku piştgirî-alîkariya cerdbaşiyan dikir" berk ceza bike **(117, 1930, hejmar 8-9, r. 36)**.

Ew makkirin jî ku piraniya pêşmergan ji Farisistanê hatibû ne rast e.

Di tîrmeha sala 1930 da, gava qumandariya Tirkiyê dest bi firetî êrîşkirina li ser navça serhildanê kir, çend desteyên Kurdan ji Sûriye û Iraqê (weke 1.000 şervan) ji sînor derbas bûn û ketin navçeyên Mêrdîn û Midyatê yên çiyayî, usa jî besta Sirûcê (126, r. 251). Lê wan nikaribû rewşa pêşmergên navça Araratê bidin pakkirin û di bin zordayîna hêzên Kemaliyan ên pir da mecbûr bûn ji wî erdî dûrkevin. Qumandariya Tirkiyê, ku li wan navçan ji hesabên Kurdan hate der, dest pê kir eskerên xwe li navça Kîrê ku tê da hela weke 3.000 şerkerên Kurdan hebûn, berhev bikin.

Eskerên Tirkan, ku dixwest bikevin pişta pêşmergan û dorê li wan bigrin, derbasî axa Îranê bûn. Pêşiyê Îraniyan bi wê yekê qayil ne dibû. Wê demê kommisyona Îran- Tirkiyê hela xebata bona kifşkirinparvekirina sînoran xelas ne kiribû. Loma jî gelek sebeb hebûn bona li ser hevdu şikayet bikin û bi hevra pev nekevin. Ewha, rojnama "Cumhuriyet" di 30 hezîran da îlan kir : "Ji Bazîdê têlêgram şandine û tê da tê gotin ku di 10 hezîran da firindên Tirkiyê yên eskerî, yên ku gelek caran êrîşî navça Agiriyê dikir bona heywanan bidizin, êrîşî cerdan kirine û ew mecbûr kirine ku birevin welatên derve. Ew qaçaxên ku ji Îranê êrîşî gundê rex sînorê Xanîkê dikir, ew jî ber bi erdê Îranê hatin raqetandin. Desteya ji 100 suwarî bi serokatiya serekeşîran di şeva 20 hezîran da ji gundê Îranê yê Kemal dakutane erdê Tirkiyê, gihîştine navça Zîlanê û rastî eşîrên Heyderanliyan hatine, bi wan ra hevpeyvîn derbas kirine. Bi wan ra li hev hat ku ji wê navça biçûk ku ew tê da ji bin zordariya pareskerên cendierman reviyabûn pêş da herin"

Hem wê demê, di nava weşana Tirkiyê ku dicedand Îranê di nava karên pêşmergên Kurdan û dijminayîya di hindava Tirkiyê da gunehkar bikin da bend û gotar hatine çap kirin. Ewha, rojnama "Hukumeti milli" ya 8 tîrmeh 1930 nivîsiye : "Xusûsiyeta vê tevgerê ew e ku ew ne bi destê xelkên welêt, lê bi destê welatên derve tev rabûye. Tirk nikarin derc bikin ku çawa li ser erdê dewleta cîran dikarin



Institutkurde de Paris

ewqas pirr cerd bên damezrandin, bona ku paşê ji êrîşî axa me bikin û çawa li wan cerdan li hev tê ku dû derbasbûna ji sînor pevgirêdanan tevî rêxistina xwe ya navbendî saz bikin".

Lê rojnama "Rêpublik" a hezîrana 1930 bi gefxwarin nivîsiye : "Eger Îran bi xwe dikare ders bide qaçaxên ku li ser axa wê tên çekdar kirin, wê demê destûra wê tune ku dij derkeve, eger ew ders bide hinekên mayîn".

Lê badilhewa weşana Tirkiyê hêviya xwe danîbû ser siyaseta Îranê ku dîwana wê ya wê demê têkoşîna Kurdan li Kurdistana Îranê dida temirandin. Di 5 îlon da, eskerên Tirkiyê dest pê kir bi alîkariya balafiran êrîşî Kîrê bikin. Di çend pevçûyînan bi Kurdan ra da, li hev hatin ku zora eskerên Tirkan bibin. Lê ji ruyê pirbûna Kemaliyan a eskerî û teknîkî, Kurdan dest pê kir ji Kîrê derkevin û xwe li navçeyên Araratê yên çiyayî veşart. Ihsan Nûrî û çend lîderên mayîn li hev hatin ku herin Îranê, lê Ibrahîm Paşayê Hesikê tevî hevalbendên xwe ku ketibûn nava hesarê şerrê xwe berdewam dikir, ew jî di zivistana sur-serma da. Lê ew di şerrekî giran da hat kuştin, lê hevalbendên wî yên mayîn ên saxmayî dîl hatin girtin (192 a, 1985, hejmar 15, r. 14). Ewha merheleke şerkariya Kurdan a mêrxasiyê ku ji 3 salan bêtir li navça Araratê kişand xelas bû.

Rojnama "Milliyet", pey hincirandina wê ocaxa serhildanê, li ser goristana çiyayê Araratê, li ser kevirê gorê-papaxê ya kurdî wêneyek weşand. Li ser kevir ev gotin hatine nivîsîn : "Li vira Kurdistana xewnerojk hatiye binax kirin" (120, r. 76). Karikatura ha tenê zêna rojnamevanê tirk nîşan dida, lê ne ku rewşa Kurdên rasteqîn, yên ku nenihêrî zordestiya sext terka têkoşîna bona razîkirina mafên xwe yên millî ne kir. Eskerên Tirkan ku siyaseta gelkujiyê berdewam dikir çensed şervanên Kurdan kuştin. Wan neferên çend malên Kurdan ku dîl girtibûn bi hovîtî kuşt, gunehê xwe li kalemêran, pîrejinan û zarokan ne anî. Sala 1930, li Qahirê bultena doktor Behleç Şêrko hate weşandin û tê da navnîşana

pêşmergên dardakirî anîbû û navên gundên Kurdan ku bi destê cezakirên tirk hatibûn wêran kirin û şewitandin dabûn rêzê.

Ş. S. Aydemir, ku di derheqa qewimandinên wê demê da û di siyaseta Kemaliyan a di derheqa pirsa Kurdan da dipeyive, dinivîse : "Nexwestina pêkanîna rêformên aborî û civakî yên dû serhildana sala 1925 gihand wê yekê ku dîsa xwîn wek çem kişiya. Vê carê navça Agirî rabû qal û cengê. Gelek xwîn hat rêtin, gelek şehîd ketin. Li her derî xelayî û sexîrî bû. Û dîsa jî wan dixwest ku hemû problêman bi mecalên admînîstratîf û eskerî hel bikin (116, r. 399).

S. Gavan xût di derheqa wê siyaseta Tirkiyê di hindava Kurdan da ewha nivîsiye : "Li gundan saxesax dişewitandin û ... zarok dikuştin, herweha jin û mêran jî. Piraniya mêran di nava şerr da şehîd dibûn, an jî direviyan çiya. Hukûmeta Tirkiyê siyaseta xwe ya bi herdemî kuştina Kurdan û tirkkirina wan derbas dikir. Bi hezaran Kurd mihacirî Anatoliya Roavayê dikirin. Zimanê kurdî bi resmî qedexekirî bû, lê weşanên kurdî berhev dikirin û dişewitandin. Gotinên "Kurd" û "Kurdistan" jî ji pirtûkên dersan derxistibûn, li vir divê ji Kurdan ra bigotana "Tirkên çiyayî". Kurdistan ji cihanê hatibû birrîn û bona mirovên biyanî riya wê girtî bû" (162, r. 26).

C. Nehru ku siyaseta komên Tirkiyê yên serokatîkir di hindava Kurdan da qîmet dikir, di nava pirtûka xwe ya "Dîtinek li ser dîroka hemcihanê" da nivîsiye : "... Kemal têkoşîna Kurdan bi hovîtî hincirand û "mehkemeyên serbest" ên xusûsî çê kirin ku mehkema hezaran Kurd kirin. Serokên Kurdan, Şêx Seîd, doktor Fuad û gelekên mayîn hatin dar da kirin. Gava ew dihatin dar da kirin, di dema jiyana xwe ya dawîn da bang dikir ku Kurdistana serbest bê çê kirin".

"Bi vî awayî, Tirkan, ku bi xwe van demên dawîn ji bo serbestiya xwe şerr dikir, Kurdên ku wek wan ji bo serbestiya xwe şerr dikir hincirandin. Tiştekî ecêb e ku nasyonalîzma xweparastinê warguhêzî

Institut kurde de Paris

nasyonalîzma agrêssîf dibe, lê şerkariya bona azadiyê warguhêzî şerkariya zorbetiyê dibe ji bo ku hukm li ser xelk bikin. Di sala 1929 da, Kurdan tevger çê kir û dîsa, rast e, ji bo demeke kurt, ew hat hincirandin. Lê gelo ew dikarin heta-hetayê dengê milletekî ku dixwaze azad be û hazir e bona wê azadiyê her tiştî, hetanî canê xwe jî, bide bidin birrîn ?" **(99, r. 93)**.

Hovîtiya di hindava pêşmerên Kurdan bona Daşnakan bû bingeh ku bîr û baweriya mexlûqetiya Awropa û Amerîkayê bicivînin ser hev, bona ku pirsa Kurdan derkeve meydanê. Wan agahdarî di derheqa qewimandinên li Anatolya Rohilatê da didan weşana burjuwaziyê, bi belgan pêş da dihatin û pere û tişt berhev dikirin bona alî pêşmergên Kurdan bikin. Daşnak gelek caran ber bi Entêrnasyonala Sosyalîst bûn. Di nava raporeke buroya xwe ya giranbeha da wan nivîsî : "Dewletên kapîtalîst li ber qewimandinên bi qetl çavê xwe digirin û wek dîtindarên dengbirî xwe diparêzin. Wan peymana Sêvrê ku tê da di derheqa otonomiya Kurdistanê da tê gotin pişt guhê xwe va avêt" **(82, N° 2, r. 39)**.

Pirsa Kurdan, ku li plênuma buroya Entêrnasyonala Sosyalîst ku di 22-25 tebax 1930 da li Zurîxê hat derbas kirin, dihate enene kirin û herweha biryara ku wê buroyê qebûl kiriye hêjayî guhdariyê ye û gelek hewaskar e. Kêlm û peyvên li plênumê, usa jî bîr û baweriyên tevgelên wê, gelek hewaskar in.

Di nava banga buroyê da dihat gotin : "Pirsa Kurdan bona Entêrnasyonala me gelek giring e, ji ber ku eger ew pirs nesafîkirî bimîne, ewê qeziyake mezin be bona aşîtiya li Rohilata Nêzîk ... Casûsên Komîntêrnê dicedînin ku şerkariya Kurdan bikin bin hukmê xwe ... ew cêribandinên wan gihîştine hinek biserketinan, ji ber ku Kurd li her deran xwe bê dost û heval dibînin. Eger Entêrnasyonala me piştgiriya Kurdan bike, ewê ne bi dilê wan kesên ku li Kurdistanê xwe di hindava Entêrnasyonala Moskvayê da tebiya dijiminayiyê girtine be".

Sedrê Komîta karkirinê "De Broucker", ku bersiva kêlmdar da, ewha got : "Me guh da wê doklada

Institut kurde de Paris

hewaskar û nuha em divê derbasî enenekirina wê bin. Lê, berî wê, ku em gilî bidin hevalan, ez dixwazim wan dijwariyên ku di dereca azirûkirin-zelalkirina tebiya me di hindava pirsa Kurdan da dibe ku bi kêrî me bên bidim nîşan dan. Dijwariyên yekemîn ew in ku ... em divên xwe mukur bên ku fikirandina me ya bi cûrê awropî li ber me di dereca helkirina pirsên bi bingehên xwe ne yên awropî da asêgehan çê dike û dikare bîqewime ku em şaşîtiyan bikin. Dijwariya duduyan ew e ku di dilê me da tirs heye ku şerkariya Kurdan li Iraq, Farisistan û Sûriyê jî belav be û ewê bibe sebebê sextbûnên navneteweyî di nav dewletan da". "Rast e - De Brouckerê ku ketibû heyr û goriya empêryalîstan gotina xwe dûmayî kir - ji me ra dibêjin ku îro têkoşîna Kurdan tenê dijî Tirkiyê ye, lê kî dikare bi hêvî be ku sibê ew li welatên jorgotî ewê neyê belav kirin ... Kemala dijwariya sisiyan bona me gelek bingehî ye. Entêrnasyonal, ku parastvana mafên milletan hesab dibe, lê tevî wê yekê her car ew fikir gotiye ku ew dijî wê yekê ye maf bi destê çekan û xwînrêtinê bê dest anîn ... Gelo em dijî tebiya xwe ya bingehî dernakevin - De Broucker kire gazî - eger em piştgiriya têkoşîna Kurdan a çekdarî bikin ? Dijwariya çaran ew e - wî gotina xwe berdewam kir - ku em bi çi awayî dikarin alîkariya Kurdan bikin. Cûrê herî nêzîkî aqilan ew e ku em bi destê Koma Milletan hukm li ser Tirkiyê bikin. Lê hûn gişk jî dizanin ku ew rêxistina navneteweyî çiqas bêçare ye bona hukmkirina bi wî awayî ... Ez nikarim fehm bikim ku tevbûna me ya nava pirsa Kurdan xwediya çi kemala bingehî ye ?".

Raportor, ku bersîva De Broucker da, lazimiya tevbûnê ewha şirove kir : "Min êdî gelek caran ew ferqiya mezin daye nîşan dan ku di wê derecê da di navbera Entêrnasyonala me û ya 3yan da heye. Wê çaxê, gava Entêrnasyonala sisiyan ne tenê bi guhdarî dîna xwe dide her têkoşîneke millî, lê usa jî bi zorê şerkariyên bi wî awayî li wan derên ku ew tu nene saz dike, li her derên topa dinyayê yên

Institut kurde de Paris

dûr jî em hîç naxwazin xwe biêşînin jî, ku di pêş da nasiya xwe bidin her tevgereke millî, heya wê demê, gava ew ewqas pêş va diçe, ku bona cihanê qeziyayê pêş da tîne".

Paşê Mênşêvîkê demekê bi Abramovîç ra peyivî. Wî bi ruhdarbûn çend gotinên "çep" gotin û li dawiyê jî ewha temam kir : "Helbet, em nikarin bîr û baweriyên xwe di derheqa serbestiya Kurdistanê da bêjin, ji ber ku haya me ji fikra xebatkarên kurd di wê pirsê da tu neye; di hêla din jî, em nizanin ku serbestiya Kurdistana Tirkiyê ewê çawa hukm li ser danûstendin û eleqetiyên dewletên cîran, ango bi gilîkî mayîn gotî, li ser Ingiltere û Fransayê bike" (117, 1932, N° 13-14, r. 18-20).

Li dawiyê ji peyvên tevgelên plênumê xuya dibû ku ew di bingehê da ne dijî têkoşîna Kurdan dijî hukûmeta Tirkiyê ne, lê ew ditirsin ku ewê dilê dewletên Roavayê yên Empêryalîst bikeve. Lê jênosîda (gelkujî) di hindava Kurdên Tirkiyê da ewqas bi hovîtî bû ku buroya Entêrnasyonala Sosyalîst jî "dijî wan hovîtiyan derket". Di nava rêzolusyonê da, ku di tebaxa 1930 da hat qebûl kirin, dihat gotin : "Buroya karkirinê ... guhdariya cihanê datîne ser wan xerabkariyan û kuştina ku hukûmeta Tirkiyê pêk tîne, ne tenê bona ku Kurdên ku bona serbestiya xwe rabûne qal û cengê qir bike, lê usa jî dixwaze bineciyên Kurdan am û tam, ku qet tevî serhildanê jî ne bûbûn, bizêrîne. Bi van kelegoziyan va, hukûmeta Tirkiyê dixwaze wê ecêba ku anî serê Ermeniyan bîne serê gelê kurd" (76, r. 18).

Lê ew "dijderketin" û agahdariyên sosyal-dêmokratan, ku bi bingehên xwe va yên taktîkî bûn û ku ji aliyê komên Tirkiyê yên rêkasyonêr dihatin pêk anîn, nikaribû bextê Kurdan ê trajîk biguherînin.

Burjuwaziya Tirkiyê, dema serhildana Kurdan, siyaseta xwe ya helandinê ya şovînîst di hindava gelên welêt ên biçûk da dida xurt kirin. Ewha, di 30 tebax 1930 da, serekwezîr Ismet Paşa, ku dema vekirina xeta hesin li Sîvasê peyivî, got : "Tenê

neteweyê tirk iznê wî heye ku de'wa mafê êtnîkî û irq bike. Tu milletekî mayîn destûra wî ji bo wê yekê tu neye" (216, 31.8.1930).

Wezîrê edaletê Esat Beg, dema ku li Ödemişê li ber bijartiyên xwe pêş da hat, hîn berktir peyivî : "Em li Tirkiyê - welatê herî aza li cihanê - dijîn. Parlementerê we, ku di derheqa baweriyên xwe da gelek eşkere ji we ra dibêje, nikaribû li tu ciyî xelkên wek we bidîta. Loma jî ezê hesînên xwe veneşêrim. Tirk - ew maqûl û xwediyê welêt ê tek-tenê ye. Tirkên bi eslê xwe va ne paqij li vî welatî xwediyê tenê mafekî ne : xulamtî û qûltiyê bikin. Bira ev rastî hem dost, hem jî neyar bizanibin, hela bira çiya jî bizanibin" (216, 19.9.1930). Weşana Tirkiyê jî bi wê giyanê nivîsî. Di 10 tebaxa sala 1930 da, rojnama "Hukumeti-milli" nivîsî : "Tukes şikber nîn e ku me de'wkariyên bi wî awayî (di derheqa serbestiya Kurdistanê da - M.H.), yên wê peraniya (kerî, kom) hovên beyanî laqirdî-henek hesab dikir. Bona wî milletê ku di ferhenga wî da serhevdu 200 gotin hene ... ciyê tek tenê, ku ew dikarin tê da otonomiyê bistînin, di navbera Afrîka yan jî beristaneke wê ku tê da nîvmeriv û nîvmeymûn dijîn e. Lê Asya, ku darinde-dîroka pêşketinê ye, nikare iddiayên ewha qebûl bike. Ew kesên ku dîsa behsa wê bikin, hêjayî wê yekê ne ku boy navê bêqeziyabûna gişkî bên zêrandin û nizm kirin, û bi rastî jî, bi wî awayî ber bi wan dibin" (117, 1932, N° 13-14, r. 73).

Dema vebûna meclisê di 1 cotmeh 1930 da, Mustefa Kemal, dema tehlîla rewşa siyasî ya hundirî, got ku qewimandinên li rohilata Tirkiyê "qeziyabûn bona serbestiya me" (114, r. 349).

Bi vî awayî, şerkariya Kurdan bona naskirina mafên xwe yên millî ji aliyê komên Tirkiyê yên serokatîkir wek destdirêjayiyên di hindava serbestiya Tirkiyê da dihat lênihêrandin. Ji van yekan, dijwar nîn e ku meriv bê ser wê baweriyê ku ji bo çi Kurd bi her teherî dicedand ku ji hukumdariya Tirkiyê xelas bin.

Qewimandinên rex Araratê bingeh daye dîwana Tirkiyê ku êrîş li ser Dersîmiyên ku dest pê kir piraniya wan (eşîrên Seyid Riza û yên Koçelan) di behara sala 1930 da ber bi Erzincanê bibin, bona ku bên hewara serhildana Araratê, bike. Di van qewlan da, hat biryar kirin ku mecalan qebûl bike bona hincirandina eşîrên Dersîmê. Anegorî biryara hukûmetê, Wezareta parastina millî ferman ji qumandariya korpusa Erzincanê ra şand û tê da dihat gotin : "Divê bineciyên gundên Aşgirik, Daxbey û Xersê, yên navça Danzigê (qezayê Pûlûmûrê), yên ku naxwazin baca dewletê bidin û sa jî zagonên hukûmetê yên mayîn bendî tiştekî hesab nakin, ceza bikin" **(136, r. 167)**. Waliyê wilayeta Erzincanê jî ji wezareta karên hundir biryar usa stend : 10 alayên peya bi 15 top û 10 firinde şandin dijî Kurdan, herweha hêzên cendirman, yên wilayetên cîran jî pê ra **(126, r. 256)**.

General-major Ruştî Beg qumandarî li eskerên Tirkan dikir. Rast e, eskerên Tirkan bi jimar û têknîka xwe va gelek bi ser Kurdan bûn, lê Kurdan, xwezma yên Pûlûmûrê, bi mêranî li ber xwe da. Wê demê qumandar Ruştî Beg bertîl da çend serokên Kurdan û wan jî ji eşîrên wilayetên Erzincan û Erzurûmê yên kurd mîlîsên ku rind hay ji cî û wargan hebû teşkîl kirin, û ew hêz li pêşiya eskerên Tirkan xistin û dijî Kurdên Pûlûmûrê derxistin. Di 26 oktobr 1930 da, eskerên hukûmetê ketin navbenda naçva Denzigê. Rojtira mayîn wan gundên Daxberg, Xarsî û Aşgirik şewitandin **(136, r. 170)**.

Hema wê rojê, Dersîmiyan êrîşî tebiyên Tirkan kir û di ruyê wan da batalyona eskerên Tirkan a 11an, tevî qumandarê xwe Surrî Beg, teslîm bû û ew dîl hat girtin. Ev serketin bi saya alîkariya ku Seyid Riza da Kurdên wê navçê hat dest anîn. Eşîrên Brîman, Heyderan û Demnan mêraniyeke bêhempa kir **(126, r. 257)**.

Di 7 cotmeh 1930 da, alaya 3mîn bi qumandariya Xalis Paşa gihîşt eskerên Ruştî Beg ku ji navça

Araratê vegeriyabû. Cezakirên Tirkan êrîşeke nuh bir ser Kurdan. Wan, dema pevçûyînê, gelek esker hunda kirin, lê dîsa jî bi wan ra li hev hat ku gundê Gurkê zevt û wêran bikin. Lê serketina wan bi wê yekê va xelas bû. Di nava rapora xwe da, Xalis Paşa bi pesndarî da zanîn : "Jimara qaçaxan, ku xwe li şkeftan û di nava berfê da veşartine, ji 40 kesî derbas nabe. Dema pevçûyînên 11 û 12 novembr, ji qaçaxan weke 100 mirovên ku wan mecbûr kir ji hev belav bin şehîd bûn" **(136, r. 171)**.

Rast e, wî pesna xwe dida, lê berxwedayîna Kurdan bi mêranî di wê zivistana sur-serma da Tirk mecbûr kirin ku vê carê jî paş da vekişin. Pey çûyîna eskerên Tirkan, Kurd vegeriyan gundên xwe.

"Kurd, ku ocaxên wan hatibûn şewitandin û hedimandin - waliyê Erzincanê Elî Kemalî dinivîsî - ... vegeriyane cî-warên xwe, koxikên xwe yên sade ku ji çar dîwaran û banekê bûn çê kirin, û di wan qewlan da dijîtin ku qet ferqa wan û yên berê tu nebû" **(136, r. 171)**.

Behara sala 1931, serhildana Kurdan li Araratê dîsa "serê xwe bilind kir". Bona ku pêşiya wî şerrî bigire û ew şerpeze bike, di destpêka gulana 1931 da hukûmeta Tirkiyê navça Araratê wek navça qedexekirî îlan kir **(185, 2.5.1931)**. Bilî qulixçiyên eskeriyê, iznê tukesî ne dida ku here wira. Bona hincirandina şerrê nuh li navça Araratê, hukûmeta Tirkiyê diviya gelek esker bike nava şerr û çend deh milyon lîra xerc bike.

Rojnama "Zarya Vostoka", ku di derheqa mecalên hukûmeta Tirkiyê yên cezakirinê da dipeyive, di hejmara xwe ya 20 adar 1931 da nivîsiye ku eskerên Tirkan kême-kêm 200 wargên Kurdan ên jiyînê û konên koçeran xerab kirine, û usa jî çend hezar pêşmergên Kurdan kuştine. Tevî neferên malan, jimara şehîdan digihîşt 10-15.000 **(117, 1931, hejmar 12, r. 14)**. Bi salixên partiya "Xoybûn", desteyên Tirkan ên cezakirinê 660 gund wêran kirin û 15.206 mal şewitandin **(103, r. 73) (31)**.

Dû 30 salan, zanyarê Kurdan ê bi nav û deng, Ismet Şerîf Wanlî, nîşan da ku serhildana salên

1927-1931, ku barêgeha wê li rexê Araratê bû, ji serhildanên Kurdan yên herî demdirêj bû. Ew şerrê ji bo serbestiyê bû ku "bi hûrgilî ji aliyê rêxistina eskerî-siyasî, Xoybûn, hatibû amade kirin û ku serokatiya wê Ihsan Nûrî Paşa û zabitên wî yên navdar dikir" (173, r. 11).

Serhildana Araratê ya gelî bû, hêzên wê yên siyasî û bingehî gundiyên koçer û reat bûn.

Tukes nikare teqsîr bike ku wek berê qeflên gundiyan ên pirr tevî serhildanê dibûn - kovara komunîstên Tirkan "Inqilab yolu" dema serhildanê dinivîsî -. Eger usa nebûya, eskerên hukûmetê ewê mecbûr nebûna ku mecalên cezakirinê ku gelek meh kişand bi kar bînin, û qewimandin ewqas bi qeziye ne dibû. Rast e, rojnameyên burjuwa pir agahdariyên di derheqa "qaçaxan" û "desteyên cerdbaşiyan" da dinivîsîn, lê tiştek isbat e ku binecî bi hevra bi firetî dijî siyaseta hukûmetê derketine (211, 1930, N° 1-2, r. 10).

Serhildana Araratê zîrekî û jêhatiya dereca Kurdan a siyasî nîşan da. Ew serhildan, ku bi qedera xwe va ji ya Şêx Seîd nizmtir bû, bi qedera zîrekiya xwe ya siyasî, bi armanca zelal û fireh ku Komara Kurdistan çêke, bi ser serhildanên berê xwe ra bû. Serhildana Araratê di bin ala Komara Kurdan a serbixwe da pêş va diçû, bi aliyê eskerî û siyasî rêxistina Xoybûn ku nûnerên rewşenbîrên Kurdan, burjuwaziya bazirganiyê, usa jî nûnerên niştimanperweriya burjuwa diketin nav wê serokatî dikir. Eynata di hindava zordestên Tirkan da ew gihandibûn ser hev û yekîtiyek di navbera wan da çê bûbû.

Tevî wê yekê, çend faktor hebûn ku bûne sebebê ketina serhildanê :

1. Serhildana Araratê bêy tedarukdîtina bi hûrgilî dest pê bû.

2. Rast e, partiya Xoybûn hukmê xwe li ser wê serhildanê hiştibû, lê ew bi aqilane ne hatibû teşkîl kirin, rêxistina wê ya zane tu nebû û bernama wê ya siyasî ya hazirkirî jî tu nebû.

3. Tunebûna yekîtiyê di navbera eşîran da ferzend da Kemaliyan ku pareke serokên Kurdan bîne hêla xwe û berê wan bide dijî têkoşîna Kurdan a millî.

4. Serhildana Araratê ya mehellî bû û li ser navçeyên Anatolya Rohilatê bawer bike hîç belav ne bû.

5. Ne li hundirê welêt, ne jî ji welêt der, şerkariya Araratê ne hat parastin, piştgiriya wê ne hat kirin.

Zinar Silopî ku di derheqa aliyên serhildana Araratê da dipeyive, dinivîse ku tunebûna barêgeha qumandariyê, ku bikaribûya serokatî li teşkîlkirina şerkariya partîzaniyê bike, tunebûna rêxistyinerke usa ku bikaribûya hemû pêşmergan bike bin qolê xwe û serokatiyê lê bike, gihandina wê yekê ku her kes bi serê xwe, an jî bi daxwaziya çend hevalan şerr dikir **(145, r. 90)**.

Ev hemû faktor û herweha yên din jî bûne sebebê derdayîna serhildana Araratê.

Kemaliyan ku bi destê esker serhildana Kurdan hincirand, dest pê kir propaganda milletçîtiyê û panturkîzmê, yên ku ne tenê mafên gelî bendî tişteki hesab ne dikir, bi hêz bikin, lê usa jî li ser wê baweriyê bûn ku li Tirkiyê gelên biçûk an jî yên ne tirk tu nene. Ewha, sekreterê sereke yê partiya Gel-Komarî, Recep Peker, di nava kêlma xwe ya oktobra 1931 da got ku dema prensîpên "milletçîtiyê" ku di programa PGR da heye şirove dikirin, dibêje ku li Tirkiyê Kurd, Çerkez, Laz û gelên mayîn tu nene, lê tenê Tirk hene ...

Ji hemşeriyên me yên xaçparêz û ji Cihûyan ra lazim e ku di derheqa fikra me da bê gotin - Recep Peker bi wê eşkeretiyê gotina xwe berdewam kir -. Partiya me wan jî wek Tirk hesab dike. Wî fikra xwe bi wê yekê va isbat û mak dikir ku ulmê nûjen kefîltiya heyetiya wan gelên ku 5.000-10.000 in, çend 100.000 in, lê hela çend milyon in jî nade" **(216, 17.10.1931)**.

Partiya komunîst a Tirkiyê dijî siyaseta komên Tirkiyê yên serokatîkir û di hindava Kurdan da şovînîst derket. Ev yek di bernama wê, ku di

kongreya sala 1926 da hatiye qebûl kirin û di ya 1929 da hatiye rast kirin, da hebû.

Ew, ku bi prensîpên Marksîzmê dihat serkarî kirin, di wan qewlên pirr dijwar da dijî bindestkirina gelên biçûk ku ji aliyê burjuwazî û milkedarên Tirkiyê dihat derbas kirin şerkarî dikir. PKT pêş da dihat bona wekhevtiya hemû gelan di jiyana welêt a civakî-aborî, siyasî û çandî da.

Partiya komunîst a Tirkiyê - di nava bernamê da dihate gotin - dicedîne ku bigihîje wê yekê ku karker, gundî û eskerên ji 18 salî ne biçûktir, bêy hesabhildana qism, olperestî û milletê wan, maf dest bînin bona nûnerên xwe bibijêrin û xwe xwe di nav hemû civînên zagondariyê û belediyê da bên bijartin, usa jî mafê wan hebe ku paş da gazî wan nûneran bikin ..." (& 10) (25, r. 151).

Partiya komunîst a Tirkiyê mafên gelên bindest, herweha yên Kurdan jî, ku bêy tu qewl, bixwe bextê xwe biryar bikin û safî bikin, heta cihêbûna tam jî, nas dikirin. Ew dijî siyaseta partiya Gel-Komarî ya ku bona helandina Kurdan û gelên mayîn ên ne Tirk bê hempa kar dikir. Tevî wê yekê, PKT pirs danîbû pêşiya xwe ku bi gelên biçûk ra rola burjuwaziyan, derebegan, milkedaran, ku gelek ji wan daxwaziyên gel avêtibûn pişt guhê xwe, yan xwe bi Kemaliyan ra kiribû yek û piştgiriya armancên empêryalîzmê dikir, di zêrandinê da şirove bike. PKT şerkariya dijî empêryalîzmê wek pirsdanîneke xwe ya sereke hesab dikir.

Partiya komunîst a Tirkiyê - di nava bernamê da dihate gotin - dijminê empêryalîzmê yê bêhempa û neyarê hemû casûsên wê, milkedarên gir, derebegên hemû gelan, dîndarên hemû olan, hemû burokratan e" (25, r. 151).

Tevî wê yekê, PKT ku wekhevtiya gelên biçûk diparast, de'w dikir ku mafê wan hebe bona ku di dibistanan da bi zimanê xwe yê zikmakî derbaz bin, bi wî zimanî bikaribin di idaran da bipeyivin, usa jî pêş da dihat bona gundiyên rêncber û koçer ji bindestiya derebegan aza bikin, xwelî û heywanan

ji destê derebegan hildin û di nava gundiyan da par ve bikin.

Di bernama PKT da dihat dîtin ku cahilên (genc) Tirkiyê bi giyana Entêrnasyonalîzma prolêtaryê terbiye bibin. Di bernamê da jî dihat xuya kirin ku dîwana karker-gundiyê Tirkiyê divê bicedîne ku di nava xebatkaran da yekîtiyê tevî gelên biçûk çêke û wek komarên Sovyêtî fêdêrasyonekê saz bike bona şerkariyê dijî fêodalîzm û empêryalîzmê bike.

Ev nuqteyên programê şehadet didin ku PKT di nava wan qewlên pirr sext da bi tomerî hildayî xwe di dereca pirsa millî da riya rast girtibû, bona kara xebatkarên tirk, kurd û hemû gelên Tirkiyê yên destdayî bû û bi dilê wan bû.

### 4. Peymana Tirkiyê tevî welatên mayîn bona hincirandina têkosîna Kurdan

Şerkariya Kurdan a azadariyê ne tenê komên Tirkiyê yên serokatîkir bêtabet dikirin, usa jî yên Îran, Iraq û Sûriyê û tirsek xistibû nava dilê wan. Rast e, welatan carna helekarî di nava siyaseta xwe da dikir, lê bi tomerî hildayî sermiyanên wan dijî şerkariya Kurdan a millî derdiketin. Di derheqa wê yekê da dibêjin ku peyman û biryarên cihê-cihê ku wan welatan di nîveka salên 20 a duduyan û destpêka salên 30 da bi hevdu ra girêdabûn, usa jî ew gavên wan ên pratîk ku bona hincirandina tevgerên Kurdan li wargên Kurdistanê yên cihê-cihê, dihatin pêk anîn.

Ingilîzan dû "safîkirina" pirsa di derheqa Mûsilê da dest pê kir li rê-derban bigerin bona bi kîsê Kurdan danûstendinên xwe û Tirkan hel bikin, nêzîkî hev bin. Tevî wê yekê, gelek hewaskar e elametiya komîsarê Iraqê yê sereke, maqûl Henrî Debbas, ku wî di adara 1926 da kiriye.

Nûçegihanê rojnama "Manchester Gardian" ji maqûl Henri Debbas pirs di derheqa Kurdên Iraqê da kir û di derheqa pêrspêktîvên serbestiya wan ku tirseke mezin kiribû dilê Tirkiyê da jê pirsî. Debbas ewha bersîv da : "Pirsa di derheqa serbestiya Kurdan da

Institut kurde de Paris

tu neye û ewê tu nebe. Tirkiye dikare ar-xayin be, ku biryarên Koma Milletan ên di derheqa serdestiyên (ziman û yên mayîn) da çawa jî bêne pêk anîn, hesab yek e, pirsa di derheqa serbestiya Kurdan da tucar ewê neyê meydanê. Şikberiya Tirkan a di derheqa wê yekê da, ku pirsdanîneke siyaseta Ingilterê li Rohilata Nêzîk ew e ku Kurdistana serbest saz bibe, ji esasê peymana Sêvrê tê, lê nuha karmendên Ingilterê yên siyasî ji wê daxwaziyê paş da sekinîne. Ez li ser wê bawerlyê me ku di nava van du salên dawîn da min bixwe Kurdên Iraqê da bawer kirin ku xewnerojkên wan ên di derheqa serbestiya tam da bona wan xeyalan û bextewariya wan a duwerojê di nava jiyana tevayî ya bi Iraqê ra da ne yên pêkhatinê ne" (178, 9.6.1926).

Di 5 hezzîran 1926 da, di navbera Brîtanya Mezin, Iraq û Tirkiyê da, peyman hat qol kirin û tê da usa jî tê gotin : "Dîwanên Tirkiye û Iraqê ewê ji her cûre eleqetiyên xwe yên tevî serokan, şêxan an jî endamên eşîrên mayîn, bajarvanên dewletên din ku wê demê li ser axa dewleteke mayîn in ta bidin (tev nebin, bipên) ku ew resmî, an jî dîplomatîk bin. Ew yê berk dijî her rêxistin, propagandakirin an jî civînên ku ewê li ser navça ser tixûb bên teşkîl kirin û derbas kirinên ku dijî wan her du dewletan bin derdikevin" (miqal 12) (24, r. 310-311).

Wê peymanê bingeha wê hevrakarkirinê danî, ku divê karkirina herdu welatan di pirsa Kurdan da bida koordînasyon kirin. Tevî wê yekê, wê demê nêzîkhevbûn di navbera komên Tirkiyê yên serokatîkir û hukûmeta Îranê ya padîşahtiyê da xuya dibû. Di nîsana 1926 da, li Tehranê peyman di derheqa dostî û bêqeziyabûna di navbera Îran û Tirkiyê da, ku hinek miqalên wê didît ku bi hev ra kar bikin bona hincirandina têkoşîna Kurdan, hate qol kirin.

Anegorî wê peymanê, her du alî borc hildida ser xwe nehêlin ku li ser erdê wan rêxistinek saz bibe, an jî komikek ku armanca awê ew e ku aşîtiyê biteribînin kar bike bona ku serokatiya wan welatan qeziyê pêş da bîne, usa jî divê nehêlin ku kes û komikên usa, ku niyeta wan ew e ku propa-

Institut kurde de Paris

ganda şerr bikin an jî dijî yek ji wan her du waletan derkevin, bên wira" (miqal 5).

Di nava miqala wê peymana 6an da dihate gotin ku bona netirsandina dilrehetî û bêqeziyabûna bineciyên ser sînor, her du aliyên pevketî ewê her mecal pêk bînin bona dawîanîna wan karên gunehkar ku dikarin zerer bidin her du welatan, dijî wan eşîrên ku li ser erdê nêzîkî sînor dijîn û wî karî dikin derkevin ..." (24, r. 304-305).

Her du dewlet, ku ditirsiyan eşîrên Kurdan bibin yek û bi hevra dijî dijmin şerr bikin, hema wê salê anegorî miqala wê peymanê ya 7an li hev kir "di derheqa hevrakarkirina bona helkirina pevçûyînên ser sînor" qol bikin. Bi rastî, ew lihevkirin bû di derheqa karên tevayî bona hincirandina şerkariya Kurdan a millî. Hewaskar e ku qasidên alman ku di sala 1926 da li Tirkiyê bûn ji dîwana xwe ra di derheqa wan qewimandinan da çi dinivîsîn :

"Tirkiye bi qayilbûna hukûmeta Farisistanê sîronên xwe yên Kurdistan-Farisistanê xurt dike. Ev mecala girêdayî gumrehbûna şerkariya pêşmergên Kurdan hatibû qebûl kirin. Peymana nuh a di derheqa karên tevayî bona qeydekirina nerazîbûnên li ser sînor da, ku di navbera Farisistan û Tirkiyê da hatibû girêdan, dijî serhildanên Kurdan bû, ku dikaribû biqewimiya. Em bidin xuya kirin ku peymana Mûsilê ku di navbera Ingiltere û Tirkiyê da hatibû girêdan, hukûmeta Bexdadê mecbûr dike ku nehêle ku Kurdên netebitî ji sînorê Iraq-Tirkiyê derbasî vî aliyî û wî aliyî bibin ... Tevî wê yekê, safîkirina pirsa Kurdan di wan rojan da, bona wê yekê derdiket ser plana pêşîn ku dewletên Tirkiye û Farisistanê bi hêz bûbûn û dixwest ku ew hêzbûna xwe bi kar bînin bona pêşîgirtina pirsa Kurdan. Ew yek ji Tirkiyê ra li hev hat. Gelek eşîrên Kurdan bi serokên xwe va ji warê xwe ber bi navçên roavayê yên dûr hatin raqetandin, lê li ser erdê Kurdan bineciyên tirk cîwar dikirin" (94, r. 97-99).

Lê bi kîsê Kurdan nêzîkhevbûna Tirkiyê bi Îranê ra ewqas jî zelal nîn bû. Di îlon-oktobra 1927 da,

şerkariya Kurdan a dijî Tirkiyê ya li ser sînorê Tirkiya rohilatê warguhêzî şerrekî giran bû. Hêzên Tirkiyê yên cezakirinê, ku li dû Kurdan digeriyan, digot ku Kurd xwe li ser erdê Îranê ku ew tê da alîkariya moral û maddî distînin vedişêrin. Girêdayî vê yekê, fikra mexlûqetiya Tirkiye û weşanê dest pê kir hukûmeta Îranê berk rexne bike. Ewha, rojnama "Igdam" nivîsî : "Anegorî peymana Farisistan-Tirkiyê, her du alî divên hereketên xwe bikin yek bona ku bêqeziyabûna navçeyên xwe yên ser tixûb biparêzin. Eger usa be, bira Farisistan alî me bike ku em ji heq-hesabên qaçan bên der. Em divê bizanibin ku ew di wê pirsê da xwe bi çi tebiyê digrin û ... mecalên anegor qebûl bikin, ji ber ku sebra Tirkan qut bûye û ew êdî nikarin vê rewşa tevhevbûyî qebûl bikin" **(28, 161, belge 280)**.

Di destpêka meha oktobr 1927 da, hukûmeta Tirkiyê nota şikayetkirinê ku guhdariya wê datanî ser karkirina dîwana ser sînor, ya ku di nava danûstendinên dostiyê da tiştên neqebûlkirinê ne, ji hukûmeta Îranê ra şand.

Sertiya di navbera Tirkiye û Îranê da ewqas dem dom kir, hetanî serhildana Araratê dest pê bû. Karê Kemaliyan tevî sermiyanên Sûriyayê di wê derecê da bi serketin pêş da diçû.

Di 30 gulan 1926 da, di navbera Tirkiye û Fransiyayê da lihevkirin di derheqa dostî û pêwendiyên qenc da hate qol kirin. Dema qolkirina wê lihevkirinê, protokol N° 8 ya di derheqa "Karên li ser sînor"da, ya ku ji bo dijderketina Kurdan bû, jî hate imza kirin. Em li jêr naveroka wê protokolê bi hinek kurtkirinan va tînin.

Miqal I. Her du aliyên bi hev ra pevketî borc hildidin ser xwe ku bi hemû mecalên ku di bin destê wan da hene bi kar bînin bona ku dijî wan kesên çekdar ku dixwazin navça li ser sînorên cîran talan bikin, an jî qaçaxiyê bikin û nehêlin ku ew kes ji sînor derbas bin ... derkevin. Miqal 3. Dîwana berpirsiyar ... çiqas bikaribin ewê ewqas zû di derheqa her karekî talankirin û qaçaxiyê ku

dikare ji ser axa wî bê miaser kirin da hevdu agahdar bikin. Dîwana wî aliyî ku işareta usa stendiye, divê bicedîne ku gunehkaran (eşqiya) bigre û bi her awayî nehêle ku ew ji tixûb derbas bin. Miqal 4. Eger yek an jî çend kesên çekdar, ku li ser navça cîran li ser sînor teribandina qanûnan an jî gunehkarî kirine û revîne navça li ser sînorê mayîn, wê demê dîwana wê navçê borcdar e ku kesên usa bigire, bona wan bi çekên wan teslîmî aliyê mayîn bike, ji ber ku ew xelkên wî welatî ne" **(24, r. 308-310)**. Anegorî peymana 30 gulan 1926, 29 hezîran 1929, li Ankarê di navbera Tirkiye û Sûriyê da "protokola di derheqa parastina sînor û kontrola li ser koçeran da" hate qol kirin. Anegorî wê protokolê, her du hukûmet borc hildane ser xwe ku nehêlin ku navça li ser sînor wek ciyê amadekirina opêrasyonên "qaçaxiyê" an jî karên pîs ku ewê dijî kara dewleta cîran bin bê xebitandin. Her du alî borc hildane ser xwe ku pêşiya êrîşkirinan bigrin û nehêlin ku cerdên çekdar ji sînor derbas bin (miqal 2) Eger gunehkarî an jî qaçaxî li ser sînor hatine kirin û gunehkar dicedînin xwe li navça li ser sînor veşêrin, dîwanên wê navçeya cî divên bi lez mecalan qebûl bikin, bona gunehkaran bigrin û mehkema wan bikin (miqal 3). Her eşîr an jî malbateke ku dijî dîwanê radibe û ku destûra koçeriyê stendiye û derbasî axa dewleta cîran bûye bona xwe biparêze, divê çekan ji destê wê hildin û ewqas ji sînor dûr bixin ku nikaribe karên dijminatiyê bike (miqal 11) **(117, 1929, № 3, (II), r. 80-82)**. Salên 1930-1931, weşana Tirkiyê a girêdayî hêzbûna şerkariya pêşmergeyên Kurdan li navça Araratê kampanyake nuh dijî hukûmeta Îranê dest pê kir û ew gunehkar kir ku ew xwedê giravî li ser sînorê Tirkiye-Îranê piştgiriya Kurdan dike. Ewha, rojnama "Yeni gün" di hejmara xwe ya 8an, sala 1931 da nivîsiye : "... Pey demeke kurt ji qewmandinên Agrî Daxê me agahdarî stend ku cerdên Kurdan û Ermeniyan dîsa êrîşî Tirkiyê kir. Anegorî salixên ku me ji Ankarê stendine, ew şerkariya li ser sînor a nuh nîn e, lê gilî di wê yekê da ye ku hinek Kurdên ku

xwe li ser erdê Îranê veşartine dîsa karên xerabkariyê dikin. Em berî gişkî bona tabiya ferz a di hindava wan xerabkariyên ku ziyaneke mezin in di nava dostiya navbera herdu welatan da li ber xwe dikevin. Hukûmeta Tirkiyê çawa lazim bû, usa guhdariya hukûmeta Îranê danî ser wê yekê. Em dixwazin ku di navbera Tirkiye û Îranê da eynî dostiya xurt ku ewê bona kara her du neteweyên mezin be bê testîq kirin".

Pey vê yekê, rewş li ser sînor demekê hate normal kirin û ew bi wê yekê va tê şirove kirin ku Îranê ne dixwest navça Araratê bide Tirkiyê. Heq-hesabên hukûmeta Îranê jî li ser wê tixûbê hebûn, ji ber ku ew navçe gelek nêzîkî Azerbaycana Îranê ku tê da piraniya bineciyan ji wan milletên ku dikevin nava koma zimanên tirkî bûn bû. Bi dizî, Tirk li ser wê baweriyê bûn ku divê navça Araratê bidin wan, ji ber ku, wek wan digot, tenê bi wî awayî dikarin dawiya şerkariya pêşmergên kurd bînin. Lê Tehran jî li ser wê baweriyê bû ku bona wê armancê pêwîst e ku careke mayîn li pirsa parevekirina sînor binihêrin.

Pey hevpeyvînên demdirêj, her du dewlet di 23 çileya pêşîn 1932 da li Tehranê protokol di derheqa sînor da qol kir û peyman di derheqa arbîtraj û lihevhatinê da girêda **(35, dîwan 13, r. 673-699)**. Pey wê, di 5 novembr 1932 da, peymana Tirkiye-Îranê ya di derheqa dostiyê da, ku di 28 çiriya paşîn 1933 da hat testîq kirin, hat girêdan. Lê di 9 çileya paşîn 1932 da, li Ankarê lihevkirina Tirkiye-Îranê di derheqa teslîmkirina guhkaran û qaçaxan da hatibû qol kirin, û ew yek di 27 hezîran 1932 da ji aliyê meclisa Tirkiyê hatibû testîq kirin **(35, dîwan 13, r. 1027-1042; dîwan 15, r. 134-135)**. Ev hemû lihevkirin û peyman şehadeta wê yekê dida ku Tirkiye bi serokên xwe yên burjuwa-milkedaran va di karê "safîkirina" pirsa Kurdan da xwediya piştgirên usa bû, wek hukûmeta Îranê û usa jî empêryalîstên Ingiltere û Fransayê ku di nava derbaskirina siyaseta xwe ya di hindava Kurdan da gelek mîna Kemaliyan bûn.

Empêryalîstên Roava têdigihîşt ku biserketinên şerkariya Kurdan li Tirkiyê ewê alîkariya şerkariya Kurdan li welatên mayîn bikin, û usa jî ewê tebiya empêryalîzmê ne tenê li wan welatan, lê usa jî li temamiya Rohilata Nêzîk bidin sist kirin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## XURTKIRINA SIYASETA HINCIRANDINA KURDAN DI SALÊN 30 DA

INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

1. "Safîkirina" pirsa Kurdan berî serhildana Dersîmê

Hukûmeta Tirkiyê, ku serhildana Araratê hincirandibû, dîsa ferzendên usa pêk dianîn ku bi bîr û baweriya wê diviya pêşiya şerkariya Kurdan bigirta. Bona wê yekê, wê dest pê kir mecal bi kar bîne ji bo mihacirkirina Kurdan ber bi Anatolya Navbendî û Roavayê ku tê da ew diviyan di nava bineciyên Tirkan da bihelin. Ew yek dû serhildana 1925 jî bû. Wek Lucien Rambut dinivîse, bona wê armancê di destpêka gulana 1932 da zagon hat qebûl kirin ku li Tirkiyê 4 navçe bên saz kirin (32). Ji wan 3 li Kurdistanê bûn û yek ji wan "bona pakkirina rewşa sihhî, maddî, çandî, siyasî û strtatêjîk bû, usa jî bona wê armancê bû ku qayde-qanûnan biparêzin" û ew navça gotî bi temamî bihata cihê kirin û bibûya navça qedexekirî.

Her du paragrafên pêşîn destûr dida dîwana Tirkiyê ku bi mecalên zordayînê, admînîstratîf-polîsî yekîtiyên eşîran ji hev bikin, pîre-pîre bikin û mafan ji destên serekeşîran û şêxan hildin. Anegorî paragraf 3, temamiya hebûna eşîran dikete bin qolê dewletê û dibû arzîtiya wê. Di paragraf 4 da dihat dîtin ku ewê erdê ji destê Kurdan hildayî bidin wan Tirkên multecî, yên ku ji welatên Balkanan hatibûn.

Bi vî awayî, dîwana Tirkiyê di hêlekê da dixwest ku bingeha heyeta eşîran a aborî ji binî va rake, lê ji hêlekê din jî "kesên tirk ên emîn" ku bi baweriya wan diviyan pêşiya şerkariya Kurdan a nuh li wilayetên rohilatê bigrin "bîne li wira cîwar bike".

Paragraf 5 destûr dida serokatiya Tirkiyê ku her bajarvanek, tevî neferên mala wî, sirgûn bike, eger şikberî li ser heye ku ew casûsiyê dike. Di paragraf 6 û 7 da dihat dîtin ku mecalên usa qebûl bikin

Institut kurde de Paris

ku Kurd zimanê xwe yê dê ji bîr bikin, ku ew li navça mihaciriyê nikaribin xebata bi dilê xwe peyda bikin.

Û li dawiyê, paragraf 8 biryar kiribû ku li navçeyên mihaciriyê jimara Kurdan diviya ji %10 ji bineciyên tirk zêdetir nîn bin.

Weşandina wê projê tevhevbûneke nuh li Kurdistanê pêş da anî, xwezma li Dersîmê. Kurdan dest pê kir li ser navê Mustafa Kemal name-erze binivîsin û jê hêvî dikir ku qebûlkirina wê zagonê bidin sekinandin. Lê ew hemû hêvîkirin bê bersîv man **(128, r. 128)**.

Di nîveka sala 1932 da, waliyê Elazîzê Deli Fahri, ku talîmên eskeriyê li wargên jiyînê yên giring bi hêztir kiribûn, de'w kir ku bineciyên Dersîmê çekan teslîm bikin, lê desteyên pêşmergan yên eşîra Koçgirî dev ji berxwedayînê berdin û teslîmî eskerên Tirkiyê bikin. Eger usa nekin, wî da zanîn, ewê temamiya bineciyên Dersîmê bîne ber mîratê.

Deli Fahri, ku planên xwe di nava jiyanê da pêk dianîn, li bajarên Çemişkezek, Xozat û Melezgirê, ku tê da serekeşîran gazî bal xwe kir, gefxwarinên xwe ji wan ra gotin, qesidî. Lê ew gefxwarin ne gihîştin tu mefayî, lê hela bi ser da ew bûn sebebê hêzbûna tevrabûnên li Dersîmê. Wê demê, Seyid Riza têlêgram şandin Ankarê û tê da temamiya bersîvdariya rewşa hişk li wê navçê davêt ser karên walî Deli Fahri **(126, r. 242)**. Rewşa li Dersîmê berxweketina dîwana Ankarê ya mezin pêş da anî. Loma jî dawiya îlon-destpêka oktobr 1932, serekwezîr Ismet Paşa li wilayetên bakur- rohilatê geriya **(36, r. 61-62)**. Ew çû Elazîzê û li wê derê tevî mirovên bi nav û deng û Deli Fahri, Ibrahîm Talî Beg, qumandarê eskerên Elazîzê Huseyn Husnî peyivî û nerazîbûn û hevraneqayilbûnên girêdayî wan mecalan, ku gotî bên qebûl kirin ji bo "mulayimkirina" Kurdan, xuliqîn. Ismet Paşa de'w ji wan kir ku mecalan bidin xurt kirin bona pêkanîna siyaseta hukûmetê.

Walî Deli Fahri wek berê li ser wê baweriyê bû ku pirsa Kurdan divê bi şerr bê hel kirin. Wî desteya

Institut kurde de Paris

ji 120 mirovên suwarî teşkîl kir û berê wan da ber bi eşîra Yûsufan, ferman da ku serekeşîr Kember Axa bigrin. Lê hêzên çekdar ên eşîra Yûsufan bêy tu gullekirin wê desta suwarî dîl girt. Neserketina Tirkan gihand wê yekê ku walî dîn û har bû û îlan kir ku ewê bixwe Kember Axa bigre û gulle bike, yan na ewê sax venegere. Bona wê armancê, ew bi alaya eskerên hukûmetê va hate Melezgirê. Li wargê jiyînê yê Paksuyu (bakurê Nazimiyê) Deli Fahri kete nava dorgirtina eşîra Yûsufan ku xwe bi tebiyên şervaniyê girtibû. Wî li ber Kember Axa û Yûfus Axa pêşniyar kir ku "aşîtiyê" girêdin. Lê serokên Kurdan ji Deli Fahri ra got ku ew çekê xwe teslîm bike. Paşê Deli Fahri giran nexweş ket û alayê mecbûr bû vegere Melezgirê. Deli Fahri hema li wira jî çû ser heqiya xwe, ji dest wê yekê ku xwîn li ser mejiyê wî dilop kiribû **(126, r. 244)**.

Ha jiyana celladekî gelê kurd ê herî hov bi vî awayî "gever" bû.

Hurmeta Ibrahîm Talî Beg di nava hukûmetê da ket, ji ber ku wî nikaribû anegorî plana vekirî ya Dersîmê bike bin qolê xwe, û wî ji qulixa mufettişê wilayetên rohilatê hate derxistin û gazî wî li Ankarê kir. Waliyê Sîvasê Wehbî Beg dewsa wî girt ... Li ser riya Diyarbekirê ew li gundê Helwenkê (wilayeta Elazîzê) qesidî û li wira rastî mihacirên ku ji Yûnanistanê hatibûn hat. Ji ber ku wî zanibû ku li wî gundî dijî Mehmet Nûrî Dersîmî bûn, ewha gote mihaciran : "Nûrî dijminê Tirkan e, me hûn anîne vî welatî ku hûn berî mirovên wek wî bi qeziya bidin. Tu tiştekî tomerî di navbera mirovên usa û welatê me da tu neye. Ev axa me ye. Ez hela ji Sîvasê wî neyarî dizanim û gelek li ber xwe dikevim ku ew hetanî nuha sax e" **(126, r. 245)**. Ew agahdariya Wehbî Beg a şerletanî li temamîya Dersîmiyan belav bû û di nava Kurdan da bi hêrsketin hat qebûl kirin. Loma jî dîwana Tirkiyê turuş ne dikir ku ji heq-hesabê wî welatparêzê kurd ê ku li vira di bin bandûra polîs da dijît bê der. Lê wî ne dida zanîn ku wan di hindava serekeşîrên Kurdan ên bi nav û deng da siyaseta xwe ya durûtiyê terk dane.

Di sala 1932 da, Selaheddîn (kurê Şêx Seîd) ji Iraqê vegeriya Tirkiyê. Soz dabûne wî ku wî efû bikin, bibexşînin. Lê mehkema wî li Erzurumê kir. Di sala 1933 da, dîwana Tirkiyê li rex Diyarbekirê dijî Şêx Fexrî opêrasyonek teşkîl kir. Di sala 1934 da, mehkema Tirkiyê ji bo çend serokên Kurdan gunehê gullekirinê derxist, lê ji bo yên mayîn biryara girtina heta-hetayê derxist **(100, r. 294-295)**.

Komên Tirkiyê yên serokatîkir, bilî mecalên hov yên bona hincirandina şerkariya Kurdan a millî-azadariyê, siyaseta xwe ku li wan navçên ku tê da berê Ermenî û Kurd diman Tirkan cîwar bike berdewam dikir.

Di 9 hezîran 1934 da, meclîsê zagona (hejmar 2502) di derheqa wê yekê da ku li wilayetên Qers, Bazîd, Erzurûm û Çerûxê mihacir û milteciyan cîwar bikin û perçeyên xweliyê bidin wan qebûl kir. Di nava zagonê da dihat gotin ku ew xwelî û avayî-xaniyên ku di bin destê xelkên Rûsyayê da bûn, yên Qers, Bazîd, Îdir û Tuzlucê (Qulp), pey çûyîna wan ketin bin bandûra dewletê. Erd û milkên qezayê Oltê (wilayeta Erzurûmê), Ertvîn, Şeşat û Borçayê (wilayeta Çorûx) û navça Kemal Paşa jî ketin bin destê dewletê. Ew erd û çêkirin, ku di bin destê dewletê da bûn, wan dikaribû di nava multeciyan û wan mirovên wan wargan da, yên ku bê xwelî bûn an jî xweliya wan hindik bû **(miqal 1, 2) (35, dîwan 15, r. 1122-1123)** par vekin. Bi me va, ne diyar e ku ew zagon çawa hate mîaser kirin, çiqas multecî li wan navçan hatin cîwar kirin û çiqas binecî xwelî stend. Anegorî hinek salixan, ji sala 1923 hetanî sala 1934, 630.000 meriv ku pareke mezin ji wan li wilayetên rohilatê hatin cîwar kirin mihacirî Tirkiyê bûn **(116, r. 321-322)**. Lê tiştek xuya ye. Ew mecal dihatin pêk anîn, ne ewqas bona xemxuriya di hindava gundiyên Tirkiyê yên bê xwelî da, lê bona daxwaziya wan komên Tirkiyê yên serokatîkir ku bi kîsê zorlêkirin û derxistina Ermeniyan û Kurdan li wan deran Tirkan cîwar bikin. Di derheqa wê yekê da, zagona di derheqa mihacririyê da (2510) ku di 13 hezîran 1934 da ji aliyê meclisê hat qebûl kirin jî

şehadet dida. Ew zagon bi formalî tenê ji bo mihacirên tirk bû, lê bi rastî ew dijî gelên biçûk bû, xwezma dijî Kurdan bû. Anegorî wê zagonê, Tirkiye li ser 3 navçan hat belav kirin - par ve kirin. Di nava navça pêşîn da ew qezayên ku tê da bineciyên usa dihatin cîwar kirin ku çanda wan xût bi tirkî ye; ya duduyan tê da dihat dîtin ku bona wan mihacirên ku hewcê wê yekê ne, wekî "çanda tirkî dest bînin û tê da kûr bin"; navça sisiyan jî ew navça ku ji ruyê rewşa aborî, saxî, çandî, siyasî û eskerî, lê usa jî bona parastina qayde-qanûnan, divê ji bineciyan bên vala kirin û li wira divê mihacir jî neyên cîwar kirin" (35, r. 15). Li wê navçê, piraniya bineciyan Kurd bûn û fehmdariya ku gilî xût di derheqa Kurdan da bû, ku gotî wan bi temamî ji cî bişihitînin û raqetînin.

Destûr û maf dabûn Şêwra Wezîran ku bineciyên ji navça sisiyan, yên rêncber û koçer cîguhastî navçeyên mayîn bikin "bona qewlên wan ên jiyînê û saxiyê" bêtir bên pak kirin. Destûra wezîrê karên hundir dikaribû wan kesan ji navçeyên ser sînor, "yên ku di nava casûsiyê da tên gunehkar kirin" raqetîne, usa jî dikare wan "kesên biyanî ku fêrî çanda tirkî bûne" ji welêt derxe (35, dîwan 15, r. 1157, 1158).

Miqala zagonî ya 10mîn ku bi temamî di derheqa Kurdan da bû ewha dibêje :

a) Zagon mafên eşîran wek bajarvan nas nake, eger ew maf bi dadgehê jî dane endamekî eşîrê, hemû wekîldarî-extiyariyên serok, axa, beg an jî şêxê eşîrê tên hildan û li bendî tiştekî nayên hesab kirin, eger ew bi dokumentan hatin isbat kirin, an jî li ser urf-adetan tên hîm kirin.

b) temamiya hebûn û milkê eşîrê, eger ew berî weşandina zagonê li ser bingeha dokumentekê an jî aktên mayîn hesab dibûn arzîtiya eşîrê, an jî ew maf serok, beg, axa an jî şêx daye wî endamê eşîrê, pûç tên hesab kirin û dikevin bin destê dewletê. Anegorî wê zagonê û prensîpên dewletê, ew hebûn di nava multeciyan da tê par ve kirin.

v) Wezîrê karên hundirî li ser esasê biryara hukûmetê serok, beg, axa û şêx extiyarî distendin, usa jî neferên mala wan ji cî raqetandin û li navçeyên anegor cîwar bikin, eger mayîna wan kesan li wan navçeyên ser sînor qeziyê pêş da bîne **(35, dîwan 15, r. 1158-1159)**.

Hukûmeta Tirkiyê, ku dicedand ku serdestiyên serekeşîrên Kurdan bide hilanîn, ne dixwest ku dereca xebatkarên Kurdan a aborî û çandî bê bilind kirin, wan ji destdirêjiyên derebeg û milkdaran xelas bike, an jî pirsa milkê erd safî bike bona kara gel. Ew dicedand ku bineciyên kurd bizêrîne û di nava xwe da bihelîne.

Di nava miqala zagonê ya 11mîn da dihat gotin :

a) ji bo wan mirovên ku zimanê tirkî ne zimanê dê bû, qedexe bû ku gundên nuh çêkin, an jî li meheleke cihê bijîn, rêxistinên gundiyan û karkeran çêkin ...

b) jimara wan mihacirên kurd, ku îzn dane wan ku li bajarên biçûk bijîn, divê 10% bêtir ji bineciyên bingehî derbas nebe. Destûra merivên ji cî-warên xwe raqetandî tu nebû ku mehelên nuh jî çêkin **(35, dîwan 15, r. 1159)**.

Hukûmetê bona armanca zêdekirina bineciyên tirk li navçeyên Kurdan qedexe dikir ku ew multeciyên ku ji Yûnanistanê hatine di nava deh salan da ji wan cî û deran derkevin. "Multecî, ... koçer, - di nava miqal 29 da dihate nîşan dan -, usa jî ew kesên ku hukûmetê li navça pêşîn cîwar kirine, divê ji 10 salan ne kêmtir li navçeyên xwe bijîn. Ew nikarin herin navçeke mayîn bijîn hetanî wê çaxa ku destûra wezareta karên hundirî bistînin ..." **(35, dîwan 15, r. 1165)**.

Lê Kurdan nikaribû dû 10 salan ra jî ji navçeyên ku bona wan cihê kirine derkevin, hetanî ku destûra hukûmetê tu nebe. Gelên biçûk ên mayîn jî di wê rojê da bûn.

Bona di nava jiyanê da wê zagonê pêk bîne, hukûmetê komîsyoneke ku wezîrên karên derve, parastina millî, aborî, usa jî çend wezîrên mayîn diketin nav wê çê kir. Komîsyona hukûmetê di destê xwe da

dest bi qedandina biryara meclisê kir û berî her tiştî Kurd bi kitle raqetandin.

Tevî wê yekê, komên Tirkiyê yên serokatîkir bi weşandina zagona di derheqa cîşihitandin- raqetandinê da dicedand ku tûjbûna pirsa hebûna erd bidin sist kirin - mulayim kirin, ew jî bi kîsê Kurdan.

Anegorî salixên Tirkiyê yên resmî, di hezîrana 1938 da, 89.000 mal weke 300.000 hêktar xwelî, ku ji destê fêodalên raqetandî hildabûn, stendin (57, r. 402). Ji sed hezaran gundiyên Tirkiyê yên bê xwelî û kêmxwelî, tenê 48.411 meriv gelek hindik xwelî - bi hesabê navîn her malek 3 hêktar - stendin (101, r. 126). Tiştek xuya ye. Mecalên vî awayî nikaribûn problêma xweliyê li welêt safî bikin. Wan ew yek jî ne dixwest.

Hukûmeta Tirkiyê, ku dicedand pirsa Kurdan "safî bike", wek berê dixwest piştgiriya cîranên xwe yên rohilatê bistîne.

Di havîna sala 1934 da, Şahê Îranê hat Tirkiyê. Her du hukûmet ya xwe kir yek û biryar kir ku tixûbên xwe dadin, bona ku nehêlin Kurdên ku li ser erdê Tirkiye û Îranê dijîn birevin Îraq û Sûriyê.

Dîwana Tirkiyê, ku zagona di derheqa sirgûnkirinê da diqedand (N° 2510), ferman dan bineciyên çend navçeyên Kurdan, xwezma yên Botanê, ku hazir bin bona sirgûniyê. Lê piraniya Kurdan, ku ne dixwest ji cî-wargên xwe derkevin, reviyan çiya. Li ser vê yekê dest bi zordariyan bû. Di tebaxa 1934 da, balafiran ew navça ku Kurdan xwe tê da veşartibû da ber bomban. Bi gotina nûçevanên welatên derve, wê demê dîwana Tirkiyê li Xarpûtê gelek Kurd dar da kirin.

Rojnama "El-Kebas", ku li Demîşqê ronayî didît, di 19 tebax 1934 da nivîsî : "Li Kurdistanê ne ku serhildan e, wek hinek rojname nîşan didin, lê berxwedayîna Kurdan di hindava dîwana Tirkiyê da ku dixwaze wan ji axa wan ber bi roavayê raqetîne ye" (170, r. 24). Ji ruyê hişkbûna pirsa Kurdan, serekwezîr Ismet Paşa Inönü careke din jî çû wilayetên welêt ên bakur-rohilatê. Di nava du

hefteyan da, ew li Diyarbekir, Mêrdîn, Siirt, Bitlîs, Wan, MÛş, Bilanix Û Melezgirê qesidî (36, r. 63-64) Û li wan deran di derheqa siyaseta hukûmetê ya di hindava pirsa Kurdan da çend serokên cî pê da hesandin. Ewê ku li ber mihaciran li Diyarbekirê peyivî Û dicedand ku bi awakî li ber dilê wan bê, ewha pirs kir : "Şikir ji Xwedê ra, hûn êdî hînî zimanê tirkî bûne ?". Li ser vê yekê, xortekî tûre got : "Na lo, ez benî, ew êdî hîn bûne bi kurdî bipeyivin". Wê demê Ismet Inönü got : "Lawê min, ew jî baş e ku meriv çend zimanan bizanibe" (145, r. 141). Ev hemû şehadet dide ku programa hukûmetê ya helandinê Û daxwaziya wê ku struktura teşkîla millî li Kurdistana Tirkiyê biguhêze, ne gihîştine tu mefayî.

Di 18 november 1935 da, Meclisê zagon N° 2848 di derheqa guhartinên çend miqalên zagona di derheqa sirgûnkirinê, ya ku navçeyên sirgûnkirina Kurdan dida biryar kirin, da qebûl kir (35, dîwan 17, r. 28-30). Tevî wê yekê, hukûmeta Tirkiyê dest pê kir mecalên cezakirinê li wilayetên rohilatê bide xurt kirin. Mufettişê sereke, general Abdullah Alpdoğan, ku dewsa Ibrahîm Talî Beg girtibû, êdî xwediyê mefayên pir bû.

Girêdayî wê yekê, di cî de ye ku em perçeke miqala "Tirkiye Û pirsa Kurdan" ku di rojnama fransî "Temps", N° 18, ya sala 1937 da çap bûye bînin :

"Helandina eşîrên Kurdan hela tam pêk ne hatiye, ji ber ku ew problêm bi wê yekê va sext e ku gilî di derheqa gelek kesan da ye ... Weke du salan pêş da, hukûmeta Tirkiyê li welêt rejîma xusûsî, ku pê ra temamiya hukumdariyê kete destê Abdullah Alpdoğan ku pirsdanîna wî ya sereke ew bû ku bi hemû ferzendan va wê navçê bide seqirandin - mulayim kirin, da damezrandin. Ji wê demê da, di weşanê da tu agahdarî ne hat weşandin. Şik tune ku mecalên qebûlkirî ne yên elaxêriyê bûn Û bineciyan ew bi dilekî xemgîn qebûl kirin".

"Çawa jî hebûya - xwediyê miqalê di dawiyê da nîşan dide -, rast e, ew ferzendên mulaymkirinê, ku di salên 1934-1935 da ji aliyê general Alpdoğan

dihatin mîaser kirin, di hêlekê da kar dida gel, di hêlekê da jî dijderketî dar da dikirin, bona çavê xelkê Elazîzê yê nesitirî bide tirsandin, û ew yek hinek mefa dan, lê ew ne kardar bûn û di nava demeke kurt da temirîn" (260, 1.8.1937).

Siyaseta hukûmetê ya rêaksyonêr hişkbûna li Kurdistanê da gumreh kirin. Hela bi ser da, hemû karên dîwana Tirkiyê şehadeta wê yekê dida ku ew dicedînin serhildana Kurdan a nuh pêş da bînin, bona bikaribin heta-hetayê pirsa Kurdan li welêt bidin hildan.

## 2. Serhildana li Dersîmê "Tuncelî" (1936-1938)

Di nîveka salên 30 da, hukûmeta Tirkiyê biryar kir dest bi wê yekê bike ku eşîrên Dersîmê yên nîvserbest bi temamî bikevin bin qolê wê. Berî wê yekê, bineciyên Dersîmê tuê bêjî di otonomiya ne resmî da dijîtin. Meclisa her eşîrekê, ku diket nava meclisa Dersîmê ya sereke, hebû. Biryarên eva dawîn bona hemû serekeşîran, usa jî komên Kurdan ên çekdar, eseyî, borclî bûn. Serekê Dersîmê yê herî bi nav û deng Seyid Riza bû (119 a, r. 49). Dîwana Tirkiyê bona hildana "otonomiya" Dersîmê dest pê kir bi dizî bingeha "idêolojîk" saz bike. "Zanyarên" Tirkiyê bi rojnamevanan ra tevayî "isbat" dikir ku Kurdên Dersîmê yên zaza ku, rast e, bi pêşketina çanda xwe ji Tirkên mayîn paş va mane, lê "gelek dixwazin careke din bi welatê xwe ra bibin yek", "Tirk in, ku ji zû da ji aranan derbasî çiya bûne". Girêdayî vê yekê, perçeke gotara "Kurd", ku di ansîklopêdiya Tirkiyê da hatiye nivîsîn, gelek hewaskar e : "Piraniya Kurdên Tirkiyê bi tirkî dipeyivin û wek Tirkan dijîn. Em, Tirk, hesab nakin ku ew ji milletekî mayîn in" (37, r. 2966). Dîtina resmî di derheqa milletiya Kurdan da ewha bû.

Li Dersîmê, li dibistanên destpêkê mamostatî bi zimanê tirkî bû, ji bo ku wan dixwest ku bi zimanî Kurdên zaza ku "zimanê pêşiyên xwe ji bîr kiriye" bi çanda tirkî ra çavnas bikin. Gotina "Kurd" ji peyvê kesan hatibû hildan. Lixwekirina cillên kurdî, stirana bi zimanê kurdî berk hatibûn qedexe kirin.

Tevî wê yekê, hukûmeta Tirkiyê dicedand ku li Dersîmê ji bineciyan bacan hilde. Berê bineciyên wê navçeyê, bawer bike, hîç bac ne dida. Û, fehmdarî ye ku ew yek ne tenê ne bi dilê bineciyên Dersîmê bû, lê usa jî bû sebebekî nerazîbûna Kurdan a giring û sereke.

Bi destê zorê hildana wan mezîlên xweliyê, ku yên eşîran bûn, û berê-pêş da gundiyan ew didane bêcer kirin, ekin-tîkinê xwe dikirin, û parvekirina wan xweliyan di nava Tirkên mihacir da nezazîbûn û hêrsa Kurdan rakirin.

Daxwaziya Tirkan ku ji gundiyan bac hildin û xweliyê ji destê wan hildin ji aliyê Kurdan rastî dijderketina bêhempa bû, loma jî serokatiya Tirkiyê mecbûr bû ku demekê ji pêkanîna planên xwe bipê. Lê wê dest bi pelixandin-zordestiyan kirin. Hukûmeta Tirkiyê li kuçeyên Elazîzê çend Kurdên ku dijî biryarên dîwanê derketibûn dar da kirin. Ew yek bû sebeb ku Kurd eşkere û bi xurtî êrîşî hukûmetê bikin. Zûtirekê temamiya Dersîmê di nava agir-alavan, tevrabûnê da bûn.

Bi pêşniyara Atatürk, pirsa di derheqa Dersîmê da kete nava pirsgirêkên Meclisê ku civîna wê dizî û derîdadayî bû. Di peyvê xwe yê 1 cotmeh 1936 da, dema vekirina meclisê, Atatürk ku di derheqa Dersîmê da dipeyivî got : "Problêma herî giring di nava karên me yên hundirî da ew pirsa Dersîmê ye. Pêwîst e ku em bi her awayî wê tevrabûna ku bûye kula piçengê ji binhegê va raqetînin ... û me destûra herî mezin daye hukûmetê bona ku mecalên herî mezin di pirsa jorgotî da bi lez qebûl bike" **(119 a, r. 50)**. Agahdariyên cihê-cihê, ku di weşana Tirkiyê da di derheqa wê yekê da dihatin weşandin, şehadet dida ku di civînên meclisê da pirsa "mulayimkirina" Kurdan hatiye enene kirin. Li dawiyê, weşan nîşan dida ku enenekirina pirsa di derheqa Dersîmê da li meclisê kuta bûye û "mehkemeyên ku biryarên gullekirinê derxistine bi cezakirinên mayîn va hatine guherandin".

Bi pêşniyara Atatürk navçeyên merkezî bûne wilayetek û navê wê danî Tuncelî **(35, dîwan 17, r. 165–182)**.



Institut kurde de Paris

Di 6 hezîran 1936 da, navçeya teftîşa sereke ya 4mîn, ku wilayetên Elaziğ (Elazîz), Tuncelî û Bingolê (33), ango temamiya axa Dersîma berê, diketin nav wê, hat saz kirin (36, r. 66). Di wê navçeyê da, serokatiya xusûsî bi serokatiya mufettişê sereke, general Alpdoğan, hat saz kirin. Li rex serwêrtiya mufettişê sereke ku li Elazîzê bû, parên xusûsî hatin saz kirin : ya şêwrdarên eskerî, koma casûsiyê, koma xusûsî ya zabitên barêgeha sereke, mehkema eskerî (sedr û du endamên wê), sekretarî, parên maliye û avukatiyê.

General Abdullah Alpdoğan ferman da ku li wilayetên Tuncelî, Elazîz û Bingolê halê eskeriyê îlan bikin û de'w kir ku Kurd 20.000 tifing û demançe teslîm bikin; eger na, ewê cezayên mezin bixwin (126, r. 270). Niştimanperwerên kurd kar dikir ku li pêşeniya dijî Tirkiyê yekîtiyê çêkin, lê nikaribûn ew dubendî-dutîretiya di navbera eşîran da bidin hildan, wan bikin hêzek. Rast e, Seyid Riza li hev hat ku eşîrên Abbasan, Ferhedan, Kerbelan, Bextiyaran, Yûsufan, Demnan, Heydan û pareke Kalanan bike yek û di navbera wan da yekîtî çêke. Lê Kurdên navçeyên Ovacix, Koçan, Tekman, Melezgir, Pulumêr û Nazimiyê biryar kir ku xwe di hêlekê da bigirin û xwe "bêteref" îlan kir. Hela bi ser da, çend eşîrên Xozatê biryar kir ku derbasî aliyê hukûmetê bibin. Serokên wan hatin Elazîzê û ji Alpdoğan ra got ku ew hazir in hemû fermanên wî pêk bînin.

Serokê Kurdên Dersîmê Seyid Riza name ji general Alpdoğan ra şand û tê da de'w dikir ku hukûmet zagonên nuh ên di hindava Dersîmê da pûç bike û dev ji dûgera Dersîmiyan berde (126, r. 268, 270). Wek bersîva wê yekê, general Alpdoğan alaya peya û bêlûka cendirman dijî Dersîmiyan şandin. 10 balafirên eskerî piştgiriya eskerên ku her roj li ser Dersîmiyan difiriyan dikir. Lê dîsa jî şerrê giran ne bû. Opêrasyona eskerên Tirkiyê bona "mulaymkirina" Dersîmê gelek dirêj kişand. Zivistana 1936 hat û qumandariya Tirkiyê mecbûr bû ku wan karan bide sekinandin, ji ber ku herdem baran dihat û bi carekê hewa sar dibû, lê paşê jî berf diheliya û dijwarî pêş da dihatin.

Ji 7 çiriya pêşîn 1936 hetanî 27 çiriya paşîn 1937, li Ankarê kongreya mufettişên sereke bi serokatiya Şukrî Kaya hat derbas kirin **(34)**. Tevî pirsên mayîn, mecalên ku diviyan bi dawî "problêma Dersîmê" bidana safî kirin hatin enene kirin.

Di nava van şertan da, di sala 1937 da, Seyid Riza lawê xwe Bira Ibrahîm şande bal general Alpdoğan bona ku pê ra hevpeyvînan di derheqa sekinandina karên eskerî da derbas bike **(126, r. 272)**.

Lê bi daxwaziya qumandariya Tirkiyê, Bira Ibrahîm bi awakî hat xapandin, wan bi destê zabitê tirk, Şevket, ew anî gundê Deştê û bi hovîtî kuşt. Wê demê, Seyid Riza ber bi riya serekeşîran bû ku hêzên xwe bikin yek û bi tevayî dijî eskerên tirk derkevin. Serekeşîrên Hesenan, Yûsufan û hinekên mayîn piştgiriya banga Seyid Riza kir. Di hezîrana 1937 da, wargeha Kurnîkê (30 kîlometre dûrî Mezgirê, li hêla roavayê) civîna serekeşîrên Kurdan, a ku biryar qebûl kir ku dest bi serhildanê bike, hat derbas kirin **(153, r. 43)**. Ew axa ku gel li ser rabûbû çiqas diçû ewqas fireh dibû. Hêzên Kurdan ên çekdar ku tê da hetanî 30.000 esker hebûn, êrîşî pareskerên Tirkan dikir, pir diteqandin, rê xetên telefonê xerab dikirin. Qumandariya Tirkiyê korpusa eskerî dijî Kurdan şand. Serekwezîr Ismet Inönü û wezîrê karên hundirî Şukrî Kaya, ku di cî da bi rewşê ra bûne nas û mecalên hişktir bona xurtkirina karên cezakirinê qebûl kirin, hatin navça şerr. Di havîna sala 1937 da, şerr li Dersîmê gelek giran bû, ji her du aliyan jî gelek şehîd diketin. Di nava van şertan da Seyid Riza careke din jî ber bi riya general Alpdoğan bû ku "terka xwînrêtinê bikin, mafên Kurdan ên millî nas bikin, kuştiyê kurê wî teslîmî wî bikin", lê bi xwe soz da hemû Tirkên dîlgirtî berde û şerr bide sekinandin **(126, r. 273)**. General Alpdoğan wek bersîv got ku ew divên bi temamî teslîm bibin û hemû çekên xwe, yên ku di bin destê bineciyên Kurdan da hene, teslîm bikin.

Tevî wê yekê, qumandariya Tirkiyê biryar kir ku dem hunda neke û çend serekeşîran bikire, bîne

Institut kurde de Paris

hêla xwe. Ew bi general Alpdoğan ra li hev hat ku xwarziyê Seyid Riza, Rexber, ku bi pêşdanîna Tirkiyê dest pê kir di nava Dersîmê da karekî pîs, karê pîrepîrekirinê bike, bikire, bîne aliyê xwe. Ji bo nimûne, bi Rexber ra li hev hat ku baweriya serekeşîrê Bextiyaran bi dest bîne û wî bîne hêla xwe. Serokên hinek eşîrên Kurdan ên mayîn, ên ku wek serekeşîrê Bextiyaran haya wan ji neyarî û pîsîtiya Rexber tu nebû, qayil bûn ku tevî wî "şerkariyê" dijî eskerên tirk bikin.

Tenê Seyid Riza baweriya xwe bi xwarziyê xwe ne dianî. Seyid Riza ku ditirsiya ku bineciyên Dersîmê ewê ji kokê va bên qir kirin, biryar kir ku desteya bi serokatiya alîgirekî xwe - Elîşêr - bi riya sînorê Iraqê derbas bike û hêvî bike ku li wir sitarê bidin Kurdên Tirkiyê. Rexber, ku di derheqa planên Seyid Riza da zanîbû, çû hêwirgeha Elîşêr (wargê Eglatê), giva ku hatiye "xatirê xwe jê bixwaze". Êvarê Elîşêr û pîreka wî bi destê neyartiya Rexber bi hovîtî hatin kuştin. Casûsiya Tirkiyê ew kuşt **(35)**. Rexber serê Elîşêr ê jêkirî hilda û çû Elaziğê, bal Alpdoğan.

Qumandariya Tirkiyê bona Kurdan mecbûr bike ji şkeftên çiya derkevin, ferman da ku daristanên dora Dersîmê bişewitînin. Pêşmerge mecbûr bûn ji çiyayên Dersîmê derkevin û berê xwe bidin rohilatê, ber bi sînorên Iraqê. Casûsiya Tirkiyê ku ciyê desteya Seyid Riza, ku di navça Uzun-Mêşê da bû, diyar kir, esker şandin wira, herweha top û balafir jî. Atatürk bixwe firindeyên ku firîn bona Dersîmiyan bihincirînin rê kirin **(216, 20.9.1927)**. Di dawiya havîna 1937 da, li navça Kozlucê, di navbera eskerên Tirkan û Kurdan da pevçûyînek bû. Di wî şerrî da, Seyid Riza hate birîndar kirin. Desteya Kurdan ziyan û zerereke mezin ket.

Kurd bi mêrxasî li ber xwe dida, loma jî serhildan bere-bere sist dibû, lê dîwanê bi hovîtî ji heq-hesabên Dersîmiyan dihat der.

Serhing Êlfînston di nava miqala xwe "Pirsa Kurdan" da nivîsî : Tirkan, ku gelek hêzên xwe civandibûn

Institut kurde de Paris

ser hev, di gulana 1937 da dest bi karên dijî serhilan kirin ... Wezîrê karê hundirî, Celal Beg, hukûmet agahdar kir ku pirsa Kurdan li vira êdî tu neye. Aqilmendan, - wî got -, bela qaçaxan da ... Bi hesabê îro tebiya resmî bi vî awayî ye, û Kurdan li Tirkiyê bi resmî Tirkên çiyayî bi nav dikin" **(250, 1946, N° 1, r. 96–97)**.

Em çend isbatan bînin ku şehadeta van gotinên jorê didin :

"Çekên herî nûjen hatin bi kar anîn û wargehên stratêjîk ên sereke hatibûn zevt kirin. Balafir jî roleke giring lîst, û nuha êdî diyar e ku dîploma bi hurmet dane firindevana tirk Sabiha Gökçen **(36)** ... bona mêrxasiya ku wê li Dersîmê kiriye û ku tê da tevî firînên xwe yên casûsiyê ciyên serhilan diyar dikirin û ji gullereşan ra gulle berî wan didan. Di gulana 1937 da, esker êdî bi temamî bi ser ketibûn ... Nuha emê dîsa dest bi pêkanîna programa xwe (ya helandin-asîmîlekirinê - M.H.), ku me hela di sala 1935 da amade kiriye, bikin", xwediyê gotarê rojnama "Temps", hejmar 18, ku di tebaxa 1937 nivîsîbû.

Di hezîrana 1937 da, qumandariya Tirkiyê, ku armanca wê navçê bi temamî bîne rayê, 20.000 esker dijî Dersîmê derxistin **(108, r. 324)**.

"Dersîm, navbenda şerkariyê, - rojnama tirkî "Tan" di hezîrana 1937 da nîşan dida -, ewê bi temamî bê hilweşandin, lê bineciyên wê ewê cîguhastî navçeyên mayîn bibin ... Bi vî awayî, bineciyên Dersîmê - Tirkên paqij -, ku ji destê Têmurleng revîne, hatine Dersîmê û bere-bere dibin Tirkên eslî, ji sedî sed Tirk in ...".

Nuha em wan mecalan bînin meydanê ku çawa wan dixwest bineciyên Dersîmê ku "Tirkên eslî" hesab dikirin di nava gelê tirk da bihelînin.

"Li Dersîmê li ciyê dardakirina pêşmergan gelek mirov xeniqandibûn". Xwediyê miqala rojnama "Temps" ku van malûmatan îlan dike, dû ra dinivîse : "Pirsa Kurdan berî her tiştî pirsa bi xeysetê polîsî ye" **(260, 18.8.1937)**.

Weşana Tirkiyê ya resmî û ya welatên derve yên rêaksyonêr û burjuwa dicedand ku sebebên serhildana Kurdan bidin fe'ş kirin, dixwest ku qewimandinên Dersîmê usa bînin ber çavan ku xwedê giravî ew şerkariya di navbera burjuwaziya Tirkiyê (ku giva rêformên pêşverû dane derbas kirin û pêk anîn) û fêodalên rêaksyonêr da.

Ewha, rojnamevanekî bi navê Resîm Dawez, dema gumrehbûna serhildanê di hezîrana 1937 da, di miqala xwe ya bi sernivîsara "Serhildana Kurdan a nuh li Tirkiyê" da çi nivîsiye :

"Hukûmeta Ankarê ji du mehan zêdetir xerc kirin ji bo hincirandina serhildana Kurdan a rêaksyonêr a nuh li navça Dersîmê. Nenihêrî rêformên ku ji aliyê partiya Kemal da dihatin pêkanîn, derebeg li hev hatine ku hetanî nuha tebiyên xwe li wî qulçê cihanê biparêzin ... Partiya gel ku di bin hukmê burjuwaziya millî da dixwest bazara hundirî bide fireh kirin, biryar kiribû ku sala par bi destê hemû mecalan koka gunehkarên ku di bin qolê dewleta komarî da bûn bîne. Wan bi zagona xusûsî di wê qeziyê da serokatiya eskerî ku di bin wê da gelek maf hebûn, heta testîqkirina mehkemê ya gullekirinê ya ku herdem di bin extiyariya meclisa Tirkiyê ya millî da bû, damezrand".

Ji agahdariyên weşanê û gotinên serekwezîr Ismet Inönü li meclisê, meriv dikare bê ser wê baweriyê ku di destpêkê da, ango di meha nîsanê da, weke 25-80 mirov (ji 100.000 binecî) dijî biryarên hukûmetê derketine ...

Vê demê jî şerrekî zor diçe û çend êrdekên (êskadrîlya) balafiran jî tevî wan qal û cengan dibin **(162, r. 26-28)**. Rojnama "Times" a 16 hezîran girêdayî serhildana Kurdan li Dersîmê miqala nûçegihanê xwe ya li Stembolê, ya bi sernivîsara "Kurd dijî xwendin û nivîsarê ne. Eskeran pêşmerge hincirandin", çap kir. Di wê miqalê da dihat gotin ku giva serhildan bona wê yekê li Dersîmê dest pê bû, ji ber ku dijminatî di hindava "zagona di derheqa xwendina icbarî û rêformên mayîn da" hebû **(261, 16.7.1937)**. Bi vî awayî, şirovekirina sebebên serhildanê

hela wê demê jî ji aliyê wan mirovên ku hay ji daxwaziyên Kurdan hebûn, bi problêma Kurdan ra nas bûn, berk dihat gunehkar kirin. Girêdayî vê yekê, ew nama ku kurdzanê bi nav û deng V. Nîkîtîn ji berpirsiyarê rojnama "Times" ra şandibû gelek hewaskar e. Di wê namê da usa jî dihat gotin : "... Ez wek mirovekî usa, ku Kurdan nas dikim, ziman û dîroka wan dizanim, ez dixwazim ji we ra bêjim ku ez ji wê agahdariyê gelek li ber xwe ketim. Kurd, ku di wê navçê da dimînin, tu tiştekî usa tomerî bi cîranên wan ra tu neye. Ziman, dîn-ol, rêxistinên wan gelek ji hev cihê ne. Ew qewimandinên ku li Dersîmê dibin, ew cêribandineke Kurdan a nuh e ku wek milletê biçûk otonomiyê bi dest bixin. Wê şaşbûna ku Kurd dijî xwendinê ne bifikirin, loma jî şerr dikin bona ku nehêlin , nebin Tirk. Zimanê dê mecala tek-tenê ye bona pêşketina her mirovekî, bona hezkirina welatê xwe yê ku li ber wî borcdar û deyndar e ... eger li her deran bi van şertan va neyên serkarî kirin, mixabin, emê li her derî bibin şahidên konflîkt-pevçûyînên di navbera dewletan û de'wkariyên gelên biçûk da û mafên gelên biçûk divên hildin ser hesêb û pişt guhê xwe va navêjin" **(100, r. 405-406)**.

Girêdayî wê yekê, di 18 tebax 1937 da di rojnama "Temps" da miqalek bi sernivîsara "Tirkiye li ber pirsa Kurdan", ya ku bi bênamûsî hovîtiya Tirkan di hindava pêşmergên Kurdan da şirove dikir, derket. V. Nîkîn, di 1 îlon 1937 da, name li ser navê berpirsiyarê wê rojnamê şand û tê da pêkenîtiya wê miqalê rexne kir, Kurd parastin, ji ber ku ew ji bo mafên xwe şer dikin. Em li jêr wê namê bi hinek kurtkirinan va raberî we dikin :

" ... Ez Kurdan nas dikim, bi ziman û dîroka wan ra nas im û li ser wê baweriyê me ku divê di van rojên me da heyetiya wan wek milletekî biçûk inkar nekin û ew fehmdarî divê bi fikra fireh bê qebûl kirin. Divê bizanibin ku litêratura Kurdan a dewlemend heye û rewşa Kurdan a siyasî ya xerab nahêle ku ew çand pêş va here. Zimanê kurdî qet jî zaravek nîn e û ji zimanê îranî pêş da ne hatiye

û bi "lehceyên ermenî, xaldî, tirkî û aralî ne hatiye dewlemend kirin". lê zimanekî wek zimanên Îraniyan û Afganiyan û yên mayîn e; û zimanê kurdî hela ne bûye zimanekî litêraturî yê helkirî ... Lê ew nîşan nade ku afirandinên wî yên edebî yên giranbuha, xwezma yên helbestan, tu nene, û ew afirandin (berhem) divê bên weşandin û lênihêrandin, ji ber ku ew gelek aqilmend hatine nivîsarê û mirov dema wan dixwîne lezeteke baş jê dibîne ... Kurd ji sedî sed dikarin wek milletên biçûk bên hesibandin, nenihêrî wê yekê ku hela di nava eşîran da dubendî heye, û Kurd bê dewlet in û di nava welatên cihê-cihê da hatine perçe kirin. Tukes nikare vê yekê inkar bike, ji ber ku dikarin pirseke weha bidin : "Izna me heye ku em di derheqa nasyonalîzma Kurdan da bipeyivin ?" ... Ne axir li vira gilî ne di derheqa komeke fêodalan da ye, lê di derheqa fehmdariya millî da ye. Hîç kes nikare bêje ku Skotlandî ne millet in. Ew jî, wê demê, di nava sazûmana dîroka wan a civakî da jî eşîrtî hebû. Kurd jî di wê rojê da ne. Hêja ye ku pirsa Kurdan bi hûrgilî bê lênihêrandin û divê pêşiya siyaseta qirkirina wan, mihacirkirin û cîşihitandina wan bigrin, ji ber ku Kurd nikarin xwe biparêzin û guhdariya cihanê bidin ser bextê xwe. Di destê wan da tenê çek û mêrxasî hene. Tiştekî gelek ê liberxweketinê ye ku em hevokeke usa, ku li ber qelema rojnamevan derketiye, bixwînin : "Pirsa Kurdan berî hertiştî pirsa polîsî ye". Eger em bi wê bîr û baweriyê qayil bibin, wê demê her pêşveçûneke ku bi zagonên navneteweyî hatiye bi dest anîn ewê bi derbekê va bê pûç kirin û ewê tu mafekî pêpeskirî nikaribe li ber cihana pêşketî biparêze. Na, pirsa Kurdan ew pirsa polîsî ya sade nîn e. Li vira gilî di derheqa naskirina mafên gelê biçûk ê etnîkî, zimanî û civakî, ku dikare bibe bingeh bona pêşketina normal, da ye ..." **(100, r. 406-407)**.

Lê ew nama ku li ser navê serokê "Temps" hatibû şandin ne hate weşandin, ji ber ku ew ne bi dilê xwediyê rojnamê bû û ne jî bi dilê komên empêryalîst ku piştgiriya wan rojnaman dikir bû.

Ew welatparêzên kurd ku mihacirî welatên derve bûbûn, di derheqa siyaseta dîwana Tirkiyê ya gelkujiyê di hindava gelê kurd da ji dewletên mezin, Koma Milletan ra nivîsî.

Ewha, di nava Gaziya (Bang) pêşmergeyên Kurdên ku derketibûn welatên derve, ya 20 november 1937, ku ji nûnerên dewletên mezin ên ku li Rohilata Nêzîk rûdinên ra nivîsîbû, û ew bang herweha ji sekreterê sereke yê Koma Milletan ra şandibû, bi hûrgilî di derheqa hemû zordarî û êşkencên ku dîwana Tirkiyê li Kurdistanê dida derbas kirin da dihat gotin (126, r. 296-299).

"Em mecbûr in - di nava wê bangê da dihate gotin - ku careke din jî ber bi riya rêxistina we ku li cihanê organa dadgehê ya herî bilind e, di derheqa siyaseta zêrandin û qirkirinê ku hukûmeta Tirkiyê di nava 15 salan da li Kurdistanê pêk tîne da, bibin". Di nava bangê da xuya dibû ku Kurd bi milletiya xwe, bi ziman û dîroka xwe û bi çanda xwe ji Tirkan gelek cihê ne. Kurd gelek sensalan pêş da hatine ser wê axê û çanda wan gelek pêşketî ye. Hukûmeta Tirkiyê bi behana pêşxistina wan navçan li ber cihanê siyaseta durûtiyê dide derbas kirin. Di wê bangê da di derheqa bext-qederê bineciyên Dersîmê yên 500.000 da tê gotin. Bineciyên kurd, di nava wê dokumentê da tê gotin, bi hovîtî tê zêrandin. Gundên Kurdan tên bombe kirin. Hemû dibistanên gundên Kurdan hatine dadan, qedexe kirine ku bi zimanê kurdî bipeyivin û binivîsin, pirtûkan çap bikin, rojnaman û kovaran derxînin. Dîwana Tirkiyê bend daniye ber xort û keçên kurd ku bi zehmetî di idarên xwendinê yên navîn û bilind da bên qebûl kirin. Hukûmeta Tirkiyê navça Dersîmê kiriye dojeh (cehennem) ...". Di dawiya bangê da, Kurdan ji navê eşîrên Dersîmê hêvî dikir ku komissyonekê bişînin bona lênihêrandina gunehkariyên dîwana Tirkiyê. Lê bang û gaziya Kurdên Tirkiyê li Koma Milletan û dewletên mezin bêy bersîv ma.

Di hezîrana 1937 da, hukûmetên Tirkiye, Îran û Iraqê peymana Seedabadê girê da û tê da wan gotî

Institut kurde de Paris

Antanta Rohilata Nêzîk, ku bû çekê siyaseta Ingilterê li Rohilata Nêzîk, damezrand. Tirkiye, ku di wê Antantayê da rola sereke lîst, bû bedela hukumdariya Ingilterê li Rohilata Nêzîk **(97, r. 184)**.

Peymana Seedabadê didît ku ew dewletên ku wê paymanê qol kirine divên şerkariya tevayî dijî tevgerên veqetandinê, û helbet dijî têkoşîna Kurdan jî, bikin. Di nava miqala 7an a wê peymanê da dihate gotin :

"Her welatek ji wan dewletên ku ew peyman qol kiriye borc hildide ser xwe ku mecalan dijî sazkirin, an jî karkirina cerdên çekdar, komele an jî rêxistinên ku dixwazin rejîma heyî wergerînin û li her derî tevhevbûnan çêkin û dijîhevtiyê di navbera van welatan da pêş da bînin qebûl bike" **(35, dîwan 19, r. 300–302)**.

Komên Tirkiyê yên serokatîkir, ku piştgiriya hukûmeta Îran û Iraqê texmîn kir, dest pê kir wî karê ku wan di hindava Kurdên Dersîmê da pêk dianîn xelas bikin. General Alpdoğan name ji Seyid Riza ra şand û tê da bi navê qumandariya Tirkiyê qayilbûna xwe ku şerr bidin sekinandin diyar dikir. Seyid Riza, ku baweriya xwe bi gotinên Alpdoğan anî, hate Erzincanê bona ku tevî dîwana Tirkiyê hevpeyvînan derbas bike. Gava ku ew hat Erzincanê (5 îlon 1937), di dest xwe da hate girtin û wan ew da mehkemê. Dema mehkemê, Seyid Riza îlan kir ku ew ji bo serbestiya Kurdan şerkarî dikir, û daxwaziya wî her tenê ew bûye ku Kurd aza bin. Dema mehkemê, çend pirsên provokasyonê dan Seyid Riza : Gelo bal wî zabitên rûs hebûn ? Gelo Rûsan çek û cebirxane ji wan ra dişandin ? **(126, r. 284, 288)**. Hema wê demê di weşanê da dihat îlan kirin ku zabitên Ingiltere û Fransayê hatine bal eşîrên Kurdan ên Koçan.

Di 10 november 1937 da, mehkema eskerî li Elazîzê biryara mehkema pêşmergeyên kurd derxist. Ji bo Seyid Riza û 11 terefdarên wî biryara gullekirinê derxist. Di 18 november 1937 da, Seyid Riza, kurê wî yê biçûk Resik Huseyn, serekeşîrê Qurêşiyan

Seyid Husyen Axa, serekeşîrê Yûsifan Qember Axa û yên mayîn li Elazîzê hatin dar da kirin. Berî mirina xwe, Seyid Riza bi zaravê zaza bilind kire gazî : "Ez 75 salî me, ewê nuha min dar dakin û ezê herim bal şehîdên Kurdistanê ! Dersîm ket, lê Kurd û Kurdistan ewê bijîn, gencên Kurdan ewê heyfa me hildin ! Şerm û etb ji zulmkaran ra ...". Lawê Resik Husnî, ku li rex wî sekinî bû, bilind got : "Bavo, bira bijî Kurdistan !" **(126, r. 283, 289, 290)**.

Di 11 november 1937 da, ango rojtira mayîn, pey biryara mehkemê ya di hindava welatparêzên Dersîmê ra, Atatürk bi rêberiya serekwezîr C. Bayar, ku di meha oktobirê da dewsa Ismet Inönü girtibû, dest bi gerra xwe ya li wilayetên welêt ên rohilata başûr kir. Ew çû Meletiye, Ûrfa, Diyarbekir û wilayetên mayîn **(130, r. 86)**. Di 16 novembr 1937 da, Atatürk li Diyarbekirê, ku piraniya bineciyên wê Kurd bûn, peyivî. Lê dîsa jî wî di nava kêlma xwe da got ku giva hemû bineciyên rohilata welêt Tirk in. Wek ku Atatürk, xwedî-xudanên Komara Tirkiyê, nîşan da, "yên ku bona cihana pêşketî dikarin bibin nimûne Tirk in" **(121, r. 301)**. Bi vî awayî, Atatürkê ku di salên 1919-1920 da di derheqa biratiya Kurdan-Tirkan da dipeyivî, nuha propaganda panturkîzmê derbas dike û dixwaze ku heyetiya Kurdan û pirsa Kurdan bide inkar kirin.

Lê pirsa Kurdan bona komên Tirkiyê yên serokatîkir dîsa wek "kula piçengê" mabû. Di hezîrana 1938 da, rojnamevanê Tirkiyê yê bi nav û deng Yûnus Nadî nivîsî ku hukûmeta Tirkiyê îsal ewê dîsa bi pirsa Kurdan va mijûl bibe, xwezma bi problêma Dersîmê va, û li wira ewê karên eskerî bên pêk anîn **(193, 30.4.1938)**. Xuya bû ku Dersîm hela ne hatibû rayê û Kurdan dîsa li ber xwe dida û xwe li navçeyên çiyayî diparast. Di 28 gulan 1938 da, serekwezîrê Tirkiyê Celal Bayar ber bi riya Dersîmiyan bû: "Ey gelê Dersîmê ! Çekan ji destê xwe bavêjin û emê destê xwe dirêjî we bikin. Em gelek dilrehm in, lê kîna me hîn zehf e: bextê we di destê we da ye !" **(258, 7.8.1938)**.

Lê çara Kurdan jî tu nebû. Ceribandina temamîya dîroka şerkariya azadariyê ya dijî Tirkiyê digot ku ewê kevneperestên Tirkiyê bona "safîkirina" problêma Dersîmê di nîvê rê da nemînin.

Tevî wê yekê, agahdariya serekwezîr Celal Bayar usa jî şehadeta di derheqa wê yekê da dida ku hukûmeta Ankarê di nîveka sala 1938 da nikaribû serhildana Kurdan bide temirandin û rewşa Kurdan wek xwe ji mexlûqetiyê vedişart. Kêlma wî li meclisê (30 tîrmeh 1938) ew yek testîq dike. "Ji karên me yên hundirî ên îsalîn, - wî gotiye -, babetek hêjayî guhdariya we ye. Ew pirsa di derheqa Dersîmê da ye. Em dixwazin li wira rêforman bidin derbas kirin. Ew program di nava jiyanê da tê pêk anîn. Sala par li wir şerr bû, di derheqa wê yekê da gişk bi hûrgilî dizanin. Îsal, anegorî programa me, lazim e ku karên eskerî li wir berdewam bikin. Li hemberî sala par, nuha li navça Dersîmê hîn bêtir hêzên me hene. Em ji bo wê yekê li Dersîmê rêforman didin derbas kirin ku heta-hetayê pirsa Dersîmê bidin hel kirin ..." **(193, 31.7.1938)**. Şerkariya Kurdên Dersîmê û hişkbûna danûstendinên Tirkiye-Fransayê di hêla demê da ketin hev. Ew hişkbûn ji ruyê senceqa Iskenderonê bû. Hukûmeta Tirkiyê ku dicedand fikra mexlûqetiya welêt ji qewimandinên li Kurdistanê bide dûr xistin dicedand ku hertiştî bavêje ser destdirêjiyên kolonyalîst ên Fransayê. Tevî wê yekê wê bi behana "talîmên eskerî" paraskerên bi jimara pirr şandin Kurdistanê. Qumandariya Tirkiyê sê korpusên orduyê, ku bi teknîka nûjen va hatibûn razî kirin, şandin dijî Kurdan.

Serekwezîr Celal Bayar û wezîrê karên derve Tofîq Ruştî çûn navça "talîmên eskerî". Em binihêrin girêdayî wê yekê rojnama "Cumhuriyet" çi nivîsiye :

"Serekwezîr û wezîrê karên hundirî duh çûne Elaziğê (Elazîz) ... Serekwezîr berî çûyînê li Dolmabahçayê çû mêvaniya serokê mezin Atatürk. Eskerên ku spartin stendine ewê dema hatina serekwezîr tevî talîmên eskerî yên mezin bibin" **(193, 24.8.1938)**.

Institut Kurde de Paris

Dema "talîmên eskerî" usa jî wezîrê parastina millî Kazim Özalp, serokê barêgeha sereke Fewzî Çakmak, mufettişê orduya siyasî general Kazim Paşa û yên mayîn hazir bûn. Ew "talîm" li navçeyên Elaziğ, Dersîm û Paluyê dihatin derbas kirin.

Di tebaxa sala 1937 da, anegorî peymana Seedabadê, hukûmeta Tirkiyê gotûbêj tevî hukûmetên Îran û Iraqê, bona pirsa di derheqa karkirina dijî Kurdan da derbas kirin, bona nehêlin ku şerkariya Kurdan a millî-azadariyê li navçeyên her sê welatên ser sînor belav bibe.

Dîwana Tirkiyê ku piştgiriya komên Îran û Iraqê yên serokatîkir stend, dest pê kir bi hovîtî ji heq-hesabên Kurdên Dersîmê were der. Eskerên Tirkan, ku bi jimara xwe û teknîka eskerî va bêtir bûn, gunehê xwe ne bi kalmêran, ne bi jinan, ne jî bi zaran dianî. Beyantiyên cezakiran ewqas bi hovîtî û bêxudêtî bûn ku qumandarê korpusa Erzurûmê Tofîq Paşa dev ji kar berda û çû Ankarê **(119 a, r. 57)**.

Di îlon-oktobra sala 1938 da, berxwedaniya Kurdan şikiya. Dema şerrê giran, bi hezaran Kurd hatin qir kirin. Bi hinek salixan, dema qewimandinên Dersîmê cezakiran weke 70.000 Kurd qir kirin **(192, 1972, N° 2, r. 9)**.

Wek I. Ş. Wanlî bi heqî nîşan dide, serhildana Dersîmê berî her tiştî ji ruyê wê yekê pêş da hat ku hukûmeta Ankarê dicedand ku Kurdan bi kitle ji cî bişihitîne, mihacir bike. Bineciyên Dersîmê guh ne da fermana Ankarê di derheqa muhacirkirina Kurdan ber bi navçeyên welêt ên roavayê da **(173, r. 11-12)**.

Di 5 hezîran 1938 da, meclisê projeya di derheqa kêmkirina muhacirbûna Kurdan da eciband û qedexe dikir ku Kurdên muhacirbûyî ji navçeyên roavayê vegerin wargên xwe yên ezîz. Ew zagon qedexe kir ku ew eşîr û kesên "bi eslê xwe va ne tirk, ên ku bi çanda tirkî ra ne girêdayî ne" careke din vegerin navça N° 1 **(35, dîwan 20, r. 1556)**.

Institut kurde de Paris

Anegorî zagon N° 3667, a 24 november 1939, hukûmetê biryar qebûl kir (N° 2/12374) ku Kurdên koçer derbasî jiyana reatiyê bibin û perçeyên xweliyê bifiroşin wan **(45, r. 166-171)**.

Divê bê nîşan dan ku salixên rasteqîn di derheqa Kurdên ku ji wilayetên rohilatê muhacirî wilayetên roavayê bûbûn tu nene. Lê em dikarin hinek tiştan ji qinyatên hesabkirina bineciyan ên salên 1935 û 1940 pê bihesin. Ewha, hesabkirin nîşan didin ku tenê li wilayetên Elazîz, Erzurûm, Mûş û Wanê, ji sala 1935 hetanî 1940, jimara bineciyan bi 280.338 mirov hatiye kêm kirin. Eger em bidin ber hesêb ku di nava wê demê da bineciyên welêt bi 10% zêde bûne, ev nîşan dide ku li navçeyên jorgotî jimara bineciyan ne ku divê nehata kêmkirin, lê hela divê bi 100.000 mirov va bihata zêde kirin.

Bi vî awayî, jimara bineciyên wan wilayetan bona wê yekê kêm bûne, ji bo ku hukûmeta Tirkiyê ji wan wilayetan weke 370.000 kes ber bi navçeyên mayîn raqetandine.

Usteyngul, ku di derheqa siyaseta Kemaliyan di hindava milletên biçûk da, herweha Kurdan da, dipeyive, nîşan dide : "Ew (Kemaliyan - M.H.) milletên biçûk bi destê zorê dikin Tirk. Lazan ji wargên wan cîşihitandî dikin, Kurdan bi kitle qir dikin, usa wek ku berê anîbû serê Ermeniyan. Êdî bi hezaran Kurd hatin qir kirin, bi sedan gund hatin şewitandin û wêran kirin. Hukumdarên Ankarê, bona ku rêça gunehkariyên xwe hunda bikin û veşêrin, ew navçe wek navça "qedexekirî" ku tê da gund xerab kiribûn û bi erd va kiribûn weke hev" îlan kir **(151, r. 21)**.

Di derheqa wê yekê da ku siyaseta Kemaliyan di salên 30 da di pirsa Kurdan da gihande çi, miqala rojnamevanê tirk Osman Metê, ku di nîsan 1948 da di rojnama "Son Posta" da hatiye çap kirin, şehadet dide :

"Ez çûm Tunceliyê, ew Dersîma berê. Ez li wê warga valabûyî geriyam. Ez bi bineciyên Kalanê (berê ew gundê Memikan bû) ra peyivîm, heta

gihîştime Araratê. Wan bi çavan karmendên hukûmetê yên mayîn, bilî berhevkirên bacan û cendirman, ne dîtine ... Li vira ne sen'et, ne ziraet, ne jî bazirganî heye. Min tenê mirovên bextreş, sexîr, feqîr, ku di temamiya jiyana xwe da kar û bizin xwedî dikirin, dîtin. Tuncelî di sedsala 16a da dijî û haya wê ji pêşketina sedsala 20an tune. Navbenda wilayeta Tunceliyê, ku rex çemê Munzurê ye û tê da 50 mal hene, li Kalanê ye. Çima ew gund li cîkî usa bê fesal hatiye çê kirin ? - min pirs kir -. Bersîva min da ku dû ketina qewmandinên Dersîmê ra ji Abdullah Paşa ra gotine ... (Alpdoğan) ku bona ku ji wilayetê ra navbendek bibîne û bingeha wê deyne û, nenihêrî neqayilbûna pêşekzanan ...., wî hema xût ev şkeft bijart ... Li vira binecî nemaze bi bizinxwedîkirinê va mijûl in. Xwezma jin gelek kar dikin. Tu jiyaneke rûhanî tune, ne dibistan hene, ne jî medrese. Pêşketin qet ne hatiye bal me. Li vir ne bijîjk (doktor) hene, ne jî derman û heb. Di navbera gundan da rê tune. Li navçeyê ji 100.000 bêtir mirov dijîn. Bersîva van şertên jiyanê yên nemirovatiyê divê bikeve ser komissyonên hukûmetê, ji ber ku ew ji Dersîmê gelek tişt hildidin, lê tutişt nadin wan. Em divê nehêlin ku ew rewş berdewam bike".

Bi deh salan gelê kurd şerkariya çekdarî di hindava zordarên Tirkiyê da biriye, ji bo naskirina mafê xwe, ji bo wekhevtiya çandî, siyasî û aborî di nava jiyana welêt da. Lê Kurdan bi sebebên cihê-cihê di wan şerran da hergav jî daye der, ji ber ku ew şerkarî ne weke hev bûye. Bi hovîtî hincirandina serhildanên bêjimar aboriya Kurdistana Tirkiyê ji cêrgê derxist û ew kafkûn kir û hêzên Kurdan gelek da sist kirin. Pelixandinên berk û têrora bêhempa bûne sebebên mirina karkirên Kurdan ên bi nav û deng û bineciyên aşîtiyê. Pirsa Kurdan li Tirkiyê ma nesafîkirî.

3. <u>Cend bîr û bawerî li ser şerkariya Kurdan a millî-azadariyê di salên 20-30 da</u>

Em dikarin siyaseta komên Tirkiyê yên serokatîkir

di hindava Kurdan da di salên 20-30 da bi vî awayî raber bikin : inkarkirina mafên Kurdan wek neteweyekî cihê, an jî komika etnîkî ya xwexwetiyê, ku ji Tirkan cihê ye, û pêkanîna siyaseta zêrandina millî.

"Ev siyaset, - wek ku sosyologê tirk ê bi nav û deng Ismail Beşikçi texmîn dike -, gelek caran warguhêzî siyaseta rasîzm û panturkîzmê dibû" (121, r. 213). Dewletê tam anegorî wê siyasetê dîsa xwe dixapand, gava ku îlan kir : "Kurd tu nene, her tenê Tirk hene" (116, r. 313).

Lê siyaseta wan nikaribû wê pirsa giring safî bike, ji ber ku dîsa sebebên objêktîf ên ku dibûn miqeserê (sebebê) şerkariya Kurdan a millî-azadariyê hebûn. Serhildanên li rohilata welêt hatin hincirandin. "Lê rohilat hergav jî dima wek birîna k'ewnegirtî", - Ş. Aydemir dinivîse - (116, r. 313).

Şerkariya pêşmergan a bêy navbirî, ku di salên 20-30 da li wilayetên Tirkiyê yên rohilatê dihat texmîn kirin, şehadet di derheqa faktorên herdem şuxulkir da, yên ku isbat dikir ku Kurd ji bo çi rabûne qal û cengê, dida. Di bingeha şerkariya Kurdan a azadariyê da, ev sebebên sereke bûn :

1. Ji aliyê civakên milletê Tirkiyê yê hukumdar da, zêrandina Kurdên ku ne dixwest ku mafê gelê kurd ê pirmilyon bidin û dicedand bi riyên eskerî-polîsî û mecalên hukumdariyê yên zor Kurdan assîmîle bikin, an jî bi destê cezakirina wan bînin rayê.

Siyaseta raqetandina Kurdan ji cî û warên wan, ji best-beyarên ekindar û zozanên xweş ber bi navçeyên roava û merkezî yên bê neder û xike-xalî, bona ku dewsa wan mihacirên tirk bînin û cîwar bikin, û ev yek li bal komên Tirkiyê yên serokatîkir bûbû pratîka ku nerazîbûna Kurdan a berk pêş da dianî, loma jî ew radibûn serhildanê.

Anegorî zagon N° 2510, ku 500 axa û şêx ji navçeyên rohilatê derxin û berê wan bidin navçeyên roavayê, ne tenê pirsa Kurdan ne da safî kirin, lê rewşa wan hişktir û dijwartir kir. Bi formalî xweliya wan diviya derbasî gundiyan biba. Lê parvekirina wan

xweliyan bi pratîkî di nava jiyanê da ne hat pêk anîn. Li dawiyê, ew şêx û axayên ku anegorî zagon N° 2510 mihacirî navçeyên roavayê kiribûn, vegeriyan wargên xwe yên jiyînê. Hela bi ser da, wan xweliya xwe stend.

Mecalên hukûmeta Tirkiyê yên bi wî awayî, wek mihacrkirina şêx, axa û began li wilayetên roavayê, cîşihitandina pareke bineciyên Dersîm, Ararat û çend ciyên mayîn ên pirr li navçeyên qedexekirî, firotina perçeyên xweliya axa û şêxên ku revîbûn welatên derve, berî gişkî li Sûriye û Iraqê, û li dawiyê sazkirina teftîşên sereke - sebebên xuliqandin-pêşdahatina şerkariyên millî-azadariyê ne dan hildan.

Dewleta Tirkiyê li rohilata welêt hîç idarên nuh, ku anegorî rewacên gelê kurd bûn û bi dilê wan bû û ku dewsa civaka kurdî ya hukumdar bigirta, ne da saz kirin.

2. Bilî zêrandina Kurdan a aborî, cendirmeyên Tirkan û karmendên cihê-cihê Kurd talan dikirin. Wan dicedand ku bi pêşniyarên hukûmeta Ankarê Kurdan bikin qûl û ne dixwest mecalan biafirînin bona xweşkirina rewşa wan a malhebûnî. Isbatan şehadet dida ku li navçeyên Kurdan hukûmeta Kemaliyan ji Tirkiya dema sultaniyetê bêtir bac ji bineciyan distend, û ew yek jî nerazîbûna Kurdan pêş da dianî.

3. Ew nerazîbûna ku ji ruyê serokatîkirina sistema Tirkiyê ya burokratîk a bêfeyde li wilayetên rohilatê dihatin derbas kirin, sebebê sereke nîn bû bona destpêkirina şerkariya azadariyê. Bi mukurhatina Tirkan bixwe, herdem nûnerên hukûmetê yên eskerî û karmendên burokrat usa dişandin navçeyên Kurdistanê yên dûr, yên ku di dema xwe da xwe kiribû robot û sosret û yên ku tucar xemxurî di hindava rewacên bineciyan da ne birine, lê tenê cedand ku zû ji wan navçeyên paşketî û nerehet derkevin.

4. Ew rêformên wan gotî admînîstratîf jî bi xerabkarî hukm li ser Kurdên ku li Kurdistana Tirkiyê dihatin mîase kirin dikir. Dîwana Ankarê, ku siyaseta hukmkirinê derbas dikir, di salên 20 û 30 da li

Institut kurde de Paris

wilayetên rohilatê sê navçeyên sereke, yên ku di nava rewşeke pak da nîn bûn û ji aliyê mufettişên sereke ku di bin destê wan da izn-destûr pirr hebûn dihatin serkarî kirin, saz kirin. Ev guhastinên admînîstratîf yên vî awayî alîkariya serkarîkirinê dikir û dibûn bingeh bona xurtkirina hukmkirina sîstema karmendiyê yê burokratîk yê li ser bineciyên welêt. Berê gelek caran, qaymeqamên ku bi eslê xwe va Kurd bûn serokatî li senceqên navçeyên rohilatê dikir. Û herdem jî Tirkan, an jî Kurdên caş, ew walî kifş dikirin û haya wan ji Kurdan qet tu nebû jî. Xuya ye ku di bin destê waliyan da ji yê qaymeqaman bêtir hukm hebû. Ev mecalên admînîstratîf bi vî awayî helbet di nava eşîrên Kurdan da bi dilkovanî û xemgînî dihatin qebûl kirin.

5. Kurdên milkdar û derebeg ne dixwest ku serokatî-kirina bineciyan ji destê wan derkeve û bikeve destê Kemaliyan û ew yek bû sebebê bingehî û esasî ku serok û şêxên Kurdan jî tevî şerkariya bona peydekirina mafên gelî bûn. Derebeg, şêx û axên Kurdan nikaribû fehm bikin ku ew mecalên Kemaliyan dijî daxwaziyên wan in, bona wan qeziye ye, ku dikare biqewime ku nikaribin ji vir şûn da wek berê aza hukm li ser xebatkarên kurd bikin.

6. Sebebê serhildanê yê giring ew têgihiştina fehmdariya Kurdan bû, nasyonalîzma burjuwayên Kurdan, ku daxwaziya wan a dawîn sazkirina "Kurdistana serbest a mezin" (programa maksîmum), bi hesaba axa Kurdan li Tirkiye, Îran û Iraqê, bû. Faktorên hîmlî bona ruhdarbûna Kurdan bona pêşdahatina nasyonalîzma wan - ew tomerîbûna zimên, dîn-ol, bextê dîrokî, usa jî zulmkariya civakên Tirkiyê yên hukmdar, ku di hêla siyasî, aborî, admînîstratîf da li ser Kurdan hebû, bûn. Ruhdarkirên nasyonalîzmê yê sereke ew rewşenbîrên Kurdan, parlementerên berê, karmend, zabit, nivîskar, rojnamevan û yên mayîn bûn.

Testîqkirina sînorên nuh di navbera Îran, Tirkiye û Iraqê da, ku Kurdên Tirkiyê ji îskelên Sûriya bakur didan birîn û ku bi riya wan berê gelek kirîn-firotina

Institut kurde de Paris

tiştên biyanî dibû; usa jî ew yek ku Kurdan êdî nikaribû wek berê biçûna koçeriyê, li zozanan, gihand cîdamayîna aborî li Kurdistana Tirkiyê. Ev yek bi awakî objêktîf alîkariya aktîfbûna şerkariya pêşmergan kir û bû bingehek ku burjuwaziya Kurdan a bazirganî jî, ya ku nerazîbûna xwe di hindava teribandina pevgirêdanên bazirganiyê ya tradîsyonêl da diyar kir, tevî wê bibe.

Li çend navçeyên Kurdistanê êdî hinek fêodal û serekeşîr li hev hatibûn ku bibin bazirgan. Şervaniya di dereca bazirganiyê da ku di navbera burjuwaziya Tirkiyê ya bazirganî û milkdarên Kurdan da pêş da hatibû, dijminayiya millî xurt kir û bû sebebê sazkirina Kurdistana Serbest ku ji wan ra xeyalek bû, û derebegên kurd dixwest ku li Kurdistanê piştre karê xwe yê zêrandina xebatkaran berdewam bikin.

Nasyonalîstên Tirkan li ber çavê gundiyên Kurdan reş bûbûn, ji ber bacan û zêrandinan. Burjuwaziya Kurdan ku nuh saz dibû nikaribû Kemaliyan temûl bike, tenê bona wê yekê ku ji ruyê siyaseta wan Kurdistan ji bazarên hundirî û yên derve hatibû birîn; û nenihêrî ew gelek dewlemend bû, lê dima ya herî paşketî, di nava welêt da navçeyên wê yên herî belengaz û sexîr bûn. Û ya dawî, ne bi dilê rewşenbîrên Kurdan bû ku nasyonalîstên tirk ne dihişt ku ew bi aktîfî tevî jiyana dewletê û mexlûqetiyê ya siyasî bin û baweriya xwe bi wan ne dianî.

Ewha, anegorî himara bineciyan, ji Kurdan divê weke 60 parlementêr li meclisa welêt di gazîkirina dudu û sisiyan da hebûna. Lê tenê çend parlementerên wan ku herdem nîn bûn û ku dihîştin bên meclisê hebûn. Çi ku di derheqa parlementerên ji wilayetên rohilatê yên mayîn dimîne, ew an Tirk bûn an jî Kurdên xwefiroş û yên wergerayî ku tutiştekî wan ê tomerî bi bineciyên kurd ra tu nebû bûn.

Ev in ew faktor-şertên giring, yên ku ji rewşa Kurdistana Tirkiyê ya aborî û mexlûqetiya siyasî pêş da dihatin û ku bûne bingeh bona şerkariya aktîf û serhildanên gelê kurd ên bona azadariya millî. Tevî wê yekê, ji wan şertan hinek bingeh saz

dikirin bona ne tenê şerkariya millî-azadariyê, lê usa jî bona şerkariya xebatkarên kurd bona azadiya xwe ya civakî (86, r. 99-100).

Tehlîla sebebên şerkariya Kurdan a azadariyê nîşan dide ku hîmê xelkê Kurdistana Tirkiyê yê xebatkar hebû bona ku ji rewşa xwe ne razî be. Serhildanên Kurdan ên salên 20 û 30 yên sedsala XXmîn gelek bi kitle bûn, hemû taqên mexlûqetiya Kurdan, yên ku di karê dijminatiya di hindava zêrandina burjuwaziya Tirkiyê ya hukmdar da li ser bîr û bawerîkê bûn, tevî wan dibûn. Ew serhildan bona wê yekê bi kitle bûn, ji ber ku gundiyên kurd bi aktîfî tevî wê dibûn. Ango hêza bingehî di wan serhildanan da gundiyên kurd bûn, û ew yek fehmdarî ye ku ji ber esasê pirsa Kurdan li Tirkiyê gundiyên kurd bûn. Di nava ordiya şerkariya Kurdan da yên herî pirr gundî bûn. Bêy ordiya gundiyan şerkariya Kurdan a millî ya zor jî ewê tu nebûya.

Lê serokatiya serhildanê herdem jî di destê Kurdên fêodal û bazirgan da bû : ew şêx, serekeşîr, bazirgan bûn ku bere-bere dibûn burjuwaziya bazirganiyê. Lê idêologên şerkariya millî-azadariyê, ruhdarkirên wan hergav jî rewşenbîr bûne, ew zabitên ordiya Tirkiyê, doktor, avukat, xwendekar û yên mayîn bûn. Em bi vê yekê va jî dikarin pirsdanînên şerkariya Kurdan a azadariyê, ku serokên wan di salên 20 û 30 da hîmlî daxwaziya wan ew bû ku heyetiya olka Kurdan a millî bê nas kirin, mafên gelî li wan welatên ku tê da Kurd dijîn bidin Kurdan, bînin ber çavan (156, r. 11-12).

Tevî vê yekê, divê bê nîşan dan ku di wan deman da sloganên millî bi firetî, yên ku de'w dikir ku serbestiyê bidin Kurdistanê, dihatin bi kar anîn.

Ji ruyê hukumdariya fêodalan û kesên nîvfêodal, lê usa jî ji ruyê zêrandina di hêla eskerî-siyasî û hildana bacan ji aliyê dîwana Tirkiyê da, xebatkarên Kurdan hêviya xwe dîsa bi serok û şêxan, ên ku dicedand xwe usa nîşan bidin ku ew parastvanên Kurdan ên tek-tenê ne, ku dikarin Kurdan ji nîrê Tirkiyê xelas bikin, dianî. Ev yek pêşketina Kurdan

a civakî û sinifî, ya ku bi xerabkarî hukm li ser şerkariya azadariyê li Kurdistanê dikir, dida bend kirin. Ew yek jî mora xwe li ser şerkariya Kurdan a azadariyê, ku rêxistinên wan ên siyasî yên usa bi bernama fireh û zelal tu nebûn ku bikaribûna gel li pey xwe bibirana, hişt. Rêxistinên usa, wek Komela Damezrandina Kurdistanê, Komita Serbestiya Kurdistanê, "Xoybûn", komikên Kurdan ên siyasî yên mayîn, rast e, di wê merhelê da mirovên bi nav û deng li dora xwe berhev kirin, lê di hêla teşkîdarî, idêolojî û têorîk da gelek sist hatibûn hazir kirin. Ew rêxistin pirr caran îdêolojiya fêodalîzma Kurdan, an jî burjuwaziya Kurdan, diyar dikir û pirr caran bona kara wan kar dikir.

Şuxulkarên Kurdan ku di nava wan da usa jî eynî welatparêzên ku jiyana xwe dabûn azadariya Kurdan hebûn, nikaribû riyên paktir bidîtana bona safîkirina pirsa Kurdan a millî. Rêxistinên Kurdan ên siyasî di nava wê dema ku em lê dinihêrin da tu sloganeke dijî empêryalîstiyê raber ne kir û nikaribû pevgirêdan tevî hêzên gelên Tirkiyê yên mayîn ên pêşverû saz bikin.

Ev hemû dida nîşan dan ku li ser wê bingeha civakî, bi serkarîkirina şerkariyê ya wî awayî û rewşa navneteweyî ya wî awayî, şerkirina Kurdan nikaribû bigihîje armanca xwe, destxistina mafên millî di sînorên Tirkiyê da. Şerkariya Kurdan a salên 20 û 30, ku serokatiya wê serkaniya fêodalan dikir, bi awakî objêktîf diviya biketa. Gel, ku tevî wan serhildanan dibû, fireh texmîn ne dikir armanc û pirsdanînên wan çi ne, lê serokên Kurdan jî nikaribû sloganên konkrêt, yên ku bi dilê temamiya gelê kurd bûn, derxînin meydanê (104, r. 13).

Heyetiya hukumdarên Tirkiyê yê nasyonalîst yên milkdarî-burjuwaziyê bi temamî dij bû ku pirsa Kurdan wek problêma milletekî cihê bê safî kirin. Hukûmeta Tirkiyê bi mecalên zordariyê herdem ji xwe ra li behane û bingeh digeriya ku fêodalên Kurdan bîne hêla xwe. Hela bi ser da, êdî xuya bû ku rewşenbîrên kurd û xebatkar çiqas aktîf dibûn

û şerkarî dijî derebegan û fêodalên kurd, ku gotî ewê tevî dîwana Tirkiyê biketana nava hevrakarkirinê bona ku gundiyên kurd bihincirînin, dikir.

Ji van hemuyan meriv dikaribû bihata ser wê baweriyê ku şerkariya Kurdan a millî-azadariyê, bi karker û gundiyên Tirk ra tevayî dijî fêodalan, dijî empêryalîzmê û zêrandina hukmdaran, dijî zêrandçiyên tomerî-fêodal, şêxan û rejîma milkdar û burjuwaziyên Tirkiyê şerr bikira, dikaribû wê çaxê bigihîje serketinê.

Tenê şerkariya xebatkarên kurd û tirk dijî zêrandçiyan, zordaran û usa jî empêryalîstan dikaribû şerkariya Kurdan a azadariyê rake ser dereceke herî bilind û alîkariya safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê bike.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# B E Ş V

## PIRSA KURDAN PEY ŞERRÊ HEMCIHANÊ YÊ DUDA RA (1945-1970)

### 1. Rewşa pirsa Kurdan di salên dû şerrê pêşîn da

Serketina Yekîtiya Sovyêtî li ser Almanya faşîzmê û Japona empêryalîst di şerrê hemcihanî yê duda da, wek xuya ye, alî kûrtirkirina hilweşandina sazûmana empêryalîzmê, bilindbûn û geşbûna şerkariya millî-azadariyê li welatên Rohilata Nêzîk û Navîn kir.

Kurdên Îran, Iraq û Sûriyê jî rabûn şerkariya azadariyê. Tenê li Tirkiyê şerkariya Kurdan gurr û germ, ji ruyê têrora eskerî-polîsî û admînîstratîf, nîn bû. Bilî wê, komên Tirkiyê yên serokatîkir dema şerr û di salên pey wî yên pêşîn da piraniya hêzên xwe yên çekdar li wilayetên welêt ên rohilatê, yên ku dikaribûn bi kar bên bona pêşîgirtina her awayê bêtabetî û nerazîbûna Kurdan, xwedî dikirin.

Nenihêrî wê yekê, dîwana Ankarê nikaribû Kurdên Tirkiyê ji wan qewimandinên ku li perçeyên Kurdistanê yên mayîn diqewimîn dûr bixe. Ewha, çend welatparêzên Kurdistana Tirkiyê di nava pevgirêdanên nêzîk da, tevî Partiya Daxuliqandina Kurdistanê-JK (37) (Kurdistana Îranê) û "Hîwa" (Kurdistana Iraqê) (160, r. 36), da bûn. Di tebaxa sala 1944 da, li ser çiyayê Daînpera (li ser tixûbê Îran û Tirkiyê) rasthatina dêlêgasyonên her sê perçeyên Kurdistanê, ku tê da ji nav hêzên Kurdistana Tirkiyê yên millî Qazî Muhemed Wehab hazir bû, hat derbas kirin. Dema wê rasthatinê, dêlêgasyona pirsa di derheqa "hevkarkirina tevayî ... ji boy navê Kurdistana Mezin" enene kir (92, r. 396).

Zinar Silopî di derheqa karkirina rêxistinên Kurdan a wê demê da ewha dinivîse : "Komela Xoybûn ku



Institut kurde de Paris

hildida ser hesêb ku dikare biqewime ku guhartinên bingehî bikevin nava rewşa dewletê ya siyasî, û guhartin dikarin li dawiya şerrê hemcihanê yê duda da pêk bên, bi rêxistinên Kurdan ên siyasî yên cihê-cihê ra, yên navçeyên Kurdistanê ra gihîşt hevraqailbûnê di derheqa lazimiya hereketên tevayî da bona pêkanîna armancên tomerî. Girêdayî wê yekê, komela "Xoybûn" kete nava hevrakarkirinê tevî nûnerên komela "Hîwa" Fazil û ... Refîq Hilmî Beg ra. Ew komele li Kurdistana Başûr hatibû saz kirin" **(145, r. 176)**. Di dûmayîkê da wî nîşan da ku ji ber wê yekê ferzend çê bûye ku dû şerr ra ne tenê Kurdistana Tirkiyê aza bikin, ku armanca partiya "Xoybûn" bû, lê usa jî hemû perçeyên Kurdistanê, loma jî wê partiyê dev ji karkirina xwe berda **(145, r. 179)**. Vê carê rêxistinên Kurdan ên siyasî yên nuh dest pê kir armancên şerkariya Kurdan pêk bînin.

Bi tomerî hildayî, Kurdan dema şerrê hemcihanê yê duda ji bo kara dewletên hevalbend rehet bû, şerr ne dikir bona "li navça giring dijwariyan saz neke" **(156, r. 12)**. Ew bi hêvî bûn ku paşê daxwaziyên wan ên gelî ewê bên razî kirin.

Tevî wê yekê, serokên Kurdan mêmorandum û bang ji dewletên mezin ra dişandin û tê da hêvî dikir ku piştgiriya safîkirina pirsa Kurdan bikin. Mêmorandum û gaziyên usa di 30 tebax 1943, 30 adar 1945, 31 adar 1945, 21 tîrmeh 1945, 10 îlon 1945, 26 cotmeh 1945, 9 çiriya pêşîn 1945, 26 hezîran 1946, 10 adar 1947, 31 adar 1947 da ji dewletên mezin ra hatin şandin **(246, 1949, N° 6, r. 1)**.

Salên pey wan ra, bangên bi wî awayî ji Koma Milletan ra jî hatin şandin : ji bo nimûne, 30 tîrmeh 1947, 29 cotmeh 1948, 15 çiriya paşîn 1949, 13 îlon 1950, 27 îlon 1950, 18 cotmeh 1951, 30 cotmeh 1952, 5 tebax 1945, 7 îlon 1955, 3 adar 1956 **(156, r. 13)**.

Gelek hewaskar e ew nama nûnerê Kurdan ku li ser navê serokên dêlêgasyonên kongreya li San

Fransîskoyê hatibû şandin. Em li jêr wê nameyê bi hinek kurtkirinan va didin :

"Maqûlê mezin ....,

"Hurmeteke mezin bi min ra ketiye ku ez bi navê Lîga Kurdan vê banga di derheqa pirsa Kurdan da ji we ra bişînim. Mithîmtiya (rehetî, guhseqirî, stabilî) aşîtiyê li Rohilata Navîn, û hela li temamiya cihanê, ewê tu nebe bêy safîkirina vê pirsa ku di derheqa gelê 9 milyon da ye û li ser axa 500.000 kîlometrên çargoşe dijî ..., û ku serbestiya wî bi peymana Sêvrê hatiye nas kirin".

"Erdê Kurdan, ku bi temamî ketiye bin destê dewletên biyanî, helbet nikare di wê kongrê da bê raber kirin, loma jî ez hêvî ji we dikim ku hukmê dêlêgasyona we û dêlêgasyona hukûmeta we bona van armancên jêrîn bi kar bînin :

1. Kongrê prensîpa naskirina mafên wan gelên ku hela serbestiya xwe bi dest ne aniye qebûl bike, û ew gel bikaribin di derheqa daxwaziyên xwe da li ber meclisa navneteweyî bêjin. Bixwe tişteki têgihîştinê ye ku bi qebûlkirina wan prensîpan ra tevayî divê kefîltî jî (garantî) bên qebûl kirin ku pê hukûmet divê dijî wan kesên ku nahêlin ku wan mafan bi kar bînin derkevin.

2. Di civîneke kongrê da pirsa Kurdan bikin nava pirsa rojane.

3. Projeya raberkirin an jî piştgirtinê divê deynin ber komîsyona navneteweyî ku divê bi pirsa Kurdan ra bibe nas û safîkirina wê amade bike. Hesabdayîna wê komîsyonê dikare bibe bingeh bona safîkirina wê pirsê û kongreya Aşîtiyê dikaribû di wê hêlê da alîkarî bikira ..."

"Dû şerrê hemcihanî yê yekê ra, di dema dewrana mandatan da, ewê Kurd di zemanê rejîmên anegor da pêş va biçûna, wek gelên Rohilata Navîn ên mayîn, û ewê riya xwe ya serbestiyê bigirtana. Lê wê demê, gava hinek gel bi pêşketina cihanê ra bûne nas, ji çi dereca wan bilind bû, piraniya Kurdan di bin hukmê Tirkiye, Iraq û Îranê, ku dicedand wan bi fîzîkî qir bikin, dest davêt mihacir-

kirin, bombekirin, lêdan û zêrandinê, an jî bi moralî ew pêpes dikirin û bi destê zorê di nav xwe da dihelandin, da bûn".

"Bona her dewleteke ku perçeke Kurdistanê stendibû, axa Kurdan dima wek koloniyeke usa ku jê ditirsiyan ku ewê ji destê wan here. Dicedînin ji wî erdî bêtir bac hildin û bêtir esker berhev bikin bona hincirandina gelê wira. Temamiya sinaetên cî tê hilweşandin, rûxandin, ji bo xatirê endustriya ku li ser wê axa ku tê da milletên biçûk dimînin pêş va diçû. Hema ku filan an bêvan dewlet xwe bi hêz texmîn dikir, ewê bi destê zorê ew milletên biçûk ên nav wê da asîmîle bikira, ji ber ku ew bêçare û sexîr bûn".

"Gelo dikarin mafên Kurdan ên millî bidin kefîl kirin bêy guherandina xerîta (karta) Rohilata Navîn a siyasî ? Bona parastina wan mafan bê tirs bikin, divê di her yek ji wan dewletan da kontrola welatên muttefiq, ku divên ewqas kardar bin ku serbestî di wan welatan da tiştekî resteqîn bibûya, testîq bikin ... Di nava 20 salên dawîn da, jimara şehîdên Kurdistanê gelek zêde bû. Dibe ku tiştekî dûrî aqilan bê hesibandin ku ew hemû tişt di dewraneke gelek pêşdaçûyî da diqewime; di demên me da Kurdan ewqas êşkence û zordarî dîtin ku tu di tu dema nava dîroka xwe da ne dîtine. Lê ew paradoks tenê bi rû va usa ye; di tu dewraneke mayîn da şerkariya millî ewqas bi sext û berk ne bûye ... û di wê cihanê da, ku pey peymana Sêvrê ra naskirina mafên gelan ên millî îlan kir û xwefehmberiya Kurdan bilind bû, Tirkan û Farisan ne dixwest bona safîkirina pirsa Kurdan riyeke mayîn bibînin, bilî wê riya ku bi destê zorê wan bînin ser rê. Cihana paşerojê nikare izn bide ku ocaxên neheqî, zordestî û zêrandinê di qulçekî cihanê da hebin".

"Heyetiya Yekîtiya Sovyêtî ku li hemû kongreyên navneteweyî parastvana gelan e, ew şertê safîkirina pirsa Kurdan di paşerojê da, bi riya sazkirina Kurdistana aza û serbest, kefîl dike" (100, r. 408-411).

Şuxulkarên şerkariya Kurdan a millî-azadariyê, ku name, mêmorandum û bangên bi wî awayî dişandin, li ser wê hêviyê bûn ku pirsa Kurdan li Tirkiye,

Îran û Iraqê bi aşîtî safî bikin. Girêdayî vê yekê, mêmoranduma partiya Kurdan "Rizgarî" jî (38), ku ji serokê Koma Miletan ra hatiye şandin, hêjayî guhdariyê ye. Di nava wê mêmorandumê da qîmeta siyasî û aborî ya rewşa gelê kurd hatiye dayîn, usa jî tê da dîroka şerkariya bona azadiyê, mafên gelî tên ber çavan, usa jî ew siyaseta hukûmetên her sê dewletên li jor nîşandayî, ku di hindava gelê kurd da pêk anîye, anî ber çavan. Em wê dokumentê bi hinek kurtkirin va tînin :

"Partiya Kurdan "Rizgarî", ji rêxistina bi nav û deng ra serketin û destanînan dixwaze boy navê serketina we di hemû derecan da ..."

"Partiya Kurdan "Rizgarî", ku rêxistina gelî bixwe ye, pirsdanîna xwe ya yekemîn raberkirina rewşa Kurdan a xerab hesab dike, usa jî dixwaze di derheqa wê zulmê da bi we ra gilî bike ku empêryalîzm û hukûmetên bêbext çi tînin serê Kurdan û daxwaziyên wan xwînmijan li cihanê anîne ber vî şerrê bi kuştin. Hukûmetên Tirkiye, Îran û Iraqê hela hê li ser wê baweriyê ne ku bi karanîna hemû mecalên bin destê xwe va dikarin Kurdên li bal xwe yên dîl û qûl qedexe bikin, bi riyên resmî ber bi rêxistina navneteweyî bibin û de'wa mafên xwe bikin, bêjin ku divê zordar bersîva dîrokê bidin û ew hetanî nuha ji ber wê yekê "lingê xwe li guhê xwe dixin" û bê gunehkarkirin dimînin, ji bo ku rêxistineke navneteweyî ya rasteqîn wek Koma Milletan hetanî nuha tu nebû".

"Partiya me mecbûr e ne lêgal kar bike. Hetanî nuha çareke wê hebû bangên xwe bi destê mirovên biyanî, usa jî rêxistinên Îran û Sûriyê yên pêşverû ji we ra bişîne".

"Partiya me şikber nîn e ku hûn gelek ji nêzîk va rewşa rêjîmên Tirkiye, Îran û Iraqê yên ne dêmokratîk dinasin, usa jî dizanin ku ew hukûmet çiqas xerab ber bi riya Kurdan dibin, xweliya wan zevt kiriye û di nava xwe da par ve kiriye. Bona isbatkirina gotinên xwe, em borcê xwe hesab dikin ku çend isbatan bînin ku zanebûn û haypêhebûna wan ewê alî we bikin ku di riya safîkirina pirsa Kurdan da,

ku pirseke herî sereke ye û ku aşîtî û xweşbextiya gelên Rohilata Nêzîk bi wê va girêdayî ye, heq bibînin. Anegorî peymana aşîtîyê ya pey şerê hemcihanê yê pêşîn û peymanên pey wê ra, Kurdistan bi destê zorê, bêy qayilbûna Kurdan, di nava çar dewletan da - Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê - hate perçe kirin û ew yek bona wê hate kirin ku kara welatên empêryalîst li Rohilata Nêzîk bê bêtirsandin û xurt kirin. Di van welatan da qeyde-qanûnên dîktatoriyê hatine testîq kirin, lê di hindava wê cimaeta am û tam da hemû ferzendên pîs hatine bi kar anîn bona ku wan ji mafên millî bê par bikin, nehêlin ku ew azadiya xwe bistînin, bi zimanê xwe yê dê bipeyivin û binivîsin, aza fikra xwe bêjin. Helbet, Kurd bi wê perçekirina kêmkirinê ra ne razî bûn û dicedand mexlûqetiya cihanê bidin bawer kirin ku daxwaziyên wan zagonî û makkirî ne. Mixabin, ew hemû cedandin bêfeyde bûn, ji ber ku empêryalîstan ne dixwest guh bidin Kurdan, eşkere bend datanî pêşiya wan ku ew nikaribin rewşa xwe bigihînin cihanê. Kurdan, ku texmîn kir ku nikarin bi riyên aşîtiyê bigihîjin naskirina mafên xwe, dijî rêjîmên Tirkiye, Îran û Iraqê yên dîktator rabûne qal û cengê û di nava 25 salan da şerrekî mêrxasiyê kir ji bo azabûna xwe ji zulm û zordestiyê ...".

"Tiştekî gelek liberxweketinê ye ku nuha, gava temamiya cihanê li ber dergehê aşîtiyê ye, gava pirr kongre li ser lênihêrandin û safîkirina problêmên cihê-cihê diqacqicin, Kurd nikarin dengê xwe bigihînin wan kongreyan û de'w bikin ku bi prensîpên dêmokratîk, anegorî ruhê şarta Atlantayê li pirsa wan binihêrin. Rewşa vî awayî herdem li wan welatên ku tê da cellad û hukumdar serokatî dikin û bi karkirina xwe va dijî kara millet in heye".

"Usa jî ew yek tiştekî liberxweketinê ye ku Ingiltere û DYA hukûmeta Tirkiyê wek dêmokratîk hesab dikin û izn didin wê ku nûnerên xwe bişîne Koma Milletan. Loma jî divê şaş-metel nemînin çima dengê Kurdên Tirkiyê, û bi wî awayî jî dengê wan Ermeniyan ku di wê rewşê da ne, nayê bihîstin.

Bona wê rewşa giran, partiya me de'wê dike ku wan zulmkarên ku xwe wek hukûmet bi nav dikin ji text bavêjin ...".

"Gava şerrê hemcihanî yê duda xelas bû, hêviyên gelên bindest, herweha yên Kurdan jî ku bi hemî hêzên xwe va piştgiriya wan hevalbendên xwe ku dijî faşîzmê ne digirt, hişyar bûn. Gelê kurd berê jî, nuha jî, hêviya mezin datîne ser wan sozdayînên ku şuxulvanên hevalbendanên dewletê dane ku ew biqedînin. Ew usa jî hêviya xwe datîne ser pêkanîna wan şertên ku şarta Atlantayê û dêlêgasyonên Moskow dane bona ku mafên gelên ku wek milletên biçûk hesab dibin bên nas kirin û ew divên azadiya tam bistînin, xwe bi xwe bextê xwe qirar bikin û li karê xwe bi xwe serokatî bikin".

"Partiya me bi navê gelê kurd de'wê dike ku empêryalîstan ji welatê me derxin, terka dûgera mirovan bidin û nehêlin ku hukûmetên wan welatên ku hukumdariyê li gelê me dikin û em di nava xwe da perçe kirine usa bi zulmkarî ber bi riya me bibin".

"Gelê kurd li ser a xwe sekiniye, bona ku mafên wî bên dasekinandin û ewê bibe gava pêşîn li ser riya serbestiyê. Divê ji bîr nekin ku gelê kurd rola giring di nava parastina aşîtiyê da dilîze û bi azadî û serbestiya wê va gelek girêdayî ye, ka çika li Rohilata Nêzîk û Navîn aşîtiya çawa ewê hebe. Em bawer dikin ku dewrana neheqî û qûlîtiyê derbas bûye û demeke nuh hatiye ku hemû gel ewê bi awakî azadiya xwe ku ji bo navê wê milletelên ittifaqdar şeş salên reş şerr kir texmîn bikin" (94, r. 103-110).

Lê ev de'wkariyên partiya "Rizgarî" yên heq, herweha daxwaziyên mayîn, ku pirsa Kurdan, ku ewê bi dilê hemû Kurdan bibûya bi aşîtî safî bikin, bê guhdarî man. Sekretariya Koma milletan ne tenê li wê mêmorandumê ne nihêrî, lê qet di derheqa stendina wê da jî ji kesî ra ne got.

Di nava van şertan da, hukûmeta Partiya Gel a Komarî ku mafên gelên biçûk inkar dikirin, pey şerr ra jî wek berê di derheqa pirsa Kurdan da

Institut Kurde de Paris

xwe kerr kiribû. Wê dicedand usa nîşan bide ku li Tirkiyê Kurd tu nene, loma jî pirsa Kurdan jî tu neye. Ew yek rojnamevanên welatên derve jî ku li Tirkiyê dixebitîn nîşan dida. Ewha, nûçegihanê rojnama "New York Post", Murer, di nîsana 1946 da nivîsî : "Li Tirkiyê Kurd ser jê kirin û ewqas mirov sirgûn kirin ku hukûmeta Tirkiyê nuha dikare isbat bike ku li Tirkiyê pirsa Kurdan tu neye" **(256, 17.4.1946)**.

Lê nûçegihanê kovara Ingilterê "Economist" di gulana wê salê da nivîsiye : "Kurd bona dewleta Tirkiyê têderxistinokek e. Li Tirkiyê di derheqa qeder û dîroka wan da tiştekî tam nizanin. Kurdistana Tirkiyê kiriye bin perda hesinî. Tiştekî tenê ku xuya ye ew e ku ordiya Tirkiyê di sala 1930 da bi hêzên mezin dijî Kurdan şerr kiriye û ew yek dî salên 1937-38 da wekiliye. Paşê, pey şerrê dawîn, wezîrê Tirkiyê yê karên hundirî îlan kir ku li Tirkiyê pirsa Kurdan êdî tu neye. Ji wê demê da, bi resmî Kurdên Tirkiyê wek milletekî cihê ne hatine hesab kirin. Di derheqa wan da car-caran tînin bîr ku ew jî an wek qaçaxên serê çiya, an jî wek Tirkên çiyayî, ne" **(249, 10.5.1946)**.

Ji aliyê komên serokatîkir, herdem inkarkirina heyetiya pirsa Kurdan, helbet, nikaribû ew pirs ji meydanan bide hilanîn; ew hergav jî wek problêma hundirî ya giring dima. Rast e, sensura berk hebû, lê dîsa jî di weşana Tirkiyê û welatên derve da carna agahdariyên ku tê da netîcên siyaseta dîwana Tirkiyê ya şovînîst di hindava milletên biçûk da, herweha Kurdan jî, dihatin ber çavan diyar dibûn.

Bi vê yekê ra girêdayî, perçeke gotara endamê parlementa Ingilterê, Philippe Prays, ku di sala 1956 da çûye wilayetên Tirkiyê yên rohilatê, hewaskar e : "Li ser girava deryaya Wanê kelefên mizgevtên Ermeniyan ên kevn hene. Hetanî van dawiyan jî dîwana Tirkiyê ne dihişt ku mirovên biyanî herin wira. Ew naxwazin xwe mukur bên ku milletên wek Ermenî û Kurdan demekê li vira jîne û li ser wê baweriyê ne ku hemû bineciyên vira hergav jî Tirk bûne. Lê nuha wan dest pê kiriye xwe bi

tebiya aqiltir bigirin. Çend komên welatên derve van dawiyan çûne wê giravê. Lê dîsa jî wek berê ber bi Kurdan dibin. Her mirovek ku çil sal pêş da li Tirkiyê qesidiye, dizane ku piraniya bineciyan Kurd bûn, ew milletekî kevnare ku li navçên çiyayî dima ye, bi zimanê xwe dipeyivîn û tu tiştekî wan ê tomerî bi Tirkan ra tu neye. Hetanî nuha jî li wan navçan dikarin jinên usa ku kofî didin serê xwe, êlek û kurtikan li xwe dikin bibînin. Ew Kurd in ku bere-bere ji aliyê Tirkan tên helandin. Mêr êdî wek Tirkan li xwe dikin ... Ew gişk bi zimanê tirkî dipeyivin, lê li kuçeyên bajarê Wanê û gundên dor-beran dikarin zimanê kurdî jî bibihîsin" (168, r. 28).

Çawa dema şerr, herweha di salên pey şerrê pêşîn ra, komên Tirkiyê yên serokatîkir ferzendên hayjixwehebûn û fesalbûnê bi kar dianîn, dicedand ku nehêlin ku Kurd pêş da bên. Ew xwezma ji sazkirina Partiya Kurdistanê ya Dêmokrat li Îranê gelek ditirsiyan, ji ber ku ew dikaribû şerkariya Kurdan a azadariyê li Kurdistana Tirkiyê bide hez kirin. Li dawiya sala 1945 û di destpêka 1946 da, dîwana Tirkiyê dest pê kir Kurdan ji ciyê wan raqetîne ber bi kûrayiya welêt, li hêla sînorên tevî Iraq û Îranê. Lê ji ruyê xurtbûna hişkbûna siyaseta hundirî, ew zûtirekê mecbûr bû ku dev ji siyaseta zordestiya bi kitle di hindava Kurdan da berde. Hela bi ser da, di nava siyaseta civakên hukumdar da, çend xusûsyên ku nîşanan didan ku di hindava pirsa Kurdan da berbirîbûneke nuh diyar dibe di pirsa millî da peyda dibûn.

Gilî ew e ku pey şerr ra û pey derbasbûna ber bi sazûmana pirpartîtiyê ra, rola di nava jiyana welêt a siyasî da baş bilind bû. Wan nikaribû ji wê yekê ra hesab rûnenên ku bijarvan ewê dengê xwe bide kîjan partî. Gelek tişt girêdayî wê yekê bûn ku ewê bi kîjan partiya burjuwaziyê ra li hev bê ji bo ku di dema bijartinan da bêtir dengên bijarvanan, herweha dengên bineciyên kurd jî, berhevke.

Karmendê Ingilterê K. C. Edmonds, yê ku pey şerrê hemcihanî yê pêşîn ra tevî şerkariya dijî

têkoşîna Kurdan a azadariyê bûbû, di nîveka salên 50 da nivîsiye : "Ji serkaniya rasteqîn ez pê hesiyam ku ji ruyê dêmokratîzekirina Tirkiyê, dengê Kurdan bi carekê ra kemaleke giring bi dest anî û divê hildin ser hesêb ku dema ku jimara bineciyên kurd li wî welatî tînin meydanê, jimara rast carna digihîje 3-4 milyon" (161, r. 4).

Derbasbûna ber bi sazûmana pirpartîtiyê, ku gaveke ber bi dêmokrasiya burjuwa hesab dibe, çiqas jî tiştekî ecêbmayînê nîn be, bi dilê derebegên Kurdan, şêx û axan, bû. Ev yek ew nêzîkî milkdarên tirk ku li meclisê dijî her cûrê warguhastinên erd derdiketin dikirin, lê tevî wê yekê jî bi dilê fêodalên Kurdan pêş da dihatin. Girêdayî wê yekê, ew qewimandina ku di sala 1945 da bû gelek hewaskar e, gava li meclisê projeya zagona di derheqa rêforma xweliyê da dihate enene kirin. Xwediyên xweliyê yên usa bi nav û deng, wek Cewad Orel, Ednan Menderes, Emîn Sezak û xudanxweliyên Tirkan û Kurdan ên mayîn, berk dijî projeya zagona di derheqa rêforma xweliyê derketin. Ji bo nimûnê, Emîn Sezak, gava ber bi Şewket Reşît Hetipoğlu ku ew proje raberî enenekirinê kiribû bû, îlan kir : "Ewê projê paş da hildin ... û ezê 30.000 donum erd li navça Beylikopruyê bidim we". "Lê eger em bi qanûnê hildin ?", Hatipoğlu pirsî. "Eger dewlet xweliyê bi destê zorê hilde, wê demê Emîn Sezak li wê navça Eskişehirê nejî", wî bersîv da (121, r. 326).

Bi derbasbûna ber bi sazûmana pirpartîtiyê, hukmê şêx, axa û hukumdarên Kurdan ên mayîn bi hêztir bû. Berê sazûmana bijartinan a nuh kemala bijarvanan, yên Kurdên ku bi aborî û dîndarî-olî bi axa, şêx û serekeşîran va girêdayî bûn jî pê ra, da bilind kirin. Divê bê gotin ku serokatiya Kurdan a civakî wek berê bûbû serkaniya berhevkirina dengan ji bo kara civakên Tirkiyê yên hukumdar, partiyên siyasî û bi wê yekê va ew dibû şertekî siyasî yê mezin di nava şerkariya bona dîwanê da. Bijarvanê kurd ê sade dengê xwe dida wî mirovê ku şêx û axê wî jê ra gotibû. Ya dudu, ew mêlgirtina qenc, ku şuxulvanên

Institut kurde de Paris

burjuwazî di hindava serokatiya fêodalên Kurdan û serekeşîran da diyar dikirin, hurmeta wan di nava bineciyan da bêtir dida bilind kirin. Ev hemû alî xurtbûna tebiyên şêx, axa û serekeşîran dikir, hukmê wan li ser bineciyên kurd bêtir dida mehkeme kirin.

Bi vî awayî, derbasbûna ber bi sazûmana (sîstêm) pirpartîtiyê bû bingeh bona Kurdên dewlemend ku bi civakên Tirkiyê yên hukmdar ra nêzîktir bibin. Derebegên Kurdan ji ruyê "lîstikên dêmokrasiyê" dest pê kir bere-bere bi nûnerên civakên Tirkiyê yên serokatîkir, burjuwa û milkdaran ra bikevin nava hevkarkirinê. Wan dest pê kir bar bikin, biçin bajarên ku tê da dibûn tucar û bazirgan, carna jî bi wan ra li hev dihat ku çiqlên malhebûnê yên cihê-cihê bikin bin hukmê xwe û pê ra jî xweliya wan di destên wan da dima. Nûnerên serokatiya Kurdan, tevî wê yekê, bi siyasetê va jî mijûl dibûn û bi qayilbûna partiyên serokatîkir nemaze tevî xebata civînên wilayetê yên belediyê û yên sereke dibûn.

Ango, şerkariya partiyên burjuwaziyê ya siyasî ji bo ku bijarvanan bîne hêla xwe, dîwanê hilde destê xwe, kemala şêx û axayên Kurdan da bilind kirin û bext û qederê pewandarên (kandîdat, namzed) parlementerîzmê li meclisê bi gelek tiştan bi wan va girêdayî bû. Ew mecal jî dikarin bi vê yekê va şirove bikin ku hukûmeta Partiya Gel a Komarî bi kar dianî bona ku Kurdan bîne hêla xwe. Ewha, di sala 1947 da, serekwezîr îlan kir ku divê Kurdan, çawa ku Tirkan, li vira bi wî awayî gazî eskeriyê bikin **(165, r. 31)**. Berî wê, Kurd di nava pareskerên dijwar da bi kar dianîn. Tevî wê yekê, di 8 hezîran 1947 da, meclisê zagon N° 5098, ku çend guherandin di nava zagona di derheqa mihacirkirin û sirgûnkirinê da dikirin **(1510)** û ku di sala 1934 da hatibû qebûl kirin **(35, dîwan 28, r. 1322-1327)**, qebûl kir.

Anegorî miqala wê ya we'delî ya 1mîn, ew hemû astengên we'delî yên bona mafên wan mirovên ku bi biryara hukûmetê bi destê zorê, berî qebûlkirina zagonê, hatibûn sirgûn kirin ber bi navçeyên dûr, ji



Institut kurde de Paris

ortê dihatin hildan. Lê di zagonê da dihat gotin ku bêy izndayîna hukûmetê destûra tukesî tune ku barke-here navçeyên qedexekirî - Agirî, Sasûn, Tuncelî û Zeylan -. Tevî wê yekê, pey çapkirina wê zagonê, kesên berê sirgûnkirî dikaribû bi izndayîna hukûmetê di nava salekê da (39) vegerin wilayetên xwe, an jî yên cîran (miqala we'delî, hejmar 2). Lê wê çaxê temamiya hebûna wan diket destê dewletê.

Anegorî zagona jorgotî ya N° 5098, a 5 sibat 1948, hukûmetê biryar hejmar 3/6992 ku şehadet dida ku komên Tirkiyê yên serokatîkir, rast e, bona şêx û axayên Kurdan hinek berdaxwarin kir, lê xwe ji siyaseta helandina Kurdan ne da paş, qebûl kir. Wek di paragraf "b" ya wê biryarê da tê gotin, "koçerên ne tirk, ku bi zimanê tirkî dipeyivin, her maleke wan gundên Tirkan ên di navçeya mihaciriyê da tên cîwar kirin, an jî di her gundekî da divê ewqas mihacir hebin ku jimara wan 10% ji bineciyên gundên Tirkiyê yên mezin derbastir nebe" (45, r. 133). Ango, bona Kurdan û koçerên ne tirk ên mayîn qedexerkirî bû ku wargên xwe yên jiyînê çêkin, ji ber ku ewê dijî siyaseta dîwana Tirkiyê ya helandin-asîmîlasyonê bibûna.

Ev ferzend di nava zincîra mecalên dawîn, ku Partiya Gel a Komarî di nava 27 salên serokatîkirina xwe da dida derbas kirin bona "safîkirina" pirsa Kurdan, da bûn. Temamiya dîroka serokatîkirina PGK şehadet di derheqa teribandina (şerpezebûna) siyaseta wê di pirsa Kurdan da dida. Çend şuxulkarên Tirkiyê yên burjuwaziyê jî mecbûr bûn bi vê yekê xwe mukur bên. "Di nava temamiya dema serokatîkirina Ismet Inönü da (wek serekwezîr an jî serek), pirsa di derheqa wilayetên rohilatê da ... wek perçeke problêma millî lê ne hatiye nihirandin. Safîkirina pirsa di derheqa wilayetên rohilatê da tenê diket nava planên admînîstratîf û eskerî ... û wê yekê tevlihevbûneke bêhempa saz dikir. Berxweketinên Rohilatê herdem kûrtir bûn, ne ku ew ji kêlekê dihat texmîn kirin ..." (116, r. 326), Ş. S. Aydemir nîşan daye.

Siyaseta hukûmeta PGK ya durûtiyê di hindava pirsa Kurdan da (lîstikên bi derebegên Kurdan ra di hêlekê da, û berdewama siyaseta helandina Kurdan di hêla mayîn da) tebiyên partiya hukumdar dida sist kirin û hukmê Partiya Dêmokrasiyê (PD) ê nuh ê muxalefetê xurt dikir, xwezma li wan wilayetên ku tê da piraniya bineciyan Kurd bûn. Loma jî di sala 1950 da, dema bijartinên di nava meclisê da, piraniya Kurdan dengê xwe da Partiya Dêmokrasiyê ku serkariya wê C. Bayar û A. Menderes dikir. Pewandarên wê partiyê ji wilayetên rohilatê, dema kampanya bijartinê, di nava peyvên xwe da soz dida ku mafê rasteqîn, ên wek mafên Tirkan, bidin Kurdan, lê usa jî her tiştî bikin bona pêşdabirina aboriya wan navçan ku tê da bineciyên kurd piranî ne. Lê qewimandinên paşdemê nîşan da ku ew sozdayîn tenê tewlebaziyên berî bijartinê bûn. "Bona Kurdan, hem komarî, hem jî dêmokrat, - I. Ş. Wanlî nivîsiye - hergav hukmê burjuwaziya Tirkiyê, yê rasîstan hebûye, herdem zordariya millî bi korpusa admînîstrasyona Tirkiyê, têrora polîs û ordiyê hatiye texmîn kirin. Kurd hergav jî zêrandî, bê maf bûne ... Faşîzm, milliyetçîtî, tunebûna dêmokrasiyê berdewam bûne, nenihêrî ku bi resmî gelek tişt soz dane ... " **(173, r. 16)**.

Aydemir ku di derheqa tebiya partiyên siyasî di pirsa Kurdan da dipeyive, pey wê yekê ra, gava dîwan kete destê PD, nivîsiye ku hukmê şêxan li ser bijarvanên para welêt a rohilatê û bikaranîna wan bûne haceta şerkariyê û "tucariyê ... di navbera partiya serokatîkir û muxalefetê da" **(116, r. 327)**. Loma jî pey hatina dîwana PD ra, li wilayetên rohilatê kêm tişt hatin guherandin. Di 3 tebax 1951 da, hukûmeta Partiya Dêmokrasiyê li meclisê zagon N° 5826 ya di derheqa guhartinên di nava miqal 12 ya zagon N° 5098 da derbas kirin. Pey nuhkirina wê miqalê ra, ewha bû : bêy destûrdayîna hukûmetê izna tukesî nedin (bilî nûnerên hêzên çekdar û ordiyê" ku here navça qedexekirî, herweha ji erdê rohilatê girtî hetanî wê xeta ku wargehên jiyînê yên Ilîce (qezayê Qersê) dest pê dike û pê digihêje

Tokatli-Serdarbulek-Qerniyarik-Şexirgerden-Yukari-noçeyê (wilayeta Agiriyê), usa jî hetanî Ararata Biçûk (45, r. 114).

Di zagon N° 5826 da dihat dîtin ku komîsyona ji sê mirovan saz bikin (nûnerek ji wezareta xwelîbêcerkirin, yek ji ya transport û pevgirêdanê, yek jî ji saxlemîxweykirin û bêxofkirina sosyal) ku diviya wan navçeyên ji zona qedexekirî bide nîşan dan (ji bo numûnê, Tuncelî, Sasûn, Zeylan û yên mayîn), ku tê da, eger pêwîst bibe, ewê wargehên jiyînê bihatana saz kirin. Bi vê biryarê li wargehên jiyînê yên usa ew kesên ku pey 1 çileya paşîn 1938, ango dû karên cezakirinê ku eskerên Tirkiyê li Dersîmê pêk anîn, ber bi wilayetên roavayê hatibûn sirgûn kirin, dikaribûn bijîn.

Anegorî zagon N° 5826, paragraf 6, ya serwêrtiya sereke ya aliyê karên xwelîbêcerkirinê û muhaciriyê ya rex serekwezîr, di 17 oktobr 1951 da bi qolê wezîrê dewletê Işcan, belgok N° 154 ji waliyên wilayetên rohilatê ra şand. Di wê belgê da dihate nîşan dan ku zagon N° 5826 ya 3 tebax 1951, qedexekirina çûyîna navçeyên Tuncelî, Sasûn û Agiriyê (bilî perçeke wê ya biçûk) û vegerandina ji wan deran dide hildan (45, r. 335). Hema wê dem-salê, waliyên wilayetên Agirî, Bitlîs, Qers, Siirt, Tuncelî û Wanê bi belgok N° 105-3630 di derheqa sazkirina komîsyona li jorê nîşandayî da hatin agahdar kirin (45, r. 335).

Qedandina sozdayînên Partiya Dêmokrasiyê berî bijartinê bi van mecalan va jî xelas bû. Çi ku di derheqa sozdayînên mayîn da dimîne, ew tucar ne hatiye miaser kirin. Hela bi ser da, hukûmeta Partiya Dêmokrasiyê mecal qebûl kir bona xurtkirina hevrakarkirina tevî welatên rohilatê yên cîran (Iraq, Îran) bona hincirandina tevgerên Kurdan. Ew yek bi dilê DYA, Ingiltere û çend welatên roavayê yên mayîn, ku dixwest ku rêxistineke eskerî ya wek NATO çêkin û welatên Rohilata Nêzîk û Navîn tê da wergirin, bû.

Di miaserkirina planên dewletên roavyê yên bona teşkîlkirina rêxistineke ewha berî gişkan Tirkiye

hat, ji ber ku navbera wê û DYA û Ingilterê xweş bû. Di destpêka çileya paşîn 1955 da, serokê hukûmeta Tirkiyê A. Menderes çû Bexdadê û li wira hevpeyvîn tevî serekwezîrê Iraqê Nûrî Seîd ra derbas kirin. Di 12 çileya paşîn da, li Bexdadê daxuyaniyek, ku tê da dihat gotin ku herdu alî biryar kiriye peyman di derheqa bêqeziyabûna herdu aliyan da girêdin, hat weşandin.

Di 24 sibat 1955 da, li Bexdadê Peymana ku di paşdemê da wek "Pakta Bexdadê" hat bi nav kirin di erheqa hevrakarkirina di navbera Iraq û Tirkiyê da hat qol kirin (130, r. 162). Anegorî miqala wê peymana pêşîn, eger pêwîstî hebe peyman û protokolên xusûsî di derheqa hevrakarkirina tevayî di şerkariya dijî heja dêmokrasiyê da, herweha jî dijî şerkariya Kurdan ji bona mafên xwe, qol dikin.

Wek ku rojnama Lubnanê "Têlêgraf" di adara 1955 da dinivîse, di nava peymana Bexdadê da protokola Tirkiye-Iraqê, ku tê da didît ku balafirgehên hev bi kar bînin û izn bidin eskerên hêlekê ku derbasî hêla mayîn bibin, bi dizî jî bû. Bi wê protokolê, Tirkiyê borc hildida ser xwe ku alîkariyê bide Iraqê di nava hînkirin û bi teknîkî razîkirina ordiya Iraqê bi çekên nûjen va da. Ew alîkarî jî, ku Tirkiye ji DYA distîne, ji kîsê wan e. Pareke protokolê didît ku hereketên her du aliyan di nava şerkariya dijî eşqiyayên ku "dijî siyaseta Tirkiye û Iraqê tên" bikin yek (102, r. 16).

Di nava sala 1955 da, Îran, Pakistan û Ingiltere jî ketin nava wê peymanê. Pey civîna peymana Bexdadê ya rikindar ra, ku di novembra 1955 li Bexdadê hat derbas kirin, struktura peymanê ya teşkîldariyê, ku Şêwra Wezîran, sekretarî û çar komiteyên aliyê pirsên cihê-cihê diketin nava wê, hate qebûl kirin. Bona me komita bona şerkariya dijî karkirina pîre-pîrekirinê, ango casûsiyê, ("komiteya bêqeziyebûnê", "komiteya polîsî") hewaskar e. Ew komite ji serokên serwêrtiyên polîs, usa jî xebatkarên dereca casûsiyê yên dewlet-endamên peymanê hatibû saz kirin. Komitê salê carekê civîna xwe dikir. Wê bona şêwra wezîran wekîlname amade dikirin û



INSTITUT KURDE de PARIS

mecal didan hazir kirin bona şerkariya dijî tevgerên dêmokrasiyê û millî-azadariyê, hem li hundirê welatên endamê peymanê, hem jî li welatên cîran ku xwe bi tebiya bêalî girtibû. Bi formalî ew komite ji du binkomiteyên ku şerkarî dijî "karkirina casûsiyê" dikir bû. Ji van hemuyan, em dikarin bên ser wê bîr û baweriyê ku dema sazkirina peymana Bexdadê tûjbûn û hişkbûna pirsa Kurdan, hukumdarên Tirkiye, Îran û Iraqê, usa jî piştgir û kolonyalîstên DYA û Ingilterê, hergav di nava tirs û xofê da xwedî dikir, hatibû hesab hildan.

Şuxulkarên tevgera Kurdan a bi nav û deng gelek caran xeysetê peymana Bexdadê dijî Kurdan di nava nameyên xwe ku ji Koma Milletan û rêxistinên navneteweyî yên mayîn ra şandine da, nîşan dida, usa jî ew yek di nava nivîsarên wan da hatine xuya kirin **(44, r. 3-4)** :

"Ez dikarim we bidim bawer kirin, - I. Ş. Wanlî nivîsiye -, ku heyetiya pirsa Kurdan bû behana sereke bona girêdana peymana Bexdadê ku Nûrî Seîd serokatî lê dikir, di navbera Tirkiye, Îrana Şah û Iraqa padîşahtiyê ku gihîştine hev bona bi tevayî têkoşîna Kurdan bidin hincirandin. Ingiltere jî şervaniyê dijî tevgera Kurdan dike, ji ber ku ew naxwaze li Rohilata Nêzîk û Navîn guhartinên siyasî û civakî bibin. Ew dicedîne ku statukwo biparêze bona li vira kaniyên neftê bi kardarî bide xebatê. Û ziyankêşê sereke yê wê statukwoyê li Rohilata Nêzîk ew gelê kurd e. Ev isbata sedî sed e" **(173, r. 25)**.

Ji text avêtin û hilweşandina rejîma padîşahtiyê li Iraqê, ku di hezîrana sala 1958 da qewimî, û derketina wê ji peymana Bexdadê (sala 1959) derbeke xedar gihande siyaseta komên Tirkiye, Îran û Iraqê yên rêaksyonêr û şovînîst. Ji ruyê wergerandina dewletê li Iraqê, qewlên baştir hatin saz kirin bona şerkariya Kurdan ji bo mafên xwe yên millî li wî welatî. Lê tevî wê yekê, rewşa Kurdên Tirkiyê wek berê bû. Hukûmeta Partiya Dêmokrasiyê ji qewimandinên li Iraqê ders hilneda. Wê dîsa siyaseta fetisandina

Institut kurde de Paris

şerkariya dêmokrasiyê û pêşîgirtina her awayê nerazîbûnan di nav bineciyên Tirkiyê yên kurd da dida derbas kirin.

Di nava van şertan da, şuxulvanên Kurdan li welatên biyanî yên bêtir dûrdîtî bangî Kurdan dikir ku yekîtiyê çêkin bona ku dijî desîseyên empêryalîzmê li Rojhilata Navîn derkevin, bona azakirina gelê kurd ji zordestên welatên derve û yên cî. "Banga ber bi Kurdan" ku di gulana 1956 da Komîteya Kurdan li Ewropayê pê pêş da hat hêjayî guhdariyê ye. Em wê bangê bi temamî li jêr tînin :

"Hemû Kurdên welatparêz dibînin ku milletê kurd di nava rewşeke çiqas xerab da ye. Kurdistan bi destê zorê hatiye perçe kirin : Kurdan dîsa dizêrînin û li dû wan digerin; ew ji mafên siyasî û çandî yên biçûktirîn hatine mehrûm kirin; herdem siyaseta êşkencekirin û helandinê di hindava Kurdan da tê pêk anîn - ev hemû nikare berxweketina gel, ku ji bona wê tradîsyonên şoreşgeriyê û têkoşîna millî beha ne, pêş da neyne".

"Rewşa Kurdistanê nuha guheriye. Kemala Kurdistanê ya stratêjîk û dewlemendiya binerdê wê ji alîkî, bihêzbûna şerkariya azadariyê li navça Rohilata Navîn û pevgirêdanên wê yên dîrokî tevî Kurdistanê ji aliyê mayîn va, wê navçeyê dikin wargeke gelek giring".

"Empêryalîzm destên xwe danîne ser dewlemendiya welêt û tebiya wî ya stratêjîk bona ku armancên xwe bi kar bîne. Ew helanan dide Kurdan ku rabin dijî cîranên xwe û dicedîne ku sebebê rewşa wan a hergav pîs, ku tê da ew bixwe gunehkar û sûckar e, ji ber ku empêryalîst e û dijminê gelan e, binperde bike".

"Kurd tê digihîjin ku bextê wan bi bext û qederê cîranên wan va girêdayî ye, loma jî daxwaziya wan a herdemî ew mehkemebûna dostiyê û hevrakarkirina her du aliyan di navbera hemû hêzên dêmokratîk ên gelên tirk, ereb û faris da ye. Dîrokê borc daniye ser merivên pêşverû û gelên Rohilata Navîn ku alîkariya şerkariya Kurdan a azadariyê bikin, lê bextê Kurdistanê di destê Kurdan bixwe da ye".

Institut kurde de Paris

Ji ruyê peygerîn, tenêkirin (izolekirin) û nexwendîtiyê, usa jî nezaniya pirsa Kurdan, piraniya Kurdan nizanin ku riya xelasbûna wan kîjan e û nizanin ewê înk û eynata xwe, ku di nava giyana wan da bi salan berhev bûye, çawa bi kar bînin bona hêza xwe bikin yek, ji bo ku derbeke xedar bigihînin dijminên gelê kurd û peymanên wek yên Saadabad û Bexdadê".

"Bi vî awayî, bona Kurdan, weke av û hewa, siyaseteke yekbûyî ku divê li ser gel hîm bibe lazim e, û ew siyaset gotî ji aliyê rêxistinên Kurdan ên cihê-cihê û kesên zane bê amade kirin. Ev hemû bona dîroka Kurdistanê gelek giring in".

"Em, koma Kurdên Ewropayê, hêviya xwe datînin ser gelê xwe û alîkariya cîranên we yên qenc, pêşniyar dikin ku kongreya Kurdan a millî, ku hemû rêxistinên Kurdan, komeleyên çandî û welatparêzên Kurdan ên bi nav û deng divên tevî wê bibin, derbaskin. Li kongrê dikarin pirsa di derheqa amadekirina siyaseta tomerî da enene bikin û divê Kurd şervaniyê bikin bona ku ew di nava jiyanê da bê pêk anîn".

"Em bi dil û can bi wê yekê bawer in ku derbaskirina kongreya Kurdan, kîjan gotî usa jî siyaseta hemkurdiyê amade bike, ewê emekeke mezin be di nava karê azakirin û yekbûna Kurdistanê da û ewê derbeke xedar bigihîne empêryalîzmê. Kongre ewê gelek kardar be di karê mehkemekirina dostî û biratiyê di navbera Kurdan û cîranên wan da".

"Kongre, bilî nîşandana armancên tomerî, ewê planên pratîk amade bike bona parastina hebûna milletê kurd, ji bo nimûnê ziman û edebiyat. Ewê bibe dengdara Kurdistanê li hemû cihanê".

"Em eynî bangî ji hemû welatparêzên Kurdan ra dikin ku dest bi sazkirina komiteya tedarukdîtinê bikin ji aliyê derbaskirina kongreya Kurdan a millî; komite ewê pirsa cî û dema derbaskirina kongrê nîşan bide, ewê propaganda bide derbas kirin û belgokan belav bike, ewê dawetnaman ji tevgelên kongrê ra bişîne. Bi kurtî, ewê bibe komiteya tedarukdîtinê bona teşkîlkirina kongreya Kurdan".

Institut kurde de Paris

"Bijî kongreya Kurdan a millî, bijî Kurdistana aza"! (162, r. 55-56).

Rêxistinên welatên derve yên pêşverû ji bo parastina Kurdên Tirkiyê pêş da hatin. Ewha, kongreya 5mîn a "Yekîtiya xwendevanên navneteweyî" ku di îlona 1958 da hate derbas kirin, di derheqa pirsa Kurdan da biryarek qebûl kir. Di wê biryarê da wê siyaseta hukûmeta Tirkiyê ya rêaksyonêr di hindava Kurdan da rexne kir, usa jî piştgiriya mafên 5 milyon Kurd, ku şerkariyê bona naskirina mafên gelî dikin, kir (173, r. 16).

Nûnerên rewşenbîrên Kurdan di şertên Tirkiyê yên giran da, di salên pey şerrê pêşîn da hêzên xwe kirin yek bona ku guhdariya cihanê deynin ser problêma wilayetên rohilatê, ango pirsa Kurdan a millî. Ewha, di sala 1948 da, di meha tîrmehê da, welatparêzê kurd Mûsa Enter (Şêxmûs Yılmaz) dest pê kir kovara "Serkaniya Diclê" (Dicle kaynağı) biweşîne û nûnerên rewşenbîrên kurd û xwendevanan li dora xwe bicivîne. Kovarê di sînorên zagonê da dest bi enenekirina "problêma Rohilatê" kir, di derheqa bîr û baweriyên bona pirsa pêşdaçûyîna wilayetên rohilatê da dinivîsî. Di çileya paşîn 1950 da, kovara bi wî awayî "Kovara Rohilat" jî derket. Lê di wê derecê da, rojnama "Wetenê pêşverû" (Ileri Yurt) ku di payîza 1958 da li Diyarbekirê hate weşandin roleke giringtir lîst. Rojname bona pêşdaçûyîna Rohilatê, çêkirina nexweşxanan, dibistanan, riyan û tiştên mayîn pêş da dihat (166, r. 112).

Girtina Mûsa Enter bona propagandakirina "kurdîzmê" bû sebebê protêstoyên mexlûqetiya Kurdan û vê yekê di hêla siyasî da gelek deng da. Ji ruyê protêstoyên herroj Mûsa Enter hat berdan. Ew ne tenê destanîna welatparêzên Kurdan bû, lê ew usa jî biserketina hemû hêzên welêt ên dêmokratîk bû, ji ber ku berî wî tu kesê ku bi gunehkarkirina "kurdîzmê" hatibû girtin ji hebsê sax û silamet venedigeriya. Mexlûqetiya Kurdan de'w dikir ku dîwana Tirkiyê ku mafên Kurdan ên millî inkar dike, di navbera Kurdan û Tirkan da dijminayiyê pêş da tîne, dev ji siyaseta helandinê berde, lê usa jî riyên safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê bibîne.

Lê dîwana Tirkiyê nikaribû demeke dirêj "sebra" xwe bona wê karkirina Kurdan bîne, nenihêrî ku ew di nava sînorê zagonê da dibû. Di 17 çileya pêşîn 1959 da, wan 49 nûnerên rewşenbîrên Kurdan girtin, di wê jimarê da herweha xwendekarên zanîngehan jî hebûn. Nenihêrî dizîbûna wan girtinan û qedexekirina weşanan, girtina nûnerên rewşenbîrên kurd, çawa li Kurdistana Tirkiyê usa jî li welatên derve berk hate gunehkar kirin.

Serek C. Bayar û wezîrê karên hundirî Namık Gedik, ku dicedand bi awakî ew xweserîtiya dîwana Tirkiyê şirove bikin, îlan kir ku welatparêzên kurd bona "karkirina komunîzmê" ku bi zagona welêt hatiye qedexe kirin hatine girtin.

Hukûmeta Tirkiyê bang-gaziyên mexlûqetiyê li bendî tiştekî hesab ne dikir û siyaseta xwe ya hundirî ku bû sebebeke xurtkirina hişkiya siyasî li welêt dijî milletiyê berdewam dikir.

Di behara 1960 da, rewşa siyasî li Tirkiyê gelek sincirî. Genc û cahil dijî hukûmetê derdiketin û komên mexlûqetiyê yên cihê-cihê piştgiriya wan dikir. Li welêt krîza siyasî dihat xurt kirin. Bona ku pêşiya hişkbûna siyasî bigirin, di 27 gulan 1960 da, li Tirkiyê dewlet hate wergerandin û ji ruyê wê dîwan kete destê komên eskerî yên herî bilind, ên ku di nava Komiteya yekîtiya millî da (KYM) bûne yek. Temamiya dîwana zagondariyê û pêkanînê kete bin destê wê komitê. Bi bîr û baweriya endamên KYM, sebebeke wergerandina dewletê ew pirsa Kurdan, ku heyetiya wê bona dewletê qeziya pêş da dianî, bû **(139, r. 260–270)**.

Lê ji rojên serkarîkirina wê ya pêşîn, KYM dewsa ku guhdariya xwe ya sereke deyne ser safîkirina problêmên gihîştî, dest pê kir mecal qebûl bike bona pêşîgirtina her awayê nerazîbûnên bineciyên welêt ên kurd.

2. <u>Jimara Kurdan li Tirkiyê û rewşa wan a civakî-aborî</u>

Statîstîka Tirkiyê jimarên milletên biçûk li welêt rast nade : di nava bultenên (belgok) hesabkirina

bineciyan da pirsa di derheqa milletan da tu neye. Tê da dewsa wê pirsa di derheqa zimanê dê (zikmanî) da heye. Em wê jî bêjin ku di nava şertên Tirkiyê da gelek mecbûr dibin milletiya xwe veşêrin. Ev hemû me tîne ser wê baweriyê ku jimara bineciyên ne tirk li welêt hîn bêtir e û bi resmî nayê nîşan dan. Ji bo nimûnê, anegorî hesabkirina bineciyan a sala 1927 (bi nîşana zimanê dayikê), milletên biçûk li wilayeta Stembolê (Kurd û Çerkez pê ra) dikir 27,5%, lê yên ne musulman 31,14% **(41, r. 71)**. Ango, 3,69% bineciyên wê wilayetê yên ne musulman zimanê xwe yê dê kiriye tirkî. Ew nîşan dide ku tenê li wilayeta Stembolê weke 21.250 merivên ne tirk wek tirk hatine hesab kirin. Ango, hesabkirina bineciyan a bi nîşana zimanê dê jimara bineciyên ne tirk dide kêm kirin. Lê dîsa, ji ber ku zanînên di derheqa jimara bineciyan a rasttir tu nene, em di nava hesabkirinên xwe da li ser statîstîkên dêmografiyê yên resmî hîm būne.

Girêdayî wê yekê ku zanînên hesabkirina bineciyan ên dawîn ên resmî ne hatine weşandin, dema nîşandana teşkîla bineciyên Tirkiyê me nemaze zanînên hesabkirina bineciyan ên berê derbaskirî bi xwe ra wek esas û bingeh hildane.

Anegorî zanînên resmî, ji sala 1927 hetanî 1965 jimara Kurdan ji 1.184.000 bêtir bûye û gihîştiye 2.370.000, ango weke du caran. Lê em bawer in ku jimar ne rast in. Berî her tiştî, hesabkirina sala 1927 jî di şertên nezaniya gel da, ciyên jiyînê yên çiyayî û sebebên mayîn ne rast bû, gelek navçeyên Kurdan ne ketine nava hesabkirina bineciyan. Ewha, hesabkirina bineciyan a sala 1927 eyan kiriye ku li Dersîmê 270.000 binecî hebûn. Lê wê tenê bineciyên qezayên Xozat, Pertek, Çarsencaq, Nazimiye, Ovacix, Mezgirt û Çemîşkezekê hesab kirine, ango bineciyên merkezên qeza û eşîrên cîranên wan. Gelek Kurdên navçeyên Kîgî, Pulumur, Erzincan, Kemax, Kuruçay, Koçgirî, Dîvrigî û Koçxîsarê ne ketibûn nava wê jimarê. Loma jî dîwana Tirkiyê mecbûr bû xwe mukur bê ku di dawiya sala 1938 da tenê li Dersîmê 500.000 Kurd hebûn **(126, r. 59)**.

Institut kurde de Paris

Rewş bi wî awayî usa jî dema hesabkirina bineciyan a van salên dawîn bû. Êdî pey hesabkirina bineciyan a sala 1956, I. Beşikçi nivîsî ku vê demê zanînên rasteqîn di derheqa jimara eşîrên Kurdên ku li zozanên Anatolya Rohilatê koçer in tu nene. Û di wê yekê da tu tiştekî metelmayînê tu neye. Gilî ew e ku li Tirkiyê hesabkirina bineciyan herdem di meha oktobrê da hatine derbas kirin. Hema xût di wan deman da Kurdên koçer ji merkezên qezayan dûr diman, li bajarên mezin û wargên jiyînê jî Kurd pir nîn bûn û li konên xwe yên çiya diman. Loma jî ew qet ne diketin nava hesabkirina bineciyan, an jî ew dikirin nava bineciyên wargehên mayîn. Hela bi ser da, eşîrên Kurdan ên koçer li tu ciyî ne dihatin hesab hildan. Wek ku I. Beşikçi nîşan dide, li wilayeta Siirtê wî çend pirtûkên di derheqa hesabkirina koçeran da, ku tê da xuya dibe ku cara dawîn di sala 1940 da hesabkirina bineciyan di nava wan da derbas kiriye, dîtine. Li qumandariya cendirman, li serwêrtiya vêtêrînêran û ya saxlemîxwedîkirinê zanîn di derheqa jimara eşîrên Kurdên koçer hebûn, lê meriv li ser rastiya wan şikber e. Di vê derecê da, ew karmendên xwefiroş ên bertîlkirî, yên ku qestbende jimara koçeran da kêm kirin, roleke biçûk ne lîstiye.

Hewaskar e ku isbata ha nîşan bidin : anegorî hesabkirina bineciyan a sala 1965, li Tirkiyê 2.370.000 merivên ku zimanê xwe yê dê yê kurdî hesab kiriye (herweha di nava wan da zaza jî) diman. Tevî wê yekê, hema wê salê 410.000 wan gotî "Tirk" (ango, ew kesên ku zimanê xwe yê dê tirkî hesab kiriye) di bultenan da zimanê xwe yê duda kurdî hesab kiriye. Şikberî tu neye ku pareke wê cimeta Tirkan, ku li wilayetên rohilatê dimîne, herweha jî ew 100.000 gelên biçûk ên cihê-cihê, bi rastî jî zimanê kurdî dizanin. Lê dîsa jî em li ser wê baweriyê ne ku piraniya wan "Tirkan" bi rastî Kurd bûne, lê zimanê xwe yê dê tirkî hesab kiriye. Ew isbat jî me di nava wê yekê da dide bawer kirin ku weke 22.000 "Tirkên" wî awayî zimanê xwe yê duda ermenî hesab kiriye **(70, r. 116)**.

Ismail Beşikçi li ser wê baweriyê ye ku di sala 1969 da li Tirkiyê 4,5-5 milyon Kurd jîne **(121, r. 377)**. Ew bi heqî wan komên Tirkiyê yên serokatîkir, ên ku bi fehmberî dixwazin jimara Kurdan li welêt bidin kêm kirin, rexne dike. Tehlîla salixên di bin destê me da tîne ser wê baweriyê ku li dawiya salên 60 li Tirkiyê weke 6-7 milyon Kurd, ne kêmtir jî, jîne.

Pêwîst e bi xusûsî nîşan bidin ku, hela di salên 20 da, li gelek navçan Tirk piranî nîn bûn. Li wilayetên Tirkiyê yên Rohilat û başûrê rohilatê milletên biçûk dikir 15,3%, û 47% wan jî Kurd bûn. Ew şehadet dide ku Kurd li wan navçan bi kitle dijiyan. Hela bi ser da jî, li hinek wilayetan ew piranî bûn. Ewha, li wilayeta Wanê 77% Kurd bûn, li Bitlîs û Siirtê 75%, li Diyarbekir û Hekkariyê 69%, li Mêrdînê 61% û li Elazîzê 53%. Hetanî sala 1925, li vira Kurd bêtir bûn. Lê ji ruyê sirgûnkirina wan a bi destê zorê ber bi navçeyên roavayê ku komên Tirkiyê yên serokatîkir pey serhildana Şêx Seîd mîaser kiribûn, jimara Kurdan li navçeyên rohilatê û başûrê rohilatê gelek hat kurt kirin. Lê salên mayîn, nenihêrî mecalên dîwana Tirkiyê yên admînîstratîf û polîsî, li Anatolya Rohilatê jimara bineciyên ne tirk di nava jimara bineciyên welêt da xwezma jimara Kurdan dîsa pirr bû.

Hesabkirin didin nîşan dan ku li Anatolya Rohilatê û Başûrê Rohilatê milletên biçûk dikin 40% ji bineciyên welêt, ku ji wan 37% Kurd bûn.

Bi salixên wan lênihêrandinên ku fakulteya ilmên siyasî ya zanîngeha Ankarê derbas kirine, nûnerên dîwana Tirkiyê li gelek wilayetên rohilata welêt bi bineciyan ra bi destê wergervan dipeyivîn. Ew wilayetên Bingol, Mûş, Agirî, Bitlîs, Hekkarî, Mêrdîn û Wanê bûn **(201, 1968, N° 349, r. 14)**. Wek ku I. Beşikçi digot, ew eşîrên Kurdan, ku li dora deryaya Wanê û çiyayên başûrê rohilata welêt diman û koçer bûn, tenê bi kurdî zanîbû û weke 80-85% wan bi tirkî hîç nizanîbû **(201, 1967, N° 324, r. 16)**.

Bi vî awayî, Kurd li wilayetên rohilatê û başûrê

rohilatê bi kitle dijîtin, dîsa li ser urf û adetên xwe bûn, zimanê xwe diparast û dikarîbûn bi civakî-aborî, çandî û rûhanî pêş va biçûna. Lê komên Tirkiyê yên serokatîkir ên rêaksyonêr li ser riya pêşdaçûyîna Kurdan asêgeh çê dikirin û herdem maf û daxwaziyên gelê kurd ên azadîhez inkar dikirin.

Loma jî Kurdistana Tirkiyê wek berê navça Tirkiyê ya herî paşketî dima. Vê yekê hukm li ser pêşketina Tirkiyê bi temamî dikir. Tevî vê yekê, xusûsiyetên Kurdan di dereca civakî-aborî û çandî da, ku ji yên Tirkan dihatin cuda kirin, jî hebûn. Li Anatolya Rohilatê, weke 20% ji temamiya bineciyên welêt diman. Li vira, pirbûna bineciyan ji roavayê Tirkiyê kêmtir bû. Eger ew reqem di sala 1970 da li Tirkiyê 44 meriv li her kîlometreke çargoşe dikir, li Kurdistana Tirkiyê ew li ser hevdu 31 mirov dikir. Hindikbûna bineciyan, şûndamayîna aborî muhra xwe li ser wê yekê hişt ku her kes nikarîbû xebat peyda bikira. Ewha, eger li dawiya salên 60 li navçeyên mayîn li ser her mezîleke kîlometreke çargoşe weke 20 meriv di bêcerkirina erd da kar dikir, li Anatolya Rohilatê 10 meriv, ango du caran kêmtir, bûn. Divê bê nîşan dan ku li vira, ne li navçeyên welêt ên mayîn, binecî bêtir li hev zêde bûn. Loma jî em hindikbûna bineciyan dikarin tenê bi wê yekê va şirove bikin ku pareke bineciyan bar dikir, diçû wilayetên roavayê, xwezma bajaran. Bi salixên weşana Tirkiyê, li bajarên Tirkiyê yên merkezî 10% mihaciran ji wilayetên rohilatê bûn (201, 1968, Nº 331, r. 9).

Piraniya malên Kurdan li gundan diman. Eger li temamiya Tirkiyê 65% bineciyan gundî bûn, 35% jî bajarî bûn, lê li wilayetên rohilatê ew reqem dikir 73% û 27%. Kurd nemaze bi malhebûna gundîtiyê va mijûl dibûn. Bi çend salixan, 90% Kurdan di nava malhebûna gundîtiyê da kar dikir (201, 1968, r. 9). Çawa bona temamiya Tirkiyê, herweha bona Kurdistana Tirkiyê problêma herî giring ew pirsa erd bû. Rast e, cûrên karkirina bi kapîtalîstî li gundên Kurdan hela di salên 50 da hatin rikin kirin, lê

fêodalîzm hela wek berê dîsa mabû. Fêodalîzma paşketî ne dihişt ku navçeyên Kurdan bi aborî, civakî-siyasî û çandî pêş va herin, û wek yek alî komên Tirkiyê yên serokatîkir dikir ku gelê kurd di nava belengazî û sexîriyê da bihêlin, dibû asêgeh li ser riya bîr û baweriyên dêmokratîk û millî-niştimanwerî li Kurdistanê.

Li Anatolya Rohilatê hergav jî xwelî weke hev par ve ne dikir, piranîya mezîlên xweliyê di bin destên mirovên derebeg û dîndar, ango axa û şêxan, da bûn, loma jî gelek gundî bê xwelî diman. Anegorî lênihêranvanên (îzgerçî) Tirkan, di salên 60 da 33% ji xweliya çandinê li Anatolya Rohilatê di bin destê 2,4% malan da bûn, ew jî wê çaxê gava ku 38% malên gundiyan lap bê xwelî bûn **(121, r. 61)**. Li çend wilayetan %ê gundiyên bê xwelî bilindtir bû : ji bo nimûnê, li wilayeta Urfê 53%, Diyarbekirê 47%, Siirtê 42% **(135, r. 37)**.

Li wilayetên usa, wek Urfa, Mêrdîn û Gaziantep, di bin destê hinek kesan da hetanî 10-60 donum erd hebûn, lê bi deh hezaran gundî buhusteke xweliya wan jî tu nebû. Hela bi ser da, ne tenê mezîlên xweliya çandinê pirr di bin destê şêx û axa da bûn, lê usa jî gelek di bin qolê wan da bûn. Ewha, li qezayê Cizîrê ji 27 gund 23 di bin destê miroveki an jî malbatekê da bûn, li qezayê Nisêbînê ji 72 gund 56, li wilayeta Diyarbekirê 75 gund di bin destê mirovên şexsî da bûn, lê 175 gund jî di bin destê malbatan da bûn **(121, r. 62-63)**.

Tevî wê yekê, weke nîvê malên gundiyan kêmxwelî bû. Rewşa wan bi hindik tiştî va ji rewşa kesên bê xwelî dihat cuda kirin. Malên gundiyên kêmxwelî û bê xwelî dikir weke 83% ji hemû malên gundiyan. Em wê jî bêjin ku erdên herî baş, yên deşt û aranan, di bin destê milkedaran da bûn, lê erdê bi kevir-kuçik, dêm, xozan para gundiyan bû. Gundiyan pirr caran xweliya xwe bi cûrê kevnare - bi kotan û mêr-kulingan -diçand. Aleta wan a xebatê nemaze kotan bû. Di nîveka salên 60 da, li wilayetên rohilatê weke 400.000 kotan hebûn **(112, r. 137)**. Ew kara ku ji xweliyê dihat stendin têra abora

Institut kurde de Paris

rêcberan ne dikir, loma jî ew mecbûr dibûn ku karekî mayîn peyda bikin, an diçûn xulametiya milkedaran dikir, an jî bar dikir-diçûn. Gava gundî bi cûrê kirê li bal milkeradan kar dikir, ew êdî bi xwediyê xweliyê ra dihat girêdan. Milkedar, ku hema hema serokê dîwanê bû, li wargehê xwe çawa dixwest usa jî gundî dida xebatê. Mafê axa yê nenivîsar hebû ku gundiyê kirêkirî bê pere di nava xweliya xwe da bide xebatê. Carna rojê hertanî 15 saet kar dikir. Gundî jî ji tirsa ku ewê destê xwe ji xebatê bike, milkedar çi digot usa jî dikir.

Gundî ne tenê bi aborî bi şêx û axa girêdayî bûn, lê usa jî di hemû derecên jiyanê da. Ewha, dema hilbijartinan, milkedar bi isbat xwediyê dengê wan hemû gundiyên ku li bal wî kar dikir, ku ji tirsa ku ewê destê xwe ji xebatê bikin, dengê xwe dida wî kesê ku ji wan ra digot, bû.

Milkedarên Kurdan ji aliyê dîwana Tirkiyê û serekên rûhanî-şêxên ku di destê wan da carna bêhesab erd hebûn dihatin parastin.

Şêx û axa koma Kurdan a hukmdar hesab dibûn. Hebûna wan ji xweliya bin destê wan a pirr û xêra mirîdan dihat. Hukmê şêxan li ser gundiyên kurd bi qasî yê axa bû. Dîwana Tirkiyê bi her awayî piştgiriya wan dikir, ji ber ku wan siyaseta hukûmeta rêaksyonêr diparast, dijî her cûre de'wekariyên pêşverû û millî-dêmokratîk derdiketin.

Tevî vê yekê, li Kurdistana Tirkiyê pêwendiyên kapîtalîst dest pê kir pêş va biçin. Ew yek nîşan dida ku, mesele, hinek milkedarên xweliyê, ku li bajaran diman, êdî dibûn bûrjuwa : ew êdî xwedî otêl, dikan, sinetxane û fabrîkên biçûk bûn. Bi vî awayî, ew nûnerên serokatiya Kurdan dest pê kir ne tenê li gundan, lê usa jî li bajaran, kontrola deranîn û parvekirina tiştan bikin. Ji bo nimûnê, 70% fonda xweliyê para xudanên xweliyê ku li bajaran diman, ya ji çar wilayetan - Gaziantep, Urfa, Diyarbekir û Mêrdîn - diket. Lê ew dikir tenê 8% wan malên ku xwedî xwelî bûn. Bi tomerî hildayî, li Anatolya Rohilatê milkedar 5% bûn, lê

30% temamiya xwelya wê para welêt di bin destê wan da bûn (121, r. 64).

Tevî pêwendiyên kapîtalîst ku ketin gund, cûrê xebatê jî li Anatolya Rohilatê hinekî hate guhastin, bêtir makînên malhebûna gundîtiyê bi kar dianîn, traktor û komba êdî ketibûn nava deşt û beyaran. Tevî wê yekê, jimara kotanan û aletên malhebûna gundîtiyê yên prîmîtîf kêm dibû. Wan deman, li hinek navçan êdî bi cûrê hinartî av dida û xwelî qinyat dikir. Di salên 70 da, li bakurê welêt berhevkirina pembû, birinc, titun û hinekên din zêde bû. Lê ew zêdeyî guhartineke mezin ne kir nava xebata malhebûna gundîtiyê, xwezma li wan navçên ku hela bi kotanê kar dikir. Loma jî, rast e, li hinek malhebûnên mezin mêtodên kapîtalîst hatin rikin kirin, lê li ser piraniya erdê welêt dîsa jî bi cûrê kevnare kar dikir, ango gundî wek berê dihat kirê kirin û bona axayê xwe dixebitî, xweliya wî diçand.

Awayekî malhebûna gundîtiyê yê giring jî heywanxwedîkirin, ku 70% temamiya bineciyên Anatolya Rohilatê gîro bû, bû (201, 1968, N° 331, r. 9). Li wê navçê, 50% goşt (201, 1968, N° 331, r. 9), weke 20% şîr û 23% hiriyê welêt dida (167, r. 66). Lê heywanxwedîkirin li Anatolya Rohilatê bi cûrê tradîsyonêl dihat kirin, deranîna wê kêm bû.

Li Kurdistana Tirkiyê mecalên baş bona pêşketina sinaetê hene, ji ber ku li binerdê wê gelek zîv, sifir, krom, volfram, neft û tiştên mayîn hene (32, r. 66). Lê ew navçe bi pêşdaçûyîna xwe va ji navçeyên welêt ên mayîn gelek paş va dima. Li vira tenê 5,6% hemû fabrîkayên Tirkiyê yên sinaetê hebûn.

Di nava aboriya Anatolya Rohilatê da sinaeta derxistinê roleke mezin dilîst : merkezên neftderxistinê yên sereke, yên hesin û krom li vira bûn. Li ser çemê Feratê komplêksa hîdroênêrjiyê ya Kebanê, ku nemaze para welêt a roavayê bi ênêrjiya elektrîk va dida razî kirin, hat çê kirin.

Girêdayî pêşdaçûyîna sinaeta di nava jiyana mexlûqetiya Kurdan a civakî da, guhartin dihat texmîn kirin; li dawiya salên 60 tenê 4% bineciyên kurd di

Institut kurde de Paris

nava sinaetê da - di wê jimarê da di nava deranîna sinaetê da - kar dikir (201, 1968, N° 331, r. 9). Li ser hevdu, li wilayetên rohilatê, di nîveka salên 60 da 17.000 karker, ku 5% ji wan kesên ku li temamiya Tirkkiyê di nava sinaetê da kar dikir bûn, kar dikir. Lê êdî di sala 1970 da, jimara karkeran ji 102.000 derbastir dibû (111, r. 119). Nemaze ew karker di derecên sinaeta neftê, çiya-madeniyê, têkstîlê, şekir û çimentoyê da, usa jî li ser transporta xeta hesin û ereban, kar dikir.

Rewşa Kurdan a aborî a xerab bi bêmafî û mecbûriyeta wan va pîstir dibû. Dîwana cî, polîs û cendirme çi dixwest dikir, bi hovîtî ji heq-hesabên bineciyên kurd dihatin der.

Loma jî gelek Kurd bar dikir, diçûn bajaran, nemaze yên Anatolya Roavayê; lê li wira hem bona wan, hem jî bona gundiyên tirk her tişt beha bû, qewlên jiyînê xerab bûn, betalî û bêxebatî hebû û li wira jî mirovên sade bendî tişteki hesab ne dikir. Çûyîna mihaciran ber bi wilayetên roavayê pirsa bêbextiya welêt da tûj kirin. Tunebûna xebatê li Tirkiyê Kurd û karkerên tirk jî mecbûr kir ku herin welatên derve, ku belkî karekî peyda bikin. Tenê li Almanya Fêdêral 200.000 karkerên kurd hene (143, r. 135). Li vira Kurdan xebata herî dijwar û kêmmeaş dikir. Lê gilî ne tenê di wê yekê da ye. Wan, ku terka welatê xwe dikir, hinek ji wan mal, qewm û pismamên xwe dihiştin. Tevî zehmetiyên mayîn, tevayî bi moralî jî hukm li ser neferên malê dikirin, dibû sebebê nexweşiyên giran. Kurdistana Tirkiyê perça di hêla pêşketina xwe ya di dereca saxîxwedîkirinê, ronakiyê û çandî da ya herî paşdamayî bû. Di sala 1965 da, tenê 18% nexweşxanan û 15% ciyên paldana nexweşan ên welêt diketin para Rohilatê : li vira tenê 12% xuşkên doktoriyê û tenê 6% hemû bijîjşkên welêt kar dikir. Eger li temamiya Tirkiyê ji 6.900 mirov ra xuşkeke doktoriyê û ji 3.000 mirov ra bijîjşkek diket, ew jimar li Anatolya Rohilatê dikir anegorî 11.000 û 9.200 (201, 1968, N° 331, r. 10). Lê isbat şehadet dida ku ne tenê di derheqa qulixkirina

saxîxwedîkirinê ya sist li welêtda, lê usa jî di derheqa wê yekê da ku li navçeyên Kurdan, ne ku li temamiya Tirkiyê bi temamî hildayî, ew 2-3 car kêmtir bû. Di nîveka salên 60 da, dîwana Tirkiyê biryar kir ku li çend navçan, herweha li rohilata welêt jî, dest bi pêkanîna mecalên bona rakirina tirsa civakî, pakkirina sistema saxîxwedîkirinê bike. Li vira mecalên xusûsî hatin qebûl kirin. Ji bo nimûnê, "ocaxên saxîxwedîkirinê" hatin vekirin. Ocaxên usa li wilayetên Mûş, Wan, Hekkarî, Bitlîs, Qers, Agirî, Erzincan û Diyarbekirê hatin vekirin. Lê ev hemû rewşa saxîparastinê li rohilata welêt ne da pak kirin. Tunebûna jimara bijîşkan a pêwîst li wilayetên rohilatê gihand jihevbelavbûna nexweşiyên jihevhildanê, zêdekirina jimara miriyan di nava zarokan da **(231, 25.8.1979)**. Loma jî di nava zarokên ji yeksalî destpêkirî hetanî çar salî da, mirin gihîşt 55% **(171, r. 203)**. Dereca mirinê li çend wilayetên rohilatê, ne li wilayetên roavayê, bilindtir bû. Ewha, sala 1970, dereca mirinê li Anatolya Merkezî, Rohilat û Rohilata Başûr kir 18%, lê li navçeyên roavayê yên deryayên Ege û Marmara 13% **(40, 1973, r. 65-67)**.

Sebebên pir mirinê li Kurdistanê ne tenê tunebûna şertên saxiyê yên bingehî, ku gelek pêwistî doktoriyê bûn, bûn, lê usa jî şertên jiyînê yên gelek pîs bûn. Ne li hemû gundan elektrîk û xetlûla avê heye, gelek malên gundiyan li malên ji kevirê gicûce û heriyê çêkirî diman û jimara wan digihîşt 10-12 nefer.

Li Kurdistana Tirkiyê rewş di dereca xwendinê da jî ne baş bû. Dîwanên Tirkiyê, ku siyaseta helandinê derbas dikir, qedexe kiribû ku Kurd dibistanên millî vekin. Loma jî jimara mirovên nexwendî li vira ji roavaya Tirkiyê bêtir bû. Ewha, eger li dawiya salên 60 jimara mirovên nexwenda li welêt bi tomerî hildayî dikir 52%, li Anatolya Rohilatê ew dikir 72%, lê li hin wilayetan ew digihîşt hetanî 90% jî **(121, r. 131)**.

Sebebeke dereca xwendinê ya nizm di nava Kurdan da ew kêmbûna jimara dibistan û mamosteyan di

nava Kurdan da bû. Ewha, sala 1963, li temamiya Anatolya Rohilatê serhevdu 2.980 dibistanên destpêkê û 77 jî yên navîn hebûn.

Piraniya dibistanan ne anegorî şertên demê bûn : demûdezgên pêwîst bona ku mamoste li dibistanan ders li ser dereca bilind bidin tu nebûn, ew mecal têrê ne dikir. Dersdayîn li dibistanan bi zimanê tirkî dihat derbas kirin.

Temamiya merhela hînkirinê li dibistanên tirkî bona armancekê bû : zarokên Kurdan bihelînin, wan bi giyana nasyonalîzma Tirkan terbiye bikin. Ewha, di bernama dibistana destpêkê da çi dihat gotin : "Mamosta divê ne tenê dersan bide. Ji bo nimûnê, mamosteyê dîrokê divê guhdariyê deyne ser hal û demên milletê tirk ên hukumdariyê, ku ji demên kevnare tên. Divê ew belavbûna çanda wî li ser gelên bindest nîşan bide, usa jî bêje, ku Tirkan ji wan ra jiyana bextewar aniye" **(222, 1978, NI, r. 29)**. Pirtûk û defterên bona dibistanên destpêkê û yên navîn li ser bingeha antî-zanîn û şovînîzmê dihatin amade kirin.

Dîwana Tirkiyê "guhdarî" datanî ser pirsa amadekirina mamosteyên bona wilayetên rohilatê. Mamosteyên kurd, ku diplomên mamostetiyê distendin, bona xebatê ew dişandin wilayetên welêt ên roavayê, lê nûnerên milletê tirk bixwe dişandin Anatolya Rohilatê. Generalê ordiya Tirkiyê, Kenan Esengin, ku ji navên komên şovînîst ên pêş da dihat, di pirtûka xwe "Pirsa kurdîzmê" da nivîsiye ku divê nehêlin ku Kurd li dibistanên Anatolya Rohilatê dersan bidin. Bi bîr û baweriya wî, divê "wî karî bidin mamosteyên herî hişyar, dersbêj û terbiyetdarên ji wilayetên mayîn" **(127, r. 163)**.

Kar bi van bang û gaziyan va xelas ne bû. Rêaksyona Tirkan, ku idareyên xwendinê xistibûn bin destên xwe, bi alîkariya polîs û komikên faşîst ên cihê-cihê bi hovîtî ew hemû diyarbûnên ku di nava şagirtên Kurdan da pêş da dihatin difetisandin. Ew digirtin û li wan dixist, ji dibistan û zanîngehan derdixistin û radiqetandin.

Bi vî awayî, rast e, hinek pêşketin di dereca aboriyê da xuya dibû. Saxîxwedîkirin, xwendin û çand hinek pêş da çûbûn, lê Kurdistana Tirkiyê di salên 60 da dîsa gelek şûn da mabû û kitleyên Kurdan di hêla maddî û rûhanî da pirr mehrûm û belengaz bûn.

### 3. Siyaseta dewleta Tirkiyê di pirsa Kurdan da, pey wergerandina eskerî ya 1960

Wergerandina dewletê ya 27 gulan 1960 hêviya mexlûqetiya welêt a pêşverû, hêzên Kurdistana Tirkiyê yên dêmokratîk ne anîn serî. Rast e, dû wergerandinê ra gelek girtiyên hebsan hatin berdan. Lê nûnerên rewşenbîr ên Kurdan, ku hatibûn girtin, bi gunehkariya "di nava karkirina usa ku dijî dewletê ne" da di girtîxanan da man. Hela bi ser da, di 31 gulan 1960 da, weşana Tirkiyê agahdariyeke heyecanê weşand. Anegorî wê agahdariyê, giva dokumentên usa ketine destê Komîta Yekîtiya Millî (KYM) ku şehadet didin ku hinek endamên Partiya Dêmokrasiyê (PD) yên ji text avêtî dixwest ku dewleta Kurdistanê saz bikin. Tevî wê yekê, xuya dibû ku hukûmeta PD dijî wê yekê derneketiye, usa jî pêşiya wê propagandayê lawê Şêx Seîd, ku bi cîpa xwe li gundan digeriya û helan dida gundiyan, ne girtiye. Hukûmeta nuh "karên dijî dewletê" qedexe kirin û dicedand ku Kurdên ku "dixwazin welat perçe bikin" bi temamî îzole bike. "Ew yek, ku Tirkiya yekîtî ya Tirkan e, divê bixin serê wan hinek kesên ku tiştên mayîn dixwazin" - agahdarî ewha xelas dibû - **(143, 5.1.1960)**.

Rojên pey wergerandina dewletê yên pêşîn ra, nivîskarê pêşverû Yaşar Kemal çend caran bi serokên Tirkiyê ra rûnişt. Qisên wan nîşan da ku serokên Tirkan di pirsa Kurdan da xwe bi tebiya rasîsmê girtiye **(146, r. 109)**.

Dîwana nuh dest pê kir Kurdan bi kitle bizêrîne. Di 1 hezîran 1960 da, wan 485 Kurd girtin û ew xistin girtîgeha Sîvasê ya xusûsî **(121, r. 328)**. Em dikarin bi pêşdahatin, peyvên dema pey wergerandina

eskerî ra di derheqa siyaseta serokên Tirkiyê yên nuh di hindava pirsa Kurdan da tê derxin. Ewha, serokê dewletê C. Gürsel, ku di 24 oktobr 1960 da li Diyarbekirê peyivî, Ziya Gökalp (ku bi eslê xwe va Kurd e), ku daxwaziyên Kurdan bendî tiştekî hesab ne kiribûn û dema heja Kemaliyan bû alîgirekî propaganda panturkîzmê yê erhede, parast. Gava ew di derheqa pirsa Kurdan da peyivî, nîşan da : "Kurd tu nene, gişk Tirk in. Ew kesên ku dixwazin me perçe bikin, ew neyartiyê dikin ... Ew xweliya (qesda wî Diyarbekir e - M.H.) ku Ziya Gökalp li ruyê dinê xistiye nikare axa Kurdan be. Ne tenê li vira, lê li temamiya rohilatê Tirk dijîn" (209, 25.7.1960).

Weşana Tirkiyê jî piştgiriya gotinên ewha dikir. Ewha, rojnama "Yeni Gün" di 28 oktobr 1960 da nivîsî : "Em mirovên usa ku xwe Kurd dihesibînin nas nakin. Hemû bajarvanên Tirkiyê Tirk in".

Di meha îlonê da, endamê KYM, serhing Küçük, û di meha oktobr 1960 da wezîrê karên hundirî yê hukûmeta we'delî, general Kızıloğlu, çûn wilayetên welêt ên Kurdan. Pey wê yekê ra, wan rapor raberî KYM kirin û tê da agahdarî da ku bineciyên navçeyên rohilatê xwedê giravî peymana dizî tevî Kurdên Îran, Iraq û Sûriyê girêdaye bona sazkirina Komara Kurdan (215, 1961, hejmar 7)8, rûpel 40).

Di 17 oktobr 1960 da, Komîta Yekîtiya Millî, wek serdazêdekirina zagon N° 2510 (zagona di derheqa mihaciriyê da), zagon N° 105 ku li gora wê malên Kurdan ên ne bi dilê hukûmetê bi destê zorê ji ciyên wan ên kal-bavan dihatin raqetandin û şandin bo navçeyên Tirkiyê yên mayîn, qebûl kir. Di nava zagonê da dihat gotin ku ew kesên ku hissên olî-dîndarî, urf-adet an jî "bîr-baweriya biyanî, qewat û zordariyê bi kar tînin û dixwazin bi wê yekê va tesîra xwe li ser hinekan bi kar bînin, usa jî bineciyan ditirsînin û dixwazin rehetiya wê navçeya ku ew tê da dijîn biteribînin an jî şerpeze bikin ..., ew karekî usa dikin ku ziyan û zerer bona kara millî tînin û dikarin bi pêşniyara Şêwra wezîran û bi biryara wezareta karên hundirî wan sirgûnî

navçeyên welêt ên cihê-cihê bikin û izn nedin ku ew vegerin wargehên xwe yên jiyînê yên berê" (miqal D (121, r. 333).

Anegorî wê zagonê, Wezareta karên hundirî belgok ji waliyên wilayetên rohilatê ra şand û tê da de'w dikir ku wan kesên ku "karê casûsiyê dikin" li ber çavê xwe hildin.

Anegorî dîtina resmî, zagon N° 105 giva hatibû qebûl kirin bi meremê "pêkanîna çend rêformên xusûsî, ji binî va rakirina qeydê sedsalên navîn li Tirkiyê, hilanîna tesîra axa û şêxan, nîşandayîna hêza dewletê ..., usa jî bona wê yekê pêşiya zêrandinê û paşdamayînê bigrin ..." (128, 23.10.1960).

Pey wê durûtiya bê şerm a "xemxuriya di derheqa bajarvanan da" ra, wezîrê karên hundirî Kızıloğlu bi altindarî îlan kir : "Nuha ne şêx, ne axa, ne jî serekeşîr hene ... Ez bi şêxan ra peyivîm. Ew mirovên usa ne ku musulmaniyê nizanin. Ew ne şêx in, lê lêpok û kelegoz in. Bi dînê musulmaniyê tukes nikare di navbera xwedê üû xulamê wî da bisekine. Ew yek tenê dikare li bal xaçparêzan biqewime ... Hevalno, nebin çekê destê wan navçîgaran. Hukûmeta şoreşgeriyê ewê dijî wan mecalên herî berk qebûl bike" (237, 22.11.1960). Û hukûmeta Gürsel jî dest pê kir wan mecalên heyî miaser bike.

Anegorî zagon N° 105 a çileya pêşîn 1961, 55 Kurdên bi nav û deng ên ji girtîgeha Sîvasê ji wilayetên rohilatê sirgûnî roavayê (Antalya, Burdur, Izmir, Muğla, Afyon, Isparta, Manis, Çorum, Denizli ...) kirin (192, 1973, N° 4, r. 96). Divê bê nîşan dan ku gelek Kurdên sirgûnkirî ne şêx û axayên eşîran bûn. Ew nemaze mîlîtanên Kurdan ên bi nav û deng bûn, ku hukmê wan li ser bineciyên kurd ên Kurdistana Tirkiye û Ermenistana Roavayê hebû (40).

Ji Kurdên sirgûnkirî 54 endamên Partiya Dêmokrasiyê bûn, yek jî endamê Partiya Komarî ya gundiyan a millî bû (240, 1962, N° 4, r. 10). Ev isbat şehadet dide ku berê her tiştî ew rola ku serokatiya Kurdan

a fêodal di dema serkarîkirina Partiya Dêmokrasiyê da lîst gelek giring e. Ew rol giring bû usa jî bona pevgirêdanên xurt tevî partiyên cihê-cihê, ya duda jî ku sirgûnkirina mîlîtanên Kurdan ên bi nav û deng ne tenê bi sebebên civakî-aborî bûn, lê bêtir siyasî bûn. Komîta yekîtiya millî ku tesîra partiya Gel-Komarî li ser gelekan hebû, bi wê mecalê dicedand ku ne tenê şerkariya Kurdan bê serî bike, lê usa jî dixwest hukmê Partiya Dêmokrasiyê li navçeyên Kurdan bide hildan.

Di 27 oktobr 1960 da, KYM zagon N° 114, ku li gora wê pareke profêsor û rêktoran bona karê sazkirina Kurdistana serbest dihat gunehkar kirin û ji zanîngehên welêt hatin derxistin, qebûl kir **(215, 1961, N° 7-8, r. 40)**.

Di nava koma "49" da usa jî rojnamevan Ebdulrehman Efemdolek ku li Diyarbekirê rojnama "Ileri Yurt" diweşand hebû. Ew bi 17 "suc" dihat gunehkar kirin. Rojnama "Yeni Sabah" ku li Stembolê ronahî didît, rûpeleke "Ileri Yurt" bi fotokopî, bi helbesta kurdî va çap kir û de'w dikir ku "gunehkarên wan sûcan" berk ceza bikin. "Sûckar" hat girtin. Lê ji ber ku gelek avukatên kurd hatin Diyarbekirê bona ku wî biparêzin, wê çaxê ew hat berdan. Lê paşdemê polîsê Tirkiyê careke din ew tevî çend mîlîtanên kurd ên bi nav û deng girt **(41)**.

Rêxistinên Kurdan ên welatên derve dijî girtina wan derketin. Ji bo nimûnê, di 2 çileya paşîn 1961 da Komela Xwendekaranî Kurd li Ewropayê li ser navê C. Gürsel têlêgrama protêstokirinê, ku dijî girtina mîlîtanên Kurdan bû, şand. Lê di 15 çileya paşîn da, wê komelê ji serokê dewleta Tirkiyê ra bang şand û tê da de'w dikir ku hemû mîlîtanên siyasî berdin û otonomiya Kurdistanê di nava sînorên Komara Tirkiyê da nas bikin **(215, 1961, N° 7-8, r. 41)**.

Lê komên Tirkiyê yên serkarîkir ew de'wkariyên heq bendî tiştekî hesab ne kirin. Nexwestina hukûmetê, ku li ser bingeha heqî bi safîkirina pirsa Kurdan va mijûl bibe, xweserîtiya dîwana cî hêrsa bineciyên kurd ên ku protêstoyên mezin kirin,

rakir. Di destpêka sala 1961 da, dest bi karê wan gotî Mêrdînê bû. Wê çaxê , ji bo ku eskerek sîleyekê dabû bineciyê Mêrdînê, temamiya bajêr di nava çend saetan da bû meydana şerr : eskeran gulle dikirin, lê bineciyan kevir û dar kewkî dikirin. Tenê pey hatina pareskerên suwarî û tankan li dîwanê ra, li hev hat bineciyên bajêr bê çek "rehet" bike. Kurdên Wan, Bitlîs, Diyarbekir, Sîwerek û Urfê hatibûn hawara Mêrdîniyan. Tevgera Kurdan li wan navçan ewqas bi k'el û bîn bû ku eskeran balafir dane xebatê (253, 1961, N° 5, r. 7).

Bi vî awayî "safîkirina" pirsa Kurdan bi hovîtî hincirandina serhildanên Kurdan ên salên 20-30 tîne bîra mirovan. Di gulana 1961 da li Bûrsê mehkema 8 Kurdan hat kirin. Ew ev kes bûn : Mehmûd Ertûş, Bala Qertel, Kinyaz Qertel, Xalit Qertel, Abdulbaqî Qertel, Ebûbekir Ertûş, Caftagizêr Qertel û Ebdulrehman Qereqûş, yên ku di nava jimara "55"an da hatibûn girtin û hela di sala 1960 da ew şandibûn Bûrsê. Ew di nava karkirina casûsiyê, ku dijî yekîtiya dewletê bû, da dihatin gunehkar kirin.

Tevî dîwana eskerî ya pelixandinê, zagon qebûl dikir ku diviya alî helandina milletên biçûk, herweha Kurdan jî, bike û diviya nehêle ku milletê wan pêş da here. Wek ku xuya ye, di Destûra Tirkiyê ya sala 1924 da unsurên rasîzmê ku milletên ne tirk ji zagonê der hesab dikirin hebûn. Dema amadekirina Destûra sala 1960, gelek aliyên dijî milletên biçûk ji Destûra komarê hatin derxistin. Ewha, dewsa gotinên "her Tirkek", her miqal bi van gotinan va dest pê dibû : "her bajarvanek ..." û t.m. Lê berî wê di komîsyona destûrê da bona wê yekê munaqeşeke zor bûbû.

Dema amadekirina projeya destûrê ya nuh, li komîsyona destûrê hucet diçû di navbera terefdarên nasyonalîzma Tirkan û dijên wan. Serokatiya komîsyonê profêsor Sadiq Sami Öner dikir. Di komîsyonê da hucet gelek gurr bû, xwezma dema enenekirina miqala di derheqa naskirina wekhevtiya hemû zimanan da. S. S. Öner bi wî awayî hesab dikir ku

xwedê giravî helan dida pêşdaçûyîna "Kurdîzmê". Lê endamê komîsyona destûrê, dîrokzanê navdar T. Z. Tuney, û alîgirên wî ku terefdarên wê miqalê bûn, li ser wê baweriyê bûn ku ew paşmayînên xerab, ku dikarin pirsa kurdî pêş da bînin, bi hêsanî dikarin bi miqalên destûrê yên mayîn va bidin hildan. Sedir S.S. Öner di derheqa van bîr û baweriyên alîgirên T.Z. Tuney da raberî Komîta Yekîtiya Millî kir. Loma jî KYM T.Z. Tuney û I. Giritli ji teşkîla Komîsyona destûrê derxistin (133, r. 379-380).

Dema enenekirina projeya destûrê, di civîna hîmdar da munaqeşeke bi k'el û bîn di derheqa wan pirsên ku ketibûn nava miqalên destûrê û ku tê da komên şovînîst dicedand ku bîn û boxsa destûrê ya berê ya milletçîtiyê biparêzin da, çû. Xwezma serokê hukûmeta Tirkiyê C. Gürsel ruhê projeya destûrê ya milletçîtiyê diparast : "Em divên ji filan an jî bêvan bîr û baweriya turkîzm û milletçîtiya xwe hunda nekin, em gotî culeta usa nekin. Werin em gotina "milletçîtî" bixin nava destûrê ... Gava li welêt bîr-baweriya turkîzmê ciyê xwe yê mehkem bigre, em dikarin wê gotinê derxin ... Hûn di derheqa wê şerkariyê da dizanin ku em dijî Kurdan dikin. Eger em dev ji milletçîtiyê berdin, gelo ewê bi ya me bikin ? Na, em divên li ser wê hîm bidin. Eger li welêt serokatîkirina normal bê testîq kirin, tu qeziya wê nabe. Em berî her tiştî milletê xwe bikin milletê tirk ... Tirkiye divê ya Tirkan be ... Eger em îro xwe ji vê yekê bidin paş, wê demê piştî 50 salan li Tirkiyê ewê tu Tirkek nemîne" (52, r. 1080). Loma jî ew yek ku dixwest xeysetê milletçîtiyê bidin destûra Tirkiya nuh, ew daxwaziya komên serkarîkir bû ku milletên biçûk di nav xwe da bihelînin, herweha Kurdan jî. Lê dîsa jî bi xudanên destûrê ra li hev hat ku projeya destûrê, ku serketina hêzên welêt ên dêmokratîk bû, ji unsurên rasîzmê biparêzin.

Di destûra sala 1961 da dereceke usa hebû ku di destûra sala 1924 da tu nebû û ku hema-hema heyetiya gelên ne tirk li welêt nas dikir. Ji bo

nimûnê, anegorî miqala 12, "hemû li ber zagonê wek hev in, bêy cudabûna ziman û milliyet, bêy hesabhildana bîr-baweriyê ya siyasî, dîndarî û olperestî" (54, r. 7).

Tevî wê yekê jî, sazkirên destûrê dixwest usa bidin nîşan dan ku li welêt tenê Tirk dijîn û loma jî gotina "Tirk" tim bi kar dianî. Bilî nûnerên wan gelan, ku bi zimanê turkofîl dipeyivîn, ew hemû gelên biçûk ên mayîn jî li ser Tirkan hesab dikir ku zimanên wan ne diket nava koma zimanên turkofîl. Ewha, di miqala 54 da ewha hatiye nivîsîn: "Her kesê ku bi têlên bajarvaniyê bi dewleta Tirkiyê ra hatiye girêdan Tirk e".

Ango, destûra sala 1961 jî ji unsurên şovînîzmê bê par nîn bû. Tê da milletçîtiya Tirkiyê ya burjuwa, ku îdêologên wê mafên milletên biçûk li Komara Tirkiyê inkar dikirin, jî hebû. Di derheqa wê yekê da ev miqalên destûrê yên jêrîn jî isbat bikin :

"Dîwana herî sereke bêy gilî-gotin a gelê tirk e ..." (miqal 4). "Her Tirkek dikare li idareke dewletê kar bike" (miqal 58). "Her Tirkekî ku 30 salên wî êdî temam bûne dikare wek parlementer bê hilbijartin ..." (miqal 68). "Her Tirkekî ku 40 saliya wî temam bûye û xwendina wî ya bilind heye dikare li sênatê bê bijartin" (miqal 72).

Di destûra sala 1961 da gelek derece, yên ku aşkere an jî ji binî va dijî milletên biçûk bûn û dijî safîkirina pirsa Kurdan bûn, hene. Ewha, tê da dihat gotin ku "dewleta Tirkiyê bi erd û milletê xwe va yek e û nayê perçe kirin ..." (miqal 3). Ew dida nîşan dan ku Kurdan ne tenê nikaribû bi erdê xwe va ji Tirkan biqetin, lê usa jî nikaribû bibin xwedî otonomiya millî di nava sînorên Komara Tirkiyê da.

Anegorî destûrê, li welêt izna her bajarvanekî heye ku aza ji cîkî here cîkî mayîn bijî. Lê ew azayî dikaribû bi zagonê bihata bisînor kirin, bona bêxofkirina "bêqeziyabûna millî û pêşîgirtina nexweşiyên jihevhildanê" (miqal 18). Komên Tirkiyê yên serkarîkir di bin wê behanê da di salên 20-30 da bi deh hezaran Kurd ji wilayetên rohilatê sirgûnî wilayetên roavayê kirin.

Destûra sala 1961 sazkirina partiyên siyasî, yên ku şerkarî bona razîkirina mafên gelên biçûk, herweha Kurdan jî, dikir, qedexe dikir. "Qanûnname, bername û karkirina partiyên siyasî - di **miqal 57** da dihat gotin - divên anegorî prensîpa neperçekirina dewletê û millet bûna ...".

Para **miqal 68** a duda jî mafên gelên biçûk kêm dikirin û li gora wê ew kesên ku bi tirkî nikarin bixwînin û binivîsin nikarin wek parlementer li meclisê bên hilbijartin.

Bi vî awayî, Destûra sala 1961, nenihêrî hinek aliyên wê yên pêşverû, asêgeh datanî ser riya bi dêmokrasî safîkirina pirsa Kurdan. Loma jî pey wergerandina dewletê ya sala 1960, Kurdan dest bi şerkariya xwe ya bona mafên gelî kir.

Rewşenbîrên kurd roleke mezin di nava şerkariya Kurdan a millî-azadariyê da, ku xebateke pirr di nava mehkemekirina xwefehmdariya millî da kir, bi rûhanî di pêşdaçûyîna gelê xwe da, lîzt. Nûnerên wan bi dijwariyeke mezin rojname û kovarên xwe derdixistin. Rast e, zemanê wan weşanan dirêj ne dikişand: gelek caran ew li ser hevdu çend meh derdiketin, carna jî kêmtir. Lê tesîra wan li ser jiyana Kurdan gelek bû. Di sala 1962 da, Mûsa Enter di rojnama "Barıs dunya" (Cihana aşîtiyê) da çend bendên di derheqa folklor (zargotin), ziman û edebiyata Kurdan da dane weşandin **(166, r. 114)**. Di nîsana 1963 da, komên kurdî dest pê kir li Stembolê bi zimanê kurdî û tirkî kovara hermehî "Deng" derxînin, rojnama "Riya nuh" çap kir. Hema jimarên wê yên pêşîn hêrsa Tirkan rakir û zûtirekê dîwanê ew da girtin. Di dawiya nîsanê-destpêka gulana 1963 da, berpirsiyarê kovara "Deng" Yaşar Kaya û xebatkarê wî Medet Serhan hatin girtin û ew di nava "belavkirina propaganda kurdayetiyê da" hatin gunehkar kirin.

Dawiya meha hezîranê, wezîrê karên hundirî Bêkata li Ankarê îlan kir ku organên bêqeziyabûnê rêxistina dizî diyar kiriye û 12 meriv girtine ji bo "karê kurdayetiyê" **(193, 29.6.1963)**. Girêdayî vê yekê, wezareta karên hundirî ji hemû waliyan ra bi lez

belgokek şand û tê da daxwazî dikir ku şerkariyan berk dijî "karkirina Kurdan a komunîstiyê" bikin û usa jî mehkema wan kesên ku di nava wî karî da şik li ser wan heye bidin lez kirin. Rojnama "Son haber" di hejmara xwe ya 1 tîrmeh 1963 da di derheqa wê yekê da îlan dike ku waliyan êdî bi nûnerên para qulixkirina bêqeziyabûnê û cendirman ra peyiviye û de'w ji wan kiriye ku peyketina mirovan bidin xurt kirin. Di çileya pêşîn 1963 da, mehkema barêgeha sereke ya eskerî dest bi mehkema 23 kesên ku piraniya wan di havîna 1963 da hatin girtin kiriye. Ew gişk di nava karê sazkirina Kurdistana serbest da dihatin gunehkar kirin. Di nava biryara dadxwaz da (prokuror) dihat gotin ku "hinek dewlet dixwazin ji bo kara xwe li Tirkiya Rohilatê tevhevbûna ku di navbera blokên roava û rohilatê da cîkî giring digre pêş da bînin", ku pirsa Kurdan li Tirkiyê "tam û temamî eserê karkirina komûnîzma navneteweyî ya casûsiyê ye". Di dawiya peyvê xwe da, dadxwaz de'w kir ku gunehkaran gulle bikin **(193, 18.12.1963)**. Di nava temamiya we'dê salên 60 da, nûnerên rewşenbîrên Kurdan digirtin û mehkema wan dikir. Divê bê nîşan dan ku dîwana Tirkiyê ku ji eşkeretiyê û gunehkarkirinên di nava şovînîzmê da ditirsiya, lê usa jî dicedand ku sebebên şerkariya Kurdan a millî bixwe veşêrin, ew hemû merhele li paş deriyê girtî derbas dikirin.

Hukûmeta Tirkiyê ku bi siyaseta dijî Kurdan va dihat serkarî kirin, bi pelixandinên hundirê welêt ra gavên anegor pêk dianîn bona koordînasyonkirina mecalan tevî dîwanên Îran û Iraqê ku bona hincirandina şerkariya Kurdan a azadariyê bûn **(224, 1971, N° 1, r. 3)**.

Bi agahdariya rojnama Qahirê "El-Heqaîq" ya 11 nîsan 1963, nûnerên Iraq, Tirkiye û Îranê li Bexdadê çend şêwrdarî dan derbas kirin û tê da karên eskerî hatin enene kirin bona hilanîna tevgera Kurdan. Di wan şêwrdariyan da zabitên wan her sê welatan ku hela dema serkarîkirina Qasim tevî şerrê dijî Kurdan bûbûn hazir bûn. Dema wan şêwrdariyan - rojnaman nivîsiye - peyman di derheqa



Institut Kurde de Paris

karên eskerî yên tevayî dijî Kurdên Kurdistana Iraqê û Kurdistana Tirkiyê hatiye girêdan, lê usa jî hatiye biryar kirin ku sînorên di navbera Îran, Iraq û Tirkiyê da bigrin.

Lê di destpêka havîna 1963 da, şêwra SENTO ya hertimî, ku berevî li Izmirê bûbû, plana êrîşa Tirkiye û Îranê dijî Kurdên Iraqê hazir kiribû. Ew plan bi firetî êrîşa li Kurdistana Iraqê "Piling" bi nav kir. Dema tedarukdîtina "Piling" hemû hûrgiliyên şerr hatibûn hesab hildan : pêwendiya dîplomatîk bona efûkirina êrîşê, agahdariya ku bi gelê Iraqê ra di derheqa meremên teribandina serbilindiya wê da, û usa jî karên eskerî yên hûrgilî, şirove dike. "Şerrê dijî Kurdan - kovara "Journal d'Egypte" nivîsî - ku li Qahirê ronayî dibîne, bi vî awayî ewê ji sînorên gelî derketa û bibûya pirsa navneteweyî. Endamên wê komikê dixwazin dîsa Iraqê bînin hêla xwe û ew pirsdanîn pirsa herî sereke di nava stratêjiya xwe da hesab dikir" **(104, r. 28)**.

Di derheqa rêaksyona Iraq û Tirkiyê dijî Kurdan da, balyozê Iraqê li Ankarê Xalit Mûşteg bêfesal, ango bêhemdî, xwe got (yanî ji devê wî çû). Di 12 tîrmeh 1963 da, wî nûnerê xwe yê weşanê agahdar kir ku hukûmetên Iraq û Tirkiyê mecalan hazir dikin bona ku tevayî serhildana Kurdên Iraqê bihincirînin **(216, 13.6.1963)**.

Xwemukurhatina vî awayî tirseke mezin kir dilê komên Tirkiyê yên serokatîkir û wezareta Tirkiyê ya karên derve agahdarî weşand û tê da "da ferih kirin" ku ew mecal bona parastina tixûban e. Lê agahdariya wezareta Tirkiyê ya karên derve wek ceribandineke bona şaşîtiya wan hevalbendên ku şerkariyê dijî tevrabûna Kurdan rast bike hate qebûl kirin.

Gavên komên Tirkiyê yên serkarîkir ên eskerî û dîplomatîk bi tirs dihatin qebûl kirin ku çawa bikin ji bo ku têkoşîna Kurdan a azadariyê li Tirkiyê belav nebe. Girêdayî vê yekê, gelek hewaskar e ew pêşnivîsara ku di rojnama Tirkiyê "Dunya" da hate çap kirin. Xudanê wê gotarê, Atay, ku bangî Îran û Tirkiyê dikir ku bibin yek dinivîsî : "Li ser

me tevan qeziyek heye. Ziyan û zerer dikare bigihîje me gişkan. Wek ku ji qewimandinên van dawiyan xuya dibe, qeder-bextek Îran, Iraq û Tirkiyê digihîne hev. Em mecbûr in bi hevra kar bikin" **(199, 19.6.1963)**. Û ew dewlet bi rastî jî bi hevdu ra kar kir bona hincirandina serhildana Kurdan a millî-azadariyê.

Di meha tebaxê da, rojnama lubnanî "Eş-şe'b" agahdarî di derheqa karkirina komên zabitên Tirkiye, Iraq û Îranê, ku hêzên xwe dicivandin ser hev ji bo ku dijî tevgera Kurdistana Iraqê derkevin, da weşand. Wek ku rojnama Lubnanê nîşan dida, wan koman tevî barêgeha Iraqê planên xwe çê dikirin ku dijî Kurdan şerr bikin. Wan pevgirêdanên radyoyê yên rast tevî qumandarên pareskerên ordiya Tirkiyê, ku berevî ser sînorê Iraq-Tirkiyê bûbûn, saz kiribûn. Rojname nîşan dida ku balafirên Tirkiyê ne tenê li ser navçeyên Iraqê yên bakur firînên casûsiyê dikirin, lê usa jî tevî hêzên Iraqê yên hewa bi wan bombeyên napalm wargehên Kurdan ên jiyînê, ku Tirkiyê bi riya SENTO stendibûn û dabûn hêzên Iraqê yên çekdar, bombebaran dikirin **(182, 28.8.1963)**.

Isbatên mayîn jî, ku di weşana Ereban da hatibûn çap kirin, testîq dikir ku hêzên Tirkiyê yên çekdar tevî hincirandina tevrabûna li Iraqa Bakur bûbûn. Ev hemû careke din nîşan dida ku sebebeke sazkirina bloka eskerî ya SENTO ew bû ku serhildananên gelên Rohilata Nêzîk û Navîn bihincirînin.

Lê ne mecalên zêrandinê yên bi hovîtî, ne karên cezakirinê yên hevraqyilkirî, ku Tirkiye, Îran û Iraqê dijî Kurdan bi kar dianîn, nikaribû tevrabûna Kurdan a millî ku di nîveka salên 60 da gumrehtir bû bidin sekinandin.

## 4. <u>Xurtbûna şerkariya Kurdan di nîveka salên 60 ya duda da</u>

Di nîveka salên 60 da, tevrabûna Kurdan bi hêzeke nuh va pêş da çû. Ew êdî bi cûrê nuh pêşdaçûyîna xwe berdewam dikir. Nûnerên rewşenbîrên Kurdan tevî karkirina xwe ya dizî (ji bo nimûnê, sazkirina rêxistinên xewle) dest pê kir li cûrê şerkariyê yê

Institut kurde de Paris

nuh yê lêgal yê bi dilê gelê kurd bigerin. Cûrekî şerkariyê yê nuh ew mîtîngên li navçeyên Kurdan ku li bin slogana bi xeysetê burjuwazî-dêmokrasiyê derbas dibûn bûn.

Di mîtîngên salên 60 da, li wilayetên rohilatê ev slogan dihatin bilind kirin : "Bineciyên Rohilatê ! Dengê xwe bilind bike bona naskirina mafên xwe yên zagonî !". "Armanca me parastina biratiyê, wekhevtiyê û bextewariyê !". "Em alîkar û terefdarên wan hemû gelên ku dijî faşîzmê û empêryalîzmê şer dikin in !". "Ji me ra ne cendirme, lê mamosta pêwîst in !". "Em dibistanan dixwazin, ne qereqolên cendirman !". "Bineciyê Rohilatê ewê ji sedî sed bigihîje naskirina mafên xwe yên mirovî û bajarvanî !". "Plana pêncsaliyê vir-derew e ! Bineciyê Rohilatê, hişyar be !". "Em jiyana aza, şexsiyet û xwendina aza dixwazin !" **(201, 1968, N° 331, r. 115)**.

Serecem naveroka wan sloganan di derheqa wê yekê da dibêjin ku teşkîldarên mîtîngan ne ku de'w dikir ku ji Tirkiyê veqetin, lê kefîltiya parastina mafên xwe anegorî qanûna bingehî, hilanîna ferqan di navbera roava û rohilatê di dereca aborî da, pêşdaçûyîna hemû aliyên jiyana Kurdan a aborî û mexlûqetî dixwestin.

Institut Kurde de Paris

Gelek axaftinker jî di nava peyvên xwe da di derheqa wê yekê da digot. Hela bi ser da, gelek ji wan berbirîbûna civakî, dema derketina tebiyên komên cihê-cihê di hindava pirsa Kurdan da, diyar dikir. Ewha, tevgelekî mîtîngê, ku di derheqa agahdariya ku fêodalê Kurdan ê mezin ê ji wilayeta Agirî, Qasim Kufreqî, ku li meclisê kiriye da peyivî : "Qasim Kufrewî ji dika meclisê îlan kir ku pirsa newekhevtiya di navbera Roava û Rohilatê da tu neye. Agahdariya Qasim Kufrewî divê hema usa bûya ... Wî tucar ne xwestiye ku qanûnên nuha bên guherandin, ji ber ku ew hemû tiştên ku ev gelê belengaz ji xwe dibire û ji şêx û axayên "xwe ra" dişîne, Qasim Kufrewî li Ankara, Stembol û Parîsê xerc dike ... Loma jî, bi baweriya wî, di navbera roava û rohilata welêt da tu ferq tu neye" **(201, 1968, N° 310, r. 10)**.

Peyvê Qasim Kufrewî li meclisê careke din isbat kir ku pevgirêdan û danûstendin di navbera derebegên Kurdan û civakên Tirkiyê yên hukumdar da : burjuwa û milkedaran, hene. Lê pêwîst e em nîşan bidin ku fêodalên Kurdan jî tevî gelek mîtîngan dibûn (ji bo nimûnê, Yusuf Azizoğlu, û xwezma Ihsan Azizoğlu, xwediyê (muxtar) gelek gundên Sîlwanê, li wilayeta Diyarbekirê).

Li mîtîngan guhdariyeke mezin datanî ser 55 lîderên Kurdan ku sirgûnî navçeyên welêt ên roavayê kiribûn. Di nava peyvan da xuya dibû ku sirgûnkirina wan bi behana berxwederxistî hatiye pêk anîn, giva boy navê ku gundiyan zordestiya derebegên Kurdan biparêzin, usa jî bona derbaskirina rêforma xweliyê. Girêdayî vê yekê, gelek caran ew gotinên serokekî Kurdan, Ali Bucak, ku sirgûn bûye diwekilandin : "Gava em di derheqa rêforma xweliyê da dipeyivin, di derheqa heqiya civakî da gilî tê ortê, wê demê em çima Qasim Axa (Gulek), Cevit Axa (Orel) Fewzî Lutfî Karaosmanoğlu, Hecî Omer Axa û bi sedan ên wek wan bîr naynin ? Hebûn û milkê wan sed caran ji yên me bêtir in. Lê xwedî kapîtalên li Stembolê ? Çi ye ? Ew ji me kêmtir axa ne ?" **(201, 1968, N° 310, r. 10)**. Gilî ew e ku ew kesên ku me navê wan da, ew milkedarên milletê tirk in, xwe Tirk dihesibînin, loma jî ew sirgûn ne kirin û hebûna wan ji dest hilnedan.

Bi rastî jî, sirgûnkirina 55 Kurd qet jî bi rêforma xweliyê ra girêdayî nîn bû, ne jî bona ku xem-xerêqên gundiyan bidin sivikkirin, lê bona ku tesîra siyasî ya pareke serokên Kurdan li ser gel bidin hildan. Loma jî ew sirgûnkirin bi xeysetê xwe va ne ya aborî bû, lê bêtir civakî-siyasî û milletçîtî bû.

Gelek axaftinker siyaseta komên Tirkiyê yên serokatîkir di hindava wan wilayetên ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn berk rexne kir. Ewha, ji malbata Kurdên cî (malbata Xezro), xwendekarê zanîngehê, Turgay Budak, ku sedrê komela xwendevanên Rohilatê û Rohilata Başûr bû, tevî hemû mîtîngan bûye û di nava peyvên xwe da di derheqa şûndamayîntiya wilayetên rohilatê da gotiye ku siyaseta



Institut kurde de Paris

komên Tirkiyê yên serokatîkir a milletçîtiyê di hindava bineciyên wan navçeyên welêt da rexne kiriye.

Di nava peyvê xwe da, wî gotiye : " Pêşdaçûyîn nîşan nade ku divê li roavayê karxanan, lê li rohilatê jî girtîgehan, çêkin. Rohilat zêrandî û razayî ye, ketiye xewa hingorê. Dibêjin ku hukûmet li Hekkariyê zindaneke bi buhayê 7.5 milyon lîra çê dike. Dibe ku ew çêkirina herî mezin û ya herî beha li Hekkariyê ye. Wê demê, gava ku li gundan dibistan, mamosta, nexweşxane, bijîjk tu nene, çawa meriv dikare 7.5 milyon lîra li ser çêkirina girtîxanan xerc bike?..." **(193, 19.11.1967).**

Pêşdaçûyîna qewimandina li rohilata welêt bêtabetiya komên Tirkiyê yên serokatîkir ên mezin pêş da dianî. Di dawiya hezîrana 1966 da, li Ankarê şêwrdariya dizî ya 21 wezaretên Tirkiyê, ku tê da pirsa Kurdan hat enene kirin, hat derbas kirin. Wek ku weşana Tirkiyê dida nîşan dan, tê da "biryarên giring" ji bo dûrxistina bineciyên kurd ji şerkariya azadariyê, hatin qebûl kirin. Ew biryar xwedîgiravî tê da dixwest ku li 16 wilayetên Tirkiyê ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn mecalan pêk bînin bona pêşdaçûyîna çandî û aborî. Ji bo nimûnê, tê da dihat dîtin ku ew berhevkirina pereyê ku li wan deran ji bo dibistanên tirkî yên nuh û tiştên mayîn bê xerc kirin bêtir bikin. Hema wan deman dest pê kir li wan navçan "sistema bêqeziyebûnê ya gelek hişk" bidin saz kirin. Wek ku weşana Tirkiyê dida nîşan dan, ew mecal pêwîst bû bona ku pêşiya pêşdahatina pirsa Kurdan li Tirkiyê bigrin, bona ku xwe ji wan qewimandinên ên wek li Iraqê bipên **(239, 2.7.1966).**

Şerkariya Kurdan a pir-hindik serketî li Iraqê ne tenê di nava hukûmetê da, lê usa jî di nava komên rêaksyonêr da hewaseke mezin pêş da anî. Girêdayî vê yekê, miqala rojnamevan Şeref Genso, ku di hezîrana 1966 da hat çap kirin, gelek hewaskar e. Tê da dihat gotin ku bona "Tirkiyê guhastinên siyasî û pêşketinên ku divên bi peymanê di navbera

hukûmeta Iraqê û Kurdan da bên dest danîn gelek hewaskar e". Di dûmayîkê da Ş. Genso nivîsî : "Tevgera Kurdan ku îro li Iraqê bi ser dikeve, ewê hetanî ku ew serbestiya xwe bistînin û Kurd di bin alekê da bibin yek berdewam bike". Girêdayî wê yekê, wî pêşniyar kir ku "bi guhdarî li têkoşîna Kurdên Tirkiyê ewê mêze bikin" **"207, 3.7.1966)**.

Komên Tirkiyê yên serokatîkir hema bi plan jî kar dikir. Di nîveka meha oktobr 1967 da, li Ankarê, bi serokatiya serok C. Sunay, civîna Şêwra bêqeziyebûna millî hate enene kirin. "Du nûnerên bi nav û deng - Milliyet nivîsî - di nava peyvên xwe da qewimandinên li Anatolya Rohilatê wek ên casûsiyê nav kirin" **(216, 17.10.1967)**.

Girêdayî vê yekê, bi gotina hukûmeta Partiya Heqiyê (PH), waliyên wilayetên rohilatê bi her awayî ne dihişt ku komîteyên teşkîlkirina mîtîngan kar bikin. Ewha, dîwana cî ne dihişt ku bineciyên wilayetên cîran tevî mîtînga Tunceliyê bibin. Bilî wê, wan gelek berk qedexe kiribû ku karmend tevî mîtîngan bibin. Bona pêşîgirtina tevrabûnên bineciyan a ji bo mafên xwe, gelek hêzên cendirme û polîs hatin xebitandin. Pêş da desteyên cendirme û polîsên ku wê demê li gelek bajaran dibûn dişandin ciyên derbaskirina mîtîngan. Xwendekar Kemal Fewzî Bingol li mîtînga Ankarê got : "ji her tevgelekî mîtîngê ra sê polîs û cendirmeyek dikeve" **(193, 19.11.1967)**.

Di meha sibatê 1967 da, hukûmeta Tirkiyê, bona tamkirina hêzên xwe yên bona hincirandina şerkariya Kurdan, qanûnname N° 6/7635, ku anîn û belavkirina her cûreyê destgehên welatên derve yên bi zimanê kurdî (belgok, lîste, sêlik, qeytanên magnêtofon, kasêt û tiştên mayîn) qedexe dikir, derxit **(58, 14.2.1967)**.

Van mecalan ne tenê nerazîbûna Kurdên cî pêş da anî, lê usa jî ew ji aliyê mîlîtanên Kurdan ên welatên derve yên bi nav û deng, herweha ji hêla rêxistinên Kurdan ên cihê cihê, hatin rexne kirin.

Ewha, di destpêka sala 1967 da, Emîr Kamuran Bedirxan, ku li Parîsê dima, nama vekirî ji serokê

Komara Tirkiyê ra şand û tê da bangî wî dikir ku qet nebe otonomiya Kurdan a çandî nas bike.

Di îlona 1967 da, rêxistina avukatan a navneteweyî jî, ya ku belge di derheqa xeysetê pirsa Kurdan li Tirkiyê da weşand, li Jenêvê de'w kir ku mafên bingehîn bidin Kurdan. Tê da xuya dibû ku hukûmeta Tirkiyê mafên Kurdan inkar dikirin, dicedand ku li welatê xwe Kurdan tam bihelîne. Di belgê da dihat xuya kirin ku nenihêrî qayiliya hukûmeta Tirkiyê ku anegorî peymana Lozanê (miqal 38-39) qedrê milletên biçûk bigre, wê sozdayînên xwe ne qedandin. Ewha, dîwana Tirkiyê qedexe kiriye ku Kurd dibistanên kurdî vekin û zarokên xwe bişînin wan, nahêle ku edebiyata wan hebe û ji welatên derve pirtûk û sêlikan bistînin. Di belgê da usa jî tê gotin ku hukûmeta Tirkiyê gelek Kurd ji cî û wargên wan ên kal û bavan sirgûn kirine, lê dijderketiyên wê siyasetê dihatin kuştin **(201, 1967, N° 324, r. 12)**.

Komên Tirkiyê yên serkarîkir ku qedexe dikir dibistan û weşanên Kurdan hebin, dîsa wek berê Kurd assîmîle dikirin. Bona wê armancê, di salên 60 da wan dest pê kir bona zarokên kurd dibistanên şevbuhêriyê yên xusûsî, anegorî zagon N° 220, saz bikin û kesên ku tê da digot ku dibistan divê alîkariya "belavkirina ziman û çanda tirkî bikin ..." **(58, 12.1.1961)**.

Gelek dûrî aqil e ku ew dibistan hatibûn vekirin ji bo ku Kurd hîn bibin û xwendinê bi dest bînin. Gilî ew e ku li Anatolya Roavayê gelek wilayet hene ku tê da gelek kêm mirovên xwenda hene. Lê hukûmetê li wan wilayetan bawer bike tu dibistan bi wî awayî çê ne kiriye.

Di sala 1968 da, êdî 42 dibistanên bi wî awayî ku tê da 14.229 zarok hîn dibûn dest pê kir kar bikin. Sala xwendinê ya 1970, ji 57 dibistanên bi wî awayî 51 li wilayetên rohilatê bûn. Û tenê 6 li wilayetên roavayê û yên merkezî bûn **(121, r. 401-403)**. Ew li Ankara, Sivas, Qonya û ciyên din ên mayîn bûn. Tevî vê yekê, divê em li ser hesêb hildin ku li wan bajaran gelek Kurd diman.

Institut kurde de Paris

Eger ew dibistan bona bilindkirina dereca xwendinê dihatin vekirin, wê demê ew diviyan li wilayetên wek Çorum, Giresun, Kastamonu, Ordu, Yozgad û Tokat, ku tê da xwendewarî li ser dereceke nizm bû bihatana çê kirin. Girêdayî vê yekê, dereceke mayîn jî gelek hewaskar e.

Ewha, li wilayeta Bitlîsê, anegorî hesabkirina bineciyan a sala 1965, weke 154.000 mirov diman (%76 nexwendî bûn) û bona wan 3 dibistanên şevbuhêriyê hebûn. Wê demê, li wilayeta Kastamonu, ku tê da 442.000 mirov diman (65% nexwendî bûn), tu dibistaneke usa tu nebû **(121, r. 404)**. Wek ku ji gotina jorê xuya ye, daxwaziya komên Tirkiyê yên serokatîkir ew bû ku bi vekirina wan dibistanan nisleta Kurdan a nuh bihelîne, bike Tirk.

Usa jî, bona wê armancê bûn ew bingehên radyoyê ku li dawiya salên 60 li Diyarbekir, Wan, Erzurum, Qers û bajarên Anatolya Rohilatê yên mayîn hatibûn çê kirin. Agahdariyên wan radyoyan (pêlweşan) bi tu tiştî ji bernamên radyoyên wilayetên roavayê ne dihatin cuda kirin. Ew anegorî planên serwêrtiya agahdariyên radyo û dûrdîtinokê (televîzyon) yên tomerî, yên ku anegorî zagon N° 359 diviyan tebiya "milletçîtiya Tirkan" bidana mehkeme kirin, dihatin hazir kirin. Di wan elametiyan da ne tenê ziman, çand, urf-adetên milletê kurd dihatin inkar kirin, lê eşkere siyaseta tirkkirina wan wilayetên ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn dida derbas kirin.

Demek, siyaseta di şertên sazûmana pirpartîtiyê di pirsa Kurdan da gelek hindik ji siyaseta demên sazûmana yekpartî dihat cuda kirin. Cûre û metodên helandina Kurdan hinek hatibûn guhastin. Eger berê derba sereke datanîn ser zordayîna admînîstratîf û eskerî, bi hovîtî hincirandina her awayê nerazîbûn û sirgûnkirina Kurdan a kitleyî ji wargehên wan ên kal û bavan û tiştên mayîn, lê nuha li ser wan hemuyan propaganda û mêtodên hînkirina nuh a zêde bûn.

Hêzên Tirkiyê yên gelek nasyonalîst, panturkîst û faşîst ên hêla rastê, bona gumrehkirina hişkbûnê li welêt her roj bang dikir ku pelixandina Kurdan, ku

Institut kurde de Paris

lîderên wan bi şaşîtî-sûckirina" siyasî ya herî mezin : propaganda komunîzm û sêparatîzmê, dihatin gunehkar kirin, xurt bikin. Nasyonalîstên berk, rêaksyonêrên bêhempa miqalên şovînîzmê di kovarên "Milli Yol" û "Otuken" ku organa Partiya şerkariya nasyonalîst bû û serokatiya wê Alparslan Turkeş dikir da diweşandin.

Ewha, rasîstê tirk Ismet Türmtürk di kovara "Milli Yol" (N° 14, 1967) da miqaleke ku tê da pêşniyar dikir ku "Qazax û Qirgizên koçer ên çekdar" ji Asya Navîn "teklîf" bikin û wan di nava Kurdên wilayeta Hekkariyê da cîwar bikin çap kir. "Cendirme û paraskerên ordiyê wî ciyî badilhewa hêza xwe dêris bikin", wî nivîsî. "Ewê tutişt neyê guherandin. Ew kesên ku li van ciyan beled in hesab dikin ku hemû hereketên wan bêkar û bêfeyde ne. Şert û qewlên hewayê, wargehên çiyayî, halê riyan û şertên mayîn şehadeta wê yekê didin. Li wira ne tenê spartinên dewletê li bendî tiştekî hesab nakin, lê usa jî turkîzm ji bo wan ne tiştek e ... Ew wargeha çiyayî bi kevir-kuçik tenê perên dewletê "hûfî xwe dikin". Jê zêdetir tiştek nîn e. Ew (Kurd - M.H.) qedrê dewletê nagrin, piştgiriya wê nakin. Lê çare heye û ew dermanekî sade ye ... koçerên qazax û qirgiz ên çekdar li wira cîwar bikin ...". Tenê tiştek ne hat fehm kirin. Xudanê wê dîtina bêhiş ewê çawa wê pêk bîne ?

Panturkîstekî din ê miqerim, Nihal Atsız, di kovara "Otuken" (N° 28, 1967) da miqalek weşandiye û tê da gotiye : "Hela bela û ecêb ne hatiye serê milletê tirk, bira ew (Kurd - M.H.) bicemidin, ji vira herin. Ku da ? Ku da dixwazin bira wê da jî herin, dilê wan çawa dixwaze, bira herin Îran, Pakistan, Hindistanê, bal Barzanî. Bira ber bi Koma Milletan bin ku li Afrîkayê ax bide wan. Milletê tirk gelek bi sebr e, lê gava k'el û hêrsa wî radibe, digihîje serê poz, ew mînanî şêrekî li ber tiştekî nanihêre; bira di derheqa wê yekê da ji Ermeniyên kirîvên xwe bipirsin, dibe ku wê çaxê hişê wan bê serê wan".

Demekê şûn da, N. Atsız di kovara "Otuken" (N° 42, 1967) da miqala duda bi sernivîsa "Zûkîniya

Institut kurde de Paris

Kurdên sor" çap kir. Em jê perçekê li jêr tînin :

"Belê, min di derheqa wê yekê da di miqala xwe ya berê da li "Otuken" (nîsana 1967) gotiye ku eger ew (Kurd - M.H.) dixwazin bi zimanê xwe yê prîmîtîf ê ku tê da li ser hevdu 4 an 5 hezar gotin hene bipeyivin, û eger ew dixwazin dewleta xwe saz bikin û edebiyata xwe biweşînin, bira ji van deran bicehimin. Me, Tirkan, weke çem xwîn rêtiye bona xweliya xwe û me xwe ji Gurcan, Ermeniyan û Yûnanan parastiye ... Dema şerrê hemcihaniyê yê pêşîn, gava ku Ermeniyan em firotin, Kurd ji hefhildana me filitîn, ji ber ku li çiya diman. Eger usa nîn bûya, ewên li wan navçên ku nuha tê da dijîn û bi jimara xwe va bi ser hemû milletên mayîn in, piranî ne dibûn. Ew dikarin li wan navçan %100 bin jî, lê xeyala wan a di derheqa sazkirina dewleta serbest li ser axa Tirkan da ewê wek xeyal bimîne, wek ku Bîzans ji bo Yûnanan xeyal ma û Ermenistana Mezin jî bona Ermeniyan xeyal ma. De bira ew ji van deran bicehimin herin, hela li ser bextê milletê tirk rûneniştine û heta me ecêb-nenere ne aniye serê wan. Bira ew bicehimin".

Wezîrê çêkirin û mihaciriyê di hukûmeta Partiya Heqiyê da Haldun Menteşoğlu jî, gava ku erd hejiya bû çûbû navçeyên Kurdan, bi wî ruhî peyivî. Ew ber bi Kurdan bû û got : "Hûn dixwazin me bidin bawer kirin ku gom û tewleyên we (wî ciyê jîna Kurdan usa bi nav kir M.H.) koçik û seran in. Hûn gazina xwe çi dikin ? Li bal we jimara şehîdan digihîje 3.000, lê li Vyêtnamê ew jimar digihîje 30.000". Paşê, gava wî peyvê kurdî bihîst kire gazî: "Ez ji zarê (devê) yekî wekî mirovan dengê giremira dewaran dibihîsim" û bi ser da zêde kir : "Eger ev dewlet ji we ra dest nade, ji xwe ra li yeke din bigerin" **(157, r. 14).**

Ev gotinên panturkîtên rasîst ji aliyê komên welêt ên mexlûqetiyê bi cûre-cûre hatin qebûl kirin. Miqale dijî wan gotinên rêaksyonêrên Tirkiyê yên faşîst hatin weşandin. Di nava miqaleke protêstoyê da, ku Komela xwendewariya herî bilind a 19 wilayetên Rohilatê qol kiribû, dihat gotin :

Institut kurde de Paris

"Kî kî dikuje ? Kî ecêban tîne serê kî û kî bera kî dide ? Na, ewê hêzeke usa tunebe ku bikaribe wî gelê ku ji sedsalên dîrokê yên herî kevnare da li ser vê axê jiye û dijî ji van erdan derxe. Divê wan bênamûsên ku milleteki didin berî melleteki din ji van deran derxin. Em cahilên (genc) Rohilatê naxwazin pirsa Kurdan bikin ... pirsa wilayetên Tirkiyê yên rohilatê. Em dijî wê idêolojiya ku li ser ferqiyên heyî yên zimên, urf-adet, dîndariyê hîm dibe û dixwaze bajarvanan bike du parçe û dijî hev rake ... bona parastina sebebên ... şûndamayîna Rohilatê. Ji aliyê siyasî, em dijî faşîzm û rasîzmê, usa jî qerfkirina dîndariyê, derdikevin. Em dixwazin ku li Tirkiyê danûstendinên biratiyê, yekîtiya hemû bajarvanan di nava goveka destûrê da bên testîq kirin. Çi ku di derheqa miqala ku di "Milli Yol" da çap bûye dimîne, di protêstoyê da dihat xuya kirin: "divê bizanibin ku Hekkarî ne hebs e, ne nexweşxana dînan e û ne jî mala terbiyedariyê ye. Bona Tirkiyê Hekkarî ew e, çi ku Stembol e. Divê ne ku wan bajarvanên ku li vira dijîn, lê wanên ku piştgiriya îdêolojiya ewha pîs û qilêr dikin terbiye bikin" **(121, r. 441-442)**.

Ev e protêstoya bi dilê wê perça rewşenbîrên Kurdan, ya ku nemaze bona pêşdaçûyîna aborî ya Kurdistana Tirkiyê di nava Komara Tirkiyê da û sloganên otonomiya millî, yan jî bi dewletî xwebiryarkirina Kurdan pêş da ne dikişandin.

Ev gotinên rasîsmê yên di kovarên "Ottyuken" û "Milli Yol" da, di nava komên mexlûqetiya Tirkiyê yên mayîn da jî protêstoya mezin pêş da anî û bû sebebeke hişkbûna rewşa siyasî li welêt. Nenihêrî ku miqalên ronayîdîtî dijî bendên destûrê yên anegor bûn, lê dîsa jî dîwanê xudanên wan miqalan ceza ne kirin û gazî ber bersîvdayînê ne kir.

Fêdêrasyona millî ya xwendekarên Tirkiyê jî komên rêaksyonêr rexne kirin û piştgiriya mîtîngê kir. Ji bo nimûnê, fêdêrasyonê bi sernivîsara "Birayên me yên Rohilatê û Rohilata Başûr" miqala ku ev tişt jî tê da hatibû nivîsîn çap kir : "Empêryalîst û lêpokên wan yên wek li welatên kolonîkirî yên şûndamayî

te dizêrînin, te mecbûr dikin ku tevî heywanan di bin banekî da bijîn. Em li ber Xudê sond dixwun ku emê tevî wan kesên ku ewê rabin şerkariya dijî zêrandçiyên bajarvanên Tirkiyê bikin bin" **(193, 24.9.1967)**.

Pêşdahatina mexlûqetiya dêmokratiyê di derheqa wê yekê da şehadetî dide ku wan deman di navbera rêxistinên roava û rohilata welêt da hevrakarkirin û hevalbendî çê dibûn, û di navbera Tirkan û Kurdan da di hêla tevgera pêşverû da yekîtî çê dibû.

Nûnerên rewşenbîrên kurd berî her tiştî guhdariya mezin datanîn ser pêşketina ziman û çanda gelê xwe. Li Tirkiyê, ku tê bi zagonê her weşaneke bi zimanê kurdî qedexe bû, amadekirina elfaba kurdî xwediyê kemaleke siyasî ya mezin bû. Loma jî xudanên kurd ku dicedand li ser asêgeh û qedexekirinan derbas bin, afirandinên xwe yên edebî bi du zimanan - kurdî û tirkî - çap dikirin, an jî tenê bi zimanê tirkî. Di sala 1965 da, rêzimana kurdî ya K. Bedillî û sala 1967 ferhenga M. Enter a kurdî-tirkî hatin weşandin. Bi zimanê kurdî afirandinên bedewetiyê jî dest pê kir ronayî bibînin **(174, r. 42)**.

Sala 1968, M. E. Bozarslan helbesta hozanê Kurdan ê bi sedsalên navînî yê bi nav û deng, Ahmedê Xanî, "Mem û Zîn" wergerand tirkî **(Jiyana A. Xanî 1591-1652)**. Tê da hatibû dîtin ku ewê afirandinên bi zimanên tirkî û kurdî çap bikin. Lê berî ronayîdîtinê, ew werger li weşanxanê berhev kirin û ne hişt ku derkeve. Hema wê salê Bozarslan bi zimanê kurdî Elfeba derxist. Ew wek elfeba zimanê tirkî ku zarok pê di dibistanên tirkî yên navîn da dixwend derket. Lê ew pirtûk jî berhev kirin û mehkema M. E. Bozarslan kir **(121, r. 424-425)**.

Li Tirkiyê, bi hewaskariya di hindava edebiyata Kurdan da usa jî hejek dest pê bû, bona bi ilmî lêgerîn-lêkolîna rewşa "pirsa rohilatê" ya aborî û civakî bê kirin. Xudanên gelek xebatan, herweha sosyologên Tirkan, hatin ser vê bîr û baweriyê : Anatolya Rohilatê û Rohilata Başûr, ne ku li wilayetên roavayê, li hemberî perçeyên welêt ên mayîn di



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

hêla civakî û aborî da gelek paş da mane; sinaet pirr kêm pêş da çûye, dereca jiyanê pir nizm e, nexwendîtî hîn gelek e; lê siyaseta bîrkirina zimanê kurdî û helandina Kurdan ne gihîşt tu mefayî. Kurdistana Tirkiyê dikaribû "pesna" xwe bide ku li vira, ne ku li perçeyên welêt ên mayîn, bêtir polîs û cendirme hene.

Dawiya salên 60, xwefehmdarî-xwenasîna Kurdan a millî û siyasî pirr xurt bû. Di derheqa wê yekê da ew meşîn û mîtîngên ku li rohilata welêt dibûn şehadet didin. Sloganên dema meşîn û mîtîngan ku Kurdan wan deman digirtin destên xwe pêşketinek bû.

Ewha, di 16 sibat 1969 da li Gaziantebê "Mîtînga şerkariya dijî betaliyê"; di 22 sibat da li Meletyê "Mîtînga dijî bêxebatî, birçîbûn û empêryalîzmê"; di 17 adarê da li Qersê "Meşa gundiyan"; di 19 nîsanê da li Agiriyê "Mîtînga şerkariya bona dijderketina betaliyê", hatin derbas kirin **(187, 1969, N° 115, 118, 122, 201, 1969, N° 361)**.

Di 13 nîsan da, li Diyarbekirê mîtîng hat derbas kirin. Di wê mîtîngê da dîsa sloganên ku siyaseta Partiya Heqîqetê, ku projeya zagona di derheqa parastina qayde-qanûnên destûrê raberî meclisê kiribû û ku pê diviya azayên burjuwa li welêt mehrûm bikin, derb bigihînin şerkariya Kurdan a millî, gunehkar û rexne dikir pêş da hatin kişandin.

Sloganên ku di wê mîtîngê da pêş da hatibûn kişandin gelek hewaskar in. Di nava wan sloganan da evên han hebûn : "Parlementerên Rohilatê ! Bes e hûn Rohilatê di nava tengezeriyê da bihêlin !", "Ew ne zagona parastina destûrê ye, lê hilanîna wê ye", "Li Bosforê lezet e, li Rohilatê sexîrî û bindestî ye !", "Mirovên birçî kes nikare bi zagonên faşîzmê bide kerr kirin (bêdeng kirin) !", "Ew serdestiya we ewê bibe qesasê serê we !", "Bineciyên Rohilatê pola ne dijî diktaturiya we !", "Em dijî zêrandina maddî û rûhanî ne !", "Bira pûç bibe idêolojiya empêryalîst !", "Gel êdî giringiya parastina destûrê fehm kiriye !", "Bawerî li bin zagonê nayê veşartin!". Di nava wan sloganan da yek bi zimanê kurdî

hebû. Ew ji Batmanê bû : "Xwe ji Morisson, peyhatiyê Bayer, biparêzin !" (193, 14.4.1969).

Wek ku ji wan sloganan xuya dibe, piraniya pêşdahatinên bineciyên Rohilatê, yên ku nîşan dida ku merheleke şerkariya Kurdan a nuh li Tirkiyê dest pê dibe, dijî hukûmetê bû. Hema wan deman xebatkarên navçeyên Kurdan bi awakî aktîf piştgiriya têkoşîna hêzên pêşverû (hem ên Tirkan, hem jî yên Kurdan), yên ku dijî zordayîna empêryalîzmê û siyaseta civakên hukumdar bûn û bona safîkirina pirsên civakî-aborî, bona parastina azayên burjuwa-dêmokrat ku bi destûra Tirkiyê (ya sala 1961) tê ra hatiye dîtin bûn,digirt.

Di destpêka sala 1969 da, cuhanên wilayetên welêt ên Rohilatê bi navê wilayetên rohilatê name li ser navê parlementeran ji serok, serekwezîr, serokên partiyên siyasî, sedrên wan partiyan li wilayetan, komele û rêxistinên pêşverû ra da weşandin. Di nava wê namê da, cuhanan ew projeya zagona di derheqa parastina qayde-qanûnên destûrê da, ku Partiya Heqiyê ya serokatîkir ew amade kiriye, berk rexne kir. Ew ji aliyê wan wek şaşîtî hat qîmet kirin, ji bo ku Partiya Heqiyê di nava wê projê da wan kes û rêxistinên ku bona pêşketina wilayetên rohilatê, bona dayîna mafên bajarî û civakî ji bo bineciyên wê navçeyê pêş da tên, gunehkar dike. Di wê namê da usa jî dihat gotin : "Di projeya wê zagonê da dicedînin ku heyetiya çanên cihê-cihê di wê navçeyê da inkar bikin. Qebûlkirina wê ewê nîşan bide ku bineciyên Rohilatê yên belengaz û sexîr ewê ne tenê ji empêryalîzma aborî bizêrin ..., lê usa jî ji empêryalîzma "çandî". Hetanî nuha dîwanê herdem kêmkirina mafên Anatolya Rohilatê di dereca pêşdaçûyîna çand û ziman da pirsdanîna xwe ya sereke hesab dikir. Wê demê, gava gundî, karker û rewşenbîr hişyar bûbûn û xwenaskirina wan gihîştibû dereceke bilind û wan dest pê kiribû bi çand û zimanê xwe bi ilmî binihêrin û fêr bibin, dewlet dicedand bi her awayî pêşiya wan bigire, asêgehan deyne ber wan. Wê usa dikir ku gunehkariyên xwe bixwe bin perde bike û veşêre. Loma jî

dîwana Tirkiyê projeya wê zagona faşîst hazir kiribû" (185, 11.3.1969). Hemû partiyên burjuwa xwe bi prensîpa nasyonalîzmê ku dixwest hemî kesên ne tirk li welêt bihelînin, girtibû. Û loma jî bernamên hemû partiyên burjuwa prensîpa nasyonalîzmê ku awayê şovînîzmê wergirtibû xistibû nava bernama xwe. Ewha, di nava bernama Partiya Heqiyê da, di derheqa wê yekê da dihat gotin ku endamên wê diviyan şerkariyê dijî wan tiştên ku dikarin ferq di nava çand, millet, dîn-olperestiyê da bikin (miqal 9) bibin, lê usa jî ewê bi destûrê bi nasyonalîzma Tirkan va, ji bo yekîtiya milletê tirk, bên serkarî kirin (miqal 11) (30, r. 6, 7).

Bawer bike, hema bîr û baweriyên bi wî awayî di nava bernama partiyeke burjuwa ya mayîn, Partiya Gel a Komarî (PGK), da hatibûn nivîsîn. Tê da dihat gotin ku PGK dixwaze ku gelê Tirkiyê wek milletekî yekbûyî ku "ferq di nava yekbûna ziman, çand, idêolojî û nivîsînê da danayne" pêş da here. "Partiya me, -di nava bernamê da dihat xuya kirin-, qîmeteke mezin dide nasyonalîzmê, ji ber ku ew rikindar û parastvanê giyanê millet û xwefehmdarî-xwenaskirinê ku li ser wan divê gelê tirk yekîtiya xwe biparêze ye" (miqal 3), (30, r. 58).

Partiya tevgera nasyonalîst (PTN) jî bi gotinên bernama xwe "dicedand ku pêşdaçûyîna gelê Tirkiyê wek milletekî tam, yê di hêla ziman, armanc, çand û nivîsînê da ne cihêkirî biparêze" (miqal 23), (30, r. 183), bi wan bîr û baweriyan dihat serkarî kirin.

Binyeta siyaseta partiyên burjuwa yên şovînîst bi awakî firehtir di bernama Partiya Tirkiya Nuh (PTN) da hat xuya kirin. Tê da dihat gotin : "Em nasyonalîzmê wek yekîtiya giyanê, ya ku bîr-baweriyên veqetandinxwestinê ku ferq dixe nava olperestî, çand û urf-adetan inkar dike û li ser daxwaziya bajarvanan a tomerî ku xwe milletekî xwedî zimanekî - zimanê tirkî - û yê çanda tomerî - ya tirkî - hîm dibe hesab dikin" (30, r. 376).

Hemû partiyên siyasî pirr-hindik di derheqa tevrabûnên li rohilata welêt da peyivîn û qîmetên xwe dan wan.

Institut kurde de Paris

Partiya Heqiyê ya serokatîkir hema ji destpêkê da bi guhdarî dîtina xwe dida qewimandinên li Rohilatê. Wê teşkîldarên meşîn û mîtîngan bi perçekirina welêt, firotina weten gunehkar kir û de'w kir ku binecî tevî wan nebin. Bi wê dew'kariyê usa jî cîgirê serokê PH, Talat Asal, gava çûbû Urfa, Bingol, Tuncelî û wilayetên mayîn bona di cî da bi sebebên meşîn û mîtîngan bihese, pêş da hat. Di peyvê xwe da wî got : "Niyet-meremên teşkîldarên mîtîngan ên şexsî hene. Ew dixwazin welêt perçe bikin, nûnerên milletên cihê-cihê berî hev bidin. Ev karên wan dikarin wek neyartî di hindava welêt da bên hesab kirin" **(193, 22.10.1967)**.

Lê partiyên muxalefetê bi fikrên hukûmetê û lîderên PH di hindava qewimandinên li wilayetên rohilatê da qayil nîn bûn. Nûnerên Partiya Gel a Komarî û yên mayîn ên muxalefetê jî çûn navçeyên rohilatê, lê bixwe tevî meşîn û mîtîngan ne bûn. Bi tomerî hildayî, partiyên burjuwa yên muxalefetê nemaze bi ferzendên taktîkî (hilbijartinên parlementê nêzîk dibûn) ew meşîn û mîtîngan rexne kirin. Ewha, lîderekî PGK ê bi nav û deng, Kemal Satır, ku di partiya muxalefetê ya sereke da bû, gava li Mêrdînê peyivî got : "Partiya me bi kûr-dûr dîtina xwe dida meşînan. Me li ew pirs nihêrî. Çiqas ew li bin hukmên hundirî û yên derve bin, ewqas ew dijî tambûna welêt in. Ez bi bawerî û kubarî îlan dikim ku welatparêz û lawên mêrxas ên wê wilayetê piştgiriya tambûna welêt dikin. Helbet, ewê mirovên usa peyda bibin ku ewê bixwazin wan pêşdahatinan bi kar bînin û di nava ava şêlûbûyî da bigirin. Û eger bi wan ra li hev bê ku çend tevhevbûnan bînin jî, eger di wê yekê da temamiya navçeyê gunehkar bikin rast nabe" **(193, 18.10.1967)**.

Lê tevî wê yekê, partiyên burjuwa yên muxalefetê li ber xwe diketin ku nûnerên Partiya Tirkiyê ya Karkeran tevî wan mîtîng û meşînan dibûn **(193, 18.10.1967)**.

Gilî ew e ku Partiya Tirkiyê ya Karkeran (PTK) dicedand ku qîmeta objêktîf bide tevrabûnên li

wilayetên rohilatê, ji wan ra di nava şerkariya welêt a pêşverû ya tomerî ku di salên 60 da çiqas diçû zortir dibû da cî bibîne.

Endamên PTK tevî mîtîng û meşînên ku wek qewimandineke berbiçav dihatin hesibandin bûn. Gilî di wê yekê da ye ku hinek komîtên tkîldariyê dicedand ku ew pêşdahatin wek ên xurû rohilatê raber bikin (ango, yên dijî derebegiyê an jî etnîkiyê), û giva tu tuştekî wan pirsên tomerî tevî pirsên welêt ên civakî-aborî yên mayîn tu nene. Serokatiya PTK, M. A. Ayber, Behice Boran, Tarık Ziya Ekinci û yên mayîn di nava peyvên xwe da nîşan da ku pirsa rohilatê ya "serbest" tu neye û dikarin ew bi radîkalî, tevî pirsên welêt yên civakî-aborî yên hîmlî yên mayîn, safî bikin. M. A. Ayber di mîtînga 22 oktobr 1967 da li wilayeta Agiriyê ya teşkîldarî da got : "Em bi şabûn û bi razîbûn mîtîngên li Rohilatê enene dikin û hîn dibin. Ev mîtîng diyarbûnên xwefehmdariya millî ya herî geş in û ew van salên dawîn çiqas diçin bihêztir dibin. Xebatkarên Rohilatê yên bê maf û feqîr-fiqare bi rewşenbîrên xwe ra tevayî dest pê kir ji bo mafên xwe rabin meydanê ... Bona derc bikin gel ji bo çi rabûye, çi ecêbnenere aniye serê gelê bindest, divê bizanibin ... Partiya Tirkiyê ya Karkeran ji roja sazbûna xwe da dibêje ku hemû xebatkarên welêt, çi yên rohilatê, çi yên roavayê, birayên hevdu ne, daxwaziyên wan yek in û loma jî bi hemû pirsan ... divên weke hev binihêrin. Xwedî milkên mezin, piştgirên wan ... avê şêlû dikin, gelek hereket dirijînin bona ku karkeran bixalifînin, guhdariya wan ber bi hêleke din bikin ... Çekê wan ê sereke di wî karî da xapandin e, şer-şiltax e, buxdan e ... Pirsa sereke ew azabûna ji nîrê empêryalîzma Amerîka ye û ... qeydê kapîtalîzmê ku bingeha wê li bal wan e ... têkoşîna dijî empêryalîzma Amerîka ew têkoşîna dijî kedxuriyê, ji bo sosyalîzmê ye" (115, r. 593).

Û bi rastî jî, safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê bi xurtî bi warguhastinên dêmokratîk li welêt, bi şerkariya gelên Tirkiyê dijî zordariya empêryalîzmê, herweha jî dijî rêaksyona hundirî, girêdayî ye.

Institut kurde de Paris

5. Rêxistinên siyasî û mirovî ku serokatiya tevgerên Kurdan di nîveka salên 60 ya duda da dikir

Zagondariya Tirkiyê ne dihîşt ku milletên Tirkiyê yên biçûk xwedî partiyên siyasî bin. Ewha, miqal 89 û 90 yên zagona di derheqa partiyan da (№ 648), ku di tîrmeha 1965 da hatiye qebûl kirin, sazkirina her cûre partiyên ku ji endamên gelên welêt ên cihê-cihê bibûna, wek parastvanên milletên biçûk, usa jî şerkarî bona ku otonomiyê bidin navçeyekê bikirana, qedexe dikir (29, r. 106-107).

Lê dîsa jî dema qebûlkirina wê zagonê êdî li Kurdistana Tirkiyê çend rêxistinên kurdî yên siyasî û mirovî (yên lêgal û ne lêgal) yên ku şerkarî bona naskirina mafên Kurdan ên millî li Tirkiyê dikir kar dikir.

Di nîveka salên 60 da, di qewlên têrora hov da welatparêzên Kurdan Partiya Dêmokrat a Kurdistana Tirkiyê (PDKT) a ne lêgal saz kiribû. Organa wê ya weşandinê tu nebû û tenê bi saya çend bultenan weşanên yekcare, yên ku bi tirkî an jî bi zimanên mayîn çap dibûn, meriv dikaribû di derheqa bernama wan da serederî bikira. Armanca Partiya Dêmokrat a Kurdistana Tirkiyê ya sereke ew bû ku otonomiya tam bidin gelê kurd, di goveka Komara Tirkiyê da, bona naskirina mafên gelê kurd, pêşdeçûyîna çand û zimanê millî, azadiya Kurdan a neteweyî. Di nîveka salên 60 da, êdî hukmê wê partiyê li Kurdistana Tirkiyê pirr bû (85, r. 194).

Di novembra 1966 da, PDKT tevî partiyên biratiyê yên mayîn di kongreya Partiya Dêmokrat a Kurdistanê PDK, ku li Gelalê (Kurdistana Iraqê) hat derbas kirin, bû (169, r. 240). Hema di wan deman da, PDKT karkirina xwe bi carekê va da guhastin û bi we'delî aktîfbûna xwe li hundirê welêt da kêm kirin. Biryara usa hate qebûl kirin ku girêdayî qewimandinên Iraqê ku tê da bi serokatiya Partiya Dêmokrat a Kurdistanê (PDK) Kurdan şerrê xwe yê giran û bi hêz bona otonomiya Kurdistana Iraqê di goveka Komara Iraqê da kiribû bibin.

Lîderên PDKT kemala qewimandinên li Bakurê Iraqê bi layiqî wek şerkariya hemû Kurdan a azadariyê

qîmet kir. Wan biryar kir ku piştgiriya PDK di şerrê wê ya mêrxasiyê da, bo mafên Kurdan ên millî li Iraqê, bikin. Eger li rastiyê bikeve, PDKT di bin tesîra Barzanî ya mezin da bû û wek perçeke PDK li Tirkiyê dihat hesibandin.

Bi salixên Jean Pierre Viennot ku endamê kafêdra zanîngeha Sorbonê ya dîrok û çanda kurdî bû **(224, 1971, Nº 2, r. 8)**, ew perça PDK di sala 1967 da hatibû saz kirin. Hîmdarekî wê, parlementerek ji Urfayê, Faik Bucak, bi nemamî hate kuştin. Viennot usa jî navê çend rêxistinên Kurdan ên dizî li Tirkiyê, wek Partiya Xelasiya Gelê Kurd li Tirkiyê, Rêxistina Azayê, usa jî Rêxistina Şervanên Kurdistanê **(254, 1971, Nº 40)** dide. Van hemû rêxistinên Kurdan bi dizî kar dikir.

Ji bo serketina Kurdan pêwîst bû ku ew rêxistinên dizî yên Kurdan di karê xwe da yek bibûna. Loma jî, wek ku nûnerekî PDKT di hevpeyvîna xwe ya di kovara lubnanî "El-Hedef" da dibêje, di sala 1970 da kongreya yekemîn a Partiya Dêmokrat a Kurdistana Tirkiyê ya ku hemû komikên rêxistinan gihandine hev û kirin yek hat derbas kirin. Ew komik hela di sala 1950 da dest pê kiribû saz bibin. Kongrê bernama partiyê ku tê da nuqteyek di derheqa mafê milletan bona bixwe biryarkirina bextê xwe û destûrdayîna gelê kurd ku bixwe qederê xwe di goveka Komara Tirkiyê da safî bike hebû qebûl kir **(242, 1975, Nº 284, r. 16-18)**.

Tevî partî û komikên Kurdan ên siyasî yên dizî di dawiya salên 60 da, rêxistin û komeleyên cuhanan û yên mirovî yên mayîn ên lêgal dihatin saz kirin. Ewha, bi pêşniyara fraksyona Kurdan a Partiya Tirkiyê ya Karkeran di tebaxa 1969 da Ocaxên Rohilatê yên çandî yên şoreşgeriyê (ORÇŞ) ku li hemû bajar û wargehên jiyînê yên mezin ên Kurdistana Tirkiyê hebûn hatin saz kirin.

ORÇŞ, yên ku li Ankara, Stembol, Diyarbekir, Silvan û bajarên Anatolya Rohilatê yên mayîn hatibûn saz kirin, fêdêrasyonên serbixwe yên xwendekarên kurd û rewşenbîrên wan bûn û bi huqûqî ne

hatibûn testîq kirin. Di ORÇŞ da weke 20.000 mirov hebûn (174, r. 46).

Dokumentên anegor isbat dikin ku ew "rêxistinên ku bingeha wan hevra karkirin, hevalbendî, ronayîdariya xwendewariyê, karê tevayî ji bo xwendekarên cuhan e. Usa jî ew ya nûnerên rewşenbîran e û dicedîne ku idêolojiya şoreşgeriyê pêş da bibe û belav bike ... Hemû endamên wê baweriya xwe bi fikirdariya aza ku di destûra Komara Tirkiyê û daxuyaniya navneteweyî ya hemcihanî ya bona mafên gelan da heye tînin ... Bona pêkanîna armancên xwe, rêxistin ewê civînan, lecan, temaşegehan bide derbas kirin û teşkîl kirin û ewê mecalên ronayîdariyê û çandî yên cihê-cihê yên ku di goveka zagonê da ne pêk bîne" (121, r. 451).

Bi awakî din, ORÇŞ kar dikir ji bo alîkirina pêşdaçûyîna zimanê kurdî, folklorê, usa jî dîrok û edebiyata Kurdan. Nûnerên wê rêxistinê, rast e, mecbûr dibûn ku di nava gotinên xwe yên zar (devkî) da xwe hinekî xwedî fesal bikin, dest pê kir çend gotarên gelek culet biweşînin – ew jî di qewl û şertên siyaseta Tirkiyê da –. Wan bulteneke ku tê da di derheqa gelê Tirkiyê da û di derheqa karên cezakirinê li Kurdistana Tirkiyê, ku desteyên "Komando" û cendirme didan derbas kirin, da dihat gilî kirin çap kir (254, 1971, N° 40).

Salên 1969-1970, tenê rêxistinên Ankara û Stembolê 9 bulten û 24 dokumanên mayîn derxistin, her weha çend bangên ku kopyên wan ji serok û serekwezîr ra dişandin (33, r. 24-25).

ORÇŞ karê xwe bi Partiya Tirkiyê ya Karkeran (PTK) ra dikir û rêxistinên wê partiyê li Kurdistana Tirkiyê jî hebûn.

Di destpêkê da PTK di pirsa Kurdan da xwe tebiya zelal ne girtibû. Tenê çend nûnerên wê (nemaze mirovên kurd) bixwe siyaseta resmî di hindava Kurdan da rexne dikir û dijî wê yekê bûn ku li "pirsa rohilatê" wek pirsa "pêşdaçûyîna kapîtalîzmê ya newekhev" binihêrin. PTK bere-bere hat ser wê baweriyê ku safîkirina pirsên rohilata welêt ên

Institut kurde de Paris

civakî-aborî bi gelek tiştan va safîkirina pirsa Kurdan a millî va girêdayî ye. Cara pêşîn ev girêdan M. A. Ayber di nava axaftina xwe ya li civîna komita karkirinê ya sereke ku di 12 adar 1963 da li Gaziantepê hat derbas kirin da nîşan da (115, r. 275–285).

Lê di bernama PTK ku di sala 1964 da hatibû qebûl kirin girêdan tam ne hatibû xuya kirin. Lê tevî wê yekê, bernama PTK wekheviya bajarvanan, bê cihêtiya millet, dîn û ziman, nas dikir. Usa jî ew ji bo parastina mafên gelên biçûk ên mayîn pêş da dihat û li ser wê baweriyê bû ku hemû jî wek hev in, bê hesabhildana ziman, ol û baweriyên siyasî (60, r. 80–82). Ew yek gelek mîna naveroka miqala destûra Tirkiyê ya 12an ya 1961 bû.

Di şertên hişkbûna pirsa Kurdan li welêt da, ev hemû tişt hindik bûn, têr ne dikir. Ji PTK ra pêwîst bû ku di hindava pirsa Kurdan da xwe bi tebiya firehtir û zelaltir bigirta. Di novembra 1966 da, li Meletyê kongreya PTK ya duda hate derbas kirin. Li kongrê pirsa di derheqa rewşa li wilayetên rohilatê hat bilind kirin. Ewha, serokê rêxistina partiya Tunceliyê, Kemal Burkay, nîşan da ku li rohilatê hela tesîra tradîsyonê pirr e, hela gel nikare li pirsên xwe di neynika civakî da binihêre. Divê usa jî hildin ser hesêb ku ew gel di hêla dîndariyê da hatiye pîre-pîre kirin. "Komên hukumdar vê yekê bi kar tînin" (240, 1966, N° 192). Loma jî Kemal Burkay pêşniyar kir ku xebata partiyê li wilayetên rohilatê bidin xurt kirin.

Kongrê, ku ew pirs enene kir, ev biryar qebûl kir : "PRP, karkerên me, rewşenbîrên me yên sosyalîst li ser wê bîr û baweriyê ne ku pirsa Rohilatê wek her pirseke aktuel (giring), ku bi maddî û moralî tê zêrandin, hewcê lêhûrbûn-lêhînbûnê ye". Girêdayî vê yekê, kongrê sipart organên partiyê yên serkarîkir ku bi wê pirsê va mijûl bibin (240, 1966, N° 192, r. 16).

Di kongreya PTK ya 3an da jî, ku di novembra 1968 da hat derbas kirin, dîsa pirsa di derheqa wilayetên rohilatê da hate bilind kirin. Tevgelê wê Naci

Kutlay, ku di kongrê da peyivî, nîşan da ku di nava dokumana M. A. Ayber da guhdarîya pêwîst li ser rohilata welêt û pirsên wê ne hatibû danîn. Paşê wî karkirina parlementerên meclisê yên ji Kurdistana Tirkiyê yên ku qet ne dihatin navçeyên ku ew tê da hatin hilbijartin berk rexne kirin. Di dawiyê da Naci Kutlay bangî PTK kir ku bi pirsên Rohilatê ku bineciyên wê nikarin herin nexweşxanan bitenê ji bo ku ew bi zimanekî mayîn dipeyivin va mijûl bibe (201, 1968, № 3512, r. 4).

Kongreya 3an, ku tevî pirsên mayîn problêma Rohilatê jî enene kir, di nava biryarnama xwe da nivîsî : "Di hêlekê da di nava destûrê da nivîsiye ku wekhevtî di nava hemû bajarvanên welêt da - bêy hesabhildana ziman, ol, bîr-baweriyên siyasî, bawermendiya felsefî û dînperestiyê - heye. Di hêla mayîn da jî daxwaziyên wan mirovên ku bi kurdî û erebî dipeyivin û li wilayetên rohilatê û rohilata başûr wan dizêrînin bendî tiştekî hesab nakin ... Divê şertên psîkolojîk û sosyolojîk jî hildin ser hesêb, ji ber ku tenê bi wî awayî dikarin rewşa sazbûyî tehlîl bikin û hel bikin" (232, 1969, № 25, r. 4).

Paşê di dûmayîka biryarnama kongrê da tê gotin ku PTK, ku qedrê bawermendiyên karkeran û hurmeta dînê wan digire, eşkere dijî zêrandin û pelixandinê derdikeve û pêwîst dibîne ku serwêrtiya daîran di aliyê karên olperestî-dîndariyê da hemû dînan weke hev bibîne û di nava wan da di hemû derecan da wekhevtiyê biparêze (232, 1969, № 25, r.4)

Eserên kongreyên 2an û 3an şehadet didin ku PTK hetanî sala 1969 di dereca pirsa Kurdan da xwedî bernameke karkirinê ya fireh nîn bû. Gava biryar di kongreya partiyê ya 4an da, ya ku di 28-31 oktobr 1970 da li Ankarê hat derbas kirin, hat stendin, kongrê biryara xusûsî ya di derheqa pirsa Kurdan da qebûl kir. Ew gelek zelal û culet bû û kemala wê ya dîrokî jî hebû, ji ber ku ew nîşan dida ku dest bi merheleke nuh di nava danûstendinên

Kurdan û Tirkan da dike. Em li jêr metnê wê biryarê yê tam tînin :

"Kongreya Partiya Tirkiyê ya Karkeran a çaran eşkere îlan dike ku li Rohilata Tirkiyê gelê kurd heye;

hema di destpêkê da rejîma faşîst ku bi civakên hukumdar hatiye damezrandin, di hindava gelê kurd da siyaseta bindestkirin, teror û helandinê, ku gelek caran binyatê xwînrêtinê bi dest aniye, daye derbas kirin;

sebebeke sereke ya şûndamayîna wê navçeya ku gelê kurd tê da dijî ew siyaseta civakên hukumdar ên civakî û aborî ye; loma jî wê rejîmê kêm tişt kiriye bona pêşxistina rohilatê û di wî karî da sûcê idêolojiya civakên hukumdar a milletçîtî-şovînîst gelek e;

piştgiriya partiya me borc û deynê tebiî ye, ji ber ku partiya me dijmina her diyarbûneke dijdêmokratîk, faşîst û milletçîtî-şovînîst e; ew alîgira şerkariya gelê kurd bona naskirina mafên wî yên bi destûrê testîqkirî ye û terefdara razîkirina hemû daxwaziyên dêmokratîk e;

pêwîst e ku sosyalîstên kurd û tirk di cêrgên partiyê da bi hev ra kar bikin, ji ber ku şerkariya bona pêkanîna daxwazî û armancên gelê kurd ewê têkoşîna bona şoreşa sosyalîzmê xurttir bike; bi saya wî şerrê şoreşgeriyê yê yekîtiyê saz bibe û ewê serokatiya wê sinifa karkeran û rêxistina wê ya pêş - ew jî partiya me ye - bikin;

di nava bîr-baweriyên karkeran û sosyalîstan da kuştina idêolojiya rasîzm, burjuwazî û milletçîtî-şovînîsmê di hindava gelê kurd da, şertekî sereke bona pêşketina partiyê û şerkariya wê ya idêolojîk hesab dibe. Partî pirsa Kurdan bi neynika şerkariya sinifa karkeran a şoreşvanî û sosyalîzmê dibîne" (53, r. 205-206).

Biryara kongreya PTK a 4an di derheqa pirsa Kurdan da di nava komên mirovan ên pêşverû da, hem li welêt, hem jî li derve, bi dilgermî hat qebûl kirin û gelek deng da. Ew merheleke nuh bû

Institut kurde de Paris

di nava danûstendinên Tirkan-Kurdan da, di nava dîroka pêşdaçûyîna pêwendiyên wan da, ku di bingeha wan da ne ku durûtiya hukumdarên her du aliyan bû, lê yekîtiya hêzên gelên kurd û tirk ên pêşverû yên şoreşgeriyê ku armanc daniye pêşiya xwe ku her cûre zêrandina millî û civakî ji bin kok va pûç bike, bûn.

Komela Xwendevanên Kurd li Ewropayê piştgiriya biryara kongreya 4an, a ku di 1 çileya pêşîn 1971 da agahdariya xusûsî ya girêdayî wê yekê weşand, kir. Tê da dihat gotin ku Komela Xwendevanên Kurd li Ewropayê ku li ser bîr-baweriyên komunîzmê ye ... îlan dike ku piştgiriya xwe ji PTK ra dike û silavên alavî ji şervanên partiya karkeran ya ku di destpêkê da gelek xebat rêt bona bi heqî safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê ra dişîne. Komele bangî hemû rêxistinên marksîst-lênînîst ên pêşverû û partiyên dêmokratîk kir ku di pirsa Kurdan da xwe tebiya xurt bigrin û di şerkariya gelê kurd a millî-azadarî da alîkariya wê bikin **(bînihêre 243, 9.4.1971; 174, r. 60-61)**.

6. <u>Bihêzkirina karên cezakirinê li Kurdistana Tirkiyê û Ermenistana Roavayê</u>

Slogan û karên konkrêt ên wan rêxistinên siyasî û mirovî ku serokatî li tevgerên Kurdan dikir, di derheqa wê yekê da şehadet didin ku li dawiya salên 60 têkoşîna Kurdan li Tirkiyê dest pê kir li ser bingeha dijî empêryalîzmê fireh û xurt bibe. Wê demê, di navbera tevgera Kurdan a millî û şerkariya hêzên Tirkiyê yên çep da nêzîkîhevbûnek pêş da dihat. Ew bona firehkirina azayên dêmokratîk ên gelên Tirkiyê û bona hilanîna newekhevtiya aborî û civakî di navbera wan da, bona raqetandina empêryalîzma Amerîkayê ji welêt, dijî siyaseta rejîma Partiya Heqiyê ya dijî neteweyan çê bû.

Bi vî cûreyî pêşdaçûyîna qewimandinan helbet ne bi dilê komên Tirkiyê yên serokatîkir û rêaksyona navneteweyî yên ku dityirsiyan ku ewê hêzên welêt ên pêşverû bibin yek û pêşeniyeke yekîtiyê dijî

Institut kurde de Paris

empêryalîzmê çêkin bû, û loma jî biryar kir ku derbeke nuh bigihînin serhildana Kurdan a millî-azadariyê.

Di destpêka salên 70 da, desteyên "komando" û cendirma Tirkiyê êrîş li ser Hekkarî, Mêrdîn, Silvan, Batman, Bismil, Diyarbekir, Melezgirt, Tûtek, Tekman, Qereyaz, Kîgiyê kirin. Tevî wan êrîşan, Kurdan bi kitle digirtin, zordestî li bineciyên Kurdistanê yên am û tam dikir. Ewha, di destpêka nîsana 1970 da, 2.000 "kommando"yên çekdar bi behana berhevkirina çekan dora Silvanê girt, ew kir nava hesarê. Bineciyên wê berî hingê dijî dîwana cî derketibûn û gazinên xwe ji siyaseta hukûmetê ya dijî Kurdan dikirin. Di nava 17 saetan da, cezakirên tirk mal-mal digeriyan, mêr dizêrandin, jin û keç dişuhurandin. Wan ji 3.000 bêtir Kurd girtin (174, r. 47-48). %80 ji wan mêr bûn (209, 9.4.1970). Gava Kurd ber bi zabitên cendirman dibûn û digot ku kirina wan dijî destûrê ye, wan ewha bersîv dida : "Destûra di destê me da nagire, me ji serkariyê ferman stendiye" (121, r. 43). Hela bi ser da, "komando"ya xusûsî hazirbûyî li Kurdan dixist û gotinên nerê (pîs), wek "Kurdên bi dûv", "sehê Barzanî", digotin (193, 25 - 28.7.1970).

Girêdayî karên cendirmên tirk li Silvan û navçeyên Kurdistana Tirkiyê yên mayîn, pirs pêş da hat ku bi wê yekê va gelo dîwana Tirkiyê nacedîne ku serhildana çekdarî tev rake, bona ku tevgera Kurdan a millî bêserî bike û bela wê hejê bide û wê şerkariyê bigihîne dereca demên salên 1938-1960, gava şerkerên Kurdan ku bi dizî kar dikir dabûn der û hatibûn hincirandin nuh-nuh hêzên xwe dicivandin ser hev.

Bineciyên Silvanê name ji ORÇŞ re şand û tê da di derheqa zordestiyên ku cendirmên tirk dianî serê bineciyên Silvanê da dihat gilî kirin (200, 1970, N° 26, r. 7). Girêdayî vê yekê, beşa Stembolê ya ORÇŞ bangek weşand û de'w kir ku dîwan dev ji têrora li wilayetên rohilatê berde. Di nava bangê da xuya dibû ku "derîvekirina malan, girtinên bi kitle, şuhurandina jin û keçan, ne xwestiye ku wan gunehkarên rasteqîn ku di nava wî karê pîs ku li

Silvanê bûye da bêbextî kirine bigrin, bi bingeha xwe va diyarbûneke têrora faşîst û rasîst ku ev çendik-çend sal e ku organên dewletê pêk tînin e".

"Gelê me şerkarî dike ji bo dêmokrasiyê. Ew şerkarî ewê nesekine hetanî çaxa ku mafên mêmokratîk ên bingehî bên bi dest anîn. Bilî wê, bêy testîqkirina dêmokrasiyê li Rohilatê, dêmokrasiya li Tirkiyê her dem ewê di bin qeziyê da be ... Em bangî hemû welatparêzan, karmendên pêşverû dikin ku dijî ferzendên faşîzmê ku armanca wan rakirina gel dijî hev derkevin ... Gelên Tirkiyê ewê guh nedin provokasyonan û ewê şerkariyê dijî empêryalîzmê û casûsên wê yên cî bikin bona ku şoreşê nêzîk bikin" (187, 1970, N° 173, r. 5). Beşa Ankarê ya Ocaxên Rohilatê yên Çandî yên Şoreşgeriyê jî bangeke usa da weşandin.

Girêdayî qewimandinên li Silvanê usa jî ev rêxistinên ku bang-gaziyên xwe ber bi gelên Tirkiyê didan weşandin hebûn : Fêdêrasyona cuhanên Tirkiyê yê Şoreşvan ya komita Stembolê ya karkirinê, Yekîtiya Xwendevanan a Zanîngeha Stembolê ya Teknîkî, Komela Alîhevkirinê ya Çand û Xwendina Bilind a Mêrdîn, Diyarbekir, Karakoçan, Adıyaman, Bingol, Siwerek, Dêrik, Midyat û Agiriyê.

Di nava bangeke wan komele û rêxistinan ber bi gelên Tirkiyê da dihat gotin : "desteyên komando" ketin Silvanê. Silvan destê xwe da, rabû cengê. 6 tîkfir, 200 tank, 2.000 cendirme û "komando"yên rind çekdarkirî di bin rêberiya balafir-rakêtan dora Silvanê girt, di wî qezayî da halekî şerr da saz kirin. Gava komandoyan dest bi êrîşan kir, ecêbeke giran hat serê bineciyên Silvanê. Mêr hatin girtin... mal hatin dar ve kirin, zordariyên mezin dianîn serê jin û zarokan. Ev êrîşkirina li Silvanê ku di 8 nîsan 1970 da pêk hat çi nîşan dide ? Ev kirin dûmayîka qewimandinên li Tuncelî ne. Lê, bilî dîwanê, hêzên dizî ku li rohilata welêt alîkariya wan dikin hene ... Em dizanin ku ew hêzên dizî terefdarên Amerîka ne ... Pêwîst e ev bindestiya li Anatolya Rohilatê bidin hildan. Dîwana siyasî ku ketiye nava krîza giran û Amerîka empêryalîst ku

dijminên dêmokrasiyê ne û çav berdaye dewlemendiyên neft û madenan, li Anatolya Rohilatê lîstikên bi qeziya dilîzin. Lê bineciyên Anatolya Rohilatê ewê nehêlin ku provokasyon, wek 50 sal pêş da, bînin serê wan. Anatolya Rohilatê de'wa dêmokrasiyê, qedrgirtina mafên mirovatiyê dike. Em bangî hemû rêxistinên şoreşgeriyê dikin ku bihêlin ew lîstika ku dijminan li Anatolya Rohilatê çê kiriye şerpeze bibe" **(121, r. 411)**.

Naveroka wan bangên rêxistinên Kurdan û xût ew isbata ber bi gelên welêt şehadet dida ku şerkariya Kurdên Tirkiyê bi siyasî gelek gihîştiye. Gaziya wan a ber bi gelên Tirkiyê, ku bibin yek dijî zordestiya Amerîkayê û rejîma Partiya Heqiyê ya dijî neteweyan, bona parastina mafên neteweyî û civakî yên hemû xebatkaran nîşan dia ku rêxistinên Kurdan dest pê kiriye razîkirina daxwaziyên xwe yên neteweyî bi pêşketina şerkariya dêmokratîk li Tirkiyê bidin girêdan.

Jean-Pierre Viennot ku di derheqa wê dema şerkariya Kurdan a nuh da dipeyive, di miqala xwe "Kurdistan, milletê ku tê perçe kirin" da dinivîse : "Eger rast e ku serokên Ankarê herdem de'wkariyên Kurdan bi neheqî hesab dikirin (ji bo nimûnê, daxwaziya Kurdan ku rojnaman bi zimanê kurdî çap bikin), wek gunehkarî di hindava tambûna axa Tirkiyê û yekîtiya komarê da didît, wê demê ew yek jî rast e ku nêzîkîhevbûna hêzên Tirkiyê yên çep û nûnerên şerkariya Kurdan a millî, ku van demên dawîn wek sansasyonek hat qebûl kirin, ne tenê rejîma Ankarê ya siyasî dike bin pirsê, lê usa jî riknê Tirkiya nûjen wek dewlet, idêolojîya wê ku bi "şoreşa millî" ya Tirkiyê ya salên 1919-1923 xuliqandiye û navê wê Kemalîzm e, dike bin şika mezin, û heya îro jî ew idêolojiya Tirkiyê ya nûjen a resmî dimîne" **(254, 1971, N° 40)**.

Di 12 nîsanê da, ORÇŞ telegramek li ser navê serok C. Sunay şand û tê da kirinên desteyên komando yên zordestiyê di hindava bineciyên Anatolya Rohilatê yên kurd da rexne û gunehkar dikirin û

de'w dikir ku mecalên berk û lez qebûl bikin bona pêşgirtina wan kirinên dijî destûrê yên cendirmên tirk. Di 20 nîsan 1970 da, sekretarya rex serok bersîva wê telegramê şand û de'w dikir ku bizanibin çi serkanî bi kar aniye di dema lênihêrandina wan qewimandinan da û salixên anegor bişînin sekretarya sereke ya rex serok.

Bersîva bi wî awayî bersîva xwetadanê bû, ku li ser ruyê xwe red bike. Eger serok bixwesta, wî dikaribû bixwe tevî wî karî biba û ji organên anegor agahdarî di derheqa kirinên cendirman li Tirkiyê, li wilayetên rohilatê, da bixwesta. Hela bi ser da, bi baweriya me, ew kirinên dijî qanûnê hema xût bi izindayîna serok dihatin kirin.

Lê dîsa jî ORÇŞ hesabê pêwîst kir ku komeke ji 16 xwendekaran bişînin wan ciyên ku cezakirên tirk li wir bûn, bona ku di cî da hay ji qewimandinên buhurî hebin. Dû ra wê komê dokuman hazir kir û di 15 gulan 1970 da ew şand ji C. Sunay ra. Di wê dokumanê da di derheqa zordestî û hovîtiyan da dihat gotin ku desteyên "komando" anîne serê wargehên jiyînê yên wilayetên Diyarbekir û Mêrdînê. Di dawiyê da wan nivîsîbû : "Serokê qedirbilind ... siyaseta qûltî, zordestî û gelkujiyê ku di hindava wî gelê ku li rohilat û rohilata başûr a Tirkiyê dimîne da tê pêk anîn, bi baweriya me kirinên usa ne ku ji derveyî goveka zagonê û mirovatiyê ne. Ew kirinên bi behana "lêgerîna qaçaxan" hatine pêk anîn çi nîşan didin ? Eger em bala xwe bidin dîroka Tirkiyê, tê ber çavan ku kirinên zordestiyên nemirovatiyê û qûlkirina kesan di vê navçeyê da herdem jî bûne. Ji dema testîqkirina komarê, ew bi behanên cihê-cihê hatin miaser kirin, lê evên dawîn bi behana "lêgerîna qaçaxan" hatine pêk anîn. Lê dîsa jî ew qaçax digerin û ji axayên wê navçeyê yên zengîn alîkariyê distînin û ji aliyê wan tên parastin".

"Ji vir û şûn da, bajarvanên Rohilatê ji mafên xwe yên bêqeziyabûnê û destpêketina hebûna xwe bêpar mane. Şevekê, qaçax êrîşî wan dikin, şeva mayîn cendirme. Sexîrî, kuştina mirovan, şuhurandina



Institut kurde de Paris

jinan, bachildana nuh ... destûra sala 1961 kiriye bin lingên xwe. Ji bo ferqa zimên, wergirtina cillan, rû-rengê mirov, li wan dixin û ew davêjin hebsên xusûsî ... Serseriyên siyasî bi fêlbaziyan dema hilbijartinan bi ser dikevin û gava dibin serok, tenê cendirman dişînin rohilatê. Ev karê nezagonî di navbera gel û rejîma dewletê da dijîhevtiyê pêş da tîne û loma jî gel êdî baweriya xwe di hindava organên dewletê da hunda kiriye. Em ku bûne xwendevanên Rohilatê yên şoreşger, van kirinên nezagonî berk rexne dikin û îlan dikin ku ji vir û pê va emê şerkariyê dijî karên dîwanê yên vî awayî bikin" **(121, r. 412-414)**.

Rêaksyona dîwana Tirkiyê li ser qewimandinên li wilayetên rohilatê nîşan da ku dewlet ne tenê naxwaze li ser bingeha humanizmê pirsa Kurdan hel bike, lê hela bi ser da jî dixwaze pelixandinên dijî Kurdan bide gumreh kirin û berdewam bike. Ewha, serok Sunay, dema peyvê xwe tevî partiyên siyasî di hezîrana 1970 da li ser qewimandinên li Kurdistana Tirkiyê sekinî û ewha got : "Tiştên usa diqewimin ku qeziya bona tambûna welêt ... Ji bo nimûnê, li rohilatê Kurdên komunîst, boy navê sazkirina dewleta serbixwe, li ferzendan digerin ku gel rakin ser piyan. Ew bi çend rêxistinan ra bûne yek û dicedînin ku dest bi tevrabûnan bikin û bigihîjin armancên xwe. Xuya ye, yên çep ku bi navê "gelên Tirkiyê" pêş da tên, dicedînin ku millet li ser çend perçeyên biçûk par-parî bikin : ji Kurdan girtî heta Çerkezan" **(209, 8.6.1970)**.

Di nîveka hezîranê da, serok ku bersîva pirsên nûçegihanê rojnama "Cumhuriyet", Kemal Ayder, dide dibêje : "Wek berê, nuha li welêt û ji derveyê wî idêolojî û kirinên usa hene ku dijî tambûna wê ne. Lê divê tukes şikber nebe ku wek berê ew kar ewê şerpeze bibin û naçin serî" **(193, 14.6.1970)**.

Sunay, ku bersîva pirsa nûçegihanê "Akşam", Aydın Soysal, da, got : "Hem li welêt, hem jî li derveyî welêt, hinek mirov dicedînin ku qewimandin û rastiya dîrokî bi cûrê nuh raber bikin, bona ku bineciyên Anatolya Rohilatê ji bo armancên xwe bi

Institut kurde de Paris

kar bînin. Lê dewlet û hukûmet hişyar in ... Divê nehêlin ku ew daxwazî û karên ku ji bo perçekirina welêt tên kirin bigihîjin qedereke usa ku qeziya be bona bêqeziyabûna millet ... Hem dewlet, hem jî hukûmet, hay ji wan planan hene û dikarin wan biteribînin" (185, 16.6.1970). Wî, bawer bike, eynî tiştî di radyoya dawîn a meha tebaxê da, di nava peyvê xwe yê dema cejna millî da, gotiye (193, 30.8.1970).

Bersîvên C. Sunay ku wî dabûn, pirsên bona mexlûqetiya Tirkiyê ya hewaskar di derheqa wê yekê da şehadet dida ku komên serkarîkir ne dixwest bi rastî pirsên hêzên pêşverû ku ewê kareke mezin bona bi dêmokrasî pêşdaçûyîna Komara Tirkiyê bianiyana safî bikin.

Di 6 hezîran 1970 da, PTK mêmorandumek di derheqa pirsên Tirkiya nûjen ên cihê cihê û yên ku hewcê safîkirinê bûn da ji serok C. Sunay ra şand. Di perça di derheqa kirinên komandoyan li Anatolya Rohilata Başûr da, PTK hovîtî û xweserîtiya cendirmên Tirkiyê ku li navçeyên Kurdan bi behana "çekgerandinê" dihatin pêk anîn rexne dikirin. Di nava mêmorandumê da dihat gotin ku eger dîwan bi rastî jî li çekan û gunehkaran digere, ew çima hema xût li wilayetên rohilata başûr digere. Gelo ne ji bo ku li wan navçeyan milletên ku bi kurdî û hinek jî bi erebî dipeyivin hene ? Eger usa be, ew hemû karên dîwanê dijî wê miqala destûra 12an, ku li gora wê hemû bineciyên Tirkiyê li ber zagonê wek hev in, bê hesabhildana millet, ziman û dîn, in. Li dawiyê xuya dibû ku siyaseta hundirî ya bi vî awayî ne tenê alîkariya parastina yekîtiya dewletê ne dikir, lê usa jî, bileks, derî bona perçebûna dewletê vedikirin (193, 9.7.1970).

Nenihêrî ku merivên pêşverû bang dikir ku dev ji hovîtiyên komondoyan berdin, lê dîsa jî zêrandina Kurdan berdewam bû. Ewha, di 11 hezîran 1970 da, desteyên komando û cendirme êrîşî gundê Boykoyê (qezayê Tekmanê, wilayeta Erzurûmê) kir û qerfê xwe li bineciyan kir û bi wan lîst. Girêdayî vê yekê, koma bineciyên Boykoyê (Ali Akkuş, Kerem

Akkuş, Mehmed Akbaba, Feyzullah Sozler, Ebdulbarî Sozler) ber bi dadxwazê Erzurûmê bûn û de'w kir ku mehkema du zabitan bikin. Yek ji wan serekê cendirma Tekmanê û yê din jî qumandarê desteya komandoyan bû. Wan serokatî li cezakiran dikir, gava wan êrîşî gundê Boykoyê kiribû. Wek ku di wê bangê da xuya dibû, desteyên komandoyan, saetek berî ku êvar bê û tarî bikeve erdê, dora gund girt û bi zorê hemû gundiyan jê derxistin. Paşê, jin û mêr ji hev kirin, ew kirin cêrge û pêşberî hev da sekinandin. Pey ra serekê cendirma Tekmanê gote mêran ku çekan bînin. Wê demê hinek mêrên gund, Ismaîl Taştan, Ferakî Kurdere, Ebdulbarî Işık, çûn malên xwe û çend tifing û damançên ku ji kal û bavan li bal wan mabûn anîn û dan cendirman. Lê dîsa jî cendirman çek dixwestin. Hela bi ser da, wan Mehmed Ekbab û Kerem Akkuş birin newalê û li wan xist. Wan Mehmed Ekbab rût-tazî kir, anî ber jinan û tirs li wî û mêrên mayîn difirand ku ewê ecêbên hîn girantir bînin serê wan, eger ew çekan teslîm nekin. Li dawiyê koma bineciyên Boykoyê de'w kir ku guneh-karên wan qerf-hebekan ceza bikin û ji heqê wan bên der **(190, 1970, № 22, r. 317-322)**. Zordariyên bi vî awayî li gundên Kurdan ên mayîn jî hatin pêk anîn. Dîwana resmî dicedand ku wan isbatan inkar bike. Bona wê meremê, wan teşkîl kir û miqala wî zabitê desteyên komando ku isbatên lêdana bineciyên gundên Kurdan inkar dikir da çap kirin, lê ew li xwe mukur dihat ku li ber jin û zaran mêr tazî kirine bona ku wan mecbûr bike ku çekan bînin. Divê bê nîşan dan ku bêhurmetkirina bi vî awayî ji bo Kurdan beramberî mirinê bû. Hela di demên buhurî yên kevnare da jî begên Kurdan kêm caran tiştên usa dikirin, ew jî di şertên fêodaliyê da wek cezayê herî mezin dihat hesab kirin. Ismail Beşikçi dinivîse ku ew mirovê ku ecêbên usa anîne serê wî xwe gelek kêm dihesiband û loma jî mecbûr dibû xwe bikuje **(121, r. 419)**.

Girêdayî wê yekê ku dîsa li wilayetên rohilatê têror berdewam bû, di dawiya hezîrana 1970 da

parlementerê meclisa Tirkiyê, M. A. Ayber, ji serekwezîr de'w kir ku pirsê li meclisê enene bike. Dema enenekirinê, wî di nava peyvê xwe da isbatên lêdana Kurdan anîn û kirinên desteyên "komando" wek dijî destûrê hesab kirin. Wî got : "Bona wê yekê li bajarvanên Rohilatê dixin, ji ber ku ew bi zimanê xwe yê dê dipeyivin ... Eger hûn serê xwe wek qulinqan bikin nava qûm û xîzgê, wê demê hûnê tiştekî nebînin û nikarin hîç pirsekê safî bikin. Siyaseta têror û zordayînê ya li Rohilatê ewê mefayên baş ji we ra neyne. Têror - ew çekê ku ji her du aliyan tûj e" (193, 25.8.1970). Wezîrê karên derve li hukûmeta Partiya Heqiyê di nava peyvê xwe da dicedand ku zordestiyên di hindava Kurdan da bide efû kirin û behane dikir ku Kurd di hindava dewletê da karê dijminayiyê dikin, bi hêzên çep ra kar dikin. Bi agahdariya wî, ew êrîşkirin hatin pêk anîn bona "ji destê bineciyan çekan berhev bikin û qaçaxan bigrin". Pey ra, ew ber bi riya Ayber bû û kir gazî : "Ewê ji Ayber ra li hev neyê ku bineciyên Rohilatê yên welatparêz û multecî bike peyhatiyên kor ên idêolojiya sor". Wê demê Ayber careke din ji wezîr pirsî : "Zordestî tê kirin an na ?". Bona wê yekê nûnerê hukûmetê êrîşî wî kir, nifir kir. "Wê demê, gava em gişk ji bajarvanên Tirkiyê hez dikin, yên çep û hûn, we idêolojiya sor kiriye serên xwe û gişkan rûreş dikin" (193, 28.7.1970). Wek ku li hêviyê bû, Qesra Millî ku piraniya wê Tirk bû ne xwest li pirsa di derheqa karên dîwanê yên dijî Kurdan li rohilata welêt da binihêre. Lê, bi salixên weşana Kurdan a li welatên derve, li meclisê 80-90 parlementerên kurd hebûn. Lê piraniya parlementerên "kurd" bona kara burjuwaziya Kurdan a bazirganiyê, axa, şêx û milkedarên ku bi Tirkan û milletên mayîn ên hukumdar ku xebatkarên Tirkiyê yên pirneteweyî dizêrandin ra kar dikir. Ew li bajaran diman û tenê wê çaxa ku pêwîst bû ku tevî kampanya berî hilbijartinên meclisê bibin dihatin navçeyên Kurdan, û hema bona wê yekê jî daxwaziyên gundiyên kurd bona wan tiştekî pûç bû, li bendî tiştekî hesab ne dikirin û li pişt guhê

xwe va davêtin. "Derebegên me - organa weşanê ya resmî "Hevra" nivîsiye - ku rejîma nuha ji xwe ra kirine delîl, ji xwe ra dijîn, bûne wek bilûra ku dikarin pê meqaman bi pere lêxin, û ew bûne yek û bûne asêgeha pêşîn li ser riya pêşveçûnê, bûne bend li ser riya şerkariya me ya dêmokratîk û millî" **(224, 1973, N° 2, r. 4)**. Kongreya xebatkarên zanîngehê yên yekîtiyên pêşekariyê ya komita karkirinê ya sereke, ku di 12-13 îlona 1970 da hate derbas kirin, gava di derheqa hevrakarkirina rêaksyona hundir û derve da dipeyivî, bangeke bi vê naverokê raber kir û da çap kirin : "Têrora faşîzmê li Anatolya Rohilatê, ku bi kirinên komandoyan dest pê bûye, siyaseta rejîmên Rohilat û Roavayê ku gelên Rohilatê dizêrînin dijî gel hesab dibe. Nuha ew zêrandin di hindava şoreşgerên zanîngeha Atatürk da pêk tînin. Têrora ku bi destê bajarvan û derebegên Erzurûmê hatiye teşkîl kirin, û ew profesor jî tevî wî karî bûne, ku bi ruhê hevrakarkirina tevî Amerîkanan hatine terbiye kirin, diyarbûneke siyaseta rêaksyonêr ku empêryalîzmê li rohilatê tevî burjuwaziya navçîgar û fêodalên hov pêk tîne hesab dibe" **(121, r. 420-421)**. Ev hemû di derheqa wê yekê da dibêje ku safîkirina pirsa Kurdan li welêt bi xurtî girêdayî pêşdaçûyîna azayên hemdêmokrasiyê, heja mirovên genc û rewşenbîr ên pêşverû, usa jî rê-derbên şerkariya prolêtarya Tirkiyê ya şoreşgerî ye.



Institut kurde de Paris

# BEŞ VI

# SERHILDANÊN KURDAN LI TIRKIYÊ DI SALÊN 70 Û DESTPÊKA 80 DA

## 1. Mêmoranduma 12 adar 1971 û testîqbûna rejîma têrorê li welêt

Têkoşîna bona mafên Kurdan ên millî ji bo berdana têror û zordestiyê li Kurdistana Tirkiyê bi hêz dibû û tevî wê şerkariya xebatkaran bona mafên xwe yên civakî-aborî û siyasî, bona firehkirina azayên dêmokrat, dijî siyaseta empêryalîzmê û casûsên wê yên li Tirkiyê, pêş va diçû. Tevî wê şerkariyê nemaze karker û keç û xort (piranî xwendekar, usa jî nûnerên rewşenbîrên pêşverû) dibûn.

Di nava wan şertan da, rêaksyona Tirkiyê biryar kir ku bi destê ordiya Tirkiyê derbekê bigihîne tevgera dêmokratîk a li welêt. Di 12 adar 1971 da, bi navê hêzên Tirkiyê yên çekdar, serokê barêgeha sereke û generalê ordiyê, Mehmud Tegmaç; qumandarê pareskeran, general Faruk Güler; Cemal Eyicioğlu û Ihsan Batur mêmorandumeke ku gelek mîna ultimatum bû ji serek, serokên sênatê û palata meclisa millî ra şand. Di nava wê mêmorandumê da dihate gotin ku bêkaretiya parlement û hukûmetê gihand anarşiyê, şerrê di navbera biran da, usa jî bêqanûniya civakî-aborî, û loma jî pêwîst e hukûmeta bi ser partiyan, ku bêqanûniyên li welêt bide hildan û rêformên ku bi destûrê hatin dîtin û li ser prensipên Ata-Türk in pêk bîne, saz bikin. Eger usa nîn be, hêzên çekdar ewê mecbûr bibin ku dîwanê hildin destê xwe (130, r. 273-274).

Wê rojê hukûmeta Partiya Heqiyê bi serokatiya S. Demirel ku ji sala 1965 da li ser hukm bû ji text hat avêtin.

Qewimandinên durojê nîşan da ku, nenihêrî jibîranîna di derheqa "rêforman" da, hêzên ordiyê dixwest ku

Institut kurde de Paris

bi mêtodên hov şerkariya karkeran bihlncirînin, nehêlin ku ceng û rewşenbîrên Tirkan, usa jî bineciyên kurd, şerkariyê bikin bona ku bigihêjin destxistina mafên xwe.

Di 26 adar 1971 da, hukûmeta "li ser partiyan" a pêşîn a bi serokatiya Nihat Erim, a ku di 26 nîsan da li wilayetên Stembol, Kocali, Diyarbekir û Siirtê halê eskeriyê li ser mehekê îlan kir, hat damezrandin. Paşê halê eskeriyê li wan wilayetan çend caran hat dirêj kirin. Bi vî awayî, halê eskerî li merkezên admînîstratîf û yên sinaetê ku tê da prolêtarya Tirkiyê pirr bû, xwendekar û rewşenbîrên pêşverû karekî pêşverû dikir, hat îlan kirin. Ew hal li wilayetên rohilatê jî hat îlan kirin, ji ber ku li wira tevgera Kurdan komên Tirkiyê yên rêaksyonêr kiribûn nava gêjgerînê.

Dîwanên Tirkiyê ku wekîldariyên bêhempa stendin, dest pê kir mecalên usa ku dijî hemû cûre şerkariya dêmokratîk û pêşverû li welêt bûn qebûl bike, bona qedexekirina rêxistinên siyasî yên çep û dijî komele û organên weşanê yên pêşverû.

Di 21 tîrmeh 1971 da, dîwana Tirkiyê di derheqa qedexekirina Partiya Karkerên Tirkiyê da îlan kir (bi isbat ew di 21 çileya paşîn 1971 da hatibû qedexe kirin) **(53, r. 12)**, lê serokên wê bi serkariya sekreterê wê yê sereke, Behice Boran, girt û da mehkema xusûsî ku di şertên halê eskerî da kar dikir. Li dawiyê mehkemê ew bi demên cihê-cihê hebs kir.

Mehkema destûrî sebebê şeklî ji bo qedexekirina karkirina Partiya Tirkiyê ya Karkeran biryarên kongreya wê partiyê ya 4an, ku biryarek jî di derheqa pirsa Kurdan da bû û ku di nava wê da xwe mukur dihat ku pirseke usa li welêt heye û ku divê ji tebiya şerkariya sinifa karkeran a şoreşvaniyê ber bi safîkirina wê bibin, hesab kir **(53, r. 12)**.

Bona kêmkirina azayên burjuwa di îlona 1971 da, para parlementerên rêaksyonêr bi destê meclisê guhart, kir nava destûra sala 1961 û 30 xalên wê hatin nuh kirin. Bi gotina N. Erim, wê destûrê

bona Tirkiyê azayên nedestûrdayî raber dikirin. Serekwezîr, N. Erim, ku bona guhartinên di nava destûrê da pêş da dihat, ew fikir diparast ku divê azayên burjuwa bidin kêm kirin, got ku li welêt pirsek heye û ku " li rohilata welêt qumandarî di şertên halê qaydeder û eskeriyê da her roj gunehkaran digre" **(193, 14.9.1971)**.

Nemaze mehkemên qaydeder-mehkemên eskerî kareki pîs dikir. Ewha, di nîveka gulana 1971 da, li Diyarbekirê civîna mehkemê, ku tê da karên koma mirovan (22 kes) lê dinihêrî û ku di "nava daxwaziya ku dewleta Kurdan saz bikin" dihatin gunehkar kirin, hat derbas kirin. Ew hemû endamên ORÇŞ bûn **(199, 11.5.1971)**. Di dawiya hezîrana 1971 da, polîs li Mêrdînê du kesên ku li bal wan "edebiyata di derheqa pirsa Kurdan da hebû" girtin, lê li Diyarbekirê 11 merivên ku li bal wan çekên cihê-cihê hebûn hatin girtin **(193, 23.6.1971)**. Wê demê nûnerên Kurdan ên rewşenbîr ên wek Tarik Ziya Ekinci, Canip Yıldırım, Kemal Burkay, Naci Kutlay, Mihdî Zana, M. Emîn Bozarslan, Yusuf Ekinci û bi sedan karkerên Kurdan ên pêşverû yên bi nav û deng, hatin girtin **(224, 1971, N° 2, r. 2)**.

Pey îlankirina halê eskerî ra, bi salixên weşana Kurdan a welatên derve yên pêşverû, tenê li Diyarbekir û Silvanê 4.000 Kurd hatin girtin **(224, 1971, N° 2, r. 2)**.

Di sala 1972 da jî girtin û têror li Kurdistanê berdewam bûn. Di sibata 1972 da, qumandariya halê eskerî ya li Diyarbekir û Silvanê daxuyaniya N° 30, ku tê da dihat gotin ku ji 7 hetanî 18 sibat 1972, pey dûgera mirovan ra 10 xwendekar, çar mamosta, weşanvanek, bazirganek û xwendekarekî liseyê li Diyarbekirê hatin girtin, weşand. Gunehê wan ew bû ku wan rêxistineke dizî, ku armanc danîbû pêşiya xwe ku "qayda destûrî û dêmokratîk bidin hildan" li Tirkiyê, "gel rake serhildana çekdarî, yekîtiya millî û yekîtiya welêt biteribîne-şerpeze bike", saz kiribû **(216, 20.2.1972)**.

Di 17 nîsana wê salê da, li Diyarbekirê civîn bi serokatiya wezîrê karên hundirî, Ferit Kubat, ku

wê li wê pirsê wek girêdayî wilayetên Tirkiyê yên Rohilata Başûr dinihêrî, hat derbas kirin. Qumandarê eskerên cendirman û generalê ordiyê, Kemalettin Eken; serokê serwêrtiya bêqeziyabûna dewletê, Orhan Erbug; walî, serokên parên bêqeziyabûna dewletê û qumandarên hêzên cendirman ên wilayetên Adiyaman, Mûş, Mêrdîn, Bingol, Siirt, Meletye, Urfa, Bitlis, Elaziğ û Diyarbekirê tevî wê civînê dibûn **(216, 17.4.1972)**. Di civînan da xurtkirina kirinên cezakirinê li Kurdistana Tirkiyê hat biryar kirin. Di dawiya nîsana 1972 da, qumandariya halê eskerî li Diyarbekir û Siirtê daxuyaniyekê (N° 63), ku tê da di derheqa kirinên dîwana eskerî ya cezakirinê da dihat gilî kirin, da weşandin. Tê da usa jî dihat gotin ku bi saya 10.230 agahdariyên ku me ji kesan stendine, ji 10.000 bêtir kes hatin girtin **(216, 28.4.1972)**.

Di gulana 1972 da, mehkema halê eskerî dest bi lênihêrandina kirinên serok û endamên Partiya Kurdistana Tirkiyê yên dêmokrasiyê kir. Di nava wan da Abdulkadir Okteman, Şebap Bilgiç, Egit Tanrıkulu, Arıf Zeyrek, Xûrşîd Onik, Mehmed Tayfan, Tahir Oktem, Mehmet Gündüz, Ramazan Halimoğlu, Yusuf Ugli, Abdullah Kalalıp, Abdulcelil Erkan, Sabri Vesek, Şerafettin Elçi, Nurettin Sık, Fadil Çiftçi, Nadir Çiftçi, Ahmed Kayer, Yusuf Bilek, Abdi Oner, Salahettin Teymurtaş, Taha Gerentaş, Fahrettin Yavuz, Süleyman Fekhan, Kaya Begdur, Edip Karahan, Musa Anter, Zulkuf Şahin hebûn. Hinek kes, wek Doktor Said, Kırmızıtoprak, doktor Faik Savaş, Nazmi Balkasa, Hikmet Buluttekin, Hasan Yıkılmış û Ali Kaplan, bi cûrê dûr ve dan mehkemê, ji ber ku ew li welatên derve bûn **(216, 23.5.1972)**.

Ew gişk jî hatin hebs kirin û cezayên cihê-cihê xwarin. Di dawiya gulana wê salê da, serokê ORÇŞ, Yumut Budak, bona miqala "Li zanîngehê li polîs xistine" ji aliyê mehkema Ankarê ya eskerî salek ceza xwar û piştre ew şand Kastamonu, sirgûniyê **(216, 26.5.1972)**. Di nîveka meha tîrmeh 1972 da, li navenda qezayê Hilwanê (wilayeta Urfayê) serwêrê

dibistana destpêkê, Şêxmûs Hacıyusufoğlu, û Mehmet Nakçi bi gunehkariya "bona propagandakirina komunîzm û kurdîzmê" hatin girtin **(193, 13.7.1972)**. Di 21 tîrmeh 1972 da, li qumandariya mehkema eskerî ya halê eskeriyê li wilayetên Diyarbekir û Siirtê, mehkema mamostayên dibistanên navîn ên navenda qezayê Taşlıçayê (wilayeta Agiriyê), Ihsan Demirci û Necati Güneş, serokê rêxistina cî (ya wilayeta Agiriyê) ya Partiya Tirkiyê ya Karkeran, Ferit Şahin, xelas bû. Ew di nava propaganda "komunîzm û kurdîzmê da" dihatin gunehkar kirin. Mehkemê 5 sal û 10 meh dan Ferit Şahin û Necati Güneş, lê Ihsan Demirci 4 sal û 10 meh ceza xwar **(216, 22.7.1972)**.

Di tebaxa 1972 da, sosyologê tirk ê bi nav û deng, Ismail Beşikçi, ji aliyê mehkema Diyarbekirê ya eskerî 13 sal ceza xwar, ji bo propaganda "komunîzm û kurdîzmê". Di nava gunehkarkirinê da dihat gotin ku di salên 1967-1971 da, Ismail Beşikçi di nava gotin û xebatên xwe da li zanîngeha bi navê Atatürk (Erzurum) û rêxistinên usa da, wek li Partiya Tirkityê ya Karkeran, Dev-Genç û ORÇŞ, propaganda "komunîzm û kurdîzmê" kiriye **(216, 15.8.1972)**.

Dîwanên eskeriyê, tevî girtina mîlîtanên pêşverû, bi behana talîmên eskerî li navçeyên Kurdan karên cezakirinê didan derbas kirin. Di 19 oktobr 1972 da, li navçeya Batmanê (wilayeta Siirtê) talîmên eskerî di bin navê dizî "Bulce-1" da hatin derbas kirin. Hêzên peya, eskerên hewa û cendirme tevî wan talîmatan bûn. Bona ku dîna xwe bidin talîmatan, serek C. Suney, serekwezîr F. Melen, serekê barègeha sereke Güler, qumandarên hêzên peya, eskerên hewa, eskerên dengizê, usa jî zabitên ordiya Tirkiyê yên mayîn hatibûn Batmanê **(216, 20.11.1972)**.

Dema talîmên eskeriyê fîşekên rasteqîn hatin bi kar anîn, bombe û lexmên cûre-cûre ku hemû tiştên ruhber li wan deran qir kirin diavêtin hevdu. Di weşana Tirkiyê da wêneyên serok C. Suney û serekwezîr F. Melen ku bi alîkariya dûrbînê mêze dikir ku çawa "dijmin tê hincirandin" çap kirin **(216, 20.10.1972)**. Pey talîman ra, serok qîmeteke

mezin da eskerên Tirkan. Di 21 oktobr da, rojnama Tercuman miqalek bi sernivîsara "Pêşmerge hatine kuştin û talîm xelas bûne" weşand.

Ev hemû tişt di derheqa kirinên ji pêş hazirkirî da şehadet dida. Di derheqa wê yekê da benda Ecvet Guresin "Işaret ji bo Rohilata Başûr" ku di hejmara Hurriyet a 22 oktobr 1972 da hatiye weşandin heye. Tê da tê gotin ku talîmên "Bulce-I" talîmên sade nîn bûn. Naveroka wan bi awakî din bû. Berî her tiştî, dema di dema talîman da, ne fîşekên sade, lê yên rast bi kar dianîn. Tevgeliya hêzên peya, eskerên hewa, usa jî cendirman, serokên qumandariya hêzên welêt ên çekdar ên sereke divê bidana nîşan dan ku dema serhildanê ewê hema xût bi wî awayî şer bikin. Xudanê miqalê di dawiyê da nivîsî ku ew talîm ewê bibin işaretdayîna berk bona wan kesên ku li rex kursiyan rûniştine û bi xwe bawer dibêjin: "Li Tirkiyê ne ku yek gel, ne ku yek netewe, lê gelek gel dijîn" û divê serbestiyê bidin wan. Bi salixên rojnama Hurriyet li qezayê Batmanê bineciyên 33 gundan tam cîguhastî navçeyên mayîn kirin (209, 21.10.1972). Hukûmeta Tirkiyê, tevî xurtkirina karên cezakirinê li hundirê welêt, dijî Kurdan hêza xwe dicivand ser hev bona dîsa tevgera Kurdan li Kurdistanê bi riya SENTO bihincirîne. Ewha, di nîveka hezîrana 1973 da, li Tehranê civîna Şêwra wezîran a SENTO hat derbas kirin. Di dawiya civînê da daxuyaniyek hat weşandin û tê da dihat îlan kirin ku ji ruyê xurtbûna karê pîre-pîrekirin û têrorîzmê, hevalbendên ji SENTO ewê hişyarbûneke bêhempa diyar bikin (216, 13.6.1973). Bi gilîkî mayîn, komên Tirkiye û Îranê yên serkarîkir mecal qebûl dikir bona nehêlin ku tevrabûna Kurdan li wan welatan bê aktîf kirin.

Hetanî bijartinên parlementê yên sala 1973, li Kurdistanê li dû mîlîtanên pêşverû digeriyan. Ew bijartin hukûmeta Bulent Ecevit a koalîsyonê ku ji endamên Partiya Gel a Komarî (PGK) û Partiya Xweşbextiya Millî (PXM) hatibû damezrandin anî ser hukm. Gava hukûmeta B. Ecevit hat ser hukm, li welêt jiyana siyasî gumreh bû. Parlementerê PGK

ji wilayeta Urfayê, Celal Baydaş, di çileya paşîn 1974 da nameyek ji serokê Palata (Qesr) Millî ra şand û tê da karên cendirmên ku agir berî bineciyên gundên Urfayê daye rusi'a dikirin.

Di nava wê namê da dihat gotin : "Li rohilata welêt li bineciyan usa dinihêrin, wek ku ew mirovên celebê duda ne. Ji ruyê zordestiyên herdemî yên ne qanûnî gelek bajarvan hatin qir kirin. Di 26 çileya pêşîn 1973 da, li gundê Alîgorê (qezayê Sîcilê) pareskerên bin qumandariya Yusuf Kalinka bi sebebê ne diyar êrîşî gund kir, ew gulle kir û binecîkî am û tam bi navê Osamnoğlu Sait Yazar kuşt ... Dû çend rojan, qewimandineke usa li gundê Mezrîkê, wilayeta Mêrdînê qewimî û ji ruyê wê du kes hatin kuştin û çend mirov jî hatin birîndar kirin".

Di dawiya nama xwe da parlementer C. Baydaş de'w kir ku cendirmeyên gunehkar ceza bikin bona karên wan ên ne zagonî. Bi vî awayî, hişkbûna pirsa Kurdan di nava karkirina ORÇŞ da jî, ku qewimandineke mezin di nava heja Kurdan li welêt bû, xuya bû.

Bi saya hereketên PGK, di behara 1974 da li meclisê zagona di derheqa baxşandinê (efû) da, ku li gora wê dest pê kir girtiyan ji hebsxanan aza bikin hat enene kirin. Di nav wan girtiyan da usa jî gelek mîlîtanên Kurdan ku xwe bi riya çepê girtibûn hebûn. Wek xuya ye, bona qebûlkirina wî karê mirovheziyê, tevî sebebên hundirî sebebên derva jî hebûn. Ji bo nimûnê, serketinên têkoşîna Kurdan li Iraqê ku hukûmeta wan di adara 1974 da îlan kir ku otonomiyê di nava goveka Iraqê da bide Kurdan. Tevî vê yekê, ev isbat tirseke mezin xist dilê komên Tirkiyê yên serkarîkir. Hema wan deman, qumandarê hêzên peya yên ordiya Tirkiyê, general Eşref Ekinci, û qumandarê eskerên cendirman, general Orhan Yiğit, çûn wilayetên Diyarbekir, Gaziantep, Urfa, Mêrdîn, Siirt û wargehên Kurdan ên mayîn ku tê da talîmên eskerî ku armanca wan ew bû ku nehêlin Kurd rabin hatin derbas kirin **(209, 12.3.1974)**.

Di nîveka salên 70 da, bi xurtbûna tevgera hêzên çep ên li Tirkiyê, tevgera Kurdan ên ku di destpêkê da rêxistinên xwe yên lêgal û ne lêgal saz kirin, usa jî rojname û kovar dan weşandin, jî hat gurr-gumreh kirin. Di sala 1975 da, nûnerên Kurdan ên genc li Stembol û Ankarê komeleyên xwe yên çandî yên şoreşgerî-dêmokratîk (Devrimci Demokratik Kültür Dernekleri), ku tê da endamên ORÇŞ ên berê tê da bûn, saz kirin. Wan komelan karê xwe li Stembol, Ankara û Izmirê, usa jî hema-hema li hemû merkezên welêt, dikir. Li Rohilatê ew bêtir li Diyarbekir, Kızıltepe, Dêrik, Mazidağ, Hekkarî, Wan û ciyên mayîn kar dikir.

Li Kurdistana Tirkiyê Komeleyên jinan ên şoreşger-dêmokratîk (Devrimci Demokratik Kadınlar Derneyi - DIKD) û Yekîtiya "Mamosteyê Şoreşger-dêmokratîk" (Devrimci Demokrat Öğretmen) ku terefdarên Şivaniyan - ku cûreke Partiya Dêmokratîk a Kurdistana Tirkiyê ya nuhkirî, ya partiya Doktor Şivan, hesab dibû - bûn **(190, 19.6.1979)**.

Di adara 1976 da, li Ankarê kovara pêşverû ya bi zimanê tirkî û kurdî "Rizgarî" dest pê kir bê weşandin. Kovar niyet danîbû pêşiya xwe ku ji "tebiyên matêrya-lîzma dîrokî" di derheqa pirsên hundirî û yên navneteweyî da binivîse. Teşkîldarên kovara "Rizgazî" daxwazî dikir ku wê bi zimanên kurdî, tirkî, ingilîzî, fransî, erebî û farisî derxînin. Di hejmara pêşîn da, kovarê bend û gotarên dijî empêryalîzmê, usa jî yên bi naverokên di derheqa serhildana Kurdan a sala 1925 da bûn, çap kirin. Roja derketina wê, ango 21 adar 1976, kovar hat girtin û berpirsiyarê wê yê sereke, Mehmed Uzun, ji aliyê dîwana Tirkiyê hat girtin. Hejmara kovarê ya duda di 21 nîsan da li Stembolê hat weşandin û pey wê dewleta Tirkiyê derketina wê qedexe kir **(222, 1976, № 1, 2)**.

Qedexekirina weşanan û mehkemekirina Kurdan bûn sebebê gumrehkirina tevgera Kurdan li Kurdistana Tirkiyê. Wan deman, li vira bi cûrê lêgal û nîvlêgal rêxistinên Kurdan ên siyasî, wek Partiya Dêmokratîk a Kurdistana Tirkiyê, Partiya Karkeran a Kurdistanê (Doktor Şivan), Partiya Karkerên Kurdistanê (Apocî),

Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê, KUK (Kurdistan Ulusal Kurtuluşçuları), Ala Rizgarî, Têkoşîn, Kawa û yên mayîn kar dikir.

Rojname û kovarên van rêxistinan, wek Roja Welat, Özgürlük Yolu, Rizgarî, Jîna nû, Devrimci Dêmokrat Gençlik, Özgürlük, Têkoşîn û çendên din, ronayî didît. Di wan weşanan da, di goveka qanûnê da li aliyên cihê-cihê yên pirsên Kurdan dihat nihêrandin, siyaseta dîwana resmî û partiyên burjuwa di hindava Kurdan da dihatin rexne kirin, daxwaziyên gelê kurd ên civakî û millî dihatin azirû kirin.

Tevî vê yekê, çend rêxistinên Kurdan dest pê kir desteyên şervanan a dizî yên ku dijî hukûmeta Tirkiyê li ber xwe dida bidin saz kirin, usa jî dijî lêpokên wan û axa û şêxên Kurdan, ên ku bi hovîtî xebatkarên kurd di nava terngezeriyê da dihiştin, derdiketin.

## 2. Bîr û baweriyên partiyên siyasî yên salên 70 di derheqa Kurdan da

Me êdî da xuya kirin ku hemû partiyên burjuwa dijî wê yekê bûn ku pirsa Kurdan li ser bingeha dêmokratîk bê safî kirin. û ew bi idêolojiya milletçîtiya Tirkan ên ku mafên gelên biçûk ên bingehî, herweha yên Kurdan jî, inkar dikirin dihatin serkarî kirin. Her naskirineke mafên gelên biçûk li ber çavê wan wek perçekirina "yekîtiya" neteweyê tirk, wek veqetandinxwazî ku dixwaze Tirkiyê par-parî bike, dihat hesab kirin.

Çi ku di derheqa hêzên Tirkiyê yên çep ên pêşverû da dimîne, ew eşkere û bi dizî xwe mukur dihatin ku li Tirkiyê pirsa Kurdan heye.

Partiya Sosyalîst a Tirkiyê ya Karkeran (PSTK) heyetiya Kurdan û pirsa Kurdan li welêt nas ne dikirin. Bernama wê (214, 25.6.1974) ku di havîna 1974 da hat qebûl kirin, ew pirs tenê wek pirsa aborî, ne ya millî û etnîkî, nas dikir û hesab dikir. Anegorî bernama PSTP, bineciyên Anatolya Rohilatê di nava rewşa aborî ya herî giran da ne û loma jî pêwîst e rewşa wan bidin xweş kirin. Partiyê li ser

wê bîr û baweriyê bû ku tenê gava ku li welêt dêmokrasî bi ser keve, ji zêrandinê bên parastin, dikarin bigihîjin wê yekê. PSTP li ser a xwe'sekinîbû ku qederê hemwetalên Anatolya Rohilatê û navçeyên mayîn divê ji qederê temamiya gelê Tirkiyê neyê birîn. Loma ew dijî wê yekê derdiket ku guh bidin hinek navçan, lê hinekan jî bavêjin pişt guhê xwe, û ew yek tevrabûna dêmokratîk dide sist kirin û dubendî-dutîretiyê dixe nava xebatkaran. PSTP dixwest ku pirs ne ku bi saya xweşkirina rewşa çend navçan bihata safî kirin, lê ku sinifa karker, gundiyên sexîr û hemû xebatkarên Tirkiyê bi hev ra tam bi aborî û siyasî pêş va herin. PSTP di derheqa wê yekê da îlan kir ku ewê jî qedrê dîn-ol, ziman û milletiya her neteweyekî bigre û ewê şerkariyê bona yekîtî û hevkariya gel bike, ji bo navê çêkirina mexlûqetiya nuh, a ku ji wî gelî ra bextewarî bîne. Lê tevî vê yekê, PSTP di nava Bernama xwe da hîç tişteki konkrêt di derheqa safîkirina pirsa Kurdan da ne gotibû.

Ji bernamê eşkere xuya dibû ku PSTP dewsa gotinên "Kurd" û "Kurdistan" gotina "Bineciyên Anatolya Rohilatê" bi kar anîye. Xuyaye ku wê usa kiriye ku xwe ji zordestiyên dîwana Tirkiyê biparêze. Lê dîsa jî berbirêbûna usa bi dilê nasyonalîstên tirk bû, işaret dida hêzên Kurdan ên pêşverû ku bêy wan ewê pirsdanînên "çêkirina mexlûqetiya nuh" ku di derheqa wê da bernama PSTP dihat gotin zor bibûna.

Partiya lêgal a mayîn a çep Partiya Tirkiyê ya Karkeran bû, ku biryarên kongreya xwe ya 4an ên qebûlkirî pûç hesab kirin û ji tebiya xwe ya rast di hindava pirsa Kurdan da paş da sekinî. Ewha, serokatiya PTK namek (Bersîva gunehkariyê) ji mehkema destûrî ra şand û tê da dihat gotin : "Eger bi rastiyê keve, Partiya Tirkiyê ya Karkeran tucar bona bajariyên bi eslê xwe va kurd de'wa mafan an jî statuya milletê biçûn ne kiriye, lê tenê de'w kiriye ku dev ji kirinên dijî destûrê ku di hindava Kurdan da tên pêk anîn bikişînin" **(222, 1976, № 1, r. 43)**. Ev işareta eşkere eksî wê biryara



Institut kurde de Paris

kongreya PTK ya 4an di derheqa pirsa Kurdan da bû. Ew di bernama PTK da, ku di sala 1975 da hatibû qebûl kirin, hatibû nivîsîn.

Bernama nuh a Partiya Tirkiyê ya Karkeran di derheqa pirsa Kurdan û milletên biçûk da xwe di bêdengiyê da danîbû. Tê da tenê dihat gotin ku PTK ewê şerkariyê dijî siyaseta rasîzm û şovînîzmê ku li welêt dihat miaser kirin bike (61, r. 42). Rast e, di Qanûnnama PTK da dihat gotin ku her bajarvanek, ji çi milletî, ji çi dînî be û bi çi zimanî bipeyive, dikare bikeve nava cêrgên partiyê, eger qanûnname û bernama partiyê qebûl bike (61, r. 61).

Dijwar e ku em şirove bikin ji bo PTK ji tebiya xwe ya rast di hindava pirsa Kurdan da paş da sekinî. Dibe ku serokatiya wê ne xwestibe culet û turuş bike, ji ber ku dibe ku partiya wê bihata qedexe kirin. Bêy sebebên objêktîf û subjêktîf ku bûne behana wê siyaseta durû, tebiya bi wî awayî di nava komên Tirkiyê yên pêşverû da rêaksyoneke ne baş pêş da anî. Ji sedî sed êdî fehmdarî bû ku siyaseta usa ewê hukm û tesîra PTK di nava Kurdên welêt da neda xurt kirin, ew jî çaxa ku wan dixwest ku rêxistinên Kurdan ên siyasî piştgiriya wan bikin.

Em li jêr li kar û barên partiyên Kurdan ên siyasî ku wan deman kar dikir binihêrin. Rêxistina herî bi nav û deng ew Partiya Dêmokrat a Kurdistana Tirkiyê bû (PDKT). Em çend miqaleyên bernama wê ku di sala 1974 da hatiye qebûl kirin bibînin (binihêre 68) :

Tevgera Tirkiyê ya Sosyalîst - di nava bernamê da dihat gotin - di şertên hinek aza da, ku bi destûra sala 1961 hatine îlan kirin, pêş da diçû û bi hêz dibû. Wê li ser rewşenbîrên kurd û xebatkaran hukmekî mezin hiştiye û wê alîkarî kir ku bîrbaweriyên sosyalîst di nava rewşenbîr û xebatkarên kurd da bên belav kirin.

Gelê me, di bernamê da dihate gotin, ku bi dersên şerkariya millî-azadariyê yên berê û bi pratîka şoreşgeriyê ya cihanê ku pê hatiye hîn kirin - fêr kirin, hatiye ser wê baweriyê ku bona serketina di

şerrê dijî zordestên faşîst da, bona qerarkirina qederê xwe, pratîkeke usa ku bi idêolojiya prolêtarya va bê çekdar kirin pêwîst e, û divê xwediyê dîssîplîna pola be. Û loma jî wî rêxistina xwe, Partiya Dêmokrat a Kurdistana Tirkiyê, damezrand.

Armaca PDKT ew e ku ji bona gelê kurd li Kurdistana Tirkiyê "mafê bi xwe qerarkirina qederê xwe" bi dest bixîne. Ew li ser wê bîr û baweriyê ye ku bi riya şoreşa millî- dêmokratîk dikarin bigihîjin wê armanê, bi şerkariya gelî bi ser bikevin; loma jî wê biryar kir ku hêzên berxwedayînê yên çekdar saz bike (miqal 2).

PDKT ku ordiya gel saz kir, di nava dema şerkariya demdirêj da diviya navçeyên Kurdan ji hêzên Tirkiyê yên çekdar bida paqij kirin û li Kurdistana Tirkiyê dîwana gelî-dêmokratîk bide saz kirin. Bona wê yekê ku bixwe biryar bistîne, ewê pêşeniya dijî empêryalîzmê, dijî faşîzmê, ku gelek kesên millet û hemû hêzên dêmokratîk ên niştimanperwer bikevin navê, saz bike.

PDKT ku şerrê çekdarî wek riya safîkirina pirsa millî wek riya tek-tenê hesiband, bangî rêxistinên Tirkiyê yên şoreşgeriyê yên prolêtaryayê yên ku bi ulmê Marksîzm- Lênînîzmê dihatin serkarî kirin ku bibin yek, "bona dema ku ferzend hebe, ew dijî lêpokên empêryalîzmê şerr bikin ... dijî hukumdaran derkevin", lê usa jî bi hev ra kar bikin bona sazkirina pêşeniya yekîtiya ku bikaribe xwe-biryarstendina millî nas bike.

PDKT hêza gelê kurd a bingehî gundî dihesiband û loma jî ew di nava karên xwe da hêviya xwe datanî ser gundiyên Kurdistanê, lê di hêlekê da jî bi idêolojiya civaka karkeran va dihat serkarî kirin.

Di dema şervaniyê da, gundîtî divê bibûya hevalbenda civaka karkeran. Yekîtiya karker û gundiyên Kurdistanê diviya ji aliyê nûnerên rewşenbîr, xwendekar, karmend, senetkarên ku bernama PDKT nas dikir bihata parastin û hêjayî piştgiriyê bibûya (miqal 4).

PDKT bona testîqkirina karê yekîtiyê tevî wan rêxistinên siyasî yên şoreşgeriyê yên ku eşkere

heyetiya gelê kurd nas dikir pêş da dihat. Usa jî wê piştgiriya mafên wan ên gelî û dêmokratîk dikir.

PDKT dijminê herî mezin ê hemû gelên ku bona azadariya millî şerr dikin empêryalîzmê dihesibîne; ev empêryalîzma ku bi girêdana peymanên siyasî û eskerî yên cihê-cihê tevî hukûmeta Tirkiyê, ku bona kara burjuwaziya eskerî ya mezin pêş da tê û ku her dem cedandiye ku şerkariya gelên Tirkiyê ya bi heq bihincirîne (miqal 8).

Şerkariya PDKT li ser netirsandina biratî û wekhevtiyê ya gelên tirk û kurd di şertên bijartina wekhevtiya tam da, di sînorên Komara Tirkiyê ya necihêbûyî da hîm dibû (miqal 3).

Tixûbên Kurdistana Tirkiyê diviyan anegorî faktorên etnîkî, erndîgarî, aborî û dîrokî bihatana testîq kirin (miqal 7).

PDKT îlan kiriye ku ewê pevgirêdanên dostiyê û hevrakarkirina tevayî bi wan hemû welatên azayiyê yên pêşverû, rêxistin û gelên ku têkoşîna gelê kurd a bi heq diparêzin ra testîq bike (miqal 28).

Bi tomerî hildayî, ev xalên bernamê şehadet dida ku PDKT bona gihîştina armanca xwe ya sereke - testîqkirina dîwana gelî ya dêmokratîk - niyet danîbû ku li pêşiyê hêviya xwe deyne ser yekîtiya karker û gundiyan, hêzên çekdar ên liberxwedayînê ku nemaze ji gundiyan bûn, yên ku ewê bikaribûna bere-bere Kurdistanê ji hizûra Tirkiyê û Tirkan bidin paqij kirin.

Lê, PDKT ku bi dizî kar dikir, hukmê xwe di nava gelê kurd da ewqas pirr jî ne dabû belav kirin, hêzên wê jî li Kurdistana Tirkiyê pir zor nîn bûn ku bikaribe bi xwe pirsdanîna xwe safî bike, ango maf bi destxîne ku gelê kurd bi xwe li ser qederê xwe biryar bistîne. Bi tomerî hildayî, PDKT di têkoşîna Kurdan da riya rastê girtibû. Em bêjin ku hemû nûnerên mexlûqetiya Kurdan di cêrgên partiyê da hebûn : derebeg, burjuwaiya bazirganî, rewşenbîr, gundî, karker. Hukmê wan xwezma li Başûrê Kurdistana Tirkiyê, nêzîkî tixûbên Sûriye û Iraqê, pirr bû.

PDKT di nava karkirina xwe da mulayim bû û pevgirêdanên wê yên xurt tevî Partiya Dêmokratîk a Kurdistanê (PDK) hebûn. PDKT alîkariya wê dikir, bi riya tixûbê Sûriyê çek digihandin wê **(254, 1980, № 318, r. 9)**.

Di sala 1978 da, kongreya PDKT a ku bernama nuh qebûl kir û navekî nuh danî ser partiya xwe - Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê (Kurdistan Işçi Partisi) hate derbas kirin **(li 48 binihêre)**.

Wek ku di bernamê da dihat gotin, PPKK partiya karkerên Kurdistanê, ku bi Marksîzm-Lênînîzmê va tê serkarî kirin, ye. Armanca PPKK a sereke ew e ku hukmdarî, zêrandin û qûlîtî bên hildan, li Kurdistana yekbûyî mexlûqetiya bê zêrandin saz bike. Lê di merhela pêşîn da, PPKK dixwest ku şerkariyê bike bona avêtina hukumdariya zêrandçiyên Tirkiyê ji ser text, herweha wan derebegên Kurdan ku bi wan va girêdayî ne û empêryalîzmê, bona ku gelê kurd bigihîje xweqerarkirina millî.

Bi tomerî hildayî, piraniya endamên Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê ji burjuwaziya hûr bû û ew rêxistineke neteweyî ya ku di bin hukmê bîr-baweriyên sosyalîzmê û dîtinên wê da ye bû. Serokatiya partiyê mirovên ji malbatên Kurdan ên dewlemend, axa, beg û serekeşîr bû. Pey wergerandina dewletê ya eskerî ya sala 1980, di partiyê da dijîhevbûna ku bû sebebê perçebûna partiyê ya nuh bi hêz bû. Her du komikên pêşdahatî bi navê Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê pêş da dihatin. Ev hemû bûn sebeb ku gelek endamên wê jê derketin, partî gelek sist bû. PPKK ji sala 1978 li Swêd kovara Armanc çap kir, lê xwediyê wê Komela Kurdan a Çandî û Hevkariyê ya Swêd dihat hesibandin.

Wê demê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê (PSKT) aktîfbûneke mezin diyar dikir. Ew rêxistina "Özgürlük Yolu" bû û di sala 1974 da hatibû damezrandin. Diketin nava wê nûnerên rewşenbîrên Kurdan, û berî hertiştî ew ji rewşenbîrên Kurdan ên pêşverû, xwendekar, karker û palên mexlûqetiya Kurdan pêş da dihat.

Institut kurde de Paris

Di nava bernama PSKT da dihat gotin ku armanca wê ya sereke ew e ku li Kurdistanê civaka sosyalîst saz bike. Armanca yekemîn ji bo partiyê ew bû ku ji kolonyalîzmê xelas bibin û azayiya millî bi dest bînin, hukmê derebegiyê bidin hildan û li welêt dêmokrasiyê testîq bikin **(li 64 binihêre)**.

Tehlîlkirina xalên bernamê û karkirina PSKT nîşan didin ku ew partî bi prensîpên xwe yên idêolojîk bêtir nêzîkî sosyalîzma zanyarî sekiniye, ne wek partiyên Kurdan ên siyasî yên mayîn ku ulmê Marksîzm-Lênînîzmê diparêzin.

Li Kurdistana Tirkiyê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK), ku jê ra Partiya Apociyan tê gotin, jî kar dikir. Ev partiya ku di sala 1977 da hatiye damezrandin tesîra mezin li ser xwendekarên dibistanên navîn û lîseyan, li ser xortan hiştiye. Ew bona pêwîstiya têrora şexsî, kuştina dijmin û neyaran, bi xusûsî polîs, casûs û şerletanan, pêş da tê. PKK dijî hemû partiyên Kurdan ên mayîn şerkarî dikir, û ew bû sebeb ku nûnerên rêxistinên Kurdan bi çekan rabin dijî hev. Ji ruyê wan pevçûnan, bi dehan û sedan welatparêz û niştimanperwerên kurd hatin kuştin û ew bû derbeke giran bona şerkariya Kurdan a azadariyê li Tirkiyê. Di 1978 da, PKK manîfêsta "Riya Şoreşa Kurdistanê" da weşandin û tê da ji tebiyên gelek çep pirsên jiyana siyasî ya hundirî û li derve dida tehlîl kirin **(li 47 binihêre)**.

Bi tomerî hildayî, rast e, PKK bi gotina xwe Marksîzm-Lênînîzm girtibû, lê bi rastî piştgiriya komên çep ên radîka digirt û kêm hildida ser hesêb ewê rewşa têkoşîna li Kurdistanê di çi perhele de ye, dereca xwefehmdarî-xwehesîna prolêtarya Kurdan û gundiyan li ser çi bingehî ye.

Li Kurdistana Tirkiyê partiyeke mayîn jî hebû - KUK (Kurdistan Ulusal Kurtuluşçuları - Parêzkerên Kurdistanê yên millî). Ew rêxistin, ku ji perçebûna PPKK di kongreya 1979 da pêş da hat, bi tomerî hildayî hêviya xwe danîbû ser gundiyên niştimanperwer. Di oktobra 1979 da, wê pirtûkeke biçûk bi sernivîsara "Şerr ji bo azayiya Kurdistanê" weşand **(39, N° 6)**.

Institut kurde de Paris

Ew pirtûk nemaze bingeha bernama partiyê bû, ji ber ku di nava wê da di derheqa siyaseta wê ya di hindava pirsên tevgera Kurdan a cihê-cihê da, pirsên hundirî û derve, usa jî riyên şerkariya Kurdan bona azayiya millî dihatin lênihêrandin, dihat ronayî kirin.

KUK bona sazkirina partiya siyasî ya serbixwe li Kurdistana Tirkiyê pêş da dihat. Bi bîr û baweriya wê, tebiya wê usa bû, ne tenê bona ku Kurdistan di rewşa kolonî da bû, lê nemaze bona wê yekê ku şerkariya şoreşgeriyê li Tirkiye û Kurdistana Tirkiyê li ser derecên cihê-cihê bûn. Rêxistina KUK, ku li ser xebatên bingehvanên Marksîzm- Lênînîzmê hîm dibû, dicedand ku şerkariya Kurdan bona azayiya xwe mak bike, û bi baweriya wê divê li bendê nesekine ku prolêtarya Tirkiyê şoreşa civakî pêk bîne. Rêxistina KUK partiyên Tirkiyê yên çep ku, bi baweriya wê, dixwest Kurdistana Tirkiyê wek berê qûl bihêlin û ku dijî prensîpa lênînîzmê ya di derheqa bijartina millî bona xweqerarkirinê bûn rexne dikirin (39, Nº 6, r. 7, 9).

Tehlîla xalên bernamê û karkirina KUKê nîşan didin ku, rast e, KUK dicedand xwe wek partiya Marksîst-Lênînîst nîşan bide, lê di hêla gelek pirsan da ew li ser tebiya nasyonalîzmê bû. Bi tomerî hildayî, wê rast dikir ku di pirsa Kurdan da rêxistinên Tirkiyê yên çep rexne dikirin, lê tevî wê yekê wê dicedand ku ji tebiyên nasyonalîzmê dereca şerkariya prolêtarya Tirkiyê ya şoreşgeriyê ya dijî empêryalîzmê kêm bike û bêy bingeh şerkariya li Kurdistana Tirkiyê bide bilind kirin, mezin kirin. Ew partî, bêy hesabhildana rewşa civakî-aborî û siyasî, bêy lihemberîhevkirina hêzan li rastiyê bikeve, bona sazkirina Kurdistana serbest pêş da dihat. Hela bi ser da, di nava karkirina xwe da KUK bi kêm tiştan va ji PPKK dihate cihê kirin û pê ra şerrekî bê prensîp ku ziyaneke mezin digihand tevgera Kurdan dikir.

Koma Rizgarî ku ji nûnerên rewşenbîrên Kurdan ên ku pey wergerandina eskerî ya 12 adar 1971, bona damezrandina Ocaxên Rohilatê yên Şoreşgeriyê yên

Institut kurde de Paris

Çandî (DDKD), hatibûn girtin hate saz kirin. Pey efuwa (baxşandin) nîveka salên 70, wan weşana Komele saz kir û dest pê kir ji sala 1976 de kovara Rizgarî çap bikin. Endamên komikê dixwest ku di wê kovara bi du zimanan (kurdî û tirkî) da "li dîroka têkoşîna Kurdan a millî û pêrspêktîvên pêşdaçûyîna wê amade bikin". Wan dicedand ku hemû welatparêzan û karmendên pêşverû li dora xwe bicivînin bona "belavkirina bîr-baweriyên Marksîzm- Lênînîzmê".

Aktîvîstên Rizgarî wek parastvanên serbestiya her çar perçeyên Kurdistanê pêş da dihatin. Wan digot ku pêwîst e berî her tiştî li Kurdistanê têkoşîna şoreşgeriyê bidin teşkîl kirin, lê paşê hemû Kurdan di nava "pêşeniya millî" da li ser hev bicivînin. Pêwîst e li Rohilata Nêzîk bi destê karkerên ereb, tirk û faris şoreşê bikin **(254, 1980, № 318, r. 6)**.

Di sala 1979 da, ji ruyê nerazîbûnên mezin tevgera Rizgarî bû du perçeyên ku ew gihand ber kenarê hundabûn û pîrekirinê.

Pey 12 îlon 1980, bawer bike hemû serokên Rizgarî hatin girtin û ew yek jî bi xerabkarî hukm li ser karkirina wê komikê kir.

Koma Ala Rizgarî ku di sala 1979 da, ji ruyê perçebûna di nava Rizgarî da xuliqî, di sala 1980 da li Diyarbekirê pirtûka Ala Rizgarî weşand **(186, 1980, № 4)**.

Wek ku ji weşana wê xuya dibû, Ala Rizgarî di şertên hişyarbûna millî ya salên 70 da mîtîng, û meşîn dan derbas kirin, bangên ku tê da zêrandina millî û zordestiyên li Kurdistana Tirkiyê derdixistin meydanê weşandin. Lê ji ruyê karkirina koma çep a di nava têkoşîna Kurdan da, ew bû sebebê pevçûyînên di navbera eşîrên Kurdan ên cihê-cihê da. Di van şertan da, koma Ala Rizgarî biryar kir ku tevî serhildana gelî bibe, serokatiyê lê bike, wê bike ya şoreşgeriyê.

Rast e, komika Ala Rizgarî PKK di nava êkstrêmîzma çep da gunehkar dikir, lê bixwe bi hindik tiştî va ji wê dihat cuda kirin.

Dokumentên bernamê û yên mayîn, usa jî karkirina partiyên Kurdan di derheqa wê yekê da, şehadet dida ku piraniya wan bi resmî idêolojiya Marksîzm-Lênînîzmê qebûl dikir. Lê mirov nikare wan partiyan wek yên marksîst bihesibîne, ji ber ku di nava idêolojiya wan da hela gelek tiştên burjuwa-nasyonalîst hebûn. Lê dîsa jî di nava aktîfbûna şerkariya Kurdan a salên 70 da, partiyên Kurdan ên siyasî û rêxistinên mexlûqetî yên ku êdî bi siyasî gelek gihîştibûn û gelek tişt bona xwefehm-dariya gelê kurd û bona xurtkirina şerkariya wî ya bo mafên xwe yên gelî li Tirkiyê kiribûn roleke mezin lîst.

Partiya Tirkiyê ya Komunîst jî pêşniyar dikir ku bi tebiyên Marksîst-Lênîsîzmê pirsa Kurdan bide safî kirin. Di derheqa wê yekê da bernama PKT ku di sibata 1975 da hatibû hazir kirin û li kongreya wê li Konyayê di behara 1977 da hatibû qebûl kirin dibêje.

PKT bona pêşîgirtina siyaseta helandina gelên biçûk ku bi zorê dihate kirin û bona dayîna hemû mafên wan ên dêmokratîk dihat. "Partiya Komunîst a Tirkiyê - di bernamê da dihate gotin - bi prensîpa lênîniyê ku li gora wê di her destûreke neteweyekî da heye ku bi xwe qederê xwe qirar bike bawer e. Bona wan milletên ku li welêt bi kitle dijîn (Kurd, Laz û yên mayîn), divê mafên wan ên dêmokratîk û destûrî bê gilî-gotin bên nas kirin, usa jî divê şert bên saz kirin bona pêşdaçûyîna çanda wan milletan".

Di nava bernamê da xuya dibû ku mafê bona xweqerarkirinê nîşan nade ku pêwîst e herdem de'wê û propaganda bikin bona ku milletên biçûk bên cihê kirin. Di bin wê da em dikarin tê bigihîjin ku mafê her milletekî biçûk heye ku di sînorên dewleta dêmokratîk da bimîne û tevî wê hevrakar-kirina aborî û siyasî ya xurt û kîp derbas bike. Komunîst divên ji milletên biçûk ku entêrnasyonalîs-lênînvanên paşerojê ne ra propaganda bikin ku ew tevî karkerên temamiya welêt kar bikin. "Komunîstên welatê me - di nava bernamê da xuya dibû - bêy hesabhildana ku ji kîjan milletî ne, ji bo yekîtiya



Institut kurde de Paris

karker û gundiyên tirk ên bira, tevî hemû xebatkarên milletên biçûk, şerkariyê dikin".

PTK bona dijderketina zulma millî û rengçermiyê û bona pêwîstiya hildana wan zagon û biryarên ku nahêlin çand û zimanê gelên biçûk pêş va herin pêş da tê.

Ev bûn daxwaziyên bernama PKT yên bingehî yên di derheqa pirsa millî da, di derheqa pirsa Kurdan da.

Anegorî bernamê, organa komîta navbendî ya PKT rojnama Atılım di nîsana 1979 da bangên bona lê gulanê weşandin û tê da bi de'wkirinên dêmokratîk ên mayîn ra bang dikir ku dev ji zorlêkirina di hindava milletên biçûk da bidin, mafên wekhev bidin Kurdan û gelên biçûk ên mayîn, usa jî mafê gelan bona xweqerarkirina aza îlan kir. Tevî vê yekê, Komiteya Navbendî ya PKT bangî komunistan dikir, usa jî gazî sosyalîstan, niştimanperwerên ji partiya Gel a Komarî û dêmokratên kurd dikir ku têkoşîna xwe bidin hêz kirin bona yekîtiyê, bona sazkirina pêşeniya millî-dêmokratîk (189, 1979, № 4, r. 1).

3. Berdewamkirina pelixandinê li Kurdistana Tirkiyê û Ermenistana roava li dawiya salên 70

Girêdayî tevrabûna dijî empêryalîzmê, dijî Şahê Îranê û aktîfbûna têkoşîna Kurdan li Kurdistana Iraqê, dîwana Tirkiyê dest pê kir ferzendên berk dijî tevgera karkeran li Tirkiyê ku çiqas diçû zêde dibû qebûl bike, usa jî dijî şerkariya Kurdan bona mafên xwe yên gelî derket. Di dawiya meha sêptembrê 1978 da, hukûmeta Tirkiyê li 13 wilayetên welêt halê eskeriyê da îlan kirin. Ango li wilayetên Adana, Ankara, Elazîz, Bingol, Erzurûm, Erzincan, Gaziantep, Stembol, Kahramanşehir, Qers, Meletye, Sîvas û Urfê.

Behana bona îlankirina halê eskeriyê ew bû ku li Kahramanşehirê qewimandinên bi xwîn bûbûn û ji ruyê wan bi salixên resmî 100 kes hatibûn kuştin û çend sed mirov jî hatibûn birîndar kirin. Bilî



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHÈQUE

Stembol û Ankarê, li wan wilayetên ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn halê eskeriyê hatibû îlan kirin.

Wezîrê karên hundirî yê Tirkiyê, Özaydınlı, ku di civîna parlementê ya her du sarayan da peyivî, pêwîstiya qebûlkirina ferzendên usa bi wê yekê va mak kir ku têror û zordestiya li welêt gihîştiye wê merhelê ku qeziya mezin jê tê. Wezîr herweha nîşan da ku êlêmentên dijminatiyê bi xusûsî li navçeya welêt a rohilata başûr bijartine bona pêdadanîna dijîtiya dînî-olî di nava qelfên bineciyan ên cihê-cihê da, herweha di navbera sunnî û şîiyan da. Bi gotinên serekwezîr B. Ecevit, hukûmet mecbûr bû biryarê qebûl bike bona îlankirina halê eskeriyê li çend wilayetên welêt, ji ber ku têror û êrîşkirinên çekdarî pirr zêde bûne û yekîtiya dewletê û tambûna wê ketiye bin derbeke mezin.

Pevçûyînên bi xwîn li Kahramanşehirê ji aliyê komandoyên faşîst, terefdarên Partiya tevgera nasyonalîst a profaşîzmê ya A. Türkeş hatine tev rakirin. Rêaksyonvanan, ku dijîtiya di navbera sunnî û şîiyan da anîbû, dicedand ku derbeke xedar bigihînin şerkariya Kurdan, ji ber ku li wê navçê şîîzm (hîn rasttir, Elewîtî ku sêkteke şîî ye) ji aliyê Kurdan tê parastin. Nûnerên rêaksyonê dicedand ku sunnî û şîiyên musulman ku li Tirkiyê tim jî xwe hêla hêzên pêşverû digirin û li hilbijartinên parlementê yên dawîn yên sala 1977 da dengê xwe da bona Partiya Gel a Komarî ya çep, usa jî bona partiyên çep ên mayîn, berî hev bidin.

Em dikarin "pêşverûtiya" şîiyên elewî bi wê yekê va şirove bikin ku ew bi sed salan ji aliyê dîwana Tirkiyê ya navendî û cî bi olî û millî hatin zêrtandin. Anegorî weşana Tirkiyê, li dawiya salên 60 li Tirkiyê weke 10 milyon şîî diman **(193, 13.6.1967)**. Li Anatolyê, hem Tirk, hem jî Kurd şîî tên hesab kirin. Para şîiyan a bingehî li wilayetên Maraş, Adıyaman, Sivas, Qers, Meletye, Elaziz, Hatay û Manis dijî **(121, r. 227)**, ango li wan wilayetên ku pareke bineciyên wan Kurd in. Bêtir Kurdên Dersîmê bi dîn-hebandina xwe va elewî û kızılbaş in.

Dîwana Tirkiyê ji berê-paş da di navbera sunnî û şîiyan da dijminayî pêş da aniye. Ji wan gundên ku tê da ji wan her du dînên islamê bi hev ra dijîn gelek hindik mane. Destûra sunniyan tu nebû ku bi şîiyan ra bizewicin, usa jî şîî nikaribû bi sunnî ra bizewice. Û di salên 70 da şerrên çekdarî ku tê da qeimandinên Kahramanşehirê hebûn di navbera wan da qewimîn.

Rêaksyonêrên Tirkiyê, ku dijminayiya sunnî û şîiyan pêş da dianî, dicedand ku derbeke xedar bigihînin şerkariya Kurdan û di wê derecê da ew ferzend bi kar anî ku li wê navçeyê nemaze Kurdên ewelî diman.

Divê bê xuya kirin ku li Tirkiyê dîndarî bi tevayî, şîîzm jî pê ra, roleke usa giring, wek li Îranê, nalîze.

Di destûra Komara Tirkiyê ya pêşîn a sala 1924 da miqaleke usa hebû ku digot ku islam dînê dewletê hesab dibe. Ev yek berdaxwerina Kemaliyan a bi nav û deng bû li ber rûhaniya musulmaniyê ku wê demê tesîreke mezin li welêt dihişt û pevçûyînên wê pirr bûn. Lê, sala 1928 ew miqale hat hildan. Sala 1936, di destûra Tirkiyê da tevî 5 prensîpên mayîn prensîpa 6a jî ku tê da didît meçîtê ji dewletê bidin cihê kirin hat nivîsîn. Miqala duda ya destûra Tirkiyê ya sala 1961 jî ew prensîp qebûl kir (54, r. 9). Hela bi ser da, kodêksa Tirkiyê ya mehkema wan kesan gelek berk ên ku dîn û propaganda dîn bona armancên xwe yên siyasî bi kar tînin ceza dike. Anegorî wê kodêksê, gelek serokên Kurdan dû hincirandina serhildana salên 20-30 li Kurdistanê, usa jî pey şerr ra, hatin girtin.

Bi vî awayî, ji ruyê xeysetê Tirkiyê yê torinîyê (arîstokrat) karkirina dîndarî-olperestiyê li Tirkiya Komarî herdem jî bi zagonan dihat dahudûd kirin. Lê dîsa jî, partiyên welêt ên siyasî dicedand ku dîn bona kara xwe bidin xebatê. Ewha, partiya burjuwaziya hûr (Milli Selamet Partisi) eşkere piştgiriya dîn dikir û loma jî dîndarên bajar û gundan bi piraniya xwe va piştgiriya wê dikir. Serokê wê

partiyê, Necmettin Erbakan, û serokên wê yên mayîn eşkere henekên xwe bi serokên çend welatên musulmaniyê dikir, bona ku hem li welêt, hem jî li derveyî sînorên wî gelek sempatîzanan ji xwe ra peyda bikin. Lê dîsa jî Partiya "Milli Selamet Partisi" li hev ne hat ku di nava hilbijarvanan da bigihîje serfiraziyeke mezin û bi jimara ciyên parlementên li meclisa Tirkiyê ew a çaran bû. Lê pey wergerandina dewletê ya sala 1980, ew partî ji hev belav bû.

Divê bê xuya kirin ku dîwana Tirkiyê wek berê helan dida dijminayiya di nava eşîran da. Ewha, anegorî agahdariya weşana Tirkiyê, di destpêka îlona 1978 da, li gundekî wilayeta Wanê eşîrên Kurdan bi çekan rabûn dijî hev. Ji ruyê wê pevçûyînê du kes hatin kuştin, 15 saxesax li malên xwe şewitîn, 6 kes jî birîndar bûn.

Di destpêka adara 1979 da, ji ruyê bêkaretiya dîwanê, li ser sînorê wilayetên Diyarbekir -Urfayê eşîrên Îzol û Nasumlu 4 roj bi hevdu ra şerrekî giran danî û ji ruyê wî çend deh kes hatin kuştin û birîndar kirin **(193, 6.3.1979)**.

Di adara 1979 da, di şertên halê eskeriyê da qumandariya leşkerî çend bang dan weşandin, û li gora wan li wilayetên Adana, Kahramanşehir, Gaziantep û Urfayê ronayî dît, belavkirin û firotana ji 20 bêtir rojname û kovarên çep, usa jî weşanên kurdî, dihatin qedexe kirin **(193, 7.3.1979)**. Ji bo nimûnê, dîwana Tirkiyê qedexe kir ku kovarên Rizgarî, Roja welat, Devrimci Demokratik Gençlik, ku bi zimanên tirkî û kurdî çap dibûn, ronayiyê bibînin **(188, 1979, N° 1, r. 12)**.

Wek ku weşana Tirkiyê di nîsana 1979 da îlan kiriye, "kirinên pîrepîrekirinê" ku li rohilata Tirkiyê hatin xurt kirin û agahdariyên gelek hewarze dihatin barêgeha sereke. Di nava bersîvdarên bona wî karî usa jî wezîrê karên mexlûqetiyê, Şerafettin Elçi **(42)**, ku bona kurtkirina sînorên wî erdê ku lê halê eskeriyê hatibû îlan kirin, û usa jî dijî îlankirina halê eskeriyê li Diyarbekirê pêş da dihat, hebû **(209, 19.6.1979)**.

Di destpêka nîsana 1979 da, civîna Şêwra bêqeziyabûna millî ku li pirsa di derheqa veqetandinxwestina Kurdan li rohilata welêt da dinihêrî bû (231, 6.4.1979). Şêwra bêqeziyabûna millî biryara xusûsî ku li gora wê qumandariya Tirkiyê dest pê kir dîsa esker bişîne navçeyên rohilata başûr û rohilatê, yên li ser sînorê Tirkiyê, qebûl kir. Ew pareskerên ku li ser sînorên rohilatê bûn di halê şervaniyê da bûn.

Girêdayî wê yekê, ferzendên bêqeziyabûnê yên zortir hatin pêk anîn ji bo ku nehêlin ku Kurd ji sînorên Îran û Iraqê derbasî sînorê Tirkiyê bibin. Ji bo nimûnê, li navçeyên li ser sînor gelek paresker hatin berhev kirin. Ew eskerên peya bûn, lê li best û çolan pareskerên hêzên bi motor anîn. Wê demê şêwrdariya 14 waliyên wilayetên Tirkiyê yên rohilata başûr û rohilatê hate derbas kirin, di wê dema ku tê da mecal hatin qebûl kirin bona xurtkirina zordestiyên dijî tevrabûna Kurdan. Tevî wê yekê, gelek tevger hatin rêtin bona koordinasyonkirina karên hukûmetên Tirkiye û Îranê, ji bo hincirandina tevayî ya tevrabûna Kurdan. Ewha, di nîveka pêşîn a meha nîsanê 1979 da, serokê barêgeha Tirkiyê yê artêşa sereke, Evren, çû Iraqê û li wira hevpeyvîn bona yekkirina tevgera bona "normalkirina" rewşê li Kurdistanê derbas kirin.

Di 26 nîsana wê salê da, hukûmeta Tirkiyê li 6 wilayetên Kurdan ên mayîn ji - Adıyaman, Diyarbekir, Hekkarî, Mêrdîn, Siirt û Tuncelî - halê eskeriyê da îlan kirin.

Hukûmeta Tirkiyê ku halê eskeriyê şirove dikir, dîsa di derheqa casûsiya li hundirê Kurdistana Tirkiyê û li derveyî wê da peyivî. Di nava biryara hukûmeta Tirkiyê ya di derheqa firehkirina agahdariyan li ser halê eskeriyê da dihate gotin ku "ewê mecalên berk di hindava wan yekîtiyên pêşekariyê (sendîka) û komelên ku ewê dijî halê eskeriyê derkevin da bên qebûl kirin" (198, 1979, N° 7, r. 5), û bi rastî jî dîwana eskerî wek berê wan kesên ku di nava casûsiyên usa da dihatin gunehkar kirin, ku dijî rejîma Tirkiyê bûn digirtin. Bi wê yekê va halê eskerî dîsa nemaze dijî sinifa karkeran, dijî hêzên

dêmokratîk ên pêşverû û dijî gelê kurd ku şerkariya xwe bona mafên gelî berdewam dikir bû. Di tîrmeha sala 1979 da dest bi weşana "Özgürlük", ku peyhatîdûmayîka "Özgürlük Yolu" û "Roja welat" ku pey çileya pêşîn 1978 ra hatibûn qedexe kirin dihat hesab kirin, bû.

Rojnama "Özgürlük" ku rewşa li welêt tehlîl dikir, nîşan dida ku îlankirina halê eskeriyê, ku bona kara rêaksyona Tirkiyê bû, ewê alîkariya safîkirina pirsa ku li pêşiya welêt sekiniye neke. Rojname li ser wê bîr û baweriyê bû ku ew pirs dikare bê safî kirin, eger li welêt dêmokrasî pêş va here, ango : rêorma ziraî bê derbas kirin û xwelî bidin gundiyan, koopêratîvên malhebûna gundîtiyê bên saz kirin û paşmayînên fêodalîzmê bên hilanîn, miqalên mehkemekirinê yên 141 û 142an ên profaşîzmê bên hildan û rêxistinên faşîst bên qedexe kirin, mafên dêmokratîk û azayiyên rasteqîn bidin xebatkarên Tirkiyê, dev ji siyaseta nasyonalîzm û şovînîzmê ya di hindava Kurdan da berdin, dest ji zêrandina aborî ya Kurdistanê û gelên welêt ên biçûk bikişînin û destûr bidin Kurdan ku bi resmî bi zimanê xwe yê dê bipeyivin.

Rojname ku ber bi hemû hêzên welêt ên dêmokratîk dibe, bangî wan dike ku dest ji menfeetên xwe yên siyasî yên teng bikişînin û bibin yek bona ku derba cîwar bigihînin hêzên Tirkiyê yên rêaksyonêr (219, 15.6.1979). Hema wê demê bû ku şerkariya xebatkaran bona mafên xwe yên millî û civakî bi hêz dibû.

Di tebaxa 1979 da, xebatkarên Diyarbekirê yên malhebûna belediyê derketibûn mîtîngê û de'wa meaşê xwe ku êdî sê meh bû ku ne stendibû dikir. Serekbajarê Diyarbekirê îlan kir ku di wî zemanî da bajar ji hukûmeta merkezî fondên para xwe ne stendine.

Ji dema pêşîn xuya dibû ku xebathiştina li Diyarbekirê bi kêm tiştî va ji xwepêşandinên xebatkaran ên li navçeyên welêt ên mayîn dihat cuda kirin. Lê bineciyên Diyarbekirê bi heqî li ser wê baweriyê bûn ku gelek bi hovîtî ber bi wan bûne, tenê bona ku ew ji milleteki cihê ne. Wek ku serokê konfêransa

Tirkiyê yê Yekîtiyên Pêşekariyê yên Şoreşgeriyê (DISK) îlan kir, "Hukûmet dijî bineciyên Diyarbekirê şerr tev rakiriye, ji ber ku ew milletekî cihê ne" (252, 28.8.1979). DISK bona wê yekê hukûmet gunehkar kir ku ew "tu tiştekî nake bona kurtkirina dereca bêxebatiyê û betaliyê" li wê navçeya welêt.

Weke 50% ji bineciyên Diyarbekirê (ji bineciyên wê 99% Kurd in) bê kar bûn. Hela li ser vê yekê jî cîgirê serekbajarê Diyarbekirê, Fehmi Cebar, digot ku "qe olka Kurdan tune". Wî digot : "Em hemû Tirk in", "me navê Kurd daniye ser wî gelê ku li vir dijî. Em wek mirovên humanîst navên usa datînin ser wan gelên ku li navçeyên cihê-cihê û di şertên hewa yên cihê-cihê da dijîn" (252, 28.8.1979). Dema hilbijartinên di organên dîwanê yên cî da, qewimandineke ku di derheqa şerkariya Kurdan a civakî û millî ku çiqas diçû pêş da diçû da şehadet dide bû. Hilbijartinên serokê belediyê yên bajarê Agirî bûn û di nava wan da munaqeşeke berk di navbera hêzên zordar û lêpokên wê di hêlekê da û di hêleke mayîn da jî hêzên pêşverû, welatparêz derbas bû. Çiqas jî dîwana Tirkiyê, rêaksyona hundirî û tevbûna ordî û polîs tevî wî karî dibûn ji bo ku bi ya xwe bikin, lê dîsa jî Kurdekî sosyalîst wek serekbajêr hate hilbijartin. Dîwana Tirkiyê û alîgirên wê yên li bajêr nikaribû bi wê binketinê qayil bin. Pey hilbijartinê, wan li wilayetê têrora ku ji ruyê wê gelek niştimanperwer û dêmokrat hatin kuştin û birîndar kirin kir. Di nava birîndaran da usa jî serokê belediyê ku ji ser kar avêt û girt bû (221, 1982, N° 1, r. 7). Di şertên têrorê li wilayetên rohilatê da, wezîrê karên mexlûqetiyê, "parlementerê serbest" ê ji Mêrdînê, Şerafettîn Elçi, (bi milliyeta xwe Kurd bû) tevî enenekirina pirsa di derheqa dîsa dirêjkirina halê eskeriyê da ne bû û di nîveka duda ya meha tebaxê da ew çû rohilatê bona nasiya xwe bide wan qewimandinên ku li Kızıltepê (wilayeta Mêrdînê) dibûn. Wezîr hate ser wê baweriyê ku çendekî pêş da, pey kuştina polîsekî Kızıltepê, desteyên komandoyên ku ji heq-hesabên bineciyên am û tam hatine der şandine wira (216, 23.8.1979).

Bona derbaskirina teftîşa li wilayetên rohilatê, di 21 tebax 1979 da serekê barêgeha sereke, Evren û qumandarê eskerên peya, Ersin, firîn çûn Diyarbekirê **(209, 22.8.1979)**. Ew bona hişkbûna rewşê li Kurdistana Tirkiyê li ber diketin. Li dawiya tebaxa wê salê, wezîrê karên derve ya hukûmeta Ecevit, Hasan Fehmi Güneş, çû wilayetên rohilatê. Gava ew di 28 tebaxê da di gotebêja Erzurûmê da peyivî, got ku dîwana Tirkiyê her tiştî kiriye ku hêzên veqetandinxwaz ji Îran û Iraqê derbasî erdê Tirkiyê nebin **(216, 29.8.1979)**.

Tevî wê yekê, pey vê seredanê, H. F. Güneş mecbûr bû xwe mukur bê ku gelê li rohilata welêt di nava rewşeke belengaz, feqîr da ye û ku rewşa bineciyan a aborî û çandî ya pîs tesîra xwe li ser wan qewimandinên ku li vira dibin dihêle **(216, 4.9. 1979)**.

Divê ku em bidin nîşan dan ku wan deman hinek parlementer de'w dikir ku ne tenê dev ji têrora hundirê welêt di hindava Kurdan da berdin, lê usa jî de'w dikir ku siyaseta Xumeyniyê ku şerr dijî şerkariya Kurdan li Kurdistana Îranê bona otonomiyê tev rakiribû rexne bikin. Ewha, anegorî agahdariyên weşana Tirkiyê "parlementerê serbest" ê ji Mêrdînê, Nureddin Yılmaz, ku bi gefxwarin dijî hukûmetê peyivî, de'w kir ku Ecevit siyaseta xwe ya di hindava Xumeynî da biguhêre. Tevî vê yekê, Yılmaz di nava agahdariya tevayî ku bi parlementerê PGK ê ji Diyarbekirê, Azizoğlu, ra kiribû da siyaseta Xumeynî di hindava Kurdên Îranê da berk rexne kir û ew siyaseta şovînîzmê hesab kir **(205, 30.7.1979)**.

B. Ecevit ku bersîva agahdariya parlementerên ji PGK, Azizoğlu û Yılmaz ku bi tevrabûna Kurdên Îranê ra girêdayî bûn da, got ku hukûmet dicedîne ku Tirkiyê ji "karê helandin- pîrepîrekirinê" ya ji derve biparêze. Tirkiye tevî wan karên ku wek karê Îranê yê hundirî hesab dibin nabe, wî îlan kir **(209, 31.8.1979)**. Tişteki hewaskar e ku hema xût wê demê di weşana Tirkiyê da agahdarî di derheqa wê yekê da ku li rohilata welêt ew kar tên xurt kirin, bona berhevkirina wan çekên ku wan dixwest bi dizî ji Kurdên Îranê ra bişînin tên pêk anîn hat weşandin **(205, 14.9.1979)**.

Institut kurde de Paris

Di destpêka îlona sala 1979 da, cîgirê serekwezîrê Tirkiyê, C. Eyuboğlu, îlan kir ku şerkariya Kurdan li wilayetên rohilata başûr û rohilatê qeziya ye bona tamtiya Tirkiyê û ku ew şerkarî ewê bêy pareskeran bê sekinandin **(231, 7.9.1979)**. Li ser vê baweriyê bû hukûmeta Ecevit. Lê komên burjuwaziya Tirkiyê yên rastê, yên ku bona qebûlkirina mecalên hişktir di hindava şerkariya Kurdan a millî da pêş da dihatin, li ser baweriyeke mayîn bûn.

Di çileya pêşîn 1979 da, kovara Tirkiyê ya hefteyî, Yankı, gotareke rêaksyonêr çap kir û tê da xuya dibû ku Demirel dixwest ku rejîma halê eskeriyê, xwezma di hindava Kurdan da, berdewam bike û divê usa bi hovîtî, wek pey 12 adarê, be û divê di wî karî da hîç berxwarinek tu nebe. Lê di gotarê da dihat xuya kirin ku "ev hemû dikare di nava bineciyan da nerazîbûneke mezin pêş da bîne, xwezma dema ku gunehkarên têrorê dîsa neyên girtin. Wê demê ewê baweriyeke usa bê saz kirin ku ordî jî nikare borcdariyên xwe biqedîne û ev bawerî ewê gelek bi qeziya be". Bi vî awayî, komên Tirkiyê yên rêaksyonêr helan dida ordiyê ku tevî hincirandina şerkariya Kurdan li welêt bibe **(238, 10–16.12.1979)**. Tevî vê yekê, dîwana Tirkiyê di hindava zabitên bi eslê xwe va kurd bêtir şikber dibû (hindik zabitên kurd hela di ordiya Tirkiyê da qulix dikir). Wan ew di nava qulixkirinên dereca duda da bi kar dianî. Wan baweriya xwe bi eskerên kurd ne dianî ku qerewiltiya kîlerên cebirxanan bispêrin wan, ew nemaze li ser xebata paqijkirinê bi kar dianîn. Dîwana Tirkiyê dest pê kir Kurd gunehkar bike bona wê yekê ku ew di organên polîsiyê da bi siyasetê va mijûl dibûn. Wan dest pê kir Kurdan li ser qulixkirina polîsiyê qebûl nekin. Ji bo nimûnê, ji wilayetên Tuncelî, Bingol û Wanê, di sala 1979 da tukesî qebûl ne kir ku di polîsiyê da qulix bike, ew jî dema ku wan intamên xwe bi serfirazî teslîm kiribûn **(51, r. 15)**.

Tevî vê yekê, wezîrê ronkayiya millî li PGK dest pê kir wan mamosta-welatparêzên kurd ku niştimanperwer bûn ji dibistanan derxîne û ew dişandin

Institut Kurde de Paris

wilayetên roavayê. Ji ruyê wê yekê, bi sedan mamostayên kurd şandin navçeyên Qers, Agirî, Bingol, Bitlis û Mêrdînê, hinek jî girtin (51, r. 15).

Xwezma Amerîkiyan wê demê li Tirkiyê aktîfbûn nîşan dida. Ewha, casûsên Serwertiya Casûsiyê ya merkezî, yên ku li Tirkiyê kar dikir, bi behana karkirina balyozxana Amerîka diçûn wilayetên rohilatê û dicedand bizanibin di kîjan derecê da qeziya şerkariya Kurdan bona kara Amerîkayê dihat.

Empêryalîzm û rêaksyona hundirî ku helan dida Kurdan ku rabin, bi wê yekê va dicedand ku şerkariya Kurdan bona mafên xwe yên gelî bihincirînin. Tevî vê yekê, empêryalîzma DYA rêaksyona Tirkiyê dehf dida bona ku li wan navçan halê eskeriyê îlan bike, ku li ser sînorên Îran, Iraq û Sûriyê dicedand şertên baş saz bike bona ku bi awayê şerletaniyê bikeve nava karên welatên wê navçeya hundirî, bona ku Tirkiyê bike çek ji bo pêğkanîna planên xwe (198, 1979, N° 7, r. 1).

Di destpêka çileya paşîn 1980 da, gênêralên ordiya Tirkiyê ji hukûmetê de'w kir ku mecalên berk qebûl bike bona hincirandina şerkariya karkeran, tevgera Kurdan a millî. Wek bersîva wê ultimatumê, PSKT, PPKK û hevalbendên PK ber bi hemû hêzên dêmokratîk bûn û bang kir ku yek bin bona dijî faşîzm û rêaksyonê şerr bikin (188, 1980, N° 9-10, r. 13). Hema wê salê li Bitlîsê PPKK, PSKT û Ala Rizgarî yekîtiya hêz û karkirinê çê kir, û ew yekîtî diviya dijî kirinên rêaksyonêr û provokasyonên polîsî şerkarî bike (188, 1980, N° 9-10, r. 12).

Di sibata 1980 da, sê rêxistinên Kurdan Daxuyaniyek di derheqa sazkirina Yekîtiya Hêzên Kurdistanê yên Millî-Dêmokratîk çap kir (li 50 binihêre). Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê, Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê û KUK ketin nava wê yekîtiyê.

Di nava wê daxuyaniyê da Yekîtiya hêzên millî-dêmokratîk li ser wê baweriyê bû ku di navbera hêzên gelên kurd û tirk ên şoreşgeriyê û dêmokratîk da hevgirtineke bi hêz û karkirina tevayî dijî neyaran

hebin. Di nava wê da dihat gotin ku bona şerpezekirinteribandina planên civakên hukumdar, empêryalîzm û faşîzmê, bona girtina pêşiya êrîşkirinên wan û pêkanîna mecalan bona ku gelên kurd û tirk mexlûqetiya aza saz bikin, pêwîst e her du gel bi hev ra hêzên xwe yên şoreşgeriyê, dêmokratîk û pêşverû bi kar bînin. Di nava dêklarasyonê da dihat xuya kirin ku rêxistinên siyasî yên li jor xuyakirî, ku gavên pêşîn li ser riya sazkirina Yekîtiya hêzên millî-dêmokratîk di goveka Kurdistanê da saz kirine, gelek tevger xerc kirine bona ku çiqas bikaribin zûtir yekîtiyeke usa ku hemû hêzên sosyalîst, dêmokrat û welatparêz di goveka temamiya Tirkiyê da bike yek çêkin, bona şerkariya dijî empêryalîzm û faşîzmê û qûltiya millî (SO, r. 30-31). Yekîtiya hêzên millî-dêmokratîk bangî hemû hêzên şoreşvaniyê-dêmokratîk, hemû xebatkaran û kesên pêşverû dike ku yek bin û şerkariyê dijî empêryalîzm, kolonyalîzm û faşîzmê bikin (SO, r. 32).

Yekîtiya hêzên millî-dêmokratîk - di nava wê dokumentê da hatiye nivîsîn - şerkariyê dike bona van daxwaziyên gelên kurd û tirk û van nêzîkayiyan di nava jiyanê da pêk bîne : hildana halê eskeriyê û devjêberdana zordestiyê li hebsan û êşkenceyên di hindava girtiyan da, azakirina girtiyên pêşverû û yên siyasî yên şoreşger, destjêkişandina zorlêkirinê û sekinandina qedexekirina weşana pêşverû, berdana kêmkirina mafên weşanê û weşanên bi zimanê kurdî, ji bo her milletek naskirina mafê ku bi zimanê xwe yê dê bixwîne, sazûmana hînkirin-terbiyekirinê ya rasîzm-şovînîzmê ku bi naveroka helandinasîmîlasyonkirinê ji ortê bê hilanîn, miqalên pirtûkên mehkemekirinê yên 141 û 142 divê ji kokê va bên hildan, ew qedexekirinên di derheqa partiyên siyasî û hilbijartinan da, yên ku mafên kesan û rêxistinan kêm dikin, jî divê bên hildan; bona lê gulanê ku roja yekîtiyê û serhildanê hesab dibe bi resmî bê derbas kirin; bona rêforma ziraî ya dêmokratîk bê miaser kirin, wargên jiyînê yên rex sînor ji bombe û lexman aza û paqij bin; her bajarek gotî xebatê

bistîne, bacan nede an jî kêm bide; her xort û keçek divê bikaribe wekî hemuyan xwendinê bi dest bîne, hemî rêxistinên faşîzmê divên ji navê rabin; Partiya Heja Nasyonalîzmê û yên mayîn divê bên qedexe kirin; divê ji NATO derkevin, ji ber ku ew bloka herî agrêsîf e; peymanên bi empêryalîzmê ra hatine girêdan divê pûç bên hesibandin; gotî bazên eskerî bên hilanîn; divê bi tu organîzasyoneke empêryalîst ra girêdayî nebin (50, r. 27-29).

Yekîtiya hêzên Kurdistanê ya millî-dêmokratîk, ku ji aliyê niştimanperwerên Kurdan hatibû saz kirin, bi gaziyê ber bi hemû hêzên Tirkiyê yên dêmokratîk û pêşverû bû ji bo ku şerkariyê bona sazkirina yekîtiya hêz û karan ku di nav wan da usa jî divê hemû rêxistinên dijî empêryalîzmê û dijî faşîzmê hebin, bikin. Wê bang dikir ku hemû hêzên siyasî yên pêşverû ber hev bibin, armancên xwe enene bikin û amade bibin bona tevayî kar bikin (219, 1980, N° 5, r. 6).

Rast e, ew yekîtiya partiyên Kurdan ên siyasî di paşdemê da ji hev belav bû, kemala wê pirr bû bona yekkirina komele-rêxistinên Kurdistana Tirkiyê yên cihê-cihê, bona şerkariya xwe ya ji bo safîkirina pirsa Kurdan li welêt li ser bingeha dêmokrasiyê.

Di 8 adar 1980 da, li Mêrdînê mîtînga Yekîtiya hêz û karan hate derbas kirin. Dêmokratên Şoreşger, "Özgürlük Yolu", Yekîtî û Hevalbendî, Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê, Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê ew hazir kiribû. Tevî mîtîngê usa jî yekîtiyên pêşekariyê, rêxistinên dêmokratîk, komelên jinan û sen'etkaran dibûn. Mîtîng di bin nîşana yekîtiya rêxistinên gelên tirk û kurd ên pêşverû di şerkariya dijî karên hukûmetê yên rêaksyonêr di hindava heja karkerên welêt da hate derbas kirin û tê da piştgiriya heja millî li Kurdistana Tirkiyê hat kirin (188, 1980, N° 11-12, r. 4).

Wê demê li welatên derve jî danûstendinên xebatkarên tirk û kurd xur bûn. Di hezîrana sala 1980 da, Fêdêrasyona Komelên Karkerên Kurdistanê li Almanya Roava (KOMKAR), Komelên Karkerên Dêmokrat ên

Kurdistanê li Ewropa (KKDK), usa jî Federasyona Yekîtiya Karkerên Tirkiyê li Almanya Federal (FIDEF) bi tevayî bangek weşand û tê da pelixandina hêzên Tirkiyê yên pêşverû gunehkar û rexne kir û îlan kir ku karkerên tirk û kurd ên Almanyayê bi birayên xwe yên li Tirkiyê û Kurdistana Tirkiyê yên ku şerkarî bona hilanîna zagonên ne dêmokratîk (herweha miqalên mehkemekirinê 141 û 142) dikin ra ne, dijî qedexekirina rêxistinên karkeran û dûgerîna weşana dêmokratîk tên, bang dikin ku protêstoyên xwe dijî zêrandina gelê kurd bi hêz bikin, dijî têrorê, rasîzmê û şovînîzmê derkevin (li 79 binihêre).

Di van şertan da wan siyaseta xwe ya di hindava pirsa Kurdan da ya rêaksyonêr berdewam dikir, xwe usa nîşan dida ku xwedê giravî ew wê nabîne. Ewha, waliyê navça Diyarbekirê, Erdoğan Sahinoğlu, di havîna sala 1980 da gotiye : "Ez li ser wê baweriyê me ku pirsa Kurdan tu neye. Bineciyên Tirkiyê yên ku li ber zagonê wek hev in gişk jî Tirk in" **(257, 11.6.1980)**.

Bi gotinên wî, dijwariyên Diyarbekirê yên herî mezin aborî ne. Wî nîşan da ku li bajêr ew hemû destçêxên ku perçe çê dikin, penîr davêjin û araqê digirin in, ew gelek hindik in û divê jimara wan zêde bikin **(257, 11.6.1980)**.

Nûçegihanê rojnama "New York Times", Merwîn Hawû, ku di derheqa rewşa Kurdên Tirkiyê da dipeyive, dinivîse : "Seredan û gera min li Diyarbekirê, peyv û gotebêjên min ên tevî gelek bineciyan destûr didin min ez bêjim ku di nava Kurdan da xwehesîna fehmdariyê gelek bilind e, û di wê yekê da ew tişt roleke giring dilîze ku ew ji dîwana merkezî ne razî ne, ji ber ku ew naxwaze ku ew navçe pêş va here û guhdariya xwe ya sereke datîne ser pêşdaçûyîna perça Tirkiyê ya roavayê **(257, 11.6.1980)**. Lê kar ne tenê di wê yekê da ye. Sebebê sereke bona nerazîbûna bineciyên Kurdistana Tirkiyê ew e ku komên serkarîkir dicedand ku pirsa Kurdan bi ferzend-mecalên eskerî-polîsî, bi

hovîtî safî bikin û daxwaziyên Kurdan ên millî hilnedin ser hesêb, pişt guhê xwe va bavêjin.

4. Pirsa Kurdan di şertên rejîma eskerî da

Di payîza sala 1980 da, rewşa hundirî ya siyasî li Tirkiyê bi carekê va hate hişk kirin. Nemithîmtiya siyasî ku ji ruyê şerkariya du partiyên burjuwa yên sereke, Partiya Heqiyê û Partiya Gel a Komarî, pêş da hatibû, ber bi têrora ku rêxistinên milletçî yên rastê tev rakiribû hat kûr kirin. Tenê berî du salan bi destê êkstrêmîstan ji 5.000 kes bêtir hatin kuştin û ji 14.000 bêtir hatin birîndar kirin. Bêtir merivên ku xwediyên bîr û baweriyên pêşverû bûn dihatin kuştin. Karûbarên êkstrêmîzmê bi xiringêla aborî ku hatibû serê Tirkiyê va pêş va diçû, rewşa civakî jî gelek xerab bûbû. Heja karkeran a xebathiştinê, yên ku de'w dikir ku meaşê wan bilind bikin û qewlên xebatê bidin pak kirin, jî gumreh dibû. Şerkariya Kurdan bona destxistina mafên millî xurttir dibû.

Di van şertan da, di 12 îlon 1980 da, li Tirkiyê wergerandina dewletê hate pêk anîn. Serokatiya hêzên eskerî dîwan hilda destê xwe. Wê Şêwra bêqeziyabûna millî (MIT) da saz kirin. General Evren bû serokê barêgeha sereke. MIT fonksyonên organa zagondariyê hildan destê xwe. Qumandarên hêzên Tirkiyê yên peya, eskerî-hewa û eskerî-behriyê, usa jî qumandariyên cendirme û polîs ketin nava MIT. Şêwra bêqeziyabûna millî meclis û hukûmet ku serokê wê Demirel bû ji hev belav kirin, wê karkirina hemû partiyên siyasî, herweha rêxistinên mexlûqetiyê jî, qedexe kir, destpêneketina parlementê da hildan û li ser temamiya axa welêt halê eskerî îlan kir (87, r. 277). Serokên eskerî wek ên berê dest pê kir îlan bikin ku ew tu mafekî Kurdan ê millî nas nakin. Ewha, serekê dewletê, Kenan Evren, di nava hevpeyvîna xwe ya 19 oktobr 1981 da di kovara "Shpigl" da ewha dibêje : "Kurd gelek caran rabûne cengê, hela dema imperatoriya Osmanî û Ata-Türk da jî. Li ber me planeke şeytanî heye.

Gava Komara Tirkiyê sist dibe, Kurd serhildanan dikin, dixwazin bi alîkariya hêzên derve Tirkiyê perçe-perçe bikin ...". Di dûmayîkê da jî dibêje : "Kurd hene. Lê emê destûr nedin wan ku ew welêt perçe bikin. Ewê tutiştî ji me nestînin. Emê hertiştî bikin ku em wê pirsê ji kokê va rakin". Serekwezîr Bulent Ulusu bi dizî îlan kir : "Ordiya me ewê bi hemû hêzên xwe dijî veqetandinxwazan li ber xwe bide û wan bihincirîne" (127, 1983, № 5, r. 7).

Rejîma eskerî ku di siyaseta xwe ya dijî Kurdan da berdewam dikir, biryar qebûl kir ku li ser temamiya sînorê Sûriye, Iraq û Îranê wa gotî "navçeya bêqeziyabûnê" bi dirêjayiya 10-20 km saz bike. Anegorî biryarê, qedexe kiribû ku kesên ku li wê navçeyê dijîn ji norma dîwanê ya nîşandayî zêdetir pez-dewar û hasilata malhebûna gundîtiyê xwedî bikin. Dîwana eskerî bi navê şerkariya qaçaxçîtiyê li Gaziantep, Diyarbekir, Kilis, Batman, Doğubeyazit û gelek bajarên mayîn ku piraniya bineciyên wan Kurd bûn bi hezaran dikan da girtin.

Dîwana eskerî karkirina rêxistinên mexlûqetiyê yên pêşverû, herweha Konfêdêrasyona Yekîtiya Pêşekariyê yê Şoreşgeriyê ya Tirkiyê (DISK) û komela mamosteyan (Top-Der) ku tevî wan Kurd jî kar dikir qedexe kirin. Bi biryara dadgehê, ji serokatiya Top-Derê 50 mirov gunehê hetanî 9 salan stend. Mehkema wan hat kirin ji ber ku Komela Mamostan dijî sîstema dersdayînê ya şovînîst, zêrandina gelê kurd, qedexekirina ziman û çanda wî, bona dêmokratîzekirina sîstema ronayîdariyê li welêt, ji bo mafê Kurdan ku bi zimanê xwe yê zikmakî bixwînin pêş da hatibû, usa jî de'w kir ku gelê kurd bi xwe qederê xwe qerar bike (196, 1982, № 38, r. 1).

Dîwana Tirkiyê ya eskerî rojname û kovarên nûnerên rewşenbîrên Kurdan ên bi nav û deng, wek Roja Welat, Özgürlük, Rizgarî, Özgürlük Yolu, Jîna Nû, Devrimci Demokrat Gençlik, Têkoşîn û yên mayîn, dan girtin.

Salên 80 mehkema serok û endamên partiyên Kurdan ên siyasî, rêxistinên mexlûqetiyê, weşanvan

û belavkirên edebiyata kurdî yên li Kurdistanê berdewam dibû. Gişk jî di nava tiştekî da dihatin gunehkar kirin, ew jî karê wan dijî yekîtiya milletê tirk bû û ku bi wê karê wan dixwest Tirkiyê perçe bikin.

Anegorî weşana Kurdan a welatên derve, tenê pey salên wergerandina eskerî dîwana eskerî weke 170.000 kes girtine, 200 kes ji zêrandinan mirine, 700 kes dema kirinên cezakirinê hatine kuştin, 48 dijminên rejîmê hatine dar ve kirin, weke 170 girtî jî hatine gulle kirin. Hela bi ser da, di mehkeman da de'w dikir ku bona 4.600 kes jî gunehê gullekirinê derxînin **(217, 1983, N° 5, r. 5)**. Piraniya wan şehîdan Kurd bûn. Divê bê nîşan dan ku di nava dema heyetiya Komara Tirkiyê da, ango di nava 60 salan da, bi motîfên siyasî 111 kes hatibûn dar ve kirin **(226, 1983, N° 18, r. 23)**.

Serokên rejîma eskerî ku halê eskerî li ser temamiya welêt belav kiribû, pareskerên ordiya duda ji Konyayê şandin Meletiyê û bi wê yekê va gelek pareskerên hêzên Tirkiyê yên çekdar li navçeyên rohilata Tirkiyê dan cîwar kirin. Li vira esker bi çekên nûjen - tank, balafir, tîkfir - va û bi mecalên transportê û matêryalên eskerî yên mayîn va hatibûn razî kirin. Bi vî awayî, navçeyên Kurdan dihatin işgal kirin, dor li wan dihat girtin. Polîs û cendirme li Kurdistanê wek ordiyeke işgalker kar dikir. Pareskerên komando karên cezakirinê di hindava bineciyên kurd ên am û tam da derbas dikirin, gunehê xwe ne bi zarokan, ne bi jinan, ne jî bi kalemêr û pîrejinan dianî.

Canderme û polîs bi behana gera çekên komandoyan êrîşî gundên Kurdan dikir, pez-dewar û hebûna wan a mayîn dibirin.

Li ser axa Kurdan gelek caran talîmên eskerî dihatin derbas kirin. Divê bê xuya kirin ku di wan talîmatan da, "dijmin" gelek caran cillê kurdî li xwe dikir, şal û şapik bi kar dianîn. Ev isbata zelal nîşan dide ku ew talîm dijî kî bûn. Hinek talîmên eskerî bi eskerên welêt ên endamên NATO

Institut kurde de Paris

dihatin derbas kirin. Hêzên eskerî-hewa û yên peya yên Tirkiyê, DYA, Brîtanya Mezin, Almanya Federal, Îtalya û Belçîka tevî wan dibûn. Wek ku weşana Tirkiyê îlan dike, armanca talîman ew bû ku metodên hevrakarkirina hêzên bloka NATO amade bikin, eger "bona perê NATO yê rohilata başûr qeziya pêş da bê bona bêqeziyabûna wê".

Tevî wê yekê, rejîma eskeriyê wek berê ferzend bi kar dianîn bona eskerîkirina Kurdistanê. Ewha, bi alîkariya Amerîkanan, li Hekkariyê balafirgeha eskerî hate çê kirin, ya Wanê jî hate fireh kirin û bi vî awayî kemala eskerî-stratêjî ya vê navçeya ku piraniya bineciyên wê Kurd bû bêtir da bilind kirin.

Eskerîkirina Kurdistana Tirkiyê ne tenê dijî gelê kurd bû, lê dijî temamiya heja millî- azadariyê li welatên Rohilata Nêzîk û Navîn bû. Di vî karî da Tirkiye ji aliyê DYA tam dihate parastin. Empêryalîzma Amerîkayê, ku helan dida rêaksyona Tirkiyê bona ku ew kirinên dijî Kurdan bike, li navçeyê şerr tev rabike, xwezma li wan wilayetên ku li ser sînorên Iraq, Îran û Sûriyê ne, dixwest şertên baş saz bike bona tevbûna xwe ya provokasyonê di navê karên navçeyên hundirî da, Tirkiyê bike çek bona pêkanîna planên xwe.

Ewha, bi razîbûna DYA, li dawiya gulana 1983 eskerên Tirkan bi jimara weke 15.000 mirov ji tixûbên Tirkiye-Îranê derbas bûn û 30 km ketin erdê Iraqa bakur ku tê da nemaze qerargehên Partî Dêmokratî Kurdistanê ya Barzaniyan hatibûn cîwar kirin. Lê ew mecbûr bûn ji navçeyên Kurdan derkevin, ji ber ku desteyên "pêşmergan" rind li ber xwe da û di hêlekê da jî mexlûqetiya cihanê ew rexne û gunehkar kirin.

Komên Tirkiyê yên serkarîkir dixwest êrîşî Iraqa bakur bikin û nehêlin ku şerkariya Kurdan a millî-azadariyê ku dikaribû tesîra xwe li ser heja Kurdan a li Tirkiyê jî bihêle pêş va here û xurt bibe.

Tevî vê yekê, ew li ber xwe diketin ku Îran ku li Iraqa Bakur riya pêşeniyê ya nuh vekiriye dikare navçeyên Kerkûk û Mûsilê bi neftê va pir zevt

Institut kurde de Paris

bike. Divê bê xuya kirin ku Tirkiyê, bi saya wê nefta ku ji Kurdistana Iraqê distend û bi xetlûlê dişande Iskenderûnê, her sal kara weke 250 milyon dolar distend **(196, 1983, Nº 57, r. 6)**.

Dakutana eskerên tirk di nava erdê Iraqê da di danûstendinên Îran-Tirkiyê da hişkbûn pêş da anî. Nûnerên Îranê îlan kir ku ewê Îran pevgirêdanên xwe yên aborî tevî Tirkiyê bide sekinandin. Lê wê nîşan dida ku ewê Tirkiye bazara mezin hunda bike (weke milyonek dolar di nava salê da) **(196, 1983, Nº 57, r. 6)**. Di havîna 1983 de, hevpeyvînên Tirkiye-Îranê ku danûstendinên Tirkiye û Îranê hinek dan mulayim kirin hatin derbas kirin, ji bo ku siyaseta wan a şovînîst di pirsa Kurdan da wan bêtir nêzîkî hev kir, û her du alî mecbûr bûn ku bi awakî objêktîf di pirsên mayîn da jî tebiyên xwe bi hevdu ra bidin qayil kirin - razî kirin.

Balyozê Tirkiyê li DYA, Şelekdağ, ku di oktobra 1984 da di civîna sermayedarên Amerîka û Tirkiyê da peyivî, pirsî gelo Tirkiye di pirsa pêwendiyên tevî welatên cîran da dikare hêviya xwe deyne ser DYA. Alîgirê sekreterê dewletê di pirsên welatên derve da, Richard Barten, di nava bersiva xwe da got : "Tirkiye dikare hêviya xwe bi me bîne. Em bi Tirkiyê ra li ser bernama kontr-têrosîzmê kar dikin. Emê Tirkiyê li ber pirsê tenê nehêlin" **(189, 1984, Nº 19)**. Ev bang nîşan dida ku serokatiya Amerîkayê ewê alîkariyê bide hukûmeta Tirkiyê di nava karê wê yê cezakirinê ku di hindava tevgera Kurdan a azadariyê da dihat kirin da.

## 5. Destûra Tirkiyê ya nuh û pirsa Kurdan

Siyaseta serokatiya eskerî ya rêaksyonêr bi zagondarî di nava Destûra nuh a ku bi rêfêrenduma 7 cotmeh 1982 da hatibû qebûl kirin da hatibû mehkeme kirin. Ew di rewşa welêt a halê eskerî da hate derbas kirin. Bi salixên resmî, 88,5% bijarvanan tevî dengdayînê bûn û ji wan 91% dengê xwe da bona Destûra Tirkiyê ya nuh. Lê bijarvan xwediyên çareke mayîn jî nîn bûn. Ewha, hela berî rêfêrendumê,

serokê rejîma eskerî, Kenan Evren, digot ku eger gel bêje "na", "wê demê em dîsa dest ji ya xwe nakişînin" (221, 1983, Nº 1, r. 1).

Bilî wê, dîwana eskerî qedexe kir ku bi her awayî rexnekirina di hindava projeya destûrê da bê kirin, lê usa jî berî rêfêrendumê bi çend rojan, li hin navçeyên welêt mirov girtin. Nûnerên dîwanê gef dixwar ku ewê wan bijarvanên ku ewê neçin hilbijartinê bi 6 mehan bavêjin hebsê. Rast e, wan serî-binî gef xwaribû, lê wan di nava bineciyan da hewarzeke mezin pêş da anî. Girêdayî vê yekê, dîwanê îlan kir ku ew mirovên ku ewê tevî bijartinan nebin, ên ku 5 salan bibijêrin û bên bijartin, rê li wan tê birîn, ango ji mafên hilbijartinê mehrûm dibin. Hela bi ser da, li Kurdistana Tirkiyê behs di derheqa wê yekê da ku kî dengê dijî bide ewê êşkence bixwe belav bû. Di şertên têrora bêhempa li welêt da, behsên usa rola xwe lîst. Li gundan, xwezma li navçeyn Kurdan, nûnerên eskerî muxtar gazî bal xwe dikirin û gef li wan dixwar ku eger ew dema dengdayînê dijî derkevin, ewê ceza bixwin. Dema rêfêrendumê polîs û cendirme li ber qutiyên dengdayînê sekinîbûn. Di van şertan da, an divê mêranîke mezin bi te ra hebe, an jî tu divê bikevî bin derbeke mezin ku neçî dengdayînê, an jî dengê xwe "dij" bidî. Di vê rewşê da jî 91% dengê xwe wek "terefdar" da.

Weşandina netîceyên rêfêrendumê ji rastiyê gelek dûr in, lê dîsa ew hewaskar in. Ewha, li Kurdistana Tirkiyê % dengdayîna "dij" an jî yên ku hîç ne hatine dengdayînê, gelek li ser wan agahdariyên ku li welêt hebûn orte ne :

| Wilayet | Dij bûne | Boykot kirine |
|---|---|---|
| Bingol | %23 | %10 |
| Bitlîs | %13 | %9 |
| Diyarbekir | %20 | %13 |
| Elazig | %15 | %13 |
| Hekkarî | %18 | %30 |
| Mardîn | %13 | %12 |
| Mûş | %15 | %18 |
| Siirt | %12 | %19 |
| Tuncelî | %18 | %21 |

Wek ku ji van agahdariyan xuya dibe, piraniya bijarvanan dijî destûrê derketin. Di van 9 navçeyên ku piraniya bineciyên wan Kurd in, % bijarvanên ku tevî dengdayînê ne bûne an jî dij derketine ji % orte ya li temamiya welêt bi 2 caran bêtir in. Ev gişk di derhewa wê yekê da dibêje ku, nenihêrî têror û zordayînê, dîwana eskerî li Kurdistana Tirkiyê rastî berxwedayîneke mezin hat. Ewha, bineciyên gundekî wilayeta Mêrdînê (weke 1.000 kes) ne çûne bijartinan û dengê xwe ne da. Weşana Tirkiyê ya burjuwa ku dixwest isbat bike ku mast reş e, rojtira mayîn pey rêfêrendumê nivîsî : "... Nenihêrî berf, sur û sermê, li wilayetên rohilatê bi milyonan hemşeheriyên me dengê xwe da ..." **(209, 8.11.1982)**.

Lê serekê dewletê, K. Evren, ku pey rêfêrendumê çû wilayetên rohilatê, di nava axaftinên xwe da, wek li Qers û Artwînê, got : "rast e hinek bi dengnedayîna xwe va dij derketine û bi wê yekê va wan xwestiye ku destûr rindtir be, lê dîsa jî di dilê gelekan da qelpî hebûye, û loma jî ew wek neyarên me û sêparatîst tên hesibandin" **(221, 1983, N° 7, r. 1)**.

Bi hinek salixan, dîwana eskerî dû rêfêrendumê dest pê kir ji heq-hesabên bijarvanên ne bi dilê xwe werin der. Ewha, li dor-berê Mêrdînê 10 muxtar û gelek gundî girtin. Ne tenê li Mêrdînê kes digirtin, lê usa jî li wilayetên Bingol, Diyarbekir, Siirt û Mûşê **(221, 1983, N° 7, r. 2)**.

bi vî awayî, dîwana Tirkiyê dixwest heyfa xwe ji wan kesên ku ne dixwest dengê xwe bidin bona destûra nuh ku bi bingeha xwe va ya milletçîtiyê bû hilîne.

Destûra Komara Tirkiyê ya nuh, wek yên berê, daxwaziyên gelê kurd inkar dike, mafên wan nas nake. Hela bi ser da, ew bi zagonî diyarkira siyaseta komên Tirkiyê yên serkarîkir ên helandin-asîmîlasyonê ya di hindava wan milletên biçûk ku li Tirkiyê dijîn da tê hesibandin.

Destûr bi şeklî wekheviya hemû bajarvanan li ber zagonê îlan dike. Ewha, di destpêka destûrê da tê gotin ku "her bajarvanekî tirk" (türk vatandaşı) – ne "bajarvanê Tirkiyê" (Türkiye vatandaşı) – mafê wî heye ku jiyana xweş di şertên ku tê da çanda xwe pêş va bibe derbas bike, bi maddî û manewî di riya pêşketinê va bimeşe. Dû ra, di miqal 10 da xuya dibe ku gişk li ber zagonê wek hev in, bêy ferqa ziman, rengê çerm, bîr-bawerîyên siyasî, fikirdariya felsefî, dîn-olî, hebandin û yên mayîn.

Lê gava nasiya xwe didî miqalên destûrê yên mayîn, dibînî ku hela wekheviya usa ya şeklî jî tu neye, ku di nava wê da nasyonalîzm-milletçîtiya burjuwaziya Tirkiyê ya bêhempa heye. Ewha, anegorî destûrê, "Komara Tirkiyê ... bi nasyonalîzma Atatürk bawer e û li ser wan prensîpan hîm dibe", di nava miqla wê ya 2an da hatiye nivîsîn. Lê li wira, tevî çend tiştan, usa jî hatiye nivîsîn ku destûra nuha "anegorî têgihîştina milletçîtiya sazkerê Komara Tirkiyê", ango ya Atatürk, e. Dû ra, di destpêkê da tê gotin ku "serbestî bêy gilî-gotin ji bo milletê tirk" e. Û em dikarin eynî tiştî di maqal 6 da, ku tê da xuya dibe ku "Serdestî ji sedî sed a yaneteweyê tirk e" û ku "serdestiya xwe bi destê organên jêhatî, li ser bingeha wan esasên ku di destûrê da hene, pêk tîne" bibînin.

Nenihêrî ku li Tirkiyê ji 30 millet bêtir dijîn û ku jimara wan ji 10 milyon derbas dibe, dîsa jî destûra Tirkiyê wan inkar dike. Di derheqa wê yekê da ev isbat dibêje : "Mafê zagonî yê ji nav neteweyê tirk milkê Civîna Tirkiyê ya Millî ya Mezin (Meclis) hesab dibe" **(miqal 7)**. Di dûmayîkê da : "Mafê dadgehê ji nav milletê tirk bi destê mehkemeyên serbest tên miaser kirin" **(miqal 9)**. Destpêka destûrê û Destûr bi temamî hildayî gotinên usa yên dêmagojîk, wek "milletê tirk ê heta-hetayî", "dewleta Tirkiyê ya ziyaretî", "milletê Tirkiyê yê mezin", va hatine nitirandin. Ewha, di nava destûrê da tê gotin : "Her Tirkek dikare di idareyên Tirkiyê da kar bike" **(miqal 70)**. Dû ra : "Her Tirkekî ku 30 salên wî xetimî ne dikare wek parlementer bê hilbijartin" **(miqal 76)**.

Lê halê kesên ne tirk ewê çawa be ? Wek ku Tirk dibêjin, û ew yek di nava destûrê da hatiye nivîsîn, li Tirkiyê gelên ne tirk tu nene, lê tenê Tirk hene. Ango, destûr dixwaze hemû bajariyên Tirkiyê yên ne tirk wek tirk hesab bike.

Ewha, miqal 66 dibêje : "Her kesê ku bi têlên bajarvaniyê bi Tirkiyê ra hatiye girêdan Tirk e". Tu Tirk, tê da hatiye gotin, nikar ji bajarvaniyê bê derxistin, eger wî gunehkarî ne kiriye û di hindava welat da bawer e.

Divê bê nîşan dan ku komên Tirkiyê yên serkarîkir bixwe bi wê dêmagojiyê bawer nakin, û loma jî temamiya siyaseta wan bona helandina milletên biçûk e, bona ku li welêt tenê Tirk bijîn. Di derheqa van yekan da usa jî çend miqalên destûrê yên mayîn hene.

Ji bo nimûnê, di nava miqal 42 da tê gotin : "Bilî zimanê tirkî, hîç zimanekî mayîn nikare bê xwendin û di idareyên hînbûnê da wek zimanê zikmakî bê ders dayîn".

Bi gilîkî mayîn gotî, zarokên milletên biçûk nikarin bi zimanê dayika xwe fêr bibin. Ew divê tenê bi zimanê tirkî hîn bibin. Bi vî awayî siyaseta wê miqalê asîmîlasyona rêaksyonêr e.

Rast e, di miqal 42 de xuya dibe ku "bendên peymanên navneteweyî li bal me kar dikin". Xuya ye ku li vira gilî di derheqa peymanên aşîtiyê ku di kongreya Lozanê da hatin qebûl kirin da ye.

Miqalên 37-44 ên wê peymana di derheqa parastina mafên gelên biçûk da, rasttir di derheqa gelên ne musulman ên biçûk da, ne (26, r. 151-152). Anegorî miqal 57, Tirkiyê borc hildabû ser xwe ku wan şertên di nava miqalên 38-44 da hene qebûl bike. Usa jî gotî biryarên mayîn ên ku ewê dijî wan şertan derketana ewê hîç qebûl nekira ...

Miqal 38 a wê peymanê dibêje ku hukûmeta Tirkiyê borc hildide ser xwe ku jiyana hemû binecîyên Tirkiyê ya tam û azayîya wan biparêze, bêy hesabhildana millet, ziman, dîn û çermê wan.

Institut kurde de Paris

Di nav miqal 39 da xuya dibe : "bajarvanên Tirkiyê ku ne musulman in, ewê mafên wan ên bajarvanî û siyasî wek yên musulmanan usa hebin ... Bajarvanên Tirkiyê dikarin bi daxwaziya xwe bi zimanê xwe bipeyivin, hem di dereca bazirganiyê, hem di dereca dîn, çap û weşanê da û hem jî di civînan da" (26, r. 152). Lê Tirkiyê hertim jî ew peymanên ku di derheqa wan da çend miqalên destûrê jî dibêjin teribandine.

Di demên cihê cihê da, li perçeyên welêt ên cihê cihê, nûnerên dîwana Tirkiyê yên resmî di derheqa qedexekirina peyvê bi zimanekî mayîn, ji bilî tirkî, da bulten diweşandin, plakêt dar da dikirin, kampanya didan derbas kirin. Lê wê demê ew yek bêy destûrê dihat kirin. Nuha ew siyaset bi cûrê destûrê tê kirin û di maleke wê yê cihê da hatiye nivîsîn.

Ewha, miqala destûrê ya 26an dibêje : "Dema agahdariyan an jî weşandina bîr û baweriyên xwe, izn tune ku zimanekî usa ku bi zagonê hatiye qedexe kirin bi kar bînin". Miqaleke bi naveroka awayê şovînî em nikarin li welatekî cihanê yê mayîn bibînin. Zimanê bi zagonê qedexekirî çi nîşan dide ? Ziman ferzendeke hevdufehmkirina mirovan e. Tevî vê yekê, li vira ji gişkan ra xuya ye gilî di derheqa kîjan zimanî da ye. Gilî nemaze di derheqa zimanê kurdî da ye. Hela çend sal pêş da, berî wergerandina dewletê ya eskerî, gava nûnerên rewşenbîrên Kurdan ber bi waliyê Ankarê bûn û hêvî jî kir ku destûr bide bona weşandina rojnama "Roja Welat" bi zimanê tirkî û kurdî, wê demê karmendê wê dairê got : "Hûn dikarin bi her zimanî çap bikin, bilî zimanê kurdî. Eger na, çend serî ewê bên hilqetandin" (221, 1982, № 5–6, r. 4).

Di nava miqal 28 da tê xuya kirin ku izn tune ku weşana bi zimanekî qedexekirî çap bibe. Di nava destûra 1961 da tiştê usa tu nebû. Rast e, berê jî weşanên kurdî qedexe dikirin, lê dîsa jî Kurdan hinek tişt çap dikirin. Lê nuha komên Tirkiyê yên rêaksyonêr dicedînin ku siyaseta xwe ya şovînîst di hindava gelên welêt ên ne tirk da bi zagon-qanûnê bidin mehkeme kirin.

Institut kurde de Paris

Destûra nuh ferzend da ku ji cîkî barkirina-koçkirina bineciyan bo cîkî welêt ê mayîn bi sînor bike, mecalan saz dike ku bînecî mihacirî cîkî mayîn bibin. Ewha, di miqal 23 da hatiye nivîsîn : "Dikarin nehêlin ku mal koçûbar bikin bona pêşîgirtina gunehkariyan, bêxofkirina pêşdaçûyîna civakî-aborî, bona miaserkirina parastina hebûna dewletê".

Miqala ku ew bixwazin, ewê gelek fireh bidin şirove kirin, ji ber ku di bin wê da gelek tişt hene. Tiştên ewha gelek caran di salên 20 û 30 da di hindava Kurdan da hatine bi kar anîn, bona ku bineciyan bi kitle ji cî-warên wan mihacirî navçeyên welêt ên merkezî û roavayê bikin.

Eger em guhdariya xwe bidin miqalên destûrê, emê bibînin ku plana siyaseta daxwaziya xudanên wê ya sereke ew bûye ku şerkariyê dijî heja karkeran, dijî şerkariya Kurdan a millî-azadariyê gurr bikin. Bona testîqkirina gotinên xwe, em çend derecên miqalên destûrê yên mayîn tînin :

Miqal 14. "Tu maf û azadî ku di vê destûrê da hatiye dîtin, nikare bi armanca teribandin-şerpeze-kirina yekîtiya dewletê, welêt û millet bê bi kar anîn, nikare wek sazkirina qeziyê bona heyetiya dewlet komara Tirkiyê bê xebitandin ...".

Miqal 68. "Qanûnname û bernamên partiyên siyasî nikarin dijî yekîtiya dewlet, welêt û millet bin ...".

Miqal 122. "Dema pêşdahatina karên bi destê zorê, yên ku dikarin ji hundir û derva qeziyê bona tamtiya welat û millet pêş da bînin, serekwezîr dikare halê eskeriyê îlan bike, hem li çend wilayetan, hem jî li temamiya welêt".

"Şertê baweriya herî mezin bi bîr-baweriya teşkîldar-damezranvanên destûrê ew e ku bona neperçekirin û tamtiya welat û milletê tirk pêş da bên".

Di miqal 143 da tê dîtin ku dadgehên bêqeziyabûna dewletê ku divên li wan karên ku dijî tamtiya welêt û yekîtiya millet bûne, dijî bêqeziyabûna dewletê ya hundirî û derva bûne binihêrin û bi wan girîdayî ne, saz bikin.

Institut kurde de Paris

Bi vî awayî, nasandina çend miqaleyên destûra nuh me tîne ser wê baweriyê ku ew mafên millî yên gelên ne tirk inkar dike.

Tehlîla miqalên destûra Tirkiyê bingeh dide me ku em bêjin ku komên Tirkiyê yên rêaksyonêr ferzendên xwe dan fireh kirin bona derbaskirina siyaseta asîmîlasyonê di hindava gelên biçûk da. Ew, ku li ser destûrê hîm dibin, mecalên xwe yên pelixandinê di hindava gelên welêt ên ne tirk da, xwezma di hindava Kurdên ku serhildana wan a dawiya salên 70 û destpêka salên 80 gelek pêş va çûye da, dane bi hêz kirin.

Tevî vê yekê, destûra Tirkiyê ya nuha li hemberî destûra dema Komarê dikare wek gavek ber bi paş bê hesibandin. Ewê alîkariya hişkbûna dijîheviyên millî û civakî li welêt bike.

Bîrûbaweriyên destûra Tirkiyê ya nuh êdî ketine nava bernamên partiyên burjuwa ku bi destûrdayîna dîwanê ya sala 1983 hatine saz kirin. Ew gişk xwe bi tebiya idêolojiya nasyonalîzma burjuwa digrin, nenihêrî ku di bernameyên wan da di hêla raberkirinê da hinek ferq heye. Partiya Dêmokrasiyê ya Milletçîtiyê, PDM, (Milliyetçi Demokrasi Partisi) xwe ber bi hêla nasyonalîzma gef-gurr ku terefdara hukmê eskerî ya Îlona 1980 bû digire. Ewha, di nava miqala bernama wê ya dudan da tê gotin ku PDM baweriya xwe bi ruh û felsefa "heja 12 Îlon"ê ku dewleta Tirkiyê ji perçebûnê, milletê tirk ji pîrepîrebûnê xelas kir tîne û nuha jî siyaseta xwe di wê derecê da derbas dike.

Di miqal 4 a bernama wê partiyê di derheqa mêlgirtina prensîpa nasyonalîzma Tirkiyê da heye. Tê da tê gotin ku nasyonalîzma Tirkiyê ne ku perçe dike, lê digihîne hev. Ew nasyonalîzma kulturî ku bajarvanan digihîne hev e. Her bajarvanekî Komara Tirkiyê ku xwe nûnerê milletê tirk dihesibîne, qedrê dewletê digre, bi fehmdarî şabûn û qederê millet derc dike, milletçî-nasyonalîstê tirk hesab dibe.

Nasyonalîzma Tirkiyê qîmetên gelî, dîrokî û manewî testîq dike. Armanca wê ew e ku milletê tirk bide

bilind kirin, wî bigihîne ser dereca dewletên roavayê yên pêşketî û dijî komunîzm û wan rejîmên ku bi destûrê hatine qedexe kirin, wan felsefe û dînên ku kubariya milletê tirk kêm dikin pêş da tê (227, 21.10.1983).

Bi gilîkî mayîn gotî, nasyonalîzma PDM bona civandin-yekkirina hemû bajarvanên welêt, kara komên Tirkiyê yên şovînîst, mehkemekirina rejîma hukumdar pêş da tê û dijî dêmokratîkkirina jiyana mexlûqetiyê ya siyasî û dijî şerkariya Kurdan bo mafên xwe yên millî derdikeve.

Hinek bi awakî mayîn, ew di bernama Partiya Gel, PG (Halkçı Parti), da hatiye nivîsîn. Ewha, di nava miqal 2 a bernamê da xuya dibe ku Partiya Gel terefdara nasyonalîzma ku dibêje ku divê hemû endamên millet alîkariya wan bîr-baweriyan bikin û ku di dereca bextê welêt, ziman û çanda wî da divê nasyonalîzma bêhempa hebe ye. Bi baweriya wê, armanca nasyonalîzma Atatürk ew e ku mexlûqetiya Tirkiyê nûjen bike, ew qedrê serbestiya milletên mayîn bigre, dijî her awayê zêrandin û kêmkirinan pêş da tê. Ne ku bi navnîşanên millî yan jî eşîrî, ku di nava bajarvanên wê da turkîzm çiqas mehkem e, lê bi girêdana wan bi dîtinên millî, çand û armancên gelê Tirkiyê, bi parastina piştgiriya yekîtiya welêt û milletê xurt, bi hezkirina dewleta xwe dihese (227, 21.10.1983).

Bi vî awayî, rast e, Partiya Gel hinek bi cûrekî mayîn prensîpa nasyonalîzmê diyar dike, lê dîsa jî pirsdanînên wê - ew şerkariya dijî perçekirina millet, welat û dewlet jî bi ser wê baweriyê ye - çi ku Partiya Dêmokrasiyê ya Nasyonalîst.

Prensîpa nasyonalîzmê ketiye nava bernama Partiya Weteniyê (Anavatan Partisi). Wek ku di miqal 1 a bernama partiyê de tê gotin, Partiya Weteniyê ew partiya ku xwe bi riya nasyonalîzmê girtiye û ku piştgiriya qîmetên millî û moralî dike ye (227, 21.10.1983).

Hemû partiyên Tirkiyê yên burjuwa yên mayîn jî di derheqa prensipên xwe da girêdana xwe bi nasyonalîzmê îlan dikir. Partiyên burjuwa ku ew prensîp

Institut kurde de Paris

dikirin nava bernama xwe, dixwest careke mayîn isbat bikin ku bi kemalîzmê, ku dijî ku pirsên civakî-aborî û millî li ser bingeha dêmokrasiyê bên safî kirin e, bawer in.

Bernama hukûmetê jî bi ruhê destûra Tirkiyê ya nuh û bernama Partiya Weteniyê ku serekwezîr Turgut Özal di 19 çileya pêşîn 1983 da li Meclisa Tirkiyê xwend hatiye çê kirin.

Anegorî bernamê, prensîpa hukûmeta Partiya Weteniyê idêolojiya nasyonalîzma burjuwa, ku dijî ye ku mafên gelên welêt ên ne tirk bên nas kirin, hesab dibe.

Ewha, Turgut Özal ku bi bernama hukûmetê va pêş da hat got : "Hukûmeta me ew hukûmeta nasyonalîst e ... Dîtina me ya li ser nasyonalîzmê bona parastina wê serbestiyê û yekîtiya milletê tirk e, usa jî bona neperçekirina welêt ku di nava destûrê da hatiye nivîsîn e ...".

"Destûra me ya nasyonalîzma Tirkan, ku anegorî bîr û baweriyên Atatürk e, di derheqa pirsên nasyonalîzmê da ewê bibe dîtina karkirina me ya sereke û yekemîn. Tevî vê yekê, hukûmetê soz da ku şerkariya herdemî û kardar pêş da bibe dijî xiringêlî, têrosîzm, sêparatîzm û kesên destnedayî". Bi gilîkî mayîn gotî, niyeta wê ew bû ku hincirandina heja civaka karkeran, şerkariya Kurdan a millî-azadariyê berdewam bike.

Meclisa Istişarî ku dîsa di hindava Kurdan da siyaseta şovînîzmê dida derbas kirin, di gulana 1983 da "zagona di derheqa mihacirkirina millî da" (Milli Iskan Yasası) qebûl kir. Anegorî wê zagonê, dîwana Tirkiyê bi behana "bêxofkirina millî" dikare bineciyan ji cîkî derxe û cîguhastî cîkî mayîn bike (196, 1983, № 54, r. 6). Bi giliyên mayîn gotî, ew di şertên bilindbûna şerkariya Kurdan a millî-azadariyê da dikarin Kurdên "usyanvan" ji cî-warên kal û bavan raqetînin û bişînin navçeyên Tirkiyê yên roavayê, wek ku gelek caran di salên 20 û 30 da qewimî, usa jî di salên pey şerr ra berdewam bû.

Bi salixên weşana Kurdên welatên derve, li ser

bingeha zagona ku li jor hatiye nîşan dan, gelek malên Kurdan şandin navçeyên welêt ên roavayê (217, 1983, Nº 5, r. 7).

Em nikarin bêjin ku dîwana Tirkiyê dicedand ku pirsa Kurdan tenê bi ferzendên eskerî-siyasî bide safî kirin. Wan soz da ku mecalên ku ewê alîkarî bidana pêşketina navçeyên Kurdan, ku bi baweriya wan ew diviyan hişkbûna li Kurdistana Tirkiyê bidin hildan, qebûl bikin. "Em li ser wê baweriyê ne - Turgut Özal digot - ku projeya bi giringiya yekemîn di aliyê safîkirina pirsên civakî û aborî da, ew pêşdabirina wilayetên Anatolya Başûrê Rohilatê ye, û em li wê pirsê wek pirsdanîna xwe ya millî dinihêrin û em divên hemû mecalan bi kar bînin ku ew proje di nava demeke herî kurt da bê qedandin". Armanca hukûmetê ya herî sereke ew pêşdabirina aborî ya navçeyên şûndamayî di perçeyên Tirkiyê yên cihê-cihê da ye, berî gişkî li navçeyên Anatolya Rohilatê û Başûrê Rohilatê, ew kêmkirina ferqiya di nava dereca pêşdaçûyîna navçan da ne, ew wekhevkirina dereca halxweşiya gel li temamiya welêt.

Em li jêr wan mecalên ku hukûmetê dixwest qebûl bike bona pêşdabirina aborî ya navçeyên Tirkiyê tînin :

- Li van navçeyan divê jiyana civakî bi pêşdaçûyîna malhebûna gundîtiyê û heywanxwedîkirinê pêş da here. Divê guhdariyeke mezin li ser zêdekirina hasilata gundîtiyê û deranînê bê danîn, û divê projeyên usa bi kar bînin ku gel bi xebatê bê razî kirin. Di nava wan mecaldanîn-deyndayîna (krêdî) demkurt û demdirêj ên anegorî projeyê da, dewlet divê pareke wan kapîtaldayînan bi xwe dade, demekê gotî ji bineciyan bacan hilnede.

- Zûtirekê, divê pirr pere bê cihê kirin bona çêkirina riyan, derbaskirina xetlûleyên avê, xetên elektrîk, çêkirina dibistanan, nexweşxanan, dayirên pevgirêdanê, usa jî divê dayirên gelî bên çê kirin.

- Navçeyên rex sînor êdî wek berê ewê qulç û kunc nebin. Kemaleke mezin divê bidin bazirganiya

li ser sînor, mecal ewê bên qebûl kirin bona hêsankirina çûyîn-hatinan ji vî berê sînor ber bi berê mayîn.

- Divê meaşekî bilind bidin wan serok qulixçiyên dewletê ku li wan navçan kar dikin, usa jî divê çêkirina xanî û malên jiyînê bidin lez kirin (223, 10.8.1984).

Divê bê xuya kirin ku berê jî projeyên bona pêşdabirina navçeyên Tirkiyê, xwezma li Kurdistana Tirkiyê, hatibûn amade kirin. Lê tucar di bernama hukûmeta Tirkiyê da guhdarîke usa mezin li ser wê pirsê ne hatiye danîn. Xuya ye ku ew bona wê yekê bû ku rewacên welêt ên civakî-aborî gelek zêde bûbûn. Di hêla din da jî wan dixwest ku xemxuriya komên Tirkiyê yên serkarîkir di hindava pêşdabirina navçeyên rohilatê û başûrê-rohilatê da di şertên tevgera millî ya nuh li Kurdistana Tirkiyê ku çiqas diçû hîn xurttir dibû da nîşan bidin.

Aneogrî bernamê, di hezîrana 1984 da, hukûmeta Turgut Özal biryarekeke ku tê da 27 navçeyên welêt wek "navçeyên aza" dihatin îlan kirin da weşandin. Navçeyên rohilatê û başûrê rohilatê jî diketin nava wê navçê. Anegorî biryarnamê, monopolên pirmillet ku li navçeyên Agirî, Qers, Tuncelî, Bingol, Mûş, Bitlîs, Siirt, Hekkarî, Gumuşan û Wanê, sermayeyên xwe kirine nava karxanekê, ew bac nadin, lê ew monopolên ku sermayeyên xwe kirine nava karxanên navçeyên Sîvas, Meletye, Elaziz, Diyarbekir, Adıyaman, Kahramanşehir, Urfa, Çankır, Çorum, Kastamonu, Sinop, Yozgat, Artvin, Erzurum, Erzincan û Mêrdînê divên tenê 40% wan bacên ku bi qanûnê hatine qebûl kirin bidin 233, 10.8.1984). Û divê kapital di nava çiqlên aborî yên usa da bihatana rikin kirin, wek ku malhebûna gundîtiyê û çiqlên bi wê ra girêdayî, sinaeta çiyamadeniyê, deranîna eskerî û hwd.

Bi agahdariya weşanê, ew biryarname ji peymana Amerîka-Tirkiyê ya şandina firindeyên Amerîkayê "F-16" ji Tirkiyê ra pêş da dihat. Anegorî agahdariya wezîrê parastina millî ya 22 Tîrmeh 1984, peyman

di derheqa sazkirina 10 fîrmayên nuh ku ewê demû-dezgehên usa berdin û ku bona balafirên "F-16" pêwîst in da hatiye girêdan. Wek xwedîpar, ewê monopolên DYA, bazirganên cî, dewleta Tirkiyê, Komela alîhevkirina eskerî (KAE) bikevin nava wê fîrmayê. Bo qolkirina (imzakirin) peymana "F-16", kapîtala welatên derve pirr alîkarî stend, berî gişkî Tirkiyê gelek kapitalên amerîkî stendin. Dihate texmîn kirin ku ji derveyî goveka peymana "F-16" jî gelek kapitalên welatên derve diketin Tirkiyê. Ewha, 6 mehên pêşîn ên sala 1984, 356 milyon dolarên kapitala welatên derve ketin Tirkiyê, ew jî wê çaxa ku di nava temamiya sala 1983 da tenê 102 milyon dolar hatibûn **(233, 10.8.1984)**.

Komên Tirkiyê yên serkarîkir ku navçeyên bi bineciyên kurd va wek "navçeya aza" îlan kiribû, dicedand ku kapitala welatên derve bi kar bînin bona xebitandina kaniyên tebîî û yên mirovî li Kurdistana Tirkiyê, ji ber ku burjuwaziya Tirkan ne dixwest ku fînansên xwe li vî parwelatî bide rikin kirin, ji bo ku li wira rewşa siyasî ne mithim bû (stabl nîn bû). Komên Tirkiyê yên serkarîkir gelek rêklam dikirin ku ew gava wan pirr kar e, lê dîsa ji wan ra li hev ne hat ku bi xemxurî û berxweketina xwe ya qelp ya di derheqa navçeyên rohilatê û başûrê rohilatê da şerkariya Kurdan a millî bidin seqirandin-mulayim kirin. Loma jî wan karên xwe yên cezakirinê yên li Kurdistanê berdewam dikirin. Lê tevî pelixandinên rejîmê ya "eşqiyayên" (usyanvan) Kurd, daxwaziyên empêryalîzmê yên stratêjîk jî, berî gişkan ên Amerîkayê, ku dijî Rohilata Nêzîk bûn û Waşington ew erd-ax wek wargehên "wek jiyanê giring" ji bo kara monopola Amerîkayê dihesiband, serê xwe bilind kiribû. Wek ku xuya ye, Tirkiye dikeve nava perê Bloka NATO yê başûr û bal wî gelek cebirxaneçekên bi duruşmên Amerîkayê hene. Li ser axa wî, li navça li rex sînorê Iraqê û ji Sûriyê ne dûr baza Amerîkayê ya "hêzên çeleng" hatine cîwar kirin. Ew hêz, dema ku kara Amerîkayê bikeve bin qeziyayê, amade ne ku li her xaleke navçeya ku ji Pakistanê dest pê dike û digihîje hetanî kenarên Afrîkayê mudaxele bikin **(183, 1985, N° 4, r. 96)**.

Bi vî awayî, karên Ankarê yên eskerî-cezakirinê qeziya mezin saz dikir bona kara hemû welat û gelên navçeyê, yên ku li vira şerrê millî-azadariyê dikin, ew qeziya bû xwezma bona gelê kurd ê azayîhez ê Tirkiye, Iraq û Îranê. Gava pêşmergeyên qehreman şerrekî mêranî dikir, tevgera Kurdan li Kurdistanê xurt dibû, Tirkiye û Iraq mecbûr bûn ku di 1982 da peymana Tirkiye-Iraqê qol bikin ku bona hetanî sala 1984 bû, û bi wê yekê va dixwest ku hêzên Tirkiyê dijî hêzên Kurdan ên welatparêz bi kar bînin. Endamê Komita Navendî ya PK Tirkiyê, Ali Iler, û endamê KNPK Iraqê, Qadem Hebîb, ku ew peyman qîmet dikir, nîşan da ku ew ne tenê dijî kar û mafên Kurdan ên zagonî di perçeyên Kurdistanê yê cihê-cihê da, lê wek xeleka daxwaziyên empêryalîzmê ya sereke, di serî da yên Amerîkayê, ku dijî temamiya navçeyê ne, tê hesab kirin **(183, 1985, № 4, r. 96)**.

Dû vê yekê ra, partiyên komunîst ên Tirkiye û Iraqê agahdariya tevayî da weşanê. Tê da xuya dibe : " Bi destê Tirkiyê, ku endama NATO ye, dewlet-endamên wê blokê dicedînin ku hukmê wê li navçeyê bêtir bidin fireh kirin. Rola Amerîkayê ya cendirma navçeyî gelek bi dilê hukumdarên Tirkiyê ku bixwe jî siyaseta şovînîzmê ya zevtkirinê derbas dikin e û hinkûfî wê ye.

Karên agrêsîf û peymana bênamûs qeziya ne bona her du welatan. Ew destûr dide ku hêzên derva bikevin nava karên wan ên hundirî. Ew qeziya ye bona aşîtiya navçeyê û bona temamiya cihanê **(183, 1985, № 4, r. 96)**.

PK Iraqê û PK Tirkiyê de'w kir ku di destê xwe da terka dakutanê bikin û eskerên Tirkan ji navçeyên rex sînor derxin. Ew ber bi mexlûqetiya cihanê ya pêşverû bûn, usa jî bangî wan hemû kesên ku bo wan aşîtiya cihanê tiştekî bi qîmet e kir ku piştgiriya komunîstan, hêzên her du welatan ên pêşverû-dêmokratîk ku dijî qayde-qanûnên diktatoriyê derketine bikin, bona pêkanîna dêmokrasiyê.

Institut Kurde de Paris

6. Karkirina partiyên Kurdan a siyasî. Daxwaziya wan ku bibin yek û şerkarî bona mafên xwe yên gelî bikin

Di şertên têrora hov da, gelek niştimanperwerên kurd mecbûr bûn terka welatê xwe bikin, herin welatên cîran (Sûriye, Lubnan), usa jî welatên Ewropayê (Almanya Fêdêral, Swêd, Berlîna Roava û ciyên mayîn), ku tê da wan wek berê gelek kovar û rojname di derheqa rewşa li Kurdistanê, siyaseta hukûmetên welatên Rohilata Nêzîk û Navîn di pirsa Kurdan da ronahî dikin derdixin.

Dîwana eskerî ku bi mecbûrî derketina Kurdan bi kar anî, bi sedan mirovên bi bîr û baweriyên pêşverû, rewşenbîran, karmendên siyasî ji bajarvaniya Tirkiyê da derxistin û xwest ku bi wê yekê va ji wan xelas bibe.

Wergerandina dewletê ya bi destê hukmê eskerî ya sala 1980 ji aliyê hêzên Tirkiyê yên pêşverû, herweha ji aliyê partiyên Kurdan ên siyasî, berk hate rexne kirin û gunehkar kirin. Di îlona 1980 da, Komita Navendî ya PK Tirkiyê banga ber bi karkeran da weşandin û bi wê usa jî ber bi gundiyan, hemû welatparêzên welêt çû. Wê bangî Partiya Tirkiyê ya Karkeran, Partiya Sosyalîst a Tirkiyê, Partiya Tirkiyê ya Gel-Komarî, Partiya Halxweşiya millî, usa jî dêmokratên kurd kir ku hemû nerazîbûnên xwe deynin alîkî û millê xwe bidin millên hev û dijî cunta terefdara Amerîkayê derkevin **(198, 1980, N° 17, r. 3-4)**.

Bi dizî, Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê banga "ber bi bineciyên Kurdistanê" da weşandin û tê da dêmê rejîma eskerî bi temamî da vekirin û ew wek a dijî gel, profaşîzmê hesab kir. Wê bang dikir hemû hêzên Tirkiyê yên dêmokratîk û pêşverû ku bibin yek di şerkariya xwe bona wergerandina cuntayê û testîqkirina dîwana gel a dêmokratîk **(binihêre 65)**.

Di 22 îlon 1980 da, Komiteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê du bang da weşandin : "Ber bi gelên Tirkiye û Kurdistanê", "Ber bi hemû welat-

Institut kurde de Paris

parêzên şoreşger û karkaran !". Di nava van belgeyan da serokatiya partiyê hukmê eskerî gunehkar kir û bangî hemû hêzên welatparêz û dêmokrat kir ku bibin yek bona ku cuntayê ji ser text bavêjin **(binihêre 66)**. Rêxistinên Kurdan ên mayîn jî bi agahdariyên vî awayî pêş da hatin.

Komîteya Navendî ya Partiya Sosyalîst ya Kurdistana Tirkiyê ji adara 1982 da dest pê kir kovara mehane "Riya azadî" bide weşandin û tê da bîr-baweriyên partiyê di derheqa pirsên hundirî û navneteweyî û peydakirina mafên Kurdan ên gelî da dihatin ronî kirin. Di nava nivîsarên xwe da, PSKT siyaseta DYA ya agressîf di hindava gelên Asya, Afrîka û Amerîka Latînî da rusa' dikir, bona piştgiriya şerkariya bona aşîtî û çekdanînê ku bi serokatiya Yekîtiya Sovyêtî pêş da diçû dibû, dakutana Israîl a hov li Lubnanê rexne kir, dijî desîseyên empêryalîzmê yên li Rohilata Nêzîk û Navîn derket, di derheqa piştgiriya xwe ya bi gelê Filistîn ra îlan kir û ji bo terka şerrê Îran-Iraqê û otonomiya Kurdan pêş da hat.

PSKT bangî hemû rêxistinên Tirkiye û Kurdistana Tirkiyê yên şoreşgerî û dêmokrasiyê dikir, bangî hemû welatparêzan û mirovên pêşverû dikir ku her tiştî bikin bona sazkirina pêşeniya millî-dêmokrasiyê li Kurdistanê, lê usa jî pêşeniya dêmokrasiyê dijî empêryalîzmê di goveka Tirkiye û Kurdistana Tirkiyê da saz bikin **(221, 1982, № 4, r. 1-5)**.

Di tîrmeha 1981 da, kongreya Partiya Karkerên Kurdistanê ya yekemîn hate derbas kirin. Kongrê teşkîla Komîteya Merkezî ya nuh a Partiyê bijart. Wê belgeya siyasî ku Komîteya Navendî ya partiyê amade kirîbû eciband.

Kongrê çend derecên karkirina PKK henik rexne kirin, lê bi tomerî riya partiyê ya rast hesab kir. Ji bo nimûnê, tevgelên kongrê xuya da ku hinek mecalên ku li ciyan hatine qebûl kirin û di wan ciyan da hêza partiyê xurt ne bû ziyan da kar, gihand wê yekê ku gelek endamên partiyê ji destê wan çûne. Kongrê biryar qebûl kir ku giraniya şerkariyê nemaze ji bajêr cîguhastî gundan bikin.

Institut kurde de Paris

Ew bona sazkirina "pêşeniya dijî faşîzmê ya fireh" li Tirkiyê, bona testîqkirina pevgirêdanên xurttir û kîp bi rêxistinên Kurdan li perçeyên Kurdistanê yên mayîn hat.

Kongrê "siyaseta sosyalîzmê" ya bi serokatiya Yekîtiya Sovyêtî ittifaqdara xwe hesab kir, herweha heja karkeran li welatên kapîtalîst ên pêşketî û tevgera millî-azadariyê hevalbenda xwe hesiband.

Tevî vê yekê, wê giringiya yekîtiya di navbera gelên Kurdistan û Filistînê da di şerkariya wan a bona azadiyê, dijî empêryalîzm, sîyonîzm û rêaksyona hundirî da nîşan da (226, 1982, № 1, r. 18).

Ji meha çiriya paşîn 1982 da, PKKê dest pê kir li Berlîna Roava kovara xwe ya mehane "Serxwebûn" bide weşandin. Wek ku di pêşnivîsara hejmara wê ya pêşîn da dihate gotin, kovarê dicedand ku rewş û tevgera bona serxwebûna Kurdistanê ronahî bike, siyaseta kolonyalîzma Tirkiyê, piştgirên wê yên empêryalîst, planên empêryalîzmê di hindava gelên Kurdistanê da bedlome bike, hogiriya bi hêzên cihanê yên şoreşger ra bide xurt kirin, sosyal-şovînîzm û nasyonalîzma rêformîst a cî bide izole kirin, temamiya hêza xwe bike yek bona sazkirina yekîtiyê, şerrekî bê hempa bikin dijî cunta eskerî, hem li Kurdistanê, hem jî li Tirkiyê, şerkariya herdemî bikin boy navê armanca xwe û pêkanîna daxwaziyên partiyê (226, 1982, № 1, r. 19).

Di oktobra 1981 da, kongreya pêşîn a Azakerên Milletê Kurdistanê (KUK) a ku wek hemcivîn bû hate derbas kirin. Kongrê biryar kir ku navê Partiya Dêmokratîk a Kurdistana Tirkiyê ji ser xwe rake, KUK wek heja ne lêgal ku ketiye nava merhela sazkirina Partiya Marksîst-Lênînîst a prolêtarya Kurdistanê hesiband. Wê KUK wek zurreta (peyhatî) PDKT a tek-tenê hesab kir û îlan kir ku ewê dijî kesên ku bi wî navî pêş da bên derkeve.

Kongrê rewşa navneteweyî enene kir, hal û demên rewşa siyasî li Tirkiyê tehlîl kirin, guhdariya mezin danî ser wê rewşê li her çar perçeyên Kurdistanê û di navçeyê da, vegeriya ser pirsa şoreşa millî-



Institut kurde de Paris

dêmokratîk li Kurdistanê, qîmetê xwe da karkirina KUK a berê, kêmasiyên wê derxistin holê, pirsên organîzekirinê enene kirin, pirsdanînên xwe yên şerkariya bona paşerojê nîşan dan (46, r. 1).

Xudanên biryara qebûlkirî li ser wê baweriyê bûn ku şoreşa gel a millî-dêmokrasiyê li Kurdistanê nikare tenê bi serokatiya çîna karkeran a idêolojîk, siyasî û teşkîldariyê bi ser keve, ji ber ku burjuwaziyê şoreşgeriya xwe hunda kiriye. Rast e, hinek nûnerên burjuwaziyê bi bîr û baweriya xwe, dikaribû bona kara xwe tevî tevgera millî bibûna (46, r. 21).

Kongreya KUKê ya yekemîn dijî pevçûyînên siyasî yên di navbera hejên şoreşvaniyê yên welatparêz ên perçeyên Kurdistanê yên cihê-cihê da derket, ji ber ku pevçûyînên bi wî awayî ziyanê digihîne gelê kurd, şoreşa wî û hêzên cihanê yên şoreşgeriyê, nijadparêzan bi hêz dike, hêz dide rêaksyon û empêryalîzmê, usa jî rêaksyonên mayîn ên di navçeyê û cihanê gişkî da (46, r. 30).

Wek ku di biryara kongrê da dihat gotin, hej-tevgera KUK ewê kemaleke xusûsî bide welatên sosyalîst ên bi serokatiya Yekîtiya Sovyêtî ku hevalbend-hogira gelên Kurdistanê ya herî entêrnasyonal û gelên cihanê yên bindest ên mayîn hesab dibe (46, r. 25).

Rêxistina KUK di îlona 1981 da dest pê kir li Swêdê kovara "Qêrîn" derxîne, lê xwediyê kovarê yê şeklî KOÇ-KAK ku Rêxistina Çandî ya Karkerên Kurdistanê li Swêdê hesab dibû bû (204, 1982, № 4-5, r. 2). Lê ji ruyê nerazîbûnên di navbera serokatiya KUKê da, ji payîza sala 1982 da kovar nema derket.

Di salên 80 da, ew daxwaziya partiyên Kurdan ên siyasî ku karkirina xwe koordine bikin, bicivînin ser hev, çiqas diçû xurttir dibû. Ew xwezma dû hukmê eskerî li Tirkiyê bêtir aktîf bû, gava ji ruyê hişkbûna pelixandinê li Kurdistana Tirkiyê gelek serokên partiyên Kurdan ên siyasî mecbûr bûn ku derkevin welatên derve. Ewha, di çiriya paşîn 1982 da, sê partiyên Kurdan ên siyasî (Ala Rizgarî, KUK, Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê) agahdariya

tevayî di derheqa ji aliyê wan da qebûlkirina biryara berk a yekîtiya di hêla karê tevayî da, di goveka Kurdistana Tirkiyê da, da weşandin.

Ew îlan bangî hemû hêzên şoreşgerî-dêmokratîk dikir ku di nava pêşeniya fireh da, ku divê pêş da bihata bona bernama dijî faşîzmê û dijî empêryalîzmê, bona mafê gelê kurd yê xweqerarkirinê, bibin yek (196, 1982, N° 39, r. 12).

Ev îlana her sê partiyên Kurdan gaveke giring bû li ser riya sazkirina hêzên millî li Kurdistana Tirkiyê. Di adara wê salê da, ew her sê partî, girêdayî cejna Newrozê , ber bi gelên Tirkiyê bangek weşand û tê da dihat xuya kirin ku hêzên Tirkiye û Kurdistanê yên sosyalîst û dêmokratîk şerkariyê dijî desîseyên empêryalîzmê, DYA, burjuwaziya Tirkiyê ya monopoliyê dikin. Wan bang dikir ku refên xwe bi hêz bikin, pêşeniya şerkariya fireh saz bikin û usa jî bawer bin ku gelê kurd ewê ji sedî sed serbixwe be û ciyê xwe di nava refên gelên cihanê yên azad da bigre (223, 1982, N° 34-35, r. 5).

Ne tenê partiyên Kurdan ên siyasî ketibûn nava şerkariya bona naskirina mafên gelî, dijî têrora li Kurdistanê, lê usa jî rêxistinên genc û jinan ên kurd ku li welatên derve diman. Di sibata 1982 da, çar rêxistinên Kurdan ku li Ewropa Roava kar dikir - KOMKAR, AKSA, Komîta Damezrandina Jinên Kurdistanê (Kürdistanlı kadınlar örgütleme komitesi) û Komîteya Parastina Mafên Gelê Kurd ên Millî-Dêmokratîk li Tirkiyê (Türkiyedeki Kürt Halkının Ulusal Demokratik Haklarının Savunma Komitesi) - belgeke tevayî amade kir û ew şand wezaretên karên dervayî yên Fransa, Yûnanistan, Swêd, Norvêc, Danîmark, Fînlanda, Hollanda û Beljîka. Di wê belgê da wan rêxistinan qala pirsên Kurdistanê dikir, di derheqa zêrandina Kurdan ji aliyê rejîma Tirkiyê ya eskerî da, êşkencekirin û dardakirinên welatparêzên kurd digotin û di derheqa peymanên navneteweyî da dianî bîra hemuyan ku ew peyman ji aliyê Tirkiyê tên pêpes kirin û hêvî ji hukûmetên wan welatan kir ku piştgiriya Kurdan bikin, lê usa

jî pirsa Kurdan di civînên navneteweyî da bilind bikin (196, 1982, N° 39, r. 9).

Giring e ku em nîşan bidin ku bi peydakirina riyên bona nêzîkîhevkirina tebiyên partiyên cihê-cihê di nava Kurdan da, usa jî karekî mezin dihat kirin bona yekkirin û xurtkirina ittifaqdariyê di navbera welatparêzên tirk û kurd da, di navbera rêxistinên Tirkan û Kurdan ên çep da, yên ku dest pê kiribû li welatên derve bi tevayî dijî têror û zordestiyê li Tirkiyê meşîn çêkin û ew yek protêsto bikin.

Di destpêka tîrmeha 1981 da, koma avukatên ji Tirkiyê yên kurd û tirk (Kemal Burkay, Ziya Acar, Veysi Zeydanlıoğlu, Yücel Yeşilgöz) bangek şand Koma Milletan û tê da nimûne danî ku çawa li Tirkiyê bi hovîtî mafên mirov pêpes dibin, xwezma li Kurdistana Tirkiyê rejîma eskerî zulma bêhempa dikir, û wan hêvî ji wê rêxistina navneteweyî dikir ku dêlêgasyonekê bişînin Tirkiyê bona nasiya xwe bidin têrora dîwana Tirkiyê di hindava rêxistin û mirovên pêşverû da, lê usa jî de'w kir ku karên rejîma Tirkiyê yên eskerî protêsto bikin û ku ewê pirsê di civîneke Meclisa Koma Milletan a Sereke da enene bikin (194, 1981).

Di tebaxa 1982 da, heft rêxistinên Tirkan û Kurdan ên çep, PSKT, Ala Rizgarî, Yekîtiya Kar, KUK, PKK û yên mayîn, îlana tevayî weşand û tê da bangî bineciyên welêt ên tirk û kurd dikir ku dijî destûra rêaksyonêr derkevin û dengê xwe nedin wê, ji ber ku ew ji aliyê rejîma eskerî hatiye hazir kirin, lê usa jî hêzên xwe bikin yek di nava şerkariya xwe ya bona hilweşandina diktaroriya eskerî û testîqkirina qayda dêmokratîk li Tirkiyê, bona azayiya gelê kurd a millî û civakî (196, 1982, N° 44, r. 5).

Bere-bere, jimara wan partiyên Kurdistana Tirkiyê ku tebiyên xwe bi hevdu ra didan qayil kirin, bi hevdu razî dibûn zêde dibû. Di 22 îlon 1982 da, pênc partiyên Kurdan ên siyasî û rêxistinên Tirkiyê (Ala Rizgarî, PTK, KUK, PSKT, Têkoşîn) name ji serokê Rêxistina Azadariya Filistînê ra şand û tê da wan siyaseta siyonîstên Israîl a gelkujiyê û piştgirên wan - empêryalîzma Amerîkayê - ya di

Institut Kurde de Paris

hindava gelê Filistînê da berk gunehkar û rexne dikir, û hêviya xwe ku gelê Filistînê zû an dereng ewê li ser axa xwe dewleta aza û serbest çê bike û ku di nava şerkariya heq da ewê herdem piştgiriya gelê Filistînê bikin îlan kir (196, 1982, N° 46, r. 12).

Di 1 îlon 1983 da, Ala Rizgarî, KUK, Têkoşîn, Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê (PPKK), ku ji perçebûna Partiya Karkerên Kurdistanê xuliqî, û PSTK banga tevayî weşand û tê da siyaseta empêryalîzma Amerîkayê ya agrêssîf di navçeyên cihanê yên cihê cihê da dihat rusa' kirin, planên DYA yên tevrakirina şerrê germortîkiyê dihat rexne kirin, bang dikir ku piştgiriya şerkariya welatên sosyalîst a bona bendkirina lecbeziya çekdarî, bona pêşîgirtina qeziya şerr bikin (188, 1983, N° 43, r. 20).

Partiyên Kurdan ên siyasî yên Tirkiyê kirinên barbar li Kurdistanê di oktobra 1984 da berk gunehkar kirin. Ewha, nûnerên PSKT, PPKK, KUK, Têkoşîn û Rizgarî civîneke çapê teşkîl kir û tê da ber bi serokên hukûmet û dewletan bûn, ber bi kes û rêxistinên aştîxwaz û dêmokratîk bûn û bang kir ku dengê xwe bilind bikin û bi protêsto dijî kirinên dîwana Tirkiyê yên nemirovî di hindava bineciyên welêt ên kurd da derkevin (189, 1984, N° 19, r. 7).

Divê xuya bibe ku ji partiyên Kurdan ên bi nav û deng ên mayîn PKK, ku jê ra dibêjin Apocî, tevî wan mecalan ne bû. Ew partiya Kurdên Tirkiyê ya tek-tenê ye ku bernama wê bi radîkalîzma xwe ya çepê va gelek ji wan bernameyên partiyên Kurdistana Tirkiyê yên mayîn, bîr-baweriyên idolojîk dihat cuda kirin. Wê berk tebiya rêxistinên Kurdên Tirkiyê yên siyasî rexne dikir, bê bingeh ew bi opportunîzmê gunehkar dikirin û bi wan ra tevayî jî bona sazkirina pêşeniya muxalefetek yekbûyî ya hêzên Tirkiyê yên çep pêş da dihat.

Merheleke nuh di nava heja çepê Tirkiyê da di sala 1984 da dest pê bû, gava ku partiyên Kurdan ên siyasî tevî hêzên welêt ên çep, herweha tevî Partiya Komunist a Tirkiyê, dijî siyaseta komên Tirkiyê yên serkarîkir ên rêaksyonêr derket. Ewha, dema hilbijartinên di organên cî da (25 adar 1984), cara pêşîn

Institut kurde de Paris

pênc partiyên Tirkiyê yên çep bi bangeke xusûsî ber bi gelên Tirkiyê bûn. Ew ev partî bûn : Partiya Komunîst a Tirkiyê (PKT), PSKT, PPKK, Partiya Karkeran a Tirkiyê (PKT) û Partiya Komunîst a Karkeran a Tirkiyê (PKKT).

Di 1 gulan 1984 da, van partiyan bi hev ra karkirina komên cuhanan belavok li zanîngehan belav kirin û xebatên mayîn dijî rejîma welêt a rêaksyonêr kirin. Paşê Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê jî hat, gihîşt wan pênc partiyan. Pey vê yekê, ev rêxistinên çep bi tevayî pêş da hatin bona efuya (amnîstî, bexişandin) girtiyên siyasî yên Tirkiyê.

Em li ser wê baweriyê ne ku pêşdahatinên tevayî yên çend partiyên kurdî yên siyasî tevî hêzên Tirkiyê yên mayîn pêk bûn ji bo ku Partiya Komunîst a Tirkiyê di nava bernama xwe da prensîpa Lênînîzmê di derheqa xweqerarkirina gelan da firehtir û zelaltir raber kir, û ev jî alîkariya nêzîkhevbûna van partiyan tevî PKT kir.

Pey wê, xuya dibe ku mafê gelê kurd heye ku "bi xwe bextê xwe biryar bike", ango destûra wî heye ku cihê be jî ...

Eger gelê kurd bi daxwaziya xwe biryar bike ku bi gelê tirk ra tevayî bijî, wê demê anegorî şertên dîrokî yên konkrêt divê dewleta tomerî bê saz kirin. Di nava destûra dewleta dêmokratîk da mafê Kurdan bona cihêbûnê ewê bê kefîl (garantî) kirin.

Komunîst herdem jî terefdarên dewleta dêmokratîk a li ser bingeha rizadiliyê hesab dibin û usa ber bi safîkirina pirsa millî dibin, çika ew çiqasî bona kara çîna karkeran û şerkariya wê ya bona sosyalîzmê ne (63, r. 43).

Di nava bernama PKT da dihat gotin : "Kurd, ku perçeke bineciyên Tirkiyê yên gelek in, di bin zêrandina dubare da dijîn. Gelê kurd ne tenê ji aliyê monopola cî û derve tê zêrandin, zordestiya xwedîmilkên mezin û tucaran li ser xwe dibîne, lê burjuwaziya Tirkiyê li Kurdistana Tirkiyê zêrandina millî ya barbar jî pêk tîne".

"Tevgirêdanên muhkem hene ku karkerên kurd bi



Institut kurde de Paris

karkerên tirk ra didin girêdan. Dijminê her du gelan yek e. Civaka Tirkiyê ya karkeran dijî zêrandina gel pêş da tê. Tenê şerrê dijî empêryalîzm û faşîzmê, şoreşa gelî ya dêmokratîk dijî empêryalîzmê, yekkirina hêzên her du gelan dikarin bigihînin serketinê" (63, r. 26).

Girêdayî wê yekê ku hukûmeta Tirkiyê li wilayetên rohilatê karên cezakirinê dike û dicedîne ku piştgiriya rêaksyonê bike bona hincirandina şerkariya millî-azadarî li perçeyên Kurdistanê yên mayîn, Partiya Komunîst a Tirkiyê di 24 tebax 1984 da agahdarî weşand û tê da got : "Berî her tiştî, PKT îlan dike ku ew berk di hêla gelê kurd ê pirr zêrandî ku dixwazin xeza bikin û ji nav dîrokê bidin hildan da sekiniye. General divên destê xwe ji gelê kurd bikişînin. Ittifaqdariya bi gelê kurd ra, ku ketiye nava xeleka bixwîn a rejîmên faşîst û milletçî yên Tirkan, Ereban û Îraniyan, nuha bûye mîzana (krîtêr) dêmokrasî û aşîtîxwaziyê" (189, 1984, № 16, r. 1).

Tebiya PKT a bi wî awayî, helbet, ji aliyê partiyên Kurdan ên siyasî hat ecibandin û alîkariya hevgirtina hêzên Tirkiyê yên çep kir. Bi destê tevgerê, di meha çiriya pêşîn 1984 da nûnerên hemû aliyan ên partiyên Tirkiyê yên çep rastî hevdu hatin : Partiya Komunîst a Tirkiyê (lîder Haydar Kutlu), Partiya Pêşeng a Karkerên Kurdistanê (lîder Serhad Dicle), Partiya Karkeran a Tirkiyê (lîder Behice Boran), Partiya Komunîst a Xebatê ya Tirkiyê (lîder Teslim Tore), Partiya Sosyalîst a Kurdistana Tirkiyê (lîder Kemal Burkay), Partiya Sosyalîst a Xebatê ya Tirkiyê (lîder Ahmed Kaçmaz).

Dema wê rasthatinê, li qewimandinên dawîn li cihanê li navçeyê û li Tirkiyê hat nihêrîn. Dema hevpeyvînan, wan partiyan biryar kir ku hêzên xwe bikin yek di şerkariya dijî faşîzm û empêryalîzmê da û rêxistina Yekîtiya Tirkiyê ya çep û ya Kurdistana Tirkiyê ya çep (Sol Birlik) saz kir.

Yekîtiya Çep siyaseta empêryalîzma Amerîkayê û siyonîzma Israîl rexne kirin, bona parastina mafê Filistîniyan bona sazkirina dewleta xwe ya serbest li ser erdê xwe pêş da hat, de'wa sekinandina

şerrê Îran-Iraqê ku tenê bona kara empêryalîzmê dihat kir, piştgiriya hêzên wan welatên pêşverû ku şerkariyê bona mafên xwe yên dêmokratîk û civakî dikin kir, usa jî piştgiriya gelê kurd ku şerkariyê bona mafên xwe yên neteweyî- dêmokratîk dike kir.

Yekîtiya Çep rejîma Tirkiyê ya rêaksyonêr rexne kir, bang kir ku hemû hêzên Tirkan û Kurdan ên dêmokratîk û aşîtîxwaz bibin yek bona wergerandina faşîzmê "û welêt ji krîza aborî û avanturîzmê biparêzin, lê gelên tirk û kurd ji zêrandin û belengazî-sexîriyê xelas bikin" (67, r. 1-8).

Bi vî awayî, di wan şertan da, gava dîwana Tirkiyê pirsa Kurdan inkar dike, merheleya koordinekirina hêzên Tirkiyê yên çep dihat texmîn kirin. Û di nava vê merhelê da karkirina partiyên Kurdan ên siyasî yên li jor xuyakirî, yên ku di dereca pirsên giring ên siyaseta Tirkiyê û welatên navçeyê yên hundir û derva da xwe bi tebiya dijî empêryalîzmê girtibû, ciyekî berbiçav digirt.

x x x

Nenihêrî siyaseta komên Tirkiyê yên serkarîkir ên rêaksyonêr ku bona helandin-asîmîlasyona Kurdan, inkarkirina isbatên heyetiya wan li Tirkiyê, gelê kurd ê pirmilyon urf-adetên xwe, zimanê dayikê, çand û tradîsyonên xwe diparêze. Tunebûna hesab-kirina (statîstîk) dêmografîk a rasteqîn destûr nade ku em jimara Kurdên Tirkiyê ya rast bizanibin.

Di dema komarê da, li Tirkiyê 12 car hesabkirina bineciyan hat derbas kirin. Lê netîceyên wan ku di derheqa teşkîla welêt a millî da bûn, ne hatin weşandin. Gilî di wê yekê da ye ku dîwan bi her awayî dicedîne ku heyetiya Kurdan û zimanê kurdî li welêt inkar bike. Wek nimûne, em dikarin van isbatên han bînin. Ewha, girêdayî hesabkirina bineciyan a sala 1985, li Tirkiyê pirtûka pirsiyarnaman (malûmat-naman) a bona karmendên ku diviyan hesabkirina bineciyan bidin derbas kirin hate hazir kirin. Tê da

Institut kurde de Paris

pirsek hebû ku dibêje : hûn bilî zimanê xwe yê dê ji van zimanan kîjan dizanin : ingilîzî, fransî, erebî an jî kurdî ? Bîranîna zimanê kurdî di nava wê pirsiyarnamê da ji aliyê mehkema dadxwaziyê wek cedandina sistkirina hissên "millî", wek propaganda kurdîzmê hat hesab kirin. Wê 11 kesên ku tevî hazirkirina pirsiyarnamê bûbûn dan mehkemê û de'w kir ku ji 5 hetanî 8 salan cezayê girtinê bide wan **(196, 1986, N° 86, r. 5)**.

Bi salixên serkaniyên Kurdan, di sala 1987 da li Tirkiyê ji 12 milyon Kurd bêtir diman. Rast e, dibistanên kurdî tu nene, wan qedexe kiriye ku zarên Kurdan bi zimanê dê hîn bibin, rojname, kovar û edebiyata mayîn biweşînin. Komên serkarîkir Kurdan asîmîle dikin, nahêlin ku bilî tirkî bi zimanekî mayîn bipeyivin, lê dîsa jî 80% Kurd, xwezma li gundan, tirkî nizanin û bi zimanê dayka xwe - kurdî - dipeyivin. Hela bi ser da, Kurd ne tenê zimanê xwe yê dê diparêzin, lê usa jî çand û folklora xwe ku gelek ji ya Tirkan cuda ye xwedî dikin.

Dînperestî di nava jiyana bineciyên kurd da roleke giring dilîze, xwezma di hêla jiyana ruhanî da. Piraniya bineciyên kurd islamê dihebînin û piraniya wan jî sunnî ne. Lê bawer bike 20% jî şiî ne (weke 2 milyon kes). Bilê wê, weke 250-300.000 Kurd jî dînê yezîdî diparêzin. Kurdên şiî (elewî, kızılbaş), piraniya wan şiîyên ehlê heq "mirovên rastiyê", an jî alî-ilahî ne. Piraniya wan li Dersîmê dijîn (wilayetên Tuncelî, Elaziğ, Meletye, Kahramanşehir û ciyên mayîn). Kurdên şiî bêtir şûndamayî û zêrandî ne, ji ber ku ne tenê tesîra milletekî din heye, lê usa jî tersîra olî jî heye. Ev yek ji aliyê piraniya Kurdan bi nerazîbûneke mezin va tê qebûl kirin.

Cudabûnên dînî bi tomerî hildayî hukmê xerab li ser şerkariya Kurdan a millî-azadarî dikin, lê ew wek berê rola sereke nalîzin, ji ber ku nuha xwefehm-dariya millî derketiye ser plana pêşîn û ew yek xwezma van salên dawîn hîn baştir bû.

Lê tevî vê yekê, dîn-ol dîsa jî roleke xuya di nava

Kurdan a rûhanî da dilîze, û ji vê yekê ne tenê komên Tirkiyê yên serkarîkir dikevin karê, lê usa jî nûnerên serkarên Kurdan ên civakî - axa, şêx, - yên ku wek berê tesîra wan li ser pareke bineciyên Kurdan ên şûndamayî heye.

Anatolya Rohilatê ku Kurdistana Tirkiyê jî di nav da ye, dîsa navça welêt a herî paşketî hesab dibe û li wir xusûsiyetên taybetî hene. Ew dike weke 1/5 perça Tirkiyê ku tê da weke 18% bineciyên welêt dijîn. Li vira pirbûna bineciyan ji roavaya Tirkiyê kêmtir e. Ewha, eger sala 1985 li temamiya welêt li ser her kilometreke çargoşe 66 meriv dima, li navçeyên Kurdan ew jimar dikir 46 meriv. Bi vî awayî, pirbûna bineciyan li Kurdistana Tirkiyê ji sala 1980 da ne hatibû guherandin, ew jî dema ku li temamiya welêt ew bi mirovan va zêde bûbû (sala 1980 ew dikir 58 mirov). Lê divê em hildin ser hesab ku zêdebûna bineciyan li navçeyên Kurdan, ne li temamiya welêt, 3% zêde bû. Loma jî em dikarin pirbûna bineciyan a nizm bi wê yekê va şirove bikin ku herdem binecî bar dikir, diçûn wilayetên roava, nemaze bajaran, ji ruyê şûndamayîna navçeyên welêt ên rohilatê ku tê da sinaeta pêşketî tu nebû.

Weke 70% Kurdan li gundan dimînin, lê 30% jî li bajaran. Lê li Tirkiyê bi temamî hildayî nîvî li bajaran dimînin, nîvî jî li gundan.

Kurdistana Tirkiyê bi madenên usa va dewlemend e : neft, kromît, fosfat, hesin, pola û tiştên mayîn. Li vira kaniyên ênêrjiyê jî hene : tenê stasyona hîdroêlêktrîkê ya Kebanê 11% xercên ênêrjiya êlêktrîkê yên merkezên sinaetên Adana, Ankara, Izmir û Stembolê dide. Lê tenê 10% karxanên dewletê û 2,7% ên şexsî dikevin para navçeyên rohilatê ku tê da 5% karkerên wê yên jêhatî kar dikin. Li vira sinaeta fabrîka-karxanan a mezin tu neye. Li vira tenê 18% zorayên karxanên şekir, 14% karxanên çimentoyê û ji 10% kêmtir destçêxanên dirûn-terzîtiyê hene. Lê ciyê sereke di nava aboriya navçeyên Kurdan da malhebûna gundîtiyê digre. Li vira weke 40% heywanên gir xwedî dikin, weke 21% erdê

Tirkiyê tê bêcer kirin. Anatolya Rohilatê ewqas hasilata malhebûna gundîtiyê berdide ku dike 15% ya temamiya welêt. Nuha li Tirkiyê mêkanîzekirina malhebûna gundîtiyê pêş da diçe. Ew li navçeyên Kurdan dibe. Lê ew merhele gelek hêdî diçe. Ewha, sala 1988 li rohilatê tenê 10% ji traktoran (47% li roavayê û 43% jî li merkezê) hebûn. Û eger li roava hetanî 70% hemû xweliya bêcerkirinê dihat rakirin-çandin, û li merkezê jî ew dikir weke 40%, li rohilatê ew reqem dikir 20%.

Bi tomerî hildayî, rohilata ziraî 8% deranîna sinaetê û 19% hasilata malhebûna gundîtiyê dike nava fonda hemmilletiyê.

Lê ev hemû tiştên gotî qet jî xuya nadin ku li rohilata welêt di dereca pêşdaçûyîna şertên civakî-aborî da tutişt ne hatiye guhastin.

Tirkiya Rohilatê ku êdî ne wargê bi malhebûnî izole kiriye, bere-bere dikeve nava tevgirêdanên welêt ên bazirganiyê yên hundir û derve. Nuha li her der, hem li bajaran, hem jî li gundan, cûrê xebitandina malhebûniyê ya kapîtalîst dixuliqin û tên mehkeme kirin.

Dewlet dicedîne ku bi her awayî bikeve nava merheleyên karstendinê bona ku bêtir kaniyên wê wargehê yên tebîî û mirovî bona xwe bi kar bîne.

Hemû planên pêncsaliyê yên Tirkiyê guhdariya mezin datanî li ser pêwistiya berî her tiştî pêşxistina malhebûnên navçeyên paşketî, ilahî yên wilayetên rohilatê û başûrê rohilatê. Hukûmeta Turgut Özal usa jî bernama xusûsî di derheqa pêşdabirina Anatolya başûrê rohilatê qebûl kiriye. Wê programê didît ku 15 emberavên mezin û 18 stasyonên hîdro-êlêktrîk çê bike, çi ku bi baweriya hukûmetê ewê ferzenda deranîna êlêktoênêrjiyê du caran zêde bikin û 1,8 milyon hêktar erd av bidin **(221, 1986, № 50, r. 6)**.

Lê pêşekzanan ji rastiya wê projeyê bawer ne kir, ji ber ku projeyên bi wî awayî berê jî dihatin qebûl kirin, lê ne dihatin pêk anîn. Li vira bi xusûsî tê nîşan dan ku kapîtala Tirkiyê ya şexsî guhdariya

mezin ne dida şênkirin-dewlemendkirina Kurdistana Tirkiyê, ji ber ku li wira rewşa siyasî herdem mithîm (stabl) nîn bûye. Di hundirê xwe da, nûnerên burjuwaziya Kurdan jî kapîtalên xwe di navçeyên welêt ên roava da dida rikin kirin. Wê çaxê ew dibûn hevalbendên fîrmayên Tirkiyê yên şexsî û vê yekê burjuwaziya Tirkan û Kurdan bêtir nêzîkî hevdu dikir.

Di van şertan da, dîwana Tirkiyê dicedand ku kapîtala welatên derve bi kar bîne bona pêşdaçûyîna navçeyên Tirkiyê yên bakur-rohilatê. Ewha, di gulana 1986 da ji hukûmeta T. Özal ra li hev hat ku projeya wê zagona ku destûr dida şirketên welatên derve ku li welêt xweliyê bi dest bixin, bibin xwedîmilk, li Meclisê bide derbas kirin. Anegorî wê zagonê, hukûmet dikare destûra peymanên usa bide , "eger ew bona kara millet be, bona kara aboriya welêt be" **(221, 1986, N° 50, r. 7)**. Anegorî weşanaê, ev yek bi dilê çend şêxên Erebistana Seûdî, usa jî monopolên DYA, Hollanda û welatên mayîn bû.

Di salên paşdemê da, di nava teşkîla bineciyên Kurdan a civakî da guhartin hatin xuya kirin.

Piraniya bineciyên kurd gundî ne; 70% bineciyên bi aborî aktîf di nava malhebûna gundîtiyê da kar dikir. Pêwendiyên deranînê li gundên Kurdan hewaskariyeke mezin pêş da tîne. Di nava 22 navçeyên Tirkiya Rohilatê da, 30% gundiyan di nîveka salên 70 da bê xwelî bûn. Ew jî wê dema ku 42% temamiya xweliya bêcerkirinê di bin destê 5,3% milkedarên xweliyê da bûn. Li gundan, tenê 3% malhebûnên xwelîbêcerkirinê iznê wan hebû ku teknîka malhebûna gundîtiyê di malhebûna xwe da bidin xebat kirin. Bi salixên mayîn, di nîveka salên 80 da, 4,5% wan bineciyan, ku di nava malhebûna gundîtiyê da kar dikir, nîvê xweliya bêcerkirinê xistibû bin destê xwe, dema ku tenê 10% ji temamiya xweliya navçeyê di bin destê 60% a bineciyan da bû. Hela bi ser da, 41% bineciyên Mêrdînê, 47% gundiyên Diyarbekirê û 54 bineciyên Urfayê bê xwelî bûn **(221, 1986, N° 50, r. 6)**.

Di van şertan da, hukûmeta Turgut Özal ne tenê di derheqa derbaskirina rêforma xweliyê da ne fikirî, lê usa jî biryar qebûl kir ku ji wan 3 milyon donuman 829.000 donum vegerîne axayên ku hela berî hukmê eskerî yê 12 îlon 1980 teslîmî dewletê kiribûn, bona ku ew di nava gundiyên bê xwelî da par vekin. Tê da hatibû dîtin ku xweliya mayîn li ciyên avî bi 60 donuman wek kirê bidin, lê li ciyê dêm û qir weke 200 donum kirê bidin (221, 1986, N° 50, r. 7). Tiştê herî zendegirtinê ew bû ku hukûmeta Tirkiyê ev hemû tişt dixwest usa raber bike ku xwedê giravî rêforma xweliyê dike.

Serokê Komela Xwelîbêcerkirinê ya Tirkiyê, ku rastiya wan gotî ew rêform xuya kir, got : "Ew biryar tutiştî nade xwelîbêcerkir. Armanca wê ew e ku xweliyê careke din bidin axayên xwedîmilk ku anegorî zagon N° 757 teslîmî dewletê kiribû, bona ku di nava gundiyên Urfayê yên bêxwelî û kêmxwelî da par vekin. Ew ne parvekirina xweliyê ye, lê binperdekirina wê ye" (221, 1986, N° 50, r. 7).

Şêwrdarê berê yê karên rêforma xweliyê û malhebûna gundîtiyê, Saim Kandar, ku di derheqa wê rêforma berxwederxistî da peyivî, got : "Tu tiştekî biryarê bi rêformê ra tu neye. Ew tenê dijî rêformê ye. Ew xweliyên ku dikarin dewsa wan milyar lîreyên ku dewlet xerc kirine bigrin, careke din didin axa. Ji 7 milyon donumên heyî, 5 milyon donum xweliya avî ewê bikevin bin destê 120 malan" (221, 1986, N° 50, r. 7).

Komên Tirkiyê yên serkarîkir bi van ferzendan dicedand ku bingeha xwe ya civakî li nevçeyên Kurdan xurt bike. Lê wan gelek hindik tişt kir bona hinekî pakkirina rewşa bineciyên welêt ên kurd ên ku wek berê zêrandina millî û civakî li ser xwe texmîn dikir.

Tevî şûndamayîna navçeyên Kurdan a civakî-aborî, li Kurdistana Tirkiyê saxîxwedîkirin û ronayîdarî jî gelek paş da ketibûn. Ewha, rojnama Hürriyet di destpêka tebaxa 1987 da nivîsî ku li wan navçeyên ku tê da weke 85% bineciyan Kurd bûn, li 105

wargên jiyînê hîç bijîşk (doktor) tu nebûn, lê li ciyên mayîn jî bijîşkek tenê xizmeta 30.000 mirov dikir. Li Diyarbekirê, 35 ciyên wan gotî "merkezên saxiyê" ji ruyê tunebûna doktoran hatibûn girtin. Tenê li vî bajarî 26.000 zarok ji ruyê têrênekirina dibistanan nikaribû hîn bibana **(221, 1986, Nº 50, r. 6)**.

Pelixandinên dîwana Tirkiyê, ku dû hukmê eskerî yê sala 1980 gumrehtir bûbûn, rast e, darbeke mezin gihand tevgera Kurdan, lê wan nikaribû karkirina partiyên Kurdan li welêt bidin sekinandin.

Komên Tirkiyê yên serkarîkir weşana wan, bona efûkirina kar û barên xwe yên hov di hindava bineciyên Kurd da dicedand ku tevgera Kurdan rûreş bikin û ew di çend derecan da gunehkar dikirin. Gunehê herî mezin, bi baweriya wan, ew bû ku Kurdan dixwest Tirkiyê perçe bikin û li welêt rejîma komunîst bidin testîq kirin. Lê hukûmeta Tirkiyê ne tenê propaganda dijî Kurdan dikir. Wê, wan salên dawîn, kirinên eskerî dijî Kurdan dabûn gumreh kirin. Paresker, hêzên bêqeziyabûnê (muxaberat), desteyên komando, "paraskerên gundan" ên kirêkirî tevî wan kirinan dibûn û propaganda dijî şerkariya Kurdan a millî-azadariyê derdixist. Hêzên Tirkiyê yên çekdar bi kirinên xwe yên eskerî va dixwest ne tenê şerkariya Kurdan, lê usa jî ya hemû hêzên welêt ên çep ku li Anatolya Rohilatê û Başûrê Rohilatê kar dikir bihincirînin, ji ortê rakin. Di nava agahdariyên karmendên Tirkiyê yên dewletê da, di nava şirovekirinên weşanê yên di derheqa kirinên eskerî li navçeyên Kurdan da herdem "têrorîst" bîr dianîn, di derheqa "qeziya perçekirina welêt", rêxistinên "komunîst" û "marksîst" ên têrorîzmê, ku xwedê giravî pişta Kurdan digirt, da dinivîsî. Ajansa Anatolyê bawer bike herdem agahdarî di derheqa hişkbûna rewşa li navçeyên Tirkiyê yên başûrê rohilatê da didan. Ji tebaxa sala 1984, li wira pevçûnên çekdarî di navbera eskerên Tirkan û "pareskerên gundan" da û desteyên pêşmergeyên Kurdan, ku piraniya wan ji PKK bûn û ku, bi gotina dîwanê, êrîş dikir gundan û qereqolan,

binecî wek dîl digirtin û karên têrorîzmê dikirin, dewam dikir. Bi salixên rojnamên Tirkiyê, bawer bike, di nava sê salan da (ji tebaxa 1984 hetanî gulana 1987) di nava şerrê çekdarî da 149 eskerên Tirkan, 222 "paraskerên gundan" û bineciyên am û tam û weke 270 pêşmerge şehîd bûn **(182, 11.5.1987)**.

Komên Tirkiyê yên serokatîkir, tevî karên şerr, ferzendên admînîstratîf ên polîsî, yên ku bi baweriya wan diviyan alîkariya hincirandina şerkariya Kurdan a millî-azadarî bikin, jî bi kar dianîn.

Di nava wî karî da, wan dicedand ku dijîtiya di nava serokên şerkariya Kurdan a azadariyê da, dubendiya di navbera wan da, şûndamayîn û nezaniya Kurdan bi kar bînin. Ewha, di 4 nîsan 1985 da, 2 zêdekirin xistin nava zagona di derheqa gundan, ku li gora wan "pareskerên gundan" hatin saz kirin, da. Ew "pareskerên gundan" divê bi resmî bineciyên gund ji her awayê êrîşkirinê li ser wan û hebûna wan biparêzin **(339-a, 17-23. III. 1986)**. Hukûmetê çek da wan û ji bo her karekî bi dilê wan ji wan ra pêşkêşên bi pere nîşan dan. Lê zûtirekê, wan "paresker"ên nuh derketî bi behana diyarkirina "têrorîstan" dest pê kir êrîşî gundiyan û zor li wan bikin. Ev yek hem ne bi dilê gundiyan bû, hem jî derebegên gundan dijî vê yekê sekinîn.

Ewha, serekeşîrê Adiyan, Durmaz Axa (Bilen), ku li wilayeta Siirtê dima, di sibata 1986 da bi rêberiya gelek mirovên xwe hat Ankarê û bi şikayetkirin berê xwe da dîwanê û got ku "pareskerên gundan" çi ecêbên giran tînin serê wan **(339-a, 17-23. III. 1986)** û hêvî kir ku gundiyan ji wan biparêzin.

Di sibata 1986 da, hukûmeta Tirkiyê di derhqa cîguhastina bineciyên 11 gundan, ên ku li ser sînorê Iraq-Îranê, nêzîkî navçeyên Anatolyayê yên merkezî dijîn, biryar qebûl kir **(231, 11.2.1986)**. Ev biryar bona şerkariya tevî wan "têrorîst"ên ku ji derve hatine hate qebûl kirin. Di wê navçeya azakirî da, wan dixwest ku pareskerên ordiya Tirkiyê cîwar bikin.

Hukûmeta Tirkiyê karên dijî Kurdan ên mayîn jî

qebûl kirin. Ewha, bi salixên weşana Tirkiyê dû wergerandina eskerî ya 1980, li Anatolya Başûrê Rohilatê navên 80% gundan dan guherandin **(216, 25.6.1986)**. Navên kurdî kirin tirkî : 376 gundên Kurdan (ji 558) li wilayeta Agirîyê, 426 li wilayeta Wanê, 289 (ji 363) li wilayeta Mûşê, 229 (ji 273) li wilayeta Bitlîsê. Ev hemû bi behana "bêxofkirina dilrehetiyê û bêqeziyabûnê" hat kirin **(226-a, 1986, N° 17, r. 7)**.

Di destpêka nîsana 1986 da, weşana Tirkiyê îlan kir ku hukûmetê dest pê kiriye çend gund bigihîne hev û bike gundên wan gotî "merkezî". Niyet hebû ku wan mecalan ji wilayetên Siirt, Tunceli û yên mayîn dest pê bikin. Bi baweriya hukûmetê, ew mecal ewê alîkariya pakkirina rewşa bineciyan a civakî-aborî bike, usa jî ewê bibe delîlek bona bi serketin dijî "têrorîstan" şerkariyê bike **(216, 3.4.1986)**. Bona şerkariya bi "têrorîzmê" ra, bi gotina serekê serwêrtiya bêqeziyabûnê ya tewrebilind, Saffet Arikan Bedin, di sala 1986 da dîwana Tirkiyê 2,5 milyar lîra bona sazkirina pareskerên xusûsî ku gotî ji zabitên berê ewê bihatana teşkîl kirin cihê kirin. Ew pareskerên xusûsî dixwest pey hilanîna halê eskerî li wê navçeyê li Anatolya Başûrê Rohilatê bide cîwar kirin **(216, 18.6.1986)**.

Rewş li navçeyên Kurdan ewqas hişk û bi qeziya bû ku pirsa Kurdan, ku hetanî vê dawiyê jî têma qedexekirî dihate hesibandin, dest pê kir bere-bere bê enene kirin û ket nava rûpelên weşana Tirkiyê jî. "Qewimandinên li başûrê rohilatê - şiroveçiyê rojnama Cumhuriyet, Uğur Mumcu, di sala 1987 da nivîsî - çiqas diçû ewqas bi hewarze dibûn. Îro êdî ew bûye şerrê bêhempa" **(180, 9.7.1987)**.

Di derheqa zêrandina Kurdan li Tirkiyê da, weşana Roavayê gelek dinivîsî. Ewha, wek ku rojnama Amerîkayê "Washington Post" nivîsiye, dengbêjê êstradê, Ibrahim Tatlıses, tenê bona dayîna konsereke bi kurdî hatiye girtin **(180, 9.7.1987)**.

Havîna 1986, bi gotina rojnama rast "Tercuman", dadxwazîgeha Ankarê Partiya Sosyal- Dêmokrat a

Institut kurde de Paris

Gel da mehkemê ji ber ku li komiteya wê ya navendî xwedê giravî bi kurdî dipeyivîn (226-a, 1986, № 17, r. 4).

Tevî vê yekê, di tîrmeha 1987 da, bi biryara mehkema Stembolê hejmara kovara tirkiyê "Yeni gündem" hat qedexe kirin, bona gotara "Pirsa Kurdan pirsa rojane ye", ku tê da hatiye tecrube kirin ku karên pêşmergên Kurdan bê tehlîl bikin. Wek ku ajansa Anatolyê di 23 îlon 1987 da îlan kiriye, bi biryara mehkemê hemû hejmarên kovara hefteyî "Ikibine doğru" hatin berhev kirin, ji bo ku di gotareke wê da gotinên Kemal Atatürk ku otonomiyê bide Kurdan hebûn. Mehkemê ew gotar pîs û bi fikrê ku "hissên welatparêziyê tev radike" hesab kir.

Divê ku bê xuya kirin ku gotinên jiberxwederxistî, "şerkarî dijî têrorîstan", ji aliyê dîwana Tirkiyê dihatin bi kar anîn, bona yekkirina hêzên rast û rêaksyonêr, ji bo ku êrîşkirinên xwe yên dijî dewlet û gelên din ên cîran bidin efû kirin û dijî şerkariya Kurdan a millî-azadarî derkevin. Qalmeqalma li dora têrorîzmê bûbû destmala ser destan, ku pê hukûmetê dixwest fikrê bineciyên Tirkiyê tev li hev bike, bona guhdariya xebatkaran ji dijwarî û pirsên civakî bide dûr xistin, ji bo hişkbûna siyaseta ku li welêt heye bide sist kirin.

Halê eskerî li wilayetên Diyarbekir, Siirt, Mêrdîn û Hekkariyê weke 9 salan kişand. Di 19 tîrmeh 1987 da, halê eskerî hat hilanîn. Dewsa wê, halê qaydeder hat îlan kirin. Hukûmetê biryar qebûl kir ku hêza wê ya zagonî hebû ku pê Waliyê navçeya halê sirêder saz bike. 8 wilayet diketin nava wê navçeyê: Diyarbekir, Siirt, Mardin û Hakkarî, usa jî Tuncelî, Bingol, Wan û Elazığ. Waliyê wê navçeyê hemû izn-destûrên ku bi zagona di derheqa halê qeydeder û bi miqala destûrê ya 121an dihatin dîtin bi kar dianîn. Lê di destê walî da mafên mayîn ên firehtir jî hebûn : Ew maf ev bûn :

1) Ew dikare wan destçêxanan, xanî-avayiyan, transportê û xebatkarên rêxistinên mexlûqetiyê ku li ser erdê navçeyê ne bike bin qolê xwe.



Institut kurde de Paris

2) Organên bêqeziyabûnê (MIT) yên navçeyê bike bin bandûra xwe.

3) Ji wan hêzên çekdar ku li navçeyê ne alîkarî bixwaze.

4) Wan hemû kesan, bilî cendirmên eskerî, hakim û dadxwazan, ji kar derxe an jî wan cîguhastî ser karekî mayîn bike.

5) Çend gundan û erdê wan bigihîne hev û bike navçeyek.

6) Hêzên di bin destê xwe da mecbûr bike ku, eger pêwist be, li wilayetên cîran tevî pevçûyînan bibe.

7) Meaşê karmendên di bin destê xwe da hetanî 10-25% bilind bike.

8) Li ser her xebaterekî xwe agahdariyan berhev bike, bona bizanibe ku ew bi rastî kî ye û gelo karê xwe rind dike an na, û ji bo tiştên mayîn bizanibe **(196, 1987, N° 100, r. 10)**.

Bi vî awayî, waliyê navçeya halê eskerî li wan wilayetên li jor nîşandayî temamiya dîwanê xistibû destê xwe, gelek wekîldariyên wî hebûn bona ku karibe şerkariya karkeran bihincirîne, dijî tevgera Kurdan a millî-azadarî derkeve. Hukûmeta Tirkiyê ku ew biryara ku hêza wê ya zagonî heye qebûl kir, dicedand ku rewşeke qanûnî bide polîtîka xwe ya şovînîst a di hindava Kurdan da. Divê bê xuya kirin ku ew cara pêşîn nîn bû ku li Tirkiyê dîwana usa ya kolonî dihat testîq kirin. Di sala 1927 da, teftîşa usa sereke hebû ku di destê wê da gelek kes hebûn û ku dikaribû ecêbên giran bîne serê wilayetên welêt ên Kurdan. Ev organa pelixandinê ya admînîstratîf hetanî nîvê salên 30 ya duda dom kir.

Tirkiyê her ferzend bi kar dianî bona dijî karkirina Kurdên welatên derve jî derkeve. Wê ji Iraq, Îran û Sûriyê ra pêşniyar kir ku destûr bidin eskerên Tirkan ku ji sînorên wan derbas bibin bona ku malên wan ên li ser tixûb hilweşînin û talan bikin. Serokatiya Îran û Sûriyê ew pêşniyar qebûl ne kir.



...KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

Lê di nava van salên dawîn da, di navbera Tirkiye û Iraqê da hevraqayilbûn hat dest anîn, û pê eskerên Tirkiyê yên çekdar destûr stend ku bi hewa û bi rê, li ser axa Iraqê, li dû Kurdan bigerin, lê ji sînor 10-15 kilometre bêtir neçin. Karên usa çend caran hatin pêk anîn û wê demê eskerên tirk ji sînorê Iraqê derbas dibûn û wargên Kurdan ên jiyînê dişewitandin û hildiweşandin.

Anegorî weşana welatên derve, 30.000 eskerên tirk herdem li ser tixûbê Iraqê bûn û amade bûn ku bona wê yekê derbasî axa Iraqê bibin, ji bo ku bihêlin ku nefta ku ji Mûsilê dihat şandin bê problêm bigihîje Tirkiyê, bona ku paşê jî wê derxîne Deryaya Spî. Hukûmeta Tirkiyê bona wê riya tranzîtê distîne, ji ber ku ew xetlûla neftê bi axa Tirkiyê ra jî derbas dibe.

Di destpêka meha nîsanê 1986 da, nûnerên dîwana Tirkiyê yên li ser dereca waliyan çûn Duhokê (Iraq) û li wira hevpeyvîn hatin derbas kirin. Armanca wan ew bû ku tevgerên xwe bikin yek, bona hinciranddina tevgera Kurdan li her du welatan **(216, 4.4.1986)**.

Di nîveka tebaxa 1986 da, balafirên Tirkiyê yên "Fantom" ketin erdê Iraqê û gelek wargehên Kurdan ên jiyînê dan ber bomban û ew bi xweliyê ra rast-dûz kirin. Dema wê bombekirinê, bi sedan jin û zaro hatin kuştin.

Demeke şûn da jî desteyên komando jî bi rêberiya tîkfiran êrîş kir. Hukûmeta Tirkiyê ev êrîşkirin wek ên berê (gulana 1983 û oktobra 1984) bi hukûmeta Iraqê dabû razî kirin - qayil kirin **(226, 1986, Nº 17, r. 1)**.

Divê bê xuya kirin ku komên Tirkiyê yên serkarîkir kirinên han bêy cezayê Meclisê pêk dianîn, lê tenê bi izndayîna hukûmetê dikirin. Bi wê yekê va ew dijî destûra xwe derdiketin **(226, 1986, Nº 17, r. 1)**.

Ev kirinên dîwana Tirkiyê li welatên derve, di erafê navneteweyî da berk hatin rexne kirin. Ewha, serokê şoreşa Lîbyayê, M. Qeddafî, ku di radyo da peyivî, got ku ew dijî wê êrîşê ye û ku hemû gelên cihanê wî karî gunehkar dikin. Di dûmayîkê

Institut kurde de Paris

da wî got : "Kurd ew milletekî ku divê qedrê wî bigrin û divê daxwaziya wî bona serbestî û yekîtiyê wek tişteki normal bê hesibandin" (226-a, 1986, № 17, r. 4).

Di sibata 1986 da, li Jenêv, li civîna ku pêşkêşî 42 saliya damezrandina komisyona mafên mirov a Koma Milletan kiribû, miqaleke ku di derheqa maf û azayiyên gelan da Yekîtiya Navneteweyî amade kiribû hat xwendin. Tê da dihat gotin : "Hukûmeta Tirkiyê ji destpêkê da polîtîka rasîzmê derbas dike ... Ew mafên Kurdan ji bo jiyînê, ji bo parastina çand û urf-adetên xwe, ji bo mafê peyvê bi zimanê xwe yê dê nas nake". Di nava miqaleke mayîn da, ku bi navê Navenda Ewropayê ya "Cihana Sisiyan" bû, hat gotin : "Ji roja îlankirina Dêklarasyona Koma Milletan 40 sal derbas bûn, lê dîsa jî hukûmeta Tirkiyê bi resmî heyetiya ji 12 milyon bêtir Kurdên ku li Tirkiyê dijîn inkar dike ... Di jiyana rojane da qedexe kiriye ku Kurd bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Texsîrkirina mafê gelê kurd ku bi xwe bextê xwe biryar bike darbeke xedar e bona aşîtî û bêqeziyabûna li navçeyê" (226, 1986, № 17, r. 7).

Di dawiya meha adarê û destpêka nîsanê 1986 da, parlementerê sosyalîst ê ji Belçîka, Jef Ulburgs, li Parlementa Ewropayê bi projeya di derheqa pirsa Kurdan da pêş da hat û tê da nîşan da ku Tirkiyê Kurdistan kiriye kolonî, û de'w kir ku ewê pirsê bigihîne Koma Milletan. Parlementer Ulburgs di nava projeya bi sernivîsara "Rewşa gelê kurd li Bakurê Roavaya Kurdistanê" da de'w kir ku Parlementa Ewropayê belgeyan di derheqa pirsa Kurdan da hazir bike, komisyonekê saz bike bona lênihêrandina rewşa girtiyan li hebsên ku tê da êşkence û ecêbneneran dikin, û pêşniyar kir ku hemû mecalên polîtîk bi kar bînin bona bi lez sekinandina zêrandin û lêdanê ku di hindava gelê kurd da tên miaser kirin, û de'w kir ku hemû endamên Parlementa Ewropayê ber bi Koma Milletan bibin bona lênihêrandina pirsa Kurdan (216, 4.4.1986).

Di sibata sala 1987 da, parlementerê beljîkî yê

Parlementa Ewropayê, Jacques Vandemeulebroecke, belge raberî komisyona polîtîk kir û tê da siyaseta komên Tirkiyê yên serkarîkir di hindava milletên biçûk da berk rexne kir. Vê yekê li Tirkiyê nerazîbûneke mezin pêş da anî. Ewha, nûnerên partiyên Tirkiyê yên burjuwa, yên zanîngehan, organên huqûqê, sendîka û rêxistinên mayîn nameke protêstoyê ji endamên Parlementa Ewropayê ra şand û tê da de'w kir ku li belgeya Vandemeulebroucke binihêrin. Wê nameyê J. Vandemeulebroucke bi piştgiriya têrorîstên ermenî û kurd, ku armanca wan ew e ku perçeya NATO ya başûrê rohilatê perçe bikin, gunehkar dikir, û usa jî wê ew bi sûc kir ku ew di belgeya li jor gotî da xwedê giravî piştgiriya Yekîtiya Sovyêtî, ku giva pişta têrorîstan digire, dike **(225-a, 20.11.1987)**. Nûnerê hukûmetê, wezîrê dewletê yê Tirkiyê, Hasan Cemal Güzel, îlan kir : "Em berk dijî her awayê gotinên ku dibêjin ku Tirk milletên biçûk dizêrînin. Ne di Tirkiya nuha da, ne jî berê, tu cihêtî tu nebû û tu neye jî" **(225-a, 21.11.1987)**.

Lê dîsa jî di hezîrana 1987 da, Parlementa Ewropayê li Strasburgê pirsa Ermeniyan û Kurdan enene kir û hat li ser wê baweriyê ku li Tirkiyê pirsa Kurdan, ku divê bi lez bê safî kirin, heye. Parlementa Ewropayê biryar kir ku "nexwestina hukûmeta Tirkiyê ku nijadkujiya Ermeniyan, ku Cuhanên Tirk di salên şerrê hemcihaniyê yên pêşîn da anî serê wan, nas bike û nexwestina wê ku di nava nerazîbûnên xwe yên bi Yûnanistanê ra li gora normên mafên navneteweyî bi kar bîne, ji aliyê wê da zevtkirina Qibrisê, bendî tiştekî hesabkirina pirsa Kurdan, ev hemû tişt nîşan didin ku li Tirkiyê dêmokrasiya parlementerî tu neye û ku ew qedrê azadiya gelan nagire. Loma jî ew dij e ku Tirkiye bikeve nava Hevalbendiya Ewropayê" **(245-a, 1987, r. 2)**.

Pey wê yekê ra, gava Parlementa Ewropayê ev biryar qebûl kir, komên Tirkiyê yên serkarîkir dest pê kir bi gef-gurr propaganda dijî Ewropayê, dijî Ermeniyan û Kurdan tev rake. Akta qebûlkirina wê

biryarê wek "xayintiya" Ewropayê hat qîmet kirin û wek "nazîsm" hat hesab kirin. Serok Kenan Evren tirs da fîrandin ku ewê careke din li pirsa tevgeliya Tirkiyê di nava NATO da careke din binêre. Wî îlan kir ku li pirsa Ermeniyan û Kurdan a ji ber xwe derxistî her sal li Koma Milletan û rêxistnên navneteweyî yên mayîn tê nihêrîn, tenê bona armanca ku Tirkiyê ji Ewropayê izole bikin. "Ev de'wekarî ji Yûnanistan û hevalbendên wê yên mayîn pêş da tê - Kenan Evren dide xuya kirin - bira ittifaqdarên me rind zanibin ku bi jimara xwe va ordiya Tirkiyê pey Amerîkayê ra ciyê dudan digire û sînorên wê bi Yekîtiya Sovyêtî ra hene; di hêlekê da jî ew sînordaşa Iraq, Îran, Sûriye û Bulgaristanê ye" **(209, 24.6.1987)**. Bi baweriya serok, biryarên Parlementa Ewropayê tenê pêşmergên Kurdan didin ruha kirin.

Hevpeyvîna serekwezîr Turgut Özal di rojnama Hürriyetê da berktir û pîstir bû. "Ew kesên ku ew biryar qebûl kirine - serekê hukûmeta Tirkiyê digot - piştgiriya qaçaxên beradayî dikin, dîrokê şaş fehm dikin. Ew karên bêfeyde ne. Komunîst, sosyalîst, parlementerên Yûnan û Fransayê li ber dîrokê gunehkar in" **(209, 23.6.1987)**.

Weşana Tirkiyê ya burjuwa tebiya hukûmeta xwe bi awakî aktîf xwedî kir û parast. Weşanê ew tebî wek "tirsonekiya Parlementa Ewropayê li ber têrosîstan" bi nav kir, lê qebûlkirina biryarê wek "gunehkariya ji nazîsmê xerabtir" hat qîmet kirin **(231, 21.6.1987)**.

Di oktobra 1986 da, weşana Ewropa Roava dîsa di derheqa Tirkiyê, ku dicedand Kerkûkê zevt bike, da nivîsî. Ev yek li Tirkiyê ne dihat veşartin. Ewha, Profêsor Aydın Yalçın nivîsî : "Bona Tirkiyê Kerkûk bi qasî Qibris giring e". Zanayekî tirk ê mayîn, Coşkun Kirdce, nivîsî : "Kerkûk axa Tirkiyê ye. Tirkiye ewê izn nede ku ew ax bikeve bin destê wan pêşmergên ku alîkariya Îranê dikin". Pey ra, ew di rojnama Hürriyetê da gotina xwe berdewam kir : "Tirkiye ewê nehêle ku statukwo bê teribandin û dernanîna destçêxane û kaniyên neftê li navçeyê

Institut kurde de Paris

bên sekinandin" (bînihêre 196, 1989, N° 91, r. 1). Di sibata 1987 da, hukûmeta Tirkiyê hîm li ser miqal 1 a zagon N° 3310 bû û anegorî peymana Iraq-Tirkiyê di sala 1984 da biryar di derheqa pêkanîna aksyonan li welatên derve qebûl kir (245-a, 1987, N° 25, r. 56).

Di destpêka meha adarê (wê salê) da, firindên Tirkiyê careke mayîn kampên pêşmergên Kurdan li ser axa Iraqê dane ber bomban. 30 balafir tevî wê êrîşkirinê bûn.

Tevî vê yekê, komên Tirkiyê yên serkarîkir dicedand ku zorê li Sûriyê, ku bi baweriya wan piştgiriya "têrorîstên" Kurdan dikir, destûr dida ku li bal wê kampên xwe çêkin û jê derbasî axa Tirlkiyê bibin, bikin. Ewha, serekwezîr T. Özal, ku di wê semînera ku rêxistina Partiya Wetenîyê li Stembolê dabû teşkîl kirin da peyivî, got : "Niyeta me tune ku em xerabiyê bikin. Eger em du meh û nîv bidin bendê bidin ber çem (çemê Feratê – M.H.), gelek ewê av nestînin, lê ewê bibe delîlek ku neyar ewê hişê xwe berevî serê xwe bikin" (209, 2.4.1986). Bi gilîkî mayîn, wek ku nûçegihanê rojnama Hürriyetê xuya kir, ew tê vê manê : "Sûriye hişê xwe berevî serê xwe bike, karên usa bike ku hinkûfî prensîpên cîrantiyê qenc in: eger na, tuê ji çemê Feratê tu çilke av jî nestînî" (209, 2.4.1986).

Di tebaxa 1987 da, T. Özal bi seredan çû Şamê. Ev seredan pey serbestiya Sûriyê seredana resmî ya yekemîn bû. Wek hat îlan kirin, pey hevpeyvînan, protokolên di derheqa bêqeziyabûnê û hevkarkirina aborî da hatin qol kirin. Tê da pirsên bêxofkirina dilrehetiyê li ser sînoran, xebitandina kaniyên çemên Ferat û Diclê ku ji Tirkiyê dikişin û kemala wan a mezin bona aboriya ne tenê Tirkiyê, lê usa jî Sûriye û Iraqê, hatin enene kirin (182, 20.7.1987). Wek ku xuya ye, Ankara ku kemala wan çeman nîşan dida, ku bona Sûriyê gelek giring in, bi wê yekê zor li wê dikir ku ew polîtîka xwe ya di hindava Kurdan da bide hişk kirin.

Ev hemû tişt şehadeta wê yekê didin ku wek berê kemala Kurdistanê di nava polîtîka hukûmeta

Institut kurde de Paris

Tirkiyê ya hundir û derve da ewê li ser meydanê be. Rejîma Tirkiyê bi behana qeziya ji aliyê veqetînxwazan û komunîzmê ewê kûrsa hincirandina şerkariya Kurdan bide derbas kirin û ewê hêzên xwe bigihîne rejîmên navçeyê yên rêaksyonêr û empêryalîzma Amerîkayê.

Eger li rastiyê bikeve, Tirkiyê isbat kir ku ew dikare bibe cendirma navçeyî û loma jî pey Israîl re di hêla dostaniya bi polîtîka tevî Amerîkayê li Rohilata Nêzîk da ciyê duda digre. Di destpêka 1987 da, li Tirkiyê 7.000 eskerên Amerîkayê hebûn. Di 1983 da, DYA alîkariya eskerî ya bi buhayê 400 milyon dolar, lê di sala 1984 da, 755 milyon dolar, di 1985 da jî weke 900 milyon dolar da Tirkiyê. Ne tenê DYA alîkariya çek-cebirxanan dida Tirkiyê, lê usa jî welatên mayîn ku endamên NATO ne. Ewha, Almanya Fêdêral tîkfirên ku dihatin bi kar anîn dane Tirkiyê, bona şerkariya dijî pêşmergên kurd. DYA, Almanya Fêdêral û çend welatên Roavayê yên mayîn alîkariya wê dikir bona ku Kurdistana Tirkiyê bikin darinde ji bo karên hundirî yên Îran, Iraq û Sûriyê bibin, ji bo ku tesîra xwe li ser polîtîka wan a welatên hundir bihêlin, bona serhildan û tevgerên gelên Rohilata Nêzîk û Navîn ên millîazadariyê bihincirînin, bona karên dijî Yekîtiya Sovyêt bikin.

Di Adara 1987 da, peymana Amerîka-Tirkiyê ya di derheqa hevkarkirinê di dereca eskerî û aborî da hetanî sala 1990 hat dirêj kirin. Anegorî wê peymanê, DYA dewsa wê alîkariya eskerî û aborî ku dida Tirkiyê, ferzend distend ku li ser erdê wê weke 60 bingehên eskerî xwedî bike. Di wê jimarê da hêwirgehên êlêktronîk ên casûsiyê ku berê wan daye Yekîtiya Soyêtî hebûn. Piraniya wan bingehan li Kurdistana Tirkiyê ne. DYA bi alîkariya eskerî û aborî dicedand ku Tirkiye bi planên NATO va bide girêdan, ew wargeha stratêjîk a gelek giring bona meremên xwe yên agrêssîf bi kar bîne.

Di oktobra 1987 da, ji DYA çar êrîşkarên bombavêj ên F-16 ji Tirkiyê ra hatin gihîjtin. Wek ku ajansa Royter îlan kir, Tirkiye ew cebirxane di goveka

Institut kurde de Paris

programa nûjenkirina hêzên xwe yên eskerî da stendin.

Tevî vê yekê, anegorî peymana Tirkiye-Amerîkayê, ku li ser deh salan hatibû qol kirin, DYA ewê di hêla berhevkirin û bikaranîna 160 F-16 da alîkariya Tirkiyê bikira **(182, 23.9.1987)**.

Bi vî awayî, DYA tabiyên xwe li Tirkiyê da xurt kirin û huzûra xwe ya li ser erdê vî welatî da mehkeme kirin. Di wî karî da, ew herdem "di derheqa qeziya Sovyêtî da" dikir bîra Tirkiyê û bi wê yekê va dixwest Ankarê kîp bi bloka NATO ra bide girêdan û ew berde nava şerletaniyên li navçeyên Rohilata Nêzîk û Navîn.

Polîtîka dîwana wan welatan a dîskrîmînasyonê, ku Kurdistan di nava xwe da perçe kir, şertên herdemî li ser axa ku Kurd lê dimînin gelek Kurd mecbûr kirin ku dev ji welatê xwe berdin û berê xwe bidin welatên Ewropa Roava û DYA.

Li Ewropa Roava gelek Kurd hene ku ji Îran, Iraq, Tirkiye û Sûriyê mihacir bûne. Piraniya wan, 350.000 (ji 600.000) li ser axa Almaniyayê dijîn. Li vî welatî, ew bi jimara bineclyên xwe va di nava mihacirên gelên biyanî da ciyê çara digrin. Para Kurdan a mayîn li welatên Ewropa Roavayê yên mayîn dijî. Bawer bike ku nîvê wan Kurdên ku li Ewropa Roava dijîn ji Tirkiyê ne.

Divê bê nîşan dan ku salên 80 merhela xurtbûna Kurdên Tirkiyê dihat texmîn kirin, çi ku dibû delîl bona bêtir pêşketina xwefehmdariya wan a millî. Rast e, gelek rêxistinên Kurdan ên welatên Ewropa Roava îlan dikir ku bi tu partiyeke siyasî va girêdayî nîn in, lê ya rast ew e ku hemû rêxistinên Kurdan li welatên derve sempatizanên filan an jî bêvan partiyên Kurdan in û wan partiyan jî kadroyên xwe ji wan rêxistinan û komelan hildidan.

Wek ku xuya ye, polîtîzekirina Kurdên Tirkiyê yên li welatên Ewropayê ewê li vira berdewam be û bîr-baweriyên wan ên siyasî ewê bi wê yekê va girêdayî bin, çika du partiyên Kurdan ên siyasî yên hîmlî û sereke, PPKK û PSKT şerrê di navbera xwe

Institut Kurde de Paris

da çawa hel bikin, û çika hêzên Tirkiyê yên çepê tesîra xwe çawa li ser wan dihêlin.

Siyaseta dewletên Ewropayê û partiyên siyasî yên Sosintêrnê jî, ku dixwazin faktora kurdî bona armancên xwe bi kar bînin, tesîra xwe li ser wê merhelê dihêlin. Loma jî ew komên çend welatên Ewropa Roavayê yên serkarîkir, ku tesîra partiyên Sosîntêrnê li ser wan pirr e, bi dil-can Kurdên mihacir li bal xwe qebûl dikin û ew ferzendê distînin ku bi polîtîkayê va mijûl bibin, komelên xwe damezrînin, buroyên partiyên xwe vekin, rojname, kovar, pirtûk û weşanên mayîn bi zimanê kurdî û bi zimanên din ên wan welatên ku jê hatine, ango bi erebî, tirkî û farisî, çap bikin.

Li Fransa, Almanya, Belçîka, DYA û welatên mayîn, komele û enstituyên Kurdan, ên ku çanda xwe raberî cihanê dikin, hene. Ji bo nimûnê, li Enstituya Kurdî li Parîsê kûrsên zimanê kurdî, hem bona zarokan û hem jî bona mezinan, tên derbas kirin.

Lê Kurd, ku dikevin welatên Ewropa Roava yên pêşketî, zordestiya bêhempa dibînin, xwe nizmkirî dihesibînin, kar peyda nakin. Loma jî bi hezaran Kurd bê kar dimînin.

Kurdên Tirkiyê yên welatên derve ji çend faktorên idêolojîk ên ku li Tirkiyê dibûn asêgeh li ser riya xwefehmdariya wan a millî aza dibin. Ango, ew li Ewropayê tesîra panturkîzmê û dînê islamê li ser xwe texmîn nakin. Tevî vê yekê, olkên Kurdan li welatên derve alîkariya mithîmbûna (stabilî) pêşdahatina burjuwaziya hûr ku nemaze dibin bingehvanên rêxistinên siyasî, mexlûqetî û çandî dikin. Karkirina wan bona wê yekê ye ku guhdariya xelkên Ewropa Roava û cihanê bidin ser pirsa Kurdan, nasiya wan bi çand û dîroka Kurd û Kurdistanê bidin.

Rewşa siyasî ya sext li Kurdistana Tirkiyê Kurdan mecbûr dike ku demeke dirêj li welatên derve bijîn. Li wira nisleta Kurdan a nuh pêş da tê. Çûyîna Kurdan bo welatên derve, tevgeliya wan bi tevrabûnên karkeran, di nava meşînên dijî şerr, ku bineciyên welatên Ewropa Roavayê didin teşkîl



Institut kurde de Paris

kirin da, alîkariya bilindbûna bîr-baweriyên wan a siyasî dike, ew di jiyanê da zîrektir û jêhatîtir dibin. Tevî vê yekê, dirêjmayîna Kurdan li welatên derve wan ji reng û rewşa millî dide birîn, ew kêm hay ji rewşa Kurdistanê hene. Ev hemû wan ber bi sosyal-dêmokrasiya Roavayê ku dixwaze pirsa Kurdan bona meremên xwe yên siyasî bi kar bîne dibin.

Di nîveka salên 80 ya duda da, li Tirkiyê, usa jî li welatên Ewropa Roava, weke 10 partî û komikên Kurdên Tirkiyê hebûn.

Pirbûna partî û komikên Kurdan dibû sebebê perçebûna di nava wan da. Ew dibû meniya pêşdahatina bîr-baweriyên siyasî yên cihê-cihê, ji êkstrêmîstên çepê yên girtî hetanî yên burjuwa-milletçî. Tevî vê yekê, divê bê xuya kirin ku di nava idêolojiya a tevgera Kurdan da pêşketineke usa, wek di nava wan da belavbûna dîtinên sosyalîst, kivş xuliqî. Vê demê, piraniya partiyên polîtîk ên Kurdên Tirkiyê ilmê Marksîzm-Lênînîzmê qebûl dikin û li ser wê bawerlyê ne ku bi serokatiya wê ew dikarin pirs û pirsdanînên xwe yên millî û civakî safî bikin. Helbet, ne hemû partiyên Kurdan ên siyasî bûn ku xwe bi wê riyê girt. Lê ew isbat xuya dide ku dîtinên sosyalîzma zanyarî, sloganên wê di nava şerkariya Kurdan a millî-azadariyê da, ciyê xwe yê esasî û giring girtibû.

Nimûneke idêolojiya şerkariya Kurdan a millî-azadariyê di merhela vê demê da ew riya wê ya dijî empêryalîzmê ku wê xwe pê girtibû û pê dimeşiya bû. Bawer bike hemû partiyên Kurdan ên siyasî xwe bi tebiyên dijî empêryalîzmê digirin, dijî desîse û destdirêjayiyên empêryalîzm û siyonîzmê li Rohilata Nêzîk û Navîn pêş da tên, usa jî piştgiriya înîsyatîvên Yekîtiya Sovyêtî û dewletên hevlabendiya sosyalîzmê yên aşîtiyê yên mayîn ku di erafê navneteweyî da bi nav û deng in dikin.

Tevî vê yekê, divê bê nîşan dan ku di nava idêolojiya serhildanên Kurdan a azadariyê da mêlgirtinên ber bi çepê tên texmîn kirin, û rast e, partî û komikên

Kurdan ên cihê cihê di nava bernamên xwe da sempatiya xwe ya di hindava Marksîzm-Lênînîzmê da diyar dikin, lê bi rastî ew ji wê riyê gelek dûr bûne. Hela bi ser da, hinek ji wan ew pirsdanînan jî, ku li ber şerkariya milletên Rohilata Nêzîk û Navîn û li ber şerkariya Kurdan a millî-azadariyê li Kurdistana Tirkiyê û perçên Kurdistanê yên mayîn sekinîne, rind derc nakin.

Gava em di derheqa xeysetên tevgera Kurdan a li Tirkiyê dipeyivin, divê bidin nîşan dan ku perspektîva wê heye û rola wê ewê gelek bilind bibe. Optîmîzma wê qîmetkirinê bi van faktoran va tê şirove kirin :

1) bineciyên kurd hem li Tirkiyê, hem jî li welatên derve kompakt (pirr) dijîn. Ev yek alîkariya parastina urf-adetên millî û pêşdaçûyîna şerkariya wan a azadariyê dike.

2) dînamîzma jimara Kurdan nîşan dide, nenihêrî ku di hindava wan polîtîkayên helandin, cîşihitandin û pelixandinê da karên eskerî û yên mayîn bi kar tînin, dîsa jî jimara bineciyên Kurdan herdem zêde dibe.

3) rast e, di merhela nuha da çend partî û rêxistin serokatî li tevgera Kurdên Tirkiyê dikin, û divê di van şertan da şerrê hevgirtî tu nebûya, lê pirbûna partiyên Kurdan û rêxistinên wan şehadeta bilindbûna aktîfbûna Kurdan a siyasî ye. Ew dibe delîl ku hîn gelek Kurd hazir in ku tevî şerkariya xwe ya bona mafên millî-dêmokratîk bibin.

Ceribandina şerkariya Kurdan a millî-azadariyê li Tirkiyê bingeh dide me ku em bên ser wê bîr-baweriyê ku ew şerkarî, nenihêrî pelixandinên hov ku ji aliyê rejîma Tirkiyê ya serkarîkir tên pêk anîn, ewê dîsa berdewam bikin. Dû ra, divê ku em wê isbat hildin ser hesêb ku şerkariya Kurdan li Iraq, Îran û Sûriyê jî Kurdên Tirkiyê gelek ruhdar dike. Ev hemû izn didin ku em bên ser wê baweriyê ku faktora Kurdan a millî, ku ya herdemî ye û nasekine, ewê li vira jî tesîra xwe, ne tenê li ser wan welatên ku Kurd tê da dijîn, lê usa jî ewê hukmê wê li ser temamiya Rohilata Nêzîk û Navîn pirr bihêle.

Di nava dema herî nuha da, komên Tirkiyê yên serokatîkir polîtîka kêmkirina mafên Kurdan dida derbas kirin û ew wek milletekî cihê hesab ne dikir, Kurd dizêrandin û zordestî li wan dikir.

"Ew siyaset - wek ku sosyologê tirk ê bi nav û deng Ismail Beşikçi bi heq nîşan daye - gelek caran warguhêzî siyaseta rasîzm û panturkîzmê dibû" (121, r. 480). Anegorî wê siyasetê, dîwanê herdem xwe xapandiye gava ku gotiye : "Kurd tu nene, tenê Tirk hene" (116, r. 313).

Lê polîtîka usa nikaribû wê pirsa giring safî bike, ji ber ku wek berê sebebên objêktîf ku dibûn behana pêşdahatina serhildanên Kurdan ên azadariyê hebûn. Lê ew tevger û têkoşîn li rohilata welêt her car hatine hincirandin. "Lê Rohilat herdem wek birîna vekirî dima", Ş. S. Aydemir nivîsiye (116, r. 313).

Tehlîla tevgera Kurdan a azadariyê nîşan daye ku bingeha bineciyên Kurdistana Tirkiyê hebû ku ew ji rewşa xwe ne razî bin. Bona serhildanên Kurdan ên salên 20 û 30, yên sedsala XXmîn, gelek tiştên tomerî hebûn, wek : temamiya millet radibû şerkariyê, ji ber ku gişk jî zêrandina millî, ku çawa burjuwazî û burokrasiya Tirkiyê hukm li ser wan dikir, li ser xwe dîtibû. Xwezma gundiyên Kurdistanê bi awakî aktîf tevî serhildanan dibûn. Ango, hêza têkoşîna Kurdan a azadariyê ya bingehî ew gundiyên xwelî-bêcerkir û heywanxwedîkir bûn.

Lê bi piranî derebegên Kurdan serokatî li tevgerên gel dikir - ew şêx, serekeşîr, bazirgan û burjuwaziya nuh pêşdahatî bûn. Lê idêolog, ruhdarkirên şerkariya millî- azadariyê rewşenbîrên Kurdan bûn : zabitên ordiya Tirkiyê, bijîşk, avukat, xwendekar û yên mayîn.

Şerkariya Kurdan çiqas pêş da diçû, ewqas pirr burjuwa û rewşenbîrên Kurdan ku bi navê temamiya

Kurdan pêş da dihatin û sloganên serbestiya Kurdistanê bilind dikirin tevî wê dibûn, çi ku bi baweriya wan ew diviyan temamiya gelê kurd bigihînin hev bona şerkariya dijî zordestiyê, ji bo mafên xwe yên gelî.

Xebatkarên kurd di rewşa hukumdariya derebegiyê û zêrandina eskerî-polîtîk ku ji aliyê dîwana Tirkiyê dihat pêk anîn da xwe kiribû yek û guhdariya serok û şêxên xwe, yên ku dicedand ku xwe wek "parastvanên" gelê kurd ên yekemîn nîşan bide û ku dikare gel ji nîrê Tirkiyê xelas bike, dikir. Ev hemû asêgeh li ser riya pêşketina Kurdan a civakî û sinifî bûn û wê yekê jî bi xerabkarî hukm li ser şerkariya Kurdan a azadariyê ku rêxistinên wê yên polîtîk hema hema tu nebûn dikir, ku strukturên wan ên teşkîldariyê yên fireh û zelal an jî programa wan a esasî tu nebûn. Rêxistinên usa, wek Komela Serbestiya Kurdistanê, Komiteya Serbestiya Kurdistanê, Xoybûn û komikên Kurdan ên siyasî yên mayîn, rast e, wê demê ji wan ra li hev hat ku xebatkarên Kurdan ên siyasî û mexlûqetiyê yên bi nav û deng bikin nava refên xwe, lê ew bi teşkîldarî (organîze), idêolojî û têoriyê sist bûn. Ew rêxistin diyarkirên idêolojiya fêodalîzma Kurdan bûn û bi wê yekê va jî gelek caran piştgiriya burjuwaziya Kurdan dikir. Wan herdem şertên dîrokî yên konkrêt hil ne dida ser hesêb, haya wan ji hêzên siyasî û civakî yên li Tirkiye û Rohilata Nêzîk tu nebû.

Ji rêxistinên Kurdan ên siyasî ra li hev ne hat ku riyên rast ên safîkirina pirsa Kurdan a millî bibînin. Wan di salên 20 û 30 da tu sloganeke dijî empêryalîzmê dernexist meydanê û wan nikaribû danûstendin û pevgirêdanên muhkem tevî hêzên pêşverû, yên dijî empêryalîzmê yên milletên Tirkiyê yên mayîn çêkin.

Van hemû tiştan nîşan dida ku li ser wê bingeha civakî wê serokatiya tevgerê di wê rewşa navneteweyî da şerkariya azadariyê nikaribû bigihîje armanca xwe, mafên gelê kurd ên millî li Tirkiyê peyda bike.

Institut Kurde de Paris

Bingeha hukûmeta Tirkiyê ya milkedarî-burjuwaziyê, milletçîtî-nasyonalîzmê dibû asêgeha mezin li ser riya safîkirina pirsa Kurdan, wek pirsa civakî-aborî, millî-çandî. Hukûmeta Tirkiyê, tevî mecalên pelixandinê, herdem di nava mexlûqetiya Kurdan a derebegî-rêaksyonêr da li piştgir û alîkar digeriya. Ew siyaset xwezma pey şerrê hemcihanê yê duda xurttir bû, gava Tirkiye derbasî sistema serkarîkirina welêt a pirpartiyê bû. Partiyên Tirkiyê yên burjuwa û burjuwazî-milkedariyê dilê derebegên Kurdan dikir bona ku bêtir dengên bijarvanan berhev bikin, û tesîra wan li ser bineciyên Kurdan gelek bû. Serokatiya derebegên Kurdan ku didît ku şerkariya li Kurdistanê ya millî, ya dijî empêryalîzm û derebegiyê ku bi serokatiya rêxistinên Kurdan ên pêşverû yên dizî û lêgal dihat kirin xurt dibe, dest pê kir danûstendinên xwe bi dîwana Tirkiyê ra xurttir bike û bi wan ra tevayî hej-tevgera dêmokrasiyê li wilayetên rohilatê, ya ku xwezma pey wergerandina dewletê ya sala 1960 da gelek bi hêz bû, dida hincirandin.

Aktîfbûna şerkariya Kurdan a millî di salên 60 û 70 da gihand wê yekê ku weke 10 partî û komikên ku li Kurdistana Tirkiyê bîr-baweriyên cihê-cihê belav dikirin pêş da hatin. Tehlîla dokumentên programê yên rêxistinên Kurdan şehadeta wê yekê dida ku piraniya partî û komikên Kurdan, nenihêrî tebiya wan a çep ku xuya bû, û bîr-baweriyên wan ên Marksîst-Lênînîst, bi bingeha xwe va yên burjuwaziya hûr bûn. Ew gelek dûrî têgihîştina eynî pirsdanînên ku li ber şerkariya şoreşgeriyê li Tirkiyê û şerkariya millî li Kurdistanê sekinîbûn. Ji ber vê jî ji wan partiyan hinek xwe bi avanturîzma "çep" ku ziyan û zerereke mezin gihand tevgera Kurdan li Tirkiyê girt. Rêaksyona Tirkiyê ku ew bîr-baweriyên burjuwaziya hûr ên çend rêxistinên Kurdan bi kar anîn, hêzên welatparêz dijî hev radikirin, dest pê kir dû wan karmend û rewşenbîrên Kurdan ku karekî hêja dikir bigere. Tevî vê yekê jî, karên cezakirinê li Kurdistana Tirkiyê da gumreh kirin.

Di van şertan da, di sala 80 da merhela koordina-

syona tevgerên di navbera çend partiyên Kurdan da hat texmîn kirin. Hela bi ser da, ferzend çê bûn bona sazkirina Cebha pêşverû ya yekîtiyê ku çend partiyên Kurdan ên millî-dêmokratîk û rêxistinên Tirkiyê yên siyasî yên çep, herweha Partiya Komunîst a Tirkiyê jî, dikaribûn bikevin navê. Wê yekê nîşan dida ku şerkariya Kurdan a millî-azadariyê tenê dikare tevî karker û gundiyên Tirkan dijî derebegiyê, empêryalîzmê, zêrandina komên serokatîkir ên hukumdar, dijî zêrandvanên tomerî, şêxan, nijadperestan, koledaran û rejîma Tirkiyê derkeve û bigihîje serketinê. Tenê şerkariya karkerên kurd û tirk tevayî, ya dijî bêbext û neyaran, dikare şerkariya Kurdan rake ser dereceke nuh a bilind û alîkariya safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê bike.

Safîkirina pirsa Kurdan di merhela nuha da bi gelek tiştan va bi wê yekê va girêdayî ye, ka li welêt warguhastinên burjuwa-dêmokratîk ewê çiqas bi lez û baş pêş va herin. V. Î. Lênîn ku cî û rola pirsa millî di nava jiyana mexlûqetiyê da bi çîna karkeran, şoreşger-marksîstan ra şirove dikir, bi wê yekê va alîkariya wan dikir ku di dereca safîkirina pirsên millî da siyaseta nuh hazir bikin, û usa jî nîşan dida ku "pirsa millî tenê bi cûrekî dikare bê safî kirin (ji ber ku ew pirs dikare li cihana kapîtalîst ku tê da zordarî, pîsî û zêrandin hene) pêş da bê û bê safî kirin" (8, r. 118).

Divê ku bê xuya kirin ku di derheqa "safîkirina" pirsa millî di şertên kapîtalîzmê da, V. Î. Lênîn hertim jî bi qewlî-peyman digot ku qedsa wî ew bû ku xurtbûna millî û teşkîlbûna dewletên millî yekşivêt bûn. Wî li ser hesêb çend destanînên di nava dêmokratîzekirina pêwendiyên millî da, ango safîkirina wan pirsdanînên ku di dema derbasbûna ji fêodalîzmê ber bi kapîtalîzmê da jiyanê pêş da kişandiye, hildida.

Bingehvanên komunîzma zanyarî ya prolêtaryê fêr kiriye ku xût ew divên rola sereke di nava safîkirina pirsa millî da bilîzin. F. Engels hela di dawiya sala 1845 da hat ser vê baweriyê : ji ber ku prolêtarya hemû welatan xwediya baweriyekê ye û bi giyana

xwe ya çînî entêrnasyonalîst e, ew tenê "dikare dijîtiya di nava gelan da bide hildan ... di nava neteweyên cihê-cihê da biratiyê testîq bike" (3, r. 590).

Çi ku di derheqa burjuwaziyê da dimîne, ew bona ku dîwanê di destê xwe da xwedî bike dicedîne ku bi her awayî hukmê xwe li ser milletên zêrandî bihêle. Loma jî zêrandina Kurdan bona hukumdarên Tirkiyê ne tenê bona wê ye ku kar bistînin. K. Marks û F. Êngêls hela berî karkirina xwe ya şoreşgeriyê hatibûn ser wê baweriyê ku zêrandina milletên mayîn usa jî bona wê yekê lazimî burjuwaziyê ye ku hukumdariya xwe li ser milletê xwe jî bide mehkeme kirin û xurt kirin.Tevî vê yekê, wan nîşan da ku azadariya filan an bêvan millet bi wê va girêdayî ye ku çika burjuwaziya wê kengê dev ji zêrandina gelên mayîn berdide. Ewha, di meha novembr 1847 da, F. Êngêls gotiye ku "tu millet nikare aza bijî gava ew milletekî mayîn dizêrîne" (2, r. 372). Dû ra K. Marks ew hevok-fikir bi vî awayî got : "Gelê ku zordestiyê li gelên mayîn dike gora xwe dikole" (1, r. 439). Loma jî prolêtarya Tirkiyê jî dixwaze ku Kurd û milletên Tirkiyê yên mayîn aza bin, ji ber ku azayiya wê ya civakî di gelek tiştan da bi hilanîna zêrandina Kurdan girêdayî ye.

Şerkariya Kurdan a millî-azadariyê ferzendeke herî giring bona safîkirina pirsa Kurdan e. Lê ew safîkirin divê bi şerkariya hemû karker û xebatkarên Tirkiyê ku de'wa azayiya xwe ya civakî dikin girêdayî ye, herweha prolêtarya Tirkiyê jî ku divê bona parastina mafên Kurdan ên gelî, hetanî serbestiya Kurdan jî, pêş da bê.

V. Î. Lênîn komunîst fêr dikirin ku ne tenê berk mafên gelan ên bona xweqerarkirinê biparêzin, lê usa jî dema pêkanîna wê ya herdem bidin ber hesêb, çika cihêbûn çiqasî nêzîkî aqilan e.

Klasîkên Marksîzm-Lênînîzmê ku rê û awayên giring ên safîkirina pirsa millî nîşan didin, guhdariya mexsûs û xusûsî datînin ser, terbiyekirina prolêtarya û hemû xebatkaran bi awakî entêrnasyonalîst. Wan

hîn dikir ku li welatên pirmillî şoreşgerên wî milletê ku tê zêrandin divê de'wa "cihêbûnê" bikin, lê şoreşgerên wî milletî ku milletên mayîn dizêrîne divên de'wa "yekbûn-hevgirtinê" bikin (7, r. 45). Loma jî safîkirina pirsa Kurdan li Tirkiyê kîp bi şerkariya xebatkarên hemû gelên welêt a dijî huzûra empêryalîzmê, zêrandina millî ji aliyê burjuwaziya Tirkiyê, bona warguhastinên civakî-aborî û polîtîk li Tirkiyê, va girêdayî ye.

Institut kurde de Paris

(1) Senceqa Meletyê diket nava wilayeta Memûretulezîzê (Xarput). Tê da çend eşîrên Kurdan diman. Ji bo nimûnê, eşîra Atma ku ji 12 berekan bû. Li hemberî Kurdên Dersîmê ku elewî bûn, Kurdên navçeya Meletyê bi dînê xwe va piranî sunnî bûn. Wan wek Kurdên Dersîmê serbestiya xwe, bawer bike, parastibû û bi dîwana Tirkiyê ra li hev ne dihat ku wan bi temamî bike bin qolê xwe.

(2) Çawîş Noël casûsê Ingilterê yê polîtîk li Kurdistanê bû. Ew di sala 1886 da ji diya xwe bûye. Akadêmiya eskerî ya padîşahtiyê li Vulviçê temam kiriye. Pey lihevhatina Mudrosê, bi propaganda dijî Tirkan va di nav eşîrên Kurdên Meletye û Diyarbekirê da mijûl dibû (98, r. 448).

(3) Kamuran Elî Bedirxan ji malbata Kurdan a bi nav û deng, Bedirxanan, e. Ebdul Hemîdê 2an ku dicedand hukmê wê malbatê li ser bineciyên Kurdistanê bide pîre-pîre kirin û kêm kirin, ew hemî li Stembolê xwedî dikirin û ne dihîşt ku ew vegerin welatê xwe. Dû lihevhatina Mudrosê, Kamuran Elî bi aktîfî tevî tevgera Kurdan bû (miqalên wî li rûpelên rojnama kurdî "Serbestî" ronayî didît). Di cotmeha 1918 da, rojnama "Serbestî" nama Kamuran Elî ya vekirî, ku ber bi hemû rojnamên Tirkan dibû çap kir. Ew tê da bi hêvî bû ku weşana Tirkan ji bo wî tiştî ku Kurdan piştgiriya Imperatoriya Osmanî kiriye, ku tişteki şêkirandinê ye, ewê daxwaziyên gelê kurd biparêze.

Di wê namê da ew ji bo sazkirina dewleta Kurdan pêş da dihat. Ew bingehvanekî komiteya Kurdan Xoybûn, serokê dibistana millî ya zimanên rohilatê yên zendî yê Parîsê bû (98, r. 444; 126, 255).

(4) Celadet Beg Bedirxan (birayê Kamuran Elî). Paşê bû zanyarê Kurdan ê bi nav û deng, endamê komiteya Xoybûn bû.

(5) Xelîl Rehmî Beg Bedirxan, apê Kamuran Elî. Di sala 1924 da ji sînorên Tirkiyê hat raqetandin. Li kongreya ku li Şîro hat derbas kirin, ew ji aliyê şêxên Kurdan wek serokê Kurdistanê hat îlan kirin.

(6) Dersîm navçeyeke çiyayî ye. Ew 2000 metre li ser dereca deryayê ye û dikeve roavaya Kurdistana Tirkiyê, çemê Feratê ji nav wê dikişe. Kurdên Dersîmê ji Kurdên mayîn tên cuda kirin, ne tenê bi zaravê xwe yê "zaza", lê usa jî bi ola xwe. Piraniya Kurdan sunnî ne, lê yên wê navçeyê bi dînê xwe va "alî-ilahî", ku dînekî usa ye ku tê da êlêmanên çend dînan hene : musulmanî, zerdeştî û hela xaçparêzî jî, ne. Ji peyçûyên "elî-ilahî" ra carna jî "qızılbaş" dibêjin. Cihêbûn-cudabûna dîn, zimên û warê Dersîmê yê çiyayî alîkariya wê yekê kiriye ku ew navçe ji navçeyên Imperatoriya Osmanî yên mayîn dûr bûye û ew yek gihandiye wê yekê ku Kurd tam serbest bûne, tişteki wan ê tomerî tevî hukûmeta sultan tu nebûye **(98, r. 394)**.

(7) Tiştekî balkêş e. Gava M. Kemal di dema şerrê hemcihanî yê pêşîn da li Diyarbekirê bû, bona ku Kurdan bîne aliyê xwe, li rex barêgeha xwe pareskerê Kurdan, ku bi cillê kurdî bû, bi qumandariya Hasan Hayri Beg saz kir. Di wî pareskerî da ferman bi zimanê kurdî dihat dayîn. Ew di nava dîroka ordiya Tirkiyê da cara yekemîn bû. Paşê bi fermana M. Kemal, Hasan Hayri beg ji aliyê dîwana Tirkan hat dar da kirin **(120, r. 5)**.

(8) Şêx Mehmûd serekeşîrê malbata Berzencî li Suleymaniyê ye. Di sala 1919 da roleke giring di nava serhildana Kurdan a Iraqê da lîzt, di salên 1922-1923 da şerrê çekdarî dijî Ingilîzan kir, li navçeya Suleymaniyê "Padîşahiya Kurdistana Serbest" da damezirandin.

(9) Hesenanlı Halit Beg serekê eşîreke herî navdar, Hesenanlı, bûye. Di dema xwe da wî serokatiya 4 alayên "Hamidiyye" dikir. Hesenanlı Xalit Beg ji hemû gundên navçeya Melezgirê aşar berhev dikir, çi ku ferzend dida wî ku pêşmergeyên mêrxas ên

ji 100 mirovan di bin destê xwe da xwedî bike. Bilî wê, eşîra Hesenanlı jî, ku di nava wê da bi sedan eskerên dest-pê hebûn, piştgiriya wî dikir.

(10) Şêx Seîd di sala 1865 da, li navçeya Palû (wilayeta Elazizê), ji diya xwe bûye. Kalekî wî, Şêx Elî Septî, di dawiya sedsala 18an da ji gundê Septiyê (nêzîkî Diyarbekirê) koç kir, hate Paluyê ku tê da şêxîtiya xwe dikir. Şêxê ji mala Neqişbendî, Elî Septî, xwediyê 5 kuran bû. Navê yek ji wan Mehmûd, ku navê kalekî wî lê hatibû kirin, bû. Pey mirina Elî Septî, şêx Mehmûd mala xwe bar kir, çû Xunusê û li wira Seîd xwendina dîndarî-olperestiyê stend. Çend mirovên ji malbata Şêx Seîd nuha jî li Pîranê dijîn (147, r. 31).

(11) Pîran li qezayê Erganê, wilayeta Bingolê, ku navê wê yê berê Genc bû, ye.

(12) Niştimanperwerê kurd, Hesenanlı Xalit Beg, di behara sala 1926 da, tevî 25 suwariyên xwe vegeriya Tirkiyê (Melezgirê), bona ku serhildaneke nuh tev rabike. Lê hevalên wî teslîmî qaymeqam bûn. Hesenanlı Xalit Beg û du piştmêrên wî bi şev li gundê Şîrwanşêx digrin û di 31 hezîran da li Diyarbekirê dar da dikin. Çi ku di derheqa Elî Rıza da dimîne, ew ji Îranê çû Iraqê, paşê jî Sûriyê ku tê da ket nava rêxistina kurdan a siyasî ya eskerî, Xoybûn (128, r. 146).

(13) Di nava wê da tu nûner ji wilayetên rohilatê tu nebû. Hemû wezîr ji navçeyên Tirkiyê yên merkezî û roavayê bûn.

(14) Kemaleddîn Samî Paşa di sala 1885 da li Sinopê, li mala muhendis Ebdulrahman Samî hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya bilind li akadêmiya Stembolê ya eskerî kiriye. Dema şerrê hemcihanê yê pêşîn, tevî şerrê xwedîkirina Dardanêlê û şerrê li pêşeniya Qafqasê bûye. Pey wê yekê ku ji şerr betilî, ew bû qumandarê Stembolê, paşê yê qumandarê alayê. Dû wê yekê, gava zeftkaran Stembol xist bin destê xwe, ew reviya Anatolyê û tê da tevî şerrê dijî Yûnanan bû. Di tebaxa 1924 da, ew wek balyozê

Institut kurde de Paris

Tirkiyê li Almanyê hat xuya kirin. Di adara 1925 û tebaxa 1930 da, bi demeke kurt gazî wî kir Tirkiyê û ew wek qumandarê eskerî yê Tirkiyê bona hincirandina serhildanên Kurdan hat xuya kirin. Navbera wî û Kemal Paşa gelek xweş bû **(98, dîwan 2, r. 393–394)**.

**(15)** Hecî Axta (Mehmet Efendî, Bavê Tûjo) niştimanperwerekî Kurdan ê bi nav û deng bû. Ew xwe bi xwe hînbûnê, pêşekê avukat, bi dest anî. Demekê Hecî Axta wek karmend xebitî, paşê bû avukatê serbest. Di nava bineciyên Kurdan da qedr û hurmeta wî pirr bûn **(145, r. 99)**.

**(16)** Rojnamevan û xebatkarê mexlûqetiyê Kemal Fewzî endamê Komela Damezrandina Kurdistanê bû, rojnama kurdî Jîn dida çap kirin, nûçe û gotarên cihê-cihê diweşandin û di nava Kurdan da dida belav kirin **(185, 12.5.1925)**.

**(17)** Doktor Fuad Beg, kurê Hecî Ibrahîm, ji eşîra zaza (Çermik) bû. Fuad Beg di sala 1887 da li Diyarbekirê hatiye dinyayê. Wî li zaniştgeha Stembolê ya eskerî bijîşkiyê xwendiye. Paşê mihacirî Parîsê bûye û li wira dîsa xwend û bû bijîşt (doktor). Ji wira ew bi dizî hat Tirkiyê. Di sala 1921 da li nexweşxana Urfê (Ruha) derbasî xebatê bû û carna jî li Diyarbekirê kar dikir. Fuad Beg teşkîldarekî Komela Damezrandina Kurdan (Komela Kurdan) li Diyarbekirê bû **(185, 7.5.1925; 145, r. 96)**.

**(18)** Anegorî salixên weşana Tirkiyê, di nîveka sibata 1925 da, di nava PPK da weke 10.000 endam hebûn. Karmendên dewletê û zabitên berê di nava partiyê da qebûl ne dikirin **(212, 16.2.1925)**.

**(19)** Rast e, di sala 1930 da Partiya Libêral-Komarî, Partiya Gel-Komarî (Ahali Cumhuriyet Fırkası), Partiya Tirkiyê ya Komarî ya Karker û Gundiyan hatin saz kirin û damezrandin, lê wek dibêjin, jiyana wan kin bû. Ew jî di nava demeke kurt da hatin qedexe kirin.

**(20)** Nûh Beg reviya Mûsilê, bal Şêx Mehmûd. Ew li wira du sal ma. Di behara 1928 da, birayê wî

Hecî Mûsa û Heydaranlı Huseyn Paşa ji hebsê reviyan, çûn bal Şêx Mehmûd. Wî jî Nûh Beg li bal xwe hişt, lê Hecî Mûsa û Hesen Paşa şandin navça Ararat bona ku tevî serhildana Kurdan a nuh bibin. Lê Hecî Mûsa di rê da nexwş ket û mir. Di paşdemê da, êdî li ser axa Tirkiyê kurê Hecî Mûsa, Medenî, bi neyartî û bêbextî Huseyn Paşa û kurê wî ku razayî bûn kuştin, lê serê wan ê jêkirî anî, da mufettişê sereke yê wilayetên rohilatê, Ibrahim Tali Beg, û bi wê yekê va gihîşt wî tiştî ku ew hat baxşandin. Şêx Mehmûd ku di derheqa wê yekê da hesiya, bona ku heyfa Huseyn Paşa hilde, di gulana 1928 da Nûh Beg (apê Medenî) dar da kir.

(21) Avukat Melek Parso hela berê jî cezayê sê salan xwaribû, bi gunehkariya ku karê dijî hukûmetê kiriye, lê li Yazgadê ji hebsê reviyaye û derbasî Sûriyê bûye. Gava ew vedigere Tirkiyê bona tevî serhildana Kurdan bibe, wî digrin, mehkema wî dikin û dar da dikin.

(22) Ali Sahib tevgelekî şerkariya millî-azadariyê yê aktîf li wilayetên welêt ên başûr bû û parlementerê meclisê yê pêşîn ji Urfayê bû. Di nava civîna meclisê ya duda da, Ali Sahib wek endamê mehkema serbest şand Diyarbekirê, bona ku tevî hincirandina serhildana Kurdan bibe (206, 7.12.1926).

(23) Bijartinên li meclisê yên gazîkirina siyasî di îlona 1927 da hatin derbas kirin.

(24) Hukmê mufettişê sereke li ser wê navçeya ku dikir weke 107.000 m2 û ku tê da, anegorî hesabkirina bineciyan a sala 1927, weke 900.000 binecî diman hebû (36, r. 450).

(25) Ibrahim Tali Beg (Öngören) di sala 1874 da, li Stembolê hatiye cihanê. Bi pêşekê xwe va bijîşk e. Bi aktîfî di nava partiya "Yekîtî û Pêşketin"ê da kar kiriye. Di destpêka sala 1919 da, mufettişê sihhî li wilayetên rohilatê xuya bûye û tevî Mustafa Kemal Paşa di 16 gulan 1919 da çûye Anatolyê. Di gulana 1920 da, tevî kongreya gelên Rohilatê ku li Bakû hat derbas kirin bûye. Di payîza 1920 da wek

konsulê sereke li Batumiyê xuya bûye. Ji 17 kanûna pêşîn 1923 da, ew li ser qulixa şêwrdarê wezareta karên derve bû. Di havîna sala 1924 da, ew balyozê welêt li Warşovê bû. Sê caran wek endamê Meclisê hatiye bijartin **(98, dîwan 1, r. 440)**.

**(26)** Di nava dêlêgasyonê da, bilî Şêx Hesen (lawê Seyid Riza yê mezin), usa jî serekê eşîra Kerbelan, Kanoğlu Mehmet Ali; serekê eşîra Ferhedan, Cemşit Axa; serekê eşîra Abbasan, Zeynoğlu Ahmed hebûn. Mehmed Nûrî jî tevî dêlêgasyonê hatibû Diyarbekirê **(126, r. 211)**.

**(27)** Anegorî biryara Şêwra Wezîran a 18 adar 1931, ew biryar li ser temamiya navçeya teftîşê ya sereke ya pêşîn dihat belav kirin **(45, r. 166)**, ango li ser wilayetên Agirî, Wan, Mûş, Bitlîs, Hekkarî, Siirt, Mardîn, Diyarbekir, Urfa, Elazîz (herweha navça Dersîmê jî di nav da) **(116, r. 321)**.

**(28)** Anegorî salixên Nûrî Dersîmî kongreya pêşîn a rêxistina Xoybûn di tebaxa 1927 da, li bajarê Bhamdûn (Lubnan) hat derbas kirin **(126, r. 255)**. Bi salixên mayîn, ew di oktobra 1927 da derbas bûye **(145, r. 110)**.

**(29)** Di adara 1929 da, di civîna xusûsî da, Ekrem û Qedrî (Zinar Silopî) Cemîl Paşa, yên pismamên hev, wek endamên Komita Navendî ya Partiya Xoyubûnê hatin bijartin. Berî wê, ew bi biryara Mehkema serbest, dû serhildana Şêx Seîd, li navçeyên Anatolya-yê yên navendî di hebsê da bûn **(145, r. 119)**.

**(30)** Wê demê Kurdên Iraqê şerrê çekdarî dijî kevneperstên Ingilterê bona mafên xwe yên millî dikir.

**(31)** Di 22 gulan 1932 da, mehkema Adanê cezayê wan pêşmergên ku li navça Araratê dîl hatibûn girtin da. 30 mirov hêjayî gullekirinê bûbûn. 158 kes jî li ser we'dên cihê-cihê xistin hebsê.

**(32)** Naveroka zagonê cara pêşîn di nava pirtûka Lucien Rambout da, bi navê "Kurd û maf" (Parîs, 1947) hat weşandin. Divê bê nîşan dan ku di nava Destûra Tirkiyê da ew zagon tu neye. Me ew zagon ne li berhevokên zagonên Tirkiyê yên mayîn

Institut kurde de Paris

da, ne jî di weşana Tirkiyê da dît. Xuya ye ku ew proje bû ku di sala 1934 da, pey testîqkirina meclisê, bû zagon.

(33) Teftîşa sereke ya duda, di 19 sibat 1934 da, li Tirkiya Ewropî hat saz kirin. Ya sisiyan di 6 îlon 1935 da bi navenda Erzurumê va. Wilayetên Erzurum, Qers, Riza, Trabzon, Gümüşhan, Erzincan û Agirî diketin nava navçeya teftîşa sereke ya siyasî. Ew navçe wek a qedexekirî hat îlan kirin û tukes nikaribû bêy destûrdayîna dîwana eskerî li wira bê cîwar kirin.

(34) Wê demê li welêt çar teftîşên sereke hebûn.

(35) Mîlîtanê şerkariya Kurdan a azadariyê yê bi nav û deng, helbestvan Elî Şêr, ji eşîra Şêx Hesen bû. Li qezayê Urmiyê (Koçgirî) di sala 1862 da ji diya xwe bûye. Xwendina xwe li Sîvasê bi dest aniye. Elî Şêr gelek helbest nivîsîne û di nava wan da pesna gelê kurd dida, bangî wî dikir ku dijî zordestiyê û bona azadariya xwe ya millî rabe. Dema şerrê hemcihanê yê yekê (sala 1914), Elî Şêr derbasî hêla ordiya rûsî bû û dixwest ji wira bona azakirina Kurdistanê şerr bike. Ew wek nûnerê Kurdan ê navçeyên Sivas, Meletye û Dersîmê li wira kar dikir bona ku di bin bandûra Rûsyê da Kurdistana otonom damezrîne. Pey derketina eskerên rûs, Elî Şêr vegeriya Dersîmê, lê paşê derbasî Koçgirî bû û li wira karê xwe yê bona civandina Kurdan dora dîtina çêkirina Kurdistana serbest berdewam kir. Di behara 1920 da, ew dîsa vegeriya Dersîmê. Li wira, bi lîderên Kurdan ên mayîn ra wî têlêgram ji hukûmeta Ankarê ra dişand ji bo ku li gora biryarên peymana Sêvrê mafên Kurdan ên millî nas bike. Bona tevgeliya aktîf di nava serhildana Koçgiriyê da ew ji aliyê dadgeha Tirkiyê bi cûrê dûreke hatibû gunehkar kirin û jê ra biryara gullekirinê derxistibû. Loma jî wî biryar kir ku li qezayê Ovacikê bimîne û li wira dijwariyên herî mezin kirin bin lingên xwe û salên dirêj karê terbiyekirina cahilên kurd dikir. Di sala 1937 da, dema serhildana Dersîmê, wî kîp bi Seyid Riza ra kar dikir, alîkariya

yekîtiya Kurdan boy navê şerkariya millî dikir **(126, r. 278-281)**.

**(36)** Sabiha Gökçen dota Atatürk a hildayî ye (ne helal e - T.X.). Di kollêja amerîkî ya jinan da fêr bûye. Di sala 1935 da li dibistana firindevanan a bajarvaniyê hîn bûye û bûye firindevan (pîlot). Lê di sala 1936 da zanişteha eskerî ya hewayê temam kiriye, bi aktîfî tevî hincirandina serhildana Dersîmê bûye. Pey mirina Atatürk, ew bi çawîşê hêzên eskerî yên hewayê, Ali Kemal Esiner, ku paşnavê wê hilda û bixwe jî bû "Gökçen" ra mêr kir.

**(37)** Partiya Daxuliqandina Kurdistanê di îlona 1942 da li Kurdistana Iraqê hatibû damezrandin.

**(38)** Partiya Rizgarî di sala 1944 da hatiye saz kirin û baweriyên wê yên çep bûn. Wê weke du salan jiyana xwe berdewam kir. Paşê dubendî di navbera endamên wê da çê bû : pareke wan ket nava Partiya Komunîst a Iraqê, pareke din jî nava Partiya Dêmokratîk a Kurdistanê. Bi salixên mayîn, partiya Rizgarî di sala 1945 da li Kurdistana Iraqê hatiye damezrandin û armanca wê ya dawîn ew bû ku Kurdistana Mezin saz bike **(85, r. 95)**.

**(39)** Bi zagon N° 5227 a 28 hezîran 1948, we'dê vegerandina Kurdan bo wilayetên wan li ser salekê jî hat zêde kirin **(35, dîwan 28, r. 1119-1120)**.

**(40)** Anegorî zagon N° 105, ev kes li wilayetên roavayê hatin sirgûn kirin : Ibrahim Abukoğlu, Haci Topo Aktoprak, Zeki Bayer, Faik Bucak, Ismail Hakki Bucak, Haci Ali Bucak, Ali Abik Bucak, Mehmed Cemal Bucak, Midhat Bucak, Hasan Abik Bucak, Bekir Bucak, Reşîd Çeçen, Mehmed Dal, Abdulkadir Ekinci, Ebubekir Ertaş, Mahmut Ertaş, Behaddin Erdem, Abdulrezaq Enserioğlu, Seit Enserloğlu, Şêx Ali Firat, Şêx Giyasettin Firat, Şêx Ahmed Firat, Mehmed Fuat Firat, Mehmed Emin Firat, Halil Firat, Ömer Firat, Giyesettin Firat, Huseyn Ileri, Zeynal Abidin Inan, Mustafa Işık, Kinyaz Kartal, Abdulbaki Kartal, Hamid Kartal, Bala Kartal, M. E. Karadeniz, Cemil Kufrevi, Zeki Cemil Kufrevioğlu, Abdulbaki Karakuş, Feyzullah

Keskin, Mehmed Kayeler, Abdullah Öztürk, Ferzende Öztürk, Osman Öztürk, Köroğlu Öztürk, Şamil Bekir, Seyit Remenli, Kutbettin Septioğlu, Zeynal Turanli, Cafer Yagizer, Mecid Yalçin, Derwiş Yalçin, Derwiş Yakut, Kazim Yıldırım, Süleyman Yıldırım (121, r. 335-336).

(41) Tenê di dawiya îlona 1965 da, li Ankarê mehkema wan "49" kesan ku di sala 1959 da dest pê bûbû xelas bû. Ji bo 16 kesan gunehê girtina 16 mehan derxist, lê yên mayîn hatin efû kirin. Di nava girtiyan da kandidatên parlementeriyê di hilbijartinên meclisê da (5 kes) bûn. Ji wan dudu ji Partiya Karkeran a Tirkiyê bûn, yek ji Partiya Tirkiya Nuh û dudu jî "serbest" bûn.

(42) Ş. Elçi di sala 1938 da, li bajarê Cizîrê (wilayeta Mêrdînê) ji diya xwe bûye. Fakulteya avukatiyê ya zanîngeha Ankarê temam kiriye û karê avukatiyê dikir. Di sala 1971 da, Ş. Elçi bona karê "pîre-pîrekirinê" hat girtin, lê mehkema eskerî biryara mehkema berê pûç hesab kir. Di sala 1973 da, ew wek parlementerê meclisê yê Mêrdînê (bi navnîşa "serbest") hat hilbijartin. Di sala 1977 da, bû endamê Partiya Heqqiyê, bû parlementerê meclisê ji Mêrdînê bi navnîşa Partiya Heqqiyê. Dû hilbijartinê ra, dîsa derbasî cêrgên "serbestan" bû. Di sala 1978 da ket nava teşkîla hukûmeta koalîsyonê ya B. Ecevit.

Institut kurde de Paris

## ÇAVKANÎ


1. Marks K., *Agahdariya konfîdansyêl*, Marks K. û Êngêls F., dîwan 16.
2. Marks K., *Êngêls di derheqa Polonyê da*, dîwan 4.
3. Êngêls F., *Cejna gel li Londonê*, Marks K. û Êngêls F., dîwan 2.
4. Êngêls F., *Şerrê gundiyan li Almaniyê*, Marks K. û Êngêls F., dîwan 7.
5. Lênîn V. Î., *Rapora gelên Rohilatê li kongreya rêxistinên komunîst ên Hemrûsyê*, dîwan 39, 22 novembr 1919.
6. Lênîn V. Î., *Axaftina dawîn di derheqa rapora di derheqa tawîza Fraksyona Partiya Komûnîst a Karkeran (Bolşêvîk) li kongreya Sovyêtê ya 8an, ku di 21 dêcembr da hat derbas kirin*, dîwan 42.
7. Lênîn V. Î., *Eserê gotûbêja di derheqa xwebiryarkirinê da*, dîwan 30.
8. Lênîn V. Î., *Bîr û baweriyên rexnegiriyê di derheqa pirsa millî da*, dîwan 24.
9. Lênîn V. Î., *Gelo zimanê dewletê yê resmî pêwîst e ?*, dîwan 4.
10. Lênîn V. Î., *Di derheqa karîkatura li ser Marksîzmê û "êkonomiya impêryalîst" da*, dîwan 30.
11. Lênîn V. Î., *Di derheqa kubariya millî da*, dîwan 26.
12. Lênîn V. Î., *Di derheqa mafê gelan ê bona xwebiryarkirinê da*, dîwan 25.
13. Lênîn V. Î., *Çawa bi nasyonalîzma dizî va karkeran dixalifînin*, dîwan 26.
14. Lênîn V. Î., *Prolêtarya şoreşgeriyê û mafê gelan bona xwebiryarkirinê*, dîwan 27.
15. Lênîn V. Î., *Biryarên şêwrdariya Komita Navendî ya Partiya Rûsiyê ya Sosyal-Dêmokrat a Karkeran* a havîna 1913 *tevî xebatkarên partiyê*, dîwan 24.

16. Lênîn V. Î., *Şoreşa sosyalîst û mafê gelan bona xwebiryarkirinê*, dîwan 27.
17. Lênîn V. Î., *Têzên rêfêransa di derheqa pirsa millî da*, dîwan 24.
18. Gorbaçov M. S., *Rapora siyasî ya Komita Navendî PKYS bona kongreya PKYS ya 28an.*
19. *Matêryalên kongreya PYSK ya 28an*, Moskov, 1986.
20. *Bernama PYSK, rêdaksyona nuh*, Moskov, 1986.
21. *Dokumentên siyaseta derve ya Yekîtiya Sovyêtî*, dîwan 3, Moskov, 1986.
22. *Konstitusyona Komara Tirkiyê. Tirkiya Dema Nuh*, Moskov, 1958.
23. *Siyaseta navneteweyî ya dema herî nuh di nava peyman, not û dêklarasyonan da*, dîwan 2, Moskov, 1926.
24. *Siyaseta navneteweyî ya herî nuh di nava peyman, not û dêklarasyonan da.*, beş 3, weşan 2, Moskov, 1929.
25. *Dokumentên programî yên partiyên komunîst ên Rohilatê*, Moskov, 1934.
26. *Peymana Sêvrê ya aşîtiyê û aktên ku li Lozanê hatine qol kirin*, Moskov, 1927.
27. *Kongreya Sovyêtê ya Hemrûsyê ya 7an, hesabdayîna stênografiyê*, Moskov, 1920.
28. *Arşîva merkezî ya Yekîtiya Sovyêtî*, fond 4459, rû 2.
29. *Anayasa Nizamı ve Parlemento Seçimleriyle ilgili Temel Kanunlar*, Ankara, 1961.
30. Bozbeyli F., *Parti Programları (birinci)*, Istanbul, 1970.
31. *Cumhûriyet Halk Partisi Programı*, Ankara, 1976.
32. *Çeşitli yönler ile Doğu ve Güneydoğu Anadolu*, Diyarbekir, 1967.
33. *Diyarbekir Iddianamesi*, 1972.
34. *Devrimciler, Yurtseverler, tüm Emekçiler.*
35. *Düstur.*

36. *Güneydoğu. Birinci Genel Mufettişlik Bölgesi*, Istanbul, 1939.
37. *Hayat Ansiklopedisi*, cilt 7, Istanbul, 1932.
38. *Hayat Ansiklopedisi*, cilt 20, Istanbul, 1934.
39. *Xebat ji bo rizgariya Kurdistan*, 1979.
40. *Iktisadi Rapor*, Ankara, 1975.
41. *Istatistik Yıllığı*, cilt 5, 1931/32, N° 21.
42. *Istatistik Yıllığı*, cilt 19, Ankara, 1951.
43. *Istatistik Yıllığı*, 1960-1962, N° 460.
44. *"Jenosit". Hukuki Beşere Tecavuz*, Beyrut, 1956.
45. Kökdemir N., *Eski ve Yeni Toprak, Iskan hükümleri ve uygulama klavuzu*, Ankara, 1952.
46. KUK, *1. Konferans Kararları*, 1981.
47. *Kürdistan Devriminin Yolu (Manifesto)*, 1978.
48. *Kürdistan Işçi Partisi Programı*, 1978.
49. *Kürdistan Öncü Işçi Partisinin 2. Kongresi başarıyla sonuçlandı*, 1983.
50. Kürdistan Ulusal Demokratik Güçbirliği (UDG), *Deklarasyon*, Van, 1980.
51. *14 Ekîm Seçimlerinde kitlelere gerçek yolunu gösterelim*, Bitlis, 1979.
52. Öztürk K., *Türkiye Cumhuriyeti Anayasası (Tutanaklar)*, cilt II, Ankara, 1966.
53. *TIP dosyası*, Ankara, 1973.
54. *Türkiye Cumhuriyeti Anayasası*, Istanbul, 1970.
55. *Türkiye Cumhuriyeti Anayasası*, Ankara, 1973.
56. *Türkiye Cumhuriyeti Anayasası*, Ankara, 1982.
57. *Türkiye Cumhuriyeti Onbeşinci kitabı*, Ankara, 1938.
58. *T. C. Resmi Gazete.*
59. *Türkiye Istatistik Yıllığı*, 1975, Ankara, 1976.
60. *Türkiye Işçi Partisi Proğramı*, Istanbul, 1964.
61-62. *Türkiye Işçi Partisi Proğramı ve Tüzüğü*, Istanbul, 1975.
63. *Türkiye Komunist Partisi Proğramı*, 1983.

64. *Türkiye Kürdistanı Sosyalist Partisi (TKSP)*, 1981.
65. Türkiye Kürdistanı Sosyalist Partisi, *Kürdistan Halkına*, 1980.
66. *Türkiye ve Kürdistan Halklarına. Dünya ilerici demokratik kamuoyuna*, 1980.
67. Türkiye ve Türkiye Kürdistanı Sol Birliği, *Sol Birlik (Belgeler)*, 1984.
68. *Türkiyede Kürdistan Demokratik Partisi Siyasi Proğramı*, 1974.
69. *23 Ekim 1960 Genel Nüfus Sayımı*, N° 452, Ankara.
70. *24 Ekim 1965 Genel Nüfus Sayımı*, N° 568, Ankara, 1969.
71-72. *25 Ekim 1970 Genel Nüfus Sayımı*, N° 659, Ankara, 1972.
73. *Yeni Kanunlarımız*, Ankara, 1960.
74. *Yurtdışı Kürdistan Öğrenci Birliğinin Proğramı ve Tüzüğü*, (Batı) Berlin, 1980.
75. *Iraq report on Iraq administration. April 1922-March 1923*, London, 1924.
76. Bulletin du Centre d'Etudes Kurdes, *Memorandum sur la situation des Kurdes et leurs revendications*, N° 2, Paris, 1948.
77. *Report by His Britanic Majesty's government to the Council of the League of Nations on the administration of Iraq for the year 1926*, London, 1927.
78. Rizzo J. A., *La législation Turque*, vol. IV-V, Istanbul.
79. *Solidaritat mit den Demokratchen Kraften der Turkei und Turkei Kurdistan*, 1980.
80. Avanesov S. S., *Rewşa gelên bi jimara xwe va biçûk li Tirkiyê*, Erivan, 1963.
81. Akopov G. B., *Pirsa di derheqa xurtbûna Kurdan a millî li Îranê da*, Moskov, 1952.
82. Akopov A., *Pirsa Kurdan û Daşnak-Bolşevîkên Piştqefqasyê*, Tiflîs, 1931.

Institut kurde de Paris

83. Aralov S. Î., *Bîranînên diplomatê sovyêtî (1922-1923)*, Moskov, 1960.

84. Astrayan (Hasratyan) M. A., *Politika komên Tirkiyê yên serkarîkir di hindava bineciyên Kurdan da (1924-1939)*, *Malûmatên hûr*, N° XXX, 1961.

85. Barzanî H., *Partiyên Kurdan ên siyasî û rêxistinên mexlûqetiyê di şerkariya bona safîkirina pirsa Kurdan da* (têza kandidatiyê-doktorayê), Moskov, 1971.

86. Vasilyev K., *Sebeb û hêzên serhildanên Kurdan ên berxwedayînê*, *Pirsên ziraî*, Moskov, 1931.

87. Gasratyan M. A., Orêşkova S. F., Pêtrosyan Yû. A. *Serpêhatiyên dîroka Tirkiyê*, Moskov, 1983.

88. Gûrko-Kryajîn V., *Mûsil û Iraq*. *Jiyana Navneteweyî*, N° 1, Moskov, 1926.

89. Civêlêgov A. K., *Ermenistan û Tirkiye*, Moskov, 1946.

90. Celîlov H., *Aboriya Tirkiyê*, Moskov, 1971.

91. Zavriyêv D. S., *Di derheqa dîroka nuh a wilayetên Tirkiyê yên başûrê rohilatê da*, Tbîlîsî, 1947.

92. Kemal M. A., *Şerkariya millî-azadariyê li Kurdistana Iraqê (Başûr) (1918-1932)*, (têza doktora), Moskov, 1963.

93. Kemal M. A., *Tevgera millî-azadariyê li Kurdistana Iraqê (1918-1932)*, Bakû, 1967.

94. Kuznêsov A. A., *Pirsa Kurdan li ser merhela pêşîn a krîza kapîtalîzmê ya tomerî* (destnivîsar), 1966.

95. Kurdoğlu, *Kurd û empêryalîzm*, Bultena weşana Rohilata Navîn, N° 13-14, 1932.

96. Laxûtî, *Kurdistan û Kurd*. *Rohilata Nuh*, N° 4, 1923.

97. Miller A. F., *Serpêhatiyên dîroka Tirkiyê ya herî nuh*, Moskov, Lênîngrad, 1948.

98. Mustefa Kemal, *Riya Tirkiya nuh*, dîwan I-III, Moskov, 1929, 1932, 1934.

99. Nehrû C., *Nêrînek li ser dîroka hemcihanê*, T. Z. M., 1975.

100. Nîkîtîn V., *Kurd*, Moskov, 1964.

101. Novîçêv A. D., *Gundîtiya Tirkiyê di dema herî nuh da*, Moskov, 1959.

102. Prokofêv V., *Bloka SENTO ya agrêssîf*, Moskov, 1963.

103. Rost N. F., *Nivîsarname di derheqa Kurdan da*, Bultena weşana Rohilata Navîn, N° 13-14.

104. Farîzov I. O., *Gotar di derheqa pirtûka Nîkîtîn V. "Kurd" da*, Moskov, 1964.

105. Frûnzê M. V., *Seredan li Angorayê*, Berhevoka afirandinan, dîwan I, Moskov, Lênîngrad, 1929.

106. Haûz, *Arşîva serhing Haûz*, dîwan 4, Moskov, 1944.

107. Şesûtnîdov A. M., *Şerkariya millî-azadariyê li Tirkiyê*, 1918-1923, Moskov, 1966.

108. Sasûnî G., *Şerkariya Kurdan a millî û danûstendinên Ermenî-Kurdan*, (bi zimanê ermenî), Beyrût, 1969.

109. Jamkoçyan, *eynî* (bi zimanê ermenî).

110. Abdan N., *Anayasa Hukuku ve Siyasi Bilimler Açısından 1965 Seçimlerin Tahlili*, Ankara, 1967.

111. Aladağ C., *Kürdistan Sömürgeleştirilmesi ve Kürt Ulusal Hareketi*, Istanbul, 1978.

112. Aladağ C., *Milli Mesele ve Doğuda Feodalite-aşiret*, Ankara, 1976.

113. Atatürk K., *Nutuk*, cilt I-II, Istanbul, 1962.

114. *Atatürkün süylev ve demeçleri*, cilt I, Istanbul, 1945.

115. Ayber M. A., *Bağımsızlık, Demokrasi, Sosyalizm*, Istanbul, 1968.

116. Aydemir S. S., *Ikinci Adam. Ismet Inönü*, cilt I, Istanbul, 1968.

117. Aydemir S. S., *Tek Adam. Mustafa Kemal*, cilt III (ikinci baskı), Istanbul, 1961.

118. Askun V. E., *Sivas Kongresi*, Istanbul, 1963.

Institut kurde de Paris

119. Avcioğlu D., *Türkiyenin Düzeni*, cilt II (beşinci baskı), Ankara, 1971.

119 a. Baksi M., *Kürt Tarihi (kisaca)*, Stockholm, 1972.

120. Bedirhan C. A., *Mektup Türkiye Reisicumhur Gazi Mustafa Paşa Hazretlerine*, 1933.

121. Beşikci I., *Doğu Anadolunun Düzeni. Sosyo-ekonomik ve etnik temeller*, 2. baski, Istanbul, 1970.

122. Bozarslan M. E., *Doğunun Sorunları*, Ankara, 1966.

123. Cem I., *Türkiyede geri kalmışlığın tarihi* (üçüncü baskı), Istanbul, 1973.

124. Cemal B., *Şeyh Sait Isyani*, Istanbul, 1955.

125. Demircioğlu D., *Işte Doğu Anadolu*, Ankara, 1969.

126. Dersîmî M. N., *Kürdistan Tarihinde Dersim*, Halep, 1952.

127. Esengîn K., *Kürtçülük Sorunu*, Istanbul, 1966.

128. Firat M. S., *Doğu Illeri ve Varto tarihi*, Ankara, 1970.

129. Göloğlu M., *Uçüncü Meşrûtiyet. 1920*, Ankara, 1970.

130. Gökman M., *50 Yılının Tutanağı. 1923-1973*, Istanbul, 1973.

131. Hasratyan M. A., Ahmed K. M., Ciwan M., *1923 Kürt Ayaklanmasi (Şeyh Sait Hareketi)*, Uppsala, 1985.

132. *Hebat çizgisinin eleştirisi*, 1978.

133. Ipekçi A., Cosar S., *Ihtilalin iç yüzü*, cilt I, Istanbul, 1965.

134. Karal E. Z., *Türkiye Cumhuriyeti Tarihi (1918-1960)*, Istanbul, 1963.

135. Keleş R., *Türkiyede Şehirleşme, Konut ve Gecekondu*, Istanbul, 1972.

136. Kemalî A., *Erzincan. Tarihi, coğrafi, ictimai, etnografi, idari, ihsai tetkikat tecrubesi*, Erzincan, 1932.

137. Kirzioğlu F., *Kürtlerin Türklüğü*, Ankara, 1969.
138. Kıvılcımlı H., *Ihtiyat kuvvet : milliyet (şark)*, Istanbul, 1979.
139. Kıvılcımlı H., *27 Mayıs ve Yön Hareketinin Sınıfsal Eleştirisi*, Istanbul, 1970.
140. Koças S., *Tarih boyunca Ermeniler ve Türk-Ermeni ilişkileri*, Ankara, 1967.
141. Leventoğlu M., *Atatürkün vasiyeti*, Istanbul, 1966.
142. Murat H., *Özgür Kürdistan için*, Frankfurt, 1980.
143. Murat H., *Türkiye Şartlarında Kürt halkının Kurtuluş Mucadelesi*, 1977.
144. Nesef Halil, *Büyük Meclis ve Inkilap*, Ankara, 1933.
145. Silopî Z., *Doza Kurdistan*, 1969.
146. Şivan, *Kürt Millet Hareketleri ve Irakta Kürdistan ihtilalı*, Bromna, Stockholm, 1970.
147. Tokar M., *Şeyh Sait ve Isyanı*, Ankara, 1968.
148. Tunaya T. Z., *Türkiyede Siyasi Partiler (1859-1952)*, Istanbul, 1952.
149. Ulubelen E., *Ingiliz gizli belgelerile Türkiye*, Istanbul, 1968.
150. Uluğ I. H., *Atatürkün çizdiği portreler*, Istanbul, 1967.
151. Üstüngel, *Savaş Yolu*, Sofya, 1952.
152. Yamlukî A. A., *Kürdistan ve Kürt ihtilalleri*, Bagdad, 1946.
153. Arfa H., *The Kurds. A historical and political study*, New York-Toronto, 1966.
154. Armstrong H. G., *Grey Wolf. Mustafa Kemal*, London, 1934.
155. August K., *Le Pais de Kemal Ataturk*, Leipzig, 1938.
156. Bedir Khan K. A., *La Question Kurde*, Paris, 1959.

Institut kurde de Paris

157. Bedir Khan K. A., *Préface*. J. Pradier, *Les Kurdes. Révolution silencieuse*, Bordeaux, 1968.

158. Blau J., *Problème kurde, essai sociologique et historique*, Bruxelles, 1963.

159. Bois Th., *Connaissance des Kurdes*, Beyrût, 1965.

160. *Eagleton W.*, The Kurdish Republic of 1946, London, 1963.

161. Edmonds C. Y., *Kurds, Turks and Arabs. Politics travel and research in North-Eastern Iraq (1919-1925)*, London, 1957.

162. Gavan S. S., *Kurdistan, divided Nation of the Middle East*, London, 1958.

163. Gentizon P., *Mustafa Kemal ou l'Orient en marche*, Paris, 1929.

164. *Histoire de la République Turque*, Istanbul, 1935.

165. Kinnane D., *The Kurds and Kurdistan*. London-New York, 1964.

166. *Les Kurdes et le Kurdistan. La question nationale kurde au Proche-Orient*, Paris, 1981.

167. Majeed K. Y., *Under-Underdevelopment. A Regional case of study of the Kurdish Area in Turkey*, Helsinki, 1976.

168. Mauris R., *Le Kurdistan ou la mort*, Paris, 1967.

169. Pradier Y., *Les Kurdes. Révolution silencieuse*, Bordeaux, 1968.

170. Rambout L., *Les Kurdes et le droit*, Paris, 1947.

171. Roth Y., *Geographic der Underdnickten*, Hamburg, 1978.

172. Safrastian A., *Kurds and Kurdistan*, London, 1948.

173. Vanly I. Ch., *Le Kurdistan et la question kurde*, Paris, 1960.

174. Vanly I. Sh., *Survey of the National Question of Turkish Kurdistan with historical background*, Roma, 1971.

175. Wilson A., *Mesopotamia, 1917-1920*, London, 1931.

176. Pirsên zîraî.

177. Bultena weşana Rohilata Navîn.

178. Zarya Vostoka.

179. Izvestia.

180. Kommunist.

181. Mêjdûnarodnaya jîzn.

182. Pravda.

183. Pirsên aşîtî û sosyalîzmê.

184. Rêvolusionnyî Vostok.

185. Akşam.

186. Ala Rizgarî

187. Ant.

188. Armanc.

189. Atılım.

190. Aydınlık.

191. Aydınlık.

192. Bahoz.

193. Berxwedan.

194. Cumhuriyet.

195. Dengê Komal.

196. Dengê Komkar.

197. Der Spiegel.

198. Durum.

199. Dunya.

200. Emek.

201. Forum.

202. Gazet.

203. Gaziya Welat.

204. Qêrîn.

Institut kurde de Paris

205. Günaydın.
206. Hakimiyeti Milliye.
207. Havadis.
208. Hewar.
209. Hurriyet.
210. Ikdam.
211. Inkilap Yolu.
212. Istanbul.
213. Kadro.
214. Kitle.
215. Kurdistan.
216. Milliyet
217. Nıştiman.
218. Öncü.
219. Özgürlük.
220. Özgürlük Yolu.
221. Riya Azadî.
222. Rizgarî.
223. Roja Nû.
224. Ronahî.
225. Roja Welat.
226. Serxwebûn.
227. Somut.
228. Son Posta.
229. Tan.
230. Tanin.
231. Tercuman.
232. TIP Haberleri.
233. Türkiye Postası.
234. Ulus.
235. Vakit.
236. Varlık.
237. Vatan.
238. Yankı.

Institut kurde de Paris

239. Yeni Gazete, 24.
240. Yön.
241. Yurttan Haberler.
242. El-Hedef.
243. Usaber.
244. L'Asie Française, Paris.
245. Avantî.
246. Bulletin mensuel du Centre d'Etudes Kurdes.
247. The Daily Telegraph.
248. Echo.
249. Economist.
250. International affairs.
251. Journal d'Orient.
252. The Christian Science Monitor.
253. Kurdish facts and West-Asian affairs.
254. Le Monde Diplomatique.
255. The Near East and India.
256. The New York Post.
257. The New York Times.
258. L'Orient.
259. République.
260. Temps.
261. The Times.

Institut kurde de Paris

# NAVEROK


Pêşgotin 3

Beş I. Pirsa Kurdan di dema tevgera Kemaliyan da (1918-1924) 5

Beş II. Serhildana Kurdan a sala 1925 (serhildana Şêx Seîd) 63

Beş III. Siyaseta mulayimkirina Kurdan û serhildana Araratê 127

Beş IV. Xurtkirina siyaseta hincirandina Kurdan di salên 30 da 191

Beş V. Pirsa Kurdan pey şerrê hemcihanê yê duda ra (1945-1970) 223

Beş VI. Serhildana Kurdan li Tirkiyê di salên 70 û destpêka 80 da 295

Paşgotin 375

Nîşank 381

Çavkanî 391


Institut kurde de Paris

1) Bultena sêmehî ya agahdariyê, bi 4 zimanan : kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî.
2) Dossier Kurdistan, dosyeke li ser dîroka Kurdistanê û rewşa Kurdan a îroyîn ji aliyê siyasî, civakî û çandî, li welêt û li Ewropayê, bi fransî, 136 rûpel. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1989 û a 3mîn 1992.
3) Dossier Koerdistan, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi hollandî. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1991.
4) The Kurdistan File, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi ingilîzî, 1989.
5) CEMIL PAŞA Ekrem, Muhtasar Hayatım, jînenîgariya nivîskar, bi tirkî, 104 rûpel. Çapa 1mîn 1989, a 2mîn 1991.
6) SOREKLÎ Şahînê Bekir, Jana Heft Salan, helbestên bi kurdî, 155 rûpel, 1990.
7) BIRO Taharê, Memê û Eyşê, şano (tyatro) bi kurdî, 162 rûpel, 1991.
8) ŞAKELÎ Ferhad, Kurdish Nationalism in Mam û Zîn of Ahmad-î Khanî, têzeke zanîngehî li ser destana Mem û Zîn, bi ingilîzî, 146 rûpel, 1992.
9) Kurdistan, broşureke dirêj bi foto, bi zimanê fransî, li ser rewşa Kurdan a giştî, bi hevkariya rêxistina beljîkî Solidarité Socialiste û alîkariya maddî ya Kommisyona Ewropayê, 12 rûpel, 1993.

Weka ku xwendevanên me dizanin, ji berê, ango ji 1978 heta 1989, navê rêxistina me Têkoşer bû. Di wan salan de me kovareke çandî ya sêmehî bi zimanê kurdî, bi navê "Têkoşer" derdixist. Jê 43 hejmar derketine. Piştî ku me navê xwe guherand û kir Enstitu, me ew kovar rawestand û di ciyê wê de bultena agahdariyê ya sêmehî derxist. Ji derveyî kovarê, me wê gavê gelek broşûr û dosye, bi zimanên cihê, li ser Kurdan derdixistin. Em wan li vê derê nabêjin ji bo ku êdî zemanê wan buhuriye.

Institut kurde de Paris



Manvêl A [illegible] 21.5.1924 de lı Azerbaycane bûye. Wî li Enstituya Zaninên [illegible] ovê xwendiye û piştre doktora xwe li ser Pirsa Neteweyî [illegible] za xwe ya profêsortiyê lı ser Pirsa Kurdî li Tırkıyê kiriye.

M. Hasrat [illegible] rojhilatzan û kurdzanekî gelek navdar e. Ew bi salan e li [illegible] ayê weka mudîrê koma xebatê ya "pirsên kurdî" lı Moskov [illegible] pırtûka gıranbuha bı rûsî nivîsiye û nivîskarê kurd ê navdar [illegible] URADOV, ew wergerandiye kurdî.

Nuha ev [illegible], bı serokatıya M. Hasratyan, pirtûkeke bi navê "Edebıyat [illegible] yê di derheqa pırsa Kurdan da" amade dike.

Institut kurde de Paris